

**T.C.  
ZANÎNGEHA YUZUNCU YIL  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANS A BİLİND**

**NİMÛNEYÊN ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN ÇALDIRANÊ  
LI GORÎ RÊBAZA MORFOLOJİYÊ YA VLADIMIR PROPP**

**Mazhar ÇİFTÇİ**

**Şewirmend  
Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ**

**WAN-2019**

**T. C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Yüksek Lisans Tezi**

**VLADIMIR PROPP'UN MORFOLOJİ YÖNTEMİNE GÖRE  
ÇALDIRAN EFSANEVİ MASALLARI ÖRNEĞİ**

**Mazhar ÇİFTÇİ**

**Danışman  
Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ**

**VAN-2019**

**T. C.**  
**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**  
**Yaşayan Diller Enstitüsü**

**TEZ KABUL TUTANAĞI**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ danışmanlığında, Mazhar ÇİFTÇİ tarafından hazırlanan “ **Nimûneyên Çîrokên Derasayî Yên Navçeya Çaldiranê Li Gorî Rêbaza Morfolojîyê Ya Vladimir Propp**” adlı bu çalışma, 10/06/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan (Danışman) :	Doç. Dr. Ömer ÇİFTÇİ	İmza.....
ÜYE	: Dr. Öğr. Üyesi Nesim SÖNMEZ	İmza.....
ÜYE	: Dr. Öğr. Üyesi Mazhar TUNÇ	İmza.....
ÜYE	: .....	İmza.....
ÜYE	: .....	İmza.....

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

İmza  
11/10/2019  
Prof. Dr. Murat DEMİREL  
Mühür

**KURTE**  
**Mazhar ÇİFTÇİ**  
**NİMÛNEYÊN ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN EBEXÊ**  
**LI GORÎ RÊBAZA MORFOLOJİYÊ YA VLADIMIR PROPP**  
**TEZA LÎSANS A BILIND**  
**ZANÎNGEHA YUZUNCU YIL**  
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**  
**Şewirmend: Ömer ÇİFTÇİ**  
**2019, Wan. XVII+471 r.**

Em ê di vê xebata xwe de li ser nimûneyên çîrokên efsanewî yên ku me li Ebexê berhevkirî bi awayekî zanistî û bi hûrgilî li gorî rêbaza morfolojiyê ya çîrokên derasayî ya folklornasê rûsî Vladimir PROPP rawestin. Wekî ku tê zanîn folklornasî rûsî Vladimir PROPP di dahurandin û şîrovekirina erk û fonksiyonên ku çîrokan de derbas dibin û di tesbîtkirina motifên çîrokan de rêbaza wî ya fonksiyonan bi navûdeng e.

Em ê di vê xebata xwe de di beşa ewil de em ê bi awayekî giştî li ser folklorê û sedemên eleqedariya li ser folklorê bisekinin. Di vê beşê de û di binbeşên vê beşê de em ê dîsa bi awayekî giştî li ser cureyên folklorê kurdî bisekinin. Dawiya vê beşê de jî em ê li ser mijara xwe ya bingehîn ango li ser çîrok û taybetmendiyên çîrokan rawestin

Di beşa duyem de ewilî em ê bi awayekî giştî li ser jiyana folklorîstê rûs Vladimir Propp û li ser rêbaza wî morfolojîya çîrokên derasayî bisekinin. Pişre jî li gorî folklorîstê rûsî Vladimir PROPP motif an fonksiyonên çîrokan û senifandina motif an fonksiyonên çîrokan rawestin.

Di beşa sêyem de jî em ê ew çîrokên derasayî yên ku me li Ebexê [Çaldiran] berhevkirî li gorî rêbaza morfolojiyê ya çîrokên derasayî ya folklornasê rûsî Vladimir Propp tehlîl bikin. Di ve beşê de em ê li gorî wan 31 erk/fonksiyonên ku Vladimir Propp ji nava 100 çîrokên rusî tesbîtkirî li ser çîrokên derasayî yên ku me li Ebexê [Çaldiran] berhevkirî tetbîq bikin.

Di beşan dawîn de jî em ê çîrokên berhevkirî yên ku bûne mijara vê xebatê wek pêvek biweşînin.

**Peyvên Sereke:** Folklor, Vladimir Propp, morfolojîya çîrokên derasayî, çîrokên derasayî yên Ebexê.

## ÖZET

Mazhar ÇİFTÇİ

VLADIMIR PROPP'UN MORFOLOJİ YÖNTEMİNE GÖRE

ÇALDIRAN EFSANEVİ MASALARI ÖRNEĞİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Danışman: ÖMER ÇİFTÇİ

2019, Van. XVII+471 s.

Bu çalışmamızda Çaldıran yöresinden derlediğimiz efsanevi masalları Rus Folklorist Vladimir PROPP'UN olağanüstü masalların morfolojisi yöntemine göre analiz edeceğiz. Bilindiği üzere Rus Folklorist Vladimir PROPP masallarda geçerli olan fonksiyonların analiz edilmesinde ve yorumlanmasında ve ayrıca masallarda geçen motiflerin tespit edilmesinde onun olağanüstü masalların morfolojisi yöntemi önemli bir yer teşkil etmektedir.

Bu çalışmamızda ilk bölümde genel olarak folklor ve folklorik çalışmalara yönelişin sebepleri üzerinde duracağız. Bu bölüm ve bu bölümün alt bölümlerinde yine genel olarak Kürt Halk Edebiyatı türleri üzerinde duracağız. Bu bölümün son kısmında ise temel konu alanı veya masallar ve masalların karakteristik özellikleri üzerinde duracağız.

İkinci bölümde genel olarak Rûs Folklorist Vladimir Propp ve onun olağanüstü masalların morfolojisi yöntemi üzerinde duracağız. Daha sonra ise Rus Folklorist Vladimir PROPP'A göre masallarda geçen motif veya fonksiyonlar ve bu motif veya fonksiyonların sınıflandırılması üzerinde durulacaktır.

Üçüncü bölüm de ise Çaldıran yöresinden derlenen bu olağanüstü masalları Rus Folklorist Vladimir PROPP'UN olağanüstü masalların morfolojisi yöntemine göre irdeleyeceğiz. Bu bölümde Çaldıran'dan derlediğimiz efsanevi masalları Vladimir PROPP'UN 100 rus masallarından tespit etmiş olduğu 31 rol/fonksiyona göre inceleyeceğiz.

En son bölüm de ise bu çalışmaya konu olan derlenen masallar ek olarak eklenecektir.

**Anahtar Kelimeler:** Folklor, Vladimir PROPP, Olağanüstü masalların morfolojisi, Çaldıran'ın olağanüstü Masalları.

**ABSTRACT**  
**ACCORDING TO VLADIMIR PROPP'S MORPHOLOGY METHOD**  
**LEGENDARY ÇALDIRAN TALES EXAMPLE**  
**MASTER'S THESS**  
**VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY**  
**INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES**  
**DEPARTMENT OF KURDISH LANGUAGE AND CULTURE**  
**Supervisor: ÖMER ÇİFTÇİ**  
**2019, Van. XVII+471 p.**

In this study, we will analyse tales which we collected from Çaldıran region according to Russian folklorist Vladimir PROPP's legendary tales morphological method. As you know, Russian folklorist PROPP analysing of valid function in tales, commenting and also in finding motif, there is an important place of his magnificent tales morphology method.

In this our study, in the first part, we will basically focus on folklor and cause of trending folkloric studies. In this part and in this part subdivision, we will basically focus on Kurdish Public Literature. At the last part of this section, we will focus fundamental topic area or tale and tales charecteristic feature.

At the second part, we will basically focus Russian Folklorist Vladimir PROPP and his magnificent tales morphological method. Later, we will focus motif of in the tales, function and classification according to Russian folklorist Vladimir PROPP.

At the thirt part, we will examine tales which collected from Çaldıran region according to Vladimir PROPP's magnificent tales morphology method. In this part we will examine magnificent tales which we collected from Çaldıran region according to Vladimir PROPP's identified 100 Russian tales act/function.

At the last part, tales which topics of this study will be attach.

**Key Words:** Folklor, Vladimir PROPP, morphology of magnificent Tales, legendary tales of Çaldıran

## NAVEROK

KURTE .....	IV
ÖZET .....	V
ABSTRACT.....	VI
NAVEROK .....	VII
PÊŞGOTIN .....	XV
KURTEBÊJE .....	XVII
<b>DESTPÊK.....</b>	<b>1</b>
<b>BEŞA YEKEM .....</b>	<b>4</b>
1.1. FOLKLOR .....	4
1.1.2. BI AWAYEKÎ GIŞTÎ FOLKLOR .....	4
1.1. 3. SEDEMÊN MEYL Û ELEQEDARIYA LI SER FOLKLORÊ .....	5
1. 2. BEŞÊN FOLKLORA KURDÎ .....	6
1. 3. ÇÎROK AN ÇÎROKÊN GELÊRÎ .....	8
<b>BEŞA DUYEM .....</b>	<b>11</b>
2. VLADIMIR PROPP Û RÊBAZA WÎ YA MORFOLOJIYA ÇÎROKÊN DERASAYÎ.....	11
2. 1. VLADIMIR PROPP .....	11
2. 2. MOTÎF Û LI GORÎ VLADIMIR PROPP MOTÎF .....	12
2. 2. 1. MOTÎF .....	12
2. 2. 2. RÊBAZA ERKAN/FONKSÎYONAN A VLADIMIR PROPP .....	13
2. 2. 3. ERK Û FONKSÎYONÊN ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN VLADIMIR PROPP .....	16
2. 2. 4. LI GORÎ MEZHER IBRAHÎMÎ 31 ERK/FONKSÎYONÊN VLADIMIR PROPP ÊN ÇÎROKÊN DERASAYÎ.....	24
<b>BEŞA SÊYEM.....</b>	<b>30</b>
<b>3. TETBÎQKIRINA ERK Û FONKSÎYONÊN RÊBAZA MORFOLOJIYÊ YA VLADIMIR PROPP LI SER ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN EBEXÊ .....</b>	<b>30</b>
<b>3. 1. JI MALBATÊ YEK DÛR DÛR DIKEVE .....</b>	<b>30</b>
3. 1. β1. Ji neslên pîr yek ji malê dûr dikeve .....	30
3. 1. β2. Mirina bav an jî dê an jî ya herduya bi hev re wekî renekî teqez yê veqetînê tê dîtin... 31	
3. 1. β3. Ji neslên nû yek ji malê dûr dikeve .....	31
<b>3. 2. LEHENG BI QEDEXEYEKÊ RE RÛBIRÛ DIMÎNE .....</b>	<b>32</b>
3. 2. γ1. An karekî ku divê neyê kirin tê destnîşankirin an jî tê destnîşankirin ku divê ji cihê xwe neyê veqetîn .....	32

3. 2. γ2. Bi ferman an jî pêşnîyazek rewşeke berevajî qedexeyê tê destnîşnakirin .....	33
<b>3. 3. QEDEXE TÊ BINPÊKIRIN .....</b>	<b>34</b>
<b>3. 4. ÊRÎŞKAR HEWL DIDE KU AGAHÎYAN BI DEST BIXE .....</b>	<b>35</b>
3. 4. ε1. Armanca lêpîrsînê hînkirina cihê ku zarok lê dimînin an jî hînkirina eşyayê bi qîmet e..	35
3. 4. ε2. Lêpîrsîna berevajî, qurban ji êrîşkar hin pîrsan dike.....	36
3. 4. ε3. Di hin rewşan de lêpîrsîn bi navgînîya hin kesên cuda tê kirin .....	37
<b>3. 5. ÊRÎŞKAR DI HEQÊ QURBAN DE AGAHÎ BERHEV DIKE .....</b>	<b>37</b>
3. 5. ζ1. Êrîşkar (xayîn) bersivekê ji pîrsa xwe re digire .....	38
3. 5. ζ û ζ3. Lêpîrsîn ku bi rengêkî dî an jî berevajî tê kirin, bersiveke rewa lazim dike .....	38
<b>3. 6. ÊRÎŞKAR JI BO KU QURBANÊN XWE AN JÎ [JI BO] SERWETÊ [WÎ], HEWLA XAPANDINA WÎ DIDE .....</b>	<b>38</b>
3. 6. η1. Êrîşkar dixwaze qurbanî/ê qanih bike .....	38
3. 6. η2. Êrîşkar rasterast navgînên sêhrî bi kar tîne.....	39
3. 6. η3. Êrîşkar hin rêyên dî yên xapînok an jî tîrsdêr bi kar tîne.....	39
<b>3. 7. LEHENG TÊ XAPANDIN Û BI VÎ RENGÎ NEXWESTIBE JÎ ALÎKARÎYA DIJMIN KIRIYE .....</b>	<b>40</b>
3. 7. θ1. Leheng ji êrîşkar bawer dike .....	40
3. 7. θ2 û θ3. Leheng bi hin navgînên sêhrî ya tê birîndarkirin an jî dikeve xewê. An jî leheng digel ku tu kesê, wî li razanê mecbûr nekiribe jî ji nişkê ve radizê û karê dijmin rihetir dike.....	41
<b>3. 8. ÊRÎŞKAR ZIRARÊ DIDE YEKÊ JI MALBATÊ .....</b>	<b>41</b>
3. 8. A1. Êrîşkar yekê direvîne.....	41
3. 8. A2. Êrîşkar objeyeke sêhrî didize an jî direvîne.....	42
3. 8. A3. Êrîşkar zevîyan talan dike an jî zîrar dide zevîyan.....	44
3. 8. A4. Êrîşkar ronahîya rojê direvîne.....	44
3. 8. a) Tawankar çavkaniya ava vexwarina xelkê dagir dike û li hember [wê] jî qurbanîkirina keçikan dixwaze, her car ji bo demeke kurt pêşîya avê berdide.....	44
3. 8. b) Tawankar, qurbaniyan mecbûrî karên dijwar dike.....	45
3. 8. A5. Êrîşkar kiryarên xwe yên dizîyê an jî revandinê bi rengine dî dike.....	45
3. 8. A6. Êrîşkar zîrar dide bedena kesan.....	45
3. 8. A7. Êrîşkar dibe sebeb ku yek ji nişkê ve hunda bibe.....	46
3. 8. A8. Êrîşkar qurbanê/a xwe mecbûr dike ku tiştêkî bike an jî bi zorê tiştêk jê digire.....	46
3. 8. A9. Êrîşkar berê yekî/ê dide.....	47
3. 8. A10. Êrîşkar ferman dide ku yek bi nava behrê de bê avêtin.....	47
3. 8. A11. Êrîşkar li yekî/ê an jî tiştêkî sêhrê dike. (Wî/wê bi sêhrê vediguherîne tiştêkî dî).....	48



3. 8. A12. Êrîşkar yekê/î dixwe dewsa yekê/î dî.....	49
3. 8. A13. Êrîşkar ferman dide ku yek bê kuştin.....	50
3. 8. A14. Êrîşkar yekê/î dikuje.....	50
3. 8. A15. Êrîşkar yekê/î di cihekî de kilît dike an jî davêje zindanê.....	52
3. 8. A16. Êrîşkar yekê/î mecbûr dike ku pê re bizewice.....	53
3. 8. A17. Êrîşkar, [qurban] bi xwarinê ditirsîne.....	54
3. 8. A18. Êrîşkar her şev bi yekê îşkence dike/diêşîne.....	54
3. 8. A19. Êrîşkar şer îlan dike.....	55
<b>3. 8. a. JI MALBATÊ YEK TIŞTEKÊ HUNDA DIKE AN JÎ DIXWAZE TIŞTEKÎ BI DEST BIXE.....</b>	<b>55</b>
3. 8. a1. Kêmahîya keçikekê wek nîşanî, kêmahîya dostekî.....	55
3. 8. a2. Pêdivîya bi obejeke sêhrî wekî sêv, av, hesp, şûr û hwd.....	56
3. 8. a3. Pêdivîya objeyeke ne sêhrî lê ecêb. Teyrê agir, werdeka pûrtzer û hwd.....	56
3. 8. a4. Ji bo kuştina dêwek tişteki wekî hêka bi sêhr kême.....	57
3. 8. a5. Ji bo jîyînê kêmasîya wasitayên pêdivî, tiştên maqûl.....	58
3. 8. a6. Hin formên cuda.....	59
<b>3. 9. AGAHÎYA XERABÎ AN JÎ KÊMAHÎYÊ BELAV DIBE, BI DAXWAZ AN JÎ FERMANEKÊ SERÎ LI LEHENG TÊ DAYÎNÎ LEHENG TÊ ŞANDIN AN JÎ DIÇE.....</b>	<b>59</b>
3. 9. B1. Hawara alîkarîyê tê kirin, dûre jî leheng tê şandin.....	59
3. 9. B2. Leheng pêre tê şandin.....	60
3. 9. B3. Leheng ji mala xwe derdikeve tê.....	60
3. 9. B4. Agahîya felaketê belav dibe.....	61
3. 9. B5. Lehengê ku hatiye qewirandin ji mala xwe bo derekî dûr tê birin.....	61
3. 9. B6. Lehengê ku mehkûmê mirinê hatiye kirin, bi dizî serbest tê berdan.....	62
3. 9. B7. Straneke dilêş ku wê êşê tîne ziman tê stirîn.....	62
<b>3. 10. LEHENGÊ KU LÊ TÊ GERÎN QEBÛL DIKE KU BIKEVE NAVA ÇALAKÎYÊ AN JÎ BIRYARA ÇALAKÎYÊ DIDE.....</b>	<b>62</b>
<b>3. 11. LEHENG JI MALA XWE DERTÊ.....</b>	<b>63</b>
<b>3. 12. LEHENG DI ÎMTÎHAN, LÊPIRSÎN AN JÎ ÊRÎŞEK KU DÊ RÊ VEKE KU EW Ê OBJEYEKE SÊHRÎ AN JÎ ALÎKAREKE BI DEST BIXE DE DERBAS DIBE.....</b>	<b>63</b>
3. 12. D1. Bexşgêr leheng îmtîhan dike.....	64
3. 12. D2. Bexşgêr silav dide leheng û jê pirsan dike.....	64
3. 12. D3. Kesekî/ê ku li ber mirinê ye an jî mirî ye ji leheng dixwaze ku ew alîkarîya wî bike... ..	65
3. 12. D4. Girtîyek/dîlek ji leheng dixwaze ku ew wî xelas bike.....	66
3. 12. D4-a.....	66

3. 12. D5. Serî li leheng tê dayin û jê eman tê xwestin.....	66
3. 12. D6. Du kesên ku gengeşe dikin ji leheng dixwazin ku ew xenîmetê li wan parê bike.....	67
3. 12. D7. Daxwazên dî.....	67
3. 12. D8. Mexlûqekî/aferîdeyekî dijmin hewl dide ku leheng tune bike.....	68
3. 12. D9. Mexlûqekî/aferîdeyekî dijmin bi leheng re şer dike.....	68
3. 12. D10. Objeyeke sêhrî nîşanî leheng tê dayin û pêşniyaza taqasê/bihevguherînê tê kirin.....	68
3. 12. a) Yek ji bexşendeyên girîng di çîrokên kurdî de Xidirê [Xizirê] Zindî ye. Xidir bêyî ti payînê <sup>1</sup> tê ser rêya leheng û rêya serketin û biarmancgihîştinê nîşanî wî dide.....	68
3. 12. b) Ev rênimandin hin caran di xewê de rû dide.....	70
3. 12. c) Carinan dêwek ligel lehengê li hev dike û li beramber anîna kesek an tişteki dêw keresteyeke cadûyî pêşkêşî lehengê dike.....	70
<b>3. 13. LEHENG BERSIV DIDE ÇALAKÎYÊN MIROVÊ KU DÊ DI PÊŞ DE BEXŞÊ BIBEXŞÎNE WÎ.....</b>	<b>71</b>
3. 13. E1. Leheng di îmtîhanê de bi ser dikeve (bi ser nakeve).....	71
3. 13. E2. Leheng silava bexşgêr digire (nagire).....	72
3. 13. E3. Leheng daxwaza kesek ku miriye an jî li ber mirinê ye pêk tîne (pêk nayne).....	72
3. 13. E4. Leheng, girtî serbest berdide.....	72
3. 13. E5. Leheng, heywanê ku jê alîkarî dixwaze xelas dike.....	73
3. 13. E6. Leheng, parêkirina ku li serê gengeşe heye dike û yên ku gengeşê dikin dûr dixê.....	73
3. 13. E7. Leheng hin xizmetên/alîkarîyên dî dike.....	74
3. 13. E8. Leheng bi taktîkên kesê dijmin, dijmin têk dibe û ji êrîşê xelas dike.....	75
3. 13. E9. Leheng aferîdeyê/a dijmin têk dibe (an jî têk nabe).....	75
3. 13. E10. Leheng bihevguherînê qebûl dike lê li hember bexşgêr hêza sêhrî ya objeyê bi kar tîne.....	75
<b>3. 14. OBJEYA SÊHRÎ JI LEHENG RE TÊ DAYÎN.....</b>	<b>75</b>
3. 14. F1. Objê rasterast tê dayin.....	75
3. 14. F2. Objê li cihê ku ji leheng re tê gotin e.....	76
3. 14. F3. Objê tê çêkirin.....	76
3. 14. F4. Objê tê firotan û tê stendin.....	77
3. 14. F5. Objê bi rasthatinî dikeve destê leheng (leheng wê dibîne).....	77
3. 14. F6. Objê xwe bi xwe yekcar peyda dibe.....	78
3. 14. F7. Objê tê vexwarin an jî xwarin.....	78
3. 14. F8. Objê tê dizîn.....	79
3. 14. F9. Curbecur kes bi xwe dikevin xizmeta leheng.....	80

1 ) Bêyî ku li benda tişteki an sudekê be. (wer.)

3. 14. a) Gelek caran Xidirê (Xizir) Zindî ji dêvla keresteya cadûyî hin şîretan û rênimayîyan dide lehengî û çawaniya jinavbirina tawankar ji wî re ronî dike.....	81
3. 14. b) Bexşende bi şuştina lehenga keç, bi av an barana efsûnî ciwaniyeke seyr û ecêb pê dibexşe.....	82
3. 14. c) Bexşende rê û rêbazên cadûkirinê hinî lehengî dike an şiyaneke seyr û ecêb pê dibexşe, şiyana têgihîştina zimanê caneweran û hwd.....	82
<b>3. 15. LEHENG BI CIHÊ KU OBJE LI WÊ DERTÊ YE VE TÊ BIRIN, JI BO WÎ RÊBERÎ TÊ KIRIN AN JÎ TÊ BIRIN.....</b>	<b>83</b>
3. 15. G1. Leheng li ezman difire.....	83
3. 15. G2. Leheng li ser erdê a jî li ser avê rêwîfî dike.....	84
3. 15. G3. Ji leheng re rêbertî tê kirin.....	84
3. 15. G4. Ji leheng re rê tê nîşandan.....	84
3. 15. G5. Leheng navgînên sabît yên veguhastinê bi kar tîne.....	85
3. 15. G6. Leheng şopên xwînê dişopîne.....	86
3. 15. a) Di çîrokên kurdî de ji bilî van, hebên genim û agir û... jî dibine sedema ku lehengê çîrokê ber bi cihê mebestê ve here. Wek nimûne dema ku leheng mijûlî aşpêjiyê ye û agirê wî vedimire, ji dûr ve çîrûskê agirekî dibîne û ber bi wî alîyê ve diçe û hwd.....	87
<b>3. 16. LEHENG Û ÊRÎŞKAR DI ŞEREKÎ DERDIKEVIN HEMBERÎ HEV.....</b>	<b>87</b>
3. 16. H1. Leheng û êrîşkar li meydana şer dikin.....	87
3. 16. H2. Leheng û êrîşkar dikevin pêşbazîyê.....	88
3. 16. H3. Leheng û êrîşkar bi lîstika kaxizan dilîzin.....	88
<b>3. 17. ÊRÎŞKAR TÊK DIÇE.....</b>	<b>88</b>
3. 17. I1. Êrîşkar li meydana şer têk diçe.....	88
3. 17. I2. Êrîşkar di pêşbazîyê de têk diçe.....	89
3. 17. I3. Êrîşkar di lîstika qumarê de têk diçe.....	89
3. 17. I4. Êrîşkar di lîstika xwewezinandinê de têk diçe.....	89
3. 17. I5. Êrîşkar bêyî ku tu pevçûn biqewime tê kuştin.....	89
3. 17. I6. Êrîşkar rasterast tê qewirandin.....	90
<b>3. 18. NÎŞANEKE TAYBET LI LEHENG PEYDA DIBE.....</b>	<b>90</b>
3. 18. J1. Di bedena leheng de nîşanek peyda dibe.....	90
3. 18. J2. Leheng gustîlk an jî desmalek dibîne/bi dest dixê.....	91
3. 18. J3. Curbecur nîşanên dî.....	91
<b>3. 19. XERABÎYA DI DESTPÊKÊ DE TÊ TELAFÎKIRIN AN JÎ KÊMAHÎ TÊ PÊŞWAZÎKIRIN.....</b>	<b>92</b>
3. 19. K1. Objeya ku lê gerîn bi zorê an jî bi hîleyê/qurnazîyê tê revandin.....	92

3. 19. K2. Objeya ku lê gerîn bi xiz ji destê çend kesan derdikeve û dikeve destê çend kesan...	92
3. 19. K3. Objeya ku lê gerîn bi saya cazîbeyê tê bidestxistin.....	93
3. 19. K4. Bidestxistina objeya ku lê gerîn rasterast encameke çalakîyên berê ye.....	93
3. 19. K5. Objeya ku lê gerîn bi navgînîya objeyeke sêhrî hemen tê bidestxistin.....	93
3. 19. K6 Bikaranîna objeya sêhrî feqîrîyê-hejarîyê diqedîne/dawîya feqîrîyê-hejarîyê tîne.....	93
3. 19. K7 Objeya ku lê gerîn di dema nêçîrekê de tê bidestxistin.....	94
3. 19. K8. Kesê ku lê sêhr hatiye kirin vedigere şexsîyeta/nasnameya xwe ya berê.....	95
3. 19. K9. Mirî zîndî dibe.....	96
3. 19. K10. Êsîr/dîl tê xelaskirin.....	96
3. 19. K11. Bidestxistina objeya ku lê tê gerîn bi heman rengê bidestxistina objeya sêhrî ye.....	97
<b>3. 20. LEHENG VEDIGERE.....</b>	<b>97</b>
<b>3. 21. LEHENG TÊ ŞOPANDIN.....</b>	<b>98</b>
3. 21. Pr1. Şopîner li pey leheng difire.....	98
3. 21. Pr2. Şopîner daxwaza sûcdar dike.....	98
3. 21. Pr3. Şopîner dema ku [leheng] dişopîne li dû hev dikeve rengê çend heywan an jî tişteki dî.....	98
3. 21. Pr4. Şopîner dikeve rengê objeyeke bi cezb û dertê rêya leheng.....	99
3. 21. Pr5. Şopîner hewl dide ku leheng perçe bike û bixwe.....	99
3. 21. Pr6. Şopîner hewl dide ku leheng bikuje.....	99
3. 21. Pr7. Şopîner hewl dide, dara ku leheng xwe tê de veşartîye, bi diranên xwe perçe bike/jêbike.....	99
3. 21. a) Di çîrokên kurdî de dibe ku tawankar bi zahir û cilûbergên derwêş an parsekekî li pey leheng bigere.....	100
3. 21. b) Li hin çîrokan jî lehenga keç, bi teşeya mehîn an xezal an dar û hêlanek û êzingê de ji destê tawankar direve û tawankar fermana serjêkirin, birîna darê û şewitandina hêlanekê dide û hewl dide ku lehenga keç ji nav bibe; lê li dawiyê [lehenga keç] dibe weke keçîka bedew a hertim û tawankar û lehengê derewîn bêrûmet dike.....	100
<b>3. 22. BI HAWARA LEHENG DE TÊ ÇÛYÎN.....</b>	<b>102</b>
3. 22. Rs1. Leheng ber bi ezman ve tê birin.....	102
3. 22. Rs2. Leheng astengan dertîne ser rêya şopînerê xwe û direve.....	102
3. 22. Rs3. Leheng dema ku direve xwe dixwe rengê hin objeyên ku wî vedişêre.....	103
3. 22. Rs4. Leheng dema ku direve xwe vedişêre.....	103
3. 22. Rs5. Leheng di kargeha heddadekî de xwe vedişêre.....	103
3. 22. Rs6. Leheng dema ku direve dikeve rengê heywanek, kevîrek û hwd. û xelas dibe.....	103
3. 22. Rs7. Leheng li hember ejderhaya mê ku dikeve curbecur rengan û dixwaze wî bixapîne, li	

ber xwe dide.....	103
3. 22. Rs8. Leheng destûr nade ku bê perçekirin û xwarin.....	103
3. 22. Rs9. Di kêlîya ku dê leheng bê kuştin de, bi hawara wî ve tê gihastin.....	104
3. 22. Rs10. Leheng heldipeke dareke dî.....	104
<b>3. 23. LEHENG XWE VEDIŞÊRE/KÎBÛNA XWE VEDIŞÊRE Û VEDIGERE MALA XWE AN JÎ WELATEK DÎ.....</b>	<b>104</b>
3. 23. O1. Vegera leheng ya mala xwe. Leheng diçe cem zenatkarek û li cem wî dixebite.....	104
3. 23. O2. Leheng diçe cem kralê welatekî bîyan û li cem kral wekî seyîs an jî aşpêj dixebite. Carina jî bi tenê vegera li welat heyê.....	104
3. 23. a) Leheng bi awayekî nenas diçe bajar û welatekî din yan jî vedigere welatê xwe. Lehengê çîroka kurdî bi vê mebestê, gelek caran xwe weke keçekekî bêdesthilat dide naskirin.....	105
<b>3. 24. LEHENGEKÎ SEXTEKAR BI ÎDÎAYÊN BÊ BINGEH DERDIKEVE.....</b>	<b>105</b>
<b>3. 25. KAREKÎ DIJWAR LI LEHENG TÊ PÊŞNÎYAZKIRIN.....</b>	<b>106</b>
3. 25. a) Hilanîna nihênîyekê an anîna çîrok û serpêhatiyekê.....	107
3. 25. b) Bidestxistina dermanekê an tişteki seyr û ecêb.....	108
<b>3. 26. KARÊ DIJWAR TÊ BICIHANÎN.....</b>	<b>109</b>
<b>3. 27. LEHENG TÊ NASKIRIN.....</b>	<b>110</b>
<b>3. 28. KÎBÛNA ÊRÎŞKAR, LEHENGÊ SEXTE AN JÎ YÊ XERAB DERTÊ MEYDANÊ</b>	<b>112</b>
<b>3. 29. LEHENG DIKEVE RENGEKÎ NÛ.....</b>	<b>113</b>
3. 29. T1. Leheng bi tevgereke sêhrî ya alîkarê xwereng/dirûv diguhêre.....	113
3. 29. T2. Leheng koşekeke pir xweşik çêdike.....	113
3. 29. T3. Leheng kincên nû li xwe dike.....	113
3. 29. T4. Hin dirûvên mantiqî û pêkenî.....	114
<b>3. 30. ÊRÎŞKAR AN JÎ LEHENGÊ SEXTEKAR TÊ CEZAKIRIN.....</b>	<b>114</b>
<b>3. 31. LEHENG DIZEWICE Û DERTÊ SER TEXT.....</b>	<b>115</b>
3. 31. W00. Leheng jinê û welat bi hev re bi dest dixê an jî pêşî nivê kraltîyê bi dest dixê û piştî mirina dê û bav hemî kraltîyê bi dest dixê.....	115
3. 31. W0. Carina leheng dizewice lê jina wî prenses nîne, di vê rewşê de nabe kral.....	115
3. 31. W0. Carina jî berevajî vê bi tenê dertê ser text.....	116
3. 31. W1. Eger çîrok di kêlîya berî zewicînê de bi xerabîyeke nû bê birîn, bi nîşanîbûna beşa yekem û sozeke derbarê zewicînê de, bi dawî dibe.....	116
3. 31. W2. Rewşa dijber, jina lehengê zewicandî hunda dibe, di encama lêgerînê de jin tê dîtin û zewac tê nûkirin.....	116
3. 31. W3. Leheng carina li şûna ku bi prensesê re bizewice, bi pere an jî rengêkî dî tê xelatkirin.....	116

ENCAM.....	118
ÇAVKANÎ.....	124
Çavkaniyên nivîskî.....	124
Çavkaniyên devkî.....	125
Çavkaniyên dijîtal.....	125
<b>PÊVEK: ÇÎROKÊN DERASYÎ YÊN EBEXÊ (ÇALDIRANÊ).....</b>	<b>126</b>
<b>1. ÇÎROKA AVCÎ AHME.....</b>	<b>126</b>
<b>2. ÇÎROKA ENAYÎ AHME.....</b>	<b>131</b>
<b>3. ÇÎROKA CIBRÎ.....</b>	<b>146</b>
<b>4. ÇÎROKA CÎHANGÎRÊ DUNYADÎTÎ.....</b>	<b>158</b>
<b>5. ÇÎROKA EYBEZÊ XAZ, KURÊ HIRÇÊ, NEBYÊ PAŞÊ [PAŞAYÊ MISRÊ].....</b>	<b>193</b>
<b>6. ÇÎROKA FATMAYÊ.....</b>	<b>198</b>
<b>7. ÇÎROKA GUL SEYÎDVAN.....</b>	<b>204</b>
<b>8. ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎT, SILTAN ZIBÊDE.....</b>	<b>232</b>
<b>9. ÇÎROKA HEBKAHINARÊ.....</b>	<b>246</b>
<b>10. ÇÎROKA HEMZE PELEVAN.....</b>	<b>251</b>
<b>11. ÇÎROKA HESEN HISEYN.....</b>	<b>263</b>
<b>12. ÇÎROKA HEZAR YEK ŞEVÎ.....</b>	<b>280</b>
<b>13. ÇÎROKA KERR KULIK.....</b>	<b>297</b>
<b>14. ÇÎROKA MEMO ZÎNÊ.....</b>	<b>306</b>
<b>15. ÇÎROKA MERVÊ MERAQDAR.....</b>	<b>313</b>
<b>16. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME [1].....</b>	<b>318</b>
<b>17. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME [2].....</b>	<b>338</b>
<b>18. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME [3].....</b>	<b>366</b>
<b>19. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME, GOZEL DUNYAYÊ.....</b>	<b>376</b>
<b>20. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME, KURÊ ŞAH AHMED.....</b>	<b>400</b>
<b>21. ÇÎROKA NAVÇEKERÊ KURÊ ÎZA.....</b>	<b>419</b>
<b>22. ÇÎROKA PÎRA SÊR.....</b>	<b>449</b>
<b>23. ÇÎROKA ROSTEMÊ ZAL.....</b>	<b>451</b>
<b>24. ÇÎROKA SENEM XANIMÊ.....</b>	<b>458</b>

## PÊŞGOTIN

Wek ku tê zanîn folklor ji cil û bergên milletekî bigire, liv û tevgerên rojane, heta kevneşopiyên bavûkalan û werhasilê kelam hemû kevneşopiyên milletan vedihewîne. Folklor bi qasî ku ez dizanim têgiheke almanî ye û wateya wê jî kêr û zêde wiha ye.

Tewecuha ji folklorê û baldarî û eleqeya ji folklorê bi qasî ku em dizanin di sedsala 18. de li ewropayê û nemaze ji almanyayê derketiye. Gava ku em dêna xwe didinê, di wan tarîxan de eleqeya milletperweriyê jî dest pê kiriye. Yanî di navbera folklor û milletperweriyê de pêwendîyeke xurt hebûye, heye û hêj ew pêwendî berdewam e.

Eleqedariya folklorê ji bo milletên ku ji hişmendiya milletperweriya xwe dereng pêhisîyayî jî gelek xurtir û bileztir e. Wek ku birêz Remezan Alan di kitêba xwe ya *Bendnameyê* de gotî<sup>2</sup> ev derengmayîn, derengmayîna modernîzmê ye. Kurd û milletê kurd jî yek ji wan milletan e ku ji ber gelek sedeman ji modernîzmê dereng maye. Keftûleşt an jî eleqedariya zêde ya li ser folklorê ji bo ew kesên ku li ser folklorê dixebitin sedemek jî bi raya min hişmendiya derengmayîne ye.

Bi taybetî bo min egereke herî muhîm ya xebata li ser folklorê hişmendiya ji *modernîzma derengmayîne* ye. Çunkî gava ku em dêna xwe didinê li ser rûyê dinyayê de gelek milletên xwedî dewlet bi rekûpêk û bi dam û dezgayî karên berhevkirina folklorê kirine lê, milletên wekî kurdan ên bêdewlet ji van derfetan bêpar mane. Ji ber vê bêderfêtbûnê wekî ku kurdologê gewre Celîlê Celîl di mîhrîcana pirtûkan a wanê ya di sala 2013an pêkhatî de gotî; mişk vê gencîneya kurdan ji binî ve dikole dibe û wîndî dibe. Jixê gava ku min dest bi berhevkirina çîrokan dikir ji min re digotin ku li filan gundî filankes heye û çîrokbêjekî zehf baş e lê, dawîya dawî min piştrast dikir ku ew meriv mirîye. Bi mirina wî merivî re ew gencîne jî binax dibû û diçû. Ji egeran yek eger jî ev bû ku min motîve kir û min xebata xwe ya mastirê li ser folklorê, nemaze li ser çîrokan kir.

Çîrok jî beşek ji beşên folklorê bi taybetî beşek ji beşên zargotina kurdan ya herî berbelav û berbiçav e. Di vir de gere em cihêtiya folklor û zargotinê jî bikin. Folklor wek ku me li jorê jî nivîsiye ji cilûbergên milletekî bigire, tevger-xeberdanên rojane û heta hemû kevneşopiyên bavûkalan vedihewîne lê, zargotin wek ku ji navê wê jî diyar e tiştên bi zar û zimanan hatine honandin re tê gotin. Loma zargotin binbeşa folklorê ye û çîrok jî binbeşa zargotinê ye.

Çîrok, çîrokbêjî, çîrokgotin, çîrokguhdarîkirin, bo her kurdekî û bo min jî di dema tinebûna ceyranê da, di wan şevên ber lembeya qazyaxê de, bi taybetî di wan şevên zivistana Ebexê yên sar de tiştêkî efsûnî bû. Bi taybetî bo min di wan şevên dirêj ên sar de, di bin orxana hirî ya germ de,

---

2 ) Remezan ALAN, BENDNAME li ser ruhê edebiyatekê, AVESTA BASIN YAYIN REKLAM TANITIM MÜZİK DAĞITIM LTD. ŞTİ., İstanbul 2009, r. 149

guhdarîkirina çîrokan tesîreke wek sînemaya 3 rehend [üç boyutlu] li min dikir. Di wan şevan de çîrokbêjî û çîrokguhdarîkirin bo min him sînema bû him tîyatro bû û him jî dibistan bû.

Ji ber van egeran min jî xwest ku ez xebata xwe ya mastirê li ser çîrokên zarokatiya xwe bikim. Ji ber wê ez nêzîkî mehekî li gundê Ebexê geriyam û min tam 47 heb çîrok berhev kirin. Di sêrî li gundê Seregolê Jorê ji herdu zavayên xwe, ji Ahmed û ji Harûn û dîsa ji birayên wan, ji ‘Elîyê apê Miho gelek kurteçîrok û çîrok wergirt. Di heman gundî de ji Silêmanê Hecî Heyder du çîrok û bi taybetî ji Salhê Hecî Heyder 4 çîrokên Mîrze Miheme wergirt. Li gundê me li Şefexanê Jorê ji jinapa xwe, ji Suhbetê 4 çîrok wergirt. Li Bayîzdaxa ji Memedê xelkê Hacî Zîyaretê, li Şerefxanê Jêrê ji Ahmedê apê Miheme û ji Hecî Henîfî, li gundê Sarîcê ji apê Kemal, li gundê Xaca ji apê Nûredîn, dîsa li Seregolê Jorê ji Baqîyê Apê Nadir, li Bayîzdaxa ji Mihyedînê Mecîdê Gozê, li gundê Şêx Heyder ji Qiyasedînê Sofî Cemal li ser hev tam 47 çîrok wergirt. Ez li van çîrokbêjên navborî re yeko bi yeko silav, hurmet û spasguzariya xwe pêşkêş dikim. Ji ber ku hinde sal e qet di ti derekî negotine û hinde tesîra tîlevîzyonê wan bûye jî hêjî di hişê wan de ew çîrokên biqîmet mane. Ez cardin ji van çîrokbêjên re deyndarî û spasguzariya xwe dubare dikim.

Piştî ku min ev çîrok berhevkerin nêzîkî salekî ez bi karê deşîfrasyona van çîrokan re mijûl bûm. Bi rastî jî belkî karê herî zor bo min deşîfrasyona van çîrokan bû. Ji ber derengmayîna standardîzasyona kurdî her herêmek, deverek, navçeyek û heta her gundekî Kurdistanê devoka xwe parastîye. Ji ber vê sedemê herêma Ebexê jî taybetmendiya devoka xwe parastîye. Ji bo van sedeman deşîfrasyona devoka Ebexê jî zehf zehmet bû û di deşîfrasyona çîrokan de heta ku ji destê min hat min taybetmendiya devoka Ebexê parast û min di deşîfrasyona çîrokan de ti destêwerdan lê nekir.

Piştî deşîfrasyonê min xwast ku ez li ser motîf û hemanên van çîrokên derasayî yên Ebexê karê xwe yê mastirê berdewam bikim û bi awayekî zanistî û bi hûrgilî li ser van çîrokan bisekinim. Di binbeşên naverokê de ewilî li ser pênaseya folklorê û cureyên folklorê kurdî, di beşa duyem de li ser folklorîstê rûs Vladimir Propp û li ser rêbaza morfolojiyê ya wî û di beşa dawiyê de jî li gorî rêbaza morfolojiyê ya folklorîstê rûsî Vladimir PROPPÎ em ê wan çîrokên derasayî yên Ebexê tehlîl bikin.

Di vê xebata me de gelek kesên ku alîkariya min kirin û ew kesên ku min ji wan sîd wergirtiye divê qet ji bîr nekim û wan bi bîr bînim. Di sêrî de bo rênîşandayîn û şewirmendîtiya wî sipasiya xwe bi mamoste Ömer ÇİFTÇİ dikim. Piştî bo piştgirî û handana wê sipasiya xanima xwe Nazanê dikim. Sipasiya birayê xwe yê piçûk Miraz dikim ku Miraz di berhevkerina çîrokan de wek asîstanan her tim li cem min bû. Sipasiya bavê xwe, Êsibê Nûrmiheme, dikim ku dîtina kesên çîrokbêjan de keda wî zehf zehf zêde bû. Hema bêje nivê wan çîrokbêjan bavê min bi xwe ji min re dîtî.

Mazhar ÇİFTÇİ

Wan-2019



## **KURTEBÊJE**

**H. b.** : Heman berhem

**H. ç.** Heman çîrok

**H. k.** : Heman kovar

**H. t.** : Heman tez

**hwd.** : Her wekî din

**r.** : Rûper an rûpel

**Wer.** : Wergêr

**Weş.** : Weşanger/Weşanxane

## DESTPÊK

Armanca min a di ve xebatê de li gorî rêbaza erk/fonksiyonên folkorîstê rûsî Vladimir PROPP erk/fonksiyonên çîrokên derasayî yên Ebexê tehlîl bikim. Min ji bo vê xebata xwe di nava mehekî de tam 47 çîrok li Ebexê û li gundên Ebexê berhev kir. Di nava wan 47 çîrokan de jî ji bo vê xebata 21 heb çîrokên cadûyî yên Ebexê bi kar anîn. Di nava wan 21 heb çîrokan de 5 heb ji varyantên çîrokên Mîrze Miheme ne. Ji bilî çîrokên Mîrze Miheme çîrokên din ev in; Çîroka Gul Seyîdvan, Çîroka Hesên Hiseyn, Çîroka Fatmayê, Çîroka Kerr Kulik, Çîroka Navçekerê Kurê Îza, Çîroka Memo Zînê, Çîroka Rostemê Zal, Çîroka Hebkahinarê, Çîroka Eybezê Xaz, Çîroka Pîra Sêr, Çîroka Hemze Pelevan, Çîroka Hezar Yek Şevî, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, Çîroka Avcî Ahme, Çîroka Mervê Meraqdar û Çîroka Enayî Ahme ye.

Wekî ku tê zanîn di nava beşên folklorê kurdî belkî jî beşa herî berbelev çîrokên gelêrî yên derasayî ne û jixwe mijara me ya esas jî çîrokên gelêrî yên derasayî ne. Bi vê mebestê min li Ebexê û li çend gundên Ebexê çîrokên derasayî/cadûyî berhev kir.

Jixwe gava ku meriv dêna xwe dide beşên folklorê kurdî<sup>3</sup>, ji serî hetanî binî jiyana rojane ya herêmekî ya civakêkî tê li ber çavan merivan, bi taybetî jiyana rojane ya berê. Ji ber ku hetanî 20-30 sal berê jî jiyana kurdan zêdetir jiyanekê gundewar bû û rêjeya niştecihên kurdan zêdetir li gundan de bûn, jiyana wî çaxî meriv dikare bibêje jiyana sade û folklorîk bû. Wan çaxan di gundan de ceryan jî tine bû, têlevîzyon tine bû û ji ber wê jî agahdariya însanan ji deverên din û ji dinyayê gelek kêmbû an jî tine bû. Derfetên dixtorên modern û derfetên xwendina dibistanên modern an qet tinebû an jî gelek kêmbû. Ji ber van kêmasî û bêderfetbûnan, ku emrê min jî niha 40 sal e û mala me jî di gund da bû, em dikarin bêjin ku hema jiyana gundewariyê wekî van beşên folklorê kurdî jiyanekê efsûnî bû.

Mebesteke min a din a xebata li ser çîrokan jî ew e ku tomarkirina van çîrokan e. Ji ber ku em dizanin êdî çîrokbêj nemane û yên heyî jî gelek çîrok ji bîr kirine. Lê, di zemanê berê di gundan de çîrokbêjên meşhûr hebûne. Wexta ku ez ji bona teza xwe li dû çîrok û çîrokbêjan ketibûm bavê digot ku di zemanê wan de li gundê Seregolê Jorê bi navê Îboyê Necîbê çîrokbêjekî namidar bûye. Bavê min digot ku kê biçûya û guhdariya çîrokên Îboyê Necîbê bikira gere jê ra pakêtek cixare jî bibira û digot ku gava Îboyê Necîbê çîrok digotin hinek caran bi kelecana çîrokê radibû ser pîyan û bi dengê bilind çîrok digotin. Lê niha êdî ew çîrokbêj nemane. Gava ku ez bona teza xwe li dû çîrok û çîrokbêjan ketibûm û min siwal dikir û ji min re digotin ku li filan gundî filankes hebû bi rojan çîrok digotin lê, par an jî pêrar çû rehma xwedê. Sed car heyf, ji wan çîrok û çîrokbêjên berê

---

3 ) Prof. Dr. Kadrî YILDIRIM, Ramazan PERTEV-Mustafa ASLAN, JI DESTPÊKÊ HETA NIHA FOLKLORÊ KURDÎ, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul 2013, r. 143-144

zehf kê m çîrokbêj mane. Gava ku çîrokbêjek diçe rehma xwedê wan çîrokan bi xwe re dibe gora tarî.

Li her gundekî de çîrokbêjên wisa namidar hebûne. Di gundê me de jî gava em zarok bûn ‘Ayşoya qîzapa min di wan şevên dirêj ên zivistanê de ji me re çîrok digotin. Mesela ji wan çîrokan *Çîroka Jinbavê*’ hejî di bîra min de ye. Motîfên vê çîrokê, kiryarên jinbavê yên xirab, halê êtîmbûnê û xapandin bû. Lê di bingeha xwe de hêmana sereke xapandin bû, ji ber ku êtîm hema wisa birçî ye û jinbav jî her carê wî dixapîne heta ku êtîm dimire. Gotina ku her carê ji aliyê êtîm ve dihate dubarekirin *hey jinbavê jina bavê ez birçî me ber dolabê* bû. Piştî ew çîrokên ku me di zarokatiya xwe de guhdariya wan dikirin ya ku di hişê min de mayî yek ji wan jî çîrokên Mîrze Miheme bûn û di wan çîrokan de motîfên serekê; pîra sêhr, dêw, dêwê heftserî, zîha, xapandin û hwd. bûn. Ji ber wê, mebesteke min a din jî motîfên van çîrokan tesbît bikim.

Gava ku behsa motîf an erk/fonksiyonên çîrokan tê kirin, di nava çend heb folklorîstên binavûdeng de yek jî folklorîstê rûsî Vladimir PROPP e. Ji ber hindê me jî xwest ku di tesbîtkirina van çîrokên derasayî yên Ebexê dê rêbaza erk/fonksiyonên folklorîstê rûsî Vladimir PROPP bi kar bînim.

Divê di destpêkê de em hinekî folklorîstê rûsî Vladimir PROPP bidine nasîn. Li gorî Bünyamin Demir, Vladimir Yakovlevîc Propp (1895-1970), St. Petersburgê ji dayîk buye. Li beşa Fîlolojiya Elmanî û Rusî Zanîngeha St. Petersburgê xwendiyê û mamostetiya wan zimanan kiriye. Di sala 1932yan de derbasî Zanîngeha Lenîngrade bûye û wî serokatiya beşa folklorê kiriye. “Rêbaza “Tehlîla Binyadgerî ya Çîrokan” a Propp di warê tehlîla çîrokan de gelek navdar e. Ev rêbaz wek “Rêbaza Morfolojîk” jî te binavkirin. Propp lêkolînên xwe yên li ser çîrokan bi navê *Morfolojiya Skazkî* [Teşezanista (Morfolojiya) Çîroke] di sala 1928an de li Lenîngradê wekî pirtûk çap kiriye. Ev xebat hem xebatek teşeyî hem jî razberî ye” (Pertev, 2013-2014: 1).<sup>4</sup>

Pekî di warê tesbîtkirina çîrokên derasayî yên Ebexê de em çima rêbaza morfolojiyê ya folklorîstê rûsî Vladimir PROPP bi kar tînin? Ciyawaziya rêbaza morfolojiyê ya folklorîstê rûsî Vladimir PROPP çi ye? Em li dû van pirsan ketin û bi saya Bünyamin DEMİR em têgihîştin ku ciyawazî û taybetmendiya rêbaza morfolojiyê ya folklorîstê rûsî Vladimir PROPP ev e ku, Propp di destpêka xebata xwe de kêmasiyên polînkirina çîrokan a li gorî motîf û tîpan dide nîşandan. Ji ber ku gelek varyant u versiyonên çîrokan hene, mirov ne bi motîfan ne jî tîpan tesnîfeke serkeftî ya çîrokan nikare pek bîne û divê xebateke nû derbarê tesnîfê de were kirin. Piştî van nêrînên xwe Propp dest bi xebata xwe dike bo ku cihê wan tesnîfên din bigire. “Demekê motîf, tema û babet hebû. Paşî Vladimir Propp hat û her tişt guherand” (Bremond, Landy û Pavel 1995: 21). Yanî em

---

4 ) Bünyamin DEMİR, ÇÎROKÊN KURDÎ LI GORÎ MOTÎF ÎNDEKSA STITH THOMPSON (BI NIMÛNEYÊN ÇÎROKÊN MÎRZE MIHEMED), Teza Mastirê, Mêrdîn 2016, r. 17

dikarin bibêjin Propp di polînkirina çîrokan de şoreşek pek aniye. Wî hemû şaşiyên xebatên beriya xwe rexne kirine, kêmasiyen wan derxistine hole û beyî ku van kêmasî û şaşiyên dubare bike rêbaza xwe ya binyadî ava kiriye. Propp di çîrokê de li hêmanên ku nayên guherîn digere û li ser kirinên kesan disekine. Li gorî wî her çiqas kes werin guherin jî tevger nayên guherîn. Ji ber vê jî dabeşkirineke zanistî ya çîrokên derasayî li gorî tevgerên karakteran dikare were çêkirin. Di çîrokan de çiqas mijar û karakter werin guherîn jî fonksiyonên wan naguherin û mirov li gorî van fonksiyonan dikare vekolînan li ser çîrokan bike.<sup>5</sup>

Bi kurtayî em ê di beşa ewil de li ser pênaseya folklorê, çîrokên gelêrî û li ser cureyên folklorê kurdî rawestin. Di beşa duyem a di vê xebata xwe de em ê li ser motîf, hêman an jî erkên çîrokan rawestin. Di beşa dawîn de jî li ser rêbaza morfolojiyê ya folklorîstê rûsî Vladimir PROPP û li gorî vê rêbazê jî çîrokên derasayî/cadûyî yên Ebexê em ê tehlîl bikin. Wek tê zanîn rêbaza morfolojiyê ya [teşenasî, dariştenasî, dêsman] folklorîstê rûsî Vladimir PPOPP ji 31 erkan [fonksiyon, rol, tevger] pêk tê û em ê li gorî van 31 erkan çîrokên derasayî/cadûyî yên Ebexê tehlîl bikin. Jixwe ew 31 erk/fonksiyon/rol/tevgerên ku Propp ji 100 çîrokên rûsî yên derasayî tesbît kiriye di beşa duyem a ve tezê de bi berfirehî hatiye ravekirin. Loma em 31 erk/fonksiyonan di vir de rave nakin.

Piştî beşa encamê jî em ê wekî pêvek ew çîrokên derasayî yên ku me li Ebexê berhevkirî di dawiyê de pê ve bikin.

---

5 ) Bünyamin DEMİR, ÇÎROKÊN KURDÎ LI GORÎ MOTÎF ÎNDEKSA STITH THOMPSON (BI NIMÛNEYÊN ÇÎROKÊN MÎRZE MIHEMED), Teza Mastirê, Mêrdîn 2016, r. 17-18

# BEŞA YEKEM

## 1. 1. FOLKLOR

### 1. 1. 2. BI AWAYEKÎ GIŞTÎ FOLKLOR

Wekî ku birêz Remezan Alan gotî folklor; Zanista gel, hikmeta awam, xelqiyat, folklor an zargotin... Ev peyvên han, di destpêkê de parçe parçe ji bo çanda gel, ayînên mîtolojîk, adetên parastî, jiyana “wehşiyên esil”, muzik û reqsên gelêrî, biwêj, destan, efsane, û çîrokan dihatin bikaranîn<sup>6</sup>.

Wekî ku li jor jî hatiye pênasekirin gava ku em dêna xwe dinê, folklor ji jiyana rojane ya herî asan ya milletekî bigire heta ew adetên ku bi hezaran salane ji bavûkalan hatine wergirtin û hêjî bi awayekî têne bikaranîn re folklor tê gotin. Mesela awayên cilûbergên ku hatine lixwekirin, cureyên cilûbergan, adetên rojanê yên xwarin û vexwarinê yên rabûn û rûniştinê yên hatin çûyînê, adetên berdewamî yên şîn û şahîyan yên zewicandin û mêrkirina kêç û xortan yên mazûvankirin û pêşwazîkirina mêvanan, adetên mezinkirin û perwerdekirina zarokan, rê û rêbazên ku bo berdewamkirina jiyana rojanê tên bikaranîn, nifir, dia, gotinên bavûkalan, çîrok û hwd. em dikarin bêjin ku ev tiştanan hemû û hêj bi hezaran tiştên din di bin sîwana folklorê de ye.

Ji ber wê jî di esasê xwe de û di heman demê de folklor ciyawaziya milletan û herêman nîşan dide. Hinek caran em dêna xwe dinê, tiştêkî ku li cihekî li deverekî li herêmekî an jî di nava milletekî de wek liv û tevgerên rojane têne bikaranîn lê, heman tişt li herêmeke din an jî di nava milletekî din wek eybeke giran tê pênasekirin. Ji ber wê jî her milletek an her herêmek taybetmendiya xwe heye û wê taybetmediyê bi ciyawaziyê jiyana xwe ya rojane berdewam dike. Ev taybetmendî û ciyawaziya herêm û milletan bi raya min qurmên folklorê ne.

Wek ku dixuyê pêkhatiyên folklorê gelek in û folklor ji gelek şaxan pêk hatiye. Jiber wê hin caran li ser tayînkirina sînorên folklorê gelek gengeşî û sergêjî çêbûne û çêdibin jî. Wek ku li jorê birêz Remezan ALAN gotî ji bo pênasekirina folklorê gelek pênase hatin çêkirin. Mesela hin kes folklorê wek zanista gel, hin kes wek hikmeta awam, hin kes wek xelqiyat, kin kes jî wek zargotin pênase dikin.

---

6 ) Remezan Alan, Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyî ‘Roman û Folklor’, Weş. Peywend, Stenbol 2013, r. 27

### 1. 1. 3. SEDEMÊN MEYL Û ELEQEDARIYA LI SER FOLKLORÊ

Li gor Remezan Alan meyl û eleqedariya li ser folklorê de hewl û tesîra romantîkên elman û bi taybetî jî tesîra Herder berbiçav e. Ev demeke dirêj e ku eleqeya navbera folklor û netewetiyê baş tê nasîn. Û di çêbûna vê eleqeyê de jî keda romantîkên elman, xweş tê teslîmkirin. Hema bêje tu kes tune ku dema navbera çanda gelêrî û fikra millet de pêwendiyekê dayne, xwe negihîne romantîkên elman û xasma jî Herder<sup>7</sup>.

Wek ku li jor jî xuyaye eleqedariya li ser folklorê bi baldariya romantîkên elmanan ve gurr û geş dibe. Eleqedariya van romantîkên elmanan jî bi lidûketina şopên kevneşopiyên xas ên neteweke millî bûye. Wekî ku Remezan Alan gotî, ji ber ku vegotina neteweya romantîk, weke “çanda millî” ji folklorê behs dike<sup>8</sup>. Yanî wer dixuyê ku eleqedarî û meraqdariya xebatên ku li ser folklorê hatine kirin bi mebesta lêkolîn û lêgerîna kokên neteweyekî yên xas, neteweyeke ku ji ber taybetmediyên kevneşopên xwe ên millî ji yên din tê cudakirin heye. Xebatên li ser folklorê bi van hestên romantîk ên millî dest pê kiriye û hêj berdewam e.

Xebatên li ser folklorê her çiqas bi van hestên romantîk hatibine destpêkirin jî ji ber sedemên curbecur ev xebat hatine kirin û hêj tên kirin. Bi raya min sedemeke din jî bertekên psikolojîk û civakî ne. Ew bertek jî ji ber egerên wek asimilasyon, bêderfêtbûn û neemilandinê parastina folklorê xwe ye. Ev bertekên xwezayî bi taybetî di nav milletên ji aliyê netewebûn û dewletbûnê de derengmayî de zêdetir derdikevine pêş.

Bi raya min jî xebatên li ser folklorê ji ber van sedeman dest pê kiriye û bi van bertekan berdewam dike. Lê ji bo milletên ku di warê netewbûn û dewletbûnê de derengmayî de sedema herî girîng ji ber tirsê jîholêrabûn û jî windabûnê, parastin û xweparastina folklorê xwe ye.

Mesela ji bo kurdên bakûr her çiqas asimilasyona sistematîk hinekî sist bûbe, dîsa jî ev asimilasyon dibe ku hê ji berê bileztir û bi awayekî otoasimilasyonî fonksiyona xwe berdewam dike. Wekî ku tê zanîn dewletê hê di serî de bi planên wek plana islehetî şerqê dest bi asimilekirineke sistematîk a kurdan kiriye. Lê ji ber ku hetanî 20-30 sal berê jî piraniya kurdan di gundan de niştecih bûn û bi awayekî xwezayî folklorê xwe diparastin û ji asimilasyonê dûr diketin lê, ev çend sal e zêdetirê kurdan edî li bajaran de dijîn. Di zemanê berê belkî di malekî derfeta xwendina zarokê yan jî du zarokan hebû lê, aniha di maelkî de hema hemû zarok di dibistanan de dixwînin. Zimanê perwerdehiyê ji serî hetanî binî hemû bi zimanê tirkî ye. Dîsa 20-30 sal berê di gundan de ceryan tine bû û ji ber wê jî di malan de têlevîzyon jî tinebûn lê, aniha di her malekê de li şûna têlevîzyonekî du-sê têlevîzyon hene û di têlevîzyonan de her çiqas qanalên kurdî hebin jî serdestiya qanalên bi zimanê tirkî zêdetir e. Dîsa di bajaran de zimanê ticaretê jî bi zimanê tirkî ye.

7 ) Remezan Alan, h.b., r. 30

8 ) Remezan Alan, h.b., r. 31

Ji ber van sedeman edî niha hewceyîya asîmîlasyonê sîsematîkî tune ye, ji ber ku êdî otoasîmîlasyon dest pê kiriye. Werhasilê kelam zemanê berê qet nebe di malan de serdestiya zimanê kurdî hebû lê, aniha ew serdestî jî ji dest çûye û diçe. Zimanê kurdî ji ber van dezavantajan di ber sekeratê ye.

Lê baş tê zanîn ziman ne têne ziman e. Ziman her çiqas amûra ragihandin û jihevtegihiştinê be jî di esasê xwe de ziman ruhê kulturekî û ruhê milletekî ye. Gava ku ji ber asîmîlasyon, otoasîmîlasyon, bêderfêtbûn û neemilandinê zimanek hêdî hêdî ji holê rabe û winda be di esasê xwe de ruhê kulturekî û ruhê milletekî tune dibe, pêkhatayên folklorîk tune dibe.

Gava ku me behsa sedema xebatên folklorîk kirin ji wan sedeman yek jî berteka psîkolojîk û civakî bû. Ev bertek armanc dike ku ji ber jiholêrabûn û windabûna pêkhatayên folklorê, tomarkirin, mihafizekirin û parastina folklorê ye. Qet nebe mebesta min a li ser ve xebatê hinek jî ev e. Dixwazim him van çîrokên jiholêrabûnê tomar bikim û him jî bi awayekî zanistî li ser van çîrokên xebateke mastirê bikim.

## **1. 2. BEŞÊN FOLKLORA KURDÎ**

Helbet wekî ku li ser pênase û sînorên folklorê gengeşî hene her wisa li ser beşên folklorê jî gelek mineqeşe hene ji ber ku çarçoveya folklorê gelek firehtir e. Li gor kitêba 'Ji Destpêkê Heta Niha FOLKLORA KURDÎ' ya ku ji aliyê Prof. Dr. Kadri YILDIRIM, Remezan PERTEV-Mustafa ASLAN ve hatiye amadekirin de beşên folklorê kurdî di bin 4 sernavanan wek de hatiye dabeşkirin. Li gor kitêba navborî dabeşkirin wiha ye:

### 10. 1. Edebiyata Gelêrî

1. Destan
2. Menqibeyên dînî û tesawîfî
3. Dengbêjî
4. Çîrokên Gelerî
5. Çîrçîrok/Xeberoşk
6. Pêkenokên Gelerî
7. Gotinên pêşîyan û biwêj
8. Kilam û stranên Gelêrî
9. Qewlerk/Dûrik
10. Mamik/Tiştanok
11. Zûgotinok/Çîvanok
12. Lawik/Zêmar
13. Lorîk
14. Stranên Zarokan
15. Keresteyên ziman (argo/zimanê qetenîyan an zimanê girdegewran û wd.)

16. Nifir, niyaz, dia û wd.
17. Lîstikên temaşeyî yên gelêrî
18. Lîstikên şahî û werzişê
19. Şanoya Gelêrî
20. Lîstikên zarokan

#### 10. 2. Adet û Tore

1. Adet û rêwresmên karkirinê
2. Rojên taybet (Cejn, rêwresm û pîrozbahî)
3. Rêwresmên saziyên civakî yên berê
4. Jidayîkbûn
5. Navlêkirin
6. Navên Kurdî
7. Zewac û Dawet
8. Sinetkrin
9. Mirîveşartin, Şîn/Taziye
10. Rabûn û rûniştina kudewarî (Pêşwazîkirin, birêkirin)
11. Têkiliyên malbatî, merivantî û cîrantiyê

#### 10. 3 Bîr û Baweriyên Gelêrî

1. Baweriyên der bareyê sirûştê da (ba, baran, brûsk, erdhej û wd.)
2. Baweriyên der bareyê ajal û rihekan de
3. Baweriyên der bareyê laşê mirovan de
4. Baweriyên der bareyê hêzên awarte ( Xwedê, cin, pîrhevok, şeytan û wd.)
5. Baweriyên der bareyê kesên nazkirî (Xoce Xizir, Duzgin Baba û wd.)
6. Kiramet, tirbe, û cihên ziyaretê

#### 10. 4. Zanyariyên Gelêrî

1. Nexweşî û bijîjkiya gelêrî
2. Beytariya Gelêrî
3. Zanyariya dar û giyayên şifabexş
4. Stêrnasiya gelêrî
5. Meteorolojiya gelêrî
6. Zanyariya erdnigariyê
7. Fehl, sêhr, şîroveyên xewnan
8. Baweriya der bareyê pêkhatina ajal, rihek û maddeyên sirûştê de
9. Xwarin û Vexwarin<sup>9</sup>

9 ) Prof. Dr. Kadrî YILDIRIM-Ramazan PERTEV-Mustafa ASLAN, JI DESTPÊKÊ HETA



### 1. 3. ÇÎROK AN ÇÎROKÊN GELÊRÎ

Çîrok weke janrekek girîng a edebiyata devkî, neynikeke hêviyê, nêrin, zanyarî, û cîhanbîniya pêşîyan û ronîkera gelek xalên tarî yê jiyana mirov e. Çîrok, berevajiya edebiyata nivîskî ku zêdetir li ser jiyana çîna desthilatdar e, çîrok û destan çavkaniyên pêbawer ji bo nasîna dîroka rasterast a mirov, jiyana û serhatiyên xelkê asayî û çîna bindest e.<sup>10</sup>

Wekî ku Mezher Ibrahîmî behs kiriye çîrok cureyekî ji edebiyata devkî ye û di esase xwe de nêrin, hêvî, daxwaz û hwd. yê xelkên asayî û bindest dihewîne. Ji ber wê ye ku em bêjîn piranî di çîrokan de her çiqas ku neheqî, bêdaletî, zordariya derasayî û hwd. hebe jî meriv her tim di çîrokan de bendewarî û heviya xelaskerekî asayî ye ku derkeve her kesekî ji wan bêdaletiyên rizgar bike û jixwe piranî jî wisa dibe. Ji ber wê ye ku meriv heqîqeten di çîrokan de hevî, daxwaz û gelek xalên tarî yê jiyana xelkê asayî û bindest dibîne.

Ev taybetmendiya çîrokan li gorî Mezher Ibrahîmî zêdetir di çîrokên cadûyî an jî çîrokên efsanewî de hene û dibêje ku çîrokên cadûyî nûnera hêvî û mirazên mirov û meydana têkoşîna wan bo gihîştina bi hêviyan e<sup>11</sup>.

Ya rastî ew çîrokên ku min li Ebexê berhev kirin kêm zêde di wan çîrokan de û axlebe jî di çîrokên Mîrze Miheme û yê mîna van çîrokan bi xapandinan, bi dek û dolaban gelek neheqî û zordarî dibin. Gelek caran ew zilm û zordarî bi sêhrê, bi tiştên derasayî rûdidin lê, her tim bêhna hevî û rizgariyan jî ji wan çîrokan difûre û dawîya dawî rizgarker derdikeve tê meydanê û wan hêvî û daxwazan pêk tîne.

Loma jî nasîna van çîrokan ji bilî ku têgihîştina me ji edebiyata devkî kûrtir dike herwisa dikare gelek ji rastiyên veşartî yê jiyana bav û kalên me jî ronî bike û zanyariyên me li ser pêvajoya kemilîn û pêşveçûna civak û çanda mirov zêdetir bike<sup>12</sup>.

Lê bi raya min pênaseya çîrokê ya ku herî sade û kurt Yahya Yavuz kiriye. Li gorî Yahya Yavuz jî çîrok ew vegotinên gelêrî ne ku afrînerê wan ê ewil nayê zanîn û piranî di şevên zivistanan de ji bo mijûlbûn û demderbaskirinê ji hêla kesên di vî warî de pispor in tîne vegotin<sup>13</sup>.

Wekî cureyek e edebiyata devkî her çiqas li ser pênaseya çîrokan lihevkrinek tine be her wisa li ser navên çîrokan jî lihevkrinek tine ye û li gorî herêman navên çîrokan jî tîne guhertin. Dîsa li gorî Yahya Yavuz di Kurdî de ji bilî bêjeya çîrokê gelek navên din ji bo vî cureya folklorê tê bikaranîn.

---

NIHA FOLKLORA KURDÎ, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul 2013, r. 143-144

10 ) Mezher İBRAHİMÎ, Zarema 6, Dariştênasiya (Morfolojiya) Çîrokên Cadûyî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2016, r. 135

11 ) Mezher İbrahîmî, h.k., r. 136

12 ) Mezher İbrahîmî, h.k., r. 136

13 ) Yahya YAVUZ, Zarema, Berawirkirina Du Çîrokên Kurdî û Frensî: “Sedo” û “Pisîka bi Gîzme”, Berdan Matbacılık, İstanbul 2018, r. 120

Hin ji wan navên ku ji bo çîrokê tên bikaranîn evin: serhatî, çîrçîrok, çîrvanok, çîçîrok, xebroşk, hikyat, estanîk (Zazakî), merselok, serpêhatî û hwd<sup>14</sup>.

Ji ber ku xebata me li ser çîrokên derasayî yê Ebexê ne divê em pênaseya Propp a ji bo çîroka derasa jî bikin. Li gor Bedran Hikmet, Propp ji bo *çîroka derasa/fairytales* pênaseyeke wiha kiriye: “*Çîroka ku bi xerabî an jî kêmahîyekê* dest pê dike, di fonksiyonên navbeynkar de derbas dibe û bi zewac an jî bi vekirina girêkê bi encam dibe. Çîrokên wiha ji aliyê dirûvên xwe ve çîrokên derasa ne (Vladimir Propp, Masalın Biçimbilimi, r.,93)<sup>15</sup>

Gelek taybetmendî û motîf an jî hêmanên çîrokan hene û jixwe xebata min jî li gorî îndeksa Vladimir Propp motîfên sereke yê çîrokên Ebexê ne. Li gor Yahya Yavuz di çîrokan de kes û bûyerên derasa zehf in, ev taybetmendîya herî girîng a çîrokan e. Taybetmedîyeke din a çîrokan jî, guhdar berevajî efsane û menaqibên li ser şêx û ewlîyayan tên vegotin ji tiştên di çîrokan de derbas dibin bawer nakin. Guhdarên çîrokê dema çîrok tê vegotin dizanin ku tiştên di çîrokê tên behskirin ne rastin<sup>16</sup>.

Di çîrokan de hin gotinên qalib hene, ji vana re formel tê gotin. Formel bi piranî di destpêk û dawîya çîrokan de ne û hinekî dişibin zûgotinokan. Hin formel pexşan in hi ji wan jî wek helbestan bi rêzikan in<sup>17</sup>. Di wan çîrokên ku min li Ebexê berhevkirî qalibgotinên di destpêka çîrokan te dihatine gotin wekî di çîroka navborî de jî hatiye gotin wiha bû; *carek ji caran rehme li dêbavê hazira*<sup>18</sup>. Hemû qalibgotinê kêm zêde bi vî şeklî bûn û tenê qalibgotineke ku ji yê din cuda hebû û di vê çîroka navborî de jî wiha bû; “*Çaxê ku bi dest tişteki jî dikin, di çîroka da me ji mezina iha bihîstîye, dibê:*

“*Careki cara rehme li dêbavê hazira. Dibê çil kûsî çûne bin dareki, dar weldigerya, mişk mehr tev gerya. Eva xebera di serê çîroka da tê gotin*”<sup>19</sup>.

Di berdewamiya çîrokan de jî zêdetir wiha digotin ku, “*De îja dibê çîrok e, wî çaxî bi sal zemana bûye, niha bi zar zimana tê gotin*”<sup>20</sup>.

Di dawîya çîrokan de jî piranî wiha digotin ku, “*Her kes çû mirazê xwe şa bû. Hûn jî mirazê xwe*

---

14 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 120

15 ) Bedran Hikmet, Teorîyên Folklorê, A GRAFİK TASARIM TANITIM PROMOSYON WEB HİZMETLERİ, Diyarbakır 2016, r. 73

16 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 120

17 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 120

18 ) Baqîyê Apê Nadir, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 25 Îlon 2016, Çîroka Cibrî r. 1

19 ) Mihyedînê Mecîdê Gozê, Ebexe-Wan 1950, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Cîhangîrê Dunyadîtî, r. 1

20 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 11

şa bin”<sup>21</sup>. An jî digotin ku, “*Dibê sê sêv hatin cinnetê. Dudu para cima’etê, yek jî para mi*”<sup>22</sup>

Taybetmendiyeke e çîrokan a din jî li gorî Yahya Yavuz, di çîrokan de dem û cî nedîyar in<sup>23</sup>. Mesela di çîrokên ku min li Ebexê berhevkirî de cihên wek, “*Em ê biherin piştta wan çîya da bihêlin, lêxin werin*”<sup>24</sup> hene lê, ew çîya çîyayekî nedîyar e. An jî cihên wekî, “*Koşka wê, ‘imbaretê wê, ada heft behra daynîn*”<sup>25</sup> hene lê, “*ada heft behra*” cihên nedîyar in.

Her çiqas Yahya Yavuz dibêje ku çîrokbêjên serkeftî pirê caran jin in<sup>26</sup>, lê min ji 12 çîrokbêjan çîrok wergirtin û di nava wan çîrokbêjan de yek jin tenê hebû yê din hemû mêr bûn. Lê ev nayê wê maneyê ku em bêjin çîrokbêjên jin kêr in. Helbet di zarokatiya me de jinan û xusûsî jinên pîr zarok li dora xwe dicivandin û ji wan re çîrok digotin.

Wekî ku Yahya Yavuz jî dibêje çîrok piranî bi şev di odeyan de tê gotin. Di derbarê vê yekê de folklornasê mezin ê Kurdî Hecîyê Cindî dibêje li gorî Kurda vegotina çîrokan bi roj wek tiştêkî nebaş dihate dîtin. Kurda wisa bawer dikirin, heger çîrok bi roj werin vegotin wê arvanên li malên li malên wan kêr bibê. Sedem jî dibêje, ger çîrok bi roj bihatana gotin wê ev yek bibûna asteng ji xebatê re loma çîrok bi şev tê gotin (Cindî 1961:6)<sup>27</sup> Gava ku min jî ji çîrokbêjên Ebexê çîrok berhev dikirin çîrokbêjan çîrokên xwe exlebe bi şev vedigotin lê, rojekî di nava rojê em çûne mala Memedê Xelkê Hacî Zîyaretê û ji me ra dest bi çîrokên xwe kir. Lê di Çîroka Senem Xanimê de di nîveka çîroka nişkava sekinî û got: [*Çîrokbêj Memedê Xelkê Hacî Zîyaretê*]:

“*Îja arê me yê ret be ha! Binêre nava rojê ye ha! Isa dibêjin.*”

[*Berhevkar Mezherê Kalê*]:

“*Îja evê seva çi dibêjin?*”

[*Çîrokbêj Memedê Xelkê Hacî Zîyaretê*]:

“*Eva jî ewka berê ye. Dibên, gere çîrok di êvarê da werne gotin. Nava rojê ar ret dibe*”<sup>28</sup>.

21 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 22

22 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Cotmeh 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 37

23 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 120

24 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Cotmeh 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 7

25 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn r. 13

26 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 120

27 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 121

28 ) Memedê Xelkê Hacî Zîyaretê, Hacî Zîyaret-Ebexe-Wan 1963, Dema çîrokwergirtinê: 09 Cotmeh 2016, Çîroka Senem Xanimê, r. 11

## BEŞA DUYEM

### 2. VLADIMIR PROPP Û RÊBAZÎ WÎ YA MORFOJIYA ÇÎROKÊN DERASAYÎ

#### 2. 1. VLADIMIR PROPP (1895-1970)

Vladimir Yakovleviç Propp, ji binemaleyê Almanî ye, 17ê (29) Nîsana sala 1895an li St. Petersburgê bûye. Xortanîya xwe di navbera salên 1913-18, di vê hêwirzeya Rûsyayê de, di Zanîngeha St Petersburgê de derbas kir; li wir zimannasiya Rûs û Almanî xwend. Ewîlî di dibistaneke navendî de wek mamosteyekî van herdu zimanan dest bi karê xwe kir. Paşê di kolêjekî de bû mamosteyê zimanê Almanî. Di nava kulliyata Propp de sê heb kitêbên wî yên bi navê “Destpêka Almanîyê bo Xwendevanên Rûsî” û gotareke wî ya li ser rêzimana Almanî ji van salan de maye. Di sala 1932an de derbasî fakûlteya Zanîngeha Lenîngradê bû û hetanî mirinê li wir ma. Li vir di salên ewilîn de dersên zîmanî da, lê piştî 1938an giranîya xwe da li ser xebatên folklorê û êdî careke din xebatên li ser zimannasî û pedagojiya zimanî nekir. Wezîfeya serperîştîya beşa folklorê, heta ku ev beş bi beşa edebîyata rûsî re bû yek, wî bi rê ve bir; di heman demê de bi Akademiya Zanistî ya SSCB rê têkilîyeke wî ya qayîm hebû.<sup>29</sup>

Berhema wî ya ewilîn ya ku hatiye çapkirin, ku ev berhem dê di pêşerojê de di dinyayê de dengvedaneke bêhempa bi Propp re bibexşîne û niha jî berhema wî ya herî naskirî ye, *Morphology of Folktale* (Morfolojiya Çîrokan), ji sala 1928an e. Di serî de navê kitêbê ya ku em îro dizanin hinekî jê cuda ye; Propp paşê, “*min navê Morphology of Wondertale (Morfolojiya Çîrokên Derasayî) li kitêbê kiribû, lê ji ber ku bêtir balê bikişîne ser kitêbê, weşanger peyva wondertaleyê (çîroka derasayî) bi folktaleyê (çîroka gelî) ve guherand û bi vî awayî her kesî hew dizani bû ku kitab qanûnên giştî yên çîrokên gelî diduhurîne. Lê mebesta min, ne ku analîzkirina hemû cureyên çîrokên gelî ligel hemû ew cihêrengî û aloziya wan bû; min tenê cureyekî çîrokan, çîrokên derasayî yên ku cudatîyeke berbiçav radixîne ber çavan analîz kiribû*” dê wiha binivîse. Ev berhem ewilî ne li SSCBê de ne jî derveyî welat de ti dengvedanekê wê tunebû. Rexnegirekî rûsî, hêj di sala 1929an de di nivîsa xwe ya danasînê de “*Gumana min heye ku dê pêşerojeke birîqedar a rêbaza Propp hebe*” bi vê pêşbînîyê diqedîne, lê ev pêşeroj gelekî, qedera sî salî, dûr e û ev sî sal dê bêteşqele derbas nebe. Di sala 1958an de wergerandina berhemê bo îngîlîzîyê û ji wê jî girîngtir, nivîsa danasîn/rexneyî ya bi sernavê “*Binyat û Şikil, Ray û Ramanên Li Ser Berhemeke Vladimir Propp*” ya di sala 1960an nivîsandî ya Claude Levi-Straus ku danerê antopolîjiya binyatger û zanyarê binavûdeng ê Fransî ye, wexta ku ev nivîs dengvedanekî bo kitêbê û helbet bo Propp di seranserê dunyayê de derdixîne, Propp êdî heftê salî ye; deh salên xwe yê dawî dijî. Ew tesîra ku Levi-Straus

29 ) Vladimir PROPP, FOLKLOR TEORÎ VE TARİH, AVESTA BASIN YAYIN, İstanbul 1998, r. 7

li Ewropayê û li Fransayê kiribû, di Dinyaya Teze [Emerîkayê] de jî duayenekî folklornasiyê yê Emerîkayî Alan Dundes bi gotara xwe ya ku di sala 1962an de bo kovara *Journal of American Folklore* hinartî û bi kitêba xwe ya bi navê *Morfolojiya Çîrokên Çermsoran ên Bakûrê Emerîkayê* ya ku di sala 1964an de çapbûyî dê ew cure bandorê bike; û di dawiyê de bi hostatiya analîzkirina binyatgeriyê ya Proppî ligel zanîna wî ya kûr ya folklora rûsî dê bala herdu aliyên Anlantîkê bikişîne ser xwe, bi taybetî piştî sala 1970ê şûn de navê Proppî dê bibe klasîk. Îro jî meriv tenê wan berhemên ku ji çîrokên milletan ên cihêreng pêktên ên ku bi amajeyî [referans] bi rêbaza Propp hatine analîzkirin bide ser hevûdu bile naveroka kitêbekî tijî dike; karê lîstekirina wan berhemên ku behsa Morfolojiyê dikin jî êdî bûye karekî ku meriv bi hêsanî nikare jê xilas bibe.<sup>30</sup>

Propp, di seranserî heyata xwe de li dû tiştên nehugerbar a di folklorê de ketibû (*Morfolojî, Kokên Tarîxî, Şahiyên Gund ên Rusî* di vê lidûketinê de berhemên herî hêja ne) û di axiriyê de têgihîşt ku kifşkirina tiştêkî neguherbar her wext nayê maneya kifşkirina heqîqetêkî. Lewra li gorî Propp folklor dîsîplîneke îdeolojîk e û fikir-ramanên giştî yê heyamekî dide der, ku gava ew fikir-raman diguhurin amajeyên bi naveroka folklorê tê kirin jî diguhurin.<sup>31</sup>

## 2. 2. MOTÎF Û LI GORÎ VLADIMIR PROPP MOTÎF

### 2. 2. 1. MOTÎF

Di edebiyata gelêrî ya devkî de motîf an jî hêman babetek e sereke ye. Ji ber wê me jî çend pênasayên lêkolîneran ên ku derbarê motîfan de xebatên hêja kirine raxist ber çavan. Li gorî Stith Thompsonê ku bi salan li ser çîrokan û tesnîfkirina motîfên wan xebitîye û encama wê di xebateke ku ji şeş cildan pêk hatîye bi *Motîf Index of Folk-Literature* de daye weşandin, di derbarê motîfan de wiha dibêje “Hêmana herî biçûk ya çîrokê ku ji berê de xwedî qabîliyeta jîyanê ye” (veguhistin ji Thompson, Sakaoğlu, 1999:15)<sup>32</sup>

Li gorî Thompson hemû rêgezên di çîrokê de ne motîf in û ji bo ku hêmanek bikare bibe motîf divê xwedî taybetiyên cuda be. Bo nimûne di çîrokekê de dayikbûn ne motîf e le “dêmariya xayîn” ji ber ku wekî tiştêkî nayê dîtin tê hizirkirin motîf e. An jî dema ku em bibêjin “John cilê xwe li xwe kirin û çû bajêr.” tu motîfan nahewîne. Lê ku em bibêjin “Leheng kumê xwe nedîbariyê li xwe kir, li mafûra xwe ya efsûnî sîwar bû û çû welatê rojhilatê rojê û rojavayê heyvê.” herî kêma çar motîfan dihewîne: kum, mafûr, rêwîtiya derasayî ya hewayî û welatê derasa.” (vgz. Garry u El-Shamy 2005:

30 ) Vladimir PROPP, FOLKLOR TEORÎ VE TARİH, AVESTA BASIN YAYIN, İstanbul 1998, r. 7-8

31 ) Vladimir PROPP, FOLKLOR TEORÎ VE TARİH, AVESTA BASIN YAYIN, İstanbul 1998, r. 8

32 ) Yahya YAVUZ, h.k., r, 127

XV)<sup>33</sup>.

Lêkolerê Alman, Max Luthî pênaseya xwe ya motîfê wiha dide ku gelekî nêzî pênaseya Thompson e: hêmana herî piçûk ya çîrokê ku di kelepore de xwedî hêza xweparastinê ye (veguhêstin ji Thompson, Sakaoğlu, 1999:15)<sup>34</sup>

Ji van herdu pênaseyan de jî tê fêmkirin ku di çîrokan de hêmana herî biçûk a ku xwedî taybetmendiyekê ye û bi vê taybetmendîya xwe bandorê li herikîna çîrokê dike motîfê gotin. Di her çîrokê de herî kêmtir motîfêk heye<sup>35</sup>.

Ligel van pênase û raveyan em dikarin motîfan bi giştî di bin sê beşan de kom bikin:

- 1) Lehengên çîrokan: xweda, ajalên derasayî, afirendeyên ecêb, dêw, cadû, ferîşte, perî, mirov, zarokên bêguneh, dêmariyên xedar û hwd.
- 2) Mijaren di nava tevgeran de: heyberên sêhrî, kevneşopên derasayî, baweriyên ecêb u hwd.
- 3) Koma motîfan ku di nava xwe de gelek motîfan dihewîne û tenê ji bûyereke pêk tê. (Seyidoğlu, 1975: 83)<sup>36</sup>

Li gorî Bünyamin Demir piştî hinde pênaseyan meriv dikare taybetmendiyên motîfan wiha rêz bike:

- 1) Motîf xwedî qabiliyeta domdariyê ne
- 2) Motîf beşa herî biçûk a vegotinê ne, lewma nikarin werin parçekirin
- 3) Ji motîfan mijar pêk tên
- 4) Tiştên balkêş û ecêb dikarin bibin motîf
- 5) Ew di nava xwe de wateyên veşartî dicivînin.
- 6) Di çandên curbicur de xwedî heman wate an dijwateyan in.
- 7) Dibe ku bi serê xwe li deverên cuda an li devereke diyar peyda bûbin u belav bûbin<sup>37</sup>.

## 2. 2. 2. RÊBAZA ERK/FONKSİYONÊN VLADIMIR PROPP

Rêbaza nirxandina çîrokan a Vladimir Propp morfolojî ye. Li gorî Mezher İbrahîmî; dariştinasî yan morfolojî hewleke binyadîn ji bo naskirina hêmanên vegotinê ye. Hêmana ku avahiya vegotinê li ser tê avakirin û dibe sedema pêkhatina beşên din a vegotinê. Vladimir Propp wek afirînerê vê nimûneyê piştî tehlîlkirina sed çîrokên cadûyî yê rûsî, karî biçûktirîn endamên çêker yê van cure

33 ) Bünyamin DEMİR, ÇÎROKÊN KURDÎ LI GORÎ MOTÎF ÎNDEKSA STITH THOMPSON (BI NIMÛNEYÊN ÇÎROKÊN MÎRZE MIHEMED), Teza Mastirê, Mêrdîn 2016, r. 7

34 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 127

35 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 128

36 ) Bünyamin DEMİR, h.t., r. 8

37 ) Bünyamin DEMİR, h.t., r. 8

çirokan diyar bike<sup>38</sup>.

Propp navê morfolojîyê, li şêwaza xwe kiriye û ew wisa pênase kiriye: “wesifkirina çirokan li ser binemaya beşên pêkhêner û herwiha wesifkirina hemahengiya van beşan ligel hev û pêwendiya wan ligel giştî çirokê” (Propp 49:1386)<sup>39</sup>

Propp piştî tehlîlên xwe gihîşte vê encamê ku hemû çirokên cadûyî pêkhateyeke xwe hene. Ev pêkhate jî ji sî û yek erkan çêbûne û bi riya heft karakteran çirok durist dibin. Ev heft karakter: Leheng, bexşende, fesad, alîkar, prênses, birêker, lehengê sexte<sup>40</sup>.

Propp, di destpêka xebata xwe de kêmasiyên polînkirina çirokan a li gorî motîf û tîpan dide nîşandan. Ji ber ku gelek varyant û versiyonên çirokan hene, mirov ne bi motîfan ne jî tîpan tesnîfeke serkeftî ya çirokan nikare pêk bîne û divê xebateke nû derbarê tesnîfê de were kirin. Piştî van nêrînên xwe Propp dest bi xebata xwe dike bo ku cihê wan tesnîfên din bigire. “Demeke motîf, tema û babet hebû. Paşî Vladimir Propp hat û her tişt guherand”(Bremond, Landy u Pavel 1995: 21). Yanî em dikarin bibêjin Propp di polînkirina çirokan de şoreşek pêk aniye. Wî hemû şaşîyên xebatên beriya xwe rexne kirine, kêmasîyên wan derxistine holê û bêyî ku van kemasî û şaşîyan dubare bike rêbaza xwe ya binyadî ava kiriye. Propp di çirokê de li hemanên ku nayên guherîn digere û li ser kirinên kesan disekine. Li gorî wî her çiqas kes werin guherin jî tevger nayên guherin. Ji ber vê jî dabeşkirineke zanistî ya çirokên derasayî li gorî tevgerên karakteran dikare were çêkirin. Di çirokan de çiqas mijar û karakter werin guherin jî fonksiyonên wan naguherin û mirov li gorî van fonksiyonan dikare vekolînan li ser çirokan bike.<sup>41</sup>

Li gor Bedran Hîkmet, Propp, çarçoveya xebat/rêbaza xwe bi çirokên derasa bi sînor dike û têgiha “fonksiyon”ê wekî têgiheke dîyarker bi kar tîne. Lewma Propp, wekî gelekî folklorzanên berîya xwe nakeve li dû pirsên wek bingeha çirokan ji ku tê, varyanta orjînal ya çirokê kîjan e, têkilîya di navbera dîrok û folklorê de çi ye û hwd. “Li vê derê em ê nekevin mijara lêkolîna dîrokî ya çirokan, em ê bêtir li ser çawabûna çirokan bisekinin. Lewra em heya fêhm nekin ku çirok çawa ne, em derheqê peydabûna wan de jî nikarin tiştêkî bibêjin. Berî ku em hîn bibin ka çirok ji ku derê dertên, divê em fêhm bikin ku çirok çi ne (V. Propp, Masal Biçimbilim, r, 8)”

“Fonksiyon” ji bo wî di çirokên derasa de têgiha herî watedar e ku mirov dikare avahîya çirokê li ser wê bide rûniştandin. “ Ji peyva fonksiyonê, çalakîya kesekî, çalakîya ku di nava rûdana honakê de ji ber wateya xwe hatiye pênasekirin, em fêhm dikin (V. Propp, Masal Biçimbilimi, r, 24)<sup>42</sup>

38 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, h.k., r. 135

39 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, h.k., r. 135

40 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, h.k., r. 135

41 ) Bünyamin DEMİR, ÇÎROKÊN KURDÎ LI GORÎ MOTÎF ÎNDEKSA STITH THOMPSON (BI NIMÛNEYÊN ÇÎROKÊN MÎRZE MIHEMED), Teza Mastirê, Mêrdîn 2016, r. 18

42 ) Bedran Hîkmet, Teorîyên Folklorê, A GRAFİK TASARIM TANITIM PROMOSYON WEB HİZMETLERİ, Diyarbakır 2016, r. 72

Li gor Bedran Hîkmet, li vê derê em vê pênaseya Propp, dikarin wekî çalakîya karakterîstîk ku çarçoveya wê dîyar e, rola wê dîyar e lê ew li gorî herêm û çandan bi hêman an jî motîfên cuda tê tijekirin, şirove bikin. Lewra ji bo Propp, eger di çîrokekê de çalakîya çûndin an jî dûrketinê derbikeve pêş me, dibe ku li gorî varyantan leheng bi hespekî rewan biçê, dibe ku bi teyrekî mîtolojîk biçê an jî dibe ku bi qeyikek dibe ku bi navgînek dî biçê. Lê di hemî van mînakên de, çûndin esas e. Teyr, hesp, qeyik an jî tiştêkî dî, bi tenê ji fonksiyona çûyinê re xizmetê dikin û alîkar in. Eger hesp tunebe dibe ku ev teyr be lê eger ku çûndin tunebe hîkaye bi xwe nîne. Her wiha li gorî varyantên heremên cuda dibe ku navgîna çûyinê di çarçoveya mîtolojî an jî taybetmendiyên xeyalsazîya we derê biguhere, lê wekî mînak nabe ku leheng neçe û di cihê xwe de rûnê. Ev hêmaneke dîyarker e û bê alternatîf e. Lewra avahîya çîrokê li ser vê rûdinê.

Wekî ku em di vê mînakê de dibînin, aksiyon an jî karên ku di çîrokê de derdikevin pêş me hem dîyarker in hem jî prosesa pêşketina çîrokê pêk tînin. Propp, van aksiyonên bingehîn ku xwedî yekîtiyeke tematîk in û di çîrokê de epîzotekê pêk tînin, wekî “fonksiyon” bi nav dike. Li gorî Propp, dibe ku di hemî çîrokan de hemî fonksiyon bi hev re dernekevin pêş me. Lê nebûna hin fonksiyonan, tu bandorê li organîzebûna fonksiyonan nake, yanê dora hatina wan naguhere.<sup>43</sup>

Propp bi giştî encama tehlîlên xwe bi çar nêrînên binyadîn destnîşan kirin ku wisa ne:

1. Erk bingeha binyadîn ya çîrokan pêk tînin.
2. Hejmara erkan bisînor in.
3. Erk her tim bi awayekî rêkûpêk li pey hev tên.
4. Hemû çîrokên cadûyî ji hêla pêkhatayê ve çeşnek in (Propp, 53-54)<sup>44</sup>

Erk hêmana sereke û neguher a çîrokan in û tiştên ku tê guhertin şewaz û çawaniya pêşveçûna erkan e. Ji bo ronîbûna mijarê li mînaka jêr binêrin:

- Mîr, lehengî li pey prensêsê dişîne û leheng dikeve rê.
- Mîr, lehengî dişîne şûneke ecêb, leheng dikeve rê.
- Xweng, birayê xwe li pey mangê dişîne, birayê wê dikeve rê.
- Hesinger, şagirdê xwe li pey mangê dişîne, şagirdê wî dikeve rê.

Di van hemû nimûneyan de tiştê balkêş û neguhêr dubarebûna du erkên “şandin” û “çûn”ê ye. Nav, xizmayetî, pîşe, armanc û hwd, tiştên guherbar in û tu karîgeriya wan li ser pêkhataya çîrokê nîne. Çawaniya li peyhevhatina erkên çîrokê bi awayekî mentiqî û rêkûpêk, eger di nava tu efsaneyekê de hemû erk bi hev re nayên lêbelê di her efsaneyekê her tim bi awayekî li pey hev tên (Selden û Widdowson, 142: 1384)<sup>45</sup>

43 ) Bedran Hîkmet, Teorîyên Folklorê, A GRAFİK TASARIM TANITIM PROMOSYON WEB HİZMETLERİ, Diyarbakır 2016, r. 73

44 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, h.k., r. 135

45 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, h.k., r. 140



Di çîrokekê de ne pewîst e ku her 31 fonksîyon hebin lê rêza fonksîyonan tu carî nayê guherîn.<sup>46</sup>

Li gorî Vladimir Propp Ji bilî van hêmanên sereke di çîrokan de hin hêmanên zeîf hene ku berevajî erkan di nava çîrokan de ciyawaz in û karigeriya wan li ser dêsmana<sup>47</sup> çîrokan nîn e. Ev hêman jî: nav, pîşe, ruxsar, zayend û cureya kesayetî, armanc û birêker, dem û mekan, çawaniya destpêkirin û bidawîanîna vegêranê û wesifkirina tişt û kesan û hwd<sup>48</sup>.

### 2. 2. 3. ERK Û FONKSÎYONÊN ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN VLADIMIR PROPP

Tabloya 31 fonksîyonên ku Propp tesbît kiriye û hin sernavên li binê van fonksîyonan ev in:<sup>49</sup>

I.) Ji Malbatê Yek Dûr Dikeve Pênase: Dûrketin Sîmge:β	1. Ji neslên pîr yek ji malê vediqete. (β1) 2. Mirina bav an jî dê an jî ya herduyan bi hev re wekî rengêkî teqez ye veqetîne tê dîtin. (β2) 3. Ji neslên nû yek ji malê vediqete. (β3)
II.) Leheng Bi Qedexeyekê Re Rûbirû Dimîne Pênase: Qedexekirin Sîmge:γ	1. An karekî ku divê neyê kirin tê destnîşankirin an jî tê destnîşankirin ku divê ji cihê xwe neyê veqetîn. (γ1) 2. Bi ferman an jî pêşnîyazek , rewşkw berevajî qedexeyê tê destnîşankirin. (γ2)
III.) Qedexe Tê Binpêkirin Pênase: Binpêkirina Qedexeyê Sîmge:δ	Rengê binpêkirina qedexeyê wekî rengê qedexeyê bixwe ye. Fonksîyonên II û III bi hev re cotik/cotekê pêk tînin. Carina bêyî ku beşa yekem yanê fonksîyona II. hebe ya III. heye.
IV.) Êrîşkar Hewl Dide Ku Agahîyan Bi Dest Bixe Pênase: Lêpîrsîn, Sîmge: ε	1. Armanca lêpîrsînê hînkirina cihê ku zarok lê dimînin an jî hînkirina eşyayê biqîmet e. ε1 2. Lêpîrsîna berevajî, qurban ji êrîşkar hin pirsan dike. ε2 3. Di hin rewşan de lêpîrsîn bi navgîniya hin kesên cuda tê kirin. ε3
V.) Êrîşkar Di Heqê Qurban De Agahî Berhev Dike. Pênase: Agahî berhevkin, Sîmge:ζ	1. Êrîşkar (Xayîn), bersivekê ji pîrsa xwe re digire. ζ1 2. Lêpîrsîna ku bi rengêkî dî an jî berevajî tê kirin, bersiveke rewa lazim dike. ζ2 û ζ3

46 ) Bünyamin DEMİR, h.t., r. 18

47 ) Pêkhate.

48 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafîk Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 95

49 ) Bedran Hîkmet, Teorîyên Folklorê, A GRAFİK TASARIM TANITIM PROMOSYON WEB HİZMETLERİ, Diyarbakır 2016, r. 75

<p>VI.) Êrîşkar Ji Bo Ku Qurbanên Xwe An Jî Serwetê, Hewla Xapandina Wî Dide.</p> <p>Pênase: Xapandin,</p> <p>Sîmge:η</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Êrîşkar dixwaze qurbanî/ê qanîh bike. η1</li> <li>2. Êrîşkar rasterast navgînên sêhrî bi kar tîne. η2</li> <li>3. Êrîşkar hin rêyên dî yên xapînok an jî tirsder bi kar tîne. η3</li> </ol>
<p>VII.) Qurban Tê Xapandin û Bi Vî Rengî Nexwestibe Jî Alîkarîya Dijmin Kiriye.</p> <p>Pênase: Tevlî Tawanê Bûn,</p> <p>Sîmge:θ</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Leheng ji êrîşkar bawer dike. θ1</li> <li>2-3. Leheng bi hin navgînên sêhrî ya tê birîndarkirin an jî dikeve xewê. An jî, leheng digel ku tu kesê, wî li razanê mecbûr nekiribe jî ji nişkê ve radizê û karê dijmin rihetir dike. θ2 û θ3</li> </ol>

<p>VIII.) Êrîşkar Zîrarê Dide Yekê Ji Malbatê.</p> <p>Pênase: Xerabî,</p> <p>Simge: A</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Êrîşkar yekê direvîne. A1</li> <li>2. Êrîşkar objeyeke sêhrî didize an jî direvîne. A2</li> <li>3. Êrîşkar zevîyan talan dike an jî zîrar dide zevîyan. A3</li> <li>4. Êrîşkar ronahîya rojê direvîne. A4</li> <li>5. Êrîşkar kiryarên xwe yên dizîyê an jî revandinê bi rengine dî dike. A5</li> <li>6. Êrîşkar zîrarê dide bedena kesan. A6</li> <li>7. Êrîşkar, dibe sebeb ku yek ji nişkê ve hunda bibe. A7</li> <li>8. Êrîşkar qurbanê/a xwe mecbûr dike ku tişteke bike an jî bi zorê tişteke jê digire. A8</li> <li>9. Êrîşkar berê yekî/ê dide.</li> <li>10. Êrîşkar ferman dide ku yek bi nava behrê de bê avêtin. A10</li> <li>11. Êrîşkar li yekî/ê an jî tişteke sêhrê dike. (Wî/wê bi sêhrê vediguherîne tişteke dî) A11</li> <li>12. Êrîşkar yekê/î dixwe dewsa yekê/î dî. A12</li> <li>13. Êrîşkar ferman dide ku yek bê kuştin. A13</li> <li>14. Êrîşkar yekê/î dikuje. A14</li> <li>15. Êrîşkar yekê/î di cihekî de kilît dike an jî davêje zîndanê. A15</li> <li>16. Êrîşkar yekê/î mecbûr dike ku pê re bizewice. A16</li> <li>17. Êrîşkar, (qurban) bi xwarinê ditirsîne. A17</li> <li>18. Êrîşkar her şev bi yekê îşkence dike/diêşîne. A18</li> <li>19. Êrîşkar şer îlan dike. A19</li> </ol>
---	---

<p>VIII-a.) Ji Malbatê Yek Tişteki Hunda Dike An Ji Dixwaze Tişteki Bi Dest Bixe</p> <p>Pênase: Kêmahî,</p> <p>Sîmge: a</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Kêmahîya keçikekê wek nîşanî, kêmahîya dostekî. a1</li> <li>2. Pêdivîya objeyeke sêhrî wekî sêv, av, hesp, şûr û hwd. a2</li> <li>3. Pêdivîya objeyeke ne sêhrî lê ecêb. Teyrê agir, werdeka pûrtzêr û hwd. a3</li> <li>4. Ji bo kuştina dêwek tişteki wekî hêka bi sêhr kêma e. a4</li> <li>5. Ji bo jîyînê, kêmasîya wasitayên pêdivî, tiştên maqûl. a5</li> <li>6. Hin formên cuda. a6</li> </ol>
<p>IX.) Agahîya Xerabî An Ji Kêmahîye Belva Dibe, Bi Daxwaz An Ji Bi Fermanekê Serî Li Leheng Tê Dayîn, Leheng Tê Şandin An Ji Diçe.</p> <p>Pênase: Navbeynkarî, Kêlîya Derbasîyê,</p> <p>Sîmge: B</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Hawara alîkarîyê tê kirin, dûre jî leheng tê şandin. B1</li> <li>2. Leheng pê re tê şandin. B2</li> <li>3. Leheng ji mala xwe derdikeve rê. B3</li> <li>4. Agahîya felaketê belav dibe. B4</li> <li>5. Lehengê ku hatiye qewirandin ji mala xwe bo derekî dûr tê birin. B5</li> <li>6. Lehengê ku mehkûmê mirinê hatiye kirin, bidizî serbest tê berdan. B6</li> <li>7. Straneke dilêş ku wê êşê tine ziman tê stirîn. B7</li> </ol>
<p>X.) Lehengê Ku Lê Tê Gerîn Qebûl Dike Ku Bikeve Nava Çalakîyê An Ji Biryara Çalakîyê Dide.</p> <p>Pênase: Destpêkirina Çalakîya Dijber</p> <p>Sîmge: C</p>	<p>Pirî caran di çîrokê de behsa vê kêlîyê nayê kirin lê berîya derketinê teqez e ku biryarek hatiye girtin. Ev kêlî an jî element di çîrokên ku leheng ji bo gerekî derdikeve rê de dertê pêş me.</p>

<p>XI.) Leheng Ji Mala Xwe Dertê.</p> <p>Pênase: Çûyîn,</p> <p>Sîmge: ↑</p>	<p>Ev çûyîn ji dûrketina demî ku di simgeya B'yê de derdikeve pêş me cudatir e. Çûndina leheng ji çûndina qurban cudatir e. Armanca çûndina leheng lêgerînek e lê qurban bêyî armanca lêgerînekê xwe di nava serborîyekê de dîtiye. Di çîrokan de du cure derketin hene. Yek ya leheng ya dî ya qurban e. Vegotin û honak bi piranî li ser leheng teşekul dike. Lê carina dibe ku keçikeke ciwan ji malê derê û kes lê negere. Hingê vegotin li ser serboriyên keçikê teşekul dikeç Lewma lehengê lêger hebe an nebe jî ev îşaret heye.</p>
	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Bexşgêr leheng îmtîhan dike. (D1)</li> <li>2. Bexşgêr silav dide leheng û jê pirsan dike. (D2)</li> <li>3. Kesekî/e ku li ber mirinê ye an jî mirî ye, ji leheng dixwaze ku ew</li> </ol>

XII.) Leheng Di Îmtîhan, Lêpirsîn An Jî Êrîşek Ku Dê Rê Veke Ku Ew ê Objeyeke Sêhrî An Jî Alîkarek Bi Dest Bixe De Derbas Dibe. Pênase: Fonksiyona Pêşîn a Bexşgêr Sîmge: D	alîkarîyawî bike. (D3) 4. Girtîyek/dîlek ji leheng dixwaze ku ew wî xelas bike. (D4) 5. Serî li leheng tê dayîn û jê eman tê xwestin. (D5) 6. Du kesên ku gengeşe dikin ji leheng dixwazin ku ew xenîmetê li wan pare bike. (D6) 7. Daxwazên dî. (D7) 8. Mexlûqatekî/Aferîdeyekî dijmin, hewl dide ku leheng tune bike. (D8) 9. Mexlûqatekî/Aferîdeyekî dijmin, bi leheng re şer dike. (D9) 10. Objeyeke sêhrî nîşanî leheng tê dayîn û pêşnîyaza taqasê/bihevguherînê tê kirin. (D10)
---	---

XIII.) Leheng Bersiv Dide Çalakîyên Ku Dê Di Pêş De Bexşê Dibexşîne Wî. Pênase: Helwesta Leheng, Sîmge:E	1. Leheng di îmtîhanê de bi ser dikeve (bi ser nakeve) (E1) 2. Leheng silava bexşgêr digire (nagire) (E2) 3. Leheng daxwaza kesek ku miriye an jî li ber mirinê ye pêk tîne (pêk nayne) (E3) 4. Leheng girtî serbest berdide. (E4) 5. Leheng heywanê ku jê alîkarî dixwaze xelas dike. (E5) 6. Leheng parêkirina ku li serê gengeşe heye dike û y3en ku gengeşe dikin dûr dixê. (E6) 7. Leheng hin xizmetên/alîkarîyên dî dike. (E7) 8. Leheng bi taktîkên kesê dijmin, dijmin têk dibe û ji êrîşê xelas dibe. (E8) 9. Leheng aferîdeyê/a dijmin têk dibe (an jî têk nabe). (E9) 10. Leheng bihevguherînê qebûl dike lê li hember bexşgêr hêza sêhrî ya objeyê bi kar tîne. (E10)
XIV.) Objeya Sêhrî Ji Leheng Re Tê Dayîn. Pênase: Girtina Obejeya Sêhrî Sîmge: F	1. Obje rasterast tê dayîn. (F1) 2. Obje cihêku lê ye ji leheng re tê gotin. (F2) 3. Obje tê çêkirin. (F3) 4. Obje tê firotin û tê stendin. (F4) 5. Obje bi rasthatinî dikeve destê leheng (leheng wê dibîne) (F5) 6. Obje xwe bi xwe yekcar peyda dibe. (F6) 7. Obje tê vexwarin an jî xwarin. (F7) 8. Obje tê dizîn. (F8) 9. Curbecur kes bi xwe dikevin xizmeta leheng. (F9)

<p>XV.) Leheng Bi Cihê Ku Obje Li Wê Derê ye Ve Birin, Ji Bo Wî Rêberî Tê Kirin An Jî Tê Birin.</p> <p>Pênase: Di Navbera Du Kraltîyan de Rêwîfî An Jî Bi Hevrêtiya Rêberekî Rêwîfî</p> <p>Sîmge: G</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Leheng li ezman difir. (G1)</li> <li>2. Leheng li ser erdê an jî li ser avê rêwîfî dike. (G2)</li> <li>3. Ji leheng re rêbertî tê kirin. (G3)</li> <li>4. Ji leheng re rê tê nîşandan. (G4)</li> <li>5. Leheng navgînên sabît yên veguhastinê bi kar tîne. (G5)</li> <li>6. Leheng şopên xwînê dişopîne. (G6)</li> </ol>
<p>XVI.) Leheng û Êrîşkar Di Şerekî De Derdikevin Hemberî Hev.</p> <p>Pênase: Pevçûn/Şer</p> <p>Sîmge: H</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Lêheng û êrîşkar li meydanê şer dikin. (H1)</li> <li>2. Leheng û êrîşkar dikevin pêşbazîyê. (H2)</li> <li>3. Leheng û êrîşkar bi lîstika kaxizan dilîzin. (H3)</li> </ol>
<p>XVII.) Nîşaneke Taybet Li Leheng Peyda Dibe.</p> <p>Pênase: Nîşana Taybet,</p> <p>Sîmge: J</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Di bedena leheng de nîşaneke peyda dibe. (J1)</li> <li>2. Leheng gustîlk an jî destmalek dibîne/bi dest dixê. (J2)</li> <li>3. Curbecur nîşanên dî. (J3)</li> </ol>
<p>XVIII.) Êrîşkar Têk Diçe.</p> <p>Pênase: Serkeftin.</p> <p>Sîmge: I</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Êrîşkar li meydana şer têk diçe. (I1)</li> <li>2. Êrîşkar di pêşbazîyê de tê diçe. (I2)</li> <li>3. Êrîşkar di lîstika qumarê de têk diçe. (I3)</li> <li>4. Êrîşkar di lîstika xwewezinandinê de têk diçe. (I4)</li> <li>5. Êrîşkar bêyî ku tu pevçûn biqewime tê kuştin. (I5)</li> <li>6. Êrîşkar rasterast tê qewirandin (I6)</li> </ol>

<p>XIX.) Xerabîya Di Destpêkê De Tê Telafîkirin An Jî Kêmahî Tê Pêşwazîkirin</p> <p>Pênase: Pêşwazîkirin</p> <p>Sîmge: K</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Objeya ku lê tê gerîn, bi zorê an jî bi hîleyê/qurnazîyê tê revandin. (K1)</li> <li>2. Objeya ku lê tê gerîn, bi xiz ji destê çend kesan derdikeve û dikeve destê çend kesan. (K2)</li> <li>3. Objeya ku lê tê gerîn, bi saya cazîbeyê tê bidestxistin. (K3)</li> <li>4. Bidestxistina objeya ku lê tê gerîn rasterast encameke çalakîyên berê ye. (K4)</li> <li>5. Objeya ku lê tê gerîn, bi navgînîya objeyeke sêhrî hemen tê bidestxistin. (K5)</li> <li>6. Bikaranîna abjeya sêhrî, feqîrîyê-hejarîyê diqedîne/dawîya feqîrîyê-hejarîyê tîne. (K6)</li> <li>7. Objeya ku lê tê gerîn, di dema nêçîrekê de tê bidestxistin. (K7)</li> </ol>
--	--

	<p>8. Kesê ku lê sêhr hatiye kirin vedigere şexsîyeta/nasnameya xwe ya berê. (K8)</p> <p>9. Mirî zindî dibe. (K9)</p> <p>10. Êsîr/Dîl tê xelaskirin. (K10)</p> <p>11. Bidestxistina objeya ku lê tê gerîn, bi heman rengê bidestxistina objeya sêhrî ye. (11)</p>
<p>XX.) Leheng Vedigere</p> <p>Pênase: Veger,</p> <p>Sîmge: ↓</p>	<p>Veger û gihaştin bi piranî bi heman rengî ne. Digel vê jî, pêdivî bi dirûveke teybet ya vegerê nîn e. Di gihaştinê de curbicur navgîn û serborî hene lê veger hemen pêk tê. Lê bi heman rengê gihaştinê ye.</p>

<p>XXI.) Leheng Tê Şopandin.</p> <p>Pênase: Şopandin.</p> <p>Sîmge: Pr.</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Şopîner, li pey leheng difire. (Pr1)</li> <li>2. Şopîner, daxwaza sûcdar dike. (Pr2)</li> <li>3. Şopîner dema ku dişopîne li dû hev dikeve rengê çend heywan an jî tiştêkî dî. (Pr3)</li> <li>4. Şopîner dikeve rengê objeyeke bi cezb û dertê rêya leheng. (Pr4)</li> <li>5. Şopîner hewl dide ku leheng perçe bike û bixwe. (Pr5)</li> <li>6. Şopîner hewl dide ku leheng bikuje. (Pr6)</li> <li>7. Şopîner hewl dide, dara ku leheng xwe tê de veşartiyê, bi diranên xwe perçe bike/jêbike. (Pr7)</li> </ol>
<p>XXII.) Bi Hawara Leheng De Tê Çûyîn</p> <p>Pênase: Alîkarî</p> <p>Sîmge: Rs</p>	<ol style="list-style-type: none"> <li>1. Leheng ber bi ezman ve tê birin. (Rs1)</li> <li>2. Leheng astengan dertîne ser rêya şopînerê xwe û direve. (Rs2)</li> <li>3. Leheng dema ku direve xwe dixê rengê hin objeyên ku wî vedişêrin. (Rs3)</li> <li>4. Leheng dema ku direve xwe vedişêre. (Rs4)</li> <li>5. Leheng di kargeha heddadekî de xwe vedişêre. (Rs5)</li> <li>6. Leheng dema ku direve dikeve rengê heywanek, kevirek û hwd. û xelas dibe. (Rs6)</li> <li>7. Leheng li hember ejderhaya mê ku dikeve curbicur rengan û dixwaze wî bixapîne , li ber xwe dide. (Rs7)</li> <li>8. Leheng destûr nade ku bê perçekirin û xwarin. (Rs8)</li> <li>9. Di kêlîya ku dê leheng bê kuştin de, bi hawara wî ve tê gihaştin. (Rs9)</li> <li>10. Leheng heldipeke darek dî. (Rs10)</li> </ol>

<p>XVIII Tê Dubarekirin  X û XI Tê Dubarekirin  XII Tê Dubarekirin  XIII Tê Dubarekirin  XIV Tê Dubarekirin  XV Tê Dubarekirin</p>	<p>Xerabî tê dubarekirin.  Leheng dîsa derdikeve rê, lêgerîneke nû dest pê dike.  Rêzebûyerên ku di serencama bidestxistina objeya sêhrî de derdikevin dîsa tên jiyîn.  Leheng helwest nîşanî kesê ku dê di pêş de tiştêkê lê bibexşîne wî, dide.  Objeyeke nûya sêhrî bo leheng tê dayîn.  Leheng bo cihê ku objeya ku lê digere tê veguhastin/gihandin an jî tê birin.</p>
<p>XXIII.) Leheng Xwe  Vedişêre/Kîbûna Xwe Vedişêre û  Vedigere Mala Xwe An Welatek  Dî.  Pênase: Vegerîna Bi Rengê  Veşartina Kîbûna Xwe.  Sîmge: O</p>	<p>Li vê derê du kategorî derdikevin.  1. Vegere leheng ya mala xwe. Leheng diçe cem zenatkarek û li cem wî dixebite.  2. Leheng diçe cem kralê welatekî bîyan û li cem kral wekî seyîs an jî aşpêj dixebite.  Carina jî bi tenê vegera li welat heye.</p>
<p>XXIV.) Lehengekî Sextekar Bi  Îdîayên Bêbingeh Derdikeve.  Pênase: Îdîayên Bêbingeh,  Sîmge: L</p>	<p>Leheng ku vegere welatê xwe ev îdîa ji alî birayên wî ve tên pêşxistin. Leheng ku vegere welatek dî, ev îdîa ji alî wezîr, general û hwd. dî ve tî pêşxistin. Birayên leheng îdî dikin ku wan objeya sêhrî anîye û wezîr an jî generalê welatê bîyan îdîa dike ku wî ejderja têk biriye.</p>
<p>XXV.) Karekî Dijwar Li Leheng  Tê Pêşnîyazkirin.  Pênase: Karê Dijwar,  Sîmge: M</p>	<p>Yek ji giringtirîn hêmana çîrokê di vir de ye. Ev karên dijwar ji yên ku di xaçerêyên berê de dertên dibe ku cudatir bin. Ev curbecur in. Wekî îmtîhana xwarin û vexwarinê, îmtîhana agir, îmtîhana mamikan, îmtîhana helbijartinê, îmtîhana nehatina dîtîne, îmtîhana hêzê, hostetî, sebir û cesaretê, maçkirina prensesê, anîna tiştêkê an jî çêkirina tiştêkê.</p>
<p>XXVI.) Karê Dijwar Tê Bicihanîn.  Pênase: Bicihanîna Karê Dijwar.  Sîmge: N</p>	<p>Rengê bicihanîna van karên zor wekî îmtîhanê pêk tî. Ev kar bi piranî, berîya ku bî dayin ji alî leheng ve hatine kirin an jî dîtin. Mînak, leheng dizane ku kîjan nîşanên taybet li ser prensesê hene. Rewşên ku diwêtîya bicihanîna wan ji pêş de hatine hînkirin bi îşareta (0N) tî nîşandan.</p>

XXVII.) Leheng Tê Naskirin Pênase: Naskirin, Sîmge: Q	Leheng bi rêya nîşanek taybet, birîn an jî objeyek ku jê re hatiye dayin tê naskirin. Leheng di heman demê de ji ber ku karekî zor bi ser xistiye jî tê naskirin. Li dû dûrketinek dirêj jî tê naskirin.
XXVIII.) Kîbûna Êrîşkar, Lehengê Sexte An Jî Yê Xerab Dertê Meydanê. Pênase: Derxistina Meydanê. Sîmge: Ex	Derketina ve fonksiyonê bi piranî girêdayî ya berê ye. Carina li dû têkçûna di karê ku hatiye pêşnîyazkirin de rewş derdikeve meşdanê. Pîrî caran wekî vegotinek jî pêk tê ev fonksiyon. Yan rastîya bûyeran wekî çîrokek tê gotin ku êrîşkar/lehengê sextekar jî lê guhdar dike an jî carina bi rêya strîna stranekê kîbûna rast ya erîşkar tê vegotin.
XIX.) Leheng Dikeve Rengekî Nû Pênase: Veguherîna Dirûvî Sîmge: T	1. Leheng bi tevgereke sêhrî ya alîkarê xwe reng/dirûv diguhêre. (T1) 2. Leheng koşekeke pir xweşik çêdike. (T2) Di vir de guherîna dirûvî nîn e lê statuya wî diguhere. 3. Leheng kincên nû li xwe dike. 4. Hin dirûvên mantiqî û pêkenî (T4)
XXX.) Êrîşkar An Jî Lehengê Sextekar Tê Cezakirin Pênase: Cezakirin Sîmge: U	Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê kuştin, tê dûrxistin, bi dûva hespê xwe ve tê girêdan an jî ew bixwe xwe dikuje û hwd. Carina jî efûyek esîlane bo wî tê derxistin. Bi piranî êrîşkar û lehengê sextekar yê ku di bela duyem de dertê tê cezakirin.

XXXI.) Leheng Dizewice û Dikeve Ser Text. Pênase: Zewicîn Sîmge: W	1. Leheng jinê û welat bi hev re bi dest dixê an jî pêşî nivê kraltîyê bi dest dixê û piştî mirina dê û bav hemî kraltîyê dbi dest dixê. (W0) 2. Carina leheng dizewice lê jina wî prenses nîn e, di vê rewşê de nabe kral. (W0) 3. Carin ajî berevajî vê bi tenê dertê ser text. (W0) 4. Eger çîrok, di kêlîya berî zewicînê de bi xerabîyeke nû bê birîn, bi nîşanîbûna beşa yekem û sozeke derbarê zewicînê de, di dawî dibe. (W1) 5. Rewşa dijber, jina lehengê zewicandî hunda dibe, di encama lêgerînê de jin tê dîtin û zewac tê nûkirin. (W2) 6. Leheng carina li şûna ku bi prensesê re bizewice, bi pere an jî regekî dî tê xelatkirin. (W3) [(Vladimir Propp, Masal Biçimilimi, r., 28-35)]
---	---



Vladimir Propp (1895-1970) piştî lêkolîna li ser 100 çîrokên efsanewî yê rûsî hejmarek hêman diyar kirin ku dêsmana sereke yan wan çîrokan pêk tînin. Wî ev hêman wek *erk* bi nav kirin. ( Ew erk) neguherbar û sinordar in û di rastiyê de bingeh û esasa çîrokan li se van hatiye avakirin. Propp li gor kiriyara karakterên nava çîrokê û girîngiya wan di geşbûna çîrokê de wan, pênase dike. Erk 31 in û aliyê heft kesên çalak ên di nava çîrokê de pêk tîn<sup>50</sup>.

Propp di lêkolîna xwe de bo hin erkan, çend şewazên rûdanê û çend binbeş diyar kirine: wek nimûne ji bo erkê '*tawankirinê*' amajeyî [destnîşan] 18 şewazan kiriye. Em li vir hêmanên pêkhêner ên dêsmana çîrokên efsanewî yê kurdî û herwisa awayên encamdana wan erkan li gor rêjeya hebûna wan ji zêde ber bi kêm ve raçav dikin.

Herwisa ku tê gotin, lêkolîna Propp li ser çîrokên rûsî bûye û di vê beşê de de ji bilî destnîşankirina aliyên hevpar yê çîrokên rûsî û kurdî , em dê amaje bi taybetmediyên çîrokên kurdî jî bikin.

Li pey dariştênasiya (morfolojî) Propp, di nava erkan de heft ji wan rê ji bo geşbûna çîrokê û bicîhbûna erkên din vedikin. Ev erk di çîrokê de qet bi hev re nayên dîtin û ji bilî destpêka çîrokê, di nivê û dawiya çîrokê de jî îhtimala hebûna wan heye. Heft erkên behskirî di çîrokên kurdî de weke jêr in<sup>51</sup>.

## **2. 2. 4. LI GORÎ MEZHER IBRAHÎMÎ 31 ERK/FONKSÎYONÊN VLADIMIR PROPP ÊN ÇÎROKÊN DERASAYÎ**

### *1. Dûrketin û nediyarbûn*

- Endamên ciwan ên zeîf ji malê dûr dikevin
- Dê û bav endamên salmezin ji malê dûr dikevin
- Mirina dê û bavî

### *2. Hişyarîdan ji bo encamdana karekî*

### *3. Guhdarînekirina li hişyariyê*

4. *Agahî berhevkirin (hewla berhevkirina agahiyan):* Tawankar hewl dide derbarê qurbaniyê de agahiyan berhev bike. An jî leheng hewl dide derbarê tawankar de agahiyan bi dest bixe. Ev erk ji aliyê kes an tiştekî din ve jî bi cih dibe.

5. *Nuçegihanî* (pêdana agahiyan): Agahiyên pêwîst bi tawankar tînin dayîn. Ê ew jî ji bo biencamgihandina armancên xwe yê pîs ji wan sûde werdigire: an jî berevajî derbarê tawankar de agahî diçin ber destê lehengî.

6. *Xapandin:* Tawankar hewl dide qurbanî bixapîne.

50 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher Ibrahîmî, h.k., r. 95

51 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher Ibrahîmî, h.k., r. 95

7. *Hevkarî û xapîn*: Qurbanî tê xapandin û rê ji bo tawankar vedike.

Proseya sereke ya çîrokên efsanewî bi rûdana tawanan ji ber kêmasiyan tê destpêkirin. Di rastiyê de erkê “tawan/kêmasî” girîngtirîn erk e û şahdemara van cure çîrokan e. Lehengê çîrokê bi mebesta rûbirûbûna ligel tawankaran ji bo nehiştina kêmasiyan tê meydanê û erk û şexsiyetên din bi dû xwe re dihîne. Li jêrê, şêwaza erkên din yên çîrokên kurdî tên raçavkirin.

8. Tawan/kêmasî

Tawan (A)

A1. fermana kuştinê

A2. tilismkirin

A3. hewldan ji bo xwarina kesekî/ê

A4. revandin

A5. dizîna hokareke cadûyî

A6. kuştin

A7. nasandina lehengê derewîn weke lehengê rastîn

A8. xistina nava bîrê

A9. bûn sedema berzkirina kesekî

A10. fermana destgîrkirina kesekî

A11. derkirin û dûrxistin

A12. zîndanîkirin

A13. birîndarkirin

A14. zewicandina bi zorê

A15. êşkence û mijîna xwîna qurbanî

A16. xistina nava deryayê

Propp amaje bi tawana “dizîna ronahiya rojê” dike ku di çîrokên kurdî nayê dîtin. Lê li hember du şêwazên tawanê di van çîrokan de hene ku li çîrokên rûsî ew nehatine destnîşankirin. Ev du şêwaz wisa ne:

- Tawankar çavkaniya ava vexwarina xelkê dagir dike û li hember jî qurbanîkirina keçikan dixwaze, her car bo demek kurt pêşiya avê berdide.

- Tawankar, qurbaniyan mecbûrî karên dijwar dike.

Kêmasî (a)

a1. nebûna hevjinê

a2. nebûna pere û jiyarê (debar)

a3. nebûna alîkarekî/ê cadûyî

a4. nebûna tişteki ecêb û seyr

9. *Alîkarî jê xwestin û birêkirina leheng (B)*

- B1. kesek karesatê ji bo lehengî aşkere dike
- B2. bêyî ku ji lehengî bê xwestin, ew dikeve rê
- B3. şandina lehengî bi fermanekî
- B4. daxwaza alîkarîkirina ji lehengî
- B5. şikayetkirin û kilamgotin bi ziman û awazeke xemgîn
- 10. *Pêşdestî (C)*: Leheng amadebûna xwe ji bo çareserkirina kêşeyan derdibire.
- 11. *Birêketin ( )*: Leheng ji bo çareserkirina kêşeyan ji malê derdikeve.
- 12. *Tevger û reftara bexşende (D)*

- D1. silav û pirs û bersiv
- D2. şer û pevçûn
- D3. daxwaza lêborîn û bexşîna ji lehengî
- D4. ceribandina lehengî
- D5. daxwaza rizgarkirinê
- D6. daxwaza dabeşkirina çend keresteyên cadûyî

Yek ji bexşendeyên girîng di çîrokên kurdî de Xidirê (Xizirê) Zindî ye. Xidir bêyî ti payînê<sup>52</sup>, tê ser rêya leheng û rêya serketin û biarmancgihîştinê nîşanî wî dide. Ev rênimadndin, hin caran di xewê de rû dide. Carinan dêwek ligel lehengî li hev dike û li beramber anîna kesek an tişteki, dêw keresteyeke cadûyî pêşkêşî lehengî dike.

- 13. *Reftar û berteke lehengî (E)*
- E1. berteke jîrane û hişmendane
- E2. serketin li hember bexşendeyekî dijmin
- E3. rizgarkirina dîlekî/ê
- E4. dilpêşewitîn û lêborîn
- E5. xweparastina li hemberî ceribandina bexşende
- E6. xapandin
- E7. encamdana xizmet û daxwazên din

- 14. *Wergirtina hokareke cadûyî (F)*
- F1. hokara cadûyî xizmeta xwe pêşkêşî lehengî dike
- F2. hokara cadûyî bi lehengî tê dayîn
- F3. hokara cadûyî bi xwe aşkere dibe
- F4. cihê kereste û hokara cadûyî bi lehengî tê nîşandan
- F5. hokara cadûyî tê çêkirin
- F6. hokara cadûyî tê revandin
- F7. hokara cadûyî tê xwarin û vexwarin

52 ) Bêyî ku li benda tişteki an sudekê be (wer.)

Şêwazên din ên vê erkê di çîrokên kurdî de wisa ne:

- Gelek caran Xidirê (Xizirê) Zindî ji dêvla keresteya cadûyî, hîn şîretan û rênimayîyan dide lehengî û çawaniya jinavbirina tawankar ji wî re ronî dike.

- Bexşende bi şuştina lehenga keç, bi av an barana efsûnî, ciwaniyeke seyr û ecêb pê dibexşe.

- Bexşende rê û rêbazên cadûkirinê hînî lehengî dike, an şiyaneke seyr û ecêb pê dibexşe; şiyana têgihîştina zimanê canewaran û hwd.

#### 15. *Veguhestin (G)*

G1. Leheng bi hespê ji bo cihê mebestê tê veguhestin

G2. Leheng bi asîmanan ve difire

G3. Rêya lehengî pê tê nîşandan

G4. Dilopa xwîna rijiyayî dibe rênîşandêra lehengî

Di çîrokên kurdî de ji bilî van hebên genim û agir û ... jî dibine sedema ku lehengê çîrokê ber bi cihê mebestê ve here; wek nimûne dema ku leheng mijûlî aşpêjîyê ye û agirê wî vedimire, ji dûr ve çirûskê agirekî dibîne û ber bi wî aliyê ve diçe û hwd.

#### 16. *Pêşbirk û dijberî (H)*

H1. Leheng di meydana şer de bi tawankar re rûbirû dibe.

Di nimûneyên rûsî de sê şêwazên din hene ku di çîrokên kurdî de nayên dîtin. Ev sê şêwazên pêşbirkê wisa ne: Pêşbirk, lîstika kartan, kaşandina weznê.

#### 17. *Serketin (I)*

I1. Serketina li meydana şer

I2. Kuştina tawankar bêyî şer

#### 18. *Diyarkirina lehengê rastîn (J)*

J1. Prensê gustîlk an desmalekê dide lehengî

J2. Prensê bi daxkirin an bi penceyên xwînî lehengê rastîn diyar dike.

Awayeke din ji bo diyarkirinê di çîrokên kurdî de wisa ye ku leheng piştî kuştina tawankar, bêvil, guh û lêvên wî dibireû hiltîne, piştê bi van tiştan xwe bi prensê û kesên din dide selimandin. Ev rûdan di çîrokên kurdî de gelekî dubare dibe û berevajî şêwazên din bi vî rengî leheng bi xwe vê erkê encam dide. Herwisa di şêwazeke din de leheng dax û nîşana li ser ran û hêtên lehengê derewîn dide û li dawîya çîrokê ew tê bêrûmetkirin.

#### 19. *Çareserkirina kêşe û kêmasiyan (K)*

K1. Kêşe û kêmasî di encama karên leheng de çareser dibin

K2. Kêşe û kêmasî ji ber bikaranîna hokareka cadûyî çareser dibin.

K3. Bidestxistina tiştê armanc bi sûdwegirtin ji zorê an ji zîrekîyê

K4. Rizgarkirina dîl

K5. Şikandina tilismê

K6. Zîndîkirina mirî

20. *Vegerîn* ( ): Leheng piştî gihîştina bi armancan vedigere malê.

21. *Radûkirin*<sup>53</sup> (Pr)

Pr1. Hewla tawankar bo jinavbirin an xwarina leheng

Pr2. Radûkirin (le pey çûn) bi guherîna teşeyê; tawankar teşeya xwe bi tişteki an canewerên curbicur diguherîne.

Di çîrokên kurdî de dibe ku tawankar bi zahir û cilûbergên derwêş an parsekekî li pey leheng bigere. Li hin çîrokan jî leheng keç, bi teşeya mehîn an xezal an dar û hêlanek û êzingê de ji destê tawankar direve û tawankar fermana serjêkirin, birîna darê û şewitandina hêlanekê dide û hewl dide ku lehenga keç ji nav bibe; lê li dawiyê dibe weke keçika bedew a hertim û tawankar û lehengê derewîn bêrûmet dike.

22. *Rizgarî* (Rs)

Rs1. Leheng derbasî asîmanan dibe an jî siwarî hespê dibe û direve

Rs2. Leheng bi avêtina şe, sabûn û teştî avê û tiştên din li rêya tawankar astengan rêgiran çêdike.

Rs3. Leheng bi guherîna teşeya xwe ji destê tawankar direve.

23. *Nenaskirî* (O): Leheng bi awayekî nenas diçe bajar û welateki din yan jî vedigere welatê xwe. Lehengê çîroka kurdî bi vê mebestê, gelek caran xwe weke keçekî bêdesthilat dide naskirin.

24. *Quretî û pozbilindî* (L): Lehengê derewîn dixwaze serketinên lehengê rastîn li xwe bigire.

25. *Karê dijwar* (M) Prensê an bavê wê, ji bo ceribandina lehengê daxwaza encamdana kareki dijwar jê dikin û bi vî awayî firsenda xwedanasîna lehengê rastîn çêdibe. Karên dijwar di çîrokên kurdî de zêdetir wisa ne: 1. Hilanîna nihênîyekê an anîna çîrok û serpêhatiyekê; 2. Bidestxistina dermanekê an tişteki seyr û ecêb.

26. *Encamdana karê dijwar* (N): Leheng bi bicîhkirina fermana mîr an prenses wêrekî û hêza xwe li wan diselimîne.

27. *Naskirin* (Q): Prensê bi rêya nîşaneyê ser bedena lehengê, an bi rêya desmal û gustîlka ku pêştir dabû lehengê, wî nas dike û ferqa lehengê rastîn û derewîn aşkere dibe. Herwisa hêz û mîrxasî û encamdana karê dijwar dibe hokarê nasîna lehengê rastîn.

28. *Birûmetkirin* (Ex): Serneketina lehengê derewîn di encamdana xwesteka prenses û mîr de dibe hokara aşkerebûna derewan û bêrûmetkirina wî. Di hin çîrokan de tawankar hemû tawanên xwe dixin stûyê lehengê qurbanî û gelek kêşe û arîşeyan jê re saz dikin. Lê dawiyê, lehengê qurbanî bi vegêrana serpêhatiya xwe, rûyê rastîn ê tawankar nîşan dide û wî bêrûmet dike.

29. *Guherîna ruxsarê an rewşa jiyana lehengê* (T): Di beşa dawiyê de li hin çîrokan, alîkar rewş

---

53 ) Radûkirin an rapêkirin: Li pey kesekî yan tişteki revîn daku wî bigire, dan dû daku bigire. Li ser vê, *dagirkerên xwînrêj rapeyî wî dikin ku bigrin. Apê Osman , sala 1929, sînor derbas dike û diçe Sûriyê da ku xwe bigihîne Xoybûnê,...* WQFêheng, Version 4.0, 20/11/2016

an ruxsara lehengî diguherîne. Hejayî amajekirinê ye ku ev erke di çîrokên kurdî de gelekî nadir rû dide.

T1. Alîkar koşkekê ji bo leheng ava dike.

T2. Alîkar cilûbergên nû ji bo leheng amade dike.

30. *Sizadana tawankar* (U): Divê neyê jibîrkirin ku ev erk her tim nayê encamdan û hin caran jî tawankar û lehengê derewîn tê bexşandin û efûkirin û ji wan re siza nayê birîn.

31. *Zewicandin û padişahî* (W): Lehengê çîroka efsanewî yê kurdî di piraniya çîrokan de ligel keçikên hezkirî dizewice û dibe padişah<sup>54</sup>.



---

54 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher Ibrahîmî, h.k., r. 95-96-97-98-99-100

## BEŞA SÊYEM

### 3. TETBÎQKIRINA ERK Û FONKSÎYONÊN RÊBAZA MORFOLOJÎYA VLADIMIR PROPP LI SER ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN EBEXÊ [ÇALDIRANÊ]

Em ê di tetbîqkirina erk û fonksîyonên rêbaza morfolojîyê ya Vladimir Propp li ser çîrokên derasayî yên Ebexê li gorî tabloya birêz Bedran Hîkmet analîz bikin.

#### 3. 1. JI MALBATÊ YEK DÛR DIKEVE

PÊNASE: DÛRKETIN

SÎMGE: β

#### 3. 1. β1. Ji neslên pîr yek ji malê dûr dikeve.

*Di çîrokên kurdî yên derasayî yên ku me li Ebexê berhevkirî de bav piranî bo berhevkirina xeracê û piranî jî bo berhevkirina xeraca heft salan ji malê dûr dikeve û piştî dûrketina bavî karesat û bobelat dest pê dikin. Di çîrokên kurdî yên ku me li Ebexê berhevkirî de jî bav zêdetir bo ‘berhevkirina xeraca heft salan’<sup>55</sup> ji malê dûr dikeve. Ji ber wê hêmana bavî ya jî bo ‘berhevkirina xeraca heft salan’ ji malê dûrketin hêmaneke berbelav e. Di Çîroka Mîrze Miheme de bavê Mîrze Miheme jî bo ‘berhevkirina xeraca heft salan’ ji malê dûr dikeve [dê û bav, endamên salmezin ji malê dûr dikevin].*

Ji birê xwe ra bêjim, bavê xwe ra bêjim, dibê rojekî paşa dibêje jina xwe, gazî jinê dike, dibê:

- Ez ê herme xeraca xwe ye hevt sala ser şiherekî ye. Ez ê herim bînim werim. Yaniz<sup>56</sup>, kurê mi jina min tesmîlî<sup>57</sup> xwedê, tesmîlî we.

[Jinên wî] dibê:

“Baş e.”

Tesmîlî wan jinê xwe ye malê dike. Ew jinê wî ye mal da hene, tesmîlî wan dike. E. Mîrze Miheme tesmîlî wan dike, ewî bi jina xwe, bi cîya<sup>58</sup> wî va. Eva diçe.<sup>59</sup>

55 ) a) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 23 b) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 15 Îlon 2016, Çîroka Navçekerê Kurê Îza, r. 1

56 ) Lê, lê belê.

57 ) Teslîm, emanet.

58 ) Li Ebexê û li derdorê Ebexê ji bo bilêvkrina û gazîkirina peyva ‘dayîkê an jî dîya min’, peyva ‘cîya min’ tê bikaranîn

59 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon

**3. 1. β2. Mirina bav an jî dê an jî ya herduyan bi hev re wekî regekî teqez yê veqetîne tê dîtîn.**

*Di çîroka Hesên Hiseyn de gava ku bavê wan diçe hec, li wê derê dimire [mirina dê û bavî]. Jixwe piştî mirina bavê wan bûyerên xirab dest pê dikin.*

[Cihû] dibê:

“Hecî çûne hec. Mêrê te çûye emrê xwedê.”<sup>60</sup>

*Di Çîroka Fatmayê de dîya Fatmayê dimire [mirina dê û bavî]. Piştî mirina dîya Fatmayê bûyerên xirab dest pê dikin.*

Eva çîroka ya Fatmayê ye. Navê qîzîkê Fatma bûye. Fatma jî, cîya<sup>61</sup> wê bûye, bavê wê bûye, Fatma bûye. Cîya Fatmayê hebûye. Bavê Fatmayê jî diçe ber dêwêr, diçe ber dewarê gund. Cîya Fatmayê dimre.<sup>62</sup>

**3. 1. β3. Ji neslên nû yek ji malê dîr dikeve.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [2] de ku Mîrze Miheme ji dîya xwe yek kur e lê, birayên wî yên din gelek in. Mîrze Miheme him endamê malê yê herî ciwan e û him jî li hember birayên xwe yên jinbava xwe endamê malê yê herî zeîf û tenê ye. Mîrze Miheme him ji ber ciwanbûna xwe û hi jî ji ber tenêbûn û zeîfbûna xwe mecbûr dimîne ji malê dîr dikeve [ji neslên nû yek ji malê dîr dikeve].*

Dibê Mîrze Miheme lawekî zehf cîvan bûye, zehf delal bûye. Dibê îja wanê din, ji ser wê durustbûna wî, cîvanbûna wî, dibê birayê wî ye dinêna<sup>63</sup>, [jê] qisqanmîş<sup>64</sup> dikirin. Dîyê wan dudu bûne. Yanî dê yek nebûne, dîyê wana dudu bûne. Dîya Mîrze Miheme ayrî<sup>65</sup> bûye.

Dibê îja zeman di arê ra derbas dibe, cîya Mîrze Miheme dunya xwe degîş<sup>66</sup> dike, wefat dike, diçe

---

2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 2

60 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergerîtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn r. 3

61 ) Li Ebexê û li derdorê Ebexê ji bo bilêvkirina û gazîkirina peyva ‘dayîkê an jî dîya min’, peyva ‘cîya min’ tê bikaranîn.

62 ) Amojna Suhbet, Gundê Şerefxanê Jorê-Ebexe-Wan 1973, Dema çîrokwergerîtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Fatmayê, r. 1

63 ) Yê/ên din, yê/ên dî-dîtir.

64 ) Hesûdî, dexesî, çevnebarî, zikreşî.

65 ) Cuda.

66 ) Guherîn.



dunya dinê. Dibê Mîrze Miheme daha<sup>67</sup> di ewê da tenê dimîne. Dibê îja ser wê, daha birayê wî, mesela çevra<sup>68</sup> nerind, dibê zêde jê hesûdî kirin, zêde ser da çûn. Dibê dêna xwe dayê, mimkuna wê nîne. Dibê îja Mîrze Miheme rabû, hespê xwe sîyar bû, şîher terk kir. Şîherê bavê xwe terk kir. Dibê serê xwe hilda, go:

“Ez ê ji vê bolga<sup>69</sup> derkevim ku herim bolgeke isa ku kesî mi naz neke. Yanî nizanbin ez lawê paşa nim, lawê dewletîmenda nim. Ku kes ne sirra mi bizanbe ne min bizanbe.”<sup>70</sup>

### 3. 2. LEHENG BI QEDEXEYEKÊ RE RÛBIRÛ DIMÎNE

**PÊNASE: QEDEXEKIRIN**

**SÎMGE: γ**

**3. 2. γ1. An karekî ku divê neyê kirin tê destnîşankirin an jî tê destnîşankirin ku divê ji cihê xwe neyê veqetîn.**

*Di Çîroka Kerr Kulik de, Werdeka dîya wan dike nake ku bi herdu kurên xwe nikare, îja vê carê ji wan re çend şert-şurûta dibêje. Dibêje ku ti wextî nedine pey karê karxezalan û dîsa dibêje ku miqatî Sosikê [hesp] bin ku bila Sosik ti carî avên golegeniya venexwe [karekî ku divê neyê kirin tê destnîşankirin].*

[Werdek] dibê:

“Xwedê oxirê bide we. Yalniz<sup>71</sup>, çend şert-şurût hene ez we ra bêjim. Idî hûn diçin jî hûn dizanin. Nebî nebî! Çîyayê Şengalê karê karxezala ber tûmê hewşanê radibin, hûn bine pey! Berê ber da mala bavê we nayê. Li Deşta Herranê avê golegeniya hene. Sosikê nehêline beredayî. Sosik buxwe yê teng-berê xwe biqetîne, xal ê serê we jê kin, ser porkura Werdekê da rê kin.”<sup>72</sup>

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de Hekîmê Loqman [alîkar] ji Gul [leheng] re dibêje ku tu bidî boy xatirê xwedê nebî nebî tu derkevî derve û di nava şîher de bigerî [tê destnîşankirin ku divê ji cihê xwe neyê veqetîn].*

---

67 ) Zêde.

68 ) Derdor, devdor.

69 ) Dever, cihûwar, navçe, herêm.

70 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 1

71 ) Lê, lê belê.

72 ) Ahmedê Zava, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1975, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Kerr Kulik, r. 5

Dibê wexta ku isa dibêje, Hekîmê Loqma dibêje, dibê:

“Kurê mi, evê bedewbûna te, ew xulqîyeta ku xwedê daye te, tu kurê min ez bavê te. Ti bidî xatrê xwedê, ti tu zemana dernekevî nava şîher negerî. Paşa ku bi te bihise, padşahê îşkê bîne serê te. Xwedê xulqîyeta te da însan çênekirye.”

[Gul] dibê:

“Hay hay bavêkal, ez dernakevim.”

Rojek, dudu, salek, em bêjin çî zeman ortê ra derbas dibe, li cem dimîne. [Gul] rojekî dibê:

“Bavêkal, çîma zêrekî bidî min ez ê îro herme himamê?”

[Hekîmê Loqman dibê:]

“Kurê mi, ne mi ti dayî sondê. Tu herî himamê, zirara te yê çêbe. Bira pîredayka te, te ra du sîtil av germ ke, li vê derê, koxkê mi da himama xwe, himamlamîş<sup>73</sup> be.”

[Gul] dibê:

“Ê bavêkal, qey heqa<sup>74</sup> zêr ber serê min in, tu heqa zêr, te ode tijî zêr kirye, tu qey qêmîş nakî libekî jî bidî mi?”

[Hekîmê Loqman] dibê:

“Kurê min, hemû yê te ye. Hemû fida be j’ te ra. Ema, e zanim zirara te yê ji di padşê, ji şîherê padşê çêbe.”<sup>75</sup>

### 3. 2. γ2. Bi ferman an jî pêşnîyazek, rewşeke berevajî qedexeyê tê destnîşankirin.

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de bavê Mîrze Miheme [padişah] wexta ku seva ‘berhevkirina xeraca heft salan’ ji malê dûr derdikeve ji Mîrze Miheme [leheng] re dibêje ku gava ez çûm tê miqatî kurên min bibî û nehêlî bila neçîne nêçîra çîyayê sor-çîyayê reş. [ferman an jî pêşnîyazek tê destnîşankirin].*

[Paşa] dibê:

“Kurê mi, tê qatî mala mi kurê mi bî. Bira neçîne nêçîra çîyayê sor, çîyayê reş. Wekî din ku da diçin bira herin. Heta ez çûm hatim.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e, ser çehvê mi. Ez ê hell kim.”

[Paşa] dibê:

---

73 ) Serşûştin.

74 ) Ewqas.

75 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 13

“Temam.”<sup>76</sup>

**3. 3. QEDEXE TÊ BINPÊKIRIN: Rêngê binpêkirina qedexeyê wekî rengê qedexeyê bixwe ye. Fonksiyonên 1 û 2 bi hev re cotekê pêk tînin. Carina bêyî ku beşa yekem yanê fonksiyona 2. hebe ya 3. heye.**

**PÊNASE: BINPÊKIRINA QEDEXEYÊ**

**SÎMGE:δ**

*Di Çîroka Kerr Kulik de gava ku Kerr û Kulik diçine şerê xalên xwe, ew şîreta ku Werdeka dîya wan li wan kiribû piştguh dikin û pêpez dikin [binpêkirina qedexeyê].*

Kerr-Kulik bira herin. Kulik li ser barê deva pêşyê bûye. Kerro jî parava bûye. Li Çîyayê Şengalê, dibê nêzkî êvarê, vira xezalek ber wana banz dide. Kulik ser barê ewê [devê] hişyar dibe. Çaxê vediciniqe, Kerro dibê:

“Kulik, çî ye?”

[Kulik] dibê:

“Xezal e.”

[Kerro] dibê:

“Ez bextê te û xwedê me, weysête cîya me ye, nebî tu bidî pey!”

[Kulik] dibê:

“Welle, ez ê bime pey. Ez ê şeş roja bidme pey. Roja hefta li Deşta Herranê ser kaniyê dil-cîgerê wê te ra sor kim.

Kulik berdide karê da. Şeş roja dide pey. Roja hefta li Deşta Herranê karê digre, sor dike<sup>77</sup>.

*Di heman Çîroka Kerr Kulik de Kulik [lehengê duyem] û xulamê wan radizên, Sosik jî di êvar de teng û berê xwe diqetîne û avên golegeniya vedixwe [guhdarînekirina li hişyariyê]*

Bira eva isa here. Kerro Bilîcanê hildide tîne. Buxdo xulamê wan e. Buxdo raza ye, Kulik jî raza ye. Sosik filitye, avê golegeniya isa xariye, a teng-berê xwe qetandiye. Wira çaxê şûr dikşîne Buxdo, Buxdo xwe li nava guhê Kulik dixwe Kulik hişyar dibe.<sup>78</sup>

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de Gul [leheng] guh nade gotin-şîretên Hekîmê Loqman [alîkar] û wan*

76 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 5-6

77 ) Ahmedê Zava, h.ç., r. 6

78 ) Ahmedê Zava, h.ç., r. 9

*gotin-şîretan piştguh dike, pêpez dike [binpêkirina qedexeyê].*

Dike nake pê nikare, dibê:

“Here, xwedê îşê te lê bîne.”

Dergevan bi wezîr va, ew jî bêjin bê:

“Heke salek e, heke şeş meh e, yawo, em hatin derketne vira. Me paşayê xwe bîr kir. Paşayê l’ me were xezebê. Paşayê me l’ welîtîyê bavêje. Yawo, em îro herin serîkî bine paşayê xwe, zîyaret kin. Em dîsa lêxin werne ser goreva<sup>79</sup> xwe.”

Bi emrê xwedê, ewana jî diçin. Dergevan dibê:

“Em ê hene himamê.”

Diçne himamê. Wezîr dêna xwe didê, ew gencê ku heyjde xencer lêdaye navmîla wî, dibê:

“Ha va l’ himamê da!”<sup>80</sup>

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] zarokên padişêh guh nadine gotin-şîretên bavên xwe û diçine nêçîra çîyayê sor-çîyayê reş, gotin-şîretên piştguh dikin, pêpez dikin [binpêkirina qedexeyê].*

Mîrze Miheme yêra<sup>81</sup> wî [da] xwe ra rûniştîye. Dêna xwe didê, zarê wî li dorê hatin, go:

“Welle, tu bimrî em ê hene nêçîra çîyayê sor.”

[Mîrze Miheme] go:

“Kuro, werin neçin. Lawo, werin gotna mi bikin. Hûn ê herin, nayên!”

[Kurên paşê] go:

“Welle, em ê herin.”

[Mîrze Miheme] go:

“Hûn diçin, gor bavê we. Herin.

Eva sî w neh kurê wî radibin, sîyar dibin, diçne nêçîra çîyayê sor.<sup>82</sup>

### **3. 4. ÊRÎŞKAR HEWL DIDE KU AGAHIYAN BI DEST BIXE**

**PÊNASE: LÊPIRSÎN**

**SÎMGE:ε**

#### **3. 4. ε1. Armanca lêpirsînê hînkirina cihê ku zarok lê dimînin an jî hînkirina eşyayê biqîmet e.**

79 ) Wezîfe, peywîr.

80 ) Nûredînê Xelkê Xaç, h.ç., r. 13-14

81 ) Cih, şûn.

82 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 6

### 3. 4. ε2. Lêpîrsîna bervajî, qurban ji êrîşkar hin pîrsan dike.

*Di çîrokên kurdî yên derasayî/cadûyî yên ku me li Ebexê berhevkirî de leheng ji bo ku derheqê qurbanî de agahiyan berhev bike cilûbergê xwe diguhure û pîranî dikeve şiklê şivanan, dikeve şiklê jinan an jî hûrê pezekî dikişîne serê xwe dibe keçelokekî seva ku tu kesek wî nas neke. Lê di van cure çîrokan de motîfa dirûvguherînê ya lehengê rastîn wek ‘keçelokekî’<sup>83</sup> berbelavtir e.*

*‘Di van cure çîrokên cadûyî yên ku me li Ebexê berhevkirî de wexta ku leheng cilbûrgên xwe an şekl û şemalê xwe diguherîne diçe an rastî kalekî an jî rastî pîrekî tê û pîranî di navbera wan de ev curê qalibgotin derbas dibe: -Hema tu bibe bavê min ez bibime kurê te yan tu bibe dîya min ez bibime qîza te an jî berevajî wê dibe’<sup>84</sup>.*

*Di Çîrokê de Navçeker [lehengê çîrokê] hewl dide û dikeve şiklê qîzeke xama seva ku wezîrê qesasê bavê wî, wî bibîne û dilê wî têkevê ku derheqê qesasê bavê xwe de agahiyan berhev bike. Piştî ku Navçeker bi şiklê qîzekî dibe dergîstiya wezîr hemû agahiyên derbareyê kuştina bavê xwe bi wî awayî dide piştrastkirin [lêpîrsîna bervajî, qurban ji êrîşkar hin pîrsan dike].*

Dibê wextê derî vekerin ketne hundir, dêna xwe danê, di nava wan hesna da îskeletê meriva hene. Dibê wezîr kelîmeke nexaş go. Dibê wextê kelîmeke nexaş go, dibê îdî [Navçeker] anamîş<sup>85</sup> bû. Dibê go:

“Wezîr, ev çi ne?”

Dibê go:

“Heyran, jê vegere.”

Dibê [Navçeker] go:

“Wezîr, kuro mi veneşêre. Kuro, ez helala te me. Kuro, ez niha her tiştî bizanbim fayda te ye, yarara<sup>86</sup> te ye.”<sup>87</sup>

83 ) **a)** Baqîyê Apê Nadir, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergrîtinê: 25 Îlon 2016, Çîroka Cibrî r. 8 **b)** Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 27 **c)** ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergrîtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 12 **d)** Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergrîtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 5

84 ) **a)** ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergrîtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 2 **b)** Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergrîtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 4 **c)** Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergrîtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Kurê Şah Ahme, r. 23 **d)** Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 13-22

85 ) Fêmkirin, tégihîştin, serwextbûn.

86 ) Feyde, menfa’et, kêr.

87 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergrîtinê: 15 Îlon 2016, Çîroka Navçekerê Kurê Îza, r. 21

### 3. 4. ɛ3. Di hin rewşan de lêpîrsîn bi navgînîya hin kesên cuda tê kirin.

*Piştî ku xebera kuştina bavê Navçeker [leheng] li ber guhê wî dikeve hewl dide ku derbarê kuştina bavê xwe de agahiyan bi dest bixe û di vê meselê de ji dîya xwe ji wezîrêpadişêh û ji padişêh pîrsan dike. [di hin rewşan de lêpîrsîn bi navgînîya hin kesên cuda tê kirin].*

Dibê îja ewî [Navçeker û] nebiyê pîrê li hevdu dan. Dibê nebiyê pîrê zehf kutabû. Dibê nebiyê pîrê diçe. Dibê pîrê destê nebiyê xwe digre hildide tê derê mala wê. Derê malê dide. Cem cîya wî, cîya wî ra gazindê wî dike, şikyatî wî dike. Ew jî tê. En son<sup>88</sup> pîrê dibêjê, dibê:

“Eger tu mêrekî zehf jêhatî yî tê herî heyfa bavê xwe vekî. Tu wextê hinde jêhatî yî tu çima naçî heyfa bave xwe venakî?”

Dibê bira pîrê lêxe here. Agiro, kê tu gurr kirî! Dibê Navçeker wextê hate hundur, dibê cîya wî ber gerya, jê ra nan anî. Go:

“Dayê ez nan naxum. Bavê mi kê kuştiye, tê mi ra bêjî. Kê kuştibe tê mi ra bêjî.”

Dibê go:

“Kurê min, evna îtraf<sup>89</sup> in. Ev tiştta virr e, eva nebûye. Te zara wê kutaye ewê jî ev gotye. Tiştta dêst da nemaye, ew gotye. Bavê te wezîr bû, wezîrê padşê bû. Bavê te însanekî naskirî bû, însanekî pehlîvan bû, însanekî cîvan bû, delal bû. Ev tiştana virr in. Kê bikarebe bavê te bikuje? Bavê te mirye.”

[Navçeker] dibê:

“Dayê, tu nebêjî e yê te bikujim. Çara wê tune. Çi hatye serê bavê mi tê mi ra gerçekîya<sup>90</sup> wê bêjî. Çi bûye tê mi ra bêjî.”

Dibê dîya wî dêna xwe dayê, tabî ku eva îşê rojekî da nîne. Eva îşê heftêya, meha, iha derbas dike ew û cîya xwe ber hev didin. En son<sup>91</sup>, cîya wî dêna xwe didê çare tine, dibê:

“E yê te ra bêjim. Here dîwana paşê bêje paşê; te bavê mi şandîye ku? Çi hatye serê bavê mi? Ça bûye? Bira j’ te ra bêje lêxe were. Eksîk<sup>92</sup> hebe e yê tamam kim.”<sup>93</sup>

### 3. 5. ÊRÎŞKAR DI HEQÊ QURBAN DE AGAHÎ BERHEV DIKE:

#### PÊNASE: AGAHÎ BERHEVKIRIN

#### SÎMGE:ζ

88 ) Herî dawî, di axiriyê de.

89 ) Îftîra, buxtan.

90 ) Rastî.

91 ) Di axiriyê da, di dawiya dawiyê da.

92 ) Kêm, kêmasî.

93 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 15 Îlon 2016, Çîroka Navçekerê Kurê Îza, r. 5-6

### 3. 5. Ç1. Êrîşkar (xayîn), bersivekê ji pirsaxwe re digire.

### 3. 5. Ç2. Lêpîrsîna ku bi rengekî dî an jî berevajî tê kirin, bersiveke rewa lazim dike.

*Pîştî ku xebera kuştina bavê Navçeker [leheng] li ber guhê wî dikeve ji bo ku heyfa bavê xwe hilde agahiyên pêwîst ji dîya xwe û ji rûsipîyekî padişê werdigire [lêpîrsîna ku bi rengekî dî an jî berevajî tê kirin].*

Dibê wextê diçe dîwana paşê, nahêlin here, nahêlin here [hundir]. Rûsipîkî paşê tê, jor da berjêr dibe, dibê:

“Bavê te çûye filan şehîrî. Çûye filan şehîrî xeracê top ke. Bavê te li wî şehîrî çî hatibe sêrî [em nizanin]. Hevalê wî ye hatî dibê; wezîr kuştîye. Hinek dibên, inda<sup>94</sup> bûye. Hinek dibê, mirî ye. Yaniz<sup>95</sup>, net<sup>96</sup> netîce em nizanin. Yanî bihîstina ku me ra hatîye gotin, wezîr, bavê te kuştîye. Mêvanê wezîr bûye. Çi ewa bavê te hebe sorimlî<sup>97</sup> wezîr e.”

Dibê eva cake<sup>98</sup> dizvire tê cem cîya xwe, dibêje cîya xwe, dibê:

“Tê mi ra netê<sup>99</sup> wê bêjî.”

Cîya wî dibê:

“Tu di hemla mi da bûyî, ez bi te nexaş bûme<sup>100</sup> bavê te çûye. Eva nava jî bavê te mi ra gotye. Weysê kirye gotye, ku eger ez nehatim, te hemla xwe danî ku law be navê wî Navçeker lê ke. Hal-mesele iha. Hevalê bavê te yê hatî ku gotine, wezîr bavê te kuştîye. Heger tê bikaribî herî întiqamê bavê xwe hildî, here. Her tişt mi, şîrê sipî mi l’ gerdena te berî kirye. Eger tu nikaribî van tiştan, li serê xwe nealîne, li xwe nexe bar. Bira li te qar nebe.”<sup>101</sup>

## 3. 6. ÊRÎŞKAR JI BO KU QURBANÊN XWE AN JÎ [JI BO] SERWETÊ, HEWLA XAPANDINA WÎ DIDE

**PÊNASE: XAPANDIN**

**SÎMGE: η**

### 3. 6. η1. Êrîşkar dixwaza qurbanî/ê qanîh bike.

94 ) Winda.

95 ) Lê, lê belê.

96 ) Tam, yekcar, hemu, eşkereyî.

97 ) Berpirsiyar, mesûl.

98 ) Dîsa, careke din.

99 ) Tam, hemû, eşkereyî.

100 ) Yanî ducanîbûn.

101 ) Salhê Hecî Heyder, h.ç., r. 6

*Di Çîroka Harûnê Reşît û Siltan Zibêdê de Mecûsî [tawankar/êrişkar/fesad/xayîn] digere û Hesên [qurbanî] dibîne û xeberdandinê dixwaze ku Hesên qanih bike.*

[Mecûsî] dibêje, dibê:

“Kuro, tu wî îşî da çi dîstîni? Filan-bêvan.”

Iha dide xeberdandinê. Merivek, ew Mecûsî diçe dibêje wî zarî, dibê:

“Kuro, were miherin<sup>102</sup>. Ez ê te wisa zengîn kim. Tê bibî zengîne dunyayê.”

[Hesên] dibêje, dibê:

“Baş e.”<sup>103</sup>

### **3. 6. η2. Êrişkar rasterast navgînenê sêhrî bi kar tîne.**

*Di heman çîrokê Mecûsî [tawankar/êrişkar/fesad/xayîn] seva ku Hesên [qurbanî] bixapîne rasterast navgînenê sêhrî jî bi kar tîne.*

Yek hebûye. Êtîm bûye. Navê wî Hesên bûye. Hesên, li ber destê merivekî, em bê, xevitî bûye. Yanî ewa baxir qismî heye? Teyî, em bêjin carna Mîdyatê jî niha bi çagûça çêdikin, filan. Dibê [Hesên] bi wî qirarî çêdike. Dibê mecûsîk, kafîrî, em bêjin ehlê sêrê bûye, çi bûye? Filan-bêvan. Ha digere, ha digere, çehvê wî, wî [Hesên] dibîne. Dêna xwe didê, em bêjin tabî [Hesên] bêbav e, bêbira ye, bêkes e. Yanaşî<sup>104</sup> wî dibe.<sup>105</sup>

### **3. 6. η3. Êrişkar hin rêyên dî yên xapînok an jî tîrsdêr bi kar tîne.**

*Dîsa di berdewamiya heman çîrokê de Mecûsî [tawankar/êrişkar/fesad/xayîn] seva ku Hesên [lehengê qurbanî] bixapîne rêyên xapînok û tîrsdêr bi kar tîne.*

Neysene<sup>106</sup>, axir gede idî dibêje dîya xwe? Idî bê dîya xwe diçe? Eva [Mecûsî], gede hildide. Wexta ku em bêjin, tam destê gede mîtanî<sup>107</sup> van orgutana<sup>108</sup> ça dikeve dêst, wexta ku dikeve dêst, idî em bêjin digo, destê gede ji ‘erd-‘esmana diqete. Gede, yê ku da here? Eva [Mecûsî] çi dike?

102 ) Yanî, em herin. Ev şewegotin li Ebexê berbelav e û zêdetir tê bikaranîn.

103 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexê-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 5

104 ) Nêzîkbûn.

105 ) Hecî Henîfî, h.ç., r. 5

106 ) Werhasil.

107 ) Mîna.

108 ) Rêxistin.



Dibejê, dibê:

“Gede, bax<sup>109</sup>-binhêre. Em gava ku çûne ku, tê bêjî bê, eva bavê min e.”

Gede, êtim bûye. Tu kesê gede tune ye. Dîya gede heye, sade. Gede, em bê, mîtanî van îşçiyê hanê dixevite. De mi go, baxir. Yanî wir da dixevite.

Birayê xwe ra bêjim, niha eva dibê qedereke pir çûn, axir hindik çûn. Dibê yê herin gemîkî sîyar bin. Dibê wexta gemîyê sîyar bûn, Ûsibo<sup>110</sup>, evî [Mecûsî] dibê gemîyê da wisa da gede. De ehlê gemîyê hemû hatin, gotin:

“Yawo, tu çima lê dixî? Filan-bêvan...”

[Mecûsî] go:

“Yawo, kurê min e. Bavo, we ra çi?”

Gede jî tirsê dibêje, dibê:

“Bavê min e.”<sup>111</sup>

### **3. 7. QURBAN TÊ XAPANDIN Ê BI VÎ RENGÎ NEXWESTIBE JÎ ALÎKARÎYA DIJMIN KIRIYE**

**PÊNASE: TEVLÎ TAWANÊ BÛN**

**SÎMGE: 0**

#### **3.7. 01. Leheng ji êrîşkar bawer dike.**

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de Hesên [leheng/qurbanî] êdî bi şeklekî ji aliyê Mecûsî tê xapandin û bi vî rengî nexwestibe jî alîkarîya Mecûsî [êrîşkar/tawankar/fesad/xayîn] dike.*

Neysene<sup>112</sup>, eva çûn. Cîkî peya bûn. Dibê nizam kafirî xand, ça kir? Qantirek li ber hazir bû. Qantir li ber hazir bû. Dibê ew [û] gede li qantirê sîyar bûn. Dibê çûn. Çûne cîkî muwate<sup>113</sup>. Dêna xwe dayê, çiyakî wisa bilind e! Tişteki ‘ecayîb! Em bêjin, dêna xwe dayê, dibê de îja bi sêrê, sêr e.

Gede kire nav postekî, postekî deva. Em bêjin pêça, ça kir, filan? Dibêje dibê, gote gede, go:

“Kuro, binêre! Li vira, niha teyrê werin, te hildin biherne serê vî çiyayî bilind. Li serê vî çiyayî kevir hene. Kevir, yanî hemû cewharat e, yanî zêr e, zîv e, filan. Tê kewkî kî, kewkî kî, tilol kî. Yê werin, werin. Wexta ku mi gote te da, idî bes e. Ez ê rê nîşanî te kim, tê werî.”

109 ) Binhêre, binêre.

110 ) Bavê berhevkar.

111 ) Hecî Henîfî, h.ç., r. 5

112 ) Werhasil.

113 ) ?

Ê gedê qijik idî dikare bê na. Eva [Mecûsî], bi wî qirareyî dike.<sup>114</sup>

**3. 7. 02 û 03. Leheng bi hin navgînên sêhrî ya tê birîndarkirin an jî dikeve xewê. An jî leheng digel ku tu kesî, wî li razanê mecbûr nekiribe jî ji nişkê ve radizê û karê dijmin rihettir dike.**

*Di Çîroka Hemze Pelevan de pîra sêhr [tawankar an jî êrîşkar]bi tilismê û bi sêhrî Hemze Pelevan [leheng] dixewê. Gava ku Hemze Pelevan dikeve xewê êdî karê pîra sêhr rihettir dibe.*

Dibê pîrê şebeqa subê radibe. Dibê qebza şûrê wî şil dike. Diçe serê xwe dide ser qelbê wî, dibê:  
“Erê. Hemze ne mirî ye ne mayî ye.”<sup>115</sup>

### **3. 8. ÊRÎŞKAR ZIRARÊ DIDE YEKÊ JI MALBATÊ.**

**PÊNASE: XERABÎ**

**SÎMGE: A**

Mezher Ibrahimî vê qonaxê wek Tawan/Kêmasî bi nav dike û li gorî wî proseya sereke ya çîrokên efsanewî bi rûdana tawan an ji ber kêmasiyan tê destpêkirin. Di rastiyê de erkê “tawan/kêmasî” girîntirîn erk e û şehdamara van cure çîrokan e. Lehengê çîrokê bi mebesta rûbirûbûna ligel tawankar an ji bo nehiştina kêmasiyan tê meydanê û erk û şexsiyetên din bi dû xwe re dihîne. Li jêrê şewaza erkên din yê çîrokên efsanewî yê kurdî tên raçavkirin.<sup>116</sup>

#### **3. 8. A1. Êrîşkar yekê/î direvîne.**

*Di çîrokên cadûyî/derasayî yê kurdî yê ku me li Ebexê berhevkerî de erk an tawanê revandinê exlebe yan ji aliyê heywanên dirrinde [tawankar] yan jî ji hêla heyberên derasayî [tawankar] ve pêk tên. Di Çîroka Eybezê Xaz, Kurê Hirçê, Nebyê Paşê [Paşayê Misrê]<sup>117</sup> de qîza paşê wexta ji seyrangehê bi hevalên xwe ve vedigre ji aliyê hirçê [tawankar]ve tê revandin [tawan] û li ser erk an tawanê revandinê çîrok dest pê dike [Lehengê çîrokê bi mebesta rûbirûbûna ligel tawankar an ji bo nehiştina kêmasiyan tê meydanê û erk û şexsiyetên din bi dû xwe re dihîne].*

114 ) Hecî Henîfî, h.ç., r. 6

115 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelavan, r. 10

116 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmara Çîrokên Efsanewî yê Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 96

117 ) *Çîrokbêj Harûnê Zava heta cihekî ev çîroka got û şûnde kir nekîr dewama çîrokê nehate bîra wî û çî heyf e ku ew kesera dewama çîrokê him di dilê min de ma û him jî di dilê çîrokbêj de ma.*

Em bêjin, de jê [padişah ji qîza xwe ra] ra mesref dike. Hazirlixa<sup>118</sup> seyragehê çî hebe jê ra daytîne. Qîzik digîje qîzika xwe ra diçe kavilyê, kêf-heneka dikin. Nanê wan be, izgara wan be, çî be, xwe ra ser kaniyê çêdikin, duxwin. Nêzkê êvarê hev ra xeber didin, dibê:

“Em ê paytûna xwe sîyar bin herin.”

Qîz hinekî li dûrî yêra<sup>119</sup> xwe dikevin, dûrî seyragehê dikevin. Qîza paşê dibêje:

“Peee! Mi kembera xwe ya zêr wê yêra seyragehê hîştîye.”

Qîz dibêjin:

“Em ê herin.”

[Qîza paşê] dibê:

“Na, na. Hûn hema li vira du deqa li hêviya mi bisekinin. Ez ê penc deqa da herim hildim werim.

Qîzik diçe kembera xwe hildide. Hema hirçek lê derdikeve. Qîzikê digre davêje ser milê xwe. Qîz û şivan dine pey, dibê:

“Hola ha hola, hola ha hola!”

Hirç, qîzikê hildide, dikeve kirrekî<sup>120</sup> mîtanî<sup>121</sup> vî kîrê me ye Tendûlekê. Millet hewariyê dine paşê, dibê:

“Hal-hewalê iha ye. Hirçê, qîza te a bi vî terî hilda bir. Wiha ye.”<sup>122</sup>

### 3. 8. A2. Êrîşkar objeyeke sêhrî didize an jî direvîne.

*Di Çîroka Dunya Gozeliyê de Hiseyn [leheng] meraq dike û diçe dîtina Dunya Gozeliyê [tawankar/êrîşkar/fesad/xayîn]. Dunya Gozelî jî çaxê çavê wê bi Hiseyn dikeve dizane ku Hiseyn dil-hinavê Teyrê Ne'ma xwariye û Dunya Gozelî seva ku dil-hinavê Teyrê Ne'ma ji Hiseyn bidize wî vedixwîne koşka xwe û paşê jî bi awayekî dil-hinavê Teyrê Ne'ma ji Hiseyn didize.*

*Di çîrokên cadûyî yên ku me li Ebexê berhevkerî de hokarên cadûyî yan ‘kum’<sup>123</sup> e ku gava meriv wî kumî dide serê xwe meriv her kesî dibîne lê ti kesek merivan nabîne; yan ‘qamçî’<sup>124</sup> ye ku meriv gava ku qamçî li erdê dixê yan ‘efrît an jî cin li ber meriva hazir dibin û dikevîne bin emrê merivan;*

118 ) Hazirî, amadekarî.

119 ) Cî, cih, der.

120 ) Çîyayên volkanîk.

121 ) Mîna.

122 ) Harûnê Zava, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1974, Dema çîrokwergirtinê: 23 Îlon 2016, Çîroka Eybezê Xaz-Kurê Hirçê-Nebyê Paşê [Paşayê Misrê], r. 1-2

123 ) a) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05

Cotmeh 2016, Çîroka Hesen Hiseyn, r. 11 b) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 19

124 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 19

yan *'sifrik'*<sup>125</sup>e gava ku li 'erdê tê raxistin te'amên cinnetê hemû li ser hazir dibe; yan *'bilûr'*<sup>126</sup>e gava ku pîfî bilûrê dibe 'efrît li ber merivan hazir dibin û dikevîne bin emrê merivan.

Efendim, [Hiseyn] diçe deste kincê temîz xwe dike. Efendim, sinêke zêr tijî zêr dike. Efendim, dide ser serê esnafekî, merivekî. Rê dikeve diçe. Diçe. Wextê diçe, ew mervê dinê hemû bayilmîş<sup>127</sup> dibin, cake<sup>128</sup> tîn. Dunya Gozel ça çehv dikeve, dibê:

“Eheyyy Hiseyn! Ez 'esmîn te digirim tu 'erdê dest mi ketî. Mala te, tu heta niha li ku bûyî?”

Dizane, da. Dunya Gozel, çima dibêjin Dunya Gozel? Dibê:

“Were hindir.”

Ewê din hemû bayilmîş dibin. Hiseynê te diçe. Efendimê xwe ra bêjim, Hiseyn kêleka Dunya Gozelê rûdinê. Dibê:

“Mala te xira be. Tu heta niha li ku bûyî?”

[Hiseyn] dibê:

“Welle...”

Efendimê xwe ra bêjim, qazekî şerjê dike. Davêje ser goşt-birinc, dixê kêş. Efendim, ew [û] Hiseyn duxwin. Êvar tê. Dibêje carîyê, dibê:

“Carî, qawekî çêke. Şîr-şekir çêke, bîne. Ez-Huseyn buxin. Em razên.”<sup>129</sup>

[Carî] dibê:

“Baş e.”

Wextê carî qawê çêdike, ew radibe dermanê nehişê berdide fîncana Hiseyn. Efendim, wextê berdidê, dibê:

“Hiseyn, de buxwe. Mala te neşewite.”

Hiseyn wextê duxwe, bayilmîş dibe. Bayilmîş<sup>130</sup> dibe. [Gozel Dinya] dibêje carya, dibê:

“Herin, isa evî bikên, isa bikên, tiştêk devê wî dertê. Wextê derket, hûn ê li avê xin, binîn. Ez ê qurt kim.”

Dil-hinav bûye, da. Dizane, da. Wextê isa dibêje, isa dikên, isa dikên, hilqînî dikevê, vedireşe. Hiseyn dibin, davêjne cîkî kîjan pîslik<sup>131</sup> e, davêjne wê derê. Ew dil-hinavê teyr bûye. Efendim, li avê dixê, qurt dike.

125 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 11

126 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 14

127 ) Jixweveçûn.

128 ) Dîsa, careke din.

129 ) Li Ebexê û li derdora Ebexê bo vexwarina tiştên şîlemenî peyva 'xwarin'ê tê bikaranîn.

130 ) Jixwevaçûyîn.

131 ) Gemar, qirêj, qilêr.

Hiseyn wextekî çehvê xwe vedike. Dêna xwe dayê, çi? Êvar hat. Nava pîslikekî da ne. Belengaz e. Dide serê rê.<sup>132</sup>

### 3. 8. A3. Êrîşkar zevîyan talan dike an jî zirar dide zevîyan.

### 3. 8. A4. Êrîşkar ronahîya rojê direvîne.

Li gorî Mezher Ibrahîmî, Propp amaje bi tawana “dizîna ronahiya rojê” dike ku di çîrokên kurdî de nayê dîtin. Lê li hember [vê tawanê] du şêwazên tawanê [din] di van çîrokan de hene ku li çîrokên rûsî [de] ew nehatine destnîşankirin. Ev du şêwaz wisa:

- **Tawankar çavkaniya ava vexwarina xelkê dagir dike û li hember [wê] jî qurbanîkirina keçikan dixwaze, her car ji bo demeke kurt pêşîya avê berdide.**

- **Tawankar, qurbanîyan mecbûrî karên dijwar dike.**<sup>133</sup>

**3. 8. a) Tawankar çavkaniya ava vexwarina xelkê dagir dike û li hember [wê] jî qurbanîkirina keçikan dixwaze, her car ji bo demeke kurt pêşîya avê berdide.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme de dêw [tawankar] xwe dide pêşîya ava vexwarina şîher. Xelkê şîher jî ji bo ku dêw bo demeke kurt li pêşîya avê derbikeve heftê carekî qîzekî wek qurbanî pêşkêşî dêw dikin.*

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ez wusa tî me. Ez tî me, dayka pîr.”

De, av tine bûye. Zîha dikeve ber ewê [ava] wana. Dayka pîr jî metel dimîne. Av tine bidê. Heşa, diçe dimîze. Avê tîne didê. Duxwe, dibê:

“Dayîka pîr, ev av çîqa şor bûye.”

[Pîrê] dibê:

“Kurkê min, îja çi te veşêrim çi xwedê veşêrim. Te av xast. Av tine bû. Av tine. Heşa, mi mîstîye, mi anye daye te. Yalniz, zîhak heye. Zîha dikeve ber ava me. Heft roja carekî; qîzekî, heft ‘erebê ga yîyecek<sup>134</sup>, du ga, nizanîm çi çi, qîzekî dine ser. Zîha duxwe, hûf dike. Paşê xwe dide alîkî, av tê. Em ava xwe hildidin heftêkî carekî.”<sup>135</sup>

132 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 9-10

133 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmena Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafîk Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 96

134 ) Xwarin.

135 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 8

### 3. 8. b) Tawankar, qurbaniyan mecbûrî karên dijwar dike.

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de dêw [tawankar] museletî şiherekî dibe û ji ber wê jî qurbaniyan mecbûrî karên dijwar ên weke çekirina sûrekî li dora şihê û di wextekî şûnde qedexekirina hildan û berdana nava şihê dike [tawankar, qurbaniyan mecbûrî karên dijwar dike].*

Dibê wexta ku diçe, rastî şiherekî tê. Îja şihê çî ye? Dibê dêw li wî şihê misellet bûye. Bişev, mexrevê şûnda ne kes diçe derê malê, padşê yasax kirye, ne jî hildine hundur. Ji derva kê were hilnane hundur, ji hundur kêşî bernadin here derê malê. Bona dêw dora wê [şihê] sûr kirye. Dergevan daye ber dêrî, nahêle kes here were. Bişev, mexrevê şûnda kes dernakeve nagere.

Dibê eva diçe dora şihê digere, digere, digere, digere...Tu dergeyekî nabîne. Tê ber derî, dêrî dixê, dibê:

“Qurban, ez dewrêşek im. Çola mame, mexela mame. Derî mi veke ez werme hindir.”

Haşa ji hizûra we, [dergevan] dibê:

“Yawo, kuro kurê kerê, ti nizanî padşa ku pê bihise yê serê mi lêxe. Mervê mexrevê şûnda nayê hundir, yê hundur nane derê malê.”<sup>136</sup>

### 3. 8. A5. Êrîşkar kiryarên xwe yê dizîyê an jî revandinê bi rengêkî dî dike.

#### 3. 8. A6. Êrîşkar zirar dide bedena kesan

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de gava ku dêwê heftirih [tawankar an jî êrîşkar] Gul [lehengê qurbanî] bi hespê wî ve hildide dibe davêje bîrê, dêwê heftirih heftê carekî tê û tiliya Gul a qilîçkê dimijê [tawan].*

*Divê neyê jibîrkin ku di çîrokên cadûyî/derasayî yê kurdî yê ku me li Ebexê berhevkerî de wer xuyaye tawankar gelek caran însanên hêzdar ên wek qîral, padişah, paşa û wezîr in. Hin caran bûnewerên wek pîra sêhr in. Gelek caran giyanewerên wek dêw, dêwê hefruh, dêwê heftserî, zîha û zîya ne. Gelek caran jî dirrindeyên çolê yê wekî hirçan in.*

Em werin ji Gul xeber din. Gul çî dike? Dibê dêw, dêwê hefruh e. Heftê carekî tê tiliya Gul e qilîçkê dimije, xûnê jê ret<sup>137</sup> dike. Gul dikeve xwe va diçe, dêw diçe. Heta hefta wî tamam dibe, dîsa

136 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebex-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 9

137 ) Xilaskirin, kutakirin, dawîlêanîn.

Gul ser hemdê xwe da tê. Dêw dîsa tê tilîya wî dimije, xûnê jê ret dike. Dîsa ew dikeve, nehîş dikeve. Eva [dêw] derdikeve diçe<sup>138</sup>.

### 3. 8. A7. Êrîşkar dibe sebab ku yek nişkê ve hunda bibe.

*Di Çîroka Hebkahinarê de jî çaxê ku Hebkahinarê [leheng] bi hevalên xwe ve derdikevine çolê bo berhevkirina pincarê, pincara xwe berhev dikin. Êvar li ser wan de tê û bi pincara ku ji xwe re çinîne ji xwe re kolikekî çêdikin û tê de radizên. Lê gava ku Hebkahinarê sibê zû ji xewê radibe dêna xwe didê heft dêw li ser serê wê sekinîne û hevalên wê ew tenê hîştine û çûne .*

*Di çîrokên kurdî yên cadûyî yên ku me li Ebexê berhevkirî de û di Çîroka Hebkahinarê de jî wextê ku keç û jin derdikevine çolê bo berhevkirina pincarê an jî derketina derva bo seyrangehê berze dibin ango winda dibin. Ji ber wê di çîrokên kurdî yên cadûyî/derasyî de û di çîrokên ku me li Ebexê berhevkirî de motîfa ‘derketina derva ya qîz û jinan bo berhevkirina pincaran an jî derketina derva ya qîzan bo seyrangehê’<sup>139</sup> motîfeke berbelavtir e.*

Hebe nebe rehme li dêbavê hazira be.

Hebû, qîzîkek [Hebkahinarê] bû, cîya wê bû, bavê wê bû. Qîzîk radibe diçe nava gund. Dibêje qîzê hevalê xwe, dibê:

“Em herne pincarê.”

Radibin diçe pincarê. Xwe ra diçe pincarê. Serê xwe dixne ber xwe, xwe ra pincara xwe diçinin. Isa jî pincar çinîne, hebe bîst torbe tijî pincar kirine. Serê xwe bilind dikin, dêna xwe dinê, hema êvar e. Êvar li wan ketye. Ewa qîzka dibêje hevalê xwe, dibêje:

“Ka em ê çax bikin? Çax nekin? Ka îja dereng e. Em ê çax bikin?”

Radibin. Hema pincara xwe, xwe ra dixne kolik, hêmû tê da radizên. Qîzîk, sibê zû radibe. Qîzîk radibe, dêna xwe didê, hevalê wê libek tine ne. Libek hevalê wê tine ne. Hema ewa liba tenê dimîne. Ewa tenê dimîne. Qîzîk, sibê zû radibe, şeveqa tarî ye. Radibe, dêna xwe didê, heft dêw ser ra sekinîne<sup>140</sup>.

### 3. 8. A8. Êrîşkar qurbanê/a xwe mecbûr dike ku tiştêkî bike an jî bi zorê tiştêkî jê digire.

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de Mecûsî [êrîşkar/tawankar/fesad] bi awayekî Hesên [lehneng/qurban] dibîne û wî bi şeklekî dixapîne û mecbûr dike ku Hesên dişîne serê çîyayekî. Li*

138 ) Nûredînê Xelkê Xaç, h.ç., r. 7

139 ) Harûnê Zava, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1974, Dema çîrokwergirtinê: 23 Îlon 2016, Çîroka Eybezê Xaz-Kurê Hirçê-Nebyê Paşê [Paşayê Misrê], r. 1

140 ) Amojna Suhbet, Gundê Şerefexanê Jorê-Ebexe-Wan 1973, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Hebkahinarê, r. 1

*serê wî çîyayî Hesên ji Mecûsî re cewheratan berjêr dike.*

Neysene<sup>141</sup>, eva çûn. Cîkî peya bûn. Dibê nizam kafirî xand, ça kir? Qantirek li ber hazir bû. Qantir li ber hazir bû. Dibê ew [û] gede li qantirê sîyar bûn. Dibê çûn. Çûne cîkî muwate<sup>142</sup>. Dêna xwe dayê, çîyakî wisa bilind e! Tişteki 'ecayîb! Em bêjin, dêna xwe dayê, dibê de îja bi sêrê, sêr e. Gede kire nav postekî, postekî dêva. Em bêjin pêça, ça kir, filan? Dibêje dibê, gote gede, go:

“Kuro, binêrê! Li vira, niha teyrê werin, te hildin biherne serê wî çîyayî bilind. Li serê wî çîyayî kevir hene. Kevir, yanî hemû cewharat e, yanî zêr e, zîv e, filan. Tê kewkî kî, kewkî kî, tilol kî. Yê werin, werin. Wexta ku mi gote te da, idî bes e. Ez ê rê nîşanî te kim, tê werî.”

Ê gedê qijik idî dikare bê na. Eva [Mecûsî], bi wî qirareyî dike.<sup>143</sup>

### **3. 8. A9. Êrîşkar berê yekî/ê dide.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme de ji ber jêhatîbûna Mîrze Miheme [leheng] jinbavên wî [xayîn/fesad/tawankar] rikên xwe dikutine Mîrze Miheme û dîya wî [leheng/qurbanî]. Ji ber wê jî jinbav bi dek û dolaban paşa dixapînin û paşa mecbûr dikin ku paşa emrê derkirin û dûrkirina Mîrze Miheme û dîya wî dide.*

Dide destê du hev xulama, dibê:

“Hûn ê biherin serê filan çîyayî herdika bikujin. Kirasê herdika<sup>144</sup> mi ra xûnê da kin hildin bînin werin.”

Xulam dibê:

“Baş e.”

Herd xulam hildidin dibin. Hildin biherin. Dibê rê da diçin, jinik dibêje herdika, dibê:

“Yawo, werne vira. Ez ê kirasê xwe, kirasê gedê xwe bime we. Biherin, teyrêkî-tûkî bikujin, tê da kin, hildin biherin bine paşê. Paşa ku ra ketye heyra xûna me. Hûn ê bikne belaya serê xwe.”

[Herdu xulam] dibê:

“Baş e...”<sup>145</sup>

### **3. 8. A10. Êrîşkar ferman dide ku yek bi nava behrê de bê avêtin.**

141 ) Werhasil.

142 ) ?

143 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefîxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 6

144 ) Herdu.

145 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 3



Di çîrokên kurdî yê cadûyî/derasayî yê ku me li Ebexê berhevkerî de yan qurbanî yan jî leheng bi awayekî sêhrî li **'ade an girava nava heft behran'** tê şandin. Ji ber wê di çîrokên kurdî yê cadûyî yê ku li Ebexê berhevkerî de xistina nava **'ade an girava nava heft behran'**<sup>146</sup> jî hêmanek e girîng û berbelavtir e.

Di Çîroka Hesên Hiseyn de jî Dunya Gozêlî [tawankar], Huseyn [lehengê qurbanî] dixê **'ade an girava nava heft behran'** [tawan].

De rûdinên. Dîsa nan, av, çay-may... Efendimê xwe ra bêjim, êvar dikeve ser. Wextê dîsa jehrê didê, bayilmîş<sup>147</sup> dibe. Davêje ada heft behra. Hiseyn davêje wira.<sup>148</sup>

### 3. 8. A11. Êrîşkar li yekê/î an jî tişteki sêhrê dike. (Wî/wê bi sêhrê vediguherîne tişteke dî)

Tilism di çîrokên kurdî yê cadûyî/derasayî yê ku me li Ebexê berhevkerî de zehfî caran wek **'sêr'** an **'sêhr'** jî derbas dibe. Her wisa di Çîroka Hemze Pelevan de, wexta ku Hemze Pelevan [lehengê çîrokê] tilisma li ser Xeremcoyê [qurbanî] betal dike pîra sêhr [tawankar/xayîn/fesad] bi Xeremcoyê dihise û paşê jî tilisma rihê Hemze Pelevan zêft dike.

Gava ku pîra sêhr tilisma rihê Hemze Pelevan zêft dike êdî Hemze Pelevan hemû hewl û hêza xwe ji bo betalkirina tilismê û ji bo ji holê rakirina pîra sêhr xerc dike [Lehengê çîrokê bi mebesta rûbirûbûna ligel tawankar an ji bo nehiştina kêmasiyan tê meydanê û erk û şexsiyetên din bi dû xwe re dihîne].

Di çîrokên cadûyî yê kurdî yê ku me li Ebexê berhevkerî de motîfa tawankara jin zêdetir an **'pîrê'**<sup>149</sup> ye an jî **'pîra sêhr'**<sup>150</sup> e.

Hemze diçe nêçîrê. Pîrê dibêje Xeremcoyê:

“Xeremco, eva têjkê qureyşîya yê namidar ruhê xwe dizanin. Pelevan in. Dizanin tusulmata rehê

146 ) a) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 19 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 5-6 b) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Mervê Meraqdar, r. 6

147 ) Jixweveçûyîn.

148 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 14

149 ) a) Amojna Suhbet, Gundê Şerefxanê Jorê-Ebexe-Wan 1973, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Fatmayê, r. 2-4-5-7 b) Amojna Suhbet, Gundê Şerefxanê Jorê-Ebexe-Wan 1973, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Hebkahinarê, r. 3 c) Harûnê Zava, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1974, Dema çîrokwergirtinê: 23 Îlon 2016, Çîroka Eybezê Xaz-Kurê Hirçê-Nebyê Paşê [Paşayê Misrê], r. 5-7

150 ) a) Amojna Suhbet, Gundê Şerefxanê Jorê-Ebexe-Wan 1973, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Fatmayê, r. 2 b) Amojna Suhbet, Gundê Şerefxanê Jorê-Ebexe-Wan 1973, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Pîra Sêr, r. 1

wan ku da nin.”

[Xeremco] dibê:

“Ê pîrê ez ça b’kim?”

[Pîra sêhr] dibê:

“Tu xwe bavêje nexaşîyê. Ew carna diçe nêçîr-mêçîrê. Ez ê te ra tusulmata<sup>151</sup> rehê wî bigrim. Tu jî xwe ra pê tusulmata ruhê wî dileyîzî hetanî tê.”

[Xeremco] dibê:

“Pîî, erê welle.”

[Pîrê] pênc-şeş nanê hişk dixê binçenga Xeremcoyê. Duduya jî dide ser serê Xeremcoyê. Gazî dike, dibê:

“Hemze, Xeremco nexaş e.”

Hemze direve tê. Dêna xwe didê, çi? Xeremco isa nexaş e, dimre. De îja hev dixapînin. Dibê Xeremco iha xwe dide ser alîkî, dibê:

“Hemze, ez dimrim. Parxanê mi şikestin. Zû bêje ka tusulmata rehê te ku da ne.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Heyran, tusulmata rehê minê ku be? Pitê<sup>152</sup>, tu çi bî ez jî ew im.”

[Xeremco] dibê:

“Na, tê bêjî.”

[Hemze Pelavan] dibê:

“Tusulmata ruhê mi gêzîyê da ne.”

Pîrê êvar da dikeve ser gêzîyê, gêzîyê dixemilîne. Qebza<sup>153</sup> gêzîyê şil dike. Diçe ser ra disekine. Pîrê dibê:

“Na. Xeremco, Hemze virra dike.”

[Pîrê] cake<sup>154</sup> isa dike. Hemze dibê:

“Xeremco, tê sirra mi beyan kî. Welle, wexta qebza şûrê mi şil be, ez ne mirî me ne mayî me.”

Dibê pîrê şebeqa subê radibe. Dibê qebza şûrê wî şil dike. Diçe serê xwe dide ser qelbê wî, dibê:

“Erê. Hemze ne mirî ye ne mayî ye.”<sup>155</sup>

### 3. 8. A12. Êrîşkar yekê/î dixê dewsa yekê/î dî.

151 ) Tilsim, tilism.

152 ) Bo bangkirina keç û jinan tê gotin.

153 ) Destik.

154 ) Dîsa, careke din.

155 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan r. 9-10

*Di Çîroka Mîrze Miheme-Gozel Dunyayê de berîya ku Mîrze Miheme [lehengê rasteqîn]û bi seyîsê xwe, bi ‘Elo [êrişkar/tawankar/xayîn/fesad] ve derbikevine rê, ‘Eloyê Seyîs nanê bixwêy dide hazirkirinê. Wexta ku her du derdikevine rê, ‘Eloyê seyîs di rê de nanê xwe û nanê Mîrze Miheme bi hev diguherîne. Wexta ku Mîrze Miheme nanê bixwêy dixwe zehf tî dibe û dibêje Êloyê seyîs dibê, têkeve bîrê û ji me re avê derbixe. ‘Eloyê jî bi şertan dikeve bîrê û avê derdixe. Di axirîyê de ‘Elo bi şertê ku Mîrze Miheme şûr-gurzê xwe bide wî dikeve bîrê û gava ku ji bîrê derdikeve êdî hukim hemû dikeve destê wî [êrişkar yekê/î dixwe dewsa yekê/î dî].*

‘Elo dikeve bîrê, avê derdixe. Mîrze Miheme avê duxwe, avê dine hespa. ‘Elo, şûr-gurz hildide. ‘Elo wextê şûr gurz hildide, evna sîyar dibin. ‘Elo dibêje Mîrze Miheme, dibê:

“Mîrze Miheme ez im, tu jî ‘Elo yî. Axa ez im, seyîs tu yî. Axa ez, seyîs tu.”<sup>156</sup>

### **3. 8. A13. Êrişkar ferman dide ku yek bê kuştin.**

*Di Çîroka Rostemê Zal de padişahê şîher [êrişkar/tawankar] li ser bêbextîya jinekî fermana kuştina hemû jinên ku di şîherî wî de ne dide û di berdewamiya çîrokê de erka lehengê çîrokê, yanî erk û wezîfeya Rostemê Zal [leheng], ji bo betalkirina fermana kuştina jinan hewl dide û tê meydanê.*

Wexta ku dertê, dibê gazî Rostem dike, dibê:

“Bax<sup>157</sup>, ez derketim. Em bê, heta şeş meha ez nayêm. Wexta ku heta şeş meha ku ez çûm nehatim, ez wexta ku werim, yanî jinekî-qîzekî, yanî jin qismî di şehrê xwe da nebînim. Tu serê hemûka jê kî.”

[Rostem dibê]:

“Heyran, padişah, çakî<sup>158</sup> dibe? Filan...”<sup>159</sup>

### **3. 8. A14. Êrişkar yekê/î dikuje.**

*Di Çîroka Navçekerê Kurê Îza de padişahê şîher bavê Navçeker [Wezîr Îza] bo berhevkirina xeraca heft salan dişîne welatekî din. Gava ku Wezîr Îza diçe welatê din bo ‘berhevkirina xeraca*

156 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 29 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Gozel Dunyayê, r. 6

157 ) Binêre, binêre.

158 ) Li Ebexê li şûna ‘bi çi awayî, çawa’ tê bikaranin û zêde-zêde tê bikaranîn.

159 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Rostemê Zal, r. 4

**heft salan'** wezîrê padişahê wî welatî [tawankar/êrîşkar], Wezîr Îza bi awayekî dikuje. Piştî kuştina bavê Navçeker, Navçeker [leheng] bo rûbirûbûna tawankar hewl dide û çîroka me ya cadûyî/derasayî bi awayî dewam dike.

Jixwe motîfa '**berhevkirina xeraca heft salan'** di çîrokên kurdî yê efsanewî û yê ku me li Ebexê berhevkirî de motîfeke serekî ye. Gelek caran li ser '**berhevkirin an berhevnêkirina xeraca heft salan'** şer diqewime.

Dibê Îza cake qol bilind kir, ew kêrana, mengene ha gêrî<sup>160</sup> ji hev çû. Dibê îja wezîr gote Îza, go:

“Îja çika tu were denemîş<sup>161</sup> ke. Bikeve nav, e te denemîş kim.”

Dibê de arqadaşê<sup>162</sup> hev in, samimî ne, bi îyî<sup>163</sup> nîyet. Hanî<sup>164</sup> dibêjin ya, ku cara te dî însanê me ew dibe, dibê îyî nîyet sûtîstîmal dibe. Dibê ew jî bi dilê xwe yî xaş, dilê xwe yî geş, germ, saf, dibê wextê wezîrê paşê qol bilind kir, dibê Îza xwe di nav da dirêj kir. Dibê [wezîr] qol berjêr kir, dibê bîrden<sup>165</sup> basmîş<sup>166</sup> kir. Dibê Îza gotê go:

“Bedena mi diêşe, kêr di bedena mi da rûdinê.”

Dibê ewî hîngî dest da ser qol, qol hesabîyle<sup>167</sup> basmîş kir. Dibê carekî zivirî, ew kêrana hemû di bedena Îza da rûniştin. Dibê Îza ma di wî halî, di wir da. Dibê deket, derî dada. Dibê derî dada.

Dibê sibe zelal bû, evî hat dêna xwe dayê, erê, Îza ruh dide, tesmîl<sup>168</sup> dibe. Dibê go:

“Îza qeyb e, Îza hatîye kuştinê.”

Dibê ew xercê beravkirî<sup>169</sup>, dibê tekrar hemû ma. Dibê ew mervê paşê, heçî hatne şerjêkirinê, heçî hatne kuştinê, heçî canê xwe xilas kirin. Dibê her kes ji hev revî. Werhasil dibê heft sal arê<sup>170</sup> da derbas bû. Yê çûyî ku hatin, dibê ji paşê ra uzuntîya<sup>171</sup> xwe anîne ziman, go:

“Hal mesele a iha. Mesele bû ev.”

Dibê wextê go Îza hatîye kuştinê, dibê îja padşê jin-zarê Îza xweyî kir. Ji wan ra nifaqe dexist,yîyecek<sup>172</sup>, go:

---

160 ) Paşve, paşda.

161 ) Ceribîn.

162 ) Heval.

163 ) Pak, baş.

164 ) Wiha.

165 ) Di derbekî de, yekcar, ji nişka ve.

166 ) Pêlêkirin.

167 ) Bi hesabi xwe.

168 ) Teslîm, mirin.

169 ) Berhevkirî.

170 ) Nav, navber.

171 ) Kerb, keser, kovan.

172 ) Xwarin-vexwarin.

“Ji xezîne pere yardimî<sup>173</sup> çî ihtîyaç<sup>174</sup> hebe bikin.”<sup>175</sup>

### 3. 8. A15. Êrîşkar yekê/î di cihekî de kilît dike an jî davêje zindanê.

*Di Çîroka Mîrze Miheme de çîrokbêj hin caran dibêje ku Mîrze Miheme li pey zîhê çû û kete kûlê<sup>176</sup> û hin caran jî dibêje ku Mîrze Miheme çû kete bîrê, lê çîrokbêj herî dawî dibêje ku birayên Mîrze Miheme wî di bîrê de kilît kirî dihêlin. Wexta ku Mîrze Miheme [leheng] li pey zîhê diçe dikeve bîrê ku zîhaya birîndar bikuje birayên wî [tawankar/êrîşkar/xayîn/fesad], wî di bîrê de kilît kirî dihêlin.*

*Erk û tevgera ‘xistina nava bîrê an kûlê’ di çîrokên derasayî yên ku me li Ebexê berhev kirî de gelekî berbelav in.<sup>177</sup>*

Wextê nêzkaya derkeve, kêrê davêjnê, Mîrze Miheme bîrê da dimîne. Yalnız, [qîzik] dibêjê, dibê:

“Hine peyn wê derê, qulçekî ye. Ewî qulçî veroje. Tê berjêr bî. Derîkî piçûk heye wira. Kilîtek jî heye. Kilît nav rîyê ewê da ne, zîhê da ne. Yalnız, ewê kilîtê ewî derî xî, beranê wî çaxî derên. Yekî reş e, yekî qerqaş e. Wê li hev xin. Xwe bavêje ser yê qerqaş. Tê derkevî dunya rehnayî.”<sup>178</sup>

*Di Çîroka Memo Zîne de wexta ku Memo [leheng] bi Mîr re li ser şertê şandilxwaz kişik dileyze, Beko [tawankar/êrîşkar/xayîn/fesad] dêna xwe didê wê Memo listika kişikê qezenc dike, demildest xwe digihîne Zîne [qurbanî] dibê xwe bixemilîne bide ber camê belkî Memo te dibîne û kişikê qezenc dike. Gava ku Zîne xwe bi awayî dixemilîne dide ber camê û çavê Memo bi Zîne dikeve, Memo di listika kişikan de têk diçe û li ser şertê şandilxwaz Memo davêjine zindanê.*

Dibê Beko go:

“Mîr, em ê Memo bavêjne zindyanê. Em ê Memo bavêjne zindyanê. Em ê bavêjne filan zindyanê.”

173 ) Alîkarî, palpiştî.

174 ) Hewcehî, hewcedarî.

175 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergrîtinê: 15 Îlon 2016, Çîroka Navçekerê Kurê Îza, r. 4-5

176 ) Li Ebexê û li derdorê Ebexê ji bo şikeftan peyva ‘kûlê’yê bi kar tînin,

177 ) a) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 6 b) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 12-13 c) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergrîtinê: 12 Îlon 2016, Çîroka Enayî Ahme, r. 13-14 d) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergrîtinê: 29 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Gozel Dunyayê, r. 4-5-6

178 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema wergrîtine: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 6

Baş e. Memo avîtnê zindyanê. De şertê şandilxaz dileyîzin. Memo avîtnê zindyanê. Caw<sup>179</sup> dane Sitiyê, go:

“Welle Mîr, Memo avîte zindyanê.”<sup>180</sup>

### 3. 8. A16. Êrîşkar yekê/fî mecbûr dike ku pê re bizewice.

*Di Çîroka Hemze Pelevan de gava ku tisilmata Xeremcoyê [qurbanî] betal dibe û cihê ku lê ye eşkere dibe, qiralê şîher [tawankar/êrîşkar/xayîn/fesad] bo anîn û zewicandina bi zorê bi Xeremcoyê re, ku Xeremco jî di giraveke nava heft behra de ye, emir dide pîra sêhr. Pîra sêhr jî bi zefkîrîna tisilmata ruhê Hemze Pelevan [leheng] Xeremcoyê ‘bo zewicandina bi zorê’ jî qirala şîher re hildide tîne.*

*Divê neyê jibîrkirin di çîrokên kurdî cadûyî/derasayî yên ku me li Ebexê berhevkerî de gava ku tawankar daxwaza zewicandina bi zorê ji qurbanî dike, qurbanî gelek caran motîfa ‘şûşe an fîncana jehrê dide destekî xwe, kêreke çatme an xencerekî jî dide destekî xwe û dibêje ku heta çil rojî kê li ser min bikeve ez ê vê kêr an xencêrê li serê dilê xwe bixim û vê şûşe an fîncana jehrê jî li ser xwe da bikim’<sup>181</sup> bi kar tîne. Xusûsen motîfên wek ‘jehr, xencer an kêr û çil rojî’ motîfên berbelavtirin.*

[Pîra sêhr] tû şûr dike. Şûr kewkêti<sup>182</sup> orta behrê dike. Tê, digre poleçîka<sup>183</sup> Xeremcoyê. Nava cîyê wê kaş dike. Şîrp<sup>184</sup>, sîlekî davêje peleguha<sup>185</sup> wê, dibê:

“Qiralê şîher bona te dimre. Tu jî hatî ketî paşka<sup>186</sup> vî têjkê qureyşîya.”

[Xeremco dibê]:

“Hemze, Hemze, Hemze!”

[Pîra sêr] dibê:

“Haaa! Mi Hemze mest kirye, tu mayî.”

Pufî Xeremcoyê dike, dike sêvekî, dixê binê cêva xwe. Tê, kûpê xwe ji behrê kaş dike. Mehrê

179 ) Cab, cewab, bersiv.

180 ) Silêmanê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1953, Dema çîrokwergirtinê: 5 Cotmeh 2016, Çîroka Memo Zînê, r. 6-7

181 ) a) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 6-7 b) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 20 c) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 19 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 11

182 ) Dûravêtin.

183 ) Por, pirç.

184 ) Dengê lêxistinê.

185 ) Binê guh.

186 ) Paşil, paxil.

xwe ji nava kûp derdixê. Puf dikê, mehrê wê dibe qamçî. Davêje nava kûp. Tê, derbasî şîher dibe.<sup>187</sup>

### 3. 8. A17. Êrîşkar, [qurban] bi xwarinê ditirsîne.

*Di Çîroka Mîrze Miheme de zîha/dêw [tawankar/êrîşkar] xwe dide pêşîya ava vexwarinê ya şîher û seva ku heftê carekî avê li ser şîher de berde daxwaza xwarina qîzekî û hin tiştên din ji xelkê şîher dike.*

*Di çîrokên kurdî yên cadûyî yên ku me li Ebexê berhevkirî de tawankar û êrîşkarê [dêw] ku hewl û daxwaza xwarina kesekî/ê dike ji dêw zêdetir wek ‘zîha an jî zîya’<sup>188</sup> tê binavkirin.*

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ez wusa tî me. Ez tî me, dayka pîr.”

De, av tine bûye. Zîha dikeve ber ewê [ava] wana. Dayka pîr jî metel dimîne. Av tine bidê. Heşa, diçe dimîze. Avê tine didê. Duxwe, dibê:

“Dayîka pîr, ev av çîqa şor bûye.”

[Pîrê] dibê:

“Kurkê min, îja çî te veşêrim çî xwedê veşêrim. Te av xast. Av tine bû. Av tine. Heşa, mi mîstîye, mi anye daye te. Yalnız, zîhak heye. Zîha dikeve ber ava me. Heft roja carekî; qîzekî, heft ‘erebê ga yîyecek’<sup>189</sup>, du ga, nizanim çî çî, qîzekî dine ser. Zîha duxwe, hûf dike. Paşê xwe dide alîkî, av tê. Em ava xwe hildidin heftêkî carekî.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Wusa?”

[Pîrê] dibê:

“Erê welle.”<sup>190</sup>

### 3. 8. A18. Êrîşkar her şev bi yekê îşkence dike/diêşîne.

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de wexta ku padişahê şîher [tawankar/êrîşkar] pê dihise ku jina wî jê re bêbextî kirîye, jina xwe dikuje û mudeyekî bêjin dimîne û di şîherê xwe de mêrkirina qîzan*

187 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 19 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 10-11

188 ) a) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 6-7-8 b) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 29 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Gozel Dunyayê, r. 11

189 ) Xwarin.

190 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3] r. 8

*qedexe dike. Padişahê şîher paşê rojê di şîherê xwe de ji xwe re qîzekî dixwaze, dehwata wê dike û sîbetirê jî serê wê jê dike.*

Mudekî, em bê, bêjin dimîne. Mudekî bêjin dimîne. Dêna xwe didê, em bê, îdare nake. Bêjinî îdare nabe. Niha dibê bi vî qirareyî tê, mudekî jî dimîne. Dibê îdare nabe. Dibê di şehrê xwe da dike yasax [ku] kes qîza nade mêr. Dibê eva xwe ra rojê qîzekî dixaze. Em bê, dehwata wê dike. Êvarê diçe cem. Subê jî serê wê jê dike. De padişah e, xwe ra isa dewam dike.<sup>191</sup>

### **3. 8. A19. Êrîşkar şer îlan dike.**

#### **3. 8. a. JI MALBATÊ YEK TIŞTEKÎ HUNDA DIKE AN JÎ DIXWAZE TIŞTEKÎ BI DEST BIXE**

**PÊNASE: KÊMAHÎ**

**SÎMGE: a**

Li gor Mezher Ibrahimî proseya sereke ya çîrokên efsanewî bi rûdana tawan an ji ber kêmasiyan tê destpêkirin. Di rastiyê de erkê “tawan/kêmasî” girîntirîn erk e û şehdamara van cure çîrokan e. Lehengê çîrokê bi mebesta rûbirûbûna ligel tawankar an ji bo nehiştina kêmasiyan tê meydanê û erk û şexsiyetên din bi dû xwe re dihîne.<sup>192</sup>

#### **3. 8. a1. Kêmahîya keçîkekê wek nîşanî, kêmahîya dostekî.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme, Gozel Dunyayê de wextê ku bavê Mîrze Miheme [leheng] dimire Mîrze Miheme li şûna bavê xwe paşatiyê dike. Wextê ku ‘emrê wî dibe panzdeh û şanzdeh salî giregir û rûsipî qîrar didin ku êdî wextê zewaca wî ye û gere bizewice [nebûn an kêmasiya hevjinê]. Li ser vê kêmasî û nebûna hevjinê rûdan dest pê dikin.*

Dîya wî jê ra dibêje, dibê:

“Kurê mi, di filan tarîhê<sup>193</sup> da tu di hemla mi da bûyî, rehmetîyê bavê te heb’ye, me serî l’ apê te da ye, em bûne mêvanê apê te, apê te w bavê te sozekî a wiha dane hev. Niha qîzapa te jî te

191 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 3

192 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 96

193 ) Wext, dem, zeman.



beglemîş<sup>194</sup> dike. Ê şehre te da jî gencê yaşê<sup>195</sup> te seda însan hene. Kes ji boy te, te ra saygî<sup>196</sup>-hurmetekî digrin, hurmeta bavê te hê heye, nazewice. Gerekî tu pêşya wan însana jî bidî vekirinê, bi xwe ra jî karekî bikî.”

Ji dîwanê ra jî cîya wî evî tîne ziman. Her kes ser fikra dîya wî dibne heq sahibî, dibê:

“Gotin ya te ye.”

Mîrze Miheme dibê:

“Dayê, de ji boy rêwitîyê me ra xarin vexarinê tevdîr bike.”<sup>197</sup>

### 3. 8. a2. Pêdivîya bi objeyeke sêhrî wekî sêv, av, hesp, şûr û hwd.

*Di Çîroka Hemze Pelevan de wexta ku pîra sêhr qebza şûrê Hemze Pelevan [leheng] şil dike Hemze Pelevan dikeve halekî nemir û neji û pêdivîya wî bi şûrê wî û bi zihakirina şûrê wî çêdibe.*

[Pîrê] cake<sup>198</sup> isa dike. Hemze dibê:

“Xeremco, tê sirra mi beyan kî. Welle, wexta qebza şûrê mi şil be, ez ne mirî me ne mayî me.”

Dibê pîrê şebeqa subê radibe. Dibê qebza şûrê wî şil dike. Diçe serê xwe dide ser qelbê wî, dibê:

“Erê. Hemze ne mirî ye ne mayî ye.”

Tû şûr dike. Şûr kewkêti<sup>199</sup> orta behrê dike. Tê, digre poleçîka<sup>200</sup> Xeremcoyê. Nava cîyê wê kaş dike. Şîrp<sup>201</sup>, sîlekî davêje peleguha<sup>202</sup> wê, dibê:<sup>203</sup>

### 3. 8. a3. Pêdivîya objeyeke ne sêhrî lê ecêb. Teyrê agir, werdeka pûrtzêr û hwd.

*Di Çîroka Mîrze Miheme [3] de Mîrze Miheme [leheng] seva ku ji bîrê xilas bibe gere xwe bavêje li ser piştê beranê sipî lê, xwe şaş dike û xwe davêje ser piştê beranê reş û heft qat diçe binê erdê. Gava ku heft qat diçe binê erdê, vê carê jî seva ku heft qat ji binê erdê xilas bibe û derkeve dinyaya rehneyî pêdivîya bi Teyrê Sîmirr çêdibe.*

194 ) Li hêviyê li bendê sekinîn.

195 ) Temen, emir.

196 ) Qedir, rêz, hurmet.

197 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 29 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Gozel Dunyayê, r. 2-3

198 ) Dîsa, careke din.

199 ) Dûravêtin.

200 ) Por, pirç.

201 ) Dengê lêxistinê.

202 ) Binê guh.

203 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 10

[Mîrze Miheme] dibê:

“Paşa xaş be, welle, dinê da ez qîzîkê jî hîlnadim. Yalnîz, tê mi derxî dunya rehnayî.”

[Paşa] dibê:

“Heyyy, mala xira be! Ka ez ê te ça derxime dunya rehnayî? Xazila heft sala jî iha bûya, te eva negota. Yalnîz, ez ehdkar im. Mi gotye, kê lêxe zîhê bikuje, ew çî bixaze ez ê bimê.”

[Paşa] radibe, dibê:

“Tu dizanî tê ça bikî?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ça b’kim?”

[Paşa] dibê:

“Teyrê Sîmirr heye. Zîha jî, zîha hevt sal e, [wextê ku] cûckê wê givrik dibin, zîha tê cûckê wê duxwe. Heger ew te xilas ke. Welle, ez te nikarim xilas kim. Dunya tarî, ka ez ê ku ra te derxime dunya rehnayî?”

[Mîrze Miheme] dibê:

- Ê baş e.<sup>204</sup>

### 3. 8. a4. Ji bo kuştina dêwêkî tiştêkî wekî hêka sor kê m e.

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de dêwê heftirih difire tê Gul [leheng]bi hespê wî ve hildide davêje bîrê. Dewê heftirih heftê carekî tê ji tilîya wî ya qilîçkê xwîna wî dimije û wexta ji tilîya wî xwîna wî dimije Gul nehiş dikeve. Ev hal mudreyekî wiha dewam dike û rojekî sê heb kevotk tèn û li ser darekî dilûsin û ji Gul re dibêjin ku ji bo kuştina dêwê heftirih pêdivîya wî bi heft cûcîkên hundirê sandiqeke di odeyekî de heye.*

Ewa jî wisa dibêje. Dibê rojekî Gul radizê. Dêna xwe xwe didê, sê hev kevotk hatne ser serê darê. Darek di hundirê kûlê da ne, dibê:

“Gul, heke tu hişyar bî guhê xwe bide me.”

Di terefê xwedê da tê, dibê:

“Eger tu raza bî guhê xwe rind bide me. Dêwê heftirih tu zemana te bernade. Hetanî tu heyatê hebî dêwê iha bîne serê te. Em ê niha firr din. Sê hev perrê me yê bikevne ‘erdê. Tê bisîmillah bikî, her sê perrê me hildî, li binê darê xî. Kanîkê ber te vebe, kanya avê ber te vebe. Tu bisîmilla bike, li kanye xe, kanî yê bimiçiqe. Dergekê li ber te vebe, li derî xe. Dolabek di hundurê filan odê da ne. Hevt hev cûcîk[ê ku di odê da] rehê dêwê heftirih in. Binhêre, dêw ku bi te bihise, parçê te yî mezin

204 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3] r.11

guhê te nahêle. Nebî nebî ku tu bidî dêw. Ti serê her hevta biqetînî, tê j' dêw xilaz bî. Ku wisa nebe xilazbûna te j' destê dêw tine.”<sup>205</sup>

### 3. 8. a5. Ji bo jîyînê kêmasîya wasiteyên pêdivî, tiştên maqûl.

*Di çîroka efsanewî ya Enayî Ahme de lehengê çîrokê Enayî Ahme merivekî feqîr e [nebûna pere û jiyarê]. Ji ber kêmasiya feqîriyê û bi şêwirmendiya qîza padişêh [qurbanî] Enayî Ahme [leheng]ewilî dibe rêjberê serokkewran û paşê jî bi serokkewran re jî diçe welatên dûr. Jixwe serpahatiya wî jî bi derketina welatê dûr dest pê dike û Enayî Ahme dawîya çîrokê de dibe Tucar Ahme.*

[Kewranbaşî] dibê:

“Tê bejî meznê xwe, lê bişêwire. Tê werî mehekî qatî<sup>206</sup> heywanê mi bî, bibî başpehlîvanê<sup>207</sup> xulamê mi. Meha te jî sî zêr e.”

[Ahme] dibê:

“Bise, ez meznê xwe bişêwirim.”

Meznê xwe dişêwire. Qîzik dibê:

“Erê wellle Ahme. Tê herî bixevitî.”

Sî zêrê xwe pêşin distîne. Diçe ber dewarê wî, heywanê wî. Mestay<sup>208</sup> wan xulam, xizmetkarê wî dike.

Roja wî [Kewranbaşî] tê. Idî mesela yê ji Turkiyayê bar ke here Îranê. Dibê:

“Ahme.”

[Ahme] dibê:

“Ha.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Welle tu werî ser deva bar kî, ser deva em herne Îranê.”

[Ahme] dibê:

“Welle ez nayêm. Kulfetê mi, jin-zarê mi vira dimîne. Ez nayme Îranê.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Yawo, tê werî, miherin<sup>209</sup>. Mehekî me ra werî, miherin. Cake<sup>210</sup> lêxe were.”

205 ) Nûredînê Xelkê Xaça, Gundê Xaça-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 8

206 ) Miqatî.

207 ) Serekpelevan.

208 ) Mezintahî, mezintayî, rêberî, rêvebirî.

209 ) Em herin, em biçin.

210 ) Careke din.

[Ahme] dibê:

“Na welle, ez nayêm. De bise, ez meznê xwe bişêwirim.”

Diçe cem qîzîkê. Qîzîk dibê:

“Ahme, here gazî fotocîkî<sup>211</sup> ke.

Gazî fotocîkî dike, tîne tê fotrafa<sup>212</sup> xwe [û] qîzîkê tev dikşîne. [Qîzîk] dibê:

“Ahme, ez jî hemle me. Xwedê îşê te lê bîne. Here.”

Ahme bi tevî xulamê wî va deva bar dîkin. Şeveqa sibê ra bira rê kevin herin. Idî bi sala here, idî bi zemana here, her xwedê bizanibe<sup>213</sup>.

### 3. 8. a6. Hin formên cuda

**3. 9. AGAHÎYA XERABÎYÊ AN JÎ KÊMAHÎYÊ BELAV DIBE, BI DAXWAZ AN JÎ FERMANEKÊ SERÎ LI LEHENG TÊ DAYIN, LEHENG TÊ ŞANDIN AN JÎ DIÇE.**

**PÊNASE: NAVBEYNKARÎ, KÊLÎYA DERBASÎYÊ**

**SÎMGE: B**

### 3. 9. B1. Hawara alîkarîyê tê kirin, dûrê jî leheng tê şandin.

*Di Çîroka Mîrze Miheme de qîza padişêh [birêker/daner] ku jina Mîrze Miheme [leheng] ye daxwaza alîkarîkirinê jê dike.*

Qîrarê xwe herbê ra dan. Birayo, dibê wexta li hev dixin, dibê hersê qîzê paşê dikevne ewê da, dikevne cama da lê sêr dîkin. Ewa piçûk jî diçe lê sêr dike. Dibê ew herdikê dinê hîngî dine qafê wê, hîngî dine milê wê, lêdixin dikujin hetanî qîzîk êvarê tê. [Qîzîka piçûk] dibê:

“Mîrze Miheme.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ha.”

[Qîzîka piçûk] dibê:

“Bide xatrê xwedê, kuro, xûşkê mi ez kuştim, lawo. Kuro, dibêjne mi te yekî pak bikira, te çûye yekî total kiriye, te yê yek pak bikira, ew jî niha piştî bavê me şer kira.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ha bêjê, subê ez ê filan newalê ra werim, hespekî iha jî sîyar bim.”

211 ) Wênegirek, fotogirek,

212 ) Wêne, rism.

213 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 12 Îlon 2016, Çîroka Enayî Ahme, r. 8-9

[Qîzika piçûk] dibê:

“Baş e.”<sup>214</sup>

### 3. 9. B2. Leheng pêre tê şandin.

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de xebera nexweşîya weremderxistina padişêh û ji bo bidestxistina dermanê werema padişêh çûyîna ‘kurê wezîr-kurê wekîl belav dibe. Li ser belavbûna van xeberan qîza wezîr [prensê/birêker] ji Mîrze Miheme [leheng] daxwaza biestxistina dermanê bavê xwe dike û bo bidestxistina dermanê bavê xwe wî jî dişîne.*

Kurê wezîr, kurê wekîl radibin sîyar dibin. Bira herin dermanê şîrê şêr ‘îyarê şêr da. Eva [qîzika piçûk] isa digrî, tê ber Mîrze Miheme digere, dibê:

“Mîrze Miheme, bide xatrê xwedê xatrê qur’anê tu jî here.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“De here bêje cîya xwe bira mi ra hespekî bişîne. Ez jî sîyar bim herim.”<sup>215</sup>

### 3. 9. B3. Leheng ji mala xwe derdikeve rê.

*Di heman Çîroka Mîrze Miheme [1] de çaxê ku pîrê karesatê ji lehengê çîrokê ji Mîrze Miheme re eşkere dike, Mîrze Miheme jî bêyî ku alîkarî ji wî bê xwestin dikeve rê.*

Şûrekî wî jî hebûye. Xalqê ‘alemê isa hiz dike, şûrê wî jî pê ra ne. Dibê:

“Xwedê hiz ke, sibê dor dora mi zîha ye.”

Tê. Efendim, dêna xwe didê, ‘erebe wêda hat. Efendim, heft ewk birinc çêkirine, heft sîtil birinc e. Efendimê xwe ra bêjim, heft-heyşt pêz e, şerjê kirine. Efendimê xwe ra bêjim, ewa qîzka jî dane ser. Zîha yê wê buxwe. Dane ser pêşya ewê [‘erebê], diçe.

Ew çax dike? Ew, hema wextê ‘erebe rê dikevin, ‘erebê wî çaxî ‘erebê ga bûne, hema li ‘erebê sîyar dibe. Efendim, nan duxwe, goşt duxwe, birinc duxwe.

Qîzik dibê:

“Tu duxwî. Zîha yê te jî buxwe, mi jî buxwe. Bari<sup>216</sup> bira mi buxwe. Tu genc î. Bira te nexwe.”

[Mîrze Miheme] dibê:

214 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergrîtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 18

215 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergrîtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 18-19

216 ) Qet nebe.

“Na. Bi îzna xwedê, ez ê zîhê bikujim.”<sup>217</sup>

### 3. 9. B4. Agahîya felaketê belav dibe.

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de wexta ku padişah bi nexweşîya weremê dikeve û bere bere dengoya nexweşîya padişêh belav dibe.*

Cab tê, dibê:

“Welle paşê werem derxistîye.”

[Mîrze Miheme dibê:]

‘Hahhh! Kuro, werema paşê çî ye?’

Dibê:

“Welle, werem ji bona te derxistîye. Gotye, welle mi qîza xwe daye keçelok, dibê ji bona te werem derxistîye. Gotye, derdê wî jî ew e. Heqa dixtor hatine ser, hekîm hatine ser, gotye, dermanê paşê şîrê şêr di ‘îyarê<sup>218</sup> şêr da ne.’”<sup>219</sup>

### 3. 9. B5. Leheng ku hatiye qewirandin ji mala xwe bo derekî dûr tê birin.

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de wezîrê padişêh [tawankar/êrişkar/xayîn] bi fen û fûtan padişêh dixapîne û padişêh mecbûr dike ku padişah bi fermanekî Gul [lehengê çîrokê] bi Xoce ‘Elî re dişîne dişîne derekî dûr, dişîne Çînê.*

Xoce ‘Elî dibê:

“Paşayê mi, welle ez hatime. Mi eşyayê xwe hemû bar kirye, ez ê herme Çînê. Îja qurbanek lazim e. ‘Edetê padşayê me qurbanekî, eger gak be, eger devek be, eger dewarekî mezin be, dide min. E dibim Gîla Gildavê davêjim. Hût-leheng heta ewê belav dikin, gemiya mi saxlem derbas dibe diçe.”

Wezîr hema nişkavda ji wir radibe, dibê:

“Ê padşayê mi, xwedê j’ te razî be. Merivek heye, kurê Hekîmê Loqma. Zaten en qatîlê şîherê te yê ku te cezalamîş<sup>220</sup> kirye, cezayê giran dayê ew e. Heyfa dewarekî nîne ku tê bidî. Bişîne kurê Hekîmê Loqma bîne. Bira Xoce ‘Elî bihere bavêje behrê, hût leheng ewî buxwin. Bira gemiya ticarê

217 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 9

218 ) Post, çerm.

219 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 18-19

220 ) Cezadan, cezakirin.

me jî derbas be here.”

Ê padşahê qijik haj çî heye. Padişah dibê:

“Gune stîyê we be. E zanim heywan dibe qurban. Wexta ku ‘adetê we ye, hûn însanê qatilkare cezalamîşkirine<sup>221</sup>, cezayê zehf in, ret<sup>222</sup> nabin [dikirine qurban]. Herin bêjne ewê, Hekîmê Loqma bira kurê xwe bişîne.”<sup>223</sup>

### 3. 9. B6. Lehengê ku mehkûmê mirinê hatiye kirin bi dizî serbest tê berdan.

### 3. 9. B7. Straneke dilêş ku wê êşê tîne ziman tê stirîn.

**3. 10. LEHENGÊ KU LÊ TÊ GERÎN QEBÛL DIKE KU BIKEVE NAVA ÇALAKÎYÊ AN JÎ BIRYARA ÇALAKÎYÊ DIDE.** Pirî caran di çîrokê behsa vê kêlîyê nayê kirin lê berîya derketinê teqez e ku biryarek hatiye girtin. Ev kêlî an jî element di çîrokên ku leheng ji bo gerekî derdikeve rê de dertê pêş me.

**PÊNASE: DESTPÊKIRINA ÇALAKÎYA DIJBER**

**SÎMGE: C**

*Di Çîroka Eybezê Xaz, Kurê Hirçê, Nebyê Paşê [Paşayê Misrê] de lehengê çîrokê Eybez wexta ku êdî mezin dibe û dibe bîst-sî salî, biryara çareserkirina kêşeyan fikirên xwe ji diya xwe ra derdibire.*

Qîzîk diwelide jê ra kurek dibe. Kurê wê êpê mezin dibe. Idî şeş-hevt salî dibe, idî deh salî dibe. Idî em bêjin wî çaxî bi sal û zemana, niha jî bi zar û zimana tê gotin, em nizanin. Gede mezin dibe. Rojek, dudu, sisê, meh, sal derbas dibin. Gede dibêje:

“Dayê, eva çî ye? Em hema hundirê vê kûlê, ber pirtî sîtavkeke davêje hundir da nin. Eva çî ye davêje hundir?”

[Dîya wî] dibê:

“Lawo, dunyaya rehnayî heye. Ez qîza paşê me. Iha bi vî tehrî hirçê ez iha girtim, iha anîm, iha kirim.”

Idî xort e. Idî benge-benga gede ye, dibê:

“Dayê, wellehî ez ê derkevme dunyaya rehnayî.”

[Dîya wî] dibê:

“Lawo, hirç yê were me bikuje.”

---

221 ) Cezalêkirî.

222 ) Xilasbûn, kutabûn.

223 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 15

[Kurê wê] dibê:

“Na, îmkan tine ez ê derkevim. Wellehî ez ê derkevim.”<sup>224</sup>

**3. 11. LEHENG JI MALA XWE DERTÊ.** Ev çûyîn ji dûrketina demî ku di sîmgeya *B'yê* de derdikeve pêş me cudatir e. Çûndina leheng ji çûndina qurban cudatir e. Armanca çûndina leheng lêgerînek e lê qurban bêyî armanca lêgerînekê xwe di nava serborîyekê de dîtiye. Di çîrokan de du cure derketin hene. Yek ya leheng ya dî ya qurban e. Vegotin û honak bi piranî li sert leheng teşekul dike. Lê carina dibe ku keçikeke ciwan ji malê derê û kes lê negere. Hingê vegotin li ser serborîyên keçikê teşekul dike. Lewma lehengê lêger hebe an nebe jî ev îşaret heye.

**PÊNASE: ÇÛYÎN**

**SÎMGE: ↑**

*Di Çîroka Navçekerê Kurê Îza de [Navçeker] ji bo ku bizanibe kê bavê wî kuştîye û çawa bavê wî kuştine [lêgrîna kêşeyan] ji malê derdikeve diçe.*

Dibê Navçeker sîyar bû hate derê malê. Xatrê xwe dîya xwe xast. Xwe pê da helalkirinê, go:

“Mi ra di’ a bike.”

Serîyo tu qurbana niga bî, bira Navçeker here. Dibê Navçeker çû. Ji birayê xwe ra bêjim, şîher deket.<sup>225</sup>

**3. 12. LEHENG DI ÎMTÎHAN, LÊPIRSÎN AN JÎ ÊRÎŞEK KU DÊ RÊ VEKE KU EW Ê OBJEYEKE SÊHRÎ AN JÎ ALÎKAREK BI DEST BIXE DE, DERBAS DIBE.**

**PÊNASE: FONKSÎYONA PÊŞÎN YA BEXŞGÊR**

**SÎMGE: D**

Yek ji bexşendeyên girîng di çîrokên kurdî de Xidirê [Xizirê] Zindî ye. Xidir bêyî ti payînê<sup>226</sup>, tê ser rêya leheng û rêya serketin û biarmançgihîştinê nîşanî wî dide. Ev rênimandin hin caran di xewê de rû dide. Carinan dêwek ligel lehengî li hev dike û li beramber anîna kesek an tişteki dêw

224 ) Harûnê Zava, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1974, Dema çîrokwergirtinê: 23 Îlon 2016, Çîroka Eybezê Xaz-Kurê Hirçê-Nebyê Paşê [Paşayê Misrê], r. 2-3

225 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 15 Îlon 2016, Çîroka Navçekerê Kurê Îza, r. 8

226 ) Bêyî ku li benda tişteki an sudekê be. (wer.)



keresteyeke cadûyî pêşkêşî lehengî dike.<sup>227</sup>

### 3. 12. D1. Bexşgêr leheng îmtîhan dike.

*Di Çîroka Mîrze Miheme [2]de wexta ku Mîrze Miheme ji bo bidewstxistina dermanê nexweşîya padişêh ji malê derdikeve diçe Kalê Xizir [bexşende/bexşgêr] tê xewna wî û him cihê dêrmîn jê re dibêje û him jî dibêje wî dibê ev rê rêya çûyîn-nehatinê ye û bi vî awayî wî diceribîne.*

[Kalê] dibê:

“Eva rêya çûyîn-nehatinê ye. Kê vê rêyê çûye gêrî<sup>228</sup> nehatye, venegeryaye.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ew serî ew oxir e, axayê mi. Min sozekî isa hildaye. Ew serî ew oxir e.”<sup>229</sup>

### 3. 12. D2. Bexşgêr silav dide leheng û pirsan dike.

*Wekî ku li jor jî hatiye gotin ‘Kalê<sup>230</sup> an Kalê Xizir’ ku di gelek çîrokên kurdî yên cadûyî/derasayî yên ku me li Ebexê berhevkirî de hêmaneke serekî ye. Di Çîroka Mîrze Miheme [2] de Kalê Xizir [bexşende/bexşgêr] tê xewna Mîrze Miheme [leheng] û bi silav-pirs-bersivê dewam dike.*

Dibê ji şîher derket, hesp berda. Dêlbijiyê hespê kumêt da êgir, dibê hesp l’ ber hazir bû. Dibê gîyîma<sup>231</sup> xwe l’ xwe kir, şûr-gurzê xwe girêda, ‘eba xwe avîte navmilê xwe, dibê serê kumêt berda. Dibê serê kumêt berda.

Ji birayê xwe bêjim, dibê zehf çû. Dibê şev kete ser, li binê darekî raza. Hespê xwe qaş kir, serê xwe avîte xewê. Wextekî hişyar bû, dêna xwe dayê, kalek sekinye s’ tûyê wî da. Dibê [kalê] go:

“Mîrze Mihemedê mi, te ra oxir be.”

Dibê dengê xwe nekir, go:

“Gelo ev xewn e, gerçek<sup>232</sup> e?”

227 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 97

228 ) Şûnda vegeîn.

229 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 29 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 13

230 ) Memedê Xelkê Hacî Ziyaretê, Hacî Ziyaret-Ebexe-Wan 1963, Dema çîrokwergirtinê: 09 Cotmeh 2016, Çîroka Senem Xanimê, r. 13-14

231 ) Kinc, cilûberg.

232 ) Rast, rastî, rasteqîn, heqîqet.

Dibê cake<sup>233</sup> go:

“Mîrze Mihemedê mi, te ra oxir be. Tê ku da herî?”

Dibê go:

“Oxra xêrê, bavêkal. Kerem ke.”

Dibê go:

“Kure mi, tê herî ku?”

Dibê go:

“Ez ê herim, paşa nexaş e, ez ê şîrê şêr di ‘îyarê şêr da [bînim]. Dermanê paşê ew e.”<sup>234</sup>

### 3. 12. D3. Kesekî/ê ku li ber mirinê ye an jî mirî ye, ji leheng dixwaze ku ew alîkariya wî bike.

*Di heman Çîroka Mîrze Miheme [1] de wexta ku cab tê ku dibêjin paşê werem derxistîye, ber mirinê ye û dermanê wî jî ‘şîrê şêr di eyarê şêr de ye’ qîza paşê ya piçûk [prensê/birêker] ku jina Mîrze Miheme [leheng] ye daxwaza bidestxistina ‘şîrê şêr di eyarê şêr de’ [daxwaza rizgarkirina ji mirinê] ji Mîrze Miheme dike.*

Cab tê, dibê:

“Welle paşê werem derxistîye.”

[Mîrze Miheme dibê:]

“Hahhh! Kuro, werema paşê çî ye?”

Dibê:

“Welle, werem ji bona te derxistîye. Gotye, welle mi qîza xwe daye keçelok, dibê ji bona te werem derxistîye. Gotye, derdê wî jî ew e. Heqa dixtor hatine ser, hekîm hatine ser, gotye, dermanê paşê şîrê şêr di ‘îyarê<sup>235</sup> şêr da ne.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Heylê mala te xirabûyî!”

Kurê wezîr, kurê wekîl radibin sîyar dibin. Bira herin dermanê şîrê şêr ‘îyarê şêr da. Eva [qîzika piçûk] isa digrî, tê ber Mîrze Miheme digere, dibê:

“Mîrze Miheme, bide xatrê xwedê xatrê qur’anê tu jî here.”<sup>236</sup>

---

233 ) Dîsa.

234 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 29 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 13

235 ) Post, çerm.

236 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 18-19

### 3. 12. D4. Girtîyek/dîlek ji leheng dixwaze ku ew wî/ê xelas bike.

*Di heman Çîroka Mîrze Miheme [3] de gava ku Mîrze Miheme [lehengê çîrokê] wexta ku li pey zîhayê brîndar diçe û dikeve kûlê seva ku zîhayê birîndar bikuje, di wir de rastî sê heb xwûşken dîlgirtî tê. Ew her sê xwûşkên dîlgirtî bi eşkereyî nebe jî bi zimanê hal daxwaza rizgarkirina xwe ji destê zîhê bi Mîrze Miheme dikan.*

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ê baş e. Ya illa, ya xwedê.”

Her sê qîzka ra dibêje, dibê:

“Hûn çiyê hev in?”

[Her sê qîzik] dibê:

“Em hersêk jî xûşkê hev in. Zîhê, em anîne vira. Zîhê, em anîne kirine vê derê.”<sup>237</sup>

### 3. 12. D4-a. Heman rewş li piştî hatina-girtina bexşgêr derdikeve pêş me.

### 3. 12. D5. Serî li leheng tê dayîn û jê eman tê xwastin.

*Di heman Çîroka Mîrze Miheme [1] de wexta ku şer û pevçûn derdikeve û paşa ber bi têkçûnê ve diçe, qîza paşê ya piçûk [prensê/birêker] ku jina Mîrze Miheme [leheng] ye daxwaza têvlêbûna şer [eman jê xwastin] ji Mîrze Miheme dike.*

Qirarê xwe herbê ra dan. Birayo, dibê wexta li hev dixin, dibê hersê qîzê paşê dikevne ewê da, dikevne cama da lê sêr dikan. Ewa piçûk jî diçe lê sêr dike. Dibê ew herdikê dinê hîngî dine qafê wê, hîngî dine milê wê, lêdixin dikujin hetanî qîzik êvarê tê. [Qîzika piçûk] dibê:

“Mîrze Miheme.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ha.”

[Qîzika piçûk] dibê:

“Bide xatrê xwedê, kuro, xûşkê mi ez kuştim, lawo. Kuro, dibêjne mi te yekî pak bikira, te çûye yekî topal kiriye, te yê yek pak bikira, ew jî niha piştta bavê me şer kira.”<sup>238</sup>

237 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergerîtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 4

238 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergerîtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 18

### 3. 12. D6. Du kesên ku gengeşe dikin ji leheng dixwazin ku ew xenîmetê li wan pare bike.

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de Hesên [leheng] diçe cihekî, dêna xwe dide du zarok li ser parvekirina kum û qamçîyekî, ku mirata bavê wan e, şe dikin. Li ser daxwaza wan her du zarokan Hesên jî dixwaze ku xenîmeta bavê wan li wan parve bike.*

Dibê qedereke pirr diçe. Dêna xwe didê, du zar li wê derê, em bê, iha tartişmîş<sup>239</sup> dibin. Dibêje dibê, diçe cem wana. Dibêje, dibê:

“Kuro, hûn çima iha dikin?”

[Herdu zarok] ‘erebî dibêjin, dibên:

“Welle, ‘emo, yanî apo. Eva kum e, eva jî qamçî ye. Yanî herdik<sup>240</sup> jî bavê me da mane. Meriv kum dide serê xwe nayê xuyan. Qamçî jî hukmî wî zehf e. Gava te li ‘erdê da, sêzde hev padşahê cina, yanî em bê, padişah çîqa esker bin emrê wan da ne, dikevne bin emrê mêriv.”

Ewî mezin dibêje, dibê:

“Mi gotiye ez mezin im. Qamçî mi ra, kum te ra. Ew jî dibê, na. Kum te ra, qamçî mi ra. Em tartişmîş<sup>241</sup> dibin.”

Îja [Hesên] dibêje:

“Ez ê şerî’eta we bikim.”

[Herdu bira] dibên:

“Ê de tê ça bikî?”<sup>242</sup>

### 3. 12. D7. Daxwazên din.

*Di Çîroka Hesên Hiseyn de dawîya dawî Dunya Gozelî [tawankar/êrişkar/xayîn] daxwazeke din ji Hiseyn [leheng] dike û dibêje ku tê herî li filan derê merivek heye û li hespekî boz sîyar e. Ew meriv wî hespê boz hetanî êvarê dajo, xwuhê da reş dike û êvarê jî heta sibê cuhurekî tijî qûm dixê û serê wî hespî. Gelo ew mesel çî ye û here wê meseleyê hell bike.*

[Dunya Gozel] dibê:

“Tê herî. Sibê zû, merivek hespekî sîyar e. Mi’îneke<sup>243</sup> ewk sîyar e, boz sîyar e. Wextê dajo, wusa

239 ) Devjenî, minaqeşe.

240 ) Herdu.

241 ) Mineqeşe, devjenî.

242 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 18

243 ) Mehîn, mahîn.

dike xwihê da reş dibe. Wextê tê, ewkekî, cuhureke qûmê dixwe serê wê, devê wê. Ew duxwe heta sibê. Here. Wê meselê mi ra hel ke. Were, ez ê te bikim.”<sup>244</sup>

**3. 12. D8. Mexlûqatekî/aferîdeyekî dijmin hewl dide ku leheng tune bike.**

**3. 12. D9. Mexlûqatekî/afrîdeyekî dijmin bi leheng re şer dike.**

**3. 12. D10. Objeyeke sêhrî nîşanî leheng tê dayîn û pêşnîyaza taqasê/bihevguherînê tê kirin.**

*Di Çîroka Hesên Hiseyn de honaka çîrokê piranî di navbera Hiseyn [leheng] û Dunya Gozelîyê [tawankar/êrişkar] de derbas dibe. Gava ku Dunya Gozelî Hiseyn davêje ada heft behra, Hiseyn ewilî hinek sêvên sor dixwe û gava ku wan sêvên sor dixwe nişkê va dibe hirç. Wexta ku dibe hirç hinekî digere rastî hinek sêvên gewrik tê û gava ku wan sêvên gewrik dixwe dîsa tê ser halê yê berê [objeyeke sêhrî nîşanî leheng tê dayîn].*

*Hiseyn wan sêvên sêhrî yên sor bi awayekî difroşe Gozel Dunyayê û gava ku Gozel Dunya wan sêvan dixwe dibe hirç. Piştî Hiseyn bi wan sêvên gewrik bi Gozel Dunyayê re pêşnîyaza taqasê/bihevguherînê dike.*

Efendimê xwe ra bêjim, wextê tê, tê ber koşka Dunya Gozelê disekine, dibê:

“Dunya Gozel, ça ne?”

Serê xwe xar dike. Dizane, da. [Hiseyn] dibê:

“Dil-hinavê teyr te xarye, kanê? Ti bidî. Ewî derxe bide mi.”

Dil-hinavê wî ça dike, derdixe. [Hiseyn] dibê:

“Sifrika mi li ku ye? Tê bidî mi. Kumê mi li ku ye? Tê bidî mi.”

Iha dike, dibê:

“Ê baş e. Ez ê hemûka bime te.”<sup>245</sup>

**3. 12. a) Yek ji bexşendeyên girîng di çîrokên kurdî de Xidirê [Xizirê] Zindî ye. Xidir bêyî ti payînê<sup>246</sup> tê ser rêya leheng û rêya serketin û biarmancgihîştinê nîşanî wî dide.<sup>247</sup>**

244 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 16

245 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 15-16

246 ) Bêyî ku li benda tiştê an sudekê be. (wer.)

247 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 97

Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de wexta ku Mîrze Miheme [leheng] bo bidestxistina şîrê şêr di eyarê şêr de ‘dêlbijîyê hespê xwe’ ku hespê wî jî ‘hespê bayê birûskê’ bûye li hev dixê derdikeve diçe, li ser rêya wî ‘kalekî rûdana qerqaş, çehv-birîyê belek, sîmanê sipî-girover’ ku ev jî wesfê Kalê Xizir e li ber disekine û bêyî ti bedêlê cihê lana şêr jê re nîşan dide.

Di hin çîrokên ku me li Ebexê berhevkirî de motifên ‘dêlbijî’<sup>248</sup> û ‘hespê bayê birûskê’<sup>249</sup> motifên berbelav in.

Eva [Mîrze Miheme], dêlbijîyê<sup>250</sup> hespê xwe, dêlbijîyê hespê bayê birûskê herdika li hev dixê, dibê hespê wî ber wî hazir dibe, şûr-mortalê wî pê va. Hespê wî bayê birûskê bûye. Mîrze Miheme li hespê xwe sîyar dibe. Ya illah ya xwedê dibêje, dibê dikeve rêke mîta<sup>251</sup> rêya me ya Tucîyê<sup>252</sup> hildikşe. Hildikşe. Diçe dêna xwe didê, serê du rêya, rêk ha diçe, rêk ha diçe. Kalekî rûdana qerqaş, çehv-birîyê belek, sîmanê sipî-girover ber sekiniye, dibê:

“Esselamu ‘elêkim, ya xortê delal.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Elêkme selam. Tu ça dizanî ez Mîrze Miheme me?”

[Kalê] dibê:

“Ez dizanim tu Mîrze Mihemed î. Iha tu şêr dibînî? Ser milê xwe yê çepê vegere. Iha zangê da, şêr zangê<sup>253</sup> da ne. Îsal hevt sal e binê lingê wî kelemek tê ra çûye, lûvelûva wî diçe ‘asîmanê heyşta. Isa herî, girmegirma hespê, terpeterpa lingê te neçê. Lê, mi umîd xwedê heye jî naçê. Bin lana wî da yêra<sup>254</sup> xwe çêke. Ew lingê xwe yî birîn daîma dûrî xwe dirêj dike. Seva lingê wî hev nekeve neêşe, birîna wî neêşe. Isa şûrê xwe teletel daynê, li dewsa wê kelemê xe, bira ew kêmedeb lingê wî bikşe derkeve. Ewê ser lanê biqîje bireve. Yê isa here were hetanî bedena wî rihet bû. Yê cake<sup>255</sup> were ser lana xwe bikeve. Wî çaxî yê te bixaze yê bê, bêje bixaze mirazê xwe. Tu mirazê xwe çi dixazî bixaze.”<sup>256</sup>

248 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 2-3-5-13-25-31

249 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 1-21

250 ) Pirç an pûrta dirêj a dêla hespan

251 ) Mîna, nola.

252 ) Gundekî Gîhadîna Agiriyê ye.

253 ) Kevirekî zêde zêde mezin.

254 ) Cî, cih.

255 ) Dîsa.

256 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 19-20

### 3. 12. b) Ev rênimandin hin caran di xewê de rû dide.<sup>257</sup>

*Di Çîroka Mîrze Miheme de wexta ku Gulemdan, ku jina Mîrze Miheme [leheng] ye, bi tena serê xwe dimîne, di zor û zehmetiyê de dimîne û radizê 'Kalê Xizir' tê xewna wê. Jixwe di çîrokan de wexta ku leheng an kesek dikeve tensagiyê 'Kalê Xizir' li ber hazir dibe.*

Gulemdan tê, dêna xwe didê, ne Mîrze Mihemed e! Ne erê ne na! Cî da, wê derê dikeve xwe va diçe. Kalê Xizir, xwedê bîne xewna ometa Miheme, hewariya wana bîne, hewariya mi we tevayî, tê xewna wê, dibê:

“Gulemdan, serê xwe bilind ke, ber serê te da kûpek zêr heye. Wî kûpê zêr hilde bihere. Mîrze Miheme tu zor bibînî.”

Gulemdan ser hemdê xwe da tê. Ewî kûpê zêr derdixê, hildide diçe.<sup>258</sup>

### 3. 12. c) Carinan dêwek ligel lehengî li hev dike û li beramber anîna kesek an tiştêkî dêw keresteyeke cadûyî pêşkêşî lehengî dike.<sup>259</sup>

*Di Çîroka Hemze Pelevan de dêw dike û nake bi lehengê çîrokê bi Hemze Pelevan nikare şer bike û bona ku Hemze Pelevan dev jê berde mecbûr dimîne bi Hemze Pelevan li hev dike û qîza xwe didê.*

Yeke wî yeke dêw. Dibê ew [û] dêw li hev dixin. Dibê Kindir şûrek davêje serê dêw. Dibê du serê dêw dibe, du serê wî jêdike. Dimîne sê serê wî. Dibê dêw mîtanî çilpîya, nava destê wan da iha diçe tê. Kindir û dêw bona qîzikê, seva qîzikê li hev xistin. Dêw dike nake sitara dêw dêt [Hemze Pelevan] da tine. Dêw dibê:

“Yawo, tu nayê ez vê qîza xwe ya han bime te? Ez qîza xwe bide te. Tu bibî zavê mi.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Erê.”

Dibê dêw qîza xwe lê mehr dike. Hemze Pelevan bi awayê şer'a Miheme, qîza dêw helalî xwe ra dixaze.<sup>260</sup>

257 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmîna Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafîk Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 97

258 ) 'Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme (1), r. 11

259 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmîna Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafîk Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 97

260 ) 'Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 19 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 3

*Di berdewamiya heman Çîroka Hemze Pelevan de dêw li beramber daxwaza qîza xwe [li beramber pêkanîna kesek an tişteki] şûrê Hemze Pelvan ji behrê derdixe, dide ber êgir diqelîne û gava ku berdide qêlif [keresteyeke cadûyî pêşkêşî lehengî dike] Hemze Pelevan ji xewa mirinê hişyar dibe.*

[Qîza dêw] dibê:

“Bavo, bide xatrê xwedê, Hemze tengasîyê da ne.”

[Dêw] dibê:

“Lawo bide xatirê xwedê, du hev pirîskê kulê bûn hatibûn ketibûne mala mi. Lawo, bise.”

Dike nake ewlad e. Dilê wî pê dişewite. Dibê dêw xwe xorozî<sup>261</sup> behrê dike. Şûrê wî derdixe. Dibê dide ber sobê temîz diqelîne. Wexta berdide qêlif, dibê Hemze dibê:

“Weee Xeremco, ez çi xeweke xaş da bûm. Te ez hişyar kirim.”

Dêw dibêjê:

“Weylê mala te xirabûyî! Rabe ser xwe. Pîrê rîtye devê te, Xeremco birye. Xeremcoya çi? Halê çi?”

[Hemze Pelevan] dêna xwe didê, dêw e. Dêw evî tîne derbasî valî<sup>262</sup> behrê, perrê şîher dike. Şîher jî nîşan dixê, dibê:

“Xatrê te.”<sup>263</sup>

### **3. 13. LEHENG BERSÎV DIDE ÇAKALÎYÊN MIROVÊ KU DÊ DI PÊŞ DE BEXŞÊ BIBEXŞÎNE WÎ**

**PÊNASE: HELWESTA LEHENG**

**SÎMGE: E**

#### **3. 13. E1. Leheng di îmtîhanê de bi ser dikeve.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [2] de Mîrze Miheme [leheng] wekî ku Kalê Xizir [bexşende/bexşgêr] gotî dikeve rêya çûyîn û nehatinê, heft roja di reşayî, heft roja di çêm û heft roja jî di nav darûberêkî diçe û digîhe şêrê birîndar. Bi dizîka wî lingê şêr ê birîndar qenc dike û gava ku birîna lingê şêr qenc dike şêr ‘şîrê şêr di eyarê şêr de’ dide Mîrze Miheme. Bi vî awayî Mîrze Miheme di vê îmtîhanê de bi ser dikeve.*

261 ) Xweavêtîna avê.

262 ) Vî alî.

263 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 19 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 11-12



Dibê Mîrze Miheme têtjikeke wê hilda bir ku cîkî tenha kuşt. Post be, ‘iyarê wê be, çi be, dibê hilda anî. Dibê heyane xwe yek kêlekekî xwe lê fedî kir, bedena xwe derxist. Dibê Mîrze Miheme çiçkê bedena wê dot, dote wî postî. Dibê hilda. Xatrê xwe jê xast, kete rê. Dibê kete rê, lêda hat. Dibê Mîrze Miheme ew tiştana kar kirin. Li hespê xwe sîyar bû gêrî<sup>264</sup> zivirî.<sup>265</sup>

### 3. 13. E2. Leheng silava bexşgêr digire [nagire].

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de wexta ku Kalê [Kalê Xizir/bexşende/bexşgêr] silavê dide Mîrze Miheme [leheng], Mîrze Miheme silava Kalê digire û bersiva wî dide.*

Kalekî rûdana qerqaş, çehv-birîyê belek, sîmanê sipî-girover ber sekinîye, dibê:

“Esselamu ‘elêkim, ya xortê delal.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“‘Elêkme selam. Tu ça dizanî ez Mîrze Miheme me?’”<sup>266</sup>

### 3. 13. E3. Leheng daxwaza kesek ku miriye an jî li ber mirinê ye pêk tîne (pêk nayne).

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de Mîrze Miheme [leheng] daxwaza qîza padişêh [birêker] ku bo başbûna nexweşîya bavê xwe ji Mîrze Miheme daxwaza ‘şîrê şêr di eyarê şêr de’ kiribû, Mîrze Miheme wê daxwazê pêk tîne.*

Efendimê xwe ra bêjim, dibê qîzik ber digere. Isa ber digere, isa ber digere... Dibê bardaxekî tijî şîr dike dide qîzikê. Qîzik dixê ber pêşa xwe diçe. Cîya xwe dibîne, dibê:

“Dayê, dê were. Eva, Mîrze Miheme anye hatye.”<sup>267</sup>

### 3. 13. E4. Leheng [dîl]girtî serbest berdide.

*Di Çîroka Mîrze Miheme [3] de wexta ku Mîrze Miheme [leheng] lêdixê û zîhê [dêw] dikuje wan her sê xwûşkên dîlgirtî ji destê zîhê xilas dike.*

---

264 ) Şûn de, paş ve.

265 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 16

266 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 19

267 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 19 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 22

Zîha, wira ‘ışk<sup>268</sup> dibe. Efendimê xwe ra bêjim, jinik tên. De wusa bedew in. Zêr zîv zehf in. [Mîrze Miheme] dibêje birê xwe, dibê:

“Sebeta daxin. Ez ê vana [van hersê qîzana derxime jorê]”<sup>269</sup>

### 3. 13. E5. Leheng heywanê ku jê alîkarî dixwaze xelas dike.

*Di Çîroka Mîrze Miheme [3] de ew heft sal bûye wextê ku cûcîkên Teyrê Sîmirr givrik bibûne zîhayek [dêw] li wan cûcîkan musellet bibûye û xwaribûye. Daxwaza xilaskirina cûcîkên Teyrên Sîmirr ji Mîrze Miheme [leheng] tê xwastin û Mîrze Miheme wan cûcîkan ji destê zîhê xilas dike.*

[Mîrze Miheme] qasekî dimîne. Dêna xwe didê, zîha jor da hat. Wextê tê, lê dixê, zîhê dikuje. Teyrê Sîmirr jî çûye. Wextê dixê du qeta, lê dixê dikuje, efendimê xwe ra bêjim, ew parçe goşt-moştê wî davêje ber cûcîka cûcîk duxwin. De ew radizê. Cûcîk jî perkê xwe vedikin. Ew meriva bin sîha wan da radizê. Wextê Teyrê Sîmirr tê, lê bixê bikuje, cûcîkê wê dibê:

“Bide boy xatirê xwedê, yê em xilaskirye, zîha hatye, evî em xilas kirine.”<sup>270</sup>

### 3. 13. E6. Leheng yê ku gengeşê dikin dûr dixê û parêkirina ku li serê gengeşe heye dike.

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de Hesên [leheng] wan her du zarokaên ku li ser mîrata bavê xwe gengeşê dikin, bi avêtina kevîrekî wana dûr dixê û bi awayekî parêkirina wê mîratê çareser dike.*

[Hesên] dibêje, dibê:

“Ez ê niha kevîrekî bavêjim. Hûn ê birevin. Kê we kevîr hilda, qamçî yê wî ye.”

Niha hukmetê xwedê, eva kevîr davêje. Wexta kevîr davêje, ewna li pey kêvir dikevin. Eva kum dide serê xwe. Qamçî dide destê xwe. Emrê xwedê, wexta direvin, hukmetê xwedê, dibê yê piçûk ‘eynî berê kêvir hildide. Wexta dizvirin, [dibên]:

“ ‘Emo<sup>271</sup>, ha ‘emo!’ ”

‘Emo tune. ‘Emo, ku ye? ‘Emo jî a li ber wana, nayê xuyan. Evê te [Hesên], kum dide serê xwe. Qamçî dide destê xwe, dibê:

“Xwedê em xilas kirin.”<sup>272</sup>

268 ) Sekitîn.

269 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 5

270 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 11

271 ) Apo.

272 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016,

### 3. 13. E7. Leheng hin xizmetên/alîkarîyên dî dike.

*Di Çîroka Hesên Hiseyn de Dunya Gozelî [tawankar/êrişkar] daxwaza hellkirina kêşeyekî [Dunya Gozelî dibêje ku tê herî li filan derê merivek heye û li hespekî boz sîyar e. Ew meriv wî hespê boz hetanî êvarê dajo, xwuhê da reş dike û êvarê jî heta sibê cuhurekî tijî qûm dixê û serê wî hespî. Gelo ew mesel çî ye û here wê meseleyê hell bike] ji Hiseyn [leheng] dike û Hiseyn wê daxwaza Dunya Gozelîyê jî pêk tîne.*

Wextê nan tîne, nanê xwe duxwe. [Ew meriv] dibê:

“Eva, jina min bûye, eva mi’ina. Wextê ez hatime geryame, millet gotye mi gotye, eva rêjberê te, em bêjin bûye kerê reş, ker jî kerê reş bûye, jina te ra ne. Mi bihar<sup>273</sup> nekiryê. Mi gotye, virra dîkin. Hevraz-berjêr, ez rojekî hatim. Mi dî, heqeten isa ne. Jina mi sêrcî bû. Wextê qamçîk li mi da ez bûme boncî. Ez bûme boncî. Efendimê xwe ra bêjim, saqoqa ketim. Sa mi xeniqand. Vir da wê da. Baltûzeke mi hebû. Zarê wê derketin go, eva çehvê vî boncîyî nota<sup>274</sup> çehvê zavê me ye.”

[Baltûza wî] gazî dikê, tê. Qamçîkî lê dixê, dibe meriv. Dibê:

“Yalniz<sup>275</sup>, tu vê carê jî herî, wextê li te xe, idî e te nikarim. Tê bibi heywan, ‘eynî heywan. Qamçîyê ewê hene.”

Radibe. Sîyar dibe, diçe. Wextê tê, ew razayîbûye. Jinik razayîbûye. Wextê lê dixê, dibê:

“Ti bibî hesp.”

Li ewî ‘ereb dixê, dibê:

“Tu jî bibî kerekî reş.”

[Ew meriv] dibê:

“Niha eva kerê reş e. Eva jî kulfeta min e.”

[Hiseyn] dibê:

“De bihêle, îja ez te ra sozekî bidim. Yalniz, tê bidî xatrê mi. Em ê lêxin kerê reş bikujin. Em ê jina te jî dîsa [bînin] ‘eynî hêla berê.”

[Ew meriv] dibê:

“Ê baş e.”

Wextê qamçîkî lê dixin, jinik dibe ew. Jinik tobe dike, idî. Lê dixê kerê reş jî dikuje. Efendim, dibê idî bira ew here xwe ra. A bi wî hesabî. Îja dibê hell dike tê.<sup>276</sup>

---

Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 19

273 ) Bawer.

274 ) Mîna.

275 ) Lê, lê belê.

276 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 17-18

3. 13. E8. Leheng bi taktîkên kesê dijmin, dijmin têk dibe û ji êrişê xelas dibe.

3. 13. E9. Leheng aferîdeyê/a dijmin têk dibe [an jî têk nabe].

3. 13. E10. Leheng bihevguherînê qebûl dike lê li hember bexşgêr hêza sêhrî ya objeyê bi kar tîne.

### 3. 14. OBJEYA SÊHRÎ JI LEHENG RE TÊ DAYIN

PÊNASE: GIRTINA OBJEYA SÊHRÎ

SÎMGE: F

#### 3. 14. F1. Objeyê [ya sêhrî] rasterast tê dayin.

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de wexta ku dêwê heftirih [tawankar/êrişkar] Gul [leheng] direvîne û davêje kûlê [şikeft], Gul di bîrê da radizê. Wexta Gul di bîrê da radizê sê heb kevotk [bexşende/bexşgêr] tên û sê heb perrikên xwe didine Gul [hokar an jî objeya cadûyî rasterast bi lehengî tê dayîn].*

*Divê neyê jibîrkirin di çîrokên ku me li Ebexê berhevkirî de motîfa ‘kevotkan’ jî motîfeke berbelav e. Di hin çîrokan de ‘kevotk gava ku kevilên/kincên xwe li xwe dixin dibine qîzên zehf bedew’<sup>277</sup> û di hin çîrokan de jî ‘gava ku leheng radize kevotk tên li ser serê darekî dilûsin û hin nihêniyan ji lehengî re eşkere dikin’<sup>278</sup>*

Dibê rojekî Gul radizê. Dêna xwe didê, sê hev kevotk hatne ser serê darê. Darek di hundirê kûlê da ne, dibê:

“Gul, heke tu hişyar bî guhê xwe bide me.”

Di terefê xwedê da tê, dibê:

“Eger tu raza bî guhê xwe rind bide me. Dêwê heftiruh tu zemana te bernade. Hetanî tu heyatê hebî dêwê iha bîne serê te. Em ê niha fîrîn. Sê hev perrê me yê bikevne ‘erdê. Tê bisîmillah bikî, her sê perrê me hildî, li binê darê xî, kanîkê ber te vebe, kanya avê ber te vebe. Tu bisîmilla bike, li kanye xe, kanî yê bimiçiqe. Dergekê li ber te vebe, li derî xe. Dolabek di hundurê filan odê da ne.

277 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexê-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 9

278 ) a) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexê-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Kurê Şah Ahme, r. 4-5-6-16-17-18-20-22-23 b) Silêmanê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexê-Wan 1953, Dema çîrokwergirtinê: 5 Cotmeh 2016, Çîroka Memo Zînê, r. 1

Hevt hev cûcîk[ê ku di odê da] rehê dêwê heftruh in. Binhêre, dêw ku bi te bihise, parçê te yî mezin guhê te nahêle. Nebî nebî ku tu bidî dêw. Ti serê her hevta biqetînî, tê j' dêw xilaz bî. Ku wisa nebe xilazbûna te j' destê dêw tine.”<sup>279</sup>

### 3. 14. F2. Cihê ku obje[ya sêhrî lê ye] ji leheng tê gotin.

*Di Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde da gava ku meymûn [tawankar/êrişar/xayîn/fesad] jina Tucar Ahmed [leheng] hildide direvîne dibe, Tucar Ahmed li dû jina xwe dikeve û di axiriyê da cihê jina xwe tesbît dike. Gava ku Tucar Ahmed cihê jina xwe tebît dike, jina wî jê re dibêje dibê; li filan darê xencerek û dûpişkek heye. Ku tu bi wê xencerê wê dûpişkê bidî ser êgir, wî çaxî ‘efrît ê bikevine bin emrê te û em ê ji destê vî meymûnî xilas bibin. [cihê hokar an jî objeya cadûyî û sêhrî bi lehengî tê nîşandan].*

*Divê neyê jibîrkin di çîrokên ku min li Ebexê berhevkirî de ji bo betalkirina sêhrê an jî rizgarbûyîna ji karesatan motîfa ‘agir’<sup>280</sup> motîfeke berbelav e.*

[Tucar Ahmed] dibê:

“Em sarilmîş<sup>281</sup> hev bûn.”

Mi gotê:

“Qîzê, niha îdî îşê girîn û kenê tune ye. Niha mi ra çarekî bibîne. Mi tu dîtî. Em ê çakî bikin? Em ê çalî vir xilaz bin?”

[Jinik] dibêje:

“Tucar Ahmed, kafirî pirrî ku hij mi dike, yanî çîqa tiştê kara wî zirara wî heye hemû mi ra gotye. A binhêre, evê dara hanê va dûpişkek heye. A li vira, eva xencera li darê dayî, tê pozka xencerê bidî dûpişkê, dûpişkê daynî ‘erdê, êgir li ser dadî. Wexta ku dûpişk qizmîş<sup>282</sup> bû, ‘efrît yê li ber te bisekinin bêjin, padişahê mi em dinyayê xirav kin, ava kin? [Wî çaxî] hukmî wî dikeve destê te.”<sup>283</sup>

### 3. 14. F3. Obje[ya sêhrî] tê çêkirin.

279 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 8

280 ) a) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Gozel Dunyayê, r. 14-16-19 b) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 5-13-25

281 ) Hembêzkin.

282 ) Qelandin, biraştin.

283 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, r. 15

### 3. 14. F4. **Obje[ya sêhrî] tê firotan û standin.**

*Di Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêdê de dayika Tucar Ahmed [leheng] zêrekî dide Şêx ‘Elî da ku ji wan ra hinek tiş û miştan bistîne. Şêx ‘Elî jî bi wî zêrê dîya Tucar Ahmed ji wan meymûnekî [objeya an jî hokara sêhrî] dikirre. Tucar Ahmed paşê bi wî meymûnê zehf zengîn jî dibe û zehf bela jî tê serê wî.*

Ha digerin, ha diçin. Diçe nava mal meydanaîyê. Em bêjin dêna xwe dinê, her kesî tişt anîne. Yawo, dêna xwe dinê, merivekî jî meymûn anîne. Dêna xwe didê, ya rebbî, meymûnekî wisa rind di nav da heye. Yawo, emrê xwedê, dibê ku piştî xweyî meymûna dikevê, ew meymûnana hemû li wî dixin. Wexta berê wî dikevê, disekinin, filan. Ji terefê xwedê da, hema isa kêfa wî pê ra tê, dibê:

“Fîyeta wî çiqasî ye?”

[Firoşyar] dibê:

“Zêrek e.”

[Şêx ‘Elî] dibê:

“Welle, hema ez ê vî meymûnî bikirrim. Hemin ça hebe, me têra perê wê jê ra tişt berav kirye. Hema ez ê evê jî biherim.”

Yawo, niha ku xwedê da, dide. Em bêjin, meymûnê dikirre.<sup>284</sup>

### 3. 14. F5. **Obje[ya sêhrî] bi rasthatinî dikeve destê leheng [leheng wê dibîne].**

*Di Çîroka Hesên Hiseyn de gava ku Dunya Gozel [tawankar/êrişkar] Hiseyn [leheng] bi awayekî caduyî/derasayî davêje girava nava heft behran, Hiseyn bi neçarî li devdorê xwe digere û rastî hin sêvên sor tê. Wexta ku Hiseyn wan sêvên sor dixwe dibe hirçekî. Paşê digere diçe rastî hin sêvên gewrik tê ku gava wan sêvên gewrik dixwe dîsa dibe meriv û tê ser halê xwe yê berê [hokar an jî objeya caduyî û sêhrî bi rasthatinî dikeve destê leheng].*

Hiseyn wextekî şevê radibe. Dêna xwe dayê, çî! Mêşek e<sup>285</sup>, sade notanî<sup>286</sup> vî Kîrrê Tendûlekê<sup>287</sup> dar in. Ha diçe, devî ne. Ha diçe, devî ne. Birçî dibe. Sêv li wira ne. Sêvek, sêva sor duxwe. Dêna xwe dayê, bû hirç! Hisên bû hirç jî. Dibê:

“Heyyy, mala mi xira be! Teze ez bûme hirç!”

284 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, r. 6

285 ) Meşe, darûber.

286 ) Mîna.

287 ) Çiyayê Tendûrekê.

Ha digere, ha digere. Diçe dêna xwe dayê, hine sêvê gewrik hene. Dibê:

“Ev sêvê sor mi xarine. Ca sêvê gewr jî buxwim.”

Ça duxwe, dibe meriv. Dibê:

“Aaaa, baş e. Dunya Gozel, te çi kir te bi mi kir.”<sup>288</sup>

### 3. 14. F6. **Obje[ya sêhrî] xwe bi xwe yekcar peyda dibe.**

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de wezîr [tawankar/êrişkar] bi xencerê lê dixê Gul [leheng] bi xedarî birîndar dike, dixê nava telîsekî, dide destê dergevan û dibêje dergevan dibê, here bavêje cîhekî. Dergevan jî wî telîsî tîne davêje ber derê mala Hekîmê Loqman [alîkar]. Wexta ku Hekîmê Loqman wî telîsî dibîne û hildide hundir, dêna xwe didê, wê merivekî birîndar tê de ye. Wexta ku Hekîmê Loqma Gul ji hundirê telîsê derdixîne, dermanê birînen Gul di destê Hekîmê Loqman de xwe bi xwe dileyîze û çêdibe [hokar an jî objeya cadûyî û sêhrî xwe bi xwe çêdibe].*

Dibê wexta ku wisa dikin, evna heyjde xencera wisa lê dixin, [Gul] birîndar e. Dibê dergevan dide pişta xwe. Dibe here derê mala Hekîmê Loqman ra derbas be. Tehjî-tûlê Hekîmê Loqma jî, haşa we, hebûne. Tehjî-tulê Hekîmê Loqma pê dihisin, dora wî digrin. Dergevan, hema tîlê davêje derê mala Hekîmê Loqma, direve.

Bira evana hene cem padşê. Hekîmê Loqma derdikeve derê malê, dêna xwe didê, [wê telîsek li wir e]. Hekîmê Loqma jî şa dibe, dibê:

“Miheqeq ticar hatine derbas bûne. Barê deve-mevê wan e, qetyaye. Miheqeq hevirmûş e, tiştêkî entîqe ye.”

Ew jî kaş dike dibê hindir. Dêna xwe didê, gencekî ti hij-heyranî dêna xwe bidê, heyjde xencera birîndar e. Dibê dermanê Hekîmê Loqma jî, rebbê ‘alemê pê daye zanebûnê, dermanê wî noşdarî jî bi xwe xwe dileyîze, dibê:

“Ha dermanê vî gencî ev e.”<sup>289</sup>

### 3. 14. F7. **Obje[ya sêhrî] tê xwarin an jî vexwarin.**

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de Gul [leheng] şevêkî li çolê di ber xewê de ‘dil-hinavê Teyrê Enqa’ dixwe. Ji ber wê her şevê di ber serê Gul de kîsek zêr hêşin dibe û Gul her carê bi saya serê ‘dil-hinavê Teyrê Enqa’ ji wan bobelatan ku têne serê wî xilas dibe.*

288 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 14

289 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 11

Dibê dil-hinavê Teyrê Enqa xarye, dibê şevê terefê xwedê da, kîse zêrê zer li ber serê Gul hêşîn dibe. Hîngî ewa dil-hinavê Teyrê Enqa xarye. Ka idî ketye heyra wî. Ka rehê xwe xilaz kîrye ji destê dêw [ku] yê têkeve heyra zêrê ber serê xwe. Heyra canê xwe da ne. Hêsir bûye, çol-mexela ketye.<sup>290</sup>

*Di Çîroka Hesên Hiseyn de jî Hesên [leheng] serê dîk [serê Teyrê Ne'ma] û Hiseyn jî [lehengê duyem] dil-hinavê dîk [dil-hinavê Teyrê Ne'ma] dixwin. Bi xwarina serê dîk û dil-hinavê dîk herdu bira bi wî awayî her carê ji her bobelatê xilas dibin.*

Efendimê xwe bêjim, dikelîne. Efendimê xwe bêjim, êvar tê. Hesên-Hiseyn kurê wê bûne. Kurê jinikê bûne, jina Hecî 'Elî, ji wê ye. Efendimê xwe ra bêjim, lê carî dizane. Wextê tê, [carî] dibêje jinikê:

“Wextê tu hatî, tê bêjî ka serê dîk, ka dil-hinavê dîk?”

[Jinik] gazî caryê dike, dibê:

“Carî, ka?”

[Carî] dibê:

“Welle, Hesên-Hiseyn mektevê hatine. Welle, serê dîk, dil-hinavê dîk, yekî serê dîk hildaye xarye, yekî dil-hinavê dîk.”<sup>291</sup>

### 3. 14. F8. **Obje[ya sêhrî] tê dizîn.**

*Di Çîroka Hesên Hiseyn de gava ku Hiseyn [leheng] li derekî ra derbas dibe, dêna xwe didê sê heb meriv ji bona ‘sifrik, kumik û bilûrekî’ li hev dixin. Hiseyn şerî’eta wan dike û dibêje, ez ê kevirê bavêjim, ji we kê ewilî gihîşte wî kevirî ez ê sifrikê bidime wî. Gava ku Hiseyn kêvir davêje û ew hersê bira li pey kêvir direvin, Hiseyn kum dide serê xwe û êdî nayê xuyan. Bi wî awayî Hiseyn; kum, sifrik û bilûrê hildide ji xwe ra dibe [hokar an jî objeya cadûyî û sêhrî tê revandin û tê dizîn].*

*Di çîrokên ku me li Ebexê berhevkirî de hokarên cadûyî yên wekî ‘kum’<sup>292</sup>, ‘sifrik’ û ‘bilûr’ berbelav in.*

290 ) Nûredînê Xelkê Xaç, h.ç., r. 13

291 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 5

292 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 19-20-21-22



Diçe dêna xwe dayê, sê meriv ser tepekî<sup>293</sup> qirka hev digrin. Diçe nava wan da, dibê:

“Kuro, çi bûye?”

Dibên:

“Welle, eva mîrata bavê me ye.”

[Hiseyn] dibê:

“Çi ye, îja?”

Dibên:

“Eva bilûr e, kumek e, sifrik e.”

[Hiseyn] dibê:

“Ê de îja mehna wan çi ye?”

Dibên:

“Eva sifrika gava tu lê xî bê; tehm, tehmê cinnetê çi hebe lê dertê, em duxwin. Eva kuma jî ti herî ku, tu bidî serê xwe, kes te nabîne.”

[Hiseyn] dibê:

“Ahaaa, xwedê da me. Bilûr?”

Dibên:

“Mehna wê nayê dîtinê.”

[Hiseyn] dibê:

“Temam. Bira bilûr bisene. Hûn gune ne. Hûn ê li hev xin. Lê, îja ez ê ser vî tepeyî bisenim. Ez ê kevirekî bavêjim. Kê we xwe gihandê ez ê sifrikê bime wî.”

Dibên:

“Heyyy, rehma xwedê dêbavê te be.”

[Hiseyn] dibê:

“Ez ê kevirekî din jî bavêjim. Kê xwe gihandê, ez ê kum bime wî. Zaten bilûr jî yê axiriyê da [be].”

Dibên:

“Heyyy, de baş e.”

Kevirekî davêje. Hersêk direvin. Wextê direvin, ew tîne sifrikê qet dike, dixê piçenga xwe. Kum dide serê xwe. Bilûrê dide destê xwe, herrek tu naçî.<sup>294</sup>

### 3. 14. F9. Curbecur kes bi xwe dikevin xizmeta leheng.

---

293 ) Gir.

294 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 10-11

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de wexta ku Hesên [leheng] qamçiyê xwe [hokara cadûyî] li ‘erdê dixê, sêzde heb padişahên cinan li ber wî hazir dibin û dibêjin, em dinyayê xirab bikin an ava bikin [xizmeta xwe pêşkêşî lehengî dikin].*

*Di vê mijarê de di çîrokên cadûyî yên ku me li Ebexê berhevkerî hokarên cadûyî yên ku xizmeta xwe pêşkêşî lehengî dikin bêtir an ‘qamçî’ ye an jî ‘bilûr’<sup>295</sup>e. Gava ku lehengî qamçî li ‘erdê dixê an jî li bilûrê dixê piranî ‘efrît’<sup>296</sup> li ber lehengi hazir dibin û amadekariya xwe pêşkêşî lehengî dikin.*

[Hesên] qamçî li ‘erdê dixê, sêzde padişahê cina li ber hazir dibin. Dibêjin, dibên:

“Em dinyayê xirab kin, ava kin?”

[Hesên] dibê:

“Xirab nekin, ava nekin. Me ra sê hev hespê bayê-birûskê bînin.”<sup>297</sup>

### Şêwazên din ên vê erkê di çîrokên kurdî de wisa ne:<sup>298</sup>

#### **3. 14. a) Gelek caran Xidirê (Xizir) Zindî ji dêvla keresteya cadûyî hin şîretan û rênimayiyan dide lehengî û çawaniya jinavbirina tawankar ji wî re ronî dike.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de wexta ku Mîrze Miheme [leheng] bo bidestxistina ‘şîrê şêr di eyarê şêr’ de dikeve rêyekî diçe, Kalê Xizir [bexşende/bexşêr] nişkava derdikeve ser rêya wî û jê ra şûna şêr nîşan dike [rênimayiyan dide lehengî û bexşende bi wî awayî çawaniya jinavbirina tawankar ronî dike].*

[Kalê] dibê:

“Ez dizanim tu Mîrze Mihemed î. Iha tu şêr dibînî? Ser milê xwe yê çepê vegere. Iha zangê da, şêr zangê<sup>299</sup> da ne. Îsal hevt sal e binê lingê wî kelemek tê ra çûye, lûvelûva wî diçe ‘asîmanê heyşta. Isa herî, girmegirma hespê, terpeterpa lingê te neçê. Lê, mi umîd xwedê heye jî naçê. Bin lana wî da yêra<sup>300</sup> xwe çêke. Ew lingê xwe yî birîn daîma dûrî xwe dirêj dike. Seva lingê wî hev

295 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 11-12-13-14-15

296 ) a) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 14 b) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, r. 16-17

297 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar û Yek Şevî, r. 20

298 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 98

299 ) Kevîrekî zêde zêde mezin.

300 ) Cî, cih.

nekeve neêşe, birîna wî neêşe. Isa şûrê xwe teletel daynê, li dewsa wê kelemê xe, bira ew kê-m-edeb lingê wî bikşe derkeve. Ewê ser lanê biqîje bireve. Yê isa here were hetanî bedena wî rihet bû. Yê cake<sup>301</sup> were ser lana xwe bikeve. Wî çaxî yê te bixaze yê bê, bêje bixaze mirazê xwe. Tu mirazê xwe çi dixazî bixaze.”<sup>302</sup>

**3. 14. b) Bexşende bi şûştina lehenga keç, bi av an barana efsûnî ciwaniyeke seyr û ecêb pê dibexşe.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [3] de wexta ku Teyrê Sîmirr [bexşende/bexşgêr] Mîrze Miheme [leheng] heft qat ji binê ‘erdê derdixîne ser rûyê ‘erdê, Teyrê Sîmirr ji Mîrze Miheme re dibêje; dêbavên te seva te wisa zehf girîyane her du çavên wan kor bûne û tu van perrikên min bihere di avê de bike, li çavên dêbavên xwe bixe, çavên wan dê dîsa vebibin [bi ava perrikên efsûnî ciwaniyeke seyr û ecêb tê bexşandin].*

[Teyrê Sîmirr] dibê:

“Yalniz<sup>303</sup> du perkê mi jî bihere. Bavê te, cîya te isa giriyane herd jî kor bûne. Yalniz, van perkê mi tu biherî, bavê te cîya te çêhvê xwe xin, herdikê jî yê bibne xortê çardasalî.”<sup>304</sup>

Cab bavê wî ra diçe. Tê. Tê, hela diçe dîwana bavê xwe. Dêna xwe didê, çi? Bavê wî kor bûye. Cîya wî kor bûye. Heqa giriyane. Emrê xwedê, tîne perika avê da dike, çêhvê wan dixê. Çêhvê herdka jî silamet dibin. Dîsa têne ser heyama xwe ye berê.<sup>305</sup>

**3. 14. c) Bexşende rê û rêbazên cadûkirinê hinî lehengî dike an şiyaneke seyr û ecêb pê dibexşe, şiyana têgihîştina zimanê caneweran û hwd.**

*Di Çîroka Avcî Ahme de wexta ku bêtawanî û bê-sûciya Avcî Ahme [leheng] derdikeve meydanê, Mîrê Maran [bexşende/bexşgêr] wek dîyarîyekî tûyî binê zimanê Avcî Ahme dike û Avcî Ahme bi wî awayî zimanê hemû canewer û candaran dizane [bexşende şiyaneke seyr û ecêb pê dibexşe, şiyana têgihîştina zimanê canewer (candar) û hwd.].*

Dibê Avcî Ahme sibê zû pez derxist. De zimanê her heywîn dizane. Her zimanî dizane. Zanî?

301 ) Dîsa.

302 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 20

303 ) Lê, lê belê.

304 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 12

305 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, h.ç., r. 13

Wexta ku ewî [Mîrê Mehra] tû devê wî kir, her zimanî dizane. Yanî heywan çî gazî ke, heywan çî bêje, ew her zimanî dizane. Surr ew e, ha.

Dibê wexta du mîh biberan bûn, beran li ser bûn, mîhê li ser cewê<sup>306</sup> ra banz da, kire kalinî, gotê berîn:

“Were.”

Dibê beran gotê:

“Ez nayê.”

Dibê mîh cake<sup>307</sup> zivirî, kire kalinî, go:

“Were.”

Berîn go:

“Ez nayê. Ez giran im. Ez werim, banz dim dava<sup>308</sup> mi yê biqete, zîlana<sup>309</sup> mi yê biqete. Ez li pey te nayê. Ti aqlê mi jî aqlê Avcî Ahmed e ez bi gotina jinikê bikim.”<sup>310</sup>

### **3. 15. LEHENG BI CIHÊ KU OBJE[YA SÊHRÎ] LI WÊ DERÊ YE VE TÊ BIRIN. JI BO WÎ RÊBERÎ TÊ KIRIN AN JÎ TÊ BIRIN**

**PÊNASE: DI NAVBERA DU KRALTÎYAN DE RÊWÎTÎ AN JÎ BI HEVRÊTÎYA RÊBEREKÎ RÊWÎTÎ**

**SÎMGE: G**

#### **3. 15. G1. Leheng li ezman difire.**

*Di Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde da wexta ku jina Tucar Ahmed ji aliyê meymûn [tawankar/êrişkar] ve bi awayekî sêhrî tê revandin, Tucar Ahmed [leheng] jî ji bo ku bi awayekî sêhrî jina xwe bi dest bixe li dû jina xwe dikeve. Axiriyê de bi cinêkî/e dîlgirtî tê sîyarkirin û bi asîmanan ve bi hewa dikeve û diçe. Her çiqas ku leheng bir xwe nefire jî leheng bi cadûyeke efsûnî tê sîyarkirin û bi hewa dikeve, difire û diçe.*

Baş e. Tucar Ahmed, hê di çadira ku ji Harûnê Reşît ra birye, di wê çadirê da sekinye, xwe ra dibêje:

“Neysene<sup>311</sup>, gazî kirin. Yekî hirç î pirç anîn. Ez lê sîyar kirim. De îja, bi mi ra gotine, kelîmê

306 ) Qanala ava mêr û zevîyan

307 ) Dîsa, careke din.

308 ) Daw, dêla pezan.

309 ) Niçika li ser daw û dêla pezan.

310 ) Silêmanê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1953, Dema çîrokwergrîtinê: 5 Cotmeh 2016, Çîroka Avcî Ahme, r. 5-6

311 ) Werhasil.

tewhîd neyne. Wexta ewî ez bi hewa xistim, ez pir çûm hindik çûm. Ewî ez isa bilind kirim, yanê isa li nêzîkî ‘esmana bûm, stêrk mîta<sup>312</sup> loda dihatne xuyan. Li wê jorê, mi dêna xwe dayê, kalekî sipîçîl hema hat li ber mi sekinî, gote mi; Ahmed, kelîmê tewhîd bêje.<sup>313</sup>

### 3. 15. G2. Leheng li ser erdê an jî li ser avê rêwîti dîke.

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de wexta ku Mecûsî [êrişkar/tawankar] bi zorê Hesên [leheng] dibe û li serê kelehekî bi tenê dihêle. Hesên jî bi neçarî ji serê wê kelehê xwe davêje nava behrê. Gava ku Hesên xwe davêje nava behrê, qederekî li ser behrê bi gemîyan rêwitiyê dîke.*

Gede dêna xwe didê, em bê bi emrê xwedê, yanî li ser behrê gemî diçin. Eva, çakî dîke? Dibê:

“Hema ez ê xwe bavêjme yalê behrê.”

Eva xwe davêje nava behrê. Niha, xwedê jî ku yardim<sup>314</sup> ke, dîke. Xwe davêje nava behrê. Ça dîke? Axir, meriv, gemî [wî] hildidin. Hildidin. Pir diçin, hindik diçin. Idî mêrika dibêjin, dibên:

“Bavo, idî vira tê peya bî.”<sup>315</sup>

### 3. 15. G3. Ji leheng re rêbertî tê kirin.

*Di Çîroka Mîrze Miheme-Kurê Şah Ahmed de ‘Edo [alîkar] ku aqilmend û şêwirmendê Mîrze Miheme [leheng] ye ji Mîrze Miheme re rêbertiyê dîke.*

‘Edo subê radibe. Evna radibin. ‘Edo kaxza xwe hildide, diçin. ‘Edo roja dijmire. Tabî Mîrze Miheme nizane. Mîrze Miheme arekî<sup>316</sup> dibê:

“ ‘Edo, ew çî ye tu tê da mijxûl dibî, hesaba dikî?”

[‘Edo] dibê:

“Mîrze Miheme, ewa îşê min e îşê te nîne.”<sup>317</sup>

### 3. 15. G4. Ji leheng re rê tê nîşandan.

---

312 ) Mîna

313 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, r. 13

314 ) Alîkarî.

315 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar û Yek Şevî, r. 7

316 ) Kêlî, qas, lehze.

317 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 30 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Kurê Şah Ahmed, r. 7

*Di Çîroka Mîrze Miheme-Kurê Şah Ahmed de wexta ku Mîrze Miheme [leheng] û bi aqilmendê xwe [alîkar] ve li cihekî diêwirin û şev dikeve ser wana, sê heb kevotk tên li ser darekî dilûsin û ew her sê kevotk [alîkar] rêya Mîrze Miheme jê re terîf dikin.*

Dibê evna rê ketin hatin. Şev kete ser vana, evna hatin li ber wê mala xirabe, li ber wê mala xirabe, dibê sekinîn. Mîrze Miheme w ‘Edo, dibê rûniştin li bin darê. Ji birayê xwe ra bêjim, dibê Mîrze Miheme de lawê zengînan e, lawê paşan e, negeryaye. Derd, kul, xem tunebûye. Kurkê xwe, ‘ebayê xwe kişande ser serê xwe, kete xewê. Dibê ‘Edo duşmîş bû taşmîş<sup>318</sup> bû, si’et lê bûne roj, şev lê bû sal, şev nayê. Dibê Edo dêna xwe dayê, wextekî şevê hersê kevotk cake<sup>319</sup> hatne ser serê darê.

Dibê go:

“Ev kê ne?”

Dibê go:

“Eva Mîrze Miheme ye, ‘Edo ye.”

Dibê go:

“Evê hene ku?”

Dibê:

“Keça mi, evnê herin Gevernîgara Qîza Qaqayê Xaweranê bînin.”

Dibê:

“Îja yê ça bînin?”

Dibê:

“Eger ‘Edo hişyar be bira guhê xwe rind bidê. Ez ê terîf kim bira ew jî ûygûlamayê<sup>320</sup> bike. Evna ku subê rabûn bira ‘Edo roja bijmêre. Yê hevt roja reşayê herin. Hevt ro reşayê çûn yê hefta jî qûmê herin, li qûmê. Yê herne devê behrê. Yê herne devê behrê, qayikçî heye. Ez ê niha meytûbekî binvîsim, jorda berdme bin darê. Eger ‘Edo hişyar be ku subê rabû bira meytûbê hilde. Meytûbê bide, ewê namê bide destê qayikçî. Qayikçî yê vana derbasî walî behrê ke. Wexta derbasî walî behrê bûn idî gor bavê wan. Idî ji walî bi çi şertî bikin, bi çi şeklî bînin ewa sorina<sup>321</sup> wan e. Wextê hatin, ku anîn îja hatin, wextê ku anîn hatin bira hevt rojê xwe dîsa qûmê bijmirin hevt rojê xwe jî reşayê bijmirin yê dîsa werne vira. Ew ê jî vira bibne mêvan em ê jî vira bibne mêvan ew şev.”<sup>322</sup>

### **3. 15. G5. Leheng navgînên sabît yên veguhastinê bi kar tîne.**

318 ) Hûr û kûr difîrîn.

319 ) Dîsa, careke din.

320 ) Sepan, tetbîq.

321 ) Pirsgirêk.

322 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 30 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Kurê Şah Ahmed, r. 6-7

*Di Çîroka Mîrze Miheme-Kurê Şah Ahmed de wexta ku Mîrze Miheme [leheng] û bi aqilmendê xwe [alîkar] ve heft rojan di reşayî, heft rojan jî di qûmê de diçin û xwe digihînin devbehrekî, li devê behrê bi qayikêkî [navgîna sabît] derbasî aliyê din dibin.*

Evna hefta bi reşayî diçin hefta bi qûmê diçin, diçne devê behrê. Diçne devê behrê, dêna xwe dinê, qayîkek li devê behrê sekiniye. ‘Edo derdixe ewê namê dide destê qayikçî. Qayikçî vana derbasî walî behrê dike.’<sup>323</sup>

*Di Çîroka Navçekerê Kurê Îza de padişahê şîher êdî pê qani’ dibe ku Îza [leheng] xortekî bibiryar e bo hîlanîna heyfa bavê xwe, padişahê şîşer jê re hespekî dide amadekirinê û bo heyfhilanînê wî bi rê dike [leheng navgînên sabît yên veguhastinê bi kar tîne].*

Dibê paşa rabû gazî seyîsa kir, go:

“Kuro, kîjan kihêlê jêhatî, hespê jêhatî ye ku bikeve herba, bikeve şera, bikeve erqa sîyarê xwe xilas ke, kihêlekî isa bikşîne bin vî. Şûr, kîjan şûrê çelîk<sup>324</sup> e ku netewe, neşkê, dewsa yekî duduya binê. Gurzê wî, qilicê<sup>325</sup> wî, her tiştî wî ser girêdin, hazir kin. Zirrekî herbê binê.”

Dibê her tiştî wî tam kir. Dibê xurçika wî jî tijî, de îja pere be, yê wî çaxî mecdî be, zêr be, dibê xurçik jî tijî kir, go:

“Dîya te jî xûşka min e. E ça l’ xûşka xwe binhêrim, ça qîza xwe binhêrim, ez ê isa jî dîya te binhêrim. Ku tu hatî, hatî. Tu nehatî jî ev tiştê mi dane te xûna bavê te nîne. Tu bê, xûna bavê mi ez nadim. Mi çi jî daye te xaş helalî te be. Çunkî bavê te mêrê xûnê nîne ku tu bêjî xûna wî [bide].”<sup>326</sup>

### **3. 15. G6. Leheng şopên xwînê dişopîne.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [3] de wexta ku Mîrze Miheme [leheng] lêdixwe zîhê [dêw] birîndar dike, zîha ber bi kûla xwe ve, ber bi lana xwe ve diçe. Mîrze Miheme jî xwûna ji birîna zîhê rijîyayî teqîb dike û bi wî awayî cihê ku zîha ketiyê tesbît dike [dilopa xwîna rijîyayî dibe rênîşandêra lehengî].*

Efendim, zîha diçe. Ew [Mîrze Miheme] pey diçe. Zîha diçe. Kincê xwe davêje, sola xwe davêje.

323 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 30 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Kurê Şah Ahmed, r. 7

324 ) Pola.

325 ) Şûr.

326 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 15 Îlon 2016, Çîroka Navçekerê Kurê Îza, r. 8

Efendim, diçe dêna xwe didê, diçe rasteke nota<sup>327</sup> wê rasta<sup>328</sup> ewê [Bayîzdaxa]. Dêna xwe didê, beraşekî aşa li wir e. Xûna wî hetanî wira çûye. Efendim, zîha li wir da dikeve xarê. Efendim, jor da dikeve xarê. Ew jî diçe. Dêna xwe didê, heqeten kûlek<sup>329</sup> e. Zîha çû kete hundir. Vedigere tê.<sup>330</sup>

**3. 15. a) Di çîrokên kurdî de ji bilî van, hebên genim û agir û... jî dibine sedema ku lehengê çîrokê ber bi cihê mebestê ve here. Wek nimûne dema ku leheng mijûlî aşpêjîyê ye û agirê wî vedimire, ji dûr ve çîrûskê agirekî dibîne û ber bi wî alîyê ve diçe û hwd.<sup>331</sup>**

*Di Çîroka Eybezê Xaz, Kurê Hirçê, Nebiyê Paşê [Paşayê Misrê] de wexta ku dora nobedariyê tê Eybez [leheng], Eybez li ser halê dayîka xwe û kalikê xwe diponije, agir ji bîr dike û agirê wî ditemire. Wexta ku agirê wî ditemire Eybez li dûrva dû-agirekî dibîne û xwe ber bi wî agirî ve digire û diçe.*

Ew şev sira<sup>332</sup> Eybez bûye. Eybez nobeta xwe digre. Xwe ra agrê xwe şuhle dide. De hema isa kalkê wî, cîya wî dikeve bîrê. Hema isa xwe ra dalmîş<sup>333</sup> dibe, agrê wî ditemire. Radibe, dêna xwe didê, agirê wî temirye, dibê:

“Welle birê mi yê bêjin Eybez tirsyaye, razaye, agir temirye. Ez rabim ça bikim?”

Dikeve wan dera xwe ra digere, dibê:

“Ka ez ê agir li ku bûlmîş<sup>334</sup> kim?”

Digere. Dêna xwe didê, dû-agirek li cîkî radibe. Radibe, xwe li ber wî agrî wî dûyî digre diçe.<sup>335</sup>

### **3. 16. LEHENG Ê ÊRÎŞKAR DI ŞEREKÎ DE DERDIKEVIN HEMBERÎ HEV PÊNASE: PEVÇÛN/ŞER SÎMGE: H**

#### **3. 16. H1. Leheng û êrîşkar li meydanê şer dikin.**

---

327 ) Mîna.

328 ) Deyşt, deşt.

329 ) Şikeft.

330 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 2

331 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 98

332 ) Dor.

333 ) Ponijîn.

334 ) Bînîn, dîtin.

335 ) Harûnê Zava, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1974, Dema çîrokwergirtinê: 23 Îlon 2016, Çîroka Eybezê Xaz-Kurê Hirçê-Nebyê Paşê [Paşayê Misrê], r. 5



*Di Çîroka Hemze Pelevan de Hemze Pelevan [leheng] di dawiyê de di meydana şêr de bi qiralê şîher [tawankar/êrîşkar] ve rûbirû dibe û şer dîkin.*

Dibê Hemze dikeve nava şîher, yê silamet ew bûye li mala xwe nebûye. Hetanî şîher hev dihise Hemze nîvê şîher dibirre. Dibê dêna xwe dinê, idî pê nikarin. Qiralê şîher tîne tê, dixne maledor, dibê:

“Rojê dora malekî ye.”

Çiqa jin-zarê wê malê hene dine pêşya Hemze. Hemze, çiqa bi wan ra şer dike şer dike. Serê hemûka jêdike. Isakîne<sup>336</sup> dewam dike. Çadirek xwe ra perrê şîher vegirtîye. Hemze, êvarê çadira xwe ye. Sibê jî li meydanê şêr dike.”<sup>337</sup>

**Di nimûneyên rûsî de sê şêwazên din hene ku di çîrokên kurdî nayên dîtin. Ev sê şêwazên pêşbirkê wisa ne: Pêşbirk, lîstika kartan, kişandina weznê.<sup>338</sup>**

**3. 16. H2. Leheng û êrîşkar dikevin pêşbazîyê.**

**3. 16. H3. Leheng û êrîşkar bi lîstika kaxizan dilîzin.**

**3. 17. ÊRÎŞKAR TÊK DIÇE**

**PÊNASE: SERKEFTIN**

**SÎMGE: I**

**3. 17. I1. Êrîşkar li meydana şêr têk diçe.**

*Di Çîroka Hemze Pelevan de Hemeze [leheng] û Kindir [alîkar] li hev dîkin û di meydana şêr de li hemberî qiralê şîher [êrîşkar/tawankar] bi ser dikevin.*

Dibê Kindir cabê dide qiral, dibê:

“Çiqa milletî wî heye bira têxe sûra xwe, hewşa xwe. Bira jinê bî tene qûteqût. Bira êtîm tene zarezar. Wî çaxî hêrsa min ê were ez ê lêxim bikujim. Wekî din hêrsa min neyê ez nakujim.”

336 ) Wisa, bi wî awayî.

337 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 12

338 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 98

Paşa ‘eynekî wê tempoyê<sup>339</sup> dike. Hemûka têdixe sûra xwe, derîya lê qapat<sup>340</sup> dike. Dibê Hemze [û] Kindir li meydanê li hev dixin. Dibê du serîya dine hevdu, dibe qîrçînîya wana. Dibê Kindir li dêrî dixê dikeve hundir. Hemze xwe dide ber derê sûrê. Dibê çîqa millet tê da be, tamamî wî bi qiral va şerjê dikan. Davêjne dera hanê.

[Kindir] dibê:

“Kuro Hemze, kê ma, kê nema?”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Pîra sêr ma.”

Kindir dibê:

“Tu were, miherin.”<sup>341</sup>

Dibê tèn. Dêna xwe dinê, pîrê wî qulçikî<sup>342</sup> da rûniştîye. Zêra dijmêre, davêje qulçikê hanê. Hemze xwe dide ber dêrî. Kindir dikeve hundur. Wexta Hemze dibê:

“Pîrê, mi devê te gê, tê ku da herî?”

Dibê, pîrê dibe ‘orrînîya wê, dibe dêlikekî. Dibê, dibe çîreçîra wê, ber Kindir ra baz dide. Dibê Kindir ça orta<sup>343</sup> pišta wê dixê, serê wê diçe derê hewşê qûnê wê dimîne di hundir da.<sup>344</sup>

### **3. 17. I2. Êrîşkar di pêşbazîyê de têk diçe.**

### **3. 17. I3. Êrîşkar di lîstika qumarê de têk diçe.**

### **3. 17. I4. Êrîşkar di lîstika xwewezinandinê de têk diçe.**

### **3. 17. I5. Êrîşkar bêyî ku tu pevçûn biqewime tê kuştin.**

*Di Çîroka Hesên Hiseyn de di dawiyê de Hiseyn [leheng] vedigere mala bavê xwe, rastî dîya xwe û cihû [her du tawankaran/êrîşkaran] tê û her duyan li wê derê bêyî ku ti şer an jî pevçûnek biqewime dikuje.*

Diçe memleketê bavê xwe. Diçe. Dêna xwe dayê, cîya wî [û] cihû. Du hev zarê wî jî lê hene. Şûrekî hildide diçe. Efendimê xwe ra bêjim, diçe wira. Dibêje cîya xwe, dibê:

339 ) Lez, lezgînî.

340 ) Girtin.

341 ) Yanî tê maneya ku ‘em herin’ e. Ev şewegotin jî li Ebexê zêde tê bikaranîn.

342 ) Qunçik, goşe.

343 ) Nav, navend.

344 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 14-15

“Dayê, te çima iha kir? Ez serê dîk lê xim yan?”

Yek qîz bûye yek jî ew bûye. [Hiseyn] dibê:

“Ez serê dîk lê xim yan serê ewê lê xim, serê qîzikê lê xim?”

Serê herdika lê dixê, dikuje. Cihû jî dikuje. Cîya xwe jî dikuje. Wira vedigere tê. <sup>345</sup>

### 3. 17. I6. Êrîşkar rasterast tê qewirandin.

### 3. 18. NÎŞANEKE TAYBET LI LEHENG PEYDA DIBE

**PÊNASE: NÎŞANA TAYBET**

**SÎMGE: J**

### 3. 18. J1. Di bedena leheng de nîşanek peyda dibe.

*Di Çîroka Mîrze Miheme de wexta ku Mîrze Miheme lêdixê zîhê [dêw] dikuje ‘qîza paşê jî destê xwe di xwûna zîhê de dike û li piştê Mîrze Miheme dixê’ [prensê bi penceyên xwînê lehengê rastîn dîyar dike]. Lê, çaxê ku kurê wezîr û kurê wekîl [lehengên derewîn] îddia dikin ku wana lêdaye û zîha kuştîye, qîza paşê an prensê bi wê nîşaneyê xwe lehengê rasteqîn eşkere dike.*

*Di çîrokên kurdî yê cadûyî/derasayî yê ku li Ebexê berhevkirî de hêmana ‘wekî lehengên sexte kurê wezîr û kurê wekîl’<sup>346</sup> jî hêmaneke berbelav e.*

Qîzik dibê:

“Ez dizanim kê ye.”

Qîzik nas dike, dibê:

“Merivekî dinê ye. Ev nînin. Nîşana mi lê heye. Ew meriv çawa were ez ê nas kim.”

Dibê:

“Kê maye?”

Dibê:

“Kurê pîrê maye, ewî hatye nêvanê pîrê.”

Gazî dikinê. Çawa tê, [qîzik] çakê wî radike, dibê:

“A bavo, a nîşana mi hova<sup>347</sup> ye. Mi çawa destê xwe xûna zîhê daye, piştê da daye, kifş e. A ev

345 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexê-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 20

346 ) a) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexê-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 22 b) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexê-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 20-21

347 ) Li vir, li vir e.

meriva ye.”<sup>348</sup>

### 3. 18. J2. Leheng gustîlik an jî destmalek dibîne/bi dest dixê.

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de wexta ku Xoce Elî [tawankar/êrişkar], Gul [leheng] wekî qurbanekî dibe Çîn-Maçînê, qiralê Çîn-Maçînê qîza xwe [prensês] dide Gul. Di rêya vegerandinê de Xoce ‘Elî, Gul davêje behrê. Lê, di zivirandinê de beriya ku Xoce ‘Elî Gul bavêje behrê, qîza qiral yanî dergîstiya Gul, gustîla xwe dide Gul [prensês gustîlkê dide lehengî].*

Dibê Xoce ‘Elî çi b’ke? Xoce ‘Elî, haşa hizûra we, destekî serî yekî qûnê, [dibê]:

“Kuro, mi çû qîza qiral anî! Mi Gul avît! Îja qîza qiral sibê, niha gustîlê xwe jî hev guhirîne, qîza qiral sibê şahdetîkî li cem padşê bide, paşa yê serê mi jî lê xe! Ka îja ez ê Gul ku derê bibînim bînim?”<sup>349</sup>

**Awayekî din ji bo diyarkirinê di çîrokên kurdî de wisa ye ku leheng piştî kuştina tawankar; bêvil, guh û lêvên wî dibire û hiltîne, piştê bi van tiştan xwe bi prensês û kesên din dide selimandin. Ev rûdan di çîrokên kurdî de gelekî dubare dibe û berevajî şêwazên din, bi vî rengî leheng bi xwe vê erkê encam dide. Herwisa di şêwazeke din de leheng dax û nîşana xwe li ser ran û hêtên lehengê derewîn dide û dawîya çîrokê ew tê bêrûmetkirin.**<sup>350</sup>

### 3. 18. J3. Curbecur nîşanên din.

*Di Çîroka Mîrze Miheme de lehengê çîrokê Mîrze Miheme [lehengê rasteqîn] bi şertê daxkirin û dexmekirina kulûmekên kurê wezîr û kurê wekîl [lehengên derewîn], piçek ‘şîrê şêr di îyarê şêr da’ dide wan. Mîrze Miheme paşê bi wê dexmeya xwe, her du lehengên derewîn eşkere û bêrûmet dixe [leheng dax û nîşana xwe li ser ran û hêtên lehengê derewîn dide û dawîya çîrokê ew tê bêrûmetkirin]*

[Mîrze Miheme] dibê:

“Yê [ku] te ser werem dernexistibû jî ew herdikê han bûn, erê? Tu kulûmekê wane rastê binhêre,

348 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 10

349 ) Nûredînê Xelkê Xaçê, Gundê Xaçê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 20

350 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 98

herdik jî mi dexme kirine.”

Heqet, şapkê wana berjêr dikin, dêna xwe dinê, dexmekirîne. Aha!<sup>351</sup>

### 3. 19. XERABÎYA DI DESTPÊKÊ DE TÊ TELAFÎKIRIN AN JÎ KÊMAHÎ TÊ PÊŞWAZÎKIRIN

PÊNASE: PÊŞWAZÎKIRIN

SÎMGE: K

#### 3. 19. K1. Objeya ku lê tê gerîn bi zorê an jî bi hîleyê/qurnazîyê tê revandin.

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de Hesên [leheng] wexta ku diçe cihekî, dêna xwe didê du zarok devjeniyê dikin. Hesên diçe li cem wana û fêr dibe ku her du zarok li ser kum û qamçîyê ku ji bavê wan ji wan re maye, devjeniyê dikin. Hesên jî bi fêlbaziyekî wan her du objeyên sêhrî ji wan herdu zarokan direvîne û dibe.*

[Hesên] dibêje, dibê:

“Ez ê niha kevirekî bavêjim. Hûn ê birevin. Kê we kevir hilda, qamçî yê wî ye.”

Niha hukmetê xwedê, eva kevir davêje. Wexta kevir davêje, ewna li pey kêvir dikevin. Eva kum dide serê xwe. Qamçî dide destê xwe. Emrê xwedê, wexta direvin, hukmetê xwedê, dibê yê piçûk ‘eynî berê kêvir hildide. Wexta dizvirin, [dibên]:

“ ‘Emo<sup>352</sup>, ha ‘emo!’ ”

‘Emo tune. ‘Emo, ku ye? ‘Emo jî a li ber wana, nayê xuyan. Evê te [Hesên], kum dide serê xwe. Qamçî dide destê xwe, dibê:

“Xwedê em xilas kirin.”<sup>353</sup>

#### 3. 19. K2. Objeya ku lê tê gerîn bi xiz ji destê çend kesan derdikeve û dikeve destê çend kesan.

*Di Çîroka Hemze Pelevan de Hemze Pelevan [leheng] li pey Xeremcoyê [prensês] dikeve, diçe girava navbera heft behran û Xeremcoyê li wir dibîne. Lê, li wê derê Hemze Pelevan bi xeletî sêhra kirasê Xeremcoyê betal dike. Gava ku sêhra kirasê Xeremcoyê betal dibe, kirasê Xeremcoyê yê*

351 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexê-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 23-24

352 ) Apo.

353 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexê-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar û Yek Şevî, r. 19

*bisêhrî di wextekî kin de ji destê çend kesan derdikeve û dikeve destê çend kesan.*

[Xeremco] go:

“Haylê, mala te xirabûyî! Welle, ewa kirasek bû. Bavê mi, mi ra bi sêrê çêkiribû. Ne bi meqesê hatibû birrîn ne bi derzîyê hatibû dirûtinê. Bi sêrê çêbibû. Te teze sirra mi li dunyayê xist. Idî gor bavê te. Tu ça dikî bike.”

[Hemze Pelevan] go:

“Weyyy! Mi go, ka tê çi bêjî. Mala bavê wê şewityê. Kê bi mi dikare xêncî xwedê.”

[Xeremco] dibê:

“Ê de baş e.”

Kiras isa diçe. Ahoyê<sup>354</sup> me ber pêz e. Cigara wî heye, agrê wî tine. Ahoyê me go:

“Xwedê kim, eva kirasa layîqî Hacerê<sup>355</sup> nîne. Ez ê biherim bime mixtarê gund. Bira mixtarê gund çend sala şivantîya mi zêde ke.”

Dibê wexta dibe dide mixtar, mixtar dibê:

“Xwedê, eva layîqî jina mi nîne. Ez ê biherim bime axê. Bira axa çend sala mixtarîya mi zêde ke.”

Wexta dibe dide, [axa dibê:]

“Peyyy! Kuro, kirasê Xeremco ye.”

Ew axaya, berê dehwa Xeremco kiribûye, hemen gazî pîrê sêr dike, pîra top dike, dibê:

“Kê here Xeremcoyê mi ra bîne were sax-silamet, ez ê wana tême terezîyê, beramberî wana zêr bikînim [û bidime wana].”<sup>356</sup>

**3. 19. K3. Objeya ku lê tê gerîn bi saya cazîbeyê tê bidestxistin.**

**3. 19. K4. Bidestxistina objeya ku lê tê gerîn rasterast encameke çalakîyên berê ye.**

**3. 19. K5. Objeya ku lê tê gerîn bi navgînîya objeyeke sêhrî hemen tê bidestxistin.**

**3. 19. K6. Bikaranîna objeya sêhrî feqîrîyê-hejarîyê diqedîne/dawîya feqîrîyê-hejarîyê tîne.**

*Di Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêdê de wexta ku dîya Tucar Ahmed [leheng] zêrekî dide Şêx'Elî seva ku di sefereke Çîn-Maçînê de ji wan re hinek tişt-mişt bistîne, Şêx 'Elî jî bi wî zêrê wan ji wan*

354 ) Birayê çîrokbêj.

355 ) Jina Aho û jinbira çîrokbêj.

356 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 19 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 7-8

*re meymûnekî [obje an jî hokara sêhrî] dikirre. Bi saya wî meymûnî feqîrîya Tucar Ahmed û ya dîya wî diqede û zehf zengîn dibin.*

Neyse, mi we ra ça gotye, ‘eyne wisa dibêjin. Her yek ‘eynî kîse zêr didê. Ewan tişt-mişt, cewheratên ku ewî ji behrê derxistine, ewana jî dinê. Yalniz<sup>357</sup>, Şêx ‘Elî kerr dibêjê:

“Kuro, bax<sup>358</sup>, miqatî meymûnê xwe bibe. Meymûnê te, kulî rojê xwedê, sibe sibe kîse zêr te ra dianî. Yanî yê te ra bîne. Idî çi be ez nizamim. Dayîna xwedê ye. Tê bi vî qirarî xwe ra dewam kî.”

[Tucar Ahmed] go:

“Bira tucar herin. Ez mame li wira. Ez çehv bi meymûnê, çehv bi zêra ketime. Mi dêna xwe dayê, valî-walî ez hey sivik bûm.”

Dîya mi gote mi:

“Kurê mi, rabe em herin. Lawo, a ihakîne<sup>359</sup> nabe. Perê te zehf e û zêrê te zehf in. Îja em bêjin, em nava şîher da te ra dikanekî bikirrin. Îşekî bike. Filan.”<sup>360</sup>

### **3. 19. K7. Objeya ku lê tê gerîn di dema nêçîrekê de tê bidestxistin.**

*Di Çîroka Avcî Ahme de wexta ku Avcî Ahme [leheng] derdikeve nêçîrê rastî mehreke sipîçîl û mehrekî reş tê. Avcî Ahme wexta ku tîra xwe davêje ku mehra reş bixe, tîra wî diçe û bi mehreke sipîçîl dikeve. Jixwe Avcî Ahme objeya ku lê digeriya [zanîna zimanê heywanan] piştî vê nêçîrê dest pê dike.*

Dibê sal çûn, zeman çû. Rojekî Avcî Ahme rabû derkete nêçîrê. Zanî? Notanî<sup>361</sup> vî kîrre<sup>362</sup> me yê Tendûlekê here nêçîrê. Avek dikşîya. Li derê avê sekinî, mêze kir. Dêna xwe dayê, mehreke sipîçîl derket, li ser sel sekinî, xwe da tavê. Mehrekî qol î reş derket, bi wê şa bû, bi wê mehra sipîçîl şa bû.

Dibê Avcî Ahme duşmîş<sup>363</sup> bû, ji tevdîrê îllahî ra go:

“Ya rebbî, ev mehra bedew e te ha çêkirye, heqas çehvê wê reş e, sipîçîl e. Ka pekî ev mehr î kol î reş çima lê bû bela?”

Di wexta tîra da bû. Wexta tîr-kevana bû. Dibê wexta Avcî Ahme tîra xwe derxist, dûz kir ku avît li mehreke reş xe, mehreke reş xwe welgerand kete qulê, mehra sipî birîndar bû. Te seh kir? Mehra sipî jî

357 ) Lê, lê belê.

358 ) Binêre.

359 ) Wiha.

360 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokewergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, r. 9

361 ) Mîna

362 ) Ji çiyayên volkanîk ra ‘kîrre’ tê gotin.

363 ) Fikirîn.

xwe pey berda, ew jî birîndar kete qulê.<sup>364</sup>

### 3. 19. K8. Kesê ku lê sêhr hatiye kirin vedigere şexsiyeta/nasnameya xwe ya berê.

*Di Çîroka Hemze Pelevan de pîra sêhr, Xeremcoya jina Hemze Pelevan dixapîne û bi şilkirina qebza şûrê Hemze Pelevan [tilismkirin] tilisma rihê Hemze Pelevan [leheng] zeft dike. Wexta ku pîra sêhr tilisima rihê Hemze Pelevan zeft dike, qîza dêw [jina Hemze Pelevan] bi zenggirtina xencera ku Hemze Pelevan wek dîyarîyek dabûyê, pê dihise ku Hemze Pelevan di tengasiyê de ye.*

Em werne qîza dêw. Qîza dêw sibê zû hişyar dibe. Wexta radibe mêj dike, qalibê xencerê kaş dike, dêna xwe didê, isa paxs<sup>365</sup> girtîye, paxseke hêşîn. Isa diqîre! Xencer ya Hemze bûye, dabûye qîza dêw. Jina wî bûye, daye wê. Ji Mezher<sup>366</sup> ra bêjim, birê xwe ra bêjim, qîzik isa diqîre mîta<sup>367</sup> teyr. Dêw dibê:

“Qîza mi, ça bû?”

[Qîza dêw] dibê:

“Bavo, bide xatrê xwedê, Hemze tengasiyê da ne.”

[Dêw] dibê:

“Lawo bide xatirê xwedê, du hev pirîskê kulê bûn hatibûn ketibûne mala mi. Lawo, bise.”<sup>368</sup>

*Wexta ku qîza dêw pê dihise ku Hemze Pelevan [leheng] di tengasiyê da ye ji bavê xwe daxwaz dike ku bavê wê tilisma pîra sêhr betal bike. Li ser daxwaza qîza dêw, dêw xwe davêje binê behrê û şûrê Hemze Pelvan derdixîne. Dêw, şûr dide ber êgir diqelîne û gava ku şûr berdide qêlif Hemze Pelevan li ser xwe ve tê [şikandina tilismê].*

Dike nake ewlad e. Dilê wî pê dişewite. Dibê dêw xwe xorozi<sup>369</sup> behrê dike. Şûrê wî derdixe. Dibê dide ber sobê temîz diqelîne. Wexta berdide qêlif, dibê Hemze dibê:

“Weee Xeremco, ez çi xeweke xaş da bûm. Te ez hişyar kirim.”

Dêw dibêjê:

“Weylê mala te xirabûyî! Rabe ser xwe. Pîrê rîtye devê te, Xeremco birye. Xeremcoya çi? Halê

364 ) Silêmanê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1953, Dema çîrokwergirtinê: 5 Cotmeh 2016, Çîroka Avcî Ahme, r. 1

365 ) Zeng, jeng.

366 ) Berhevkar.

367 ) Mîna, nola.

368 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 11

369 ) Xweavêtîna avê.



### 3. 19. K9. Mirî zindî dibe.

*Di Çîroka Hebkahinarê de wexta ku pîra sêhr [tawankar/êrişkar] nanê bijehr dide Hebkahinarê [leheng], Hebkahinarê dimire. Wexta ku Hebkahinarê dimire birayên wê yên dêw, wê dixine nav qutîyekî û li ser rêya xwe datînin. Hinek zeman ser ra derbas dibe paşa emir dide xizmetkarên xwe ku xizmetkarên wî herin û wê qutîyê hildin bînin. Wexta ku xizmetakrên paşê wê qutîyê hildidn tînin, hinek zeman ser ra derbas dibe û Hebkahinarê di wê qutîyê de dibe serteşîyekî û ji wê qutîyê derdikeve. Wexta ku xizmetkara mala paşê wê serteşîyê dibe mala xwe, ew serteşî dibe qîzekî, yanî Hebkahinarê zindî dibe.*

Radibin diçin. Ewê qutîyê nava hev ra dikin, hildidin tînin. Dikin nakin derê qutyê venabe. Qutya pola ye. Dişkênin, ça dikin, venabe. Ewê qutîyê hema isakîne<sup>371</sup> xwe ra datînine wê derê, disekine.

Berdestyeke mala paşê hebûye. Pîrek e. Pîrek e berdestiya mala paşê ye. Ewa qutya jî wê derê ye.

Ewa qîzka dibe serteşîkî, hundirê qutyê da derdikeve. Dibe serteşîyê berê [ku] me ça hirî pê dirêsa. Ji sêrê ye, da. Hindirê wê qutyê da derdikeve. Xwe xwe derdikeve, dibe serteşîkî. Hema xwe ra nava mala paşê da ne. Pîrê jî hema hildide, dibê:

“Hîî, serteşîke çiqa rind e. Ez ê biherme mala xwe. Ez ê xwe ra serî kim, pê hiriyê bişkinim.”

Hildide tîne. Datîne pencera xwe. Pîrê nizane. Datîne pencera xwe. Pîrê idî diçe nava mala paşê da dixevite, da. Pîrê jî hema mala xwe datîne, halê xwe dihêle. Diçe îşê mala paşê dike. Vala nabe. Mala xwe, halê xwe, karê xwe dihêle, diçe. Tewneke pîrê jî dar va ne.

Ew serteşî xwe ra dibe qîz, xwe ra qîzekî. Xwe ra dikeve nav malê da. Wextê ku pîrê tê, dibe serteşî dîsa diçe pencerê. [Qîzik] dibê:

“Ez zehf çênakim. Bira pîrê nekeve şikê.”<sup>372</sup>

### 3. 19. K10. Êsîr/dîl tê xelaskirin.

*Di Çîroka Mîrze Miheme [3] de lehengê çîrokê Mîrze Miheme wexta ku li pey zîhayê [dêwê] birîndar diçe û dikeve bîrê, di wir de rastî sê heb qîzên dîlgirtî tê.*

370 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 11-12

371 ) Wisa.

372 ) Amojna Suhbet, Gundê Şerefxanê Jorê-Ebexe-Wan 1973, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Hebkahinarê, r. 3

Çiqa dibê, dadixin. Diçe. Efendim, de dunya ew e. Diçe dêna xwe dayê, efendim, diçe dêna xwe didê, kûlek e. Wira, sê hev jin li wir in. Sê hev qîz in, dibê:

“Heyyy! Mala te nekeve! Tu ça hatî? Zîha birîndar bûye. Zîha, niha rabe yê te jî bikuje, me jî bikuje!”<sup>373</sup>

*Axiriyê de Mîrze Miheme [leheng] di birê de lêdixê zîhê [dêw] dikuje û pişt re jî wan hersê qîzên dîlgirtî ji destê dêw xilas dike.*

Zîha, wira ‘işk<sup>374</sup> dibe. Efendimê xwe ra bêjim, jînik tîn. De wusa bedew in. Zêr zîv zehf in [Mîrze Miheme] dibêje birê xwe, dibê:

“Sebata daxin. Ez ê vana [van hersê qîzana derxime jorê].”<sup>375</sup>

### **3. 19. K11. Bidestxistina objeya ku lê tê gerîn bi heman rengê bidestxistina objeya sêhrî ye.**

**3. 20. LEHENG VEDIGERE. Veger û gîhaştin bi pîranî bi heman rengî ne. Digel vê jî pêdivî bi dirûveke taybet ya vegerê nîne. Di gîhaştinê de curbecur navgîn û serborî hene lê veger hemen pêk tê. Lê bi heman rengê gîhaştinê ye.**

**PÊNASE: VEGER**

**SÎMGE: ↓**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de lehengê çîrokê Mîrze Miheme di axiriyê de piştî ku digihîje hemû armancên xwe vedigere malê [mala bavê xwe].*

*Divê neyê jibîrkin ku di çîrokên ku me li Ebexê berhevkirî de hêmana ‘barê heft deveyan’<sup>376</sup> an jî ‘barê sivik qîmetê giran barê heft deveyan’<sup>377</sup> hêmaneke berbelav e. Gava ku leheng vedigere mala xwe an mala bavê xwe bi ‘barê sivik qîmetê giran barê heft deveyan’ vedigere.*

Dibê ewê jî, barê hevt deva ji wê eşyayê wê jî bar dike. Her<sup>378</sup> jinê xwe hildide, berê xwe dide

373 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 3

374 ) Sekitîn.

375 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 5

376 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 29 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Gozel Dunyayê, r. 28

377 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 16

378 ) Herdu.

mala bavê xwe, tê.<sup>379</sup>

### 3. 21. LEHENG TÊ ŞOPANDIN

**PÊNASE: ŞOPANDIN**

**SIMGÊ: Pr**

#### 3. 21. Pr1. Şopîner, li pey leheng difire.

**3. 21. Pr2. Şopîner, daxwaza sûcdar dike [Şopîner, daxwaza sûcdar/tawankar/êrişkar pêk tîne.**

*Di Çîroka Hemze Pelevan de dilê qiralê şîher [tawankar/êrişkar] dikeve Xeremcoyê [qurbanî]. Ji bona ku Xeremco ji qiralê şîher dûr bikeve bavê Xeremcoyê jî, Xeremcoyê bi awayekî dişîne davêje girava navbera heft behran û bi awayekî sêhrî Xeremcoyê li wê derê dide veşartandinê. Lê, gava ku sêhra Xeremcoyê betal dibe, qiralê şîher gazî pîra sêhr [şopîner] dike û jê daxwaza anîna Xeremcoyê dike. Pîra sêhr jî daxwaza sûcdar/tawankar bi cîh tîne.*

Ew axaya, berê dehwa Xeremco kiribûye, hemen gazî pîra sêr dike, pîra top dike, dibê:

“Kê here Xeremcoyê mi ra bîne were sax-silamet, ez ê wana tême terezîyê, beramberî wana zêr bikşînim [û bidime wana].”

Bavo, dibê pîrek derdikeve. Dibê ji haşayî cima’etê, dibe zîrezîra qûna wê, dibê:

“Ew xweyê vê nefsê ye. Wellehî, ez ê bînim.”<sup>380</sup>

#### 3. 21. Pr3. Şopîner dema ku dişopîne dikeve rengê çend heywan an jî tiştêkî dî.

*Di Çîroka Harûnê Reşît, Siltan Zibêdê de padişahê cinan [şopîner] dikeve şiklê meymûnekî û li pey Tucar Ahme [leheng] û qîza miftî dikeve.*

De îja em bêjin, Tucar Ahmed isa bi wî [meymûnê] va emîn e. Idî ew çî dibêje, ew xebera wî dike. Qet duşmîş<sup>381</sup> nabe, nabêje:

“Ka tu kê yî? Tu ça dizanî? Ev çî ye?”

379 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergrîtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 25

380 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergrîtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 8

381 ) Fikirîn.

Dibê [Tucar Ahmed] hemen<sup>382</sup> diçe. ‘Eynî bi gotina wî [meymûn] dike. Wexta ku kêrê hildide, sandiqê vedike, dîk şerjê dike, serê wan heft têjkê mehra jê dike, gava sandiqê weldigerîne, dibê hemen bû qîrçîniya qîzîkê. Dibê meymûnê qîzîk hilda, herrek tu naçî!

Yanî eva [meymûn] padşahê cinan e, bûye aşqê wê qîzkê. Evî [meymûn] bi sêhrê, bi nihêrandinê, yanî bi wî qirarî kirye. Yanî eva kafira wexta ku diçe ‘alema wan, ew têjkê mehra nahêlin here. Çimkî<sup>383</sup> diçe ku qîzîkê bîne, em bêjin jê ra nihêrîne, bi vî qirarî kirine, nikare ûlaşmîş<sup>384</sup> be. Yanî eva [meymûn] jî aşqê qîzîkê ye. Wexta ku sandiq weldigere, ew sêr betal bû. Ewî [meymûn] jî zaten di ‘alema xwe da qîzîk hilda, bi çolê ket, bi hewaye ket, çû.<sup>385</sup>

### **3. 21. Pr4. Şopîner dikeve rengê objeyeke bi cezb û dertê rêya leheng.**

### **3. 21. Pr5. Şopîner hewl dide ku leheng perçe bike û bixwe.**

### **3. 21. Pr6. Şopîner hewl dide ku leheng bikuje.**

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de Nûrûlhuda [şopîner] hewl dide ku Hesên [leheng] ji nav bibe û bikuje.*

Nûrûlhuda pê dihise, eskerê xwe li pey dixê. Evana mudekî pîrr tîn. Li bolgekî<sup>386</sup> idî Nûrûlhuda xwe bi wan ra dighîne. Nûrûlhuda xwe bi wan va dighîne.

Dibê eva [Hesên] wetxa qamçiyê xwe li ‘erdê dixê, de îja ew sêzde padişah, eskerê wana hazir dibe. Dibêje dibê evana wisa li hev dixin.<sup>387</sup>

### **3. 21. Pr7. Şopîner hewl dide dara ku leheng xwe tê da veşatiye, bi diranên xwe perçe bike/jê bike.**

**Di çîrokên kurdî de dibe ku tawankar bi zahir û cilûbergên derwêş an parsekekî li pey leheng bigere. Li hin çîrokan jî lehenga keç, bi teşeya mehînan an xezal an dar û hêlanek û êzingê de ji destê tawankar direve û tawankar fermana serjêkirin, birîna darê û şewitandina**

382 ) Yekser, zû, di cî de.

383 ) Çimkî.

384 ) Gihîştin.

385 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexê-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, r. 11

386 ) Cih, dever, herêm.

387 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexê-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 20

**hêlanekê dide û hewl dide ku lehenga keç ji nav bibe; lê li dawiyê [lehenga keç] dibe weke keçika bedew a hertim û tawankar û lehengê derewîn bêrûmet dike.**<sup>388</sup>

**3. 21. a) Di çîrokên kurdî de dibe ku tawankar bi zahir û cilûbergên derwêş an parsekekî li pey leheng bigere.**

*Di Çîroka Hemze Pelevan de pîra sêhr [tawankar] bi zahir û bi cilûbergên dewrêş û parsekekî nebe jî bi cilûbergên sofî û hecîyekî li pey Hemze Pelavan [lehengî] dikeve.*

Dibê pîrê soz dide qiral. Tê devê behrê. Dibê pufî behrê dike. Mehrekî ji behrê kaş dike. Mehr dibe qamçî. Li kûpekî sîyar dibe. Dibê [qamçî] davêje nava kûp, dibe vizeviza pîrê. Dibê pîrê tê ada orta<sup>389</sup> hevt behra. Mehrê xwe berdide hundirê kûpê xwe. Dibê tizbîke sedlibê hildide, dibê:

“Ez hecî me hecîya mame,  
Sofî me sofîya mame,  
Ser barê deva razame,  
Ketime, cî da mame.”

Hemze jî li nêçîrê bûye. Hine werdek-merdek destî wî da bûne, dibê:

“Pîrê te xêr e?”

[Pîra sêhr] dibê:

“Welle, hêca<sup>390</sup> gemîya me hatye vir ra çûye. Heta mi dezmêj girtye ez mêj kim, ez rabûme gemîcî tine. Gemîya me çûye. Îşev mi xweyî ke. Ez ê sibê herim.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Pîî, çî dibe.”<sup>391</sup>

**3. 21. b) Li hin çîrokan jî lehenga keç, bi teşeya mehîn an xezal an dar û hêlanek û êzingê de ji destê tawankar direve û tawankar fermana serjêkirin, birîna darê û şewitandina hêlanekê dide û hewl dide ku lehenga keç ji nav bibe; lê li dawiyê [lehenga keç] dibe weke keçika bedew a hertim û tawankar û lehengê derewîn bêrûmet dike.**

*Di Çîroka Hebkahinarê de pîrê, pîra sêhr [tawankar] bi jehrê Hebkahinarê [lehenga keç] bi*

388 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 99

389 ) Navber, navbeyn, nav.

390 ) Teze, niha.

391 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 8

*jehré dixé û dikuje. Wexta ku Hebhahinarê dimire dêwên birayên wê, Hebkahinarê têdixine nava qutiyeke pola û li ser rêya xwe datînin seva ku di çûyîn û hatinê de wê zîyaret bikin.*

*Wext di arê ra derbas dibe û rojekî paşa emir dide xizmetkarên xwe ku herin wê qutiye hildin bînin. Xizmetakrên paşê diçin wê qutiye hildidin tînin û dikin nakin nikarin wê qutîyê vekin. Gelek wext li ser ra derbas dibe û rojekî Hebkahinarê [lehenga keç]dibe serteşiyekî û ji wê qutiya pola derdikeve û ji destê pîra sêhr [tawankar/êrişkar] xilas dibe. Dawiya dawiyê de jî ew serteşî dibe qîzeke çardehsalî û bedew.*

Radibin diçin. Ewê qutiye nava hev ra dikin, hildidin tînin. Dikin nakin derê qutyê venabe. Qutya pola ye. Dişkênin, ça dikin, venabe. Ewê qutiye hema isakîne<sup>392</sup> xwe ra datînine wê derê, disekine.

Berdestyeke mala paşê hebûye. Pîrek e. Pîrek e berdestiya mala paşê ye. Ewa qutya jî wê derê ye. Ewa qîzka dibe serteşîkî, hundirê qutyê da derdikeve. Dibe serteşiyê berê [ku] me ça hirî pê dirêsa. Ji sêrê ye, da. Hindirê wê qutyê da derdikeve. Xwe xwe derdikeve, dibe serteşîkî. Hema xwe ra nava mala paşê da ne. Pîrê jî hema hildide, dibê:

“Hîî, serteşîke çîqa rind e. Ez ê biherme mala xwe. Ez ê xwe ra serî kim, pê hiriyê bişkinim.”

Hildide tîne. Datîne pencera xwe. Pîrê nizane. Datîne pencera xwe. Pîrê idî diçe nava mala paşê da dixevite, da. Pîrê jî hema mala xwe datîne, halê xwe dihêle. Diçe îşê mala paşê dike. Vala nabe. Mala xwe, halê xwe, karê xwe dihêle, diçe. Tewneke pîrê jî dar va ne.

Ew serteşî xwe ra dibe qîz, xwe ra qîzekî. Xwe ra dikeve nav malê da. Wextê ku pîrê tê, dibe serteşî dîsa diçe pencerê. [Qîzik] dibê:

“Ez zehf çênakim. Bira pîrê nekeve şîkê.”

Pîrê jî pîr e. Em bêjin, pîreke halê xwe da ne. Lêdide diçe. Tê, dêna xwe didê, wê mala pîrê tertemiz e. Tewna pîrê çêkirye. Zehf jî çênake, hindikî çêdike. Tewn, da. Berê tewna çêdikirin, xalîçe çêdikirin, berr çêkiririn, çîwal çêdikirin. Ya pîrê jî çîwal in, çîwal bûne. Berê çîwal çêdikirin, da. [Pîrê] dibê:

“Welle, wê [îşê] mala mi hemû kirye. Tewna mi jî çêkirye. E ça bikim? Ça nekîm? Ez ê xwe lê veşêrim.”

Pîrê tê. Hema dikeve pişt derî, xwe vedişêre. Dêna xwe didê, ew serteşîya li pencerê peya bû. Bû qîzeke çardosalî. Tu li qîzê dinhêrî, şerm dikî li qîzikê binhêrî! Radibe tê, wan derê pîrê temiz dike. Tewna pîrê çêdike, ret<sup>393</sup> dike. Wextê ku teqîniya derî tê, dibe serteşî diçe pencerê.

Wextê ku pîrê ber dêrî derdikeve, qîzikê digre, dibê:

“Ez cîya te me tu jî qîza min î.”<sup>394</sup>

392 ) Wisa.

393 ) Xilas, kuta.

394 ) Amojna Suhbet, Gundê Şerefxanê Jorê-Ebexe-Wan 1973, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Hebkahinarê, r. 3

### 3. 22. BI HAWARA LEHENG DE TÊ ÇÛYIN

PÊNASE: ALÎKARÎ

SÎMGE: Rs

#### 3. 22. Rs1. Leheng ber bi ezman ve tê birin.

*Di Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde de wexta ku meymûn [obje an jî hokara sêhrî] jina Tucar Ahmed direvîne, Tucar Ahmed li dû jina xwe dikeve û diçe. Di axirîyê de ji bo alîkarîyê Tucar Ahmed diçe cem wan xwûşkên xwe yên perî [alîkar] û xwûşkên wî yên perî jê ra heywanêkî bisêhr tînin, lê sîyar dikin û Tucar Ahmed ber bi ezmên ve bi rê dixin.*

Baş e. Tucar Ahmed, hê di çadira ku ji Harûnê Reşît ra birye, di wê çadirê da sekinye, xwe ra dibêje:

“Neysene<sup>395</sup>, gazî kirin. Yekî hirç î pirç anîn. Ez lê sîyar kirim. De îja, bi mi ra gotine, kelîmê tewhîd neyne. Wexta ewî ez bi hewa xistim, ez pir çûm hindik çûm. Ewî ez isa bilind kirim, yanê isa li nêzîkî ‘esmana bûm, stêrk mîta<sup>396</sup> loda dihatne xuyan. Li wê jorê, mi dêna xwe dayê, kalekî sipîçîl hema hat li ber mi sekinî, gote mi:

“Ahmed, kelîmê tewhîd bêje.”<sup>397</sup>

#### 3. 22. Rs2. Leheng astengan dertîne ser rêya şopînerê xwe û direve.

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de Hesên [leheng] û jina wî bi zarokên xwe ve sîyarî ‘hespên bayê birûskê’ dibin û ji Nûrûlhudayê [şopîner] direvin.*

[Hesên] qamçî li ‘erdê dixê, sêzde padişahê cina li ber hazir dibin. Dibêjin, dibên:

“Em dunyayê xirav kin, ava kin?”

[Hesên] dibê:

“Xirav nekin, ava nekin. Me ra sê hev hespê bayê-birûskê bînin.”

Sê hev hespa jê ra tînin, li ber hazir dikin. Ewana sîyar dibin. Sîyar dibin. Her yek kurekî xwe dide ber xwe. De bajon. Evana dajon. De îja hemi kum-qamçî pê ra nin, ha. Erê. Evana dajon. Pir tînin hindik tînin.<sup>398</sup>

395 ) Werhasil.

396 ) Mîna

397 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexê-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, r. 13

398 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexê-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 28 Îlon 2016,

**3. 22. Rs3. Leheng dema ku direve xwe dixe rengê hin objeyên ku wî vedişêrin.**

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de Hesên [leheng] kumekî dide serê xwe û gava wî kumî dide serê xwe nayê xuyan û bi vî awayî teşeya xwe diguherîne û ji destê Nûrûlhudayê [tawankar] xilas dibe. Ku ev hêmana ‘kum’<sup>399</sup> jî di çîrokên cadûyî yên ku li Ebexê berhevkirî de hêmaneke berbelav e û leheng gelek caran bi ‘kum’ jî tawankar xilas dibin.*

Evê te [Hesên], yê çar bike? Yê were. Dîrek<sup>400</sup> tê qawûşa ku Mîranusîna avîtine çarmixê da. Diçe jorê, dêna xwe didê, jina wî, herd<sup>401</sup> zarê wî tenê wir in. Dibê wexta ku kum li serê xwe hildide, dibê zarê wî hemen giryan, go:

“Peyyî, bavê me!”

Jinikê [Marînusîna] jî go:

“Heyran, ka bavê we vî qasî yê li ku were? Filan-bêvan...”

Erê, neysene<sup>402</sup>, [Hesên] diçe cem wana. Kum datîne, dibêje dibê:

“Ez hovanê<sup>403</sup> li vîra me. Qîzê, xwedê me xilas ke.”

Neysê, ewê [Marînusîna] vedike. Idî bi emrê xwedê, her yek zareke xwe hildide. Berjêr dibin.<sup>404</sup>

**3. 22. Rs4. Leheng dema ku direve xwe vedişêre.**

**3. 22. Rs5. Leheng di kargeha heddadekî de xwe vedişêre.**

**3. 22. Rs6. Leheng dema ku direve dikeve rengê heywanek, kevirek û hwd. û xelas dibe.**

**3. 22. Rs7. Leheng li hember ejderheya mê ku dikeve curbecur rengan û dixwaze wî bixapîne, li ber xwe dide.**

**3. 22. Rs8. Leheng destûr nade ku bê perçekirin û xwarin.**

---

Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 20

399 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexê-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 11-12-13-16

400 ) Rasterast.

401 ) Herdu.

402 ) Werhasil.

403 ) Hova, peyveke ku li Ebexê zêdetir tê bikaranîn û tê wateya ‘vir, li vir, li vir e’ ye.

404 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexê-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 19-20



**3. 22. Rs9. Di kêliya ku dê leheng bê kuştin de bi hawara wî ve tê gihastin.**

**3. 22. Rs10. Leheng heldipeke dareke dî.**

**3. 23. LEHENG XWE VEDIŞÊRE/KÎBÛNA XWE VEDIŞÊRE Û VEDIGERE MALA XWE AN JÎ WELATEK DÎ. Li vê derê du kategorî derdikevin.**

**PÊNASE: VEGERÎNA BI RENGÊ VEŞARTINA KÎBÛNA XWE.**

**SÎMGE: O**

**3. 23. O1. Vegera leheng ya mala xwe. Leheng diçe cem zenatkarek û li cem wî dixebite.**

*Di Çîroka Enayî Ahme de wexta ku Ahme [leheng] li welatekî xerîb karûbarê xwe diqedîne vedigere mala xwe lê, li cem zenatkarekî naxebite.*

Wî zemanê mi we ra go, mi go, iha bi deve-develix, xulam, xizmetkar tîn dehwa zeviya Ahme dikin. Wî çaxî Ahme, Enayî Ahme bûye da, isa nîne? [Kerwanbaşî] ‘eynekî wê tempoyê<sup>405</sup>, barê heft deva, qîmetê giran barê sivik bar dike. Bixulam, xizmetkar dide Enayî Ahme, dibê:

“Hûn ê biherin derê malê wî daynin werin.”

Bira Ahme rê keve were. Ahme tê, ber bîna xwe disekinê.<sup>406</sup>

**3. 23. O2. Leheng diçe cem kralê welatekî bîyan û li cem kral wekî seyis an jî aşpêj dixebite. Carina jî bi tenê vegera li welat heye.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme-Gozel Dunyayê de wexta ku Mîrze Miheme [leheng] Gozel Dunyayê hildide tîne, paşê vedigere şîher xwe [carina jî bi tenê vegera li welat heye].*

*Divê neyê jibîrkin di çîrokên ku me li Ebexê berhevkirî de ‘welat’ pirî caran wek ‘şîher’ derbas dibe.*

Dibê Mîrze Miheme wextê ku rê ket çû, dibê xebercîya pêş da xeber şandin, go:

“Mîrze Miheme hat.”

Dibê ayrica<sup>407</sup> jî Mîrze Miheme namedarek-namek nivîsî ji şehrê xwe şand. Dibê ji dîya xwe, ji

405 ) Wateya peyva ‘tempoyê’ lez û bez e. Lê di vir da çîrokbêj ev peyva bi wateya ‘ bi wî awayî’ bikaranîye.

406 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 12 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 14

407 ) Ji bilî vê, ji xeynî vê, xêncî vê.

ew meznê dabû dewsa xwe, dibê ji wana qederek esker xast, go:

“Ez dixazim qederek esker were.”

Dibê Mîrze Miheme, ew esker wextê hat bi wî şeklî, dibê daxilî şîherê apê xwe bû.<sup>408</sup>

**3. 23. a) Leheng bi awayekî nenas diçe bajar û welatekî din yan jî vedigere welatê xwe. Lehengê çîroka kurdî bi vê mebestê, gelek caran xwe weke keçekî bêdesthilat dide naskirin.<sup>409</sup>**

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de lehengê çîrokê [Gul] xwe weke keçekî xwe dide nasandin û diçe gundekî.*

*Jixwe di çîrokên kurdî yê efsanewî yê ku me li Ebexê berhevkirî de û pirani jî di varyantên çîrokên Mîrze Miheme de lehengê çîrokan seva ku neyê naskirin wexta ku diçine welatekî li ser rêya xwe rastî şivanekî tèn û ewilî bi şivan re li ser firota pezekî dikevîne guftûgoyê. Piştî lihevkerî, pez tê şerjêkirin û lehengê çîrokê goştê pezî dide şivîn û tene hûrê pezî jî xwe re hildide. Paşê hûr dide ber tavê ziha dike, dide serê xwe û qeşengbûna xwe bi wî hûrî vedişêre. Lehengê ev cure çîrokan bi qeşengbûna xwe navdar in.<sup>410</sup>*

Dibê Gul çi b'ke? Gul here ser avekî. Ewî hûrkî temîz bişo, bide ber tava havînê. Olça<sup>411</sup> serê xwe da, dibê bona tenbolîya wî ku neyê xuyan, bedewbûna wî neyê xuyan. Dibê hema dikşîne serê xwe, dibe keçekî. Kincê şivîn xwe dike. Xwe ra derdikeve, terkedinya dibe diçe. Dibê diçe gundekî.<sup>412</sup>

**3. 24. LEHENGEKÎ SEXTEKAR BI ÎDÎAYÊN BÊBINGEH DERDIKEVE. Leheng ku vegere welatê xwe ev îdîa ji alî birayên wî ve tèn pêşxistin. Leheng ku vegere welatekî, ev îdîa ji alî wezîr, general û hwd. di ve tèn pêşxistin. Birayên leheng îdîa dikin ku wan objeya sêhrî anîye û wezîr an jî generalê welatê bîyan îdîa dike ku wî ejderha têk bîriye.**

408 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 29 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme-Gozel Dunyayê, r. 28

409 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yê Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 99

410 ) a) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 12 b) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 3-4 c) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 26-27

411 ) Gor, anegorî.

412 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 26

## PÊNASE: ÎDÎAYÊN BÊBINGEH

### SÎMGE: L

*Di Çîroka Mîrze Miheme [3] de wexta ku Mîrze Miheme [lehengê rastîn ê çîrokê] lê dixê zîhê [dêw, ejderha] dikuje û pêşiya avê vedibe, paşayê şîher ‘defa hewarê’ dixê û dibêje ku kê lê xistiye zîha kuştîye ez ê qîza xwe bidime wî. Li ser wê bangewaziyê, lehengên derewîn ku di gelek çîrokên kurdî yê efsanewî yê Ebexê de lehengên derewîn piranî ‘kurê wezîr û kurê wekîl in’, dibêjin ku me lê xistiye zîha kuştîye û serkeftina lehengê rastîn hildigirine ser xwe. Her çiqas ku li gorî pênaseyê lehengên sextekar di welatê bîyanî de general û wezîr bin jî lê, li gorî çîrokên derasayî yê Ebexê lehengên sextekar ‘kurê wezîr û kurê wekîl’ in.*

*Di van cure çîrokên kurdî yê ku li Ebexê berhevkirî de wekî alava ragihandin û bangewaziyê hêmana ‘defa hewarê’<sup>413</sup> jî hêmaneke bingehîn e.*

Paşa tê. Heqeten, dêna xwe didê, [wisa ye]. Du roj, sê roj dimîne. Dibê sibê zû, defa hewarê dixê, dibê:

“Ew kîjan e lê daye zîha kuştîye, ez ê qîza xwe bimê.”

Kurê wekîl dibê:

“Mi kuştîye.”

Kurê wezîr dibê:

“Mi kuştîye.”

Ew [qîzik] dizane. Defa hewarê dixê, dibê:

“Millet bira were. Berav<sup>414</sup> be.”

Qîzik dibê:

“Ez dizanim kê ye.”<sup>415</sup>

**3. 25. KAREKÎ DIJWAR LI LEHENG TÊ PÊŞNÎYAZKIRIN.** Yek ji girîngtirîn hêmana çîrokê di vir deye. Ev karên dijwar ji yê ku di xaçerêyên berê de dertên dibe ku cudatir bin. Ev curbecur in. Wekî îmtîhana xwarin û vexwarinê, îmtîhana agir, îmtîhana mamikan,

413 ) a) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 9-10 b) Ahmedê Zava, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1975, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016, Çîroka Kerr Kulik, r. 1 c) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 15 d) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 23

414 ) Berhev.

415 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 10

**îmtîhana helbijartinê, îmtîhana nehatina dîtinê, îmtîhanên hêzê, hostetî, sebir û cesaretê, maçkirina prensesê, anîna tişteke an jî çêkirina tişteke.**

**PÊNASE: KARÊ DIJWAR**

**SÎMGE: M**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de wexta ku qîrarê herbê tê dayîn û şer dest pê dîke qîzên padişêh [prensês] ên mezin tinazên xwe ji xwûşka xwe ya piçûk ya ku jina Mîrze Miheme [lehengê rastîn] ye dîkin. Li ser wê qîza padişêh [prensês/birêker] a piçûk daxwaza karekî dijwar, daxwaza şerkirinê ji Mîrze Miheme dîke û bi wî awayî derfeta xwedanasîna, xweîsbatkirina û îmtîhana sebir û cesaretê Mîrze Miheme çêdibe.*

*Jixwe di çîrokên kurdî yê cadûyî/derasayî yê ku me li Ebexê berhevkerî de xwedanasîna lehengê rastîn zêdetir di meydana şer de an kuştina dêwekî zirarmend de an jî bidestxistina dermanekî nawaze de derdikeve meydana.*

Qîrarê xwe herbê ra dan. Birayo, dibê wexta li hev dixin, dibê hersê qîzê paşê dikevne ewê da, dikevne cama da lê sêr dîkin. Ewa piçûk jî diçe lê sêr dîke. Dibê ew herdikê dinê hîngî dine qafê wê, hîngî dine milê wê, lê dixin dikujin hetanî qîzîk êvarê tê. [Qîzîka piçûk] dibê:

“Mîrze Miheme.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ha.”

[Qîzîka piçûk] dibê:

“Bide xatrê xwedê, kuro, xûşkê mi ez kuştim, lawo. Kuro, dibêjne mi te yekî pak bikira, te çûye yekî total kiriye, te yê yek pak bikira, ew jî niha piştî bavê me şer kira.”<sup>416</sup>

**Karên dijwar di çîrokên kurdî de zêdetir wisa ne: a) Hilanîna nihênîyekê an anîna çîrok û serpêhatîyekê; b) Bidestxistina dermanekê an tişteke seyr û ecêb.**<sup>417</sup>

### **3. 25. a) Hilanîna nihênîyekê an anîna çîrok û serpêhatîyekê**

*Di Çîroka Hesên Hîseyî de Dunya Gozel [tawankar] ji Hesên [leheng] re dibêje ku tê herî, merivek li hespekî sîyar dibe. Ew meriv wî hespî wisa dajo, ew hesp di xwêhê de reş dibe û gava tê malê jî ew meriv cuhurekî qûmê dixê serê wî hespî û ew hesp heta sibê wê qûmê dixwe. Dunya*

416 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergrîtinê: 21 Îlon 2016. Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 18

417 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yê Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 99

*Gozel dibêje Hesên dibê, tê herî wê meseleyê ji min re hell bikî [hîlanîna nihênîyekî an tiştêkî seyr û ecêb] û ez ê paşê bi te bikim.*

[Hiseyn] tê. Dunya Gozel dibê:

“Hiseyn, kelîmeke mi heye.”

[Hiseyn] dibê:

“Çî ye?”

[Dunya Gozel] dibê:

“Tê herî. Sibê zû, merivek hespekî sîyar e. Mi’îneke<sup>418</sup> ewk sîyar e, boz sîyar e. Wextê dajo, wusa dike xwihê da reş dibe. Wextê tê, ewkekî, cuhureke qûmê dixê serê wê, devê wê. Ew duxwe heta sibê. Here. Wê meselê mi ra hel ke. Were, ez ê te bikim.”<sup>419</sup>

### **3. 25. b) Bidestxistina dermanekê an tiştêkî seyr û ecêb**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de wexta ku padişah li ser mêrkirina qîza xwe bi Mîrze Miheme [lehengê rastîn] re bi nexweşiya weremê dikeve û hekîm jê re dibêjin ku dermanê wî ‘şîrê şêr di eyarê şêr de’ ye, qîza padişêh [prensê/birêker] ku jina lehengê rastîn e, ji Mîrze Miheme daxwaza bidestxistina ‘şîrê şêr di eyarê şêr de’ dike.*

*Di çîrokên kurdî yên efsanewî yên ku me li Ebexê berhevkirî de ji bo başbûn û pakbûna nexweşiya xedar a padişêh motîfa bidestxistina ‘şîrê şêr di eyarê şêr de’<sup>420</sup> ji lehengê rastîn motîfeke serekîtir e.*

Cab tê, dibê:

“Welle paşê werem derxistîye.”

[Mîrze Miheme dibê:]

“Hahhh! Kuro, werema paşê çî ye?”

Dibê:

“Welle, werem ji bona te derxistîye. Gotye, welle mi qîza xwe daye keçelok, dibê ji bona te werem derxistîye. Gotye, derdê wî jî ew e. Heqa dixtor hatine ser, hekîm hatine ser, gotye, dermanê paşê şîrê şêr di ‘îyarê<sup>421</sup> şêr da ne.”

418 ) Mehîn, mahîn.

419 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergrîtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Hesên Hiseyn, r. 16

420 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergrîtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 11-13-16-20-21

421 ) Post, çerm.

[Mîrze Miheme] dibê:

“Heylê mala te xirabûyî!”

Kurê wezîr, kurê wekîl radibin sîyar dibin. Bira herin dermanê şîrê şêr ‘îyarê şêr da. Eva [qîzika piçûk] isa digrî, tê ber Mîrze Miheme digere, dibê:

“Mîrze Miheme, bide xatrê xwedê xatrê qur’anê tu jî here.”<sup>422</sup>

**3. 26. KARÊ DIJWAR TÊ BICIHANÎN. Rengê bicihanîna van karên zor wekî îmtîhanê pêk tîn. Ev kar bi piranî berîya ku bîn dayin ji alî leheng ve hatine kirin an jî dîtin. Mînak, leheng dizane ku kîjan nîşanên taybet li ser prensesê hene. Rewşên ku divêtîya bicihanîna wan ji pêş de hatine hînkirin bi îşareta (0N) tîn nîşandan.**

**PÊNASE: BICIHANÎNA KARÊ DIJWAR**

**SÎMGE: N**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de bi daxwaz an fermana qîza padişêh [prensês/birêker] ku jina lehengê çîrokê [Mîrze Miheme] ye, lehengê çîrokê daxwaz an fermana qîza padişêh a dijwar bi cih tîne û bi wî awayî wêrekî û hêza xwe diselmîne. Qîza padişêh di serî de daxwaz an fermana têvlêbûna Mîrze Miheme ji bo şer dike, Mîrze Miheme jî bi wêrekî û hêza xwe tevlî şerê dijwar dibe û di wî şerê dijwar de bi ser dikeve [encamdana karê dijwar].*

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ha bêjê, subê ez ê filan newalê ra werim, hespekî iha jî sîyar bim.”

[Qîzika piçûk] dibê:

“Baş e.”

Qîzik wexta diçe, sibê yê şêr sêr kin, evnê din cake<sup>423</sup> lê dixin, dimûçikîne<sup>424</sup> qîzikê, qîzik dibê:

“Mi porê we kurkirno, welle a niha mêtê mi jî hespekî iha sîyar e, yê a vira ra jî were.”

Dêna xwe dinê, ya rebbî, sîyarek lê dernekê qîtê kulê lê derket, kete nava şêr. Yê silamet ew e mala xwe nehatîye. Isa lê dixê mîta<sup>425</sup> xîzê binê behrê. Dibê zenda wî şûr lêdikeve, qaydê tilîya Harûnê birê mi. Dibê paşa jî desmala xwe derdixê lê girêdide. Dibê cake şer kêsvês dibe. Dibê eva hespê xwe sîyar dibe. Diçe wî perrî da peya dibe, lê dixê tê mala xwe. Tê mala xwe.<sup>426</sup>

422 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 18-19

423 ) Dîsa, careke din.

424 ) Bêdengbûn, xilasbûn, sekinîn.

425 ) Mîna, nola,

426 ) ‘Elîyê Apê Miho, Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 18

*Li ser daxwaza qîza padişêh [prensas/birêker] ku jina Mîrze Mihemed [leheng] e, Mîrze Miheme vê carê jî bi hêz û wêrekiya xwe diçe û 'şîrê şêr di eyarê şêr de' bi dest dixê û hêz û wêrekiya xwe cara duyem diselmîne [encamdana karê dijwar].*

Xatrê xwe ji Kalê Xizir dixaze. Hespê xwe wira girê dide. Xwe ra tîr-kevanê xwe hildide tê. Têêê, dikeve binê yêra wî. Dêna xwe didê, şêr hat, her<sup>427</sup> çehvê wî girtîne. Ber acîya<sup>428</sup> lingê xwe kudkê xwe davêje, kudkê wê haaa diçe rasta hanê. Şêr tê li dewsa xwe dikeve. Lingê xwe yî birîn dûrî xwe dirêj dike. Eva, isa tîr-kevanê xwe eyer dike, çawa datîne binê lingê wî dixê. Şêr isa ser lanê diqîre weqasî teyr radibe hewa, çolê dikeve. Isa diçe têêê, heta lingê wî rihet dibe. Dibê tê ser yêra xwe dikeve, dibê:

“Ewa kê ye? Bira bixaze mirazê xwe.”

Mîrze Miheme radibe ser xwe, dibê:

“Mirazê ew e şîrê şêr di ‘îyarê şêr da.”

[Şêr] dibê:

“Heee! Xazil îman, qur’an, mîrê miraza ra, hevt salê dinê jî lingê mi biêşîya te isa negota mi. De te ra eva kudka min e hanê. Bihere bikuje, post ke, bîne were.”

Mîrze Miheme dibe, cîkî da post dike. Dikuje, post dike. Hildide tîne tê. [Şêr] dibê:

“Tê evî gihanê mi bidoşî.”

Mîrze Miheme hema isa didoşe, ewî ‘îyarî wî tijî dike. [Şêr] dibê:

“Kefa ser ra, kîjan nexaşî dibe bira bibe, hemûkî ra derman e. Lê, ewa ava binî jî dermanê weremê ye.”

Xatrê xwe şêr dixaze. Bîra were hespê xwe sîyar be were.<sup>429</sup>

**3. 27. LEHENG TÊ NASKIRIN.** Leheng bi rêya nîşanek taybet, birîn an jî objeyek ku jê re hatiye dayin tê naskirin. Leheng di heman demê de ji ber ku karekî zor bi ser xistiye jî tê naskirin. Li dû dûrketinek dirêj jî tê naskirin.

**PÊNASE: NASKIRIN**

**SÎMGE: Q**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [3] de wexta ku Mîrze Miheme [leheng] lê dixê zîhê [dêw] dikuje, qîza paşê [prensas] destê xwe di xwîna zîhê de dike û li piştta Mîrze Miheme dixê. Paşê jî qîza paşê bi wê nîşaneyê xwe Mîrze Miheme [lehenegê rastîn] tesbît dike û bi wî awayî ferqa navbera lehengê*

427 ) Herdu.

428 ) Êş, jan.

429 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme (1), r. 20

*rastîn [Mîrze Miheme]û lehengê derewîn [kurê wezîr û kurê wekîl] eşkere dibe.*

Qîzik nas dike, dibê:

“Merivekî dinê ye. Ev nînin. Nîşana mi lê heye. Ew meriv ça were ez ê nas kim.”

Dibê:

“Kê maye?”

Dibê:

“Kurê pîrê maye, ewî hatye nêvanê pîrê.”

Gazî dikinê. Ça tê, [qîzik] çakê wî radike, dibê:

“A bavo, a nîşana mi hova<sup>430</sup> ye. Mi ça destê xwe xûna zîhê daye, piştê da daye, kifş e. A ev meriva ye.”<sup>431</sup>

*Di Çîroka Gul Seyîdvan de gava ku Gul [lehengê rastîn] ew gustîla ku qîza qiral pêş de dabûyê dixê nava hinek sêvan, dide destê pîredayîka xwe û ji qîza qiral re dişîne. Gava ku pîredayîk wan sêvan di nava çadira qîza qiral de belav dike û gustîl derdikeve meydana, bi wî awayî ferqa navbera lehengê rastîn [Gul] û lehengê derewîn [Xoce ‘Elî] eşkere dibe.*

[Qîza Qiral] dibê:

“Oylese<sup>432</sup>, dakapîr, wan sêvê te, hedyayê te çi be, sewzê te dayne koşê çadirê. Were valî va, ez ê hedyekî bime te. Ti ser çehva ra hatî.”

Wexta daykapîr boxçe bela dike, dibe şingînîya gustîla qîzîkê, diçe orta dîreka çadira wê disekine. Qîzik xwe dighînê, dêna xwe didê, eva gustîla wê, dibê:

“Heeyyy pîrê!”

Dibê xwe davêje dest-pîyê wê, dibê:

“Pîrê, bav-birê mi qurbana te be. Xweyê vê gustîlê li ku ye? Wehdenîyeta wî xwedayê ku hûn pê îmana xwe tînin, ez ê evê varyeta xwe temamî tesmîlî te kim. Yeterkî<sup>433</sup> ti evî xortî [nîşanî min bike.]

Pîrêya qijik çi zane, dibê:

“Qîza mi, wellehî keçelokekî me heye. Em ê herin, heke keçelok bizanibe. Wekî dinê e tiştêkî nizanîm. Yalniz<sup>434</sup>, eva sêvana keçelok daye mi.”<sup>435</sup>

430 ) Li vir, li vir e.

431 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 10

432 ) Wexta ku wisa ye.

433 ) Bes, tenê.

434 ) Lê, lê belê.

435 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016,



### 3. 28. KÎBÛNA ÊRÎŞKAR, LEHENGÊ SEXTE AN JÎ YÊ XERAB DERTÊ MEYDANÊ.

Derketina vê fonksîyonê bi piranî girêdayî ya berê ye. Carina li dû têkçûna di karê ku hatiye pêşnîyazkirin de rewş derdikeve meydanê. Pirî caran wekî vegotinek jî pêk tê ev fonksîyon. Yan rastîya bûyeran wekî çîrokek tê gotin ku êrîşkar/lehengê sextekar jî lê guhdar dike an jî carina bi rêya strîna straneke kîbûna rast ya êrîşkar tê vegotin.

**PÊNASE: DERXISTINA MEYDANÊ**

**SÎMGE: Ex**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [1] de li ser xwesteka padişêh qîza padişêh [prensês]tê, Mîrze Miheme [lehengî rastîn] û ‘şîrê şêr di eyarê şêr de’ bi tevayî hildidin û diçine hizûrê padişêh. Gava ku diçine hizûrê padişêh Mîrze Miheme bi vegotina serpehatiyên xwe [pirî caran wekî vegotinek jî pêk tê ev fonksîyon. Yan rastîya bûyeran wekî çîrokek tê gotin ku êrîşkar/lehengê sextekar jî lê guhdar dike] rûyê rastîn ên her du lehengê derewîn [kurê wezîr û kurê wekîl] ku li wê derê bûne eşkere dike û wana bêrûmet dike.*

Eva, Mîrze Miheme radibe, bavê xwe dide pêşya xwe bi jina xwe va. ‘Îyarê xwe dide milê xwe. Xulamê wî heb’ye, dide milê xulam. Evna diçine hizûra paşê. Wexta dêrî vedikin, dêna xwe didê, kurê wezîr kurê wekîl rûniştine, lê cina dikevin, [dibêjin]:

“Peyyy! Kuro, ewê qûna me dexme kirye kete hundur.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Paşa xaş be, ne kes derva were hundur, ne kes hundur here derva.”

Dibê du hev celladê mîta<sup>436</sup> Ahme<sup>437</sup> dide ber dêrî. [Mîrze Miheme] dibê:

“Paşa xwe be, te qîza xwe dabû keçelok, dabû mi da. Te seva mi werem derxist.”

[Paşa] dibê:

“Erê welle.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Yê şîrê şêr ‘îyarê şêr da te, tu qeñç buyî, ez im.”

[Paşa] dibê:

“Erê wellle.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Eva jî ‘îyarê mi hedyâ mi. Yê herba te jî qazanc kir ez im. Eva jî desmala te.”

[Paşa] dibê:

---

Çîroka Gul Seyîdvan, r. 32

436 ) Mîna.

437 ) Birayê çîrokbêj e.

“Erê wellle, rast e.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Yê [ku] te ser werem dernexistibû jî ew herdikê han bûn, erê? Tu kulîmekê wan e rastê binhêre, herdik jî mi dexme kirine.”

Heqet, şapkê wana berjêr dikin, dêna xwe dinê, dexmekirîne. Aha!<sup>438</sup>

### **3. 29. LEHENG DIKEVE RENGEKÎ NÛ**

**PÊNASE: VEGUHERÎNA DIRÛVÎ**

**SÎMGE: T**

**Di beşa dawiyê de li hin çîrokan, alîkar rewş an ruxsara lehengî diguherîne. Hejayî amajekirinê ye ku ev erk di çîrokên kurdî de gelekî nadir rû dide.<sup>439</sup>**

**3. 29. T1. Leheng bi tevgereke sêhrî ya alîkarê xwe reng/dirûv diguhêre.**

**3. 29. T2. Leheng koşekeke pir xweşik çêdike.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [2] de her çiças ku leheng bixwe ji xwe re koşkek çênêkiribe jî padişahê siher qîza xwe dide Mîrze Miheme [leheng] û ji Mîrze Miheme re qesrekî [koşkekî] dide hazirkirin û çêkirinê.*

Dibê dehata Mîrze Miheme bi keça xwe da kirinê. Dibê qesrêk jê ra da hazirkirinê.<sup>440</sup>

**3. 29. T3. Leheng kincên nû li xwe dike.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [2] de piştî şer xilas dibe Mîrze Miheme [leheng] kincên xwe yê teze li xwe dike û tê hizûra padişêh.*

Dibê bi wî şeklî, dibê l’derê mala xwe peya bû. Hesp li wê derê kişande hundir. Dibê ew bi wê

---

438 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 23-24

439 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafîk Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 100

440 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 34

gîyîma<sup>441</sup> xwe, bi wê qûşama<sup>442</sup> xwe hate dîwana paşê. Dibê paşa rabû, birîn vekir, go:

“A sîyarê e dibêjim ev e, ne ew bû. Sîyarê e dibêjim, ev e.”<sup>443</sup>

### 3. 29. T4. Hin dirûvên mantiqî û pêkenî.

**3. 30. ÊRÎŞKAR AN JÎ LEHENGÊ SEXTEKAR TÊ CEZAKIRIN.** Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê kuştin, tê dîrxistin, bi dûva hespê ve tê girêdan an jî ew bixwe xwe dikuje û hwd. Carina jî efûyek esîlane bo wî tê derxistin. Bi piranî êrîşkar û lehengê sextekar yê ku beşa duyem de dertê tê cezakin.

**PÊNASE: CEZAKIRIN**

**SÎMGE: U**

*Herçiqas ku erka sizadana tawankar û lehengê derewîn her tim neyê cîbicîkirin jî lê, di çîrokên ku me li Ebexê berhevkirî de sizayên tawankar û lehengê derewîn tê cîbicîkirin. Herwisa di Çîroka Gul Seyîdvan de sizayên hemû lehengê derewîn û tawankaran tê cîbicîkirin. Di hemû çîrokên ku me li Ebexê berhevkirî de û di çîroka navborî de jî sizadana lehangên ewe ku serê wan tê lêxistin [Êrîşkar an jî lehengê sextekar tê kuştin].*

Qîza qiral dibêje [padişêh], dibê:

“Çehvê mi te tev birije. Ti qiral e dabûme Xoce ‘Elî? E dabûme vî xortî. Te jî rica dikir te digo, îlam were Xoce ‘Elî bike. De îja ti rabe, pêşyê dergevan, tu serê wî lê xe, şivîn bide ser mala wî. Ti rabe wezîrê milê xwe yî rastê, serê wî lê xe, Hekîmê Loqma bide ser mala wî. Tu serê torçî lê xe, tu aşvîn bişîne ser mala wî. Bira aşvan here xwe ra bîna wî da rûnê.”

[Padişah] serê wana lê dixê, ewnê din jî dişîne ser varîyeta wan.<sup>444</sup>

*Di Çîroka Enayî Ahme de wexta ku sextekarî û tawankariya wezîrê padişêh [tawankar/êrîşkar] derdikeve meydane, wezîr hespan ve girêdidin û bi wî awayî dikujin [êrîşkar an jî lehengê sextekar bi dûva hespê ve tê girêdan]. Ev curê motifê sizadane di gelek çîrokên kurdî yê efsanewî de rû didin.*

441 ) Kinc, cilûberg, zirx.

442 ) Kinc, cilûberg, zirx

443 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 31

444 ) Nûredînê Xelkê Xaça, Gundê Xaça-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Îlon 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 35-36

Dibê hemen hespekî tî dikin yekî birçî dikin. Lingê wezîr yekî davêjne hespa birçî yekî jî davêjne hespa tî. Ew, ber bi avê xwe didê, ew jî ber bi gîhê xwe didê. Dibê wezîr ortê da dikne du çîqa.<sup>445</sup>

### 3. 31. LEHENG DIZEWICE Û DERTÊ SER TEXT

**PÊNASE: ZEWICÎN**

**SÎMGE: W**

**3. 31. W00. Leheng jinê û welat bi hev re bi dest dixê an jî pêşî nivê kraltiyê bi dest dixê û piştî mirina dê û bav hemî kraltiyê bi dest dixê.**

*Di Çîroka Mîrze Miheme [2] de padişahê şîher qîza xwe dide Mîrze Miheme [leheng] û Mîrze Miheme dîke padişahê şîher [Leheng jinê û welat bi hev re bi dest dixê].*

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê Mîrze Miheme ew şev ma l' dîwana paşê. Dibê sibê cima'eta paşa dîsa hat, meznê wî, rûspîyê wî, wezîrê wî, heyeta wî. Dibê paşê gote mezina, go:

“Fermanekî dexin, hevtêkî di şîher da têne def, dehwat, şaylixayî.”<sup>446</sup>

Dibê dehwata Mîrze Miheme bi keça xwe da kirinê. Dibê qesrêk jê ra da hazirkirinê. Dibê gazî rûsipîyê xwe, mezina, serpêsekinya [kir], dibê go:

“Idî yaşê<sup>447</sup> min derbas dibe. Ji we ra padşakî a wiha dixaze. Dîrokîyê da ku bi qarşî<sup>448</sup> paşê başqe<sup>449</sup>, bi qarşî dehwa w doza ez evî civanî qebûl dikim. Hûn jî eger qebûl bikin padşa îro şûn da ew e. ‘Eynî dîsa her tiştê bi gotna toplimê<sup>450</sup>, bi gotna şîher, bi gotna me [be]. Yaniz<sup>451</sup>, padşa ew e. Her tiştê şîher destê wî da ne.”<sup>452</sup>

### 3. 31. W0. Carina leheng dizewice lê jina wî prenses nîn e, di vê rewşê de nabe kral.

*Di Çîroka Hemze Pelevan de Hemze Pelevan [leheng] û Kindir [alîkar] dawîya dawî qiralê şîher û bi hemû xelkê şîher ve dikujin lê, ji ber ku jina Hemze Pelevan [Xeremco] ne prenses e Hemze Pelevan jî nabe qral.*

445 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Enayî Ahme, r. 19

446 ) Şahî.

447 ) Temen, emr.

448 ) Hember.

449 ) Ê/ên-yên din.

450 ) Civak, cimaet.

451 ) Lê, lê belê.

452 ) Salhê Hecî Heyder, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [2], r. 34

Dibê, pîrê dibe ‘orrîniya wê, dibe dêlikekî. Dibê, dibe çîreçîra wê, ber Kindir ra baz dide. Dibê Kindir ça orta<sup>453</sup> pişta wê dixê, serê wê diçe derê hewşê qûnê wê dimîne di hundir da. Zêrê pîrê top dikin, tèn. Dibê barê hevt deva, qîmetê giran barê sivik, bar dikin. Dibê Xeremcoyê jî dixne sandoqekî, dine ser barê devê. Tèn, qîza dêw jî hildidin. Têne nêzkîya şîherê bavê xwe. Îşçîkî<sup>454</sup> xwe pêşda dişîne dibê:

“Çika here. Piştî mi xûşkeke mi hebû. Heye, tine ye?”

Dişîne tê, dibê:

“Welle, xûşka te heye.”

Ewê xûşka xwe jî li Kindir mehr dike, dide Kindir.

Hevt roj hevt şeva dixne def û dehwat.<sup>455</sup>

### 3. 31. W0. Carina jî berevajî vê bi tenê dertê ser text.

3. 31. W1. Eger çîrok di kêlîya berî zewicînê de bi xerabîyeke nû bê birîn, bi nîşanîbûna beşa yekem û sozeke derbarê zewicînê de, bi dawî dibe.

3. 31. W2. Rewşa dijber, jina lehengê zewicandî hunda dibe, di encama lêgerînê de jin tê dîtîn û zewac tê nûkirin.

*Di Çîroka Hezar Yek Şevî de jina Hesên [lehengê zewicandî] bi awayekî wînda dibe. Di encama lêgerînê de Hesên jina xwe, Marînusînayê, dibîne û zewaca xwe bi def û dehwat teze dikin.*

Idî bi çî awayî dibe, idî anlaşmîş<sup>456</sup> dibin. Ewa [Hesên] bi vî qirarî tê dertê cem xûşkê xwe [xwûşkên wî yên cin]. Tabî xûşkê wî sevmîş<sup>457</sup> dibin, def-dehwat, filan-bêvan.<sup>458</sup>

3. 31. W3. Leheng carina li şûna ku bi prensesê re bizewice, bi pere an jî rengkî dî tê xelatkirin.

*Di Çîroka Mîrze Miheme [3] wexta ku Mîrze Miheme [leheng] lê dixê û zihê [dêw, erderha]*

453 ) Nav, navend.

454 ) Xizmetkar, xebatkar.

455 ) ‘Elîyê Apê Miho, Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 19 Îlon 2016, Çîroka Hemze Pelevan, r. 15

456 ) Lihevhatin, lihevkrin.

457 ) Şabûn.

458 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 28 Îlon 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 21

*dikuje paşayê wî welatî dixwaze ku qîza xwe [prensês] bide Mîrze Miheme lê, Mîrze Miheme li şûna wê dixwaze ku bi şeklekî derbikeve dinyaya rehnayî. Li ser vê daxwazê, leheng li şûna ku bi prensesê re bizewice, bi rengê dî tê xelatkirin û bi awayekî leheng derdixîne dinyaya rehnayî.*

[Paşa] gazî dike, dibê:

“Bixaze mirazê xwe. Tu çi bixazî, dinê da ti çi bixazî ez ê bime te. Qîza xwe ez ê bime te.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Paşa xaş be, welle, dinê da ez qîzîkê jî hilnadim. Yalnız, tê mi derxî dunya rehnayî.”

[Paşa] dibê:

“Heyyy, mala xira be! Ka ez ê te ça derxime dunya rehnayî? Xazila heft sala jî iha bûya, te eva negota. Yalnız, ez ehdkar im. Mi gotye, kê lê xe zîhê bikuje, ew çi bixaze ez ê bimê.”

[Paşa] radibe, dibê:

“Tu dizanî tê ça bikî?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ça b’kim?”

[Paşa] dibê:

“Teyrê Sîmirr heye. Zîha jî, zîha hevt sal e, [wextê ku] cûckê wê givrik dibin, zîha tê cûckê wê duxwe. Heger ew te xilas ke. Welle, ez te nikarim xilas kim. Dunya tarî, ka ez ê ku ra te derxime dunya rehnayî?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ê baş e.”<sup>459</sup>

---

459 ) Kemalê Xelkê Sarîcê, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergerîtinê: 05 Cotmeh 2016, Çîroka Mîrze Miheme [3], r. 11

## ENCAM

Wekî ku tê zanîn folklor ji taybetmediya cil û bergên rojane yên milletekî bigire liv û tevgerên rojane û heta kevneşopiyên bavûkalan, werhasilê kelam hemû kevneşopiyên milletan vedihewîne. Folklor bi qasî ku ez dizanim têgiheke almanî ye û wateya wê jî kêr û zêde wiha ye. Jixwe wekî wekî ku birêz Remezhan Alan di kitêba xwe ya navdar a navê *Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyî 'Roman û Folklor'* gotî folklor; Zanista gel, hikmeta awam, xelqiyat, folklor an zargotin... Ev peyvên han, di destpêkê de parçe parçe ji bo çanda gel, ayînên mîtolojîk, adetên parastî, jiyana “wehşiyên esil”, muzik û reqsên gelêrî, biwêj, destan, efsane, û çîrokan dihatin bikaranîn<sup>460</sup>.

Wekî ku li jor jî hatiye pênasekirin gava ku em dêna xwe dinê, folklor ji jiyana rojane ya herî asan ya milletekî bigire heta ew adetên ku bi hezaran salane ji bavûkalan hatine wergirtin û hêjî bi awayekî têne bikaranîn re folklor tê gotin. Mesela awayên cilûbergên ku hatine lixwekirin, cureyên cilûbergan, adetên rojanê yên xwarin û vexwarinê yên rabûn û rûniştinê yên hatin çûyînê, adetên berdewamî yên şîn û şahîyan yên zewicandin û mêrkirina kêç û xortan yên mazûvankirin û pêşwazîkirina mêvanan, adetên mezinkirin û perwerdekirina zarokan, rê û rêbazên ku bo berdewamkirina jiyana rojanê tên bikaranîn, nifir, dia, gotinên bavûkalan, çîrok û hwd. em dikarin bêjin ku ev tiştan hemû û hêj bi hezaran tiştên din di bin sîwana folklorê de ye.

Ji ber wê jî di esasê xwe de û di heman demê de folklor ciyawaziya milletan û herêman nîşan dide. Hinek caran em dêna xwe dinê tiştêkî ku li cihekî li deverêkî li herêmekî an jî di nava milletekî de wek liv û tevgerên rojane têne bikaranîn lê, heman tişt li herêmeke din an jî di nava milletekî din wek eybeke giran tê pênasekirin. Ji ber wê jî her milletek an her herêmek taybetmendiya xwe heye û wê taybetmediyê bi ciyawaziyê jiyana xwe ya rojane berdewam dike. Ev taybetmendî û ciyawaziya herêm û milletan bi raya min qurmên folklorê ne.

Di vir de gere em ciyawaziya folklor û zargotinê jî bikin. Folklor wek ku me li jorê jî nivîsîye ji cilûbergên milletekî bigire, ji tevger û xeberdanên rojane û heta hemû kevneşopiyên bavûkalan vedihewîne lê, zargotin wek ku ji navê wê jî diyar e tiştên bi zar û zimanan hatine honandin re tê gotin. Jixwe wekî nivîskar û edîtor Bahoz Baran ku hevpeyvîneke li gel malpera otekilingundemi.comê re kirî ferqa folklor û zargotinê wiha rawe dike; *'Zargotin beşa zarî, zimanî yê folklorê ye. Di bin sîwana folklorê da ye. Folklor peyveke fireh e, bi her awayî zanîna gelî ye (ne govend e) mîmarî jî dikeve nav wê, rabûn rûniştin jî, cil û berg jî, zargotin jî. Wextê em dibêjin zargotin, destan, xebroşk, çîrok, pêkenok, meselok, gotinên pêşîyan, biwêj, mamik, lorî.. tên*

---

460 ) Remezhan Alan, *Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyî 'Roman û Folklor'*, Weş. Peywend, Stenbol 2013, r. 27

*bîra mirovî.* <sup>461</sup> Loma zargotin binbeşa folklorê ye û çîrok jî binbeşa zargotinê ye. Çîrok jî beşek ji beşên folklorê bi taybetî beşek ji beşên zargotina kurdan ya herî berbelav û berçav e. Pekî çîrok çi ye?

Çîrok weke janrekek girîng a edebiyata devkî, neynikeke hêviyê, nêrin, zanyarî, û cîhanbîniya pêşîyan û ronîkera gelek xalên tarî yên jiyana mirov e. Çîrok, berevajiya edebiyata nivîskî ku zêdetir li ser jiyana çîna desthilatdar e, çîrok û destan çavkaniyên pêbawer ji bo nasîna dîroka rasterast a mirov, jiyana û serhatiyên xelkê asayî û çîna bindest e.<sup>462</sup>

Wekî ku Mezher Ibrahîmî behs kiriye çîrok cureyekî ji edebiyata devkî ye û di esase xwe de nêrin, hêvî, daxwaz û hwd. yên xelkên asayî û bindest dihewîne. Ji ber wê ye ku em bêjîn piranî di çîrokan de her çiqas ku neheqî, bêdaletî, zordariya derasayî û wd. hebe jî meriv her tim di çîrokan de bendewarî û heviya xelaskerekî asayî ye ku derkeve her kesekî ji wan bêdaletiyên rizgar bike û jixwe piranî jî wisa dibe. Ji ber wê ye ku meriv heqîqeten di çîrokan de hevî, daxwaz û gelek xalên tarî yên jiyana xelkê asayî û bindest dibîne.

Gelek pênseyên çîrokan hatine kirin lê, bi raya min pênaseya çîrokê ya ku herî sade û kurt Yahya Yavuz kiriye. Li gorî Yahya Yavuz jî çîrok ew vegotinên gelêrî ne ku afrînerê wan ê ewil nayê zanîn û piranî di şevên zivistanan de ji bo mijûlbûn û demderbaskirinê ji hêla kesên di vî warî de pispor in tînen vegotin<sup>463</sup>.

Wekî cureyek e edebiyata devkî her çiqas li ser pênaseya çîrokan lihevkrinek tine be her wisa li ser navên çîrokan jî lihevkrinek tine ye û li gorî herêman navên çîrokan jî tînen guhertin. Dîsa li gorî Yahya Yavuz di Kurdî de ji bilî bêjeya çîrokê gelek navên din ji bo vî cureya folklorê tê bikaranîn. Hin ji wan navên ku ji bo çîrokê tînen bikaranîn evin: serhatî, çîrçîrok, çîrvanok, çîçîrok, xebroşk, hikyat, estanîk [Zazak], meselok, serpêhatî û hwd<sup>464</sup>.

Di çîrokan de tişta herî taybet motifên çîrokan in. Pekî motif an jî hêman çi tiştek e? Li gorî Yahya YAVUZ, di çîrokan de hêmana herî biçûk a ku xwedî taybetmendiyekê ye û bi vî taybetmendîya xwe bandorê li herikîna çîrokê dike motif tînen gotin. Di her çîrokê de herî kêmtî motifek heye<sup>465</sup>.

Lê li gorî folklorîstê rûsî yê binavûdeng Vladimir PROPP di çîrokan de tişta herî girîng motif nîne. Ji ber ku Propp di çîrokê de li hemanên ku nayên guherîn digere û li ser kirinên kesan disekine. Li gorî wî her çiqas kes werin guherin jî tevger nayên guherin. Ji ber vî jî dabeşkirineke zanistî ya çîrokên derasayî li gorî tevgerên karakteran dikare were çêkirin. Di çîrokan de çiqas mijar û karakter werin guherin jî fonksiyonên wan naguherin û mirov li gorî van fonksiyonan dikare

461 ) [www.otekileringundemi.com/?p=10970](http://www.otekileringundemi.com/?p=10970)

462 ) Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 6, Dariştênasiya (Morfolojiya) Çîrokên Cadûyî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2016, r. 135

463 ) Yahya YAVUZ, Zarema, Berawirkirina Du Çîrokên Kurdî û Frensî: “Sedo” û “Pisîka bi Gîzme”, Berdan Matbacılık, İstanbul 2018, r. 120

464 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 120

465 ) Yahya YAVUZ, h.k., r. 128



vekolînan li ser çîrokan bike.<sup>466</sup>

Vladimir Propp (1895-1970) piştî lêkolîna li ser 100 çîrokên efsanewî yê rûsî hejmarek hêman diyar kirin ku dêsmana sereke yan wan çîrokan pêk tînin. Wî ev hêman wek *erk* bi nav kirin. (Ew erk) neguherbar û sinordar in û di rastiyê de bingeh û esasa çîrokan li se van hatiye avakirin. Propp li gor kiriyara karakterên nava çîrokê û girîngiya wan di geşbûna çîrokê de wan, pênase dike. Erk 31 in û aliyê heft kesên çalak ên di nava çîrokê de pêk tînin<sup>467</sup>. Di çîrokekê de ne pewîst e ku her 31 fonksiyon hebin lê rêza fonksiyonan tu carî nayê guherîn.<sup>468</sup>

Propp bi giştî encama tehlîlên xwe bi çar nêrînên binyadîn destnîşan kirin ku wisa ne:

1. Erk bingeha binyadîn ya çîrokan pêk tînin.
2. Hejmara erkan bisînor in.
3. Erk her tim bi awayekî rêkûpêk li pey hev tînin.
4. Hemû çîrokên cadûyî ji hêla pêkhatiyê ve çeşnek in (Propp, 53-54)<sup>469</sup>

Me jî li gorî rêbaza morfolojîyê ya Vladimir Propp di nava 47 çîrokên Ebexê yê derasayî 21 heb çîrokên derasayî tehlîl kir. Di nava wan 21 heb çîrokan de 5 heb ji varyantên çîrokên Mîrze Miheme ne. Ji bilî çîrokên Mîrze Miheme çîrokên din ev in; Çîroka Gul Seyîdvan, Çîroka Hesên Hiseyn, Çîroka Fatmayê, Çîroka Kerr Kulik, Çîroka Navçekerê Kurê Îza, Çîroka Memo Zînê, Çîroka Rostemê Zal, Çîroka Hebkahinarê, Çîroka Eybezê Xaz, Çîroka Pîra Sêr, Çîroka Hemze Pelevan, Çîroka Hezar Yek Şevî, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, Çîroka Avcî Ahme, Çîroka Mervê Meraqdar û Çîroka Enayî Ahme ye.

Divê ewilî hinekî li ser taybetmendiya çîrokên derasayî yê Ebexê rawestin. Bileksê çîrokbêjên din çîrokbêjên me ji bilî Amojna Suhbet ên din hemû mêr in. Çîrokbêjên me piranî di girîzgeha çîrokên xwe de bi qalibgotina *carek ji cara rehme li dêbavê hazira* dest pê kirin. Di girîzgeha hemû çîrokan de kêm zêde ev qalibgotin hatiye bikaranîn lê, tenê qalibgotineke cuda di Çîroka Cîhangîrê Dunyadîtî de wiha hatiye bikaranîn; “*Dibê çil kûsî çûne bin darekî, dar weldigerya, mişk mehr tev gerya. Eva xebera di serê çîroka da tê gotin*”<sup>470</sup>.

Di berdewamiya çîrokan de jî zêdetir ev qalibgotin hatiye bikaranîn; “*De îja dibê çîrok e, wî çaxî bi sal zemana bûye, niha bi zar zimana tê gotin*”<sup>471</sup>.

Di berdewamiya çîrokan de wexta ku kesek dikeve rêya xwe û diçe bi gelemperî ev qalibgotin

466 ) Bünyamin DEMİR, ÇÎROKÊN KURDÎ LI GORÎ MOTÎF ÎNDEKSA STITH THOMPSON (BI NIMÛNEYÊN ÇÎROKÊN MÎRZE MIHEMED), Teza Mastirê, Mêrdîn 2016, r. 18

467 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher Ibrahimî, h.k., r. 95

468 ) Bünyamin DEMİR, h.t., r. 18

469 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, h.k., r. 135

470 ) Mihyedînê Mecîdê Gozê, Ebexê-Wan 1950, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Cîhangîrê Dunyadîtî, r. 1

471 ) ‘Elîyê Apê Miho, Gundê Seregolê Jorê-Ebexê-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 21 Îlon 2016, Çîroka Mîrze Miheme [1], r. 14

hatiye bikaranîn; ‘herrek tu naçî!’<sup>472</sup>

Di dawiya çîrokan de jî piranî ev qalibgotin hatîye bikaranîn; “Her kes çû mirazê xwe şa bû. Hûn jî mirazê xwe şa bin”<sup>473</sup>. An jî ev qalibgotin hatîye bikaranîn; “Dibê sê sêv hatin cînetê. Dudu para cima’etê, yek jî para mi”<sup>474</sup>

Di nava çîrokên derasayî yên Ebexê de li gorî rêbaza morfolojîyê ya Vladimir Propp çîrokên herî guntawtir varyantên çîrokên Mîrze Miheme ne lê, çîrokên din jî xirab nebûn. Ew 31 fonksîyonên ku Vladimir Propp ji çîrokên derasayî yên rûsî de tesbît kirî me jî di çîrokên derasayî yên Ebexê de tesbît kirin lê, tenê hinek binbeşên wan 31 fonksîyonan me di çîrokên derasayî yên Ebexê de tesbît nekirin.

Ji morfolojîya Vladimir Propp fonksîyona yekem a bi navê ‘yek dûr dikeve ji malê’ bigire, ya duyem a bi navê ‘leheng bi qedexeyekê re rûbirû dimîne’, ya sêyem a bi navê ‘qedexe tê binpêkirin’, a çarem a bi sernavê ‘êrişkar hewl dide ku agahîyan bi dest bixe’, ya pêncem a bi navê ‘êrişkar di heqê qurban de agahî berhev dike’, ya şeşem a bi navê ‘êrişkar ji bo ku qurbanên xwe an jî [ji bo] serwetê hewla xapandina wî dide’, heta fonksîyona heftem a bi navê ‘qurban tê xapandin û bi vî rengî nexwestibe jî alîkarîya dijmin kirîye’, ev her heft fonksîyon û binbeşên van heft fonksîyonan di Çîrokên Ebexê yên derasayî de bi temamî hatine tesbît kirin. Yanî ev heft fonksîyon û binbeşên van heft fonksîyonan di Çîrokên Ebexê yên derasayî bi awayekî rêkûpêk tesbît kirin.

Sê heb binbeşên ji fonksîyona heştem a bi navê ‘êrişkar zirarê dide yekê ji malbatê’, binbeşên ‘êrişkar zevîyan talan dike, êrişkar ronahîya rojê direvîne, êrişkar kiryarên xwe yên dizîyê an jî revandinê bi dî dike’ me di Çîrokên Ebexê yên derasayî de tesbît nekirin. Jixwe li gorî Mezher Ibrahîmî, Propp amaje bi tawana “dizîna ronahiya rojê” dike ku di çîrokên kurdî de nayê dîtin. Lê li hember [vê tawanê] du şêwazên tawanê [din] di van çîrokan de hene ku li çîrokên rûsî [de] ew nehatine destnîşankirin. Ev du şêwaz wisa:

- Tawankar çavkaniya ava vexwarina xelkê dagir dike û li hember [wê] jî qurbanîkirina keçikan dixwaze, her car ji bo demeke kurt pêşîya avê berdide.

- Tawankar, qurbanîyan mecbûrî karên dijwar dike.<sup>475</sup>

Li gorî rêbaza morfolojîyê ya Vladimir Propp ew binbeşên 31 heb fonksîyonan ên ku me di Çîrokên Ebexê yên derasayî de tesbît nekirin ev in: Ji madeya nehem a bi navê B) *Agahîya xerabîyê an jî kêmahîyê belav dibe, bi daxwaz an jî fermanekê serî li leheng tê dayîn, leheng tê şandin an jî*

472 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Harûnê Reşît-Siltan Zibêde, r. 11

473 ) Hecî Henîfî, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 10 Cotmeh 2016, Çîroka Hezar Yek Şevî, r. 22

474 ) Nûredînê Xelkê Xaç, Gundê Xaç-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergrîtinê: 01 Cotmeh 2016, Çîroka Gul Seyîdvan, r. 37

475 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 96

*dîçe, de binbeşên B6) Lehengê ku mehkûmê mirinê hatîye kirin bi dizî serbest tê berdan, B7) Straneke dilêş ku wê êşê tîne ziman tê stirîn; ji madeya dozdehem a bi navê D) Leheng di îmtîhan, lêpirsîn, an jî êrîşek ku dê rê veke ku ew ê objeyeke sêhrî an jî alîkarek bi dest bixe de derbas dibe, de binbeşên D8) Mexlûqekî/aferîdeyekî dijmin hewl dide ku leheng tune bike, D9) Mexlûqekî/aferîdeyekî dijmin hewl dide ku bi leheng re şer bike; ji madeya sêzdehem a bi navê E) Leheng bersiv dide çalakîyên mirovê ku dê pêş de bexşê bibexşîne wî, de binbeşên E8) Leheng bi taktîkên kesê dijmin, dijmin têk dibe û ji êrîşê xelas dibe, E9) Leheng aferîdeyê/a dijmin têk dibe (an jî têk nabe), E10) Leheng bihevguherînê qebûl dike lê li hember bexşgêr hêza sêhrî ya objeyê bi kar tîne; ji madeya çardehem a bi navê F) Objeya sêhrî ji leheng re tê dayîn, de binbeşa F3) Objeya sêhrî tê çêkirin; ji madeya şazdehem a bi navê H) Leheng û êrîşkar di şerekî de derdikevin hemberî hev, de binbeşên H2) Leheng û êrîşkar dikevin pêşbazîyê, H3) Leheng û êrîşkar bi kaxizan dilîzin; ji madeya hevdehem a bi navê I) Êrîşkar têk dîçe, de binbeşên I2) Êrîşkar di pêşbazîyê de têk dîçe, I3) Êrîşkar di lîstika qumarê de têk dîçe, I4) Êrîşkar di lîstika xwewezinandinê de têk dîçe; ji madeya nozdehem a bi navê K) Xerabîya di destpêkê de tê telafîkirin an jî kêmahî tê pêşwazîkirin, de binbeşên K3) Objeya ku lê tê gerîn bi saya cazîbeyê tê bidestxistin, K4) Bidestxistina objeya ku lê tê gerîn rasterast encameke çalakîyên berê ye, K5) Objeya ku lê tê gerîn bi navgînîya objeyeke sêhrî tê bidestxistin; ji madeya bîstûyekem a bi navê Pr) Leheng tê şopandin, de binbeşên Pr1) Şopîner li pey leheng difire, Pr4) Şopîner dikeve rengê objeyeke bi cezb û dertê rêya leheng, Pr5) Şopîner hewl dide ku leheng perçe bike û bixwe; ji madeya bîstûduyem a bi navê Rs) Bi hawara leheng de tê çûyîn, de binbeşên Rs4) Leheng dema ku direve xwe vedişêre, Rs5) Leheng di kargeha heddadekî de xwe vedişêre, Rs6) Leheng dema ku direve dikeve rengê heywanek, kevirek û hwd. û xelas dibe, Rs7) Leheng li hember ejderhaya mê ku dikeve curbecur rengan û dixwaze wî bixapîne, li ber xwe dide, Rs8) Leheng destûr nade ku bê perçekirin û xwarin, Rs9) Di kêlîya ku dê leheng bê kuştin de bi hawara wî ve tê gihastin, Rs10) Leheng heldipeke dareke dî; ji madeya bîstûnehem a bi navê T) Leheng dikeve rengekî nû, de binbeşên T1) Leheng bi tevgereke sêhrî ya alîkarê xwe reng/dirûv diguhêre û ji madeya sihûyekem a bi navê W) Leheng dizewice û dertê ser text, de binbeşên W0) Carîna jî [leheng] berevajî vê bi tenê dertê ser text, W1) Eger çîrok di kêlîya berî zewicîne de bi xerabîyeke nû bê birîn, bi nîşanîbûna beşa yekem û sozeke derbarê zewicînê de, bi dawî dibe.*

Di nava van 31 fonksîyon û binbeşên van 31 fonksîyonên ku Vladimir Propp ji çîrokên derasayî yên rûsî tesbîtkirî de, ji bo çîrokên derasayî yên Ebexê fonksîyona herî neguncaw fonksîyon û binbeşên fonksîyona bîstûduyem a bi navê Rs) *Bi hawara leheng de tê çûyîn*, û binbeşên ve foksîyonê yên bi navê Rs4) *Leheng dema ku direve xwe vedişêre*, Rs5) *Leheng di kargeha heddadekî de xwe vedişêre*, Rs6) *Leheng dema ku direve dikeve rengê heywanek, kevirek û hwd. û xelas dibe*, Rs7) *Leheng li hember ejderhaya mê ku dikeve curbecur rengan û dixwaze wî bixapîne*,

li ber xwe dide, Rs8) *Leheng destûr nade ku bê perçekirin û xwarin*, Rs9) *Di kêlîya ku dê leheng bê kuştin de bi hawara wî ve tê gihastin*, Rs10) *Leheng heldipeke dareke dî, ye*.

Li gorî li Mezher Ibrahîmî di nimûneyên rûsî de sê şêwazên din hene ku di çîrokên kurdî nayên dîtin. Ev sê şêwazên pêşbirkê wisa ne: Pêşbirk, lîstika kartan, kişandina weznê.<sup>476</sup> Ew şêwazên ku Mezher Ibrahîmî behskirî di fonksîyon û binbeşên fonksîyonên ji madeya şazdehem a bi navê H) *Leheng û êrîşkar di şerekî de derdikevin hemberî hev*, û binbeşên vê madeyê yên bi navê H2) *Leheng û êrîşkar dikevin pêşbazîyê*, H3) *Leheng û êrîşkar bi kaxizan dilîzin*; û fonksîyona ji madeya hevdehem a bi navê I) *Êrîşkar têk diçe*, û binbeşên vê madeyê yên bi navê I2) *Êrîşkar di pêşbazîyê de têk diçe*, I3) *Êrîşkar di lîstika qumarê de têk diçe*, I4) *Êrîşkar di lîstika xwewezinandinê de têk diçe*, de derdikevin meydanê.



---

476 ) Wer. Mêhdî JAFARZADEH, Mezher IBRAHÎMÎ, Zarema 9, Dêsmana Çîrokên Efsanewî yên Kurdî, A Grafik Yayınları, Diyarbakır 2017, r. 98

## ÇAVKANÎ

### ÇAVKANİYÊN NIVÎSKÎ

**ADAK**, Doç. Dr. Abdurrahman, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2013

**AHMEDZADE**, Haşim, Romana Kurdî û Nasname, Weşanên Avestayê, Stenbol 2011

**ALAN**, Remezan, Bendname-li ser Rûhê Edebiyatekê, Weşanên Avestayê, Stenbol 2009.

**ALAN**, Remezan, Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn-Folklor û Roman, Weşanên Peywendê, Stenbol 2013

**ALAN**, Remezan, Destêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern, Weşanên Peywendê, Stenbol 2015

**ALAN**, Remezan & **ÖPENGİN**, Ergin, Tîr û Armanç-Gotarên Rexneyî li ser Edebiyata Kurdî ya Modern, Weşanên Peywendê, Stenbol 2014

**AVCI**, Ziya, Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye-Mela Mehmûdê Bazidî, Weşanên Lîsê, Stenbol 2010

**DEMİR**, Bünyamin, Çîrokên Kurdî Li gorî Motîf Îndeksa Stith Thompson (Bi Ninûneyên Çîrokên Mîrze Mihemed), Teza Mastirê, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn 2016

**DERWAZE 1**, Kovara Kurdî ya Zanistên Civakî û Mirovî, Çapxaneya Berdan Matbaacilikê, Stenbol 2017

**DOST**, Jan, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye-Mela Mehmûdê Bazidî, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2012

**DOST**, Jan, Ehmedê Xanî Mem û Zîn, Weşanên Avestayê, Stenbol 2010

**HECIYÊ CINDÎ**, **EMÎNÊ EVDAL**, Folklorê Kurmanca, Weşanên Avestayê, Stenbol 2008.

**HÎKMET**, Bedran, Teorîyên Folklorê, Weşanên Lîsê, Dîyarbekir 2016

**M. DORSON**, Richard, Folklor û Teorîyên Folklorê yên Îroyîn, Weşanên Avestayê, Stenbol 2017

**SAĞNIÇ**, Feqî Huseyn, Dîroka Wêjeya Kurdî, Weşanên Enstîtuya Kurdî, Stenbol 2002

**SCHWEPPEHAUSER**, Gerhard, Eleştirel Teoriye Giriş, Weşanên Avestayê, İstanbul 2015

**PERTEV**, Ramazan, Edebiyata Kurdî ya Gelêrî (Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî-1), Weşanên Avestayê, Stenbol 2015

**PROF. DR. ORDÎXANÊ CELÎL**, **PROF. DR. CELÎLÊ CELÎL**, Zargotina K'urda I, Weşanên Aramê, Amed 2013

**PROF. DR. ORDÎXANÊ CELÎL**, **PROF. DR. CELÎLÊ CELÎL**, Zargotina K'urda II, Weşanên

Aramê, Amed 2013

**PROPP**, Vladimir, Folklor/Teori ve Tarih, Weşanên Avestayê, Stenbol 1998

**PROPP**, Vladimir, Masalın Biçimbilimi, wer. Mehmet Rifat-Sema Rifat, İşbankası KültürYayınları, İstanbul 2008

**TURAN**, Prof. Dr. Abdalbaki, Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi, İstanbul 2012

**WÊJE Û REXNE 8**, Kovara Lêkolîn Rexne û Teorîya Wêjeyê, Çapxaney A Grafîkê, Dîyarbekir 2016

**YILDIRIM**, Prof. Dr. Kadri, **PERTEV**, Ramazan, **ASLAN**, Mustafa, Ji Destpêkê Heta Niha FOLKLORA KURDÎ, Weşanên Enstituya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Artukluyê, Stenbol 2013.

**ZAREMA 6**, Kovara Rexne û Teorîyê, Çapxaney A Grafîkê, Dîyarbekir 2016

**ZAREMA 9**, Kovara Rexne û Teorîyê, Çapxaney A Grafîkê, Dîyarbekir 2017

**ZAREMA 12**, Kovara Rexne û Teorîyê, Çapxaney Berdan Matbaacilikê, Dîyarbekir 2018

### ÇAVKANIYÊN DEVKÎ

**AHMEDÊ ZAVA**, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1975, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016

**AMOJNA SUHBET**, Gundê Şerefxanê Jorê-Ebexe-Wan 1973, Dema çîrokwergirtinê: 20 Îlon 2016

**‘ELÎYÊ APÊ MIHO**, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1972, Dema çîrokwergirtinê: 12 Îlon 2016

**HARÛNÊ ZAVA**, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1974, Dema çîrokwergirtinê: 23 Îlon 2016

**HECÎ HENÎFÎ**, Gundê Şerefxanê Jêrê-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016

**KEMALÊ XELKÊ SARÎCÊ**, Gundê Sarîcê-Ebexe-Wan 1947, Dema çîrokwergirtinê: 05 Cotmeh 2016

**NÛREDÎNÊ XELKÊ XAÇA**, Gundê Xaça-Ebexe-Wan 1957, Dema çîrokwergirtinê: 01 Cotmeh 2016

**SALHÊ HECÎ HEYDER**, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1968, Dema çîrokwergirtinê: 10 Cotmeh 2016

**SILÊMANÊ HECÎ HEYDER**, Gundê Seregolê Jorê-Ebexe-Wan 1953, Dema çîrokwergirtinê: 5 Cotmeh 2016

### ÇAVKANIYÊN DÎJÎTAL

**WQFeraheng**, Version 4.0, 20/11/2016

[www.otekileringundemi.com/?p=10970](http://www.otekileringundemi.com/?p=10970)

## PÊVEK: ÇÎROKÊN DERASAYÎ YÊN EBEXÊ (ÇALDIRANÊ)

### 1. ÇÎROKA AVCÎ<sup>477</sup> AHME<sup>478</sup>

Ez ê we ra Avcî Ahme bêjim. Dibê Avcî Ahme adamekî<sup>479</sup> zehf bîlîcî<sup>480</sup>, zehf baş bû. Îsanekî zehf deyerlî<sup>481</sup>, zehf baş bû. Ê him de jî mezinê gund bû. Dibê Avcî Ahme, şev roj karê wî nêçîr bû. Dewamlî<sup>482</sup> nêçîr dikir, nêçîrê ra ûxraşmîş<sup>483</sup> dibû.

Dibê sal çûn, zeman çû. Rojekî Avcî Ahme rabû derkete nêçîrê. Zanî? Notanî<sup>484</sup> vî kîrrê<sup>485</sup> me yê Tendûlekê here nêçîrê. Avek dikşîya. Li derê avê sekinî, mêze kir. Dêna xwe dayê mehreke sipîçîl derket, li ser sel sekinî, xwe da tavê. Mehrekî qol î reş derket, bi wê şa bû, bi wê mehra sipîçîl şa bû.

Dibê Avcî Ahme duşmîş<sup>486</sup> bû, ji tevdîrê îllahî ra go:

“Ya rebbî, ev mehra bedew e te ha çêkirye, heqas çehvê wê reş e, sipîçîl e. Ka pekî ev mehr î kol î reş çima lê bû bela?”

Di wexta tîra da bû. Wexta tîr-kevana bû. Dibê wexta Avcî Ahme tîra xwe derxist, dûz kir ku avît li mehrê reş xe, mehrê reş xwe welgerand kete qulê, mehra sipî birîndar bû. Te seh kir? Mehra sipî jî xwe pey berda, ew jî birîndar kete qulê.

Dibê Avcî Ahme duşmîş bû taşmîş bû<sup>487</sup>. Rabû, çi nêçîrê gerya heta êvar ser da hat, çû. Êvarê hat rûnişt. Mesela em niha ça rûniştine xwe ra xeber didin, laqirdiya dîkin, cima'eta wî jî hate dorê, rîspîyê wî hatin, [gotin]:

“Avcî Ahmed tu çima îro duşmîş dibî? Me ra suhbet bike, me ra laqirdîya bike.”

Dibê go:

“Welle ez ê çi duşmîş bim. Niha, ez îro çûm rastî tişteki hatim. Ez çûme filan derê, çem derbas bûm. Mi li devê çêm dinhêrî, mi dêna xwe dayê mehreke sipîçîl derket, xwe da tavê. Mehrekî qol î reş derket bi wê mehrê şabû. Zehf pê şabû. Ez duşmîş bûm. Mi go; ez Avcî Ahme bim, ya rebbî ji meznaya te ra şukir, ev mehrê reş, bi vê mehra sipîçîl, lê hewqa şabe? Mi wexta tîr-kevanê xwe jor

---

477 ) Nêçîrvan

478 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

479 ) Merivekî.

480 ) Zana.

481 ) Biqîmet, hêja.

482 ) Her wext, her dem.

483 ) Mijulbûn, mijûlayîbûn.

484 ) Mîna

485 ) Ji çiyayên volkanîk ra ‘kîrr’ tê gotin.

486 ) Fikirîn.

487 ) Duşmîş bû taşmîş bû, yanî dûr û dirêj fikirî.

da anî, mi tîra xwe rast kir avîte mehrê reş, wexta mehrê reş xwe welgerand, tîr li mehra sipî ket. Herdu jî birîndar bûn, xwe berdane qulê, çûn. Ez bi wê ra duşmîş dibim. Zanî?”

Millet go:

“Uzulmîş<sup>488</sup> nebe.”

[Avcî Ahme] go:

“Welle, hal-mesele a iha ye.”

Dibê mehra sipî, jina şahê mehra bûye. Mehra sipî çû yêra<sup>489</sup> xwe. Cab dane Mîrê Mehra, go:

“Ew [mehra sipî] hatye, birîndar e. Ça birîndar e!”

Dibê çûn jê [mehra sipî] siwal kirin, go:

“Ça bû?”

Tabî idî nego mehrê reş bi mi şabûye, [mehra sipî] go:

“Welle, ez derketim, mi xwe da tavê. Avcî Ahme hebû, nêçîrvan e. Tîr avît li mi da, ez birîndar kirim.”

Dibê Mîrê Mehra gazî kir, du hev tîremehr şand, go:

“Hûn ê herin Avcî Ahmed [bibînin]. Bikevne binê sola wî, isa lêxin bira hûn tewa<sup>490</sup> wî ra derkevin. Bikujin, werin.”

Baş e. Dibê wexta tîremehr hatin ku dinlemîş<sup>491</sup> kirin, Avcî Ahme ew mesele ji cima’eta xwe ra, wan ra got. Min ça ji we ra got (ku) ça bûye, olayî<sup>492</sup> ça çêbûye, tamam cima’etê ra anlatmîş<sup>493</sup> kir. [Avcî Ahme] cima’etê ra dibêje, tîremehr hatine sêr dikan. Wexta mesele tamamî ji wan go, herdu tîremehra dînlemîş<sup>494</sup> kirin, go:

“Em lê nadin.”

[Tîremehr] çekilmîş<sup>495</sup> bûn, çûne li ba Mîrê Mehra. Dibê çûne li ba Mîrê Mehra. Tabî Mîrê Mehra ra gotin. [Mîrê Mehra] go:

“Ça bûye?”

[Tîremehra] go:

“Hal- hewalê Avcî Ahme, mehra sipî, mehrê reş a iha ye.”

Baş e. Dibê Mîrê Mehra du hev [mehr] şandin, go:

“Hûn ê herin Avcî Ahmed bînin werin.”

[Mehra] go:

---

488 ) Kesirîn, keribîn, liberxweketin.

489 ) Cî, cih, der.

490 ) Ser.

491 ) Guhdarîkirin.

492 ) Rûdan, bûyer.

493 ) Vegotin.

494 ) Guhdarîkirin.

495 ) Vekişîn.



“Baş e.”

Dibê çûn li derî dan. Avcî Ahme hildan anîn. Hildan birne dîwana Şahê Mehra. Dibê Avcî Ahme gote wan mehra, go:

“Yê mi bikujin? Hûn ji mi ra çi dibêjin?”

[Mehra] go:

“Te nakuje. Yalniz<sup>496</sup>, yê bêje te bixaze mirazê xwe. Tu bêje, hema mirazê mi ew e, tê tûyî bin zimanê min kî. Tu mirazê xwe ji wî bixaze, başqe tiştêkî jê nexaze. Lal, durr, zîv, cawhirat, çi da te, bêje na. Bêjê, tê hema tûyî devê min kî. Mirazê mi ev e.”

Baş e. Dibê Avcî Ahme hildan birin. Avcî Ahme çû sera Mîrê Mehra rûnişt. Mîrê Mehra jê ra hurmet kir, go:

“Avcî Ahme, mesele çî bûye tê mi ra bêjî.”

Dibê Avcî Ahme ji Mîrê Mehra ra go:

“ ‘Emrê mi pêncî sal e. Mi tev emrê xwe di nêçîrê da derbas kirye. Rabûme ku panzde salî bûme, mi heta niha emrê xwe tev di nêçîrê da derbas kirye. Ez li filan mewqî derketime nêçîrê. Derbas bûme li ber devê çem ra. Mi dêna xwe dayê mehreke sipîçîl derketeye xwe daye tavê. Mi lê sêr kirye. Mi dêna dayê li pey wê mehrekî qol î reş derket, bi wê mehra çîl şabû. Xwe li wê aland, welgerand. Ça kir? Zehf zora mi çû. Mi go; ez Avcî Ahme bim, ev mehrê pîs bi wê mehrê şabe? Mehr(a sipî) xwe jê xilaz nake? Zanî? Wexta mi tîr-kevanê xwe jor da anî, tam dûz kir avîte mehrê reş, mehrê reş xwe welgerand, li mehra sipî ket mehra sipî birîndar bû. Herdika tev xwe berdane qulê, çûn. Ez jî çekilmîş bûm, hatme mala xwe.”

[Mîrê Mehra] go:

“Tu [mehrê reş] naz dikî?”

[Avcî Ahme] go:

“Hay hay. Ez naz dikim.”

Baş e. Dibê sibe li wana zelal bû. Mîrê Mehra qîrya. Çiqa mehr hebû gazî kirin, tamam hatin. Ejdiya hatin. Qîyametek<sup>497</sup> hatin. Serê wî sipî bû. (Mîrê Mehra) go:

“Nav dane?”

[Avcî Ahme] go:

“Na. Nav da nîne.”

Dibê Mîrê Mehra go:

“Kê ma?”

[Mehra] go:

“Kurê pîrê ma ye.”

---

496 ) Lê, lê belê.

497 ) Ji bo zêdebûna tiştan tê bikaranîn.

Kurê pîrê bûye. De tabî, cem wana gotine [ku] eva kurê pîrê ye. Cem wana, ha. Bi qewlê wana gotye [ku] kurê pîrê ye.

[Mîrê Mehra] go:

“Hema herin, ‘ecele ewî bînin.”

Dibê çûn, anîn. ‘Eynî mehrê qol î reş e, xwe dixê bin mehra. Dibê hema ça hat, Avcî Ahme go:

“Ewî han e.”

Dibê Mîrê Mehra du mehr berdane wî, ewa kuştin. Ewa ret<sup>498</sup> dîkin. Dibê îja gazî mehra sipîçil kirin. Mehra sipîçil bi girêdana xwe hat. [Mîrê Mehra] go:

“Ev jî kulfeta min e.”

Dibê Avcî Ahme ça gotibû, ewê mehrê jî go:

“Isane.”<sup>499</sup>

Ew jî lêda çû.

Dibê Mîrê Mehra sê roja îzna wî nade. Roja ku here, go:

“Tê mirazê xwe li mi bixazî. Tu çîqa mal dixazî, varyatê dixazî, zêra dixazî ez ê bidme te.”

[Avcî Ahme] go:

“Na.”

[Mîrê Mehra] go:

“Çi?”

[Avcî Ahme] go:

“Tê tûyî bin zimanê mi kî.”

Dibê [Mîrê Mehra] gotê:

“Allah Allah! Tu nizanî. Yalnız<sup>500</sup>, tu qurbana şîretkarê xwe bî.”

Baş e. Dibê tûyî bin zimanê wî kir. Mîrê Mehra jê ra go:

“Tu diçî. Yalaniz, xebera mi di bîra te da be. Ti wexta bi gotina jinê neke.”

Dibê Avcî Ahme tîr-kevanê xwe hilda, hate mala xwe. Dîsa eynî bi raw-nêçîra xwe dewam kir. Rojekî hat, jina wî nexaş e. Ha îro nexaş e, ha îro nexaş e, jinikê xwe da erdê, go:

“Ewî tu dizanî tê mi ra bêjî.”

De ewî jî gotê, Mîrê Mehra gotê, go:

“Tu ji kesî ra nabêjî. Tu li ba jinikê jî bi nav nakî. Tu ti kesî ra nabêjî. Surra xwe beyan nakî. Deqa tu beyan kî, tê herî! Te hema ça sirra xwe beyan kir, tu diçî!”

Dibê Avcî Ahme ti çare nedît, gote wana [navmaliya], go:

“Sîtîla daynin. Du sîtîl av mi ra germ kin. Kefenê mi hazir kin. Mi çara jinikê nedît.”

---

498 ) Tinekirin.

499 ) Wisa ye.

500 ) Lê, lê belê.

[Avcî Ahme gote jina xwe] go:

“Ez ê werim te ra bêjim.”

Dibê Avcî Ahme sibê zû pez derxist. De zimanê her heywîn dizane. Her zimanî dizane. Zanî? Wexta ku ewî [Mîrê Mehra] tû devê wî kir, her zimanî dizane. Yanî heywan çi gazî ke, heywan çi bêje, ew her zimanî dizane. Surr ew e, ha.

Dibê wexta du mîh biberan bûn, beran li ser bûn, mîhê li ser cewê<sup>501</sup> ra banz da, kire kalinî, gotê berîn:

“Were.”

Dibê beran gotê:

“Ez nayê.”

Dibê mîh cake<sup>502</sup> zivirî, kire kalinî, go:

“Were.”

Berîn go:

“Ez nayê. Ez giran im. Ez werim, banz dim dava<sup>503</sup> mi yê biqete, zîlana<sup>504</sup> mi yê biqete. Ez li pey te nayê. Ti aqlê mi jî aqlê Avcî Ahmed e ez bi gotina jinikê bikim.”

Avcî Ahme duşmîş<sup>505</sup> bû, go:

“Peyyy! Kuro, dêmekî<sup>506</sup> jinik [wiha li min dike]. Ez diçim.”

Dibê Avcî Ahme zivirî hate malê. Darek hilda, da jinikê, go:

“Dêmek ya te pîlan e. Mi dizanibû. Mihê iha go, berîn iha go. Zanî? Ya te sîyaset e.

Jinik dûz<sup>507</sup> bû. Rehma xwedê li dêbavê cima’etê be.”

ÇÎROKBÊJ: SILÊMANÊ HECÎ HEYDER

PERWERDE: NEXWENDE

HERÊM: GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

TEMEN: 67

DÎROK: 10/10/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

501 ) Qanala ava mêr û zevîyan

502 ) Dîsa, careke din.

503 ) Daw, dêla pezan.

504 ) Niçika li ser daw û dêla pezan.

505 ) Fikirîn.

506 ) Yanî, anku.

507 ) Baş, qenc.

## 2. ÇÎROKA ENAYÎ AHME<sup>508</sup>

Rehma xwedê li dêbavê hazira.

Birê xwe ra bêjim, dibê paşak, se hev keçê wî hebûye. Dibê, qewatê wezîr dilê wî dikeve qîza paşê ya piçûk. Dike nake qîzik serê xwe pê va nake yek. Dike nake qîzik pê ra xirabîyê nake. Rojekî diçe hizûra paşê, dibê:

“Paşa xaş be.”

[Paşa] dibê:

“Ha.”

[Wezîr] dibê:

“Welle, mala te xeberê wan hemû yek nîn in.”

[Paşa] dibê:

“Yawo, ez ça paşa me wezîr? Ça kulfetê mi xebera wan yek nebin?”

[Wezîr] dibê:

“Belê, ez bi ser serê xwe. Kelîma kîjanê yanliş<sup>509</sup> bû, tê wê bidî mi. Ez ça dikim ez ê bikim.”

[Paşa] dibê:

“Ê baş e.”

[Wezîr] dibê:

“Soz?”

[Paşa] dibê:

“Soz.”

Xwedê rehma xwe li dêbavê we ke, eva çîroka bavê min e. Dibê tîn, herdik<sup>510</sup> kincê xwe yê xezebê xwe dikin. Berê xwe dine dîwana jina paşê diçin. Jina paşê dibê:

“Yahhh! Paşa, te xêr e yawo? Te kincê xwe yê xezebê li xwe kirine.”

[Paşa] dibê:

“ ‘Evda xwedê, sorîya<sup>511</sup> siwal neke. Eva mal, dem, dezga, teşkîlat kê daye te?’ ”

[Jina paşê] dibê:

“Te daye mi.”

---

508 ) Ev çîrok, li gor devaka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

509 ) Xelet, çewt.

510 ) Herdu.

511 ) Pirs, siwal.

Sê cara jê dipirse, îmansizê<sup>512</sup> dibê:

“Te daye mi.”

[Paşa] dibê:

“Baş e.”

Diçne derê qîza xwe ya mezin. Ew jî isa dibêje. Diçne derê ya ortê. Ew jî isa dibêje. Diçne derê ya piçûk, ya piçûk dibê:

“Bavo, xwedê dide, tu jî sebebî.”

Wezîr dizîkava<sup>513</sup> dibêje paşê:

“Aha, paşa xaş be, mi nego?”

[Paşa] dibê:

“Baş e.”

Bira wezîr here mala xwe. Paşa dizvire cem wanê din, [dibê]:

“Gele kera, zaten xwedê daye, ez jî sebeb im. Niha mal, rizk yê xwedê ye. Xwedê dide, qûl sebeb e.”

[Paşa dibêje qîza piçûk] dibê:

“Te iha gotye?”

[Qîza piçûk] dibê:

“Bavo, wê surrê qapat<sup>514</sup> ke. Wê surra ara mi wezîr qapat ke. Ez dizanim kula wezîr çî ye.”

Bavê xwe ra jî nabêje. Dibê sibê zû şeveqê wezîr tê, dibê:

“Paşa, soz soz e?”

[Paşa] dibê:

“Belê, soz soz e.”

Ewê digrin dine destê wezîr. Wezîr du hevên mîtani<sup>515</sup> mi dişîne nava gund, dibê:

“Kuro herin. Enayîyê gund kîjane e, hûn ê mi ra bigrin bînin werin.”

Ewna diçin dikevin nava şîher. Valî digerin, walî digerin enayîkî dibînin. Tînin tîn, dibên:

“Welle wezîr xaş be, en enayî ev e.”

[Wezîr] dibê:

“Baş e.”

Qîzikê digrin dine destê wî, dibê:

“A te ra, hilde bihere.”

Qîzik jî aqil bûye. Dibê qederekî diçin, qîzik dibê:

“Kanê ez jê pirs kim ev ê mi bihere ku? Aqlê vî serê vî ye, serê vî nîn e?”

---

512 ) Bêîmanê.

513 ) Bidizî.

514 ) Bigire.

515 ) Mîna

[Qîzik dibê:]

“Lolyo, ca neçe.”

Disekine. [Qîzik] dibê:

“Navê te çi ye?”

[Enayî] dibê:

“Navê mi Ahme ye.”

[Qîzik] dibê:

“Ahme, tê mi biherî ku?”

[Ahme] dibê:

“Îî! Ez ê xwe qurbana te kim da. Paşê, tu dayî mi, tu kulfeta min î. Ez ê te biherim. Te ra bixevitim. Te xweyî kim.”

[Qîzik] dêna xwe didê, peyyy! Ketye tinebûna dinyayê, bûye Enayî Ahme. Aqlê wî li sêrî ye.

[Qîzik] dibê:

“Ê baş e. Ahme, îja mesela mala te, erazîyê te, ‘erdê te, xanmanê<sup>516</sup> te [heye]?”

[Ahme] dibê:

“Her tiştê mi jî heye.”

[Qîzik] diçe dêna xwe didê, sê dîwar in, ser jî avakirî nîne. Hema sê dîwarê iha niçkî ne.

[Ahme] dibê:

“Mala mi ev e. Ev jî zeviya min e.”

[Qîzik] dibê:

“Baş e.”

Dibê ew [û] Ahme heke çi avahî hebin, wê şevê di wê qulikê da dimînin. Sibê zû radibe, zêrekî wê ye piçûk be, hustuyê wê da be, diqetîne, dibê:

“Ahme, bihere çarsîyê bifroşe. Min û xwe ra bide nan, bide hine perçe, hinek jî guloka tayê îşlema<sup>517</sup> pê çêdikin. Du hev jî mûm hilde bîne.”

Birê xwe ra bêjim, Ahme dibe çarsîyê, dide hine nan, du-sê hev mûm, hînek jî perçe, hinek jî ewa tayê îşlema pê çêdikin tîne tê.

Dibê qîzikê [bişev] kirasê xwe şiqitand derxist, tijî gîha-mîha kir, da bin Ahme. Serê Ahme da ser çoka xwe. Bira Ahme xwe ra razê. Ewa heta sibê isa dixevite. Desmalê ser destê xorta çêdike. Dibê sibê zû Ahme radibe. [Qîzik] dibê:

“Ahme, liba van desmalê mi yek zêr e. Tê biherî, liba wana bidî yek zêrî. Te çi firot tê perê xwe, zêrê xwe hildî. Tê zêrekî hûr kî. ‘Eynekî vî terî te duhê çi anye, tê iha hildî me ra bînî werî.”

[Ahme] dibê:

---

516 ) Mal, xanî.

517 ) Nexşandin, neqîşandin.

“Baş e.”

Dibê Ahme isakîne<sup>518</sup> diçe difroşe. [Qîzik] rojekî dibê:

“Ahme.”

[Ahme] dibê:

“Ha.”

[Qîzik] dibê:

“Were evî xanî ava ke.”

Ahme xanî ava dike. Dîwar-mîwarê wê çêdike. [Qîzik] dibê:

“Evê avê jî bigre li oncê rast ke.”

Ahme avê digre, onca xwe jî pê av dide. Dibê ew û Ahme xwe ra isa cem hev dimînin. Xwedê îdara wan dike. Rojekî Ahme diçe çarsîyê, dêna xwe didê, hine meriv cîkî top bûne. Dibê:

“Qurban, eva çî ye?”

[Merivek] dibê:

“Welle ez kelîmekî difroşim. Aqil difroşim.”

[Ahme] dibê:

“Kuro, çakî tu aqil difroşî?”

[Ew meriva] dibê:

“Lê!”

[Ahme] dibê:

“Îja bi çî ye?”

[Ew meriv] dibê:

“Kelîma bîaqil zêrek e.”

[Ahme] dibê:

“Ê baş e.”

Zêrekî xwe dide, dibê:

“Çî ye?”

[Ew meriva] dibê:

“Mezinek mala te da hebe, tu bê wî meznî tu tiştî nakî. Tê wî bişewirî paşê îşekî bikî.”

[Ahme] dibê:

“Hema ev e!”

[Ew meriva] dibê:

“Erê.”

[Ahme] dibê:

“Baş e.”

---

518 ) Wisa. Li Ebexê û li devdora Ebexê zêde tê bikaranîn.

[Ahme dibê:]

“Ê kuro ka axirî mi zêrê qîza paşê hûr kir, da aqil! Kuro, ev yeke ça bû hate serê mi?”

Dibê zivirî hat. Qîzikê go:

“Ahme çima isa tu ewî?”<sup>519</sup>

[Ahme] go:

“Welle hal-hîkayetê mi iha.”

[Qîzikê] go:

“Te zêrê me daye. Heger qafê te da bimîne tişteki rind e. Ku nemîne jî tu dizanî.”

Ahme rojekî dêna xwe dayê, kewranbaşî<sup>520</sup> giran, deve û develix li serê merga wî danîn. Destê xwe jê ra ba kirin. Ahme çû cem wana, go:

“Bêje, we xêr e?”

[Kewranbaşî] go:

“Welle qurban, xweyî vê zeviyê kê ye?”

[Ahme] go:

“Ez im.”

[Kewranbaşî] go:

“Tu nadî me?”

[Ahme] go:

“Welle meznê min heye. Bisene, ez meznê xwe bişêwirim.”

Hat, gote qîza paşê:

“Welle ‘evda xwedê, ew merivê hanê, axê vî dewarê hanê, heywanê hanê, dibê tê vê zeviya xwe bidî me. Pitê<sup>521</sup>, deyera<sup>522</sup> vê çî ye?”

[Qîza paşê] dibê:

“Deyera wê du zêr e.”

Dîçe, dibê:

“Welle qurban, meznê mi gotye deyera wê du zêr e.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Ê baş e.”

Du zêra didê. Zêrek jî didê, dibê:

“Tê herî me ra ji loqantê nan bînî.”

[Ahme] dibê:

“Welle bise, bira zêrê te cem te be. Ez herim meznê xwe bişêwirim, werim. Îja ez ê te ra bêjim.”

---

519 ) Xerîb, ecêb, seyr.

520 ) Rêber û axayê kewranan.

521 ) Li Ebexê û derdora Ebexê bo gazîkirin û bangkirina jinan ji aliyê mêran va tê bilêvkirin.

522 ) Buha, biha.



[Kewranbaşî] dibê:

“Baş e.”

Diçe jina xwe ra dibêje. Jina wî dibê:

“Erê welle Ahme. Kuro, tu nekî ez nekîm lê kê bike? Here bîne were. Ez ê hûr kim, nîv zêrî wî ra bime melzemê nan, nîv zêr jî yê me ra kar bimîne.”

Dibê isakîna<sup>523</sup> dike. ‘Elebaşî<sup>524</sup> gazî dikê. Navê wî jî Ahme bûye. Dibê:

“Xorto.”

[Ahme] dibê:

“Ha.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Tê bejî meznê xwe, lê bişêwire. Tê werî mehekî qatî<sup>525</sup> heywanê mi bî, bibî başpehlîvanê<sup>526</sup> xulamê mi. Meha te jî sî zêr e.”

[Ahme] dibê:

“Bise, ez meznê xwe bişêwirim.”

Meznê xwe dişêwire. Qîzik dibê:

“Erê wellle Ahme. Tê herî bixevitî.”

Sî zêrê xwe pêşin distîne. Diçe ber dewarê wî, heywanê wî. Mestay<sup>527</sup> wan xulam, xizmetkarê wî dike.

Roja wî [Kewranbaşî] tê. Idî mesela yê ji Turkiyayê bar ke here Îranê. Dibê:

“Ahme.”

[Ahme] dibê:

“Ha.”

[Kewrnabaşî] dibê:

“Wele tu werî ser deva bar kî, ser deva em herne Îranê.”

[Ahme] dibê:

“Welle ez nayêm. Kulfetê mi, jin-zarê mi vira dimîne. Ez nayme Îranê.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Yawo, tê werî, miherin<sup>528</sup>. Mehekî me ra werî, miherin. Cake<sup>529</sup> lêxe were.”

[Ahme] dibê:

“Na welle, ez nayêm. De bise, ez meznê xwe bişêwirim.”

---

523 ) Wisa.

524 ) Qewranbaşî.

525 ) Miqatî.

526 ) Serekpelevan.

527 ) Mezintahî, mezintayî, rêberî, rêvebirî.

528 ) Em herin, em biçin.

529 ) Careke din.

Diçe cem qîzikê. Qîzik dibê:

“Ahme, here gazî fotocîkî ke.”

Gazî fotocîkî dike, tîne tê fotrafa xwe [û] qîzikê tev dikşîne. [Qîzik] dibê:

“Ahme, ez jî hemle me. Xwedê îşê te lê bîne. Here.”

Ahme bi tevî xulamê wî va deva bar dikin. Şeveqa sibê ra bira rê kevin, herin. Idî bi sala here, idî bi zemana here, her xwedê bizanibe.

Dibê ewa qîzka doxim<sup>530</sup> dike. Xwedê ewladekî kurîn didê. Dibê mezin dibe diçe mewteve<sup>531</sup>. Birê wê û kurê wê mewteve da dibne birakê hev. Şevêkî mala qîzkê ne, şevêkî mala paşê ne. Qîzik, birê xwe naz dike [lê], paşa nebiyê xwe naz nake. Dibê paşa hercar lê dipirse, dibê:

“Kurê mi, bavê te hê nehatye?”

[Gede] dibê:

“Na. Bavê mi çûye qurbetiyê hê nehatîye, Kalko.”

Bira ewa isa dewam kin. Em werne Enayî Ahme. Enayî Ahme diçe. Dibê bîreke avê ara me û Îranê da hebûye. Dibê kê ketye bîra avê, derneketiye. Dibê [Ahme] deva ser dide yixmîşkirinê<sup>532</sup>. Hîngî Ticar Ahme gazî dike, dibê:

“Kuro, kê ketyê derneketiye!”

[Ahme] dibê:

“Na, ez ê bikevmê. Meheke mi tamam bû. Eva jî zêrê meha mi, tê bidî mi. Ez derketim ez ê vê adrêse ra bişînim. Ez derneketim jî hûn xwedayê xwe. Hûn dişînin hûn dizanin, naşînin hûn dizanin.”

Zêrê meha xwe jî jê distîne. Dibê satila avê hebûye, dadixin. Dibê, Ahme berdine hundirê satila avê. Ahmet gurrr diçe hundirê bîrê. Diçe hundirê birê, dêna xwe didê, ‘erebekî reş î lêva wî a hinde dirêj, şûrekî dirêj dêst da ne, sekiniye. Teyşteke avê wir e, beqek nav da ne. Fotrafa qîzekî qarşî<sup>533</sup> wî li dîwêr e. Dibê birê xwe ra bêjim, Ahme dêna xwe didê, ‘ereb dibêjê:

“Ahme ez rind im? Tu rind î? Fotraf rind e? Beq rind e?”

Ahme duşmîş<sup>534</sup> dibe, dibê:

“Kuro, de mi xwe ra aqil kirîbû!”

[Ahme] duşmîş dibe, duşmîş dibe, dibê:

“Pênc deqa mi sebir ke.”

[‘Ereb] dibê:

“Temam. Deh deqa jî te sebir dikim.”

530 ) Zayîn, welidîn.

531 ) Dibistan, medrese, mekteb.

532 ) Komkiririn, dan ser hev.

533 ) Pêşber, hember.

534 ) Fikirîn.

Ahme ser da duşmîş dibe, dibê:

“Birinci<sup>535</sup> tu rind î. Îkinci<sup>536</sup> beq rind e. Ûç<sup>537</sup> ez, dort<sup>538</sup> fotraf rind e.”

Dibê agir û qîrçîn beqê dikeve, beq dibe qîzekî. ‘Ereb jî dibe xortekî. Agir fotrafê dikeve fotraf dişewite. Ahme, ciyê xwe da, wira zîq dibe disekine.

[Ahme] dibê:

“Kuro, ev çi bû? Hey mala te xira be.”

[‘Ereb] dibê:

“Qe, lê vegere Ahme. Eva qîzmeta mi bû. Ewa han jî qîzxatiya mi bû. Dilê me herdika<sup>539</sup> ketibû hev. Dilê qîzxatiya mi jî ketibû mi. Xatiya mi sêr da ser me herdika. Em avîtne wê derê. Fotrafa qîza xwe jî iha danî qarşî me. Kê dihat diçû me jê dipirsî. Digotin; fotraf, ez, tu, paşê beq. Sêra mi betal nedikir. Mi serê wî jê dikir. De îja, bixaze mirazê xwe.”

Ahme dibê:

“Heylî mala te xiraboyî. Te hundirê mi qetand. Kuro, îja qîza paşê jî jina min e. Ka ez ê niha çi bixazim?”

‘Ereb sê hinarê iha hinde didê, dibê:

“Eva hedyâ me ye ji te ra.”

Bira herdikê dinê herin. Birê xwe ra bejim, dibê ew avê dikşîne. Deve, xulam, xizmetkar, axa va duxwin<sup>540</sup>. Ahme birê derdikeve, dibê:

“Xwedê, ez kulê duxum hinarê naxum. Ez jehrê duxum hinarê naxum. Ez ê qîza paşê ra bişînim. Qîza paşê hemle ye. Ez ê jê ra bişînim. Hema bira ew buxwe.”

Her sê hinarê xwe têdixe nava desmala xwe. Adrêsa xwe ser dinvîse. Wî sî zêrê xwe va dişîne memleket. Bira Ahme wana rabin rê kevin herin.

Em werne qîzikê. Dibê qîzikê dêna xwe didê, meytûbcî meytûb anî ber dêrî. Sê hev hinar, sî zêr [di nav da ye]. Dibê:

“Hayla çehvê mi rijyayê. Ahme bona mi hinar nexarine, şandine.”

De îja, qîza paşa ne. Ti mîtanî<sup>541</sup> yê me ne, hema nişkava nade ber xwe, ker nake, naxwe. Na. Dibê hinara xwe dişo, kêra xwe dişo. Sinya xwe daytîne ‘erdê. Wexta bisimla dike, çaxê kêrê dide orta hinarê ker dike, sinî qûç<sup>542</sup> zêr dibin. Dibê:

535 ) Yekem, yekemîn.

536 ) Duyem, duyemîn.

537 ) Sêyem, sêyemîn.

538 ) Çarem, çaremîn.

539 ) Herdu.

540 ) Vexwarin. Li Ebexê û devdora Ebexê bo vexwarina tiştên şilemenî li şûna lêkra ‘vexwarin’ê lêkera ‘xwarin’ê tê bikaranîn.

541 ) Mîna.

542 ) Tijî.

“Hîî! Weyla porê mi kurbûyê! Ev çî ye?”

Dibê, diçe sinîke wê mestir, kêreke wê mezintir tîne tê. ‘Eynekî dîsa çaxê bisimla dike, dide ortê, ew jî qûç dibe. Dibê:

“Peyyy! Xwedê, idî ez eva hanê jê nakim. Ewa hanê şahidê min e. Çimkîle<sup>543</sup> ez ewa hanê ker kim, Ahmed yê were bê, ka te eva zêrana, eva mala ku aniye? Bihar<sup>544</sup> nake, da. Ez bêjim hinar e. Yê bêje, te hinar xarine ka îja şahidê hinarê.”

Aqil bûye, da. Yekî hildide. Dibê, diçe gazî Enverê<sup>545</sup> zavê mi dike. Dibê:

“Enver.”

[Enver] dibê:

“Ha.”

[Qîza paşê] dibê:

“Te koşka paşê bi çî çêkirye?”

[Enver] dibê:

“Mi bi sî kîse zêr çêkirye.”

[Qîza paşê] dibê:

“Ha te ra sî yek. Tê anaxtar tesmîl<sup>546</sup> mehekî da bidî mi.”

[Enver] dibê:

“Ser çehvê mi.”

Dibê, mesela apartmana bavê wê kê çêkiribe, dibê ew hosta ‘eynekî ser wê kolka wê, xanmanê wê radikin<sup>547</sup>. Apartmana paşê ça çêbûye, çî şeklî, çî lewnî hatye çêkirinê, ewa hosta bîna wê qîzkê wî tehrî daytîne. Dibê li ser pêşya wê dinvîse ‘Tucar Ahmed’.

Em werne Ahme. Ahme derbasî memleketê wî kewranbaşî dibe. Dibê, zehf zeman dikeve arê, dibêje kewranbaşî da:

“Destûra mi bide, ez rabim. Îja ez herme mala xwe. Kulfetê mi hebû.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Na welle, tu hê naçî.”

Dibê [kewranbaşî] mala xwe xirav dike, jîna xwe ra dibêje:

“Welle birakî mi heye. Xwedê birê isa nedane mi. Heke mi berê dikana xwe rojê pêncî zêr kar bikira, hîngî xwedê birak daye mi, tê ber dikana min e zêra ez rojê sed-pêncî zêrî kar dikim.”

Jinik dibê:

“Welle, hûn mêr qeleş in.”

---

543 ) Çunkî. Li Ebexê û li devdora Ebexê tê bikaranîn.

544 ) Bawer.

545 ) Enver, zavayê çîrokbêj e û guhdarvanê çîrokê ye.

546 ) Yanî, tê avahiyê xilas bikî û mifteya avahiyê bidî xwediyê xanî.

547 ) Çêkirin.

[Kewranbaşî] dibê :

“Çima?”

[Jinik] dibê:

“Wexta birê te hebû te mi ra bigota, mi jî birê te bidîta.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Yawo, birê mi nemehrem e, jin-mina nanhêre.”

[Jinik] dibê:

“Na welle. Tê sibê gazî kî bira were malê.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Baş e.”

Jina wî nanekî rind çêdike. Dibê [kewranbaşî] diçe dêna xwe didê, Ahme wa dikanê da ne. Dibê:

“Ahme, welle tê werî malê. Xûşka te gotye bira were malê, mêvan e.”

[Ahme] dibê:

“Heyran, ara mi jina tine. Ez zêde nayme malê.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Welle tê werî malê.”

Haşa Fecê, Hacê<sup>548</sup>, cima’eta lê. Dibê Ahme dêna xwe didê, jinik çêhvê wê li xirabiyê ye. Dike nake yawo [Ahme tu çareyekî nabîne]. Kulhalekî<sup>549</sup> nan duxwe, kulhalekî çay duxwe<sup>550</sup>. Xatrê xwe ji birê xwe dixaze, dibê:

“Bira, xatrê te. Ez ê herme dikana xwe.”

Eva diçe dikanê. Jinik pêşya wî diçe dikanê. Jinik dike nake Ahme dibê:

“Yawo, mi nanê wî mervî xarye. Mi ava vî mervî xarye. Evê yekê nikarim jê ra bikim, bûye birê mi.”

Eva [Kewranbaşî] jî dêna xwe didê, him Enayî Ahme inda<sup>551</sup> bû him jina wî inda bû. Pey herdika<sup>552</sup> diçe. Dêna xwe didê, herdik wa dikanê da xeber didin. Ahme jî dêna xwe didê, birê wî derket. Hema ça kulmekî dide nav çêhvê jinikê, jinik dikeve. Jinik radibe ser xwe, lêva wê da xûn tê. Ewa kewranbaşîyê [ku] Ahme birî, dibê:

“Pitê, ça bû?”

[Jinik] dibê:

“Yawo, te nedigo, mi çûye xwe ra dizek anye. Te digo, mi çûye xwe ra bira anye. Yawo, dehwa

---

548 ) Herdu baltûzên ango dişên çîrokbêj in û guhdarvanên çîrokê ne.

549 ) Bi awayekî.

550 ) Vedixwe. Li Ebexê û li derdora Ebexê bo vexwartina tiştên şilemenî li şûna lêkera ‘vexwarinê’, lêkera ‘xwarin’ tê bikaranîn.

551 ) Winda.

552 ) Herdu.

namûsa mi kir, mi nedayê. Iha li mi xist, ez ketim.”

Mêrê wê dibêjê:

“ ‘Evda xwedê, isa nîne bira isa be.’ ”

Bira jinik were. [(Kewranbaşî] gazî Ahme dike. Tîne tê, dibê:

“Kuro, ça bû?”

[Ahme] dibê:

“Welle hal, hewal, hîkayetê mi a iha.”

Welle herdik<sup>553</sup> diçin jinikê dikujin. Li tewlê selekî<sup>554</sup> vedikin, dibin davêjne bin sel. Dibê bira mîzê dêwêr were ser jinikê. Dîsa zeman dikeve arê. Ahme dibêje wî birakê xwe:

“Bira, tu îzna mi bidî ez ê herim. Kulfetê mi hêviya min e.”

[Kewranbaşî] dibê:

“Îja birê xwe bizewicîne, here.”

[Ahme] Êpêy<sup>555</sup> dimîne. Dibê dajo derê mala henkûfî wî, anegorî mîta<sup>556</sup> wî tucar. Dibê destê qîza wî birê xwe ra digre. Def, dehata wan dike.

Wî zemanê mi we ra go, mi go, iha bi deve-develix, xulam, xizmetkar tên dehwa zeviya Ahme dikin. Wî çaxî Ahme, Enayî Ahme bûye da, isa nîne? (Kerwanbaşî) ‘eynekî wê tempoyê<sup>557</sup>, barê heft deva, qîmetê giran barê sivik bar dike. Bixulam, xizmetkar dide Enayî Ahme, dibê:

“Hûn ê biherin derê malê wî daynin werin.”

Bira Ahme rê keve were. Ahme tê, ber bîna xwe disekinê. Dêna xwe didê, ya rebbî! Bîna diçe asîmana! [Dibê]:

“Kuro yawo, eva bîna kê ye?”

Dora xwe dinhêre. Diçe tê, heta kew<sup>558</sup> dikeve sibê. Jinik hişyar dibe. Dêna xwe didê, merivek derdorê bînayê diçe tê. Dibê:

“Filankes, tu çi derdorê xanmanê mi diçi tê digerî?”

[Ahme] dibê:

“Abla<sup>559</sup>, filan tarîxê da jinikeke belengaz li vira bû. Te qe nedîtye?”

Dêna xwe didê, peyyy! Ahmed e hatye, naz nake. Dibê:

“Were yêra<sup>560</sup> wê te ra bêjim.”

---

553 ) Herdu.

554 ) Kevirê pehn î tenik î bi ber î dirêj.

555 ) Zehf, zêde.

556 ) Mîna

557 ) Wateya peyva ‘tempoyê’ lez û bez e. Lê di vir da çîrokbêj ev peyva bi wateya ‘ bi wî awayî’ bikaranîye.

558 ) Renayî, ronayî. Tava sibê.

559 ) Xwûşkê.

560 ) Cî, cîh, der.

Derî dide vekirinê. Eva diçe hundir. Kurê wê, birê wê jî malê razayîbûne. Fotrafa wê û Ahme ya çaxê çûyîne, jinikê kişandibûye çûye, dêna xwe didê, wê ser masê ye. [Jinik] dibê:

“Tu eva hanê naz dikî?”

[Ahme] dibê:

“Erê welle. Ez im, kulfeta min e.”

[Jinik] dibê:

“Kuro Ahme, tu mi naz nakî?”

[Ahme] dibê:

“Na welle, te naz nakim.”

[Jinik] dibê:

“Kuro, de qîza paşê, ez im.”

Dibe qîrîniya herdika, xwe davêjine destpîyê hevdu. Dibê kurê wê radibe. Kurê wê radibe. Kurê wê dibêjê:

“Dayê, bavê mi nehatye?”

Jinik dibêje kurê xwe:

“Bavê te hatye. Tu îşev çûyî dîwana paşê, paşê te pirsî go, bavê te hatye? Bê, erê kalko. Bavê mi hatye. Navê bavê mi Tucar Ahmed e. Paşa, yê bizanibe.”

Ewna diçne meyteva<sup>561</sup> xwe. Êvarê diçe mala kalkê xwe. Cake<sup>562</sup> kalkê wî destê xwe li sêrî dixê, dibê:

“Kurê mi, bavê te hê nehatye?”

[Gede] dibê:

“Kalko, welle bavê mi hatye.”

[Kalikê wî] dibê:

“Bavê te ça hatye?”

[Gede] dibê:

“Welle, bavê mi isa kar kirye, isa hatye. Navê bavê mi Tucar Ahmed e.”

Dibê îja gazî wezîr dike, dibê:

“Kuro, wezîr wezîr!”

[Wezîr] dibê:

“Ha.”

[Paşa] dibê:

“Kuro, deftera tucara bîne.”

---

561 ) Dibistan, medrese, mekteb.

562 ) Dîsa.

Deftera tucara tîne tê. Dêna xwe didê, Tucar Ahmed dîye<sup>563</sup> kes tê da tine. Ewna radibin, heryek deste kincê dewrêşa li xwe dikin. Dikevne nava gund digerin hetanî rastî mala Tucar Ahmed hatin. Bira paşa bigere.

Em werne ser jinikê, gede, zêra. Ahme jê pirsî, go:

“Qîzê, te eva apartmana, eva dem, dezgaya ku anye?”

[Jinikê] go:

“Ez çî te veşêrim çî xwedê veşêrim. Hal, hewalê mi, her sê hinarê te a iha. Welle, mi dudu jê kirin, yek jî maye.”

Çû ya dinê jî anî. ‘Eyneki isa kêr dayê ker kir. Dêna xwe dayê, a iha zêr in.

[Ahme] jina xwe ra go:

“Peyyy! Çî hebe filan bîrê da bûye. Hal, hewalê bîrê van hinara jî a ihakîne<sup>564</sup> ye.”

Jinikê camê ra dêna xwe dayê, wê bavê wê [û] wezîr qîlfê xwe degîşkirine<sup>565</sup>, ketne qîlfê dewrêşa, hatne ber dîwarê wan. Ser bîna wê jî nivîsiye, Tucar Ahmed.

Dibê gazî mêrê xwe dike, dibê:

“Tu ça dikî, tê wan her dewrêşê hanê hildî hundir. Tu ça bînî, tê bînî.”

[Ahme] dibê:

“Baş e.”

Diçe gazî herdika<sup>566</sup> dike, dibê:

“De îja kerem kin werne malê.”

Dibê:

“Heyran, em ê lêxin herin. Em dewrêş in.”

[Ahme] dibê:

“Yawo, wellahî mi sond xarye. Ez bavê xwe da bûme heta roja îro ew dewrêşê hatye, ew feqîrê hatye ber derê mi, ne mi bênan veğerandîye ne mi bêxerclix veğerandîye. Hûn ê werne hundir. Ez ê bol<sup>567</sup> jî xerclixê bime we. Pere jî na, ez ê zêra bime we.”

Dibê wezîr, qewatî yalê jina va pîs bûye. Diniçîne paşê, dibê:

“Yawo, em herin nanê xwe jî buxin zêrê xwe jî hildin.”

Wexta evna dikevne hundir, qîzik nanê wan, ava wan ‘eynekî qaydê paşayê bavê xwê (hazir dike). Nan, avê bavê wê ça ji malê diçû wî terî [hazir dike]. Nan-manê wezîr jî wî terî dişîne. Paşa dibê:

“Wezîr, kuro vî îşî da îşek heye, lawo.”

[Wezîr] dibê:

---

563 ) Qet.

564 ) Wiha.

565 ) Guherandin.

566 ) Herdu.

567 ) Zehf, zêde.



“Çima?”

[Paşa] dibê:

“Yawo, binhêre iha ye. Mala mi, nanê mi ça dihat, nanê mi vira isa tê. Kuro, nanê te ça tê? Malê ça dihat niha jî iha tê? Yanî mîtanî<sup>568</sup> paşa tê, mîtanî wezîra tê?”

Paşa aqil bûye, wezîr na. [Paşa] dibê:

“Binhêre, bînpîya mi mûmek e, ber serê mi mûmek çikandine. Ya te ber serê te tenêka<sup>569</sup> mûmek çikandine. Kuro, îşek heye.”

Îja bînpîya paşê yekî datînin, ber serê wî yekî datînin. Ber serê wezîr mûmekî tenêka daytînin bira bişxule. [Wezîr] dibê:

“Na heyran.”

Jinik sibê zû qewaltiya wana hazir dike. Dibêje mêrê xwe, dibê:

“Tê bêjî paşê, tê bêjî dewrêşê mezin. Tê bejî welle jina mi, kulfeta mi, îsal bîst sale, filan tarîxê da mi xastye. Serê wê li erdê bilind nabe. Heqa mi bire dixtora, heqa mi bire hekîma, serê wê baş nabe. Welle, serê jinka mi baş nebûye. Welle, serê jinka mi baş nebûye. Hêca<sup>570</sup> ber tendûrê we ra nan valakirye, nanê we valakirye. Serê xwe ber tendurê danye, xewek ketye çehvê wê. Xewnek dîtye. Gotye, welle dewrêşê mezin destê xwe ça bikute vira cênîkê wê, êşa serê wê yê berde. Tê a iha bavê mi ra bêjî.”

[Ahme] dibê:

“Baş e.”

Dibê ewa wexta vî terî bavê jinikê ra dibêje, paşa dibêje:

“Heyran, ez nemehrem im, jin-mina nanhêrim.”

Wezîr, qewatî bînamûs bûye, gotye:

“Yawo, de bira were. Dêna xwe bidê, here. Xwedê ji te razî, yê çi be? Heqa nan-man da me, xizmeta me dike.”

[Paşa] dibê:

“Baş e.”

Dibê wexta qîzik der da tê, ‘eynekî qaydê gîyima<sup>571</sup> jin-zarê paşa tê. Birê xwe ra bêjim, çaxê serê xwe berjêr dike, paşa iha piştta xwe didê, iha destê xwe dikute cênîkê wê. Dibê, eva ewê<sup>572</sup> ser serê xwe iha davêje, dibê:

“Bavo, xwedê dide yan ‘evd?”

[Paşa] dibê:

---

568 ) Mîna.

569 ) Sîrf, bi tenê.

570 ) Lehzek berê niha, qasek berê niha.

571 ) Kinc.

572 ) Lacik,

“Lawo, welle rast e. Xwedê dide.”

[Jinik] dibê:

“Binhêre, qarşî<sup>573</sup> te jî însa’et e. Te ez dame Enayî Ahme. Binê<sup>574</sup>, bûye Tucar Ahmed.”

Wezîr kir ku rabe, dibê:

“Bavo, wezîr bira rûnê.”

Wezîr rûdinê [jinik] dibê:

“Bavo, ez çaxê mal da bûm, wezîr dehwa bênamûsiyê li mi dikir. Mi poz lê nedikir. Îja gerya ewa pîlana derxist. Îja ewa pîlana derxist. Dîsa serê xwe negirt. Îja ez dame Enayî Ahme. Îja Enayî Ahme jî îro qarşî te bûye Tucar Ahmed. Binhêre, xwedê dide yan ‘evd?’”

[Paşa] dibê:

“Lawo, welle xwedê dide.”

Dibê hemen hespekî tî dikin yekî birçî dikin. Lingê wezîr yekî davêjne hespa birçî yekî jî davêjne hespa tî. Ew, ber bi avê xwe didê, ew jî ber bi gîhê xwe didê. Dibê wezîr ortê da dikne du çîqa.

A ewana çûne mirazê xwe. Hûn jî herne mirazê xwe.

ÇÎROKBÊJ: ‘ELÎYÊ APÊ MIHO

HERÊM: GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

EMRÊ ÇÎROKBÊJ: 47

PERWERDE: DIBISTANA SERETAYÎ

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 12/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

573 ) Pêşber, hember.

574 ) Binhêre, binêre.

### 3.ÇÎROKA CIBRÎ<sup>575</sup>

Ê de îja berê digotin, carek ji cara rehme li dêbavê hazira. Dibê zemanekî Cibrî hebûye, kurê Mîrbeg. Dibê berdestiyê wî Ahmed hebûye. Navmalya wî Ahmed hebûye. Em jê ra dibêjin berdest, niha.

Dibê rojkî tê, dêna xwe didê, hema isa uzulmîş<sup>576</sup> dibe. Cibrî dibêjê:

“Ahmed, ça bûye ji te?”

[Ahmed] dibê:

“Welle, çi bûye ji mi? Eva varlixa<sup>577</sup> te, serveta te, eva şexsê te, eva mulkîyeta te, eva paşatîya te, ez dihelim, uzulmîş dibim. Tê rojekî bimirî, bêzurîyet herî. Tu nezewîcî, tê bimirî.”

[Cibrî] dibê:

“Ê mala te nekeve. Madem tu hinde uzulmîş dibî, ber mi dikevî. Tu jî here bigere. Şihera, welata, melmeketa bigere. Jineke yaqîşmîş<sup>578</sup> mi be, mi ra bibîne. Ez jî herim dest bigrim, bizewicim.”

Dibê Ahmed radibe rê dikeve. Li êla w êl ‘eşîra, melmeketa, şihera digere. Rojkî tê, tê zozanekî. Rê ra derbas dibe, dêna xwe dayê qîz têne avê. Dêna xwe didê, kuro qîzekî dinhêre, ya rebbî! Qîz nîne husnucemalek e. Dibê li serê hespa xwe dixê, vedigere. Dibê dibêje wê qîzkê da, ew qîzika isa bedew:

“Dayê, tu dikarî tase av, kanîyê da kî bidî min?”

Dibê Têlî ‘Eyşan dibêjê:

“Temam.”

Nizanbûye tabî navê wê Têlî ‘Eyşan bûye. Têlî Eyşan dibêjê:

“Bira be.”

Dibê tasa avê wexta xwe xar dike, bilind dike, didê, ser piştê hespê eva avê duxwe<sup>579</sup>. Dibê Ahmed dibêjê da:

“Xûşkê, ez ê tiştêkî ji te siwal bikim. Tu qîz î? Tu bûk î? Tu jin î?”

Dibê Têlî ‘Eyşan lê dinhêre, dibê:

“Te çima siwal kir?”

[Ahmed] dibê:

“Cîya mi, yanîş anlamîş nebe<sup>580</sup>. Ez, navê mi Ahmed e. Ez navmalîyê filan kesê me. Ez li

575 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

576 ) Liberxweketin, kesirîn, keribîn.

577 ) Dewlemendî, zengînî.

578 ) Ligorîbûn, hevtabûn, henkûfbûn.

579 ) Li Ebexê ji bo vexwarina tiştên şilemenî li şûna lêkera ‘vexwarin’ê lêkera ‘xwarin’ê tê bikaranîn.

580 ) Xelet fehm neke.

memleketê Serhedê tēm. Navê [paşayê min] wî Cibraîl e. Kurê Mîrbegê ye. Bêkar<sup>581</sup> e. Ez digirim yeke layîqî wî jê ra bibînim. Yê were dest bigre. Qedera xwedê bibe.”

Dibê Têlî ‘Eyşan dibêjê da:

“Ez bêkar im.”

[Ahmed] dibê:

“Dîya mi, navê te çî ye?”

[Têlî Eyşan] dibê:

“Navê mi, Têlî ‘Eyşan. Ez qîza Mîrê ‘Ereb im li vî memleketî.”

Dibê ava xwe duxwe, xatrê xwe lê dixaze, gêrî<sup>582</sup> dizvire tê. Tê, tê cem Cibrî. Cibrî dibê:

“Ya Ahme, tu hatî?”

[Ahmed] dibê:

“Erê.”

[Cibrî] dibê:

“Te ça kir? Çi bû?”

[Ahmed] dibê:

“Paşayê min, mi li filan melmeketî, filan bolgê<sup>583</sup> mi qîzek dît. Qîza Mîrê ‘Ereb e. Navê wê Têlî ‘Eyşan e. Tam layîqî te ye.”

[Ahmed] dibê:

“Ê de miherin<sup>584</sup> o zeman<sup>585</sup> dest bigrin.”

Dibê ew şev cima’eta xwe top dike Cibrî. Wezîrê xwe, wekîlê xwe, axalerê xwe top dike. Dibê çil roj, çil şevî rê da çûne. Dibê tèn digîjne wê zozana Têlî ‘Eyşan lê, ya Mîrê ‘Ereba.

Dibê rûdinên xwe ra xeber didin. Cima’et xeber didin. Cibrî jî dibînin. Dibê Têlî ‘Eyşanê digrin dine Cibrî. Têlî ‘Eyşanê digrin dine Cibrî. Tabî dibê dehvatê dikin, şû dikin bû dikin<sup>586</sup>. Heftêk bûye, çar roj bûye, tev dimînin.

Dibê cima’eta Cibrî dibêje Cibrî da, dibê:

“Paşa, îja, de îja warê me heye, malê me heye, halê me heye. Îşê me heye, gucê me heye<sup>587</sup>. Tu qe idî ranabî em herin?”

[Cibrî] dibê:

“Temam. Îro misade kin. Sibê ez ê îzna xwe xezûrê xwe bixazim. Em ê herin.”

---

581 ) Nezewicî.

582 ) Paş, paşde.

583 ) Dever, herêm.

584 ) ‘Miherin’ li Ebexê û li devdora Ebexê bûye qalibeke gotinê û li şûna ‘em herin’ê tê bikaranîn.

585 ) Wî çaxî, wî zemanî.

586 ) Yanî gelek tiştên dewatê dikin.

587 ) Yanî gelek karûbarên me heye.

Dibê wexta Cibrî îzna xwe ji xezûrê xwe dixaze, dibê xezûrê wî, Mîrê ‘Ereba dibêjê:

“Cibrî, ti qîza mi Têlî ‘Eyşan jî qîza şivanekî ye? Qîza gavanekî ye? Qîza feqîrekî ye? Qîza Mîrê ‘Ereb e. Tu, çil roj çil şevî rê da hafî. Tê çil roj çil şevî jî herî. Heta tu çil roj çil şevî jî werî, ez ê jî tevdirêkî qîza xwe ra bikim. Mesrefekî qîza xwe ra bikim. Were jina xwe hilde here.”

Dibê cima’et dibêje Cibrî:

“Rast e. ‘Edetê me ha ne. Urf ‘edetê me ha ne. Yê isa bibe. Em ê rûterût ça bûkê biherin?”

Dibê evna cake<sup>588</sup> dinê gêrî<sup>589</sup> dikevne rê diçin. Heta xwe dine memleketê xwe çil rojê wan temam dibe. Rojkî dimîne, rojtira din cake vedigerin. Heta çil şevî cake werin. Dibê tên, wexta nêzkaya êlê dikin, wê bolgê<sup>590</sup>, dibê Cibrî dibêje sîyara da, dibê:

“Hûn hêdî hedî werin. Ez ê pêşda bajom ha kêrta<sup>591</sup> hanê bisekinim, hinekî li êlê sêr bikim.”

Dibê Cibrî wexta pêşda dajo, hespê zengî dike, derdikeve kêrtê, kêrtê dinhêre, dêna xwe didê, êla çî halê çî! Ne êl e ne tişte e! Dibê hespê peya dibe. Desmala xwe dide ber çehvê xwe, desmala nîşanîyê Têlî ‘Eyşanê dayê, cêva xwe derdixe. Dibê dide ber çehvê xwe. Dibê hinek sîyar dibê:

“Welle, Cibrî abûna dikene.”

Hinek dibê:

“Digrî.”

Hinek dibê:

“Na.”

Dibê wexta xwe pê ra dighînin, dêna xwe dinê, Cibrî digrî. Dibê:

“Yahhh! Cibrî, ça bûye?”

[Cibrî] dibê:

“Mala we xirabîyo! Ne Têlî ‘Eyşan e, ne êl e, ne zozan e. Ti tişte pîyasê tine.”

[Cima’et] dibê:

“Ê yawo xwedê ji te razî, vegere were. Tu kurê Mîrê Serhedê yî. Tu paşayê Serhedê yî. Te ra tine ne qîz? Te ra tine ne jin?”

[Cibrî] dibê:

“Ew serî ye ew oxir e. Ez venagerim. Heta e Têlî ‘Eyşanê nebînim, e venagerim.”

Sîyara gêrî<sup>592</sup> vedigerîne. Dibê Cibrî, dibê jor da berjêr peya [dibe]. Hespa xwe jî dihêle. Dibê peya, hêdî hêdî jor da tê nava êlê. Cîyê çadira xwe lê qûrmişkirine<sup>593</sup>, cîyê dest girtine, cîyê serê pêz girtîye, cîyê Têlî ‘Eyşanê pez ku dotye... Dibê tê ser wan kevrê bêryê rûdinê. Hey digrî, hey dibêje,

588 ) Dîsa, careke din. Li Ebexê ev peyv bi vî awayî (cake) zêde tê bikaranîn.

589 ) Paş, paşda, şûnda.

590 ) Dever, der, herêm.

591 ) Kêrt, di çîyayan de ji bo cihên nizm ên ku rê tê ra derbas dibin re tê gotin.

592 ) Paş, paşda, şûnda.

593 ) Konvedan, konvegirtin.

hey uzulmîş<sup>594</sup> dibe.

Dibê kevrê bêryê diheje. Dibê destê xwe li kevrê bêryê dixê, iha wê da dixê, dêna xwe didê, bin da namek. Namê vedike, dêna xwe didê, Têlî ‘Eyşanê tê da nivîsiye:

“Cibrî, mala te xirabîyo! Bavê mi ez girtim dame Xîmê Binê Beryê. Ez girtim dame Dewrêş Begê. Tu eger mêr bî, paşa bî, kurê mêra bî tê werî mi biherî. Hema tu mol bî, tu nayê.”

Cibrî, dibê nama xwe hildide, dibê:

“Ew serî ye ew oxir e. Ez heta Têlî ‘Eyşanê nebînim, e nazvirim.”

Dibê dikeve rê. Ê paşa bûye, negerya bûye, peya neçûbûye. Dibê xam bûye. Dibê çil û çiya da diçe. Rê û dirb nizan bûne. Hema ku ketye pêşyê wir ra çûye.

Dibê diçe rastî zozanekî tê. Dêna xwe didê, pîrek derketeye avanîya<sup>595</sup>, em jê ra sergîn dibêjin. Avanîya top dike, pincarê top dike. Dibê Pîrê ça Cibrî dinhêre, dibê dixê hurmehurm jêr va xwe dighîne Cibrî, dibê:

“Heheyyy Cibrîyo!”

De navê wî nizabûye. Tabî navê wî Cibrî ye. Dibê:

“Heheyyy lolo kuro! Ez ‘esman digerîyam tu ‘erdê destê mi ketî.”

[Cibrî] dibê:

“Yahhh yahhh! Daka pîr ça bûye?”

Cibrî busulman bûye. Têjkê qureyşî bûye, busulman bûye. Pîrê jî kafir bûye. (Cibrî) dibê:

“Daka pîr, ça bûye?”

Dibê pîrê, [pîra] sêrê bûye. Dibê hahanka<sup>596</sup> Cibrî dibe malê. Jê ra, seva xam nebe, zanibûye xam bûye jî, dibê xambûna wî here, dibê hahanka şoravekî çêdike. Dibê Cibrî dixê nava şoravê çend sieta. Ondan sonra<sup>597</sup> derdixê, bi avê temîz dişo. Dibê yataxa wî datîne. Cibrî dikeve xewê. Dibê eva tîne jê ra bexekî<sup>598</sup> şerjê dike. Jê ra qelyê çêdike, sexmê çêdike.

Dibê Cibrî wexta ji xewê radibe, dibê sifra Cibrî dide pêşya Cibrî. Cibrî nanê xwe duxwe. Dibê Cibrî dibê:

“Daka pîr, idî dereng e.”

Westa wî jî çûbûye. Dibê:

“De cîyê mi dayne, e razêm.”

[Pîrê] dibê:

“Cî-mî tine. Hema cîyê te ev e.”

[Cibrî] dibê:

---

594 ) Kesirîn, keribîn.

595 ) Rêxa heywanan a li ber tavê jixweber hişbûyî ya li çol û mexelan ra tê gotin.

596 ) Zû bi zû, demildest.

597 ) Paşê, piştê.

598 ) Berx.

“Daka pîr, eva tişta nabe. Cîyê mi cîkî din dayne, ayrî<sup>599</sup> dayne.”

[Pîrê] dibê:

“Na. Ev serî ye ev oxir e. Yan tê serê xwe bi mi ra texî yek, tev mi razê, mi ra vê tişta hanê bikî, yan jî ez te bernadim.”

Cibrî dêna xwe didê, îmkan tine, xwe ji pîrê xilaz nake, dibê:

“De xwedê bela xwe bide te. Îja em musulman in. Ka misînekî mi ra bîne ez herme seravê.”

[Pîrê] dibê:

“Na, tê birevî.”

[Cibrî] dibê:

“Xwedê ji te razî, ez ê birevim herme ku? E destê te da nim. Bend bavêje navtenga min. Serê bend destê te da be. Navtenga min girêde. Tawiletê nîşanî mi xe, ez herim. Herme seravê.”

Dibê misîne avê tîne didê da. Bendekî davêje nava wî. Şirîtekî davêje nava wî. Dibê serê şirîte destê pîrê da, pîrê xwe ra odê da rûdinê. Dibê Cibrî derdikeve derê malê. De îja dibêje, dibê:

“Ez wexta dezmêj bişom, ez ê werim du rika’et mêm bikim. Em qureysî ne. Ondan sonra<sup>600</sup> em bikevne yataxa xwe.”

Dibê şirîte davêje navtenga wî. Serê şirîte destê pîrê da, pîrê hundir da rûdinê, dibê:

“A koşe bizvire, tawilet wê derê ye.”

Misîne avê dide dêst da. Cibrî wexta diçe tiwaletê, dibê Cibrî li kevira dixê, bi çi şeklî bike, dibê şirîte jê dike. Dibê misîn bi şirîte va girêdide, [dibê]:

“Ew serî ye ew oxir e. Qurbana te me.”

Dibê Cibrî dihêle, rê dikeve. Dibê pîrê beglemîş<sup>601</sup> dike, ha Cibrî were tine, ha were tine, ha were tine. Birê xwe ra bêjim, dibê pîrê hêrs dibe, dibê:

“Yawo, eva bû çi?”

Dibê wexta kaş dike, dibê dêna xwe dayê, bû xiriniya misîn, misîn hate hundur. Dibê:

“Heheyyy Cibrî! Min ê te bikira, te bi mi kir.”

Cibrîyê te diçe. Cibrîyê te qederekî diçe. Diçe rastî şivanekî tê. Tam hatye Xîmê Binê Beryê, idî. Yanî cîvara wê da bûye. Rastî şivanekî tê, dibêje şivan da, dibê:

“Selamu ‘elêkim.”

[Şivan dibêje]:

“ ‘Elêkume selam.”

Cem hev rûdinên. Bêna xwe distîne, dibê:

“Birayê şivan, tu nayê ez (û) tu em kincê xwe hev degiş<sup>602</sup> kin?”

---

599 ) Cuda, cihê.

600 ) Paşê, piştê.

601 ) Li bendê man, li bendê sekinîn.

602 ) Guherîn, guhartin.

Şivan li xwe dinhêre, kincê şivana, dibê:

“Eva axa ye. Kincê vî!”

[Şivan], dibê:

“Heyran, tu dîn î?”

[Cibrî] dibê:

“Yawo bira, welle e dîn nînim. Ez ji memleketê Serhedê hatime. Ez jî mîta<sup>603</sup> te rêjber im. Ez gava bibme rêjber ez kincê rêjbera xwe dikim. Ez gava ji rêjbertîya xwe jî derkevim ez kincê ha xwe ra xwe dikim. Hema eşqa mi te ra hatye. Hema ez [û] tu em ê kincê xwe hev degiş kin.”

Şivan jî kumê xwe davêje hewa, dibê:

“Yawo, ez [heta] van kinca va digirim ez ê bi van kinca va bigirim.”

[Şivan] dibêje:

“Temam.”

Kincê xwe hev degiş dikan. [Cibrî] dibê:

“Bira, tu gîskekî jî nadî mi da?”

[Şivan] dibê:

“Yawo, tu dîn î?”

Ser da, tabî wê arê da jî, yek zêr-du zêr jî derdixe nîşan dixê. Şivan çehv zêra jî dikeve, dibê:

“Temam. Ez ê gîskekî jî bime te.”

[Cibrî] dibê:

“Qardaşim<sup>604</sup>, gîskekî bide mi da. Eva jî pere gîskê te ra. Bê, gura xarye. Ez goştê wê jî naxwum. Sadece<sup>605</sup> hûrê wê bide mi.”

Dibê şivan çehv zêr jî dikeve, gîskê didê. [Cibrî] hûrê wê xwe ra hildide. Dibê dide ber tavê. Dikşîne qafê xwe. Xwe dide ber tavê. Dibê ber tavê diqele. Dikşîne qafê xwe. Dibê dibe keçelokekî.

[Cibrî] dibê:

“Bira, ez ê herme Xîmê Binê Beryê. Xîmê Binê Beryê kê derê ye?”

[Şivan] dibê:

“Hema tu vê kêrta<sup>606</sup> hanê da xar bî, idî Xîmê Binê Beryê ye.”

Baş e. Dibê Cibrî dikeve rê diçe. Nava gund siwal dike:

“Ez memleketê Serhedê hatime. Kê ra şivan lazim e, kê ra şivan lazim nîne? Feqîr im, xwe ra dibme şivan.”

Dibê, dibêjin:

“Hebe nebe Dewrêş Beg, şivan jê ra lazim e. Xweyî pez ew e, xweyî birr ew e. Şivanê wî çûye,

---

603 ) Mîna.

604 ) Birayê min.

605 ) Tenê.

606 ) Kêrt, di çîyayan de ji bo cihên nizm ên ku rê tê ra derbas dibin re tê gotin.



bêşivan maye.”

[Cibrî] dibê:

“Temam. Ez ê herme derê mala wî.”

Cibrî idî tam zanibûye [ku] hatye nuqtê. Namê da jî nivîsar bûye, tabî. Têlî ‘Eyşanê jê ra nivîsî bûye. Dibê birê xwe ra bêjim, wexta tê derê mala Dewrêş Begê, dibê Dewrêş Beg dibêje dibê:

“Şivanê çi, halê çi? Ez şivana hilnadim.”

Dibê carî dibêjne Têlî ‘Eyşanê da, dibên:

“Yek, melmeketê Serhedê hatye. Dewrêş Begê ra dibe şivan. Dewrêş Beg, şivantiya wî qebûl nake.”

Têlî ‘Eyşan, dibê behsa memleketê Serhedê dibe, Têlî ‘Eyşan dibê:

“Xwedê mal te xira ke.”

Dibê heta wî çaxî pê ra [Dewrêş Begê ra] xeber nedabûye. Jina wî bûye jî pê ra xeber nedabûye. Kurekî wê jî lê hebûye. Dibê navê wî lê kirye Cibrî. Dibê wî çaxî Têlî Eyşan Dewrêş Begê ra xeber dide. Mêrê xwe ra xeber dide, dibê:

“Mala te xira be. Tu qosqoceman<sup>607</sup> Dewrêş Beg î. Yek, memleketê Serhedê derkeve were Xîmê Binê Beryê, bê, ez ê bime şivanê Dewrêş Begê [hêj] tu qebûl nakî?”

[Dewrêş Beg] dibê:

“Temam.”

[Dewrêş Beg] dibê:

“Kurê mi, navê te çi ye?”

[Cibrî] dibê:

“Navê mi ‘Êlo.”

[Dewrêş Beg] dibê:

“ ‘Êloyê mi, heqê xwe bêje.”

[Cibrî] dibê:

“Sî bex<sup>608</sup>.”

[Dewrêş Beg] dibê:

“Zehf e.”

Têlî ‘Eyşan dibê:

“Mala te xirabiyo. Bidê, bidê.”

Neyse<sup>609</sup>, heqê wî bi sî bexî dibirrin. ‘Eloyê te dibe şivan. Têlî ‘Eyşanê jî dibîne, idî. Ê tabî xwe lê nade naskirinê. Têlî ‘Eyşan wî nas jî nake. Hatye nuqta xwe.

607 ) Di wateya mecazî da hatiye bikaranîn. Yanî zehf dewlemend û zehf bihêz.

608 ) Berx.

609 ) Werhasil.

Dibê mesela xelk pêz dibe çayîra, berdine yêrê<sup>610</sup> xaş. ‘Eloyê te pêz dibe şoba<sup>611</sup> rast dike, zeviya rast dike, toz-dûmanê rast dike. Rojek, dudu, sisê... Dibê şivanek rojekî dibêjê da, dibê:

“Mala te keto! Şivano, tu xaş şivan î. Xazîka pezê te Kanîreşanê biçêrya.”

[Cibrî] dibê:

“Kuro, Kanîreşan çî ye?”

[Ew şivana] dibê:

“Heylê mala te neketî. Temamî wê avê sar in, suh in, pêjek in, gulçêçek in. Tu xaş şivanî. Hema [heqê] pezê te li vira nebû, pezê te heqê wî li wira bû.”

Dibê wexta zemanê nîvro tê, werin şîr bidoşin, Têlî ‘Eyşan cariya hildide tê. Nîvro, bêryê pêz bidoşe, dêna xwe didê, pez berdaye orta<sup>612</sup> şobê, dibê:

“Kuro ‘Elo, tu ça pezê Dewrêş Begê berdidî nava şobê da.”

[Cibrî] dibê:

“Ez ê rabim devê bavê te [û] Dewrêş Begê ser hev nim. Ez ‘Elo bim, ez melmeketê Serhedê werim, pezê xelkê Kanîreşanê biçêre, pezê mi jî nava şobê gund da be? Çima we Kanîreşan nîşanî mi neda? Pezê mi jî here Kanîreşanê biçêre, avê sar buxwe, suh-pêjeka buxwe. Bibe vizeviza şîr gihanê pêz ra bavêje.”

Têlî ‘Eyşan şubhelemîş dibe<sup>613</sup>, dibê:

“Tu şivanî ber mi nesekinîye, mi ra nedaye xebera, Dewrêş Begê ra nedaye xebera.”

[Têlî ‘Eyşan] dibê:

“Temam. Bira pezê te jî sibê walî here. Temam?”

[Cibrî dibê]:

“Temam.”

Ewroj didişe. Hema sibêtirê pezê hildide, êvar da berê xwe dide Kanîreşanê diçe. Sibê wextê nîvro tê, Têlî ‘Eyşan carya hildide, dibê:

“Miherin<sup>614</sup> em ê pêz bidoşin.”

Tê, dêna xwe didê da, vizeviza şîr e. Pez hê nayê bêriyê vizeviza şîr e gihanê pêz ra davêje. Dibê mîheke kel hebûye. Cibrî serê mîhê girtibûye. Dibê valî-walî mîh xwe ba dike. Dibê serê mîhê li bişkoka îşlikê ‘Elo dikeve. Dibê qaşa nîşaniya gustîla [ku] hev degîşkiribûne, dibê davêje ‘elba şîr.

Cariya [ku] pêz didoşe, carî pê dihise. Carî pê dihise. Carî, çehv hema isa dikutê, şîr diçe ‘erdê. Wextekî Têlî ‘Eyşan dêna xwe didê, ser wan ra sekinîbûye, wextekî dêna xwe didê da, vizeviza şîr

---

610 ) Cî, cih, der, dever.

611 ) Şov. Zeviya ku bo toxim reşandinê hatiye cotkirin ra tê gotin.

612 ) Nav, naverast.

613 ) Dikeve şikê.

614 ) ‘Miherin’ li Ebexê û li devdora Ebexê bûye qalibeke gotinê û li şûna ‘em herin’ê tê bikaranîn.

e. Hema isa şîr ‘erdê ra dişqite. Li şîr dinhêre, li cariyê dinhêre, dêna xwe didê, [carî] ‘Elo dinhêre. Wexta li ‘Elo dinhêre, dêna xwe didê, Cibrî ye. Cibrî nas dike. Idî nas dike. Qaşta gustila xwe jî nas dike. Dibê ber cariyê disekine, Têlî ‘Eyşan sîlekî davêjê, dibê:

“Rabe. Porkurê, bistanê mi dikelin, niha Cibrî bi’ecî. Tu xwe bighînê heta mi dora pêz nîşanî ‘Elo da. Pez ça tê çêrandinê nîşanî şivîn da. Îja ez ê werim.”

Dibê carî şîrê xwe hildide tê. Têlî ‘Eyşan, dibê pêz radike. Bi ‘Elo ra, dibê pêz iha newalekî da xar dike. Dibê deyn<sup>615</sup> li ‘Elo dike, dibê:

“Eheyyy Cibrî, dême tu hatî!?”

Dibê hûrê li serê xwe dikşîne. Ew [û] Cibrî xwe ra dikevne kêf-heneka, laqirdîya. Sarilmîşî<sup>616</sup> hev dibin, ser hev da digrîn. [Cibrî dibê]:

“Mala te xira be. Tu ça hatî? Ça bû?”

De îja, baştan sona qadar<sup>617</sup> mi çi we ra gotye, Têlî ‘Eyşan hemûkî jê ra anlatmîş<sup>618</sup> dike, dibê:

“Yê ça be?”

[Cibrî] dibê:

“Ez ê te biherim.”

[Têlî ‘Eyşan] dibê:

“Tê ça mi biherî?”

Têlî ‘Eyşan dêna xwe didê da, Cibrî heyecanlı<sup>619</sup> ye, dibê:

“Cibrî, tu xwe ra ber pezê xwe be. Ez ê herme malê tevdîra xwe bikim. Seva em birevin, da.”

Têlî ‘Eyşan tê malê. Dêna xwe didê, dîya Têlî ‘Eyşanê jî hatye mala Têlî ‘Eyşanê mêvanî, serya bidê da. Xasiya wê jî wir e. Kurê wê jî digrî. Cibrîyê piçûk digrî. Dîya wê dibêjê da, dibê:

“Qîza mi, kurê xwe bimêjîne.”

Dibê wexta kurê xwe radike dide milê xwe, îja vir da kulamkî ye, dibê:

“Lorî lorî Cibrî lorî,

Lorî lorî berxê’m lorî,

Wez ê Cibrîyê mezin di xew rakim,

Wez ê Cibrîyê piçûk bi qurban kim,

Lorî lorî berxê lorî.”

Cîya wê dibêjê:

“Qîza mi, lawo, sal derbas bûn, zeman derbas bû. Memleketê Serhedê li ku? Eva Xîmê Binê Beryê ye. Te bîr nekîr? Kê çi zane ewa mir, ma? Kurê kê bû? Me naz nedikir ne êla wî ne ‘eşîra wî. Tu idî

615 ) Deng. Li Ebexê piranî bi vî awayî tê bikaranîn.

616 ) Hemêzkirin.

617 ) Ji sêrî hetanî binî.

618 ) Dibêje.

619 ) Bikelecan, biheyecan.

jina vê malê yî. Mala te heye, halê te heye, kurê te heye.”

[Têlî ‘Eyşan] dibê:

“Lorî lorî berxê lorî,

Lorî lorî Cibrî lorî,

Te xasîyê rewterewt e,

Te mehrûmê rewterewt e,

Wezê Cibrîyê mezin xwe ra hildim,

Wezê Cibrîyê piçûk bavêjme ser te,

Lorî lorî berxê lorî.”

Dibê cîya wê şubhelemîş<sup>620</sup> dibe, dibê:

“Qîza mi, Cibrîyê mezin kê ye? Yê piçûk kê ye? Tu kê ra dibêjî?”

[Têlî ‘Eyşan] dibê:

“Bêşka berxê’ m dara mehzî,

Bêşka lawo’ m dara mehzî,

Jê ra diçe baqek şûjin a bi derzî,

Lorî lorî berxê lorî,

Ez ê Cibrîyê mezin bi xew rakim,

Wezê Cibrîyê piçûk bi qurban kim,

Wezê Cibrîyê mezin xwe ra hildim,

Wezê Cibrîyê piçûk bime we da.”

Dibê dîya wê tam şubhelemîş<sup>621</sup> dibe, dibê:

“Porê te kurkirê, ev çî ye? Çi mesele ye?”

[Têlî ‘Eyşan] dibê:

“Inê<sup>622</sup>, ew ‘Eloyê bûye şivanê me, li Serhedê hatye, Cibrîye zavê te ye.”

[Dîya wê] dibê:

“Qîza mi, ça dibe?”

[Têlî ‘Eyşan] dibê:

“Welle, hal-mesele a iha.”

[Dîya wê] dibê:

“Lê îja ez porê te kur kim. De îja zû bike. De ka nîyeta we çî ye? Hûn ê ça bikin?”

[Têlî ‘Eyşan] dibê:

“Inê, em ê herin.”

---

620 ) Dikeve şikê.

621 ) Dikeve şikê.

622 ) Dayê. Bilêvkirinek e taybet e li Ebexê bo gazîkirin an jî bilêvkirina dayikan.

Dibê kurê xwe bî şekilde<sup>623</sup> radizîne. Xasiyê bî şekilde dixapîne. Tevdîra xwe dibîne, diçe. Ber bi Kanîreşanê diçe. Dibê wê derê pêzî wî zozanê dihêle. Cibrî hildide, serîyo tu bi qurbana linga bî. Dibê qederekî diçin. Diwestin. Cîkî rûdinên [ku] ser kanîkî, nanekî-avekî buxwin.

Dibê êvar hat, Têlî ‘Eyşan nehat. Dewrêş Beg tê, mêrê wê, dibê:

“Ka Têlî Eyşan?”

Dibên:

“Çûye Kanîreşanê teseliya şivîn ke,”

[Dewrêş Beg dibê]:

“Jin-hurmet çî îşê we heye çol-mexela?”

Hêrs dibe, tabî. Dibê hespê sîyar dibe dajo zozanê. Dêna xwe dayê pezê wî bêxweyî maye. Ne Têlî ‘Eyşan e ne Elo ye!? Vedigere tê. Rê da kê rastî wî were siwal dike, dibên:

“Welle, ‘Elo bi Têlî ‘Eyşanê iha va diçûn. Hema ‘Elo nebû yekî dinê bû pê ra. Gencek bûye.”

[Dewrêş Beg dibê]:

“Kîjan îstiqametê çûn?”

[Dibên]:

“Vê îstiqametê da çûn.”

Wê îstiqametê hespê xwe dajo diçe.

Dibê çaxê Têlî ‘Eyşan jî ser kaniyê rûdinên, destê xwe dişon, serçevê xwe dişon. Hinekî westa xwe datînin. Sifra xwe datînin. De îja çî xwe ra nan anîbe, nava mêzerê da datîne, duxwin. Dibê Cibrî xwe dirêj dike. Serê xwe dide ser çoka Têlî ‘Eyşanê, isa xew ra diçe.

Dibê Têlî ‘Eyşan wextekî serê xwe bilind dike, dêna xwe didê, rê da toz-dûmaneke ça tê, yalê<sup>624</sup> Xîmê Binê Beryê. Dibê:

“Wellehî, eva hebe nebe Dewrêş Beg e, hat. Yê mi jî bikuje Cibrî jî bikuje. E deyn<sup>625</sup> Cibrî kim.”

Dest naçê. Yanî qêmîş nake deyn lê ke. Xwe da dikele, digrî. Hêsiroke wê jor da dikeve ser sûretê Cibrî. Cibrî vediciniqe. Dêna xwe didê, Têlî ‘Eyşan digrî. [Cibrî] dibê:

“Yahhh! Têlî ‘Eyşan, tu poşman bûyî? Tu ji mi vazgêçmîş<sup>626</sup> bûyî? Destê te malê te, mêrê te, zara te nebû?”

[Têlî ‘Eyşan] dibê:

“Heheyyy, mala te xira bûyî! Çehvê mi ne mal e, ne milk e, ne li mêr e, ne zarê ye. Ez digrîm. Rê binhêre toz-dûman e. Iha eva Dewrêş Begê ye, hat. Dewrêş Begê were pirtikê gura mi [û] te va bernade. Yê te jî bikuje mi jî bikuje.”

[Cibrî] dibê: “Na. Bira were.”

623 ) Bi şeklekî, bi awayekî.

624 ) Alî, hêl.

625 ) Deng.

626 ) Poşmanbûn, jê gerîn, dev jê berdan.

[Têlî ‘Eyşan] dibê:

“Ça bira were?”

[Cibrî] dibê:

“Bira were. Du kalamê mi hene ez ê jê ra bêjim. Bi van her<sup>627</sup> kelama sekiniye, eva sekiniye. Nesekiniye em ê dest bine hev. Ya ewê mi bikuje ya ez ê ewî bikujim.”

Dibê radibe rûdinê. Radibe rûdinê, dêna xwe dayê, Dewrêş Begê bi hespê dajo ser wana, dibê:

“Heheyyy kuro kerreşivano, tu kerreşivanek î. Tu melmeketê Serhedê hatî Xîmê Binê Beryê, tu jina birevînî?”

Cibrî dibêjê:

“Jina min e.”

[Dewrêş Beg dibê]:

“Ça jina te ye?”

[Cibrî] dibê:

“Lawo, bisekine. Sozê mêrê bêrê şertê mi heye. Here mervê wî zemanî siwal ke. Helbet niha çar hev mane, du hev mane. Bê, filan tarîqê filan memleketî merivek hat? Navê ev bû? Kurê Mîrbega bû? Hat, qîza Mîrê Ereba nîşan kir nekir? Here siwal ke were. Berya anîna te da, berya dayîna te da, dane te, gotne te da tiştêkî iha heye, zaten jina min e. Gotne te, tine ye, xûna mi tejhî-tûlê te helal be, lawo. Were mi bikuje. Tu azad dikî, tu dikujî, ça jî dikî tu dizanî.”

Dibê tabî mêrê berê bûne. Dibê Dewrêş Beg hemen serê hespa duxwe, vedigere, dibê:

“Temam, tu vir ra bisene ez diçim.”

Dibê diçe wî melmeketî, wê bolgê<sup>628</sup> siwal dike. Tabî yê wî çaxî bihîstî, hazirbûlmûşbûne<sup>629</sup>, rîspîya siwal dike. Dibê dibêjnê da:

“Erê, rast e.”

Cibrî çi gotye jê ra ‘eynî isakîne<sup>630</sup>. Dibê tê, vedigere tê nêzkiya wana cake<sup>631</sup> vedigere tê nêzkiya wana. Dibê dûr va gazî Cibrî dike, dibê:

“Lawo, here. Helal be te ra. Jin, jina te ye. Jina xwe hilde bihere. Rast bûye. Jin ya te bûye. Mîrê ‘Ereba, Têlî ‘Eyşan bizore daye mi da.”

Dibê sê sêv hatin cînetê. Yek para mi dudu para cima’etê.

ÇÎROKBÊJ: BAQÎYÊ APÊ NADIR, HERÊM: JI GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

TEMEN: 46, PERWERDE: DIBISTANA SERETAYÎ,DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 25/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

627 ) Herdu.

628 ) Der, dever, herêm.

629 ) Hazirbûyî.

630 ) Wisa. Ev hokera bi vî awayî zêde tê bikaranîn li Ebexê.

631 ) Dîsa, careke din.

#### 4. ÇÎROKA CÎHANGÎRÊ DUNYADÎTÎ<sup>632</sup>

Keko, di kultura me kurda da gele çîrokê mezin hene. Çîrokê zehf giran in, kultureke kûr tê da ne. Çaxê ku bi dest tiştêkî jî dikin, di çîroka da me ji mezina iha bihîstîye, dibê:

“Carekî cara rehme li dêbavê hazira.”

Dibê çil kûsî çûne bin darekî, dar weldigerya, mişk mehr tev gerya. Eva xebera di serê çîroka da tê gotinê.

Dibê zemanekî di welatê Serhedê da sê hev genc hev dibînin, dibê:

“Em bêîş in, feqîr in, tiştêkî me tine. Em rabin herin, herin derkevne Berrîyê da. Di welatê me da hespê kihêl zehf pere dikin. Em ê xwe ra sê hev kihêl, yanî ‘ereb bînin bifroşin. Bekî<sup>633</sup> ji xwe ra pê dibne mal-avayî.”

Yanî anegorî zîhnîyeta xwe hersêk xwe ra soz dine hev. Karê xwe dikin. Radibin dikevne rê, berê xwe dine Berrîye. Yanî Berrî jî di kultura kurda da, cîyê ku berf lê neketye. Yanî sal danzde mehê xwedê reş bûye, jê ra Berrî gotine. Ew jî em dêna xwe dinê, anegorî vê gotina hanê, tişkî mîna ‘erdê Mezopotamyayê. Em bêjin, tê da ku berf neketye. Sal danzde mehê xwedê, pez dewarê wî çêryaye. Ji wê ra hatye gotinê.

Dibê evan xortana hev digrin, qedera deh roja rê diçin. Zehf diwestin, zehf ‘aciz dibin. Dibe nîvro, germa nîvro da, dibê:

“Welle cîkî hêşnayî, avek heb’ya em biçûna ser, me qotek nan bixara baş dibû.”

Dibê diçin, dêna xwe dinê, wê birrek bex<sup>634</sup> di bin darekî da mexel hatye. Kanîk jî bin darê derdikeve. Merivekî heftê pênc, heystê sal ber bexa ne, [dibê]:

“Selam ‘elêkim.”

[Kalê dibê]:

“ ‘Elêkime selam.”

[Kalê] dibê:

“Kurê mi, hûn ji kê derê tîn? Hûn kê ne?”

Ewî ber bexa ji wan xorta siwal dike. [Hersê xort] dibê:

“Welle apo, em hatine ji xwe ra îş-mîşekî bibînin, herne xevatekî. Em ji Serhedê tîn, xelkê Serhedê ne.”

[Kalê] dibê:

“Hûn ser çehva ra hatine.”

Vana dide rûniştandinê. Ser avê, evan hersê xortana destê xwe, serçehvê xwe dişon. Ê kalê dêna xwe didê, evan mervana rêke dûr hatine, westîyayî ne, birçî ne, dibê:

632 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatîye nivîsandin.

633 ) Belkî, dibe ku.

634 ) Berx.

“Kurê mi, ez zanim hûn zehf birçî ne, zehf westîyayî ne. Hûn vira ber bexê mi bin. A eva konê han, eva êla hanê êla min e. Ez ê herim ji wira we ra nan bînim.”

[Hersê xort] dibê:

“Baş e apo.”

Evan hersê xortana xwe ra rûdinên. Dêna xwe dine kalê, wezyyeta kalê, em bêjin hal wextê kalê. Heftê pênc, heştê sal ‘emrê wî, li ber bexa! Yanî anlamekî<sup>635</sup> nadnê da. Evna dibê:

“De em ê bisekinin, sebir bikin heta kalê hat.”

Dibê kalê diçe malê da. Ji van ra pezekî şerjê dike, davêje ser birinc. Sîtile goşt-birinc çêdike, dide destê xwe, tê. Hersê xort dêna xwe dinê, wê kalê hat. Nan-manekî em bêjin temîz<sup>636</sup> anî hat, goşt birinc çêkirye, da pêşya wana da. Ji te ra bêjim, nanê xwe têr xarin. Dibê:

“Apo, tu kê yî?”

[Kalê] dibê:

“Kurê mi, welle ez reîsê vê êla han im.”

[Hersê xort] dibê:

“Tu çima bexban<sup>637</sup>?”

[Kalê] dibê:

“Kurê mi, welle, qet ewê ji min siwal nekin. Yanî<sup>638</sup> ez ê tiştêkî ji we siwal kim, hûn ê rast caba mi bidin. Ji mi ra jî, navê min Cîhangîrê Dunyadîtî ye. Zehf tişt hatine serê mi, tercubê mi zêde ne. Ez dêna xwe dime wezyyeta we, hûn yê xevatê nînin. Hûn bona tiştêkî başqe hatine. Mi ra rast bêjin, ez ê jî ji derdê we ra bime derman.”

[Hersê xort] dibê:

“Welle apê Cîhangîr, em hatine ji bona bixevitin, ji xwe ra nanekî qazanc bikin. Cîkî îşkê bibînin, bibne şivan bibne gavan.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Kurê mi, welle isa nîne bira bi gotina we be. Yanî, ez evê qebûl nakim. Ez ê ji we ra rastkî bêjim. Gereka hûn jî xebera mi bikin. Hûn hersêk jî diz in, hûn hatine bona dizyê.”

[Hersê xort] dibê:

“Apê Cîhangîr, a bi vê sondê em bona dizyê nehatine. Gereka tu evê kelîmê nebêjî me. Te nanê xwe da me, ava xwe da me. Xwedê j’ te razî be. Em ê rabin herin.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Kurê mi, rûnên. Hûn sê xortne baş in, heyfa mi li we tê. Tercubê we tine ne. Her kes nikarê dizyê bike. Werin xebera xalê xwe bikin. Tiştêkî ku hatye serê mi ez ê ji we ra bêjim. Hûn diçin jî hûn

---

635 ) Wate, mane.

636 ) Baş, qenc.

637 ) Berxvan.

638 ) Lê, lê belê.



dizanin, naçin jî hûn dizanin.”

[Hersê xort] dibê:

“Apê Cîhangîr, de ji me ra bêje. Yaniz, em diz nîn in.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Baş e. Kurê mi, e zehf feqîr bûm. Ez teze zewicî bûm, zareke min hebû. Mala mi da nan-av diye<sup>639</sup> tiştek tine bû. Mi nikaribû îdara xwe bikira. Cînar-mînara, heçiyê mesela xêrxaz yardimî<sup>640</sup>-mardimî didane mi da, mi pê gêçima<sup>641</sup> xwe dikir. Rind guhê xwe bine mi. Dêna xwe binê, dizî çî ye. Îja hûn ê tiştekî fehm kin. Kurê mi, êvarê mi gote jina xwe da.”

Go, mi go:

“Jinik, eger çî di malê da hebe, mi ra karê mi bike. Ez ê sibê herim.”

Dibê [jinikê] gote mi:

“Cîhangîr, tê ku da herî?”

Mi go:

“Welle, ez ê serê xwe hildim herim. Ez ê yan tiştekî baş hildim werim yan jî idî ez nayê.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Mala mi da çî hebû jinikê anî da ser hev. Xarina min e sê-çar roja ku têra mi bike kire hevanekî<sup>642</sup>. Min avîte milê xwe. E şeveqa sibê-tarî rabûm. Mi go, bira kes mi nebîne. Ez ji gund derkevim herim. Kurê mi, ez ji gund derketim. Mi dêna xwe dayê, reperep pey mi tê. Ez sekinîm, mi dêna xwe dayê, du hevê cînarê me hatin.”

[Herdu cînarên gotin]:

“Selam ‘elêkim.”

[Mi go]:

“ ‘Elêkime selam. Kuro, we xêr e?”

[Herdu cînarên]go:

“Welle Cîhangîr, ser guhê me zû va ser te ye. Tê herî dizyê me jî bi xwe ra bihere.”

Mi go:

“Heyran welle, iha<sup>643</sup> nekin. Binhêre, ez merivekî feqîr im. Ez ê herim ji xwe ra anegorî xwe tiştekî yan bikim yan nakim. Hûn mi ra dibne heval. Eva çol e, tişte were serê we, em bêjin xweyî we hene, birê we hene, ez xwe j’ wana xilaz nakim.”

Dibê mi kir nekir pê nikaribû. Go, mi go:

“De kêfa we ye. Hûn tên [jî hûn dizanin, hûn nayên jî hûn dizanin].”

---

639 ) Bêjî ku, qey.

640 ) Alîkarî, harîkarî, yarmetî.

641 ) Debar, abor, îdare.

642 ) Tûrikekî piçûk e ku pêdawistiyên şivanan dixine nav û şivan wê davêjine pişta xwe.

643 ) Wiha.

Cîhangîrê Duniyadîfî ji wan hersê xorta ra dibêje:

“Em ketne ormanekî çûn. Çîya, banî, orman, em çar pênc roja rê da çûn. Xarin-marina me jî ret<sup>644</sup> bû. Em cîkî rûniştin, ‘esreke dereng e. Me dêna xwe dayê, wê çixira pêz ji newalekî ra derbas bûye çûye. Me go, welle gund-mund li van dera nêzîk in. Em ê ser çixira vî pezî herin. Belkî em hine nan-man xwe ra cîkî bîter dikin. Yan dizîkî dikin, vûrgûnekî<sup>645</sup> dikin, du peza şerjê dikin. Em çûn. Em di hundirê gêlî da rastî mixarekî hatin. Mixareke zehf mezin e. Me dêna xwe dayê, ew pez ji wê mixarê derketeye, çûye. Sergîne pêz, bişkulê pêz tê da nin. Me go, idî em ê xwe ra bikivne vira da. Bira pez were, şivan were, em ê şivan bigrin. Em ê evî pezî ji xwe ra hildin biherin. Têra me heye. Qurban, bû nêska<sup>646</sup> roava, me dêna xwe dayê, pêşya nêriya kişya ewê da, kişya mixarê. Em jî ketne qulçekî mixarê, me xwe tê da veşart. Me go, bira şivan were, şivan ku kete hundir da em hersêkê lê werne hev, bigrin. Çaxê ku paşya nêriya ret bû, nêrîn e her nêrîkî nûtanî<sup>647</sup> xezalekî, gakovîkî! Dikevne hundir ziravê mêriv jê diqete! Me dêna xwe dayê, merivek kete hundir. Îşê qababûnê<sup>648</sup>, îşê dest-pîya nîne! Benzemîşê<sup>649</sup> dêwekî dibe. Çehvekî wî heye, yek tine. Çaxê ku paşya pêz ret bû, kevirêkî mezin ber derê mixarê bû, ewî xwe gîhandê, kevir jor da tilol kir, da ber derê mixarê. Xwe jî kete hundir. Xwe ra hatye, piştîk jî dar anî hatye, weke lodekî di hundir da avîte ser hev. Rûnişt, agrê xwe vexist. Haj j’ me tine. Hevalê mi qilqilî, nêrî tirsîyan, li hev sîyar bûn. Me dêna xwe dayê, rabû, iha li devdorê xwe li mixarê nihêrî, hevalekî mi dît. Hevalekî i dît. Me dêna xwe dayê, darê êgir avîtne ser hev. Şîşek anî hat, avîte nava agir da.”

[Dêw] go:

“We eva dera bêxweyî ditye. Hûn hatine ketne vira da, hûn ê dizya mi bikin?”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Em hersêk pistepista me ye. Em hev dişewirin. Em pê nikarin. Em sê hev in, ewî cesaretî xwe da nabînin ku berî binê da. Qedera deh deqa, panzde deqa derbas bû. Rabû, berê xwe da me. Her yek me xwe da qulçekî mixarê. Valî em revîn, walî revîn. Parra da pey me, hevalekî me girt.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Gêlî xortano, rind guhê bine mi. Dêna xwe binê ka çî hatye serê Cîhangîr. Anegorî wî j’ xwe ra fehmeke jê hildin. Hevalekî mi girt, hema histîyê wî ş’kêmand, piştî wî ş’kêmand. Ew şîşa sorkir ye nava êgir da anî hat, li parxanekî xist aliyê din ra derxist, wusa da ser êgir. Me dêna xwe dayê, ev meriva merivxur e. De berê meriv xarine. Ê em sekinîn, me li çehvê wî nihêrî. Em ketne qulçekî da.”

---

644 ) Xilas, kuta.

645 ) Talan, êriş.

646 ) Nêzîk.

647 ) Mîna, nola.

648 ) Bêteşe, gir.

649 ) Şibandîn.

[Dêw] go:

“Niha sirya<sup>650</sup> we yê jî were.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Qurban, ew hevalê me di wî agrî da sor kir, hevalê me, goştê wî xar. Goştê wî xar. Hevalê me, parçe-marçê wî yî mayî avîte derê malê. Zangekî<sup>651</sup> isa daye ber dêrî, em taqet nakin, em nikarin zangê hildin. Heta sibê xew çehvê me neket. Rabû, zang da alîkî, xwe da ber dêrî. Nêrî teker teker<sup>652</sup> derxistin. Em herdik mane hundirê ewê da, hundirê mixarê da.”

Mi gote hevalê xwe da, mi go:

“Lawo, tey, mi kir nekir we xebera mi nekir. A binhêre dizî iha tîne serê meriva. Em hatine ketine çî dehfikêkî da. Ka em ê çî ji vê dehfikê xilaz bin?”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Mervê mi nêrî birin. Cake<sup>653</sup> kevir da ber derê mixarê. Ez (û) hevalê xwe nutanî<sup>654</sup> pişikê hatin, kevir da ûxraşmîş<sup>655</sup> dibin. Em dikin nakin quweta me nagîje kêvir. Etrafê kêvir cîkî ku were kolanê tine. Hemû zang-zahor bûn. Kevir kutaye ber, çûye. Em man. Ez (û) hevalê xwe, xwe ra ser hev da digrîn.”

Dibêjin:

“Ka em ê çî b’kin? Em ê çî xilaz bin? Çolix çocixê<sup>656</sup> me ma, mala me ma. Me çî mala xwe xirav kir, em ketne vî îşî.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Idî em derdê xwe hev ra dibêjin. Bû êvar. Cake dinê, werhasil nêrî zivirîn. Nêrî hatin. Idî bû çirpîniya dilê me. Bû çirpîniya dilê me. Paşya nêriya ret<sup>657</sup> bû. Mervê me kete hundir. Kevir kişande ber derê mixarê. Cake dinê piştî dar bi xwe ra anî hatye. Agrê xwe vêxist, şîş avîte nav. Hevalê mi li mi dinhêre, ez hevalê xwe dinhêrim. ‘Eceba dora me kê ye? Xwedê, qedera si’etekî ma-nema, rabû. Parra da pey me, em li mixarê birin anîn. Mixare gêniş<sup>658</sup> e. Em valî birin anîn. Walî anîn hatin. Em dikevne nava nêriya, ser nêriya da dikevin. Werhasilî kelam, hevalê mi girt. Hevalê mi girt. Ew jî bir. ‘Eynî aqûbeta yê ‘ewilî hate serê wî hevalî. Ew jî xar. Ew jî bi hesabê xwe xar. Şîş girt avîte vira da, raza. E duşmîş<sup>659</sup> bûm.”

Mi go:

- 
- 650 ) Dor.  
651 ) Kevirên qerese û girr.  
652 ) Yek bir yek, yeko yeko.  
653 ) Dîsa, careke din.  
654 ) Mîna, nola.  
655 ) Pêmijûlbûn.  
656 ) Zar û zêç, jin û zar.  
657 ) Xilasbûn, kutabûn.  
658 ) Fireh, berfireh.  
659 ) Fikirin.

“E Cîhangîr im. Eva, çehvekî wî tenê heye. Bi xwedê, ez ê evê şîşê di çehvê vî da tercube kim. Tawekel bi xwedê, heke mi tişte anî hate sêrî, anî. Neanî jî jixwe yê mi buxwe. Qederek derbas bû. Xwe ser piştê avîtye, razaye. Ew şîşa ku li hevalê mi xistiye, tê da kirye, pê sor kirye, kirye kebab, xarye, mi ew şîş hilda. Ez hêdî hêdî yaqlaşmîş<sup>660</sup> bûm. Ser piştê razaye. Çehvekî wî kor e, yek saxlem e. Ewa çehvê wî yî saxlem, mi şîş da ser. Heta j’ quweta mi hat mi xwe jor da avîte ser. Şîş di çehvê wî da, qafê wî da rûnişt. Qêrînî jê çû. Şîş ji serê xwe, çehvê xwe serê xwe kişand. Rabû. Ê çehv tine, tişte tine. Valî walî dora mi çû hat. Kete nava nêriya, valî-walî ser nêriya da dikeve. Mi jê da xebera.”

Mi go:

“Mi çehvê te yî kor iha kiro. Welle, idî tu bi mi nikarî.”

[Cîhangîrê Dunyadîfî] go:

“Tûfetûfa wî ye, halê xwe tine. Xûn ser çehva da tê. Min (û) ewî ber hev da heta danê sibê. Danê sibê, hindik sibe maye. E duşmîş<sup>661</sup> bûm.”

Mi go:

“E ça j’ vî kafîrî xilaz bim?”

[Cîhangîrê Dunyadîfî] go:

“Nêrîkî wî yî kever heye. Dayîm pêşya nêriya diçe tê. Yanî nêrî kifş e. Mi di qulcekî mixarê da nêrî tek kir. Mi danî ‘erdê şerjê kir. Mi danî ‘erdê şerjê kir. Ewa idî ketye hay çehvê xwe, birîna xwe. Nêrî post kir. Mi anî hat postê nêrî li xwe kir. Mi serî nêrî ser serê xwe temîz-rind girêda.”

Mi go:

“Xwedê, heke ez iha j’ vî xilaz bim.”

[Cîhangîrê Dunyadîfî] go:

“Bû sibe. Kevir ji ber dêrî hilda. Idî nêriya tek tek bi dest dike, derbas dike. Ez rind dizanim yê ewê vala ke, mixare, nêriya jê vala ke. Vegere, em ê hev biherin bînin, da. ‘Ewilî ez derbas bûm. E çûm ber sekinîm. Yehhh yehhh yehhh, gazî nêrî dike. Ez teqîb dikim kê gavê ku pêz derdixe, gazî wî nêrî dike. Welle ez çûm, destê xwe da ser piştê mi. E jê derbas bûm. Mi post avît, serî avît. Nêriya tek tek dest dike, derbas dike. Mi jê da xebera.”

Mi go:

“Mi çehvê te yî kor iha<sup>662</sup> kiro. Welle, ez derbas bûm. Nêriyê kever ez im.”

[Cîhangîrê Dunyadîfî] go:

“Ku mi isa go qêrînî jê çû, parra da pey mi. Idî bi dengê mi tê. Çehv tine. E duşmîş bûm taşmîş bûm<sup>663</sup>.”

---

660 ) Nêzîkbûn.

661 ) Fikirîn.

662 ) Wiha.

663 ) Kûrekûr fikirîn.

Mi go:

“Welle, ez ê tişteki bînime serî vî.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Mi hey gazî kir, ber bi mi hat. Ez jî çehvê xwe ji zang-zahora<sup>664</sup> digerrînim ku ewî biherme ser zangekî-zahorekî, tê da bikeve. Wersahil, mi bire ser zangeke mezin. Zang bilind e, yanî birek e. Temam zang in, zahor in, kevir e. Ez peyayî jêrê bûm alîkî va. Ez dizivirim.”

Mi go:

“Ez wir im. Were ka tê çî b’kî?”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Hema isa ber bi min hat. Nişkêva bi zangê da tilol bû, jor da hate xarê. Li zang-zahora ket, paremparçeyî bû, çû. Mi pesnek da xwe.”

Mi go:

“E Cîhangîrê Dunyadîtî me.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Ez zivirîme dora nêriya. Sed-pêncî nêrî mi top kir, da pêşya xwe, ez hatim. E şa dibim, têm. Ez hatme, hatme nava gundê xwe. Sed-pêncî nêrî notanî<sup>665</sup> ga li pêşya min e.”

Xweyê wan herd<sup>666</sup> hevalê mi hatne pêşya, [gotin]:

“Ka filankes, bêvankes?”

Mi go:

“Welle, hal-mesele iha.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Ez avîtme nava hev. Cînarê mi, beki<sup>667</sup> deh heva li mi da. Hinek ketne navbeyna me, hinek bûne navçîtî, hinek bûne sulhdar. Gund da em hevraz kirin, berjêr kirin. Sed nêrî j’ mi standin. Her maleke wana pêncî pêncî danê, pêncî jî ma ji mi ra. Qurban, eva hate serê mi, e çûme dizye. Hûn çî dibêjin? Werin xebera mi bikin, neçin.”

[Hersê xortan] go:

“Welle, apê Cîhangîr, tu merivekî jêhatî. Heqeten jî te dunya dîtye, te dunya derbas kirye, lê yaniz<sup>668</sup> em diz nînin. Em hatine bixevitin.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Kurê mi, welle ez zanim hûn diz in, lawo. ‘Emrê mi vî îşî da derbas bûye. Werin xebera mi bikin.’”

---

664 ) Kevîrên qerase.

665 ) Mîna, nola.

666 ) Herdu.

667 ) Belkî, dibe ku.

668 ) Lê, lê belê.

[Hersê xort gotin]:

“Apo, me ra misade bike.”

Hersêk xort radibine ser xwe ku herin, [Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“De werne vira, werne vira. Hema qedera nîv si’etî jî cem mi rûnên. Serpêhatîke min e din jî heye. Ez ewê jî ji we ra bêjim. Îja hûn diçin hûn dizanin.”

[Hersê xort] dibê:

“Bêje apo.”

Cake<sup>669</sup> dinê rûdinên, dibê:

“Rêya me dûr e. Xêra xwe hinekî kurt bibirre. Em beki<sup>670</sup> diçin.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Kurê mi, ez hatme mala xwe. Mi sed-pêncî nêrî anîn. Mi sed da xûna du merva, pêncî jî ji mi ra ma. Mi qederekî pê îdare kir. Hinek firotin. Tedbîr-medbîra mala xwe dît. Hinekî din ez pê halxaş bûm. Ez pê halxaş bûm. Kurmê dizyê hate mi, qilqilî.”

Mi gotê jinikê:

“Tedbîra mi bike ez ê herim.”

Dibê jinik hat, go:

“Cîhangîr, xwedê j’ te razî be. Kes birçîna nemirye. Te çûye îyî-kotî<sup>671</sup> tişteke anî hatye, pê îdara me dibe. Ji xwe ra pê cotekî-cobarekî bike, tişteke bike, neçe.”

Mi go:

“Welle jinik, xwedê ez ê herim.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Mi kir jinikê kir.”

Werhasil, mi go:

“Jinik, tê tedbîra bibînî. E sibê zû rê dikevîm.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Jinikê j’ mi ra hine nan-man, penêr-menêr, mirtoxe çêkir. Eger çî çêkir, mi ra kire hevaneke<sup>672</sup> da. Ez sibê zû şeveqa tarî rabûm ji gund derketim. Mi dêna xwe dayê, dîsa dengê lîngan li pey mi tê. E sekinîm, duşmîş<sup>673</sup> bûm.”

Mi go:

“Welle xwedê, evana dîsa min hisyane.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

---

669 ) Careke din, dîsa.

670 ) Belkî, dibe ku.

671 ) Kêm zêde.

672 ) Tûrikê ku şivan davêjine piştî xwe û tê da xwarin û vexwarina wan heye.

673 ) Fikirîn.

“E sekinîm. Mi dêna xwe dayê, du hev gencê cînarê min.”

[Herdu gencan gotin]:

“Welle Cîhangîr, em sê-çar roj e ser-guhê li ser te ye. Me tu teqîb dikî. Me dêna xwe dayê, tê herî diziyê. Me gotye, em ê jî Cîhangîr ra herin.”

Mi go:

“Kuro, erê, ez ê herme diziyê. Hûn kurê merivan in. Kuro, du hev mi ra hatin. We dît, herd<sup>674</sup> jî hatne kuştinê. Kuro, ez xilaz bûme îyî kotî<sup>675</sup>. Xwedê ‘ecelê mi neaniye. Hûn genc in, gune ne. Vegerin lêxin herne mala xwe.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Mi kir nekir, da w neda, xwe jê xilaz nekir.”

Mi go:

“De gor bavê we, hûn tên hûn dizanin.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî ji wan hersê xortan ra dibêje]:

“Gelî genca, vira rind guhê bine min. Xwedê, dizî tişteki nebaş e. Lawo, gunê mi we tê. Hûn genc in. Werin ez ê her yekî we gaki jî bime we. Her yekî we gaki rind bime we ku welatê we pere bike. Werin ji vê sewdayê vazgêçmîş<sup>676</sup> bin. A eva êla hanê ya min e. Deh danzde kurê min hene. Êl hêmu bin emrê mi da ne. Nêzkiya<sup>677</sup> pêncsid<sup>678</sup>, şesid<sup>679</sup> mîhê min heye, devê min hene. Nizam çi mi hene.”

Cîhangîr dide rêzê [ku] wana îqna bike. Dêna xwe didê, na, îqna nabin.

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Hevalê mi îqna nebûn notanî<sup>680</sup> we. Parra dane pey min, hatin. Em çûn. Yanî em deh-panzde roja, yanî semtê xalî da ku yêrleşim<sup>681</sup> tê da tine ne, tişte tê da tine, em deh-panzde roja çûn. Em j’ hal ketin. Em ketne rastekî da, ne av e, ne çem e, ne gund e, ne xarin e. Em sê çar roja tê da çûne. Em j’ hal ketine. Lêvê me çiçiqî bûne j’ tîbûna. Di qûntara çîyakî da hêşnayîk me va hate kifşê.”

Me go:

“Welle, eva av e. Şukur eva çîya ye. Em ê xwe bavêjne çîyê da. Em ê herin lê sitar bin.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Me lezand em çûn, çûn. Me dêna xwe dayê, dareke çînarê ye di qûntara çîyakî da. Di qûntara çîyê da aveke muthîş derdikeve.”

Me go:

- 
- 674 ) Herdu.  
675 ) Qenc xirab.  
676 ) Devjêberdan, destjêkêşan, jêgerîn, terkkirin.  
677 ) Nêzîk.  
678 ) Pêncsed.  
679 ) Şesşed.  
680 ) Mîna.  
681 ) Cîhûwar

“Welle, idî j’ vira rindtir cî tine.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Me xwe gîhandê, serçehvê xwe şûşt, ava xwe têr xar<sup>682</sup>. Aqlê me hate serê me.”

Mi gote hevalê xwe:

“Kuro, ka bînin nanê me çi hebe nan daynîn, nanekî jî buxwin. Îja derkevin herin.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Qurban, sibe zû ye. Me nanê xwe xar. Em ser avê sekinî ne. Wextekî me dêna xwe dayê, sîyarekî notanî<sup>683</sup> erzaîlê kulê li hespekî hêşînboz sîyar e, boncîk-tehjîk rex ketye. Ajote ser me, da xebera.”

[Sîyar go]:

“Hûn nizanin eva dera mintîqa min e? We qe navdengê mi nebîstîye? Hûn li vira çi digerin?”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Şûrê xwe tehzî kirye, ajote ser me. Em rabûne ser pîya. Ne sîlah e dest me da ne tiştêk e. Em ê çi pê bikin? Sîyar dinhêrin notanî erzaîlekî kulê, şûr dêst da ne.”

[Sîyar go]:

“Kuro, xwe dirêj kin!”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Me xwe dirêj kir. Peya bû. Destê me pişt me va temîz, mihkem girêda.”

[Sîyar] go:

“Kuro, rabne ser xwe!”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Em rabûn. Terkîya xwe da bêrek avîte cem me, tevrek avîte cem me. Em qedera pêncî mêtreyî dûrî kaniyê xistin.”

[Sîyar] gote me:

“ ‘Erdê bikolin, yek vira, yek dera han, yek dera han.’”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Di rêzê da me ra tehrîf kir. Me sê korê xwe kolan. Ez hevalê xwe dinhêrim, hevalê mi mi dinhêre.”

Quweteke me ya bi hecî da here notanî<sup>684</sup> dêw tine. Hecî sîlahî<sup>685</sup>, qeme li ber, şûr dêst da, notanî erzaîlê kulê ser me ra sekinîye. Çehlê me me da kolanê.

[Sîyar] go: “Bikevne çehla!”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

---

682 ) Bo wexwarina her cure tiştên şilemenî peyva ‘xwarinê’ tê bikaranîn li Ebexê û li derdorê Ebexê.

683 ) Mîna.

684 ) Mîna.

685 ) Bisîleh, biçek.



“Em ketne çehla da. Hevalekî me pêşyê xistê, em du hev man.”

[Sîyar] go:

“Dora vî temîz<sup>686</sup> tijî kin, pêpes kin heta ber qirikê!”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Em hersêk notanî sê hev qazix di ‘erdê da çikandin. Dora me temîz bi xulîyê basmîş<sup>687</sup> kir. Sîrf<sup>688</sup> serê me maye.”

Ez lavaya dikim:

“Hecî, bide xatirê xwedê, em misilman in. Eva îşê însanetîyê nîne. Me çi j’ te kirye? Me talanê te nebiryê. Em rêwî ne, hatine çûne.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Ji me ra da xebera. Qamçîk dêst da ne. Her qamçîkî davêje serê me kezeva me dax dibe. Hespê xwe sîyar bû. Boncîk ma li wira, tehjî pê ra çû. Em şa bûn.”

Me go:

“De, rêwî-rêdarek elbet yê rastî me were. Em nekuştine.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Boncîya reş ma li wira, notanî<sup>689</sup> nobeçîkî valî walî dora me diçe tê. Germa nîvro ye. Hat ber serê hevalekî mi, ber sîha serê wî da ket. Em çi fehm dikin ku boncîkê me bikuje. Qedera nîv si’etî ber serê hevalê mi da, ber sîha serê wî da raza. Rabû, dora devê xwe alast. Çû, qedera du mêtra dûrî hevalê mi ket. Zivirî berê xwe dayê, pê ket ‘erd kola.”

Min go:

“Baş e. Welle, eva wê ‘erdê dikole. Yê ça bike? Yê devdorê me sist ke, tiştêkî bike.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Boncîka me di ‘erdê da inda<sup>690</sup> bû. Qedera<sup>691</sup> deh-panzde deqa derbas bû derbas nebû, me dêna xwe dayê, qêrînî ji hevalê me çû. Bi qêrînîyê ra serê wî li wî da berjêr bû. Me dêna xwe dayê, boncîka reş derket. Dil-hinavê hevalê me devê boncîka reş da! Piçekî ji me dûr ket. Dil-hinavê hevalê me xar. Hevalê mi dizvire li mi dinhêrê ez li wî dinhêrim. Em digrîn, em dikenin!”

Min go:

“Kuro, hele cara dinê ez ketme destê dêw, xilaz bûm. Kuro, ka ez ê ça j’ vê bêxweyê xilaz bim.”

Dibê hevalê mi digrî:

“Cîhangîr, teyî, tiştêkî ça hate serê me!”

---

686 ) Baş, qenc.

687 ) Pêpeskirin, tepisandin.

688 ) Tenê.

689 ) Mîna.

690 ) Winda.

691 ) Weqasî.

Mi go:

“Mi jê ra da xebera, pirs gotin. Mi negote we mi ra neyên?”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Qurban, boncika reş bû erzaîlê me. Ez [û] hevalê xwe em ketine [bendewariyê] ka nîha pêşî dora min e yan dora hevalê min e. Boncika reş xwe ra ketye xewê. Hatye ber serê hevalê mi ketye. ‘Esir e, ‘esir tamam bû. Mi dêna xwe dayê, boncika mi rabû. Tevzîk da xwe. Dûrî hevalê mi ket. Pêşyê serçehvê hevalê mi alast, pozê wî, devê wî alast. Hinekî pê şa bû. Çû pêşyê sekinî, dest pê kir ‘erd kola. Hevalê mi girya.”

Mi go:

“Lawo, welle heke tişte me tê. Weysête te hebin weysête xwe mi ra bêje. Başqe ez ê çî bêjim. Tişte destê mi hat? Destê mi jî notanî<sup>692</sup> yê te girtîye.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Hevalê mi dest pê kir girya.”

[Hevalê min] go:

“Welle evê mi bikuje.”

Mi go:

“Lawo, welle yê te bikuje.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Sê-çar deqe kete ortê nekete ortê, mi dêna xwe dayê, qêrîn ji wî hevalê mi jî çû. Diçe dikeve pêsîra, zikê wî diqelêşe, dil-hinavî wî hildide, derdikeve. Ew jî xar. Xar, dora devê xwe alast. Hat li ber serê mi ket. Ez hey lê dinhêrim.”

[Ez dibêjim]:

“Hey boncika reş, ka peki<sup>693</sup> ez li kê derê tu li kê derê? Mêranîya mi li kê derê? Mi ra Cîhangîrê Duniyadîtî dibêjin. Kurê xweyê te mirê, ez jî bûme hêsîrê te, hêsîrê hecî. Ez duşmîş bûm taşmîş<sup>694</sup> bûm.”

Mi go:

“Ka, ez ê çî b’kim? Ya rebî, tu rêkî nîşanî mi kî.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Ez ber mirinê me, sixintîyê<sup>695</sup> da nim. Ka ez çî b’kim boncika reş? Ez xwe diqilqilînim. Destê me kiryê xulîyê, pêpes kiryê. Notanî<sup>696</sup> betonê dora me şidandîye. Mi dêna xwe dayê, destê me

---

692 ) Mîna.

693 ) Baş e.

694 ) Hûr û kûr fikirîn.

695 ) Tengasî.

696 ) Mîna.

naxevite, naheje. Nêska<sup>697</sup> roava ye, mi dêna xwe dayê, boncika mi rabû, tevzîk da xwe. Ez idî rind duşmîş<sup>698</sup> bûm.”

Mi go:

“Wellahî, ez bi cîkê wê negrim, yê were serçehvê mi bialêse, ez bi cîkê wê negrim, evê mi bikuje.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Çaxê ku hat serçehvê min alast, min isa eyer kir, çaxê ku devê xwe anî hat serçehvê mi bialêse, mi devê xwe vekir, mi bi pozê wê girt bi devê xwe. Mi bi pozê wê girt. Bû qarênîya wê, bû wahrênîya wê, ‘ewtîya, çi kir, dêna xwe dayê, ez bernadim, da. Mi girtîye idî. Ewê jî wehca<sup>699</sup> hema isa pencik avîtne pêsrê mi, devdorê min. Ew xulîya ku ez tê da bûm, hema isa lêxist kola kola, milekî mi derket. Milekî mi derket.”

[Min go]:

“Weyyy, mi dîya xweyê te gê. Te bidî çehvê mi herd<sup>700</sup> hevalê mi kuştin.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Mi pozê wê girtîye ‘işke’işk<sup>701</sup>. Dev-mevê mi hemû di xûna wê da maye. Mi bi lingekê wê girt. Ez derketim. Hema isa pêsrê mi kola kola ji wehca. Mi girtîye. Ew jî tiştêkî başqe bike tine xêncî penca. Mi bi herdu lingê wê yî paşyê girtin. E çûm ber kevirêkî sekinîm. Hema isa mi li kêvir da, li kêvir daaa, paremparçeyî kir. Herd çîpê wê mane destê mi da.”

Mi go:

“Eva heyfa herdu hevalê mi bira pêşyê vebe.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Kurê min, a hûn dêna xwe dinê, a xwedê ez xilas kirim. Boncîkî du hev hevalê mi kuştin. Aha sona<sup>702</sup> dizyê ev e. Xebera mi bikin. Mesela mi hê ret<sup>703</sup> nebûye, ez ê bêjim. Feqet xebera mi bikin, vegerin.”

[Hersê xortan] go:

“Apo, de bêje. Meseleya te çî ye ret bike. Rêya me dûr e. Em ê herin. Em diz nîn in.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Kurê mi, mi çû dest serçehvê xwe şuşt, devê xwe şuşt. Ro idî devî devî ava ne. Mi dêna xwe dayê, hecî nehat erzayîlek hat! Tehjîyê wî li rex e. Ê wext dizane (ku) boncîkê çi çaxî me bikuje, çi çaxî îşê wê ret be. Hatye çika boncîkê em kuştine, nekuştine? E çehv bi hecî ketim, mi dêna xwe dayê, şûr dêst da dibiriqe. Ajote ser mi. Cîkî ez pê da herim tine. Hema ez wê dara çînarê va hilpas

697 ) Nêzîk, nêz.

698 ) Fikirîn.

699 ) Kerb.

700 ) Herdu.

701 ) Hişkehişk.

702 ) Dawî, axirî.

703 ) Kuta, xilas.

bûm. Ez darê va hilpas bûm, min xwe da jorê.”

Mi go:

“Wellehî, ez ancax iha j’ vî xilaz bim.”

[Hecî] gote mi:

“Te boncika reş kuştîye. Tu a iha dîya mi, jina mi kî xilazbûna te tine.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Ê destê wî nagîje min. Min dêna xwe dayê, qeme di ber da ne, şûr kire kalanê wî. Ew jî bi darê va hilpas bû. Mi jî jorê karê xwe kir. Kêreke zehf rind mi ra ne. Darekî zehf zexm ji darê çiqileke wê qetand. Mi da destê xwe.”

Mi go:

“Xwedê, ez idî jorê me. Ez wî nexim, ez wî nikarim.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Qurban, hecî bi darê va hilkişîya. Hat, hat, hat, nêskayê<sup>704</sup> mi kir. Hey mi ra dide xebera. Ji te ra bêjim, gefa li mi duxwe. Mi darekî zexm çiniye. Mi ça dar danî tepê<sup>705</sup> hecî, jor da çû. Bi ketinê ra ew qema ber da hema isa li zikê wî ket piştê va avît. E jor da peya bûme ser serê hecî. Idî bi wî darî mi dayê, dayê. Qafê hecî temîz pelaxt.”

Mi go:

“Wellehî, eva merivekî zulumkar e. Eva ji kê derê hatibe wira zulm heye. Ji mala wî bigre cînarî wî ti kesekî ku ji vî mervî memnûn be tune.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Qurban, e Cîhangîr im. Ez duşmîş bûm taşmîş<sup>706</sup> bûm.”

Mi go:

“Evî herd hevalê mi kuştin. Eva olaya<sup>707</sup> hanê hate serê min.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Hespê hêşinboz li wira sekinîye. Welle, mi xwe gîhandê. Mi şaşka hecî li sêrî hilda. Mi kincê hecî jê kirin. Mi lingê hecî girt kaş kir, avîte newalekî da.”

Mi go:

“Bira ser kanîyê kes nebîne.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“ ‘Eynî kincê wî, tertîba wî, mi kinc xwe kirin. Şaşka wî da serê xwe. Ez hespê sîyar bûm, mi şûrê wî ber xwe ra kir. Mi serê hespê îstîqameta jê hatye, mi vegerande walî.”

---

704 ) Nêzîk, nêz.

705 ) Ser.

706 ) Hûr û kûr fikirîn.

707 ) Rûdan, bûyer.

Mi go:

“Welle, hespê mi bihere. Ewa j’ ku hatibe hespê bihere wira.”

[Cîhangîrê Duniyadît] go:

“Qurban, tarî idî ketye ‘erdê. Mi xwe gîhande qasabakî<sup>708</sup>. Yanî yêrleşimeke<sup>709</sup> dusud<sup>710</sup>, dusud-pêncî mal tê da ne. Gundekî zehf giran e. E ça ketme mehlê, mi dêna xwe dayê, kê çehv mi dikeve, direve.”

Cabê dine hev:

“Birevin, hecî hat!”

[Cîhangîrê Duniyadît] go:

“Direvin dikevne malê xwe. Zar mi dibînin direvin. Jin mi dibînin direvin. Mêr mi dibînin direvin.”

Mi go:

“Welle, eva tiştêkî baş e. Dêmekî tesbîta min rast e. Evî dilê kesekî ji xwe xaş nehîştîye. Welle, mala hecî jî gerekî farqlî<sup>711</sup> be.”

[Cîhangîrê Duniyadît] go:

“Hesp hat, hat, haaat derkete nava gund. Mi dêna xwe dayê, koşkeke bilind hatye çêkirin. Mi şaşik-maşik kirne nava çehvê xwe. Hesêbekî<sup>712</sup>, mi serçehvê xwe veşart. Mi xwe avîte ser zîn, kire nalenal. Du hev xulam, jinek li ber dêrî sekinîne. Kemberbest bûne, hêvyva min in.”

Revîne min, go:

“Wê hecî nexaş e.”

[Cîhangîrê Duniyadît] go:

“Ez peya kirim. ‘Inte‘inta min e, nalenala min e.”

[Jinik dibêje]:

“Hecî, ça bû?”

[Cîhangîrê Duniyadît] go:

“E cabê nadim. Tarî ketye ‘erdê, idî tarî ye. Jinik kete ber milê min, ez birme odê. Mi dêna xwe dayê, yataxek danye. Ya rebbê ‘alemê, dêna xwe didê, tamam qûş tuyu<sup>713</sup>, tamam qedîfe! Tu li seray-koşka dinhêrî, îşê zengînbûnê, îşê mal nîne! Mi xwe avîte nava cî. Mi orxan kişande serçehvê xwe. Mi destê xwe iha<sup>714</sup> kir.”

Mi go:

---

708 ) Bajarok.

709 ) Cîhûwar.

710 ) Dused.

711 ) Cuda.

712 ) Bi hesabekî, bi awayekî, bi şeklekî.

713 ) Pûrta çivîkan.

714 ) Wiha.

“Herin.”

[Cîhangîrê Dunyadîfî] go:

“Ez ketme nav. Mi dêna xwe dayê, kes nema, her kes inda<sup>715</sup> bû.”

Mi go:

“Welle, eva tişteki baş e. Ka îja sona<sup>716</sup> mi tê ser çi?”

[Cîhangîrê Dunyadîfî] go:

“Şev nivî bû nebû, mi dêna xwe dayê, bû çûrînîya dêrî. Jina hecî derî vekir. Tu jinikê dinhêrî, ya rebbî, hîveke çarda ne! Kembereke zêr piştê, taseke zîv li sêrî. Tu li kinca dinhêrî, tu jinikê dinhêrî, tu şerm dikî! Destê wê a iha kemberbest girêdayî, hat li ber serê mi, ser pîya sekinî. Ya rebbî, îja ez çi bêjmê ka? Ez cesaret nakim. Ez bêjmê dûrimeke<sup>717</sup> iha heye, min hecî kuştîye, dûrim ev e? Jinik rabe têxe qareqar, vî gundî da, nava malê da?”

Mi go:

“Tawekel xwedê, e Cîhangîr im.”

[Cîhangîrê Dunyadîfî] go:

“Şûrê mi heye idî. Qema mi jî heye.”

Mi go:

“Tarî ye, şev nivî bûye. Jinikê çi bike? Hema jinikê zehf kir, kire qareqar ez ê rabim birevim. J' xwe ra vê tarîyê serê xwe hildim, alîkî lêxim herim.”

Jinikê du cara go, ber xwe da go:

“Hecî, tu çanî<sup>718</sup>? Kê dera te diêşe? Tu tişteki dixazî, naxazî? Te nan nexariye? Av nexariye?”

[Cîhangîrê Dunyadîfî] go:

“Mi nerm orxan hilda.”

Mi go:

“Welle, hecî tine!”

[Cîhangîrê Dunyadîfî] go:

“Ez rabûm. Nava nivîna da ser qûna xwe rûniştim.”

Jinikê li mi nihêrî, go:

“Tu kê yî?”

Mi go:

“Welleh, ez Cîhangîrê Dunyadîfî me.”

[Jinikê go]:

“Xêlkê kê derê yî? Çi ‘îns î, çi cîns î?”

---

715 ) Li Ebexê û li derdora Ebexe li dewsa peyva ‘winda’yê peyva ‘inda’ tê bikaranîn.

716 ) Axirî, dawî.

717 ) Rewş.

718 ) Çawa yî.

Mi go:

“Welle, e jî merivek im. Hal-meselê mi (û) mêtê te ev. Mêtê te merivekî zulumkar e. Zulma mêtê te zehf mezin e.”

[Jinikê] go:

“Welle, xwedê rehma xwe li dêbavê te ke. Te guhê vî cîvarî, van gunda, evî gundî, guhê me te qîrandîye. Qet nertise<sup>719</sup>. Ez ê rabim du hev hesp j’ tewlê bikşînim. Tu heta bixazî ez ê zêr, zîv xurçekî tijî kim. Tu j’ ku hatî ez ê bi te ra werme wira.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Ez rabûm. Dilê xwe da şa bûm.”

Mi go:

“Cîhangîr, teze xwedê da te.”

Mi go:

“Welle, e zehf birçî me.”

[Jinikê] go:

“Cîhangîr, zemanê nanxarinê nîne. Ez ê nan bi xwe ra bînim. Yaniz<sup>720</sup>, tu xwe dirêj ke. Hine xulam-mulamê me hê hişyar in, ranezane. Ji tîrsa vî kafîrî kes zaten ranazê. Rihetiya kesekî tine. Du hev, sê hev nobedar in. Ez ê herim wana alîkî da bişînim. Ez ê hespa zîn kim, hazir kim. Ez ê barê xwe xurçekî zêr, zîv dagrim. Xarinê jî te ra hildim. Îja tu rê da çi duxwî buxwe.”

Mi go:

“Welle, tu baş dibêjî.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Jinik çû.”

Mi go:

“Dibe jinik oyînekî<sup>721</sup> bîne serê mi?”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Ez rabûm. Mi şûrê xwe kişand. Ez pey jinikê derketim, derketime derê malê. Mi xwe li qulçekî odê [da veşart]. Koşekî odê da ez sekinîm. Min dêna xwe dayê, na. Jinikê çû, qedera nîv si’etî egle bû. Derkete derê malê. Xurçek danî koşekî. Kete hundirê tewlê. Qedera deh deqa, panzde deqa egle bû. Mi dêna xwe dayê, du hesp dêst da nin, derkete derva. Kir ku here hundir.”

Mi go:

“Neçe, ez vira hazirim.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

---

719 ) Netirse.

720 ) Lê, lê belê.

721 ) Dek û dolab.

“Ez [û] jinik rabûn. Me zengîya kuta zengîya hev, me ajot.”

Me go:

“Êvar da em herin.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Qurban, sê roja da ez hatim derketme mala xwe. Ez hatime derketme mala xwe.”

Dîsa xweyê wan cînarê min, birê wan, bavê wan hatne pêşya mi, go:

“Cîhangîr, ka mervê me? Te ça kirye? Çi nekiryê?”

Mi go:

“Heyran, welle hal-mesele ev.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Cînar ketne ortê. Me qederekî li hev xist, çi kir. Em li ber hev geryan. Ê jinikê wusa anye, îşê anînê nîne. Xurcek tijî zêr, zîv e.”

Mi gote cînarê xwe:

“Evan merivana gune ne. Her yekî vana ez ê sed zêrî bimê.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Ku mi behsa sed zêrî kir, kumê xwe avîtnê hewa. Mi her ayleke wana sed zêr dayê. Qurban, idî ez li ser wî pereyî, li ser wî malî ez zehf zengîn bûm. Bû du jinê mi. Idî ez rûniştim.”

Mi go:

“Wehd be, ehd be, idî ez ti wexta dizîyê nekim.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Zarê mi çêbûn. Birrê min e pêz çêbûn. A wê hûn dibînin eva êla han hemû êla min e, di bin destê min da ne. Deh hev kurê min hene. Kurê mi, welle heyfa we yazixa<sup>722</sup> we. Werin ji vî îşî vazgêçmîş<sup>723</sup> bin. Dizî ji herkesî ra mîyeser nabe. Ez ê her yekî we gakî bime we da. Hûn serçehvê mi bavê mi ra hatine. Xaşhelalî we be. Hildin, j’ xwe ra bêtirs, bêxof herne memleketê xwe.”

Yekî niçande yekî, go:

“Binhêre, apê Cîhangîr çi rê dide pêşya me, ha! Çûye ji xwe ra jinek anî hatye, xurçe zêr anî hatye. Te go erê, du hev ga digre dide me da.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Kurê mi, hizkî werin ez van bexa<sup>724</sup> we ra nivî kim. Hizkî werin ez nivî pezê xwe bime we. Lawo, dilê mi dişewite. E zehf ketime rabûme, mi belengazî dîtye. E dibêm, bira hûn belengaz nebin.”

Dibê rabûne ser xwe, [gotin]:

---

722 ) Heyf.

723 ) Dev jê berdan, dest jê kişandin, jê gerîn.

724 ) Berx.



“Apê Cîhangîr, bi xatirê te.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Kurê mi, hûn serçehvê mi ra hatine.”

Qederekî ji apê Cîhangîr dûr ketin. Apê Cîhangîr parra da pey wan, go:

“Kurê mi, werin.”

[Hersê xortan] go:

“Apo, xwedê j’ te razî be. Eva si’ eteke tu ji me ra serpêhatiyê xwe dibêjî. Ustelîk<sup>725</sup> jî tu dibêjî hûn diz in. Em diz nîn in. Em hatine herne xevatê. Bihêle em herin.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Na. Hema werin qedera nîv si’etî, si’etekî jî cem mi rûnên. Tişteki din jî heye ez ê j’ we ra bêjim. Hûn diçin jî hûn dizanin, naçin jî hûn dizanin.”

Hersê genc dibêjin:

“Em vegerin. Heyfa apê Cîhangîr e.”

Vedigerine cem, cem rûdinên. [Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Kurê mi, ortê<sup>726</sup> da sê-çar sal derbas bûn. Kurmê dizîya min dîsa ez girtim. Kulî rojê xwedê, mi j’ mala xwe tişteki îlam didizî. Ji mala xwe dianî. Dixiste ber serê xwe, dixiste bin cîyê xwe. Tişteki lazim bûya, werîs bûya, das bûya, em bêjin çakûç bûya, kelbetan bûya, zarê mi lê digeryan, nedidîtin. Diçûne cem dîya xwe.”

Dîya wan digo:

“Kuro, herne oda bavê xwe, binhêrin, dêna xwe binê. Miheqeq ewî birye.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Dihatin ber serê mi derdixistin, binê lingê mi derdixistin, hildidan dibirin. Yanî dizî j’ mi ra bibû idî sen’etekî. Kurê mi, e dîsa rojekî rabûm.”

Mi gote jina xwe, jina xwe ye mezin, mi go:

“Yawo jinik, karê mi bike ez ê herim.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Jinikê mi ra kire şer.”

[Jinikê] go:

“Ca li van zarê xwe binhêre, vê serveta xwe binhêre, birrê mîha, birrê kavira, birrê deva (binhêre). Xwedê j’ te razî be, xelkê bavê te bêje. Piştî vî yaşî<sup>727</sup> tu, dizî?”

Mi go:

“Yawo jinik, tu qe idî mi ra wehza nede. Tedbîreke rind mi ra bike. Ez sibê diçim.”

---

725 ) Îcar, di ser de, bi ser de.

726 ) Nav, navber.

727 ) Temen, sal, emir.

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Jinik ehlaqê mi dizane. Jinik zivirî, peşmûrde bû, çû. Karê mi kir. Çi tine bû! Mi ra her tişt danye. Hevanek<sup>728</sup> tijî kirye. Têra min e deh-panzde roja heye. Idî ez dizanim. Ez jî xwe diparêzim ku kes mi ra neyê. Ez şeveqa tarî rabûm. E şeveqa tarî rabûm ketme rê. Ez qedera deh deqa ji gund dûr ketim dûr neketim, mi dêna xwe dayê, reperepa linga li pey min tê. Ez sekinîm. Mi dêna xwe dayê, du hev cînarê me.”

[Herdu cînara gotin]:

“Cîhangîr, welle xwedê, em zû va te teqîb dikin. Te karê xwe kir, tê herî dizyê. Em ê jî te ra werin.”

Mi go:

“Kurê mi, dizî idî j’ mi ra bûye sene’etekî. Dizî j’ mi ra bûye kurmekî. Ez dizyê nekim rihetya mi tine. Ka pekî hûn dehwa çî dikin? Lawo, ez ê herme dizyê. Hûn jî ku diçin xwe ra ayrî<sup>729</sup> lêxin herin. Kuro, kê bi mi ra hatye [mirine]. Hûn jî dizanin heta niha çar hev meriv bi mi ra hatine, her çar jî çûne. Hûn kurê merivan in, kurê însanan in.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Israr kirin. Kir nekir, da w neda, mi dêna xwe dayê, ez xwe jê xilaz nakim.”

Mi go:

“De gor bavê we. Hûn tên werin. Ez zanim, xwedê jî dizane, hemikî hûn nayên.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Birê mi, ez rabûm herd<sup>730</sup> hevalê xwe va em ketne rê. Em penc, şeş roja çûn. Ketne semtekî xerîb. Alaneke<sup>731</sup> zehf çîya ye, zehf orman<sup>732</sup> e, zehf av e, qîyamet e. Meriv deh mêtira pêşya xwe nabîne. Em çûn, em çûne devê avekî. Me dêna xwe dayê, di bintara me da, di devê avê da, qedera sî-çil merivî, neh-deh birrê pêz devê avê dane mexel, pêz dibirrin. Havîn e.”

Me go:

“Em herne cem van merva. J’ xwe ra hinekî bi van merva ra xeber din. Eva pezekî rind e li vira. Em vî pezî teqîb kin. Bekî<sup>733</sup> êvar dikeve ser me. Em xwe ra du birr pez hildidin, dizvirin diçin.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Tedbîra mi jî idî heye. Qeme bi ra ne, şûr bi mi ra ne. E zengîn im, kincê mi temîz in. Ku em ber bi wan çûn, me dêna xwe dayê, ewî sî-çil mervî îşê xwe ‘emelê xwe hîşt. Hemûşka<sup>734</sup> berê xwe da me hatin. Bi zimanekî xeber didin. Em bi zimanê wan nizanin. Em zimanê wan nizanin. Em

728 ) Tûrikê ku şivan davêjine pişta xwe û tê da xwarin û vexwarina wan heye.

729 ) Cuda.

730 ) Herdu.

731 ) Qad, meydan.

732 ) Daristan.

733 ) Belkî, dibe ku.

734 ) Hemû kes.

nerevîn.”

Me go:

“Pêş me va tîn. Çika me qarşilamîş<sup>735</sup> bikin, ça bikin?”

[Cîhangîrê Donyadîtî] go:

“Hatîn. Hema iha çember avîtnê dora me. Em girtin. Destê me pişt va girêdan. Lingê me girêdan. Her yekî me du hev, sê hev meriv xwe gîhande me. Em hildan birin. Şahîke wusa ketye nava wana, wusa şa dibin.”

Yek gazî dike, dibê:

“Me sê hev kivrîşk girtine.”

[Cîhangîrê Donyadîtî] go:

“E duşmîş bûm taşmîş bûm<sup>736</sup>.”

Mi go:

“Yawo, evana şa dibin dibê me kivrîşk girtine. Ê kivrîşka jî yê biherin, şerjê kin. Yê ça b’kin? Çi j’ kivrîşka bikin?”

[Cîhangîrê Donyadîtî] go:

“Em hildan birin. Em hildan birin. Dora me govend girtine, direqisin, şa dibin, gazî hev dikan. Her yekî me kulavekî şivana avîtnê ser serê me. Piştê me dane hev. J’ xwe ra çûne ser îşê xwe. Çûne ser îşê xwe. Mi niçande hevala.”

Mi go:

“Kuro, yê me bikujin.”

[Herdu hevala] go:

“Cîhangîr, em ça b’kin?”

Mi go:

“Kuro, a iha yanaşmîşî<sup>737</sup> mi bibin. Bi devê xwe yek we destê mi veke.”

[Cîhangîrê Donyadîtî] go:

“Ewana idî pezbirra xwe da ketine. Nêzîkî me ne. Di bin kulav da hevaleyê mi xwe gîhande mi. Bi devê xwe lêxist destê mi vekir. Ku destê mi vekîr, kêr cem min heye, min kêr avîtnê destê hevalê xwe, birrî.”

Mi go:

“Kuro, eva çemekî zehf gumrah e. Em xwe nevêjne çêm em xilaz nabin. Evana vî ormanî<sup>738</sup> da beled in, hakim in. Em ancax bi çêm xilaz bin.”

[Herdu hevala] go:

---

735 ) Pêşwazî.

736 ) Hûr û kûr fikirîn.

737 ) Nêzîkîbûn.

738 ) Daristan.

“Baş e.”

Mi go:

“Ez ê derkevim, birevim. Hûn mi teqîb kin. Ayrî<sup>739</sup> neçin.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Çaxê ku ez rabûm ji bin kulêv derketim, mi banzda, yekî ez dîtîm.”

[Ewî] go:

“Iha kivrişk çûn.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Cî da ling dane me. Heta xwe gîhande mi, mi xwe avîte avê, herd hevalê mi girtin. Herd hevalê mi girtin. Mi sovekarî<sup>740</sup> zanibû. Ez derbasî wî tayê<sup>741</sup> çêm bûm. Çemekî giran e. Ez wî tayê çêm sekinîm.”

Gazî min dîkin:

“Tu bi qurbana çemê Şemerûtke bî.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Nebî, çêm sondxarî ne j’ çêm derbas nabin. Yanî ji wan ra notanî<sup>742</sup> torekî ye, sinirekî<sup>743</sup> ye. Ez derbasî walî bûm.”

Gazî mi dîkin:

“Tu bi qurbana çemê Şemerûtke bî. Tu bi çemê Şemerûtke xilaz bûyî.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Herd hevalê mi mane destê wan da. Ez derbasî walî bûm. Idî hema herd hevalê mi bidî çehvê mi anîn hatin avîtne ‘erdê, herdik jî şerjê kirin. Şerjê kirin. Ez giryam. Mi çi kir, dilê mi şewitî bi hevalê min. Ez qederekî wî tayê çêm rûniştîm mi wana sêr kir. De îja çi dibêjin idî ez nizanîm. Yaniz<sup>744</sup> yê ku kevira davêje min, yê ku bi anegorî zimanê xwe mi ra dide xebera. E duşmîş<sup>745</sup> bûm.”

Mi go:

“Welle, ve carê jî çemê Şemerûtke hate hewarîya mi. Ez vê carê jî xilaz bûm.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Qurban, ez çûm. Mame tenê. Tenê diçim, da.”

Mi go:

---

739 ) Cuda.

740 ) Sobeberî, melevanî.

741 ) Alî, rex, qerax, kenar.

742 ) Mîna, nola.

743 ) Sînor, hidûd, tixûb.

744 ) Lê, lê belê.

745 ) Fikirîn.

“Valî<sup>746</sup> idî ez emîn im ku j’ van însana însan tine ne. Eva çema sinirek<sup>747</sup> e.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Hema isa xwe ra mi devê çem teqîb kir, çûm. Sê roj, çar roj, pênc roj, deh roj, panzde roj, mi teqîb kir, ez çûm. Ez rojekî di çiyakî da berjêr bûm. Mi dêna xwe dayê, di devbehrekî da, devê behrê da şiherekî zehf giran hate kifşê.”

Mi go:

“Welle, şukur baş e. Ez ê idî herme nava vana da. Mi histîyê xwe ş’kênand xebera jina xwe nekir. Bi wî malê xwe, halê xwe, demê xwe, dezgayê xwe, vî yaşê<sup>748</sup> xwe rabûme serê rêya ketime. Teze parra pey dizîyê ketime. Hema çi were serê mi, mi heq kirye.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Qurban, ez hatme nava şihê. Valî digirim walî digirim. Saqoqa da, mehla da, nava çarsiyê da ez rastî însanekî nayem. Însan tê da tine ne. Mixazê perçe<sup>749</sup>, mixazê qûyimciya<sup>750</sup>, [girtîne]. Ê ji te ra bêjim, ez nava şihê da mame heyret. Dikevme mehla, xwedê yawo qe însanek tine? E digirim nagerim allah rizasi îçîn<sup>751</sup> çehvê mi bi însanekî neket. Peki<sup>752</sup> eva şihêra yê kê ye? Kê evî şehîrî hildide datîne? Xweyî vî malî, van mixaza, van dikana kê derê ne? Bo mi bû ewekî [meraçekî]. Idî ez dikevme hundirê dikana da, derê dikana vekirî ye, dêna xwe dimê. Yanê idî ez şihê j’ xwe ra hesab dikim, idî eva şihêra yê min e. Ez ê çi b’kim çi nekim? A vî hesabî be, ez ê çend roj şûnda herim jin zarê xwe, mala xwe hildim werim, bikevme vî şehîrî.”

Mi go:

“Ez rind teqîb bikim ka sirra wî çi ye? Nedenê<sup>753</sup> wî çi ye?”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Qurban, ez Cîhangîr im. Yanî merivekî bêaqil nînim.”

Mi go:

“Ez ê herim. Xweyî vê servetê, vî malî, van dikana, vî erazîyî, van koşk-seraya sirreke wî heye, hikmeteke wî heye.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Ez idî bûme beçîyê şihê. Mi xwe ra tûtikek s’tandîye. Ez êvarê nava şihê da diçim, notanî nobeçîya diçim têm. Bira şihê soymîş<sup>754</sup> nekin, nebin. Mixazê zêra hene, yê zîva heye, yê perçe

---

746 ) Vî alî.

747 ) Sînor, tixûb, hidûd.

748 ) Temen, sal, emir.

749 ) Caw, qumaş.

750 ) Zêrînger, zêrfiroş.

751 ) Bo xatirê xwedê.

752 ) Baş e, tamam.

753 ) Sedem, sebeb.

754 ) Şêlandin.

heye, yê ‘etarî heye, hema tu çi bêjî. Ez êvar êvara diçim j’ xwe ra koşeke zehf delal da radizêm. Şevêkî ez di nava şîher da nim, mi dêna xwe dayê, ji behrê tevak<sup>755</sup> deket. Wesfê mezinaya wê nayê dayînê! Kete nava şîher. Kete nava şîher. Di nava şîher da soqaq soqaq, mehle mehle digere. Ez dûredûr teqîb dikim. Eva çî ye ku ez dêna xwe dimê? Ya rebbil’alemîn, eva tiştêkî pir ‘ecayîb e! Idî ez j’ tirsê revîm, mi xwe da ser serê xanmanekî bilind. Mi dêna xwe dayê, ketye mehla qontrol dike, dikana qontrol dike çika meriv tê da hene, tine ne? Berbanga sibê, mi dêna xwe dayê, cake<sup>756</sup> dinê zivirî behrê. Zivirî behrê. E duşmîş bûm taşmîş<sup>757</sup> bûm.”

Mi go:

“Ez ê evî çî b’kim? Dême<sup>758</sup> eva însanê vira, mervê vira da hemû evî xarye, evî ret<sup>759</sup> kirye.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Şeva paşîn jî mi teqîb kir. ‘Eynî kete nava şîher. Di nava şîher, nava mehla da gerya, cake zivirî behrê. Ciyê ku jê derdikeve tê ez dizanim. Ez ketme nava şîher, mi li dikan teker teker<sup>760</sup> qontrol kirin.”

Mi go:

“Çika qe barûd heye, tine ye?”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Mi di cîkî da, sê çar ‘îyar di post da, mi barûd dît. Ku mi barûd dît.”

Mi go:

“Welle ez ê bi vê barûdê tiştêkî bînme serê vî.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Çixira<sup>761</sup> jê derdikeve tê dikeve mehlê da ev çixir kifş e. Ewa çixira kifş e. Tê soqaqeke teng ra derbas dibe dikeve nava mehlê.”

Mi go:

“Welle, ez ê a li vira tûzaxekî<sup>762</sup> j’ vî ra daynim.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Mi anî hat çehlek kola. Dirêj dirêj mi barûda xwe rokirê. Min anî hat notanî<sup>763</sup> şirîtekî jî, mi barûd rokir. Qedera pêncî-şêst mêtreyî dûrî wira xist. Ez bendewarî wî sekinîm. Nîvê şevê, mi dêna xwe dayê ku derket, mi texmîn kir ku kete soqaqê, mi agir berda wê barûdê. Min agir berdayê. Ê de

755 ) ‘Teva, tevayê çolê’ rawir, cenawir.

756 ) Careke din, dîsa.

757 ) Hûr û kûr fikirîn.

758 ) Wisa dixuyê ku.

759 ) Xilaskirin, kutakirin.

760 ) Yeko yeko.

761 ) Ciyê ku tê da derbas dibe.

762 ) 9 Tele, xefik, kemîn.

763 ) Mîna.

sê-çar ‘îyar barûd mi rokiriye çehlekî da. Xwe gîhande wira da. Ew barûd çaxê ku teqya agir pê ket qêrîn jê çû. Qêrîn jê çû. Valî walî<sup>764</sup> çirpinmîş<sup>765</sup> bû. Cake dinê berê xwe da behrê, kete behrê. Kete behrê çû.”

Mi go:

“De çika eger tişte hatibe sêrî, birîndar bûbe? Veya<sup>766</sup> idî ‘işk<sup>767</sup> bûbe, çi be, nayê. Eger ku tişte pê neyê zaten ewê vegere.”

[Cîhangîrê Duniyadîti] go:

“Du roj, sê roj, çar roja mi tamam bû. Mi dêna xwe dayê, na. Ewa heywana, ewa wehşa-teva idî nayê. Idî mi li kêfa xwe nihêrî. Mi pîlanê anîna mala xwe kir. Mi pîlanê mala xwe anîne kir ku ez bînim. Ez şevêkî dîsa nava çarsiyê digirim, bûme nobeçiyê çarsiyê idî. Çika kes heye, tune ye? Diz hene, tine ne? Wextekî mi dêna xwe dayê, ji behrê çar-pênc hev jin derketin. Ê nava behrê da çaxê ku jin derketin ez mame te’ecub!”

Mi go:

“Evana însan nînin, ev çi ne?”

[Cîhangîrê Duniyadîti] go:

“Ez bendî wan ketim. Mi dêna xwe dayê, ketne nava çarsiyê j’ xwe ra geryan. Ê j’ te ra bêjim, tûr avîtin. Tu dêna xwe didî jina, ya rebbî, meriv hij heyran e dêna xwe bidê! Tiştê zehf antîqe ne. Yek nav da qîz e. Dîya wan e. Yek kur e. Du-sê hev jî piçûk in, destê wan digrin digerin. Ê de ez dizanim, teqîb dikim. Mi rojekî anî hat.”

Mi go:

“Welle, ez ê vira da tişte bikim.”

[Cîhangîrê Duniyadîti] go:

“Mi çehleke zehf rind, kûr kola. Mi anî hat hine çîlpî-milpî avîtne ser. Hine xulî-mulî ser ra kir. Rîya wan e tîn diçin. De idî ez çarsiyê bi soqaqa, bi ewa beled im. Rojekî ew jinik dîsa bi wan zarê xwe, bi qîza xwe va deket hat. Li wê soqaqê da çaxê ku derbas bûn hatin, ketne hundirê wê çehlê. Di hundirê wê çehlê da ez ser ra sekinîm.”

[Wê jinikê] go:

“Tu însan î em jî perî ne. Em ê ricakî j’ te bikin tê me berdî.”

Mi go:

“Heyran, ez jî însan im. Ez wehşî nînim. Ji mi ra Cîhangîrê Duniyadîti dibêjin. Ez ê we berdîm. Yaniz<sup>768</sup> eva qîzka hanê tê bidî mi. E vira tenê me, kes tine. Eva şîherê min e.”

764 ) Vî alî wî alî.

765 ) Pirpitîn, perpitîn, pilpitîn, pelpitîn.

766 ) An.

767 ) Di Ebexê û li derdora Ebexê da peyva ‘işk’ an ‘işkbûn’ heywanê mirî tê bikaranîn.

768 ) Lê, lê belê.

[Wê jinikê] go:

“Cîhangîr, em te nas dikin. Eva şîherê hanê ewî tevayî<sup>769</sup> xaribû, ret<sup>770</sup> kiribû. Em jî newêribûn tîrsa wî tevayî ûxramîşî<sup>771</sup> vî şîherî bibûna. Yaniz, qîzîk perî ye tu jî însan î. Em li hev nakin. Rojekî zû dereng, xêra me j’ te ra tine, em ê j’ hev biqetin.”

Mi go:

“Welle xwedê jî dizane, eger ku hûn evê qîzkê tu nedî min, mimkûna ku ez berdim nîne.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] go:

“Mi destê wê girt hilkişand. Mi zarê wê jî derxistin. Qîzîk ma tê da. Qîzîk ma tê da. Ewna çûn. Ça xwe gîhande devbehrê [çûn].”

De îja em bêjin eva çîrok e, di çîroka da perî zehf derbas dibin. Yanî di kultura kurda da behsa perîya zehf tê kirin. Ev perî idî cin bin însan bin [em nizanin]. Yaniz<sup>772</sup>, di kultura Keldanîya da di hebûna Siltan Silêman ‘eleyhî selam da behsa jinê elf dikin. Yanî ew kesên dibên ‘efrît in, di bin destê Siltan Silêman da xevitîne ji wan ra elf dibêjin. Ewana xweyî ûygarlix<sup>773</sup> in. Tarîxekî da ewan [û] însana hev dîtîne. Yanî ew [û] însan notanî<sup>774</sup> cînar yaşamîş<sup>775</sup> bûne. Însana kultureke mezin derheq madenê, teknîkê, mekanîkê da ji wana hildaye. Yanî eva tiştêkî kesin<sup>776</sup> e.

Dibê destê qîzîkê digre hildide tîne. Qîzîk dixe qareqaer, zarezar, lawayî dike, dîleka<sup>777</sup> dike, dibê:

“Cîhangîr, em bi hev nakin. Em perî ne tu jî însan î.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Na. Mimkun nîne.”

Cîhangîr tîne qîzîkê li xwe dide mehrkirinê. Sureklî<sup>778</sup> miqatî qîzîkê ye jî. [Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Qurban, ez du sal sê sala di wî şehîrî da bi wê qîzkê ra mam. Kurekî min, qîzeke min ji wê jînkê çêbûn. Rojekî zehf lawayî min kir.”

[Jinika perî] go:

“Cîhangîr, me bihere em herne devbehrê. Ji xwe ra herne pîknîkê<sup>779</sup>. Herin bigerin hinekî.”

[Cîhangîrê Dunyadîtî] dibê:

“Mi jî bîr kiribû ku evna ji behrê tîne.”

---

769 ) Rawir, rewer.

770 ) Xilaskirin, kutakirin.

771 ) Serîlêxistin, serîlêdan.

772 ) Lê, lê belê.

773 ) Şaristanî.

774 ) Mîna.

775 ) Jiyîn.

776 ) Misoger, qethî.

777 ) Daxwaz, nîyaz, miraz.

778 ) Her wext, her daîm, her tim.

779 ) Geşt, seyran.



Anegorî çîrokê da tê gotinê, dibê kevlê wan hebûne. Yanî kincê wan hebûne, li xwe kirine, inda<sup>780</sup> bûne. Çaxê ku j' behrê derketine ew kevlê xwe ji xwe xistine. Yanî ew kincê xwe ji xwe xistine. Dibê çaxê diçin devbehrê digerin, dikeve avê, çî dike, herd zarê xwe hildide cem xwe, dûrî Cîhangîr dikeve.

[Jinika perî] dibê:

“Cîhangîr, bi xatrê te.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Jinik, çî xatrê mi? Tê çî bi'kî? Çî dibêjî?”

[Jinika perî] dibê:

“Welle, em çûn. Kevlê me a l' vê devbehrê bûn. Ku destê me wan kevla nekeve, yanî wan kinca nekeve em xwe nekin, em nikarin tişteki bikin. Niha me ew kevl li xwe kirine. Ez ê herme bigîjme qewmê xwe. Herim bigîjme dîya xwe, bavê xwe.”

Dike nake jinikê sewrax<sup>781</sup> nake, dibê:

“De tu bidî xatrê xwedê, tu diçî here, her<sup>782</sup> zarokê mi nebe.”

[Jinika perî] dibê:

“Xwedê, zar jî yê te nînin.”

Cîhangîr digrî, lawaya dike, dîleka<sup>783</sup> dike. Çî dike nake, dîna xwe didê, jinik bi zara va çûn, inda bûn. Cîhangîr tê rûdinê. Digrî, nava çehvê xwe dixê, dibê:

“Teyî, mi çî mala xwe xirav kir. Mi çî derê xwe dada. Îja eva jina mi n e han, ev kurê mi, qîza min a li destê mi ketin.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Qurban, idî ez hema bîst-çar si'eta îşê mi bû girîn. Ez rûniştim, ne xarin ne vexarin (hebû). Ewa şehra hema idî ber çehvê mi reş bû. Mi rabû serê xwe hilda, mi şîher cî da hîşt, herrek tu naçî. Idî mala mi jî nayê bîra mi.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî ji wan hersê xortan ra] go:

“Gelî genca, ez van mesela ji we ra dibêjim, ber we digirim. E dibê hûn gunê ne. Xebera mi bikin. Tercubê<sup>784</sup> mi hene, neçin dîzyê nekin. Dizî tişteki nebaş e.”

[Ew hersê xort] dibê:

“Apo, tu mesela xwe bêje, zemanê me teng e. Te em zehf egle kirin, em j' rêya me hîştin. Gerekî tu ewa [îzna] me bikî em herin.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

---

780 ) Winda.

781 ) Serwext.

782 ) Herdu.

783 ) Daxwaz, nîyaz, miraz.

784 ) Tecrube, serpehatî, serborî.

“Baş e, kurê min. E çûm, çûme şiherekî. E çûme şiherekî, şiherekî nenas e. Ez xwe ra tê da geryam, çûm hatim. Ê perê mi zehf e. Ser mi pere zehf e. Mi pere anye hatye. Kincê temîz e li min in.”

Rojekî merivekî hat, gote mi:

“Filankes tu xerîb î?”

Mi go:

“Erê welle, ez xerîb im.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Ez teklîf kirim, birme mala xwe.”

[Ewî merivî] go:

“Welle, zarê mi tine ne xêncî qîzekî. Qîza mi jî zehf baş e. Eger tu hiz bikî ez ê evê qîza xwe bime te. Hema bibe kurê mi, nava mala mi da be. Zarê min e kurîn tine ne. Hema li vira be. Ez ê evê qîzkê bime te.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Mi dêna xwe da qîzikê, qîzik jinike zehf temîz e, zehf aqilî ye, zehf baş e. Idî mi mal bîr kirye, yanî wira du jinê min hene, du kurê min hene! E duşmîş<sup>785</sup> bûm.”

Mi go:

“Cîhangîr, xwedê dide te tu nizanî buxwî. Te perî da der. Îja tu hatî vira eva hatye ser te, tişte nake. Hema evê bixaze, bira kuta be here.”

Min go:

“Baş e. Hema tu bavê mi, ez jî kurê te.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Ez rabûm çûme dêst. Gazî mele kir, anî hat nikaha mi birrî. Ez nava mala wî da mam. Saleke mi tamam bû. Rojekî mi dêna xwe dayê, jina mi nexaş e.”

Mi gote bavê wê:

“Welle, qîza te nexaş e.”

Ha dixtor, ha hekîm, ha birin, ha anîn, ha îlaç-dermanê wî çaxî çî be. Jinik qedera panzde, bîst roja nexaş dikeve, diçe emrê xwedê, wefat dike. Wefat dike.

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Der-cînarê me hene, tèn. Kesekî ku here ser mirî bigrî tine. Kê tê ser mi da digrî. Tèn ser mi disekinî, nava çehvê xwe dixin.”

[Dibêjin]:

“Em kor bin. Heyfa te, tu merivekî baş î.”

Mi go:

---

785 ) Fikirîn.

“Heyran, ez sax im. Wê jina mi mirye. Herin ser jina mi da bigrîn.”

[Wan kesan] go:

“Na na. ‘Edetê me wusa nîne. Kes ser mirî da nagrî. Eger jin bimre ser mêr da digrîn. Eger mêr bimre ser jinê da digrîn. A jinê biherin çehl bikin, mêr jî dibin pê ra çehl dikin. ‘Edetê me isa ne.”

Mi go:

“Ça?”

[Wan kesan] go:

“Welle.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Ez duşmîş<sup>786</sup> bûm.”

Mi go:

“Wellehî îşê mi xirab e. Çika ez rêkî bibînim ez ê birevim.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Ê şin e, hatin çûyîn heye. Qedera si’et, si’et nîvekî kete ortê, cenaze şuştin, kefen kirin. Mi dêna xwe dayê, du hev polêz hatin ketne milê mi, polêzê wî çaxî, ‘esayîsa wî çaxî kê be. Xezûrê mi, cînar-mînar rex mi ketin. Du heva, sê heva jî cenaze hildan. Em hildan birin.”

Mi go:

“Yawo, ez j’ dêwê kor xilaz bûm. Ez j’ boncîkê xilaz bûm. Ez j’ çemê Şemerûtîkê xilaz bûm. Ez jî devbehrê jî zîyayê xilaz bûm. Îja ka ez ê j’ vira ça xilaz bim? Yê mi biherin çehl kin.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Qurban, em anîn hatin. Devbehrekî da zangekî<sup>787</sup> pîrr bilind heye. Yanê tu zangê dinhêrî çehvê mêriv reşeve tê. Me dêna xwe dayê, hema isa bi merdiven pê va hilkişîyan çûn derketne serê zangê. Bintarê da jî çem e, av dikişe. Aweke gumreh e. Derê mixarekî [vekirin]. Yanê tîketîk diçe ‘erdê. Bi şîrîta tabûta jinîkê daxistin.”

[Wan kesan] go:

“Merzelê me ev e.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Şîrîtek avîtne nava min. E jî girêdam. E jî jor da berdamê. Sî, çil mêtîre kûr e bîr. Ez çûm, mi dêna xwe dayê, tijî cenaze ne. De îja kê mirye di wî şehîrî da, davêjne wira. Yanî merzelê wan ew e. Hinek teze mirine, bên ketinê. Mixare mezin e, bêhed e, bêhesab e. Mi tabûta jinka xwe jî kaşî alîkî kir, ez çûm.”

Mi go:

“Mîrin emrê xwedê ye, jinîk. Tu mirî yî, e sax im. Yanî e jî bi te ra mirime. Ka îja ez ê ça b’kim?”

---

786 ) Fikirîn.

787 ) Kevirên pîr mezin, kevirên qerase.

Ez rîya derketinê, rîya revê digirim ka ez ê ça xilaz bim?”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Rojek, dudu, sisê... Lê, rojbiroj nan tînin mi ra davêjin. Yanî nanê mi tê. Ew mirî j’ kîjan malê çû be, ew meriv kîjan malê çû be, nanê wan tê, yanî hesêbekî<sup>788</sup> şîva wan.”

Wextekî memleketê me da jî digotin şîva miryê xwe derxin. Şîva miryê xwe derdixin dişînin.

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Qedera mehekî, bîst rojî mi îdare kir bi wî hesabî. E jî idî hal ketime di vira da. Ne rûçikê însana dibînim. Alîkî va bêna cenaza ye, alîkî ew e. Rojekî, ser devê bîrê gazî mi kirin.”

Go:

“Cîhangîr, xwe bide alîkî. Cenazek heye em ê peya kin.”

Go, mi go:

“Cenaze kê ye?”

[Wan kesan] go:

“Welle wezîrê paşê mirye. Cenazê wezîrê paşê ye, em ê peya kin.”

Mi go:

“Ê miheqeq jina wî jî yê pê ra were. Ku wezîr miri be bêjin nîne.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Welle, tabûta wezîr jor da berjêr kirin. Mi dêna xwe dayê, pey wî dîsa jinek berjêr bû. Berjêr bû hat. Jinik digrî. Ez çûm. Ez jî ser da giryam.”

[Jina wezîr] go:

“Tu kê yî?”

Mi go:

“Welle, Cîhangîrê Duniyadîtî ji mi ra dibêjin.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Jinik zehf baş e. Ê tabî jina wezîran e. Gîyîm<sup>789</sup>-mîyîma wê, em bêjin ewa wê, jineke aqil, temîz.”

[Jina wezîr] go:

“Cîhangîr, madem tu Cîhangîr î, madem tu Cîhangîrê Duniyadîtî yî, vira me ra rêkî bibîne. Em vira derkevin.”

Mi go:

“Mala bavê te xira be, ka ez ê van zanga<sup>790</sup>, van zahora, ez ê kê derê rê bibînim.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

---

788 ) Bi hesabekî, bi awayekî, bi şeklekî.

789 ) Kinc, cilûberg.

790 ) Kevirên pir mezin, kevirên qerase.

“Ez jî, ew cinazê tên temam tertîb halinde<sup>791</sup> dime alîkî cinazê wan, ewê wana. Ê em navê da nin. Mixare ye lê, e jê dûr dikevim. E rojekî têm teselîyê dikim ka ça bûne? Xira bûne? Bênetinê, neketinê? Mi rojekî, mi dêna xwe dayê, serçêhvê merivekî, guhê wî tine. E duşmîş<sup>792</sup> bûm.”

Mi go:

“Vira da eva hatye xarinê? Serçêhvê wî, guhê wî hatye xarinê?”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Ez ketme şikê.”

Mi go:

“Welle, ez ê bendî vî tiştî kevim.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Rojek, dudu, sisê... Mi dêna xwe dayê, rovîk tê. Rovîk tê. Hate ser cenaze. Mi berdayê da. Mi dêna xwe dayê, revî kete qulçekî<sup>793</sup>, di qulç da inda<sup>794</sup> bû. Mi dêna xwe dayê, qulek e. Hema isa hêdî hêdî rovî tê ra derbas bûye çûye. Mi hêdî hêdî kola, kola. Hema isa fire bû. Mi dêna xwe dayê, tunêlek e diçe. Tunêlek e diçe. Mi gazî jinikê kir.”

Mi go:

“Mizginîya mi li te. Were, mi rê dît.”

[Jina wezîr go]:

“Ça?”

Mi go:

“Welle, mi dît.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Qurban, em tunêlê çûn. De îja zangekî isa bilind e. Bintara me çemekî kûr î ‘ecayîb dikşe. Bekî<sup>795</sup> bilindaya zangê sed mêtreyê heye. Ez [û] jinik çûn ser ra sekinîn ka em xwe bavêjin, em ê ça xilaz bin? Ê rovî hatye ketyê. Ketye pala zangê. Rovî ye, deketye çûye. Feqet, îmkana me wira çûyîne tune. Ez valî-walî<sup>796</sup> qontrol dikim, mimkûn nîne. Em qedera rojekî li wira man.”

Mi go:

“Jinik, çare çî ye? Em ça b’kin?”

[Jina wezîr] go:

“Welle, çare hema ji mirina nava wan cenaza di wî ewî da, tawekel xwedê, em ê hema tawekelîya xwe bine xwedê, em ê xwe bavêjne avê. Idî em xilaz bûne, xilaz bûne.”

---

791 ) Birêkûpêk.

792 ) Fikirîn.

793 ) Quncik.

794 ) Winda.

795 ) Belkî, dibe ku.

796 ) Vî alî wî alî.

Mi go:

“Xwedê, tu rast dibêjî. Hema gereka isa be.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Nîvro ye. Mi [û] jinikê, me bi destê hev girt. Me çehvê xwe girt.”

Me go:

“Ya illah ya xwedê.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Me xwe jor da avîte wê avê. Çaxê ku me xwe jor da avîte avê, ê j’ tîrsa me çehvê xwe girtîye. Wextekî me dêna xwe dayê, em l’ reşayê ne. Yanî çem vira dikşe. Vira kêleka çem, reşayê da, sep-silamet xwe dinhêrin.”

Me go:

“Heyran, eva çî ye?”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Mi dêna xwe dayê, nava avê da qîza min e, kurê min e, jina min e.”

[Jina wî, qîza wî, kurê wî, ewên perî] go:

“Cîhangîr, me zanibû ti tengasîyê da nî. We xwe jor da avît, me hûn girtin. A, idî cake<sup>797</sup> dinê dizîyê neke. Tobe bike. Bes e idî. Pey vî îşî neçe. Jina xwe hilde xwe ra, tu kalî<sup>798</sup> diçî lêxe here. Here bigîje çol î çoxixê<sup>799</sup> xwe, mala xwe.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Mi kire qareqar.”

Mi go:

“Bine xatrê xwedê, kurê mi, qîza mi bira were ez bibînim cake dinê here.”

Jinikê go:

“Na. Hema ku hatne cem te, tu Cîhangîr î, welle tu bernadî.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Inda<sup>800</sup> bûn. Mi şejdeke şukrê bir.”

Mi go:

“Ya rebbî çox<sup>801</sup> şukir, ez j’ vê tengasîyê xilaz bûm.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] go:

“Qurban, ez rabûm. Mi jina xwe hilda, ez hatme nava çol î çoxixê xwe. Sê jinê mi tamam bûn. Deh kurê min in. A eva konê hanê mezin, tu dibînî nava êlê da, ew konê min e. Zengînê êlê, meznê

797 ) Careke din, dîsa.

798 ) Kî alî, ku alî.

799 ) Zar û zêç.

800 ) Winda.

801 ) Zehf, gelek.

êlê ez im. Xwedê, ez wehca<sup>802</sup> tême ber bexa<sup>803</sup>. Ez êvarê dizvirime mala xwe dîsa miheqeq dizîkî dikim. Yanî çay be, eger şeker be, eger kelmel be, tiştêkî tînim didizim. Dime ber serê xwe paşê radizêm. Kurê mi, e ricayê ji we dikim. Werin vê rêyê da neçin. Ti rê nîne.”

[Hersê xortan] go:

“Apê Cîhangîr, bi xatrê te. Xwedê j’ te razî be. Te meselê rind me ra gotin. Em diz nînin. Em ê herin bixevitin.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Kuro, neçin. Werne vira. Kuro, mi çî gote we, we xebera mi nekir. Kurê min, ez ê şanseki bime we. Hûn bona kihêla nehatine? Hûn bi ga qayîl nabin.”

[Hersê xortan] go:

“Erê welle. Em bona kihêla hatine.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Kurê mi, her kureki mi kihêlekî wî heye niha. Ez ê êvarê bexa<sup>804</sup> biherim. Eva konê hanê yê min e. Aha palanê deva avîtime ser hev. Hûn ê êvarê werin. Ez ê kelba cîkî da aş kim. Hûn ê bikevne nava wan palana. Şev nivî bû nebû ku kurê mi razan, ez ê sê hev kihêl, qeyd zincîrê wan vekim. Ji we ra zîn gem kim, bime we. Hûnê lê sîyar bin bajon. Si’etekî moletê dime we. Ez ê deyn<sup>805</sup> kurê xwe kim. Yê parra pey we kevin. Idî hûn xilaz bûne, xilaz bûne. Xilaz nebûne jî, gor bavê we.”

Hersêk radibin, diçe destê wî paç dikin, dibê:

“Ê xwedê j’i te razî be. Ka evan kihêlê hanê, her yekî wana li welatê me pêncî zêr e. Tu sê hev kihêl didî me bêpol, bêpere.”

[Cîhangîrê Duniyadîfî] go:

“Ez sibê da bi ehmeqîya we da ketime. Ez mesela we ra dibêjim, çîroka dibêjim. Kurê mi, ez Cîhangîrê Duniyadîfî me. Ez sê însana name bi sê hev kihêla. Yanî hûn însan in. Ez deyerê<sup>806</sup> dime we. Ez ketime rabûme. Malê duniyayê qirêja destan e. Kurê mi, welle ez ê sê hev kihêl bime we da. Idî hûn bi şansê xwe. Xilaz bûne, xilaz bûne. Xilaz nebûne jî, idî hûn dizanin.”

Dibê dibe roava. Cîhangîr bexê xwe dajo diçe malê. De sozleşmîş<sup>807</sup> bûne, orta wan da soz heye. Şev nivî dibe. Eva mervana xwe dighîne palana. Dêna xwe dinê, wê Cîhangîr derê malê sekinîye. Sê hev kihêl gem zîn kirye. Destgîrê wan destê Cîhangîr da nin, sekinîye. Hersêk xwe dighîne destê wî paç dikin. Li hespa sîyar dibin.

[Cîhangîrê Duniyadîfî] dibê:

---

802 ) Kerb.

803 ) Berx.

804 ) Berx.

805 ) Deng.

806 ) Rêz, hurmet, qedir, qîmet.

807 ) Lihevkin.

“Kurê mi, binê<sup>808</sup> nesekinin. Li tu derî nesekinin. Kurê minê bîst-çar si’eta pey we werin. Evan kihêlana jî heyfa we lê neyê, gunê we lê neyê. Hûn çîqa bajon, ewê hin qeder açilmîş<sup>809</sup> bin herin.”

Destê wî paç dikin. [Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Kurê mi, idî herin. Xwedê oxirê bide we. Yaniz<sup>810</sup>, li her derê Cîhangîr rastî we nayên. Herin, tobe bikin. Cake<sup>811</sup> dinê pey tiştêkî iha negerin. Kurê mi, hûn diz in diz nîn in?”

[Hersê xort] dibê:

“Welleh, em diz in.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Baş e kurê mi. De herin j’ we ra oxir be.”

Dibê li hespê xwe, kihêlê xwe sîyar dibin, pehnîya dinê. Cîhangîr si’etê digre. Si’et tamam dibe. Deyn<sup>812</sup> kurê xwe dike, dibê:

“Kuro, rabin. Hûn mirin e, lawo?”

[Kurên wî] dibê:

“Bavo, ça bû?”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Kuro, diz ketine olşa<sup>813</sup> me, kihêlê me birin.”

[Kurên wî dibên]:

“Ça?”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Welle.”

Zarê wî radibin. Li kihêlê xwe sîyar dibin, parra dine pey. Bîst-çar si’eta diçin îzê<sup>814</sup> rast nakin. De si’etekî evana pêş da rê ketine. Êvarê dizvirin tên, dibê:

“Bavo.”

[Cîhangîrê Duniyadîtî] dibê:

“Ha.”

[Kurên wî] dibê:

“Bavo, welle me pê ra negîhand. Erê, me îza wan hilda [lê], çûne. Xilaz bûne, çûne.”

Dîya wan e mezin dikene. Kurê wê dibînin:

“Dayê, ti bi çî dikenî?”

[Dayîka wan] dibê:

---

808 ) Binhêre.

809 ) Vebûn.

810 ) Lê, lê belê.

811 ) Careke din, dîsa.

812 ) Deng.

813 ) Hewş.

814 ) Şop, rêç, şûn, dews.



“Qe, kurê mi.”

[Kurên wê] dibê:

“Wê sê hev kihêlê me hatne dizînê. Derbe l’ me ket. Kes heta niha dizya me nekiryê, neketye olşa me.”

Dîya wî dîsa dikene. Kurê wê yî mezin dibê:

“Dayê, meznaya xwedê kim, yan tê mi ji ewladiya xwe ret<sup>815</sup> kî, yan tê mehna vê kena xwe ji me ra bêjî.”

[Dayîka wan] dibê:

“Kurê mi, dizê we hova<sup>816</sup> mala we da, bavê we ye.”

[Kurên wê] dibê:

“Ça bavê me ye?”

[Dayîka wan] dibê:

“Welleh, billeh, tilleh, bavê we destekî<sup>817</sup> kirye [ku] ev hersê kihêlê we dane birine. Bavê we idî nikare here dizyê bike. Rastî diza hatye, pê ra bûye heval.”

Zarê wî dizvirne ser. Diçin destê wî paç dikin, dibê:

“Bavo, tişteki ha<sup>818</sup> heye?”

Îja Cîhangîr dizvire, mesela wan hersê xorta, ji zarê xwe ra dibêje, dibê:

“Kurê mi, mi zehf jarî dîtye, zehf belengazî dîtye, zehf tinebûn dîtye. Ez zehf ketime rabûme. Sê xortne delal bûn, hatibûn ji Serhedê. Hatin li mi qesidîn. Mi nanê xwe, ava xwe da. Mi çiqqa jî nesîhet li wana kir qebûl nekirin. Dilê mi pê şewitî. Kurê mi, mi sê hev kihêl da, hildan birin.”

[Kurên wî] dibê:

“Ê bavo, te daye canê te sax be. Tişte jî nake.”

Zarê wî diçin destê wî paç dikin.

Yanî eva mesela hanê, hinekî tê da abartilî<sup>819</sup> hebe jî, yanî serpêhatîk e, bûye. Hema çiqqa hatye mezikirinê, çiqqa nehatye mezinkirinê, em ewê nizanin. Di welatê Serhedê da mêrê isa hebûne. Yanî camêrê isa jî hebûne. Merdê isa jî hebûne. Çîroka me vira da ret<sup>820</sup> dibe.

ÇÎROKBÊJ:MIHYEDÎNÊ MECÎDÊ GOZÊ, HERÊM: BAYÎZDAXA [NAVENDA EBEXÊ/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 68, PERWERDE: NEXWENDE

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 10/10/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

815 ) Xilaskirin, kutakirin.

816 ) Ha, aha.

817 ) Alîkarî, harîkarî, yarmetî.

818 ) Wiha.

819 ) Zêderoyî.

820 ) Xilas, kuta.

## 5. ÇÎROKA EYBEZÊ XAZ, KURÊ HIRÇÊ, NEBYÊ PAŞÊ [PAŞAYÊ MISRÊ]<sup>821</sup>

Dibê paşak hebûye. Qîzeke wî hebûye. Dibê qîza wî hema isa xwe ra hundir da bûye. De îja paşa bûye. Qîza wî derneketîye derva, negeryaye. Dibê qîza wî hema isa di oda xwe da bûye. De merivê maqûlê berê hema isa qîzên wana hundir da bûne. Rojek, dudu, sisê derbas dibin. Qîza wî rojekî dêna xwe didê, qefle qîz hatin ber bîna bavê wê ra derbas bûn. Gazî qîza xwe dike, dibê:

“Qîzno qîzno, hûne herne ku?”

[Qîz] dibêjin:

“Em ê herne kavilyê<sup>822</sup>. Em ê xwe ra herne seyrangêhê, xwe ra herne kêfê-heneka.”

[Qîza paşê] dibê:

“De neçin. Ez ê bavê xwe ra bêjim, bira bavê mi îzna mi bide. Ez ê jî bi we ra werim.”

Xulam, xîzmetkar, pêşekarê navmalê, berdestîyê navmalê dişîne cem bavê xwe, dibê:

“Bira îzna mi bide. Ez ê jî bi qîza ra herme kavilyê, herme seyrangê.”

Dibê qîz disekinin. Dibê xizmetçî diçne cem bavê wê. Dibê bavê dibê:

“Heyran, qîza mi, hinde sal e tu derneketî neçûyî. Ka tê ça herî?”

[Qîza paşê] dibê:

“Tu îzna mi bidî ez ê herim.”

Em bêjin, de jê ra mesref dike. Hazirlix<sup>823</sup> seyrangêhê çî hebe jê ra daytîne. Qîzîk digijê qîzîka xwe ra diçe kavilyê, kêf-heneka dikin. Nanê wan be, izgara wan be, çî be, xwe ra ser kaniyê çêdikin, duxin. Nêzkê êvarê hev ra xeber didin, dibê:

“Em ê paytûna xwe sîyar bin herin.”

Qîz hinekî li dûrî yêra<sup>824</sup> xwe dikevin, dûrî seyrangêhê dikevin. Qîza paşê dibêje:

“Peee! Mi kembera xwe ya zêr wê yêra seyrangêhê hîştîye.”

Qîz dibêjin:

“Em ê herin.”

[Qîza paşê] dibê:

“Na, na. Hûn hema li vira du deqa li hêviya mi bisekinin. Ez ê penc deqa da herim hildim werim.”

Qîzîk diçe kembera xwe hildide. Hema hirçek lê derdikeve. Qîzîkê digre davêje ser milê xwe. Qîz û şivan dine pey, dibê:

“Hola ha hola, hola ha hola!”

---

821 ) Ev çîrok li gorî devaoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

822 ) Seyrangêh?

823 ) Hazirî, amadekarî.

824 ) Cî, cih, der.

Hirç, qîzikê hildide, dikeve kirrekî<sup>825</sup> mîtani<sup>826</sup> vî kîrre me ye Tendûlekê. Millet hewariyê dine paşê, dibê:

“Hal-hewalê iha ye. Hirçê, qîza te a bi vî terî hilda bir. Wiha ye.”

Paşa dibê:

“Heyran, qîza mi hinde sal bû hundir da bû. Dervedikete tavê, dervedikete gezyê<sup>827</sup>. Îro derket. Dêmekî<sup>828</sup> ew jî qedera wê da a iha bûye. Helbet eva pêşya wê bûye.”

Bira qîzik xwe ra here. Paşa bira idî xwe ra ax û ox ke. Em werne hirçê.

Hirç, qîzekê hildide diçe. Eger şikeftêkî be, eger talanê wê be, kûla wê be, çi be, xwe ra dixê kûlê. Qîzikê xwe ra dike jina xwe. Idî diçe goştê pêzê xav tîne dide qîzikê. Birê xwe ra bêjim, qîzik duxwe. Idî kincê ser qîzikê diqetin. Hingî qîzikê dialêse pûrt ‘eynî isa bi qîzikê va tê. Qîzik ‘eynî nutanî<sup>829</sup> hirçê dibe. ‘Eynî dibe hirç.

Hirç zangekî<sup>830</sup> dide ber derê kûlê, diçe digere. Jin e, hurmet e, yê ça derê kûlê veke? De hundirê kûlê da nin, tariyê da nin, dernakevin. Hirç nahêle derkeve derva. Sîtavkek davêje hundirê kûlê.

Qîzik diwelide jê ra kurek dibe. Kurê wê êpê mezin dibe. Idî şeş-hevt salî dibe, idî deh salî dibe. Idî em bêjin wî çaxî bi sal û zemana, niha jî bi zar û zimana tê gotin, em nizanin. Gede mezin dibe. Rojek, dudu, sisê, meh, sal derbas dibin. Gede dibêje:

“Dayê, eva çî ye? Em hema hundirê vê kûlê, ber pirtî sîtavkeke davêje hundir da nin. Eva çî ye davêje hundir?”

[Dîya wî] dibê:

“Lawo, dunyaya rehnayî heye. Ez qîza paşê me. Iha bi vî terî hirçê ez iha girtim, iha anîm, iha kirim.”

Idî xort e. Idî benge-benga gede ye, dibê:

“Dayê, wellehî ez ê derkevme dunyaya rehnayî.”

[Dîya wî] dibê:

“Lawo, hirç yê were me bikuje.”

[Kurê wê] dibê:

“Na, îmkan tine ez ê derkevîm. Wellehî ez ê derkevîm.”

Qîzik dike nake bi gede nikare. Gede destê xwe dide zangê<sup>831</sup>, zangê ber kûlê davêje. Ew bi cîya xwe derdikevne derê malê. Xwe ra şîherê Misrê sêr dikin, hewayê sêr dikin, rehnayê sêr dikin. Dibe

825 ) Çîyayên volkanîk.

826 ) Mîna.

827 ) Ger û geşt.

828 ) Nexwe.

829 ) Mîna.

830 ) Kevirên pir mezin.

831 ) Kevirê mezin û qerase.

êvar. Êvar ser wan da tê, dikevne hundirê kûlê. Idî kevir jî cake<sup>832</sup> nade ber devê kûlê da.

Êvarê hirç tê. Dibe mirremirra hirçê. Hirç li dora jinikê diçe û tê. Lepekî li jinikê dixê. Gede li hirçê dixê, hirçê dikuje. Idî çi terî dikuje nizanim, hirçê dikuje. Ew, cîya xwe destê hev digrin, bira werne şîher. Tê, dibe hokehokê şivana, holeholê şivana. Nizanin jinik e, zara wê ye. Dibên:

“Ha hirç hat! Ha hirç hat! Iha hirç! Hirç in!”

Gazî şivana dike, gazî bexbana dike, dibê:

“Kuro, em hirç nînin. Ez qîza paşê me. Filan-bêvan.”

De yê direvne cem paşê, mizgînîyê dide paşê. De berê kulavê şivaniyê hebûn e. Paşa kurkê xwe lê dike. Yê hewaryê dide gund. Şivan, qîzikê hildidin. Tînin, têne mala paşê. Paşa, qîza xwe dibîne. Dibêje paşê, bavê xwe ra dibêje:

“Eva jî nebiyê te ye. Hal-hewalê hirçê a iha ye, bi vî terî ye.”

Paşa, qîza xwe dibe ser hekîmekî. Em bêjin idî bi îlac be, bi çi be, wê pirça wê tiraş dike, hildide. Qatek kinc li qîza xwe dike, qatek kinc li nebiyê xwe dike. Rojek, dudu, sisê derbas dibin. Rojekî gazî meclisa xwe, cema’eta xwe dike, dibê:

“Werin, ez ê navê nebiyê xwe lê kim.”

Rûsipîyê wî, wezîrê wî dibê:

“Paşa, tu xaş bî. Em ê hema navê nebiyê te lê kin; Eybezê Xaz, Kurê Hirçê, Nebiyê Paşê.”

Isa xwe ra meh, sal derbas dibin. Eybezê Xaz rojekî ji kalkê xwe dixeyîde. Idî ez nizanim seva çi dixeyîde. Radibe hespa xwe li sîyar dibe, terkedinya dibe diçe. Kirrekî<sup>833</sup> xîk î xalî dikeve pêşyê, xwe ara dikevê diçe. Xwe ra hema isa şev diçe roj diêwire, şev diçe roj diêwire. Diçe rastî merivekî tê, dibê:

“Tu kê yî?”

[Ew meriva] dibê:

“Welle ez stêrnaz im.”

[Eybezê Xaz] dibê:

“Tu ça stêrnaz î?”

[Ew meriva] dibê:

“Welle navê mi stêrnaz e, ez stêrka naz dikim.”

[Eybezê Xaz] destê biratîyê didê, dibê:

“Tu nabî birê mi?”

[Ew meriva] dibê:

“Ez bibme birê te.”

---

832 ) Dîsa, careke din.

833 ) Çîyayên volkanîk.

Li vira destê biratiyê didne hev, dibne destebirakê hev. Diçin. Herdik<sup>834</sup> xwe ra zengîyê xwe dikutne hev, diçin. Diçin, rastî gencekî tèn, dibên:

“Tu kê yî?”

[Ew genca] dibê:

“Ez Qeyaz im, navê mi Qeyaz e.”

Ew jî destê biratiyê dide wana, dibne hevalê hev. Ew hersêk<sup>835</sup> xwe ra qederekî tev diçin. Em bêjin ça ji Wanê herne Erdîşê, isa xwe ra diçin. Cîkî xwe ra diêwirin. Ew cî dibe êwra wana. Xwe ra lê rûdinên, radizên, radibin, dibên:

“Yalniz<sup>836</sup> em ê şevê nobeta hev bigrin. Şevê yek me yê nobetê bigre.”

Dibê ew şev nobeta stêrknaz bûye. Stêrknaz xwe ra nobeta xwe digre. Xwe ra agirê xwe şuhle dide heta sibê. Dibê sibetirê jî sira<sup>837</sup> Qeyaz e. Qeyaz jî nobeta xwe digre heta sibê. Sibetira dinê [Eybezê Xaz] dibê:

“Bira, îşev dora min e?”

[Herdu hevalên wî] dibên:

“Erê welle îşev dora te ye. Em ê pêş te va bigrin.”

[Eybezê Xaz] dibê:

“Na. Hevaltî başqe<sup>838</sup> ye, biratî başqe ye, nobet başqe ye. Ez ê nobeta xwe bigrim.”

Ew şev sira<sup>839</sup> Eybez bûye. Eybez nobeta xwe digre. Xwe ra agrê xwe şuhle dide. De hema isa kalkê wî, cîya wî dikeve bîrê. Hema isa xwe ra dalmîş<sup>840</sup> dibe, agrê wî ditemire. Radibe, dêna xwe didê, agirê wî temirye, dibê:

“Welle birê mi yê bêjin Eybez tirsyaye, razaye, agir temirye. Ez rabim ça bikim?”

Dikeve wan dera xwe ra digere, dibê:

“Ka ez ê agir li ku bûlmîş<sup>841</sup> kim?”

Digere. Dêna xwe didê, dû-agirek li cîkî radibe. Radibe, xwe li ber wî agrî wî dûyî digre diçe. Dêna xwe didê, pîrekî kuçikê xwe dadaye. Pîrê sîtelek daye ser da. Dehnîya<sup>842</sup> dikelîne, savar dikelîne. Dêna xwe didê, hema goştê însîn e. Yanî ‘eynî nûtani<sup>843</sup> goştê pêz e [lê] goştê însîn tev da ye. Dibê:

“Pîrê, agrê me temirye. Ez hatime hine agir.”

---

834 ) Herdu.

835 ) Her sê.

836 ) Lê, lê belê.

837 ) Dor.

838 ) (Ya/yê/yên) din, dî.

839 ) Dor.

840 ) Ponijîn.

841 ) Bînîn, dîtin.

842 ) Dan, dehlûdan.

843 ) Mîna.

[Pîrê] dibê:

“Lêxe here. Çil hev kurê mi dera hanê razane. Rabin yê pirtikê te guhê te da bînin.”

[Eybezê Xaz] dibê.

“Kurê te li ku derê ne?”

[Pîrê] dibê:

“Kurê mi a li dera hanê razane. Ez jî nanê wan çêdikim.”

[Eybezê Xaz] radibe, dibê.

“Li ku derê ne?”

[Pîrê] dibê:

“A li filan derê ne.”

Diçe, nav wan da xwe dirêj dike. Radibin, hev dijmirin. Dêna xwe dinê, çil bûn, bûne çil yekî. Hesp dijmirin. Hesp çil bûn, bûne çil yekî. Şûra dijmirin. Şûr çil bûn, bûye çil yekî. (Eybezê Xaz) xwe nav wan da dirêj dike. Radibin, dibên:

“Tu kê yî? Tu isa bêminnet ketî nava me? Xwe eşkere bike.”

[Eybezê Xaz] dibê:

“Ez im.”

[Kurên pîrê] dibên:

“Tu ti Eybezê Xaz, Kurê Hirçê, Nebyê Paşê yî tu isa bêminnet hatî ara me da razayî?”

[Eybezê Xaz] dibê:

“Erê, ez Eybez im.”

[Kurên pîrê] dibên.

“Wextê tu Eybez î, em çil hev in, çil çemlê<sup>844</sup> vê sîtilê heye. Her yekî me çemilekî digre. Em paşê daytînine ‘erdê. Tu Eybez bî, tê vê nivçê tenê hildî daynî.”

Dibê nivçê<sup>845</sup> hildide daytîne ‘erdê. [Kurên pîrê] dibên:

“Haza, tu Eybez î.”

Radibe agirê xwe ji wan dixaze, dibê:

“Ez ê herim.”

Hine agir hildide tê. Agrê xwe cake<sup>846</sup> şuhle dide, agrê xwe dadide. Idî şeveq ser wan da tê. Ji birê xwe ra bêjim, birê wî radibin. Taştêya wana, ça wana hazir dike, duxwin.

ÇÎROKBÊJ: HARÛNÊ ZAVA, HERÊM: GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 44, PERWERDE: DIBISTANA SERETAYÎ

DÎROK: 23/09/2016, BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

844 ) Destik.

845 ) Sîtil, beroşên mezin.

846 ) Dîsa, careke din.

## 6. ÇÎROKA FATMAYÊ<sup>847</sup>

Hebe nebe rehme li dêbavê hazira be.

Eva çîroka ya Fatmayê ye. Navê qîzikê Fatma bûye. Fatma jî, cîya<sup>848</sup> wê bûye, bavê wê bûye, Fatma bûye. Cîya Fatmayê hebûye. Bavê Fatmayê jî diçe ber dêwêr, diçe ber dewarê gund. Cîya Fatmayê dimre. Çêlekeke cîya Fatmayê hebûye, çêleka cîya Fatmayê dimîne. De îja cîya Fatmayê zehf zani bûye. Wextê ku cîya Fatmayê (yê bimire) dibêje Fatmayê, dibê:

“Ez ê bimrim, çêleka mi yê bimîne. Jinbavê zehf serê te bike. Bavê te jî li ber dêwêr e lê, çêleka minê jî bimîne. Wextê ku bavê te zewicî jinek anî, yê isa bayîsiyê<sup>849</sup> bike yê çêleka mi şerjê ke.”

Fatma dimîne, bavê wê dimîne. Mêrik radibe diçe ber dêwêr. Mêrik dizewice, jinekî xwe ra tîne. Lê jinbav zehf serê Fatmayê dike. Ça dike ça nake, dibê:

“Ez ê çêleka cîya Fatmayê bime şerjêkirinê.”

De îja çîrok in da, çêlek jî mûtanî<sup>850</sup> zarekî bûye. De çêleka dîya Fatmayê zehf aliyê Fatmayê dike. Çêlek bi xwe dibêje Fatmayê, dibê:

“[Jinbav] yê mi şerjê ke, yê bide şerjêkirinê. Yanî yê qestîka pîlanekî jî bike, yê mi bide şerjêkirinê. Ez ê goştê xwe lê isa bikim, ez ê lê têxme jehr. Ez ê postê xwe isa lê biçivînime hev, ez ê hestîyê parxanê wê hemûkî bişkênim, neşkestiye ez ê hemûkî bişkênim. Tu hestîyê mi pirtîkî jî navêjî. Tê hestîyê mi hemukî têxî torbekî, tê biherî afir da çehl kî. Tê isa bikî, tê ro bi ro herî destê xwe ser wan hestîyê mi da bişoyî. Hetanî mehekî, tê hema isa herî destê xwe ser wan hestîyê mi da bişoyî. Wextê meheke mi tamam bû, tê herî hestîyê mi derxî ka hestîyê mi bûne çi? Tu wana nîşanî kesekî nakî!

[Jinbav] radibe, hine nanê hişk dixê ber pêşîra xwe. Wextê mêrik li ber dêwêr tê, darekî didê, darekî lê dixê, jinbava Fatmayê dibêje mêrê xwe, dibê:

“Te parxanê mi şikênand. Dengê parxanê mi hate te? Tê çêleka dîya Fatmayê şerjê kî, tê postê wê bikşînî mi.”

Hema ew çêleka wan tenê bûye. Mêrik jî gavanê gund bûye. Mêrik dibêje jinikê, dibê:

“Ka em in eva çêleka ye. Ka em îdara xwe pê dîkin. Ka ez ê ça şerjê kim?”

Jinik dibê:

“Na, tê şerjê kî.”

Hema isakîne<sup>851</sup> tîne şerjê dike. Goştê wê li hemûka jehr e, li Fatmayê şîrîn e. Fatma ewî goştî

847 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

848 ) Li Ebexê û li derdorê Ebexê ji bo bilêvkrina û gazîkirina dayîkan peyva ‘*dayîkê an jî dîya min*’, peyva ‘*cîya min*’ tê bikaranîn

849 ) Fêl û fût, dek û dolab.

850 ) Mîna.

851 ) Wisî.

hemûkî duxwe. Pey hestîya jî dikeve. Hestîya hemûkî top dike, dixwe torbe. Dibe afir da çehl dike. Her ro her ro diçe destê xwe ser da dişo, tê.

Hema isakîne mehekê wê tamam dibe. Diçe wan hestîyê xwe derdixe. Dêna xwe didê, ew hestîyana hemû bûne zêr, bûne şimikê zêr. Qîzik, wan torbê xwe yê zêra hildide tê, vedişêre.

Li gund da dehwater çêdibe. Jinbava wê radibe torbe garis li nava malê belav dike. Sîtilekî jî datîne ser tendûrê. Jinik bi qîza wê va, jinbava wê bi xûşka wê va, radibin diçe dehwaterê. Fatma jî zehf bedew bûye. Rikê jinbava wê zehf li Fatmayê tê, dibêje:

“Fatma, em ê herne dehwaterê. Evê sîtîlê ez ê daynime vê derê, ser tendûrê. Tê isa bigrî hetanî te tijî hêsir kir. Tê evî garisî jî li nava malê libo-libo berav<sup>852</sup> kî, hetanî em li dehwaterê tên. Heta ez bi qîza xwe va em li dehwaterê hatin. Tu nekî em ê te bikujin.”

Dîkekî cîya Fatmayê jî hebûye. Dîkê [cîya] Fatmayê tê dikeve nav wan garisa. Hemûkî libo-libo berav dike. Jê ra dixwe torbe. Torbe datîne wê derê. Fatma isa digrî, isa digrî, isa digrî. Ancax du hêsir dikeve sîtîlê nakeve sîtîlê, dibê:

“Ka ez ê ça b’kim?”

Pîrek tê ser kulekê. Pîrik jî sêrbaz bûye. Zehf hij Fatmayê kiribûye, dibê:

“Fatma, tu çima digrî?”

[Fatma] dibê:

“Welle hal-meselê jinbava mi a iha.”

[Pîrê] dibê:

“Qîza mi, tu negrî. Dîkê cîya te eva garisa te ra berav kirye. Ez ê jî werim hêsirê te çêkim heta jinbava te tê. Tu du debo av bîne. Tu torbe xwêy bîne. Ez ê hêsirê te çêkim.”

Pîrê tê, ewî hêsirî çêdike. Pîrê jî zane ye, da. Pîrê dibê:

“Mi hêsirê te çêkir. Te garis jî berav kirye. Rabe, zêrê te zehf in. Tê zêra bînî. Cêveke xwe jî tijî zêr kî, cêveke xwe tijî xwêy kî. Tê herî nava dehwaterê. Jinbava te [û] qîza wê li ku rûniştîbin, tê ewê xwêya cêva xwe li nava çehvê wana bireşînî. Tê cêva zêra jî li nava koma-cima’eta dehwaterê bireşînî. Tê isa werî. Tê zêr-zîvî xwe derxî. Kincê xwe li xwe kî, rûnê. Bira jinbava te şikê nebe te.”

Fatma jî zehf bedew bûye. Fatma radibe, xwe serdanpê zêr-zîv dike. Şimka xwe ya zêr pê dike. Radibe diçe dehwaterê. Dêna xwe didê, jinbava wê (û) qîza wê li ku runiştîbin, ewê (xwêyê) li nava çehvê wana direşîne. Ewê cêva xwe ya zêra jî li nava govendê direşîne. Lê dide direve tê. Pîre ça ku gotye, Fatma jî isakîne<sup>853</sup> dike. Fatma direve tê. Şimka Fatmayê dikeve bîra kurê paşê.

Qîzik direve tê. Kinc-mincê xwe hêmûkî derdixe. Xwe ra rûdinê. Dibê jinbava wê wana tên. [Fatma] dibê:

“Jinbavê tu hatî?”

---

852 ) Berhev.

853 ) Wisâ.



[Jinbav] dibê:

“Welle em hatin. Yeke eynî nûtani<sup>854</sup> te ye bextewar hat. Cêva xwêyê nava çehvê mi, qîza mi reşand. Cêva zêra jî nava govendê reşand.”

Fatma jî dibê:

“Na, ez çima bextewar im. Ez jî wê belengazek im. Mi jî eva garisa sibe da hemû libo-libo berav<sup>855</sup> kirye. Mi eva sîtîla tijî hêsir kirye.”

[Jinbav] dibê:

“Lê, isa ne?”

[Jinbav] radibe, dibê:

“Ez ça b’kim, ça nekim?”

[Jinbav] dibêje mêrê xwe, dibê:

“Tu naçî ber dêwêr. Fatma yê here dêwêr.”

Fatmayê dixê dêwêr. Fatma diçe ber dewarê gund. Torbe hirîya a iha jî dide Fatmayê, dibê:

“Tê biherî bişkinî, birêsî, mi ra bînî werî.”

[Fatma] radibe diçe isa digrî, dibê:

“Ka ez ê evê ça xav kim? Ez ê ça birêsim? Ka ez ê çakîna<sup>856</sup> bikim?”

Dêna xwe didê, wê ew pîra hatibû ser kulekê, ew pîra dîsa hate cem. Pîra sêr, dibê:

“Tu were, çêlekek nava dêwêr da ne. Bira çêleka mi [hirîyê] biçû, bêmehne tu jî ewa [qûna] çêlekê ra bizê, derxe.”

Çêlek jî ya pîrê ye. Welle çêlek diçû. Ew du torbe hirî hemûkî li çêlekê xav dike, dirêse, hildide tîne. [Fatma] dibê:

“Welle, mi hova<sup>857</sup> hildaye aniye.”

Carek isa, dudu isa, sisê isa, dide Fatmayê. Fatma hemûkî dişkine, dirêse, hildide tîne. (Jinbav) dibê:

“Mala te! Iha dêna xwe bidê, ez evê torbê hirîyê dimê, ber dêwêr e jî, dibe hemû dişkine, dirêse, hildide tîne.”

Rojekî isa, du roja isa, sê roja isa. [Rojekî] kulîke<sup>858</sup> a iha jî dide qîza xwe, qîza xwe jî pê ra datîne, dibê:

“Te yî! Fatma ça dişkine, dirêse! Tu jî pê ra here xwe ra hîn be.”

De îja [Fatma] isa qîzikê arxayîn<sup>859</sup> dike, dibê:

---

854 ) Mîna

855 ) Berhev.

856 ) Çawa

857 ) Li Ebexê û li devdora Ebexê da li şûna peyvên ‘ li vir, li vê derê’ peyva ‘hova’ tê bikaranîn.

858 ) Giloka hirîyê.

859 ) Dilrihet, dilasan.

“Pîrê yê were, çêlek yê biçû, ez ê evê hêmurî birêsim? Ez ça b’kim?”

Qîzik tê. [Jinbav] qîza xwe dikute, dibê:

“Tu angorî Fatmayê nabî? Fatmê eva sê roj e evana hemûkî dişkine, dirêse, tîne. Tu jî nikarî evê bişkinî, birêsi?”

[Qîza jinbavê] dibê:

“Welle ez nikarim.”

Ewa kulîya hirîyê ya qîza jinbavê jî, ba dibe di kuleka pîrê da, ew pîra isa Fatmayê ra dibe yardimcî<sup>860</sup>, dixê xarê. [Pîrê] dibê:

“Welle ez çi b’kim, ça b’kim, ça nakim?”

Pîrê, hema haşa [wê kulîyê] dike xirkerekî, a vira wê va [nehtikê va] datîne, qîza jinbavê isa ‘elewat dike. Hemû, tiranê xwe li qîzîkê dîkin, dibê:

“Eva çima ha bûye?”

Cîya wê tê, dibê:

“Tu çima iha bûyî?”

[Qîzik] dibê:

“Welle, kulîya mi bayê birye, kulekeke pîrê da xistye xarê. Ez nehiş ketime. Ez nizanim ez çakîna<sup>861</sup> bûme?”

Jinik radibe tê, dibêje:

“A de îja dêna xwe bidê, xwedê îja eva jî pê va danye. Îja qîza mi iha kirin.”

Fatma jî isa bedew e, tu qêmiş nakî li Fatmayê binhêrî. Çi dîkin çi nakin bi Fatmayê nikarin.

Idî em herne mala paşê. Hespê paşê diçe ser bîrê, here avê. Dêna xwe dinê, ew şimka Fatmayê [ya ku] dikeve bîrê, li rewnaqya wê şimkê, hesp lê disilikin, lê direvin. Tînin xoznebera<sup>862</sup> davêjne binê birê, derdixin. Dêna xwe dinê, wê şimikeke zêr binê bîrê da ne. Kurê paşê dibê:

“Hûn ê evê şimkê nava şîherê bavê mi bigerînin. Eva şimka lingê kê ra bû hûn ê ewê mi ra bixazin. Kita vê şimkê jî niha heye.”

Radibin, ewê kitê li nava şîherê paşê digerînin. Lingê yekî ra nabe. Yê mezin e, yê piçûk e, nabe. De îja jinbav dizane, da. Jinbav radibe, qîza xwe dixemilîne dide ser mînderê. Fatmayê jî goreke galik didê dêst, dixê hindirê tendûrê, teyştê li ser da deverû dike, dibê:

- Fatma zehf bedew e, belkî ya Fatmayê be jî.

Wextê tînin dixê lingê qîzîkê, dêna xwe dinê, a hinde lingê qîzîkê ra piçûk hat. Lingê qîzîkê ra nabe. [Jinbav] pey dikeve, dibê:

“Bavo, were lingê qîza mi ra dibe.”

---

860 ) Alîkar.

861 ) Çawa

862 ) Noqav, noqkar, xewas, qewas.

[Xizmetkar] dibê:

“Na heyran, lingê qîza te ra nabe.”

Dîkê cîya Fatmayê jî radibe xwe dide ser xênî. De dîk dizane, da. Dîk bang dide, gazî dike, dibê:

“Qîq la qîq, Fatma nebîya tendûr e, nexşê gorê elin de<sup>863</sup>.”

[Xizmetkar] dibê:

“Kuro were Fatma li tendûrê da ne.”

[Jinbav] dibê:

“Hîî, kişê kişê, mîratî. Hûn jî guh dine vî heywanî.”

Dîk parra dû wan dikeve, pey wan dikeve, dibê:

“Qîq la qîq, Fatma nebîya tendûr e, nexşê gorê elin de.”

Mêrika dizvirin tèn, dibê:

“Welle, Fatma li tendûrê da ne.”

Tên, derî vedikin. Dêna xwe dinê, wê Fatma hindirê tendûrê da ne. Fatma isa bedew e, tu qêmîş nakî li Fatmayê binhêrî. Tên destê Fatmayê digrin, derdixin, dibê:

“Hal-mesele çî ye?”

[Fatma] dibê:

“Welle jinbava mi ez kirme tendûrê.”

Şimikê tînin dixne lingê Fatmayê. Şimik jî ya Fatmayê ye, tam lingê Fatmayê ra dibe. Diçin dibêjne kurê paşê, dibê:

“Welle, em li nava şîherê bavê te geryane. Lingê kesîkî ra nebûye. Lingê qîza gavên ra bûye.”

[Kurê paşê] dibê:

“Hûn ê herin destê wê mi ra bigrin.”

De îja ew [jinbav] jî, qîza xwe jî, zehf çehvreşîyê lê dîkin, zehf dexesîyê lê dîkin. De îja, zêr-zîvê Fatmayê jî zehf in. Radibin destê wê digrin, dixne def-zirne, bûkê sîyar dîkin. Bûka paşê sîyar dîkin. Bûkê dibin.

Qîza jinbavê radibe diçe mala paşê. Em bêjin Fatma diçe dikeve banyoyê. Jinik (jinbav), dê îja ew jî dizane, dibêjê:

“Tu ça bikî ça nekî, tê îşkilekî binî serê Fatmayê.”

Fatma diçe himamê. Qîzik jî li wê derê ye. [Fatma] radibe, dibê:

“Ca xawlîkî bide mi.”

Qîza jinbavê, Fatmayê dehf dide davêje. Fatma dîsa ‘eynî diçe dikeve wê bîrê, wê bîra şimka wê tê da bû.

De îja qîzik jî radibe, kincê Fatmayê, ew zêr-zeberê Fatmayê hemûkî li xwe da dike. Kinca li xwe dike. Laçikê dide serê xwe. Xwe girê dide. Xwe dide wê derê.

---

863 ) Di dêst da ye.

Pîrê, isa ew ‘etab kirye, de îja qîzik zehf ‘elewat bûye. Em bêjin, bêmehnî xirkerek hema isa vê dera wê [nehtika wê] va ye. Hema isa xirte-xirta wê ye jî, duxwe. Kurê paşê tê, dêna xwe didê, xeberdana Fatmayê ya her ro li ku? Xeberdana îro li ku? Dibê:

“Tu çima mi ra xeber nadî? Fatmaya her ro li ku? Tu îro çima isa dikî? Te çima isa çehv-devê xwe girê daye? Tu çima xwe nîşanî mi nakî? Tu her ro li ku bûyî? Îro li ku yî?”

Ew jî hema isa xirkera wê li vira [nehtikê] va ne. Hema isa xirte-xirta wê ye, xwe ra hema isa duxwe. [Kurê paşê] dibê:

“Ew çî ye?”

[Qîzik] dibê:

“Welle qe çî ye. Welle hine qeynekê kevirgir in. Cîya mi, mi ra şandye ez duxum.”

Rojekî isa, duduya isa, sisîya isa. Hespê paşê dîsa diçe ser bîrê. Hespê paşê dîsa disilike. Xwe xar dikin, dêna xwe dinê, wê merivek tê da ne. Wextê ku [derdixin], Fatma dibê:

“Tişte bi mi nehatye. Hûn bine xatrê xwedê, hûn ê hema kincekî bînin, ez ê li xwe da kim, hûn mi derxin.”

Derdixin, dibêje:

“Hal-meselê mi a ihakîna<sup>864</sup>.”

Radibin hespekî tî dikin yekî birçî dikin. Welle, hespek xwe valî didê, yek xwe walî didê. Qîza jinbavê ortê da çiq dikin. Qîza jinbavê di wir da dikujin.

A welle gede û Fatma jî bi mirazê xwe şa dibin. Hûn jî bi mirazê xwe şa bin.

ÇÎROKBÊJ: AMOJNA SUHBET

HERÊM: JI GUNDÊ ŞEREFXANÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJÊ: 45

PERWERDE: NEXWENDE

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 20/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

## 7. ÇÎROKA GUL SEYÎDVAN<sup>865</sup>

Ez ê ya Gul-Seyîdvan we ra bêjim. Ser çehvê mi, ser serê mi. Hûn ser çehvê mi ra hatine. Hûn misafirê min in, birê min in.

Dibê carekî hebûye cara, rehme li dê w bavê hazira be. De îja eva gotnê pêşyan in, yê berê hatine gotinê.

Dibê padişahê hebûye, du hev kurê wî hebûne. Navê yekî Gul bûye. Navê yekî Seyîdvan bûye. Gul birayê piçûk e. Seyîdvan birayê mezin e.

Dibê evan herda<sup>866</sup> davêje medresa, medresa da dixûnin. Heger ‘emrê wana tê bîst salî, heyjde sal, nozde sal. Idî tabî zeman ortê ra derbas bûye, em nizanin. Gotinê xelkê yê ku gotine, me jî jê hildaye. Dibê herda rûçkê însana nedîtye. Tek cem melayê xwe, melakî dersa van însana daye di hundur da. Rûçkê rojê, tavê, filanê, însana nedîtine. Hema isa di hundur da yaşamîş<sup>867</sup> bûne.

Dibê zemanekî aşçiyê<sup>868</sup> wana bîr dike. Goştê bihestî tu zemana neçûye pêşya wan. Nizanbûne goşt ji çi çêdike, çakî dibe. Yêmekê<sup>869</sup> wan hema isa dewamî kemîksiz et<sup>870</sup> diçe pêşyê. Dibê wexta dêna xwe dinê, tişte tevî yêmekê wan hatye. Ew herdu meriv bi hestiyê heywana dileyîzin. Xwe ra laqirdîya bi hev dikin, çi dikin. Dibê wexta ku davêjin, dibê diçe li camê dikeve cam dişkê. Îşiqek davêje orta bîna wan, oda wana ku tê da yaşamîş dibin.

Dibê herdik isa pê dileyîzin, nehiş dikevin, herdik<sup>871</sup> xwe va diçin ji şewqeta wê rehnaya ku sîtavkê avîtye hundur. Heta wî çaxî nedîtine. Heta hatine heyjde, nozde sala, ‘emrê wan bîst sal, çi, rûçkê tavê, însana nedîtine xêncî melayê xwe. Dibê bile<sup>872</sup> aşçiyê wan jî yêmekê wana nadê. Ancax melayê wan diçe hindir, dersa wan dide. Yêmekê wan didê dizvire. Kes nizane kê çi dike.

Dibê wexta ku mela derî vedike tê hindir, dêna xwe didê, herd<sup>873</sup> kurê paşê ketine. Dibê:

“Weylê agir mala mi ketî! Xwedê, paşa yê niha serê mi jê ke. Herd kurê paşê zeharlemîş<sup>874</sup> bûn.”  
Paşa yê serê mi jê ke. Valî-walî digere. Avê serçehvê wan dike. Eger çi şeklî dike, evana tene ser hemdê xwe, dibê:

“Xocê mi, pekî eva îşîqa han e avîtye hindir eva çî ye?”

[Mela] dibê:

“Qurban, roj heye, hîv heye, însan heye, şîher heye. Hûn kurê padişahan in.”

865 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

866 ) Herduyan.

867 ) Jiyîn.

868 ) Aşpêj, pêjer.

869 ) Xurek.

870 ) Goştê bêhestî.

871 ) Herdu.

872 ) Heta ku.

873 ) Herdu.

874 ) Jehrîbûn.

[Kurên paşê] dibê:

“Ê wexta ku em însan in, însan olarak<sup>875</sup> em kurê padişahan in, pekî em çima iha kirine vê derê? Xêncî te em tu kesî naz nakin. Em tu kesî nizanin.”

Dibê melayê wana jê ra anlatmîş<sup>876</sup> dike, dike. Werhasil, evana idî nasekinin, dibê:

“Tê herî bêjî bavê me, bira me derxe nava xelkê. Em jî însana naz kin. Em jî tevî toplima<sup>877</sup> bin. Em jî şîherê bavê xwe naz bikin. Xelk jî me naz bike ku em kurê padşêh in. Em anîne kirine vê derê. ‘Emrê me hate bîst salî. Eva ‘edaleta xwedê nîne.’”

Dibê eva diçe dibêje padşê. Padişah dibêje:

“Temam. Herd kurê min hatine çaxê zewacê jî. Derxe, qey malê mi tune. Derxe filan bîna min. Bira kurê min herin xwe ra bigerin, kêf kin, buxin. Mala mi zehf e, xezîne-defînê mi zehf in. Ez padişah im. Bira herin zarê mi xwe ra serfiraz bigerin.”

Dibê evana wexta ku derdixin diçin, dîya wana mirî bûye. Dîya wana mirî bûye. Detaylî<sup>878</sup> ku ez we ra bêjim, mexsed ku kêrî we were. Dibê wexta ku evana rojek, dudu, heger salek, çi dimînin nava însana, camêra notanî<sup>879</sup> we digerin. Şîherê xwe begemîş<sup>880</sup> dikin. Em bêjin, xwe ra diçin digerin. Rojekî, dibê tê bîra wana, dibê:

“Heyran, miheqeq em ji dêkî doxmîş<sup>881</sup> bûne. Yawo, em jî herin. Qe bavê xwe bibînin, dîya xwe bibînin. Çika eva çî ye?”

Padişah, hiz nake ku evana herin jinbava xwe bibînin. Dibê Seyîdvan birê mezin e. Gul dike nîke bi Seyîdvan nikare, dibê:

“Qurban, madem kî bavê me ku em iha hefs kirine, em iha dane îzdirabê, em ji însanîyetê gêrî<sup>882</sup> hîştine, qe te lazimî jinbava me jî nîne, qe neçe.”

[Seyîdvan] dibê:

“Na welle ez ê herim. Jinbava min e. Tu têtî tu dîzanî, tu nayê tu dîzanî.”

Dibê radibe hedîyekî goreyî padşê distîne. Berê xwe dide seraya jinbava xwe. Diçe herema paşê. Jinik, dibê dilekî na hezar dilî [dilê] jinbava wî dikeve Seyîdvan. [Seyîdvan] dibêje:

“Ez kurê te me, kurê padşê me.”

Hal hewalê xwe jê ra dibêje. Wexta ku radibe xatrê xwe dixaze, jinik dibêje:

“Wellahî tu naçî.”

[Seyîdvan dibê:]

---

875 ) Wek.

876 ) Dibêje.

877 ) Civat, cimaet.

878 ) Bi hûrgilî.

879 ) Mîna, nola.

880 ) Ecibandîn.

881 ) Ji dayîk bûn, welidîn.

882 ) Paş, dûr.

“Hey nabe! Tu dîya min î, jimbava min î, dewsa dîya mi mayî. Ez hatim ku tu mi xweyî bikî, mi naz bikî, mi bibî sahib.”

[Jimbava wî] dibê:

“Na. Tu serê xwe mi ra bixî yek tu zanî. Tu nexî yek, ez ê rabim gazî kim. Tellal bime gazîkirinê. Ez ê bêjim, kurê paşê hat tecawiz da namûsa mi, herema mi, oda mi. Derket, lêda çû.”

Dibê wexta Seyîdvan dike nake xwe jê xilaz nake, Seyîdvan li ber disekine kulmekî lêdixe. Dev diranê wê tijî xûn dibe. Eva dikeve xwe va diçe. Seyîdvanê te derdikeve, dêrî da lêdixe diçe. Diçê dêna xwe didê, birê wî dibê:

“Bira, hal hewalê dîya te, îkrama wê, me’rîfeta wê, te ra hurmeta wê bû çî?”

[Seyîdvan] dibê:

“Idî hurmeta wê weqasî dunyayê gihîşte mi.”

Jê ra nabêje. Dibê ku evana ku dikevne nava cî, herd bira isa alişmîşî<sup>883</sup> hev bûne, ayrî<sup>884</sup> ranazên. Herdik<sup>885</sup> yataxekî da radizên. Dibê wexta ku nîvekî şevê, heger si’et bibe deh, heger si’et hebe tine be, zemanê wî çaxî, dibê radibe. Eva Seyîdvan radibe ku bi rê keve here, Gul dêna xwe didê, heyran, Seyîdvan qe êvar da ranazê! Hema isa axeofa wî ye, tûfetûfa wî ye!

[Gul] dibê:

“Bira, were derdê xwe mi ra bêje. Em birayê hev in. Wexta ku herdik birayê hev in, heta niha tev yaşamîş<sup>886</sup> bûne, hîç olmasa<sup>887</sup> em derdê hev siwal bikin.”

[Seyîdvan] dibê:

“Qurban, qe derdê mi tişteq jî tine. Tine.”

Wextekî şevê, dibê Gul hişyar dibe. Dêna xwe didê, Seyîdvan nava cî da tine. Direve derê malê, hespê wî di tewlê da tine. Dibê:

“Wellahî, birê mi derdekî wî heye. Terkedinya bû, çû.”

Dibê birê piçûk, Gul jî radibe. Hespê xwe sîyar dibe. Kurê padşahan in. Hespê xwe sîyar dibe. Ew jî hema terkedinya dibe, dide pey. Rêk, di nava ormanekî da dikeve pêşyê, dibê:

“Welle heme ez ê jî vê rêyê da herim. Çika ez ku derê, birê xwe rastî tîm yan nayê?”

Dibê wextekî şeveqa sibê, Seyîdvan dêna xwe didê, dûnamek pey radibe. Dibê:

“Hebe nebe eva birê min e. Parra pey mi ketye. Weke dinê, kesekî dilşewîfî pey mi keve tine.”

Eva disekine. Wextekî dêna xwe didê, birê wî tê digîjê, dibê:

“Hey mala te bişewite! Wexta ku derdê te heye, tu çol mexela dikevî, pekî tu mi çira<sup>888</sup> dihêlî?”

---

883 ) Hînbûn.

884 ) Cuda, cihê.

885 ) Herdu.

886 ) Jiyîn.

887 ) Qet nebe.

888 ) Çima.

[Seyîdvan] dibê:

“Hal hewalê mi, jinbava mi, a iha.”

Jinbav çi b’ke? Haşa, radibe kincê xwe li xûna dev-mevê xwe dixê. Gazî dike, dibê:

“Cabê bine paşê, kurê wî tecawiz da herema mi. Ez ha rezîl kirim. Piştî xwe da mi, lêda çû.”

Dibê padişah jî bêsiwal bêciwal, dibê:

“Ha cellat, serê herd kurê mi jî jê ke.”

Evana bira terkedinya bin, herin. Dibê diçin. Zemanekî, nava ormanekî da, dêna xwe dinê, şevqê lê avît. Kurê padşahan in. Şevxûn nedîtine, zehmet nedîtine, îza nedîtine. Dibê evana diçin. Ber koka darekî, ji xwe ra hespê xwe girê didin. Gul dibê:

“Seyîdvan, ez ê nobetê bigrim tu razê.”

Gul dibê:

“Na. Îtbara mi bi te nayê. Tu êvar da ranezayî. Tu razê, ez ê nobetê bigrim.”

[Seyîdvan dibê:]

“Hay hay.”

Dibê serê xwe datîne radizê. Dêna xwe dinê, birçî bûne. Dêna xwe dinê, teyrekî hat, li ser serê darê danî. Dibê Gul tîr-kevanekî xwe ra çêdike. Dibê davêje li wî teyrî dixê, ew teyr dikeve ‘erdê. Tîne heger şerjê dike, eger bi şeklî ye, tîne dide ser kozîya êgir. Orman e. Dibê hema isa bi pûrt-mûrta wî va dikizirîne, ew dike. Dibê:

“Welle, ber mi da naçe. Ez ê deyn<sup>889</sup> birê xwe kim jî. Bira, rabe em ê tev buxin.”

Deyn lê dike. [Seyîdvan] dibê:

“Yawo, qe deyn mi neke.”

Hema çehvê digre, destê xwe digerîne. Pirtî pelçikê wî dikeve destê Seyîdvan. Seyîdvanê te qurç dike, dîsa serê datîne radizê.

Dibê ê ‘Enqa bûye. Gul, dil-hinavê ê ‘Enqa duxwe. Ew ê ‘Enqa bûye. ê ku hatye lêdaye xarye ew e. Dibê wextekî dinê xwe didê, radibin, hereket dikin, qederekî diçin. Dîsa êvar ser da tê, Gul dibê:

“Seyîdvan tu razê.”

Seyîdvan dibê:

“Ti razê.”

Dîsa bi gotna birê xwe yî mezin nake. Îtbara xwe pê nayne, dibê:

“Tu xayîn î. Tê dîsa mi cî da bihêlî herî.”

Gul dibêje Seyîdvan. Seyîdvan birayê mezin e. Gul birayê piçûk e. Yaniz<sup>890</sup> îtbara Gul bi Seyîdvan nayê.

Dibê dêna xwe dayê, wextekî dibê dêwê heftirih hebûye. Bi şeklê wan dêwa wexta ku tê destê xwe

---

889 ) Deng.

890 ) Lê, lê belê.



davêje Gul, bi hespê wî va dide ber xwe, bi hewa dikeve lêdixe diçe.

Seyîdvanê te, wira xewê da dimîne orman da. Dêwê heftirih, evî dibe davêje hindirê bîrê, davêjê<sup>891</sup>, pišta xwe didê, lêdixe diçe. Hespê wî jî berdide nava orman. Hespê wî bira here. Ew jî diçe kûlê da. Dibê kûle isa kûr e, yanê dengê a naçe hindir! Isa kûr e!

Birê wî, serê xwe sibê radike, dêna xwe didê, hespê wî ‘erd kolaye, qûmê da maye. Dibê:

“Hey mala însanê şîrê xwe mêtî keto! Birê mi bû, taymîş<sup>892</sup> nebû. Elhemdililla, ew çû gihîşte bavê xwe, dîya xwe. Xwedê qedera mi da jî aha<sup>893</sup> nivîsîye. Ez ê jî derkevim, xwe ra alîkî da herim.”

Derdikeve rasteke<sup>894</sup> notanî<sup>895</sup> vê Rasta Xaça<sup>896</sup>. Dêna xwe didê, millet hev berav<sup>897</sup> bûye. Seyîdvanê te, nizane çî mesele ye, Seyîdvanê te. Ew jî dajo nav, dibê:

“Heyran, ez ê herim çika eva êla hanê, ‘eşîra hanê çî ye? Ez ê jî siwalekî bikim. Memleketê xerîb e. E nizamim bigerim.”

Diçe. Dibê diçe. Dibê wexta ku diçe nava wana, dibê:

“Qurban, hûn çî ‘isn in çî cîsn in?”

[Cima’et] dibê:

“Kuro, tu kê yî? Kurê kê yî? Tu nizanî padşahê me mirye. Em ê xwe yî padşatîyê berdidin. Ê padşatîyê here ser serê kê dayne, usûla me isa ne, padşahê me dibe ew. Eger zane be, eger nezan be, kê dibe bira bibe.”

[Seyîdvan] dibê:

“Ê qurban, wexta ku isa ne hûn çîma mi dikutin<sup>898</sup>? Hûn çîma rikêfî mi dikin? E merivekî dewrêş im. Ez ê derkevim lêxim herim. Hûn herin teyrê xwe berdîn. Ku da diçe bira here.”

Dibê wexta ku emrê xwedê pê heb’ye, ku teyr berdidin, teyr diçe digere, digere, digereee... Tê, ser serê Seyîdvan datîne. Hinekê nezan e cahîl xwe dighînê dikutin, dibê:

“Yawo, tu dêna xwe bide vî dewrêşî. Ev j’ ku hat bû bela serê me? Teyrê me şaş bûye. Teyrê me diçe ser serê vî mervî, dewrêşê hanê datîne. Qey teyrê me, padşa di nava me da tine ne? Teyrê me şaş bûye diçe.”

[Seyîdvan] dibê:

“Ê qurban, hûn çîma mi dikutin? Mi nekutin. Teyrê xwe bigrin. Ez ê derkevim herim ji memleketê we xilaz bim. Hûn teyrê xwe berdîn. Kê we dibe padişa hûn dizanin. Ez, padşatî dûrî hev in. Ez yê padşatîyê nînim.”

---

891 ) Şikeft.

892 ) Berxwedan.

893 ) Wiha.

894 ) ‘Rast’ bi maneya ‘deşt’ê d herêma Ebexê de tê bikaranîn.

895 ) Mîna, nola.

896 ) Gundê çîrokbêj e ku li ser Ebexeya Wanê ye.

897 ) Berhevbûn, kombûn, civîn.

898 ) ‘Kutandin’ bi maneya ‘lêdanê û lêxistinê’ di herêma Ebexê de tê bikaranîn.

Hinek dibê:

“Em ê [teyr] biherne Bayîzdaxa<sup>899</sup>.”

Hinek dibê:

“Na, em ê biherne Şerefxan<sup>900</sup>. Em ê biherin pişta wan çîya da bihêlin, lêxin werin. Yawo, eva hatyê vê derê padşatîya me bike?”

Dîsa emrê xwedê pê hebûye. Sê cara teyrê xwe berdidin. Seyîdvan here kê derê teyr diçe wira, ser serê wî datîne.

Hine camêrê notanî<sup>901</sup> we, însane geryayî, dibê:

“Yawo qurban, teyrê me şaş neb’ye. Miheqeq ‘esaleteke vî mervî heye. Yawo, em ê bînin. Bira mehekî, rojekî, deh roja, bibe padşahê me. Eger me dêna xwe dayê, ‘edaleta wî zêde bû, bereketa wî j’ me ra zêde bû, hema padşahê me bira ew be. Ku wisa nebe em ê darekî lêxin bira derkeve lêxe here. Em ê dîsa teyrê xwe berdin. Kê bû padîşah, teyr ser serê kê danî, bira ew bibe padşa.”

[Cima’et] dibê:

“Hay hay. Qurban, madem kî wisa ne. Helbet ‘esalekete te, em nizanin hebe tine be, em ewê nizanin.”

Dibê wexta ku wisa dibêjin, evî dibin. Qîza padşê lê nikah dikin, padşayê mirî. Lê nikah dikin. Eva, xwe ra ser textê padşê rûdinê. Ha rojek, ha salek, ha du sal... Eva, bira idî xwe ra padşatîya xwe da bikeve.

Em werin ji Gul xeber din. Gul çi dike? Dibê dêw, dêwê heftruh e. Heftê carekî tê tilîya Gul e qilîçkê dimije, xûnê jê ret<sup>902</sup> dike. Gul dikeve xwe va diçe, dêw diçe. Heta hefta wî tamam dibe, dîsa Gul ser hemdê xwe da tê. Dêw dîsa tê tilîya wî dimije, xûnê jê ret dike. Dîsa ew dikeve, nehiş dikeve. Eva [dêw] derdikeve diçe.

Dibê em werin ji Gul xeber din. Gul, teze serê wî ketye xax-belme<sup>903</sup> giran. Ewî dinê jî xwe ra şa dibe, dibê:

“E bûme padşa. Gul jî çû gihîşte bavê mi, dîya mi, ber bêna wana.”

Ewa jî wisa dibêje. Dibê rojekî Gul radizê. Dêna xwe xwe didê, sê hev kevotk hatne ser serê darê. Darek di hundirê kûlê da ne, dibê:

“Gul, heke tu hişyar bî guhê xwe bide me.”

Di terefê xwedê da tê, dibê:

“Eger tu raza bî guhê xwe rind bide me. Dêwê heftruh tu zemana te bernade. Hetanî tu heyatê hebî dêwê iha bîne serê te. Em ê niha firr din. Sê hev perrê me yê bikevne ‘erdê. Tê bisîmillah bikî,

899 ) Navê navenda Ebexê ye.

900 ) Navê gundê Berhevkêr e.

901 ) Mîna.

902 ) Xilaskirin, kutakirin, dawîlêanîn.

903 ) Şerpeze, perîşan.

her sê perrê me hildî, li binê darê xî. Kanîkê ber te vebe, kanya avê ber te vebe. Tu bisîmilla bike, li kanye xe, kanî yê bimiçiqe. Dergekê li ber te vebe, li derî xe. Dolabek di hundurê filan odê da ne. Hevt hev cûcîk[ê ku di odê da] rehê dêwê heftruh in. Binhêre, dêw ku bi te bihise, parçê te yî mezin guhê te nahêle. Nebî nebî ku tu bidî dêw. Ti serê her hevta biqetînî, tê j' dêw xilaz bî. Ku wisa nebe xilazbûna te j' destê dêw tine.”

Dibê wexta bi emrê xwedê, Gul wisa wana dînemîş<sup>904</sup> dike, dibê evana difirrin. Gul ‘eynî bi gotina wana dike heta digîje cûcîka. Dibê serê şeş heva ku diqetîne, dêw tamarê wî qurimîş<sup>905</sup> dibin, qudûmê wî dişkên. Dêw cake<sup>906</sup> dinê wisa bihêrs dizvire, dibê:

“Gul, tu bidî xatrê xwedayê xwe, tê ewê tenê devê mi da bigvêşî. Mi tu j' ku anîbî ez ê te daynime wira.”

[Gul] dibê:

“Heyyy kafirê le’în, qe idî ez ewê jî dime te.”

Serê wê jî diqetîne. Dibê dibe nirrênîya dêw, haşa huzûra wê, di kûlê da tê xarê. Dêw direve xwe dide qulcîkekî<sup>907</sup>. Hevt roj hevt şeva, dêw ji wî qulcîkî dernakeve ji tirsê. [Gul] dêna xwe didê, heftê dêw tamam bû, dibê:

“Oylese<sup>908</sup> dêw ‘işk<sup>909</sup> bûye. Ku heftê wî tamam bû ku dêw wexta silamet b’ya, dêwê rab’ya, biç’ya yan hereketek bikira yan tilîya mi bimêta xûna mi ret<sup>910</sup> kira.”

Dibê [Gul] radibe wan dera digere. Dêna xwe didê, eger pirtî kurteşûr be, eger kasik be, eger dasik be, çi be, demirekî<sup>911</sup> dibîne. Dibê li cendekî wî xwe ra nerdewana çêdike. Pê va hildikşe. Derdikeve derê malê, [dibê]: “La îllahe îlella mihemed heq ya resûlilla.”

Eşeda xwe tîne. Radibe, valî-walî digere. Dêna xwe didê, hespê wî nava xasbaxçe da xarye w geryaye. Dibê hesp zîn gemê wî hemû pirtî pirtî kirine, avîtine wan rasta. Xwe ra diçe wan bendik-bondikê xwe tîne dide hev. Radibe terkedinya dibe. Hespê xwe sîyar dibe. Berê xwe dide, nizane yê kî alî here. Derdikeve, lêdixê diçe.

Dibê wexta ku diçe, rastî şiherekî tê. Îja şihêr çî ye? Dibê dêw li wî şihêrî misellet bûye. Bişev, mexrevê şûnda ne kes diçe derê malê, padşê yasax kirye, ne jî hildine hundur. Ji derva kê were hilnane hundur, ji hundur kêşî bernadin here derê malê. Bona dêw dora wê [şihêr] sûr kirye. Dergevan daye ber dêrî, nahêle kes here were. Bişev, mexrevê şûnda kes dernakeve nagere.

---

904 ) Guhdarî kirin.

905 ) Hişk bûn, ziwa bûn.

906 ) Dîsa, careke dîn.

907 ) Quncik.

908 ) Wisa dixuyê. Ku wisa be, heke wisa be.

909 ) ‘Hişkbûn’ hin caran bo heywanan bi maneya ‘sekitîbûn û mirarbûnê’ tê bikaranîn di Ebexê de.

910 ) Xilas kirin, kuta kirin.

911 ) Hesin.

Dibê eva diçe dora şîher digere, digere, digere, digere...Tu dergeyekî nabîne. Tê ber derî, dêrî dixê, dibê:

“Qurban, ez dewrêşek im. Çola mame, mexela mame. Derî mi veke ez werme hindir.”

Haşa ji hizûra we, [dergevan] dibê:

“Yawo, kuro kurê kerê, ti nizanî padşa ku pê bihise yê serê mi lêxe. Mervê mexrevê şûnda nayê hundir, yê hundur nane derê malê.”

[Gul] dibê:

“Qurban, ez dewrêşek im. Hema a dêrî veke ez têkevme hundur. Zirareke mi jî te ra tine.”

Dike nake dergevan merivekî zehf qetrehm<sup>912</sup> bûye, dêrî lê venake. [Gul] dibê:

“Qurban, wexta dêrî mi venakî...”

Tîne, dibê hespê xwe darê va girê dide, dibê:

“Helbet rebê ‘alemê qedera mi iha nivîsîye.”

Dêna xwe didê, wextêkî şeklê dêw [derket]. Dergevan zane, gazî dikê, dibê:

“Dewrêş, dewrêş! Gunê te yê têkeve s’îyê min. Bireve têkeve hundur. Dêw hat, dêwê te buxwe!”

[Gul] dibê:

“E gora bavê te w paşayê te nim. Wexta ew paşayê te yê kesî nikare hilde hundir, bi xwedê, ew dêw mi buxwe jî e nehatim.”

[Dergevan] dibê:

“Ê oyleyse<sup>913</sup> îja haj xwe hebe dêwê te buxwe.”

Dibê ewî kurteşûrê xwe dide ber ewê [nehtika] xwe, bisîmilla dike, hema isa dêw ewî hûf dikeee. Ewa hema isa dêw dibirre, diçe boçka dêw ra derdikeve. Dêw pirtî pirtî dike. Notanî<sup>914</sup>, haşa, qelaxê rêxê, lodê gîhê, davêje ser hev.

Dergevan ber dêrî ra dizîkava dêna xwe didê ku dewrêş lêdaye dêw kuştiye, avîtye ser hev nota<sup>915</sup> lodekî. Kurkê xwe dîsa kişandiye serê xwe, razaye.

Dergevan çi b’ke? Dergevan dibê:

“Ez ê cabê bime padşê, bekî<sup>916</sup> padşa bexşîşekî dide mi.”

Yaxa<sup>917</sup> şîherê wî ji dêw diqete. Direve. Padşê w wezîr ji hev naz nake. Wezîr jî derketîye dezmêjê.

[Dergevan] dibê:

“Padşayê mi, padşayê mi, ka mizginîya mi bide! Dewrêşekî lêda dêw pirtîpirtî kir, kuşt, avîte ser hev. Ez hatime mizginîya mi.”

---

912 ) Bêrehm..

913 ) Ku wisa be,

914 ) Mîna, nola.

915 ) Mîna, nola.

916 ) Belkî, dibe ku.

917 ) Pêşîr.

[Wezîr] dibê:

“Kuro, were vira xwe kerr ke. Ez wezîr im. Kuro, ez ê xelateke isa bime te di dinyayê da kesî nedabe kesî. Ez ê herme wilayeta Wanê<sup>918</sup> bime welî, tê jî bime berdestîyê xwe, serkatîbiyê mi. Tê îja çima herî bêjê padşê?”

Wezîrê te radibe. Diçê dêna xwe didê, Gulê te hê razaye, xewê da ne. Dibê di ser ra disekine. Heyjde xençera li nava milê Gul dixê. Dibêje dergevan, dibê:

“Kuro, torbekî-telîsekî bîne em têxnê, bihere bavêje filan çemî. Bira ew ro da here. Em ê jî hene cem padşê, xwe ra mirazê xwe ji padşê bixazin. Padşa yê me bişîne wilayeta Wanê. Ez walî, ti jî serkatîbiyê berdestê min î. Me kuştîye dêw, ewî nekuştîye. Bira inda<sup>919</sup> be. Mi kuştîye, wezîr dêw kuştîye.”

Dibê wexta ku wisa dikin, evna heyjde xencera wisa lê dixin, [Gul] birîndar e. Dibê dergevan dide pişta xwe. Dibe here derê mala Hekîmê Loqman ra derbas be. Tehjî-tûlê Hekîmê Loqma jî, haşa we, hebûne. Tehjî-tulê Hekîmê Loqma pê dihîsin, dora wî digrin. Dergevan, hema tîlê davêje derê mala Hekîmê Loqma, direve.

Bira evana hene cem padşê. Hekîmê Loqma derdikeve derê malê, dêna xwe didê, [wê telîsek li wir e]. Hekîmê Loqma jî şa dibe, dibê:

“Miheqeq ticar hatine derbas bûne. Barê deve-mevê wan e, qetyaye. Miheqeq hevirmûş e, tiştêkî entîqe ye.”

Ew jî kaş dike dibê hindir. Dêna xwe didê, gencekî ti hij-heyranî dêna xwe bidê, heyjde xencera birîndar e. Dibê dermanê Hekîmê Loqma jî, rebbê ‘alemê pê daye zanebûnê, dermanê wî noşdarî jî bi xwe xwe dileyîze, dibê:

“Ha dermanê vî gencî ev e.”

Derman dike. Eger rojek, eger salek, eger çî arê ra derbas be, idî ez serê we gêj nekim. Mexsed mi go, bira kêrî we were. Sewraxî<sup>920</sup> dibî? Ku kêrî we neyê qisa qisa<sup>921</sup> çênabe. Idî hûn ‘aciz bin jî qusûrê nenhêrin.

Dibê wexta ku [dergevan] wisa dibêje, evana diçne cem padşê. Dergevan direve, dibê:

“Padşayê mi, ka mizginiya mi bide! Wezîrê te êvar da hema wisa bendewarî dêw ketibû heta dêw hat.”

Wezîr jî nota<sup>922</sup> kelba, haşa hizûra we, ketye nava xûn-kêma dêw. Xwe gevizandîye tê da, xwe wûnê da hîştîye. [Dergevan] dibê:

“De wezîr wisa kir, dêw pirtîpirtî kir, avîte ser hev.”

918 ) ‘Wan’ weke bajarekî sembolîk hatiye bikaranîn di vir de.

919 ) Winda. Li şûna peyva ‘winda’ li Ebexê peyva ‘inda’ tê bikaranîn.

920 ) Fehm, tégihîştin, serwext.

921 ) Kurtekurt.

922 ) Mina, nola.

[Padişah dibê:]

“Hey nabe!”

[Dergevan dibê:]

“Belê, padşayê mi.”

Dibê padşa bi sola ra naghîne bi gora xwe dighîne. Dêna xwe didê, wezîr ketye nava xûnê, xwe gevizandiye. [Wezîr] dibê:

“Eheyyy, padşayê mi! Te heta niha digo, mêr di şîherê mi tine ne. Ez êvar da hema isa bendewarî wî ketibûm.”

Lafa dike w zirta dike w dibêje.

[Padişah] dibê:

“Wezîrê mi, bixaze miraze xwe. Ji namûsê xariçtir ti çi mi bixazî, e textsîr nekim.

[Wezîr] dibê:

“Tê mi têxî Welîyê Wanê. Mîsal, tê mi têxî Welîyê Wanê. Dergevan jî têxî yardimcîyê<sup>923</sup> mi, têxî serkatibî, bidî berdestê mi.”

[Padişah] dibê:

“Weyyy! Wilayeta Wanê hemû ‘aydî te. Here, dergevan jî bihere. Wilayeta Wanê te xastiye. Mî gotye, ji namûsê xariçtir ti wekî dinê çi bixazî ez ê bime te. Here xwe ra wilayeta Wanê da rûnê. Welî tu yî, dergevan jî serkatibê te ye. Bira berdestê te be.”

[Wezîr dibê:]

“Hayyy hayyy.”

Bira evana xwe ra hene kêfê. Dibê Hekîmê Loqma dibê:

“Kurê mi, tu ‘isn î tu çi cîsn î? Tu j’ ku tê? Tê ku da herî?”

[Gul] dibê:

“Qurban, wellahî bavêkal, e nizanim ez kî me, kurê kê me, e j’ ku tîm, ku da herim. Hema mi xwe dîtye, vir dîtye.”

Hekîmê Loqma dibêje Gul:

“Pekî tu nabî kurê mi, ez bime bavê te?”

[Gul] dibê:

“Hay hay, ser çêhvê mi. Tu bavê mi, e jî kurê te.”

Dibê dil-hinavê Teyrê Enqa xarye, dibê şevê terefê xwedê da, kîse zêrê zer li ber serê Gul hêşîn dibe. Hîngî ewa dil-hinavê Teyrê Enqa xarye. Ka idî ketye heyra wî. Ka rehê xwe xilaz kîrye ji destê dêw [ku] yê têkeve heyra zêrê ber serê xwe. Heyra canê xwe da ne. Hêsir bûye, çol-mexela ketye.

Dibê wexta ku isa dibêje, Hekîmê Loqma dibêje, dibê:

---

923 ) Alîkar.

“Kurê mi, evê bedewbûna te, ew xulqîyeta ku xwedê daye te, tu kurê min ez bavê te. Ti bidî xatrê xwedê, ti tu zemana dernekevî nava şîher negerî. Paşa ku bi te bihise, padşahê îşekî bîne serê te. Xwedê xulqîyeta te da însan çenekirye.”

[Gul] dibê:

“Hay hay bavêkal, ez dernakevim.”

Rojek, dudu, salek, em bêjin çî zeman ortê ra derbas dibe, li cem dimîne. [Gul] rojekî dibê:

“Bavêkal, çima zêrekî bidî min ez ê îro herme himamê?”

[Hekîmê Loqman dibê:]

“Kurê mi, ne mi ti dayî sondê. Tu herî himamê, zirara te yê çêbe. Bira pîredayka te, te ra du sîtil av germ ke, li vê derê, koxkê mi da himama xwe, himamlamîş<sup>924</sup> be.”

[Gul] dibê:

“Ê bavêkal, qey heqa<sup>925</sup> zêr ber serê min in, tu heqa zêr te ode tijî zêr kirye, tu qey qêmîş nakî libekî jî bidî mi?”

[Hekîmê Loqman] dibê:

“Kurê min, hemû yê te ye. Hemû fida be j’ te ra. Ema, e zanim zirara te yê ji di padşê, ji şîherê padşê çêbe.”

Dike nake pê nikare, dibê:

“Here, xwedê îşê te lê bîne.”

Dergevan bi wezîr va, ew jî bêjin bê:

“Heke salek e, heke şeş meh e, yawo, em hatin derketne vira. Me paşayê xwe bîr kir. Paşayê l’ me were xezebê. Paşayê me l’ welîtîyê bavêje. Yawo, em îro herin serîkî bine paşayê xwe, zîyaret kin. Em dîsa lêxin werne ser goreva<sup>926</sup> xwe.”

Bi emrê xwedê, ewana jî diçin. Dergevan dibê:

“Em ê hene himamê.”

Diçne himamê. Wezîr dêna xwe didê, ew gencê ku heyjde xencer lêdaye navmîla wî, dibê:

“Ha va l’ himamê da!”

[Wezîr dibê:]

“Kuro dergevan, dergevan!”

[Dergevan dibê:]

“Ha padşayê mi, ha wezîrê mi.”

[Wezîr] dibê:

“Kuro, te bir avîte ku?”

---

924 ) Serşûştin.

925 ) Ewqas.

926 ) Wezîfe, peywîr.

[Dergevan] dibê:

“Wezîrê mi, ez diçûm derê mala Hekîmê Loqma ra derbas bûm...”

Dibê wexta ku wisa dibêje, dibê:

“Mi bir avîte derê mala Hekîmê Loqma.”

[Wezîr] dibê:

“Kuro kurê te miro! Mi gote te here bavêje Çemê Şerefyan<sup>927</sup>. Ti mi gote te, here bavêje derê Hekîmê Loqma. Tu zanî Hekîmê Loqma, rebbê ‘alemê şifa daye dêst, dermanê wî bi xwe dileyîze. Kuro, Hekîmê Loqma, te birye avîte derê mala wî. A hova<sup>928</sup> qenc bûye, a hovanê himamê da.”

Dibê emrê xwedê, Xoce ‘Elî ticarekî mezin bûye. Ji şîherê Misrê diçe Çînê. Eşyayê Misrê dibe Çînê, eşyayê Çînê tîne Misrê. Ticarekî mezin e, ticaretê dike. Dibê ew zeman jî Xoce ‘Elî yê here Çînê, dibê gemiya wî ku wexta rê keve, dibê qurbanekî dibe davêje, dibê Gîla Gildavê<sup>929</sup> heb’ye, Dibê cendekekî, qurbanekî dibe davêje wê derê. Ew hût-lehengana heta pê da dikevin, gemiya wî derbas dibe.

Eva wezîra duşmîş<sup>930</sup> dibe. Dêna xwe didê, Xoce ‘Elî dêrî da hat. De zengîna jî, her kes hevalê zengînan e, kes hevalê feqîra nîne. Dibê wexta ku diçne hindir, wezîr tê hindir, wezîr jî tê zîyaretîya paşê. Xoce ‘Elî dibê:

“Paşayê mi, welle ez hatime. Mi eşyayê xwe hemû bar kirye, ez ê herme Çînê. Îja qurbanek lazim e. ‘Edetê padşayê me qurbanekî, eger gak be, eger devek be, eger dewarekî mezin be, dide min. E dibim Gîla Gildavê davêjim. Hût-leheng heta ewê belav dikin, gemiya mi saxlem derbas dibe diçe.”

Wezîr hema nişkavda ji wir radibe, dibê:

“Ê padşayê mi, xwedê j’ te razî be. Merivek heye, kurê Hekîmê Loqma. Zaten en qatîlê şîherê te yê ku te cezalamîş<sup>931</sup> kirye, cezayê giran dayê ew e. Heyfa dewarekî nîne ku tê bidî. Bişîne kurê Hekîmê Loqma bîne. Bira Xoce ‘Elî bihere bavêje behrê, hût leheng ewî buxin. Bira gemiya ticarê me jî derbas be here.”

Ê padşahê qijik haj çi heye. Padişah dibê:

“Gune stîyê we be. E zanim heywan dibe qurban. Wexta ku ‘adetê we ye, hûn însanê qatîlkar e cezalamîşkirine<sup>932</sup>, cezayê zehf in, ret<sup>933</sup> nabin [dikirne qurban]. Herin bêjne ewê, Hekîmê Loqma bira kurê xwe bişîne.”

Eva bi dizî paşê va dibê:

“Kuro dergevan, de îja firsetek e. Kuro kurê kerê, de îja bireve Gul bîne. Em Gul bine Xoce ‘Elî

927 ) Gundê berhevkar e ya ku li ser Ebexeya Wanê.

928 ) Li vir e, li vê derê yê.

929 ) Wisa dixuyê Gîlê Gildavê deverek e.

930 ) Fikirîn.

931 ) Cezadan, cezakirin.

932 ) Cezalêkirî.

933 ) Xilasbûn, kutabûn.



bira Xoce ‘Elî bihere.’”

Diçne ber derê Hekîmê Loqma, dêrî dixin. Hekîmê Loqma dibê:

“Qurban, zuryeta mi, xwedayê ‘alî ye qe zuryet nedaye mi.”

[Dergevan] dibê:

“Paşê gotye, kurê wî îro hatye himamê. Mi di himamê da dîtye. Dişîne bira bişîne, naşîne e serê Hekîmê Loqma lêdixim.”

Qijikî diçe ber serê Gul digrî, dibê:

“Kurê min, binê, min kir nekir te gotna mi nekir. Paşê şandîye pey te. Îja ez ê herim bira paşa serê mi lêxe. Hêç olmasin<sup>934</sup> ti rabe, alîkî derkeve. Bekî<sup>935</sup> ti xilaz dibî. Heyfa te gencî ye. Hema bira serê mi lêxe, zîrarê nede te.”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, ew ruhê ku xwedê daye, xwedê bistîne. Padşa ti dîn bûye, paşa yê serê mi lêxe? Ne cezayê mi heye, ne sûcê min heye, ne e paşa hev naz dîkin.”

[Hekîmê Loqman] dibê:

“Qurban, welle dergevan hatye ber dêrî sekinîye naçe.”

Eva radibe, nahêle Hekîmê Loqma here. Radibe, dide pêşya dergevan diçe.

Wezîr çi b’ke? Wezîr dibê:

“Wexta ku ewa xorta were hizûra padşê, paşayê zaten serê mi jî lêxe yê Xoce ‘Elî jî lêxe. Padşa, ewî xortî bibîne, berdide?”

Dergevan pêşva tê. [Wezîr] hildide gazî Xoce ‘Elî dike, dibê:

“Kuro kurê kerê, fîrsetek e. Evî bihere bavêje behrê. Binê, nebî nebî tu bihêlî! Ku tu [nevêjî û] vegeerî vira, welîyê Wanê ez im, wellahî ez ê te ra têxme yasax. Varîyeta te hemû bime sekinandin. Serê te jî bime lêxistin. Tê biherî bavêjî. Padşê gotye, bira bavêje.”

Wexta ku Xoce ‘Elî dêna xwe didê, ya rebbil’alemîn, xortekî nazik î nazenîn! Ti qêmiş nakî dêna xwe bidê! Dibê:

“Yawo, welle hema paşa serê mi lêxe jî ez evî xortî navêjim. E ça evî xortî biherim bavêjme behrê?”

Dibê wexta Xoce ‘Elî ku evî hildide bi rê dikeve diçe şîherê Çînê, Xoce ‘Elî dibêje, dibê:

“Yawo, fîrsetek e ku xwedê daye min, ez ê qulamîş<sup>936</sup> kim. Ez ê sinîke zêr, dîkekî zêr, bime ser serê vî xortî, hedîye ji qiralê wî ra biherim. Bira derê mixazê xwe hem’ya veke. Ez ê eşyayê xwe yî Misrê [ku] erzan e, ez ê biha bifroşme wî. Ez eşyayê wî yî giran î biha xwe ra erzan bistînim, bar kim bînim. Ez ê cake<sup>937</sup> herim yan kurê xwe jê distînim tînim yan qe naynim.”

934 ) Qet nebe.

935 ) Belkî, dibe ku.

936 ) Bikaranîn, emilandin.

937 ) Dîsa, careke din.

Dibê tîne sinîkî hine zêr dide ser. Dîkekî zêr dide ser serê Gul. Ew, sinî, dîk, li hev duxwin. Rebbê ‘alêmê xulqîyeteke wisa dayê.

Dibê wexta ku diçne sera qiral, ku wexta Xoce ‘Elî dikeve hundur, Gul pey wî dikeve hundur. Qiral idî haja wî bi zêr, zîv, dîkê zêr, bi siniya zêr nîne. [Qiral] dibê:

“Xoce ‘Elî.”

[Xoce ‘Elî] dibê:

“Lebê.”

[Qiral] dibê:

“Eva çî te ye?”

[Xoce ‘Elî] dibê:

“Welle, qurbana te be, xulamokê te ye.”

[Qiral] dibê:

“Ez ê tellal bime gazîkirinê, ‘imbarê şîherê mi çîqa heye, tiştê min î qîymetlî<sup>938</sup>, hevirmûş çîqa heye, bira derî vekin. Bi îstedixa<sup>939</sup> xwe, xwe ra bistîne. Eşyayê xwe yî biha biha bi îstedixa dilê xwe, dewrî ‘imbarê mi ke. Yêterkî eva xorta hetanî te barê xwe kir, were kurê xwe hilde here. Yê cem mi be.”

[Xoce ‘Elî] dibê:

“Bira kurik qurbana te be, qiral. Qey ez layîqî te nabînim, kurik cem te be? Bira heftekî na bira mehekî cem te be.”

Ê kurê xelkê ye, heyra wî lê nîne kî. Dibê qiral hevt roja hevt şeva bi gede ra dikeve xebordanê. Ne xew bîrê te, ne nan bîrê tê, ne av bîrê tê.

Rojekî, jina qiral çî b’ke? Jina qiral dêna xwe didê, qiral idî ne tê heremê wê, ne qe haj pê heye. Eva jî dibê:

“Oyleyse<sup>940</sup> qiral yarê başqe<sup>941</sup> xwe ra girtine. Terka mi kirye, nayê sera mi.”

Radibe diçe sera paşê. Wexta ku jinik derî vedike, dêna xwe didê, ya rebbê ‘alêmê, xortekî nazik î nazenîn kêleka qiral rûniştîye! Dibê:

“Ey qiral, ne ti bî ne navê te be. Îro hevt rojê te ye ti nehatî herema mi. Yêmekê<sup>942</sup> te yî hevt roja hema isa ser hev da maye.”

Dibê wexta ku wisa dibêje, eva diçe bi hesabê xwe eşyayê qiral çîqa heye hemû bar dike. Dibê [qiral] gazî jnikê dike, dibê:

“Jinik, Xoce ‘Elî yê were kurê xwe bihere. Îja ka layîqî kurê Xoce ‘Elî çî ez bimê?”

---

938 ) Biqîmet.

939 ) Li gorî dilê xwe.

940 ) Ku wisa be, heke wisa be.

941 ) Ya/yê/yên din, dî.

942 ) Xurek, zad.

Jinik dibê:

“Mala te xira be. Idî Xoce ‘Elî ewqas e ticarê Misrê yî mezin e. Te ra siniya zêr, dîkekî zêr, eva xorta jî aniyê. Layîqî vî xortî qîza te ye. Tê qîza xwe bidê. Tê ji pê qirar kî [û bêjî ku] serê salê carekî tê evî xortî bînî, ez ê evî xortî bibînim, tê hildî biherî. Idî layîqî wî xortî ew e. Başqe çarek e ku tu hedîyekî bidî, xêncî qîza xwe, tiştêk [tine]. Ka hedîye çî ye tê bidê?”

Xoce ‘Elî tê, dibê:

“Qiralê mi, tê idî îzna xulamokê xwe bidî ez ê biherim.”

[Qiral] dibê:

“Xoce ‘Elî, ricake mi te heye.”

[Xoce ‘Elî dibê:]

“Estexfilla qiralê mi, ça.”

[Qiral] dibê:

“Qîzeke min heye ku ti qebûl bikî ez ê bime kurê te. Tê salê carekî ku eşyayê te, gemiya te hat derbasî Çînê bû, tê evî xortî bînî. Ez ê evî xortî bibînim. Heta dîsa ti bi rê ketî, kurê hilde bihere.”

[Xoce ‘Elî] dibê:

“Qiralê mi, kurik bi qurbana te be. Ku tu layîqî kurik qîza xwe bidê, ez îja qebûl nakim?”

[Qiral] dibê:

“Oyleyse<sup>943</sup> here hemala bigre. Gemiya xwe, eşyayê te çiqas be, eşyayê xwe hemû yuklemîşî<sup>944</sup> koşekî ke, her sê koşê gemiyê vala bihêle. Ez ê cihêzê qîza xwe ji zêr, zîv, çî hebe, ez ê qîza xwe ra karê wê bikim. Hilde here.”

Xoce ‘Elî bira zîtika bavêje, [dibê]:

“Ê kurê xelkê ye. Ez ê herim, bavêjim bira here.”

Dibê qiral gazî dikê, qîza xwe dide Gul. Du kursîyê zêr datîne, maseke zêr datîne. Qîzik û gede j’ xwe ra ser rûdinên. Xoce ‘Elî, haşa j’ huzûra we, Xoce ‘Elî nota<sup>945</sup> wan guhdirêjê derbiharê, layîq nîne jî em isa bêjin idî layîqî wî ye, zîtikekî ha dide xwe, yekî ha dide xwe, dibê:

“Yawo, mi kurê xelkê anî kire bela serê xwe. Padşê go, here bavêje behrê. Mi anî hat, Qiral anî qîza dayê, hevt cara qasî mi jî zengîn eşya dayê. Evana sibê derkevne Misrê zate herd<sup>946</sup> jî mi napirsîn. Ê padşa jî yê serê mi jêke. Yê bejê mi, mi gote te bihere bavêje, te çima neavîtye?”

Qîzik dibêjê, dibê:

“Gul, ti bidî xatrê wî xwedayê ku hûn dihebînin, nebî nebî, zirara te yê j’ destê Xoce ‘Elî çêbe. E Xoce ‘Elî ferq dikim. Xoce ‘Elî yê îşekî bîne serê te. Çî gote te gotna wî neke! Hetanî em derketne

943 ) Ku wisa ye, heke wisa ye.

944 ) Bar kirin, lê bar kirin.

945 ) Mîna, nola.

946 ) Herdu.

Misrê.”

Xoce ‘Elî diçe sandiqeke mifriq-pola çêdike. Gazî dikê, dibê:

“Gul, kurê mi, çika were. Hine roja qaçax têne pêşya me, herambaşî têne pêşya me, me dişêlînin. Tişteki me yî qîymetî, zêr-zîvekî me yî qîmetî hebe, em ê têxne vê sandiqa mifriq-pola. Bona ku hema evê j’ me nestînin.”

Qîzîk dike nake Gulê te, radibe xwe di qutiyê da dirêj dike. Eva kilîteke mifriq-pola ser dixê. Gazî hemala dike, davêjne behrê. Gemî bi rê dikeve diçe.

Dibê qîza qiral çi b’ke? Qîza qiral şûşeke jehrê dide destê xwe, kêreke çirtme dide destê xwe, dibê:

“Wehdenîyeta wî xwedayê ku hûn dihebînin, Xoce Elî, ti ser mi kevî ez ê kêra çirtme li xwe xim, şûşa jehrê ser xwe da kim. Qarişî<sup>947</sup> mi nebe. Kurê kerê, bavê mi ez dame wî xortî, e ti dame te?”

Dibê heger rojek, heger şevê, heger deh roj gemiya Şêx ‘Elî derdikeve şehrê Misrê. Qîzîk gazî çar hev hemala dike, dibê:

“Xoce ‘Elî zêrekî dide we, ez ê deh zêra bime we. Eşyayê mi hemû bikşîne kêleka behrê, sahake behrê. Eşyayê mi dayne ser hev, çadirekî bikşîne ser. Werin xerçlixa we ez bime we, lêxin herin.”

Dibê Xoce Elî çi b’ke? Xoce ‘Elî, haşa hizûra we, destekî serî yekî qûnê, [dibê]:

“Kuro, mi çû qîza qiral anî! Mi Gul avît! Îja qîza qiral sibê, niha gustîlê xwe jî hev guhirîne, qîza qiral sibê şahdetîkî li cem padşê bide, paşa yê serê mi jî lêxe! Ka îja ez ê Gul ku derê bibînim bînim?”

Derdê wî dibe neh deh derda. Cab paşê ra diçe, dibê:

“Welle, gemiya Xoce ‘Elî îro derkete şehrê te. Ticarê te yî mezîn, gemiya wî hat derket.”

[Padişah dibê]:

“Hay hay, ser çehvê mi.”

Evana radibin pêşya diçin. Dêna xwe dinê, çadirek wê l’ devê behrê vegirtîye. Padişah jê siwal dike:

“Xoce ‘Elî, eva çi çadir e?”

[Xoce ‘Elî] dibê:

“Padşayê mi, e çûm. Qiralê Çînê qîza xwe da mi. Hetanî vê derê ez qebûl kirime. A hatye derketye vê derê poşman bûye. Kêreke çirtme daye destê xwe, şûşeke jehrê daye destê xwe. Dibê, kê bi ser mi keve ez ê xwe bikujim. Ew jî cihêzê wê ye. Hatye vira poşman bûye.”

[Padişah dibê]:

“Hey nabe!”

Padşayê qîjik çi zane, çi ye, neyî neyîsî<sup>948</sup> ye, padşa nizane, dibê:

947 ) Têkilbûn.

948 ) Kî ye, ji mala kê ye, çi ye ?

“Wextekî em ê herin. Em ê ricayê ji qîzikê bikin. Ez ê jin zarê xwe hildim herim. Bekî em tîne rê, Xoce ‘Elî qebûl dike.”

Dibê wexta ku wisa dibêjin, padişah diçe ku here ricayê ji qîzikê bike. Qîzik dibe:

“Padşayê mi, wehdenîyeta wî xwedayê ku hûn îmanê pê tînin, kê we bi ser mi keve ez ê kêra çitme li xwe xim, şûşa jehrê ser xwe da kim. Tu padişah î bavê mi jî qiral e. Ez ya devê Xoce ‘Eli nînim. Vegere here, ji derdê mi vegere. Here, çilê min tamam bû, were ez ê sozekî te ra bêjim.”

Padşayê cake<sup>949</sup> dizvire, lêdixê diçe. Qîzik devê behrê dimîne. Em werin ji kê xeber din? Em werin ji Gul xeber din. Gulê te diçe, dêna xwe didê, rastî tûrçî, balixçî<sup>950</sup> tê. Balixçî jî, dibê rebê ‘alemê nesîbî wî, sed carî tûra xwe bavêje rojê libek tê, hezar carî jî bavêje libek e, carekî jî bavêje libek e. Rebbê ‘alemê, libek mehsî nesîbê tûrçî dide.

Torçî çi bike? Torçî wexta tora xwe davêje, dêna xwe didê, tûra wî giran e. Kaş dike, kaş dike, kaş dike, derdixê kêleka behrê. Dêna xwe didê, qutîke mifriq-pola. Tîne, bi çi şeklî dike kilîtê dişkêne, dêri vedike. Dêna xwe didê, xortekî nazik î nazenîn rabû ser xwe. Torçî direve, balixçî direve.

[Gul] dibê:

“Qurban, bavêkal, nereve. Ez jî însanekî notanî<sup>951</sup> te me.”

[Torçî] dibê:

“Kuro, ti kî yî? Çi ‘isn î, çi cîsn î? Tu j’ ku tê?”

[Gul] dibê:

“Qurban, welle e nizamim. Hema mi xwe dîtye, vira dîtye.”

[Torçî] dibê:

“Ti nabî kurê mi, ez bime bavê te?”

[Gul] dibê:

“Ê xwedê qedera mi da isa nivîsye. Hema ti bibe bavê mi, ez jî kurê te. E nizamim ez ê kalî<sup>952</sup> herim, ku da herim? Ez nizamim.”

Torçî [qutiyê] tîne, dikşîne wê qulûba xwe ya qamişok. Dibê rojekî Gul dibêje torçî da, dibê:

- Torçî, bavêkal, binê<sup>953</sup> evana hemû zêr in.

[Torçî] dibê:

“Kuro lawo kurê mi, mi nexapîne. Tu li ku, zêr li ku! Hinde zêr li ber serê te!”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, teref xwedê da, mi dil-hinavê Teyrê Enqa xarye. Terefê xwedê da şevê sed zêrê zer, kîse zêr, li ber serê min hêşîn dibe. Evana hemû zêr in.”

---

949 ) Dîsa.

950 ) Masîgir, masîvan.

951 ) Mîna, nola.

952 ) Kî alî, kîjan alî.

953 ) Binêre, binhêre.

[Torçî] dibê:

“Kuro, te hine polik-molik berav kirine.”

Nizane, qijikî. [Torçî wan zêran] dibe kolka xwe ye qamişok. Heger rojek heger dudu heger sisê, [Gul] dibê:

“Bavêkal, tê bînake wusa xwe ra bidî çêkirinê ku sîha bîna te bide ser ya padşê. Hetanî nîvro sîha bîna te li ser ya paşê ranebe.”

[Torçî] dibê:

“Kuro kurê mi, e li ku, paşa li ku! Bi van teneka!”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, ti zêrekî biherî ti dikarî nîvî çarsîyê bistînî. Evan zêrana zêrê yapilma<sup>954</sup> nînin, evana terefê xwedê da nin. Here qate kincê temîz, îskampêleke temîz, xwe ra bide girêdanê. Bastonekî<sup>955</sup> zêr bide destê xwe. Mi ra jî yataxêkî bîne. Ez nava vê qûmê da radizem. Mi ra hema yataxekî bîne were. Ez jî xwe ra tê da razem.”

[Torçî] dibê:

“Hay hay, ser çehvê mi.”

Bavêkal, pê guvenmîş<sup>956</sup> nabe. Radibe diçe cem ticarê nota<sup>957</sup> we. Diçe kê derê kesekî deyera<sup>958</sup> wê zêrî bidê, tine. Diçe cem esnafekî mezin î nota we. Eger erzan, eger biha, kalê çi dibêje evana nava nîv si’etekî da kalê ra hazir dikin. Ber bavêkal diçin tèn. Varîyet wusa ne. Bavêkal wexta dizvire tê, [Gul] dibê:

“Bavêkal, gotina min e yan ya te ye?”

[Torçî] dibê:

“Wey xwedê mi qurbana pîyê te ke. Gotin ya te ye. Kuro, e çûme nava şîher. Çiqa ticarê mezin hebûn, zêrê mi gerandin, li hev çûn hatin, kesî nikaribû deyera zêrê mi bide. Welle, eva eşyayê han jî hemû dane min. E lédame hatime.”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, baş e.”

Bînake temîz bavêkal ra dide çêkirin. [Gul] dibê:

“Bavêkal, ti zanî tê çi b’kî?”

[Torçî] dibê:

“Ha, e çi b’kim?”

[Gul] dibê:

---

954 ) Çêkirî, sexte, qelp.

955 ) Gopal.

956 ) Bawerkirin.

957 ) Mîna.

958 ) Buha.

“Tê hespekî mi ra bînî. Ez ê xwe ra herme raw-nêçîrê. Sibê herim, êvarê vegerim werim. Xwe ra oda xwe da xwe dirêj kim razêm. E tişteki jî te naxazim.”

[Torçî dibê:]

“Hay hay, ser çehvê mi.”

Ê qe idî bavêkal isa bûye, ji padşê padşatir bûye. Dibê wexta ku wusa dibêje, rojek, dudu, salek, çî arê ra derbas dibe. Rojekî [Torçî ji Gul] qisqanmîş<sup>959</sup> dibe, [dibê:]

“Qîzê jînik.”

[Jina wî] dibê:

“Ha torçî.”

[Torçî] dibê:

“Eva mala min e yan ya Gul e?”

[Jina wî] dibê:

“Kuro, ti kurê merivan î. Ne ‘emrê min [û] te hate vî yaşî<sup>960</sup>, xwedayê ‘aliya rojê mehsîk rizqê min [û] te dabû. Îja ti gihîştî vê derecê, mal ya Gul e. Ya te ye?”

[Torçî] dibê:

“Eheyyy, mi gorka bavê te w Gul gê. Dême<sup>961</sup> mala mi nîne, mala Gul e. Erê?”

Dibê diçe baltekî dide girêdan [ku] daynî ‘erdê, mû li ‘erdê kerr dike, hildide. Gul êvarê wexta ku tê hespê xwe bikşîne hindir, eva ser serderê disekine, baltekî orta serê Gul dixê, dike du kera. Haşa, hine tersê hespê wî dixê serê wî. Desmaleke gewrik sêrî dialîne. Dîsa tîne dixê qutîya wî. Dibe behrê da berdide. Tê hindir, dibê:

“Jinik, mi gorka bavê te w Gul gê. Te digo mala Gul e. A mi Gul kuşt, Gul rast kir çû. Mal ma mi [û] te ra.”

[Jinik] dibê:

“Welle, xwedê heqê Gul yê te bistîne. Mala Gul e. Hema te bêxwedêti kirye, bêîmanî kirye. Ew ayî<sup>962</sup> mesele ye.”

Em werin ji kê xeber din. Bira Gulê te here. Here rastî aşvanekî were. Aşvan bireve derê malê, ji birca êş kaş ke, derxe. Wexta ku devê qutyê vedike, dêna xwe didê, xortekî nazik î nazenîn, sipîçîl! Ti dêna xwe didê, qêmîş nakî lê binhêrî! Destê xwe ber serî wî ra dibe. Dêna xwe didê, eger deh roj be, eger pênc roj be, behrê da ro da hatye, ketye devê birca êş. [Aşvan] dibê:

“Welle rebbê ‘alemê, derd jî daye derman jî daye. Wehdenîyeta xwedê be, evî gencî heta toza êş jî bifroşim, ez evî gencî ku xwedê xilaz ke, ez ê xilaz kim.”

Kalê kaş dike dibe mala xwe. Jinik pêşva tê, dibê:

---

959 ) Çavnebarîkirin, hesûdikirin.

960 ) Emr, sal, temen.

961 ) Yanî.

962 ) Cuda.

“Kuro aşvan, ew çî ye te dîtye?”

[Aşvan] dibê:

“Qe, ti jê vegere. Mi xezîna mezin, xwedayê ‘alîye, teze [vî] yaşê<sup>963</sup> mi da teze daye mi.”

Derî vedike, dêna xwe didê, xortekî nazik î nazenîn! Serî wî kirye du kera, hine tersê hespê, haşa, xistîyê.

Dibê wexta ku aşvan wusa wehd dike, aşvan digerîne dixtora, hekîma, li kê derê digerîne. Rebbê ‘alemê jî padşayê keremê ye. Merivekî nekuje bira dinya hemû jî dujminê wî be. Dibê zemanekî wexta qenc dibe, radibe ser xwe, [aşvan] dibê:

“Kurê mi, ti nabî kurê mi, ez bime bavê te?”

[Gul] dibê:

“Na. Ez j’ bava tobedar im. Idî vira da, na. Binê<sup>964</sup>, eva heger salek e, heger mehek e, heger çî be, ez li cem te me. Evan zêrê min e hanê, hemû xaş-helalî te bin nota<sup>965</sup> şîrê dîya te. Ez ê rabim terkedinya bim, lêxim herim.”

[Aşvan] dibê:

“Kurê min, tê ku da herî? Tê herî kê derê? Ti dibê, e nizamim ku da herim. Ti dibê, ez nizamim, însana naz nakim, şîhera naz nakim.”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, xwedê çî qedera mi da nivîsî be yê were serê mi. Heçî ya bava idî e tobedar im.”

Dibê radibe diçe. Rasteke notanî<sup>966</sup> vê rasta me, dêna xwe didê, şivanek vira ye. Dibê:

“Kuro qurban, ti evê gîska hanê yan mîha hanê ti nafroşî mi?”

[Şivan] dibê:

“Yawo, ti cunî yî? Ti dîn î? Gîska mala Ahmed<sup>967</sup> e. Ez bime te, Ahmed heqê mi yê bibirre, nade mi.”

[Gul] dibê:

“Ez ê pênc zêra bime te. Evan kincê xwe ye padşatîyê ez ê ser xwe derxim bime te. Ti kincê xwe ye kewneşivanîyê bide min. Gazî ke be, Ahme, mala Ahme, gur kete nava pêz kara te xarin! A ti evî zêrî bidî, tê nivî pezê Ahme bistînî.”

[Şivan] dibê:

“Qurban, ti çî dibêjî mi? Ahmedê mi bikuje. Heqê mi nade mi.”

[Gul] dibê:

“Qurban, ti dizanî tê çî bidî mi? Hema hûrê wê tenê derxe bide mi. Goşt jî ji te ra, pere jî te ra,

---

963 ) Temen, emr, sal.

964 ) Binêre, binhêre.

965 ) Mîna, nola.

966 ) Mîna, nola.

967 ) Guhdêr, guhdêrekî çîrokê ye.



kinc jî te ra, kîsê zêra jî te ra.”

Dibê wexta ku şivan duşmîş<sup>968</sup> dibe, dibê:

“Heyran, Ahmedê çi ji mi bike? Ahme, zehf bike yê mîhekî mi bistîne. Welle bi xwedê, hema ez ê bidim.”

Gazî dike, ê jin jî zate hema goşt hebe mala bavê jina ava be, dibê:

“Welle, gur kete nava pêz, zikê mîhekî qelaşt. Mi şerjê kir bira werin biherin.”

Jin şa dibin, herin qelyê buxin. Eva jî kincê Gul li xwe dike, dizvire tê.

Dibê Gul çi b’ke? Gul here ser avekî. Ewî hûrkî temîz bişo, bide ber tava havînê. Olça<sup>969</sup> serê xwe da, dibê bona tenbolîya wî ku neyê xuyan, bedewbûna wî neyê xuyan. Dibê hema dikşîne serê xwe, dibe keçelokekî. Kincê şivîn xwe dike. Xwe ra derdikeve, terkedinya dibe diçe. Dibê diçe gundekî. Dêna xwe didê, bostançîk li wê derê ye. Diçe cem bostançî, [dibê]:

“Selam ‘elêkim.”

[Bostançî dibê]:

“ ‘Elêkim selam.”

Bostançî dêna xwe didê, [dibê]:

“Pî pî pî! Keçelok, tê mi biherimînî. Wêda dûrî mi keve.”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, ez jî însan im, meriv im. Xwedayê ‘alîye, ez keçel çêkirime. Tu çira<sup>970</sup> heqa îkrahiyê mi dikî? Tu hema a ji boy xwedê, mi xweyî ke, nanekî ber destê te çi ma bide mi, ez ê miqatî golikvana bim, şivana bim, bexvana bim. Nahêlim kes ne bi bostîn keve. Ez ê avdim, ez ê bostîn gelişmîş<sup>971</sup> kim.”

[Bostançî] dibê:

“Kuro lawo keçelok, tu?”

[Gul] dibê:

“Ê Bostançî, te ez begem nekirim dîsa gopalekî li devê qûna mi xe, ez ê lêxim herim.”

[Bostançî dibê]:

“Hay hay, ser çehvê mi.”

Rê nîşan dixê, [dibê]:

“Tê ha herî, tê ha herî.”

Heger ku hine şorbe-morba ber destê Bostançî bimîne didê. Gul ketye heyra Bostançî. Gul ber derdê xwe ketye, ber kula xwe ketye. Gul ha serê xwe rast dike, li derdorê xwe, sahayê dinhêre, li şîher dinhêre, dibê:

---

968 ) Fikirîn.

969 ) Gor, anegorî.

970 ) Çima.

971 ) Bi maneya ‘geşkirinê’ hatiye bikaranîn.

“Bavêkal, ev bostan yê te ye?”

[Bostançî] dibê:

“Na welle. Ez bostançîyê padşê me.”

[Gul] dibê:

“Navê padşayê we çî ye?”

[Bostançî] dibê:

“Kuro lawo keçelok, ne mi dizanibû tê mi têxî belayê. Kula te niha bi navê paşê ketye? Welle lawo kurê mi, ez navê paşê nizanim. Mi qe padşa jî nedîtye. Hema ez zanim, ez bostançîyê wî me. Zemanê wî [tê], îşçîyê wî, mervê wî tèn hasilata wî jê hildidin dibin. Heqê mi dine min. Ez jî ber bostîn im.”

[Gul] dibê:

“Ê bavêkal, ev çadira devê behrê çî ye?”

[Bostançî] dibê:

“Aha, keçelok îşek anî serê mi. Ewa qîza qiralê Çînê ye, jina Xoce ‘Elî ye. Qiralê Çînê qîza xwe dayê Xoce ‘Elî, Xoce ‘Elî anye hatye vê derê. Niha qîzik poşman bûye, Xoce ‘Elî nake.”

[Gul] dibê:

“Aha tamam. Bavêkal, ez ê ji hine sêv te ra hedyekî çêkim. Tu pêşyê here tiraş<sup>972</sup> be ser berber. Xwe ra bastonekî<sup>973</sup> zêr çêke bide destê xwe, şimikeke zêr çêke têxe lingê xwe. Silinderekî<sup>974</sup> temîz bide serê xwe. Sinîke zêr mi ra çêke bîne.”

[Bostançî] dibê:

“Kuro lawo kurê mi, evan polikana! Ew tiştê tu dibêjî! Sinîya zêr a hinde, polik a hinde ye. Kuro, ka ez ê çakî biherim sinîyeke zêr pê bînim?”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, ev zêrana deyera<sup>975</sup> wana ayrî<sup>976</sup> ye. Aha binhêre, te eva koxkê xwe tijî zêr kirye. Eger bîst roj e, mehek e, ez cem te me, te deh kîse zêr berav kirye. Yekî, libekî jî bihere xwe ra xerc ke, mi ra jî xerc neke.”

Kalê diçe nava çarsîyê. Zêrê xwe nîşanî kîjan esnafî dixê, her kes dibe hevalê hev, ew gazî wî dike, ew gazî wî dike. Kalê dibin digêrin. [Li cem] berber tiraş dikin. Deste kincê temîz kalê dikin. Silindirê Kemal Sûnay<sup>977</sup> dine sêrî. Şimikeke zêr dixê lingê kalê. Kalê tê, dibê:

“A kurê mi, wellehî xwedê ‘emrê te dirêj ke keçelok. Xwedê mi qurbana te ke. Kuro, mi go qey tu

---

972 ) Rih û porr kurrkirin.

973 ) Gopalek.

974 ) Kumek.

975 ) Buha.

976 ) Cuda.

977 ) Aktorekî tirk ê binavûdeng bû û çûye rehma xwedê.

nizanî. Kuro, eva ez çûm iha<sup>978</sup> îltifat mi ra kirin.”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, ez ê hine sêv çêkim bime ser siniyê tê biherî. Bexşîş, çi da te tu hilnadî. Tê sirf bêjî, navê te çî ye, navê xwe mi ra bêje. Temam e.”

[Bostançî] dibê:

“Kuro lawo kurê mi, paşa yê hedîye bide mi, paşa yê tiştê bide mi. Tu dibêjî mi, here navê wî siwal ke.”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, tê çi j’ tiştê kî? Evana hemû zêr-zîv in ji te ra. Tiştêkî ji te naxazim, hemû j’ te ra. Hema navê wî tenê siwal ke.”

Wexta kalê diçe, dergevan pêşva tên. Em bêjin, qorumayê<sup>979</sup> wî pêşva tên:

“Tê herî ku?”

[Bostançî] dibê:

“Ez ê herme goruşa<sup>980</sup> padşê.”

Dêna xwe dine qiyafetê kalê, kalê ji padşê padşatir. Diçne hizûra padşê, dibê:

“Welle, bostançiyê te hine sêv, hedye ser sinîke zêr, gopale wî zêr, şimkê lingê wî zêr, silindirê serê wî ancax serê te heye yan tine ye, hatye. Dibê, ez ê herme goruşa padşê.”

[Padişah] dibê:

“Ê qurban, însan nîne? Ez jî însan im, ew jî însan e. Herin berdin bira serbest were. Derdê wî çi be bira derdê xwe anlatmîş<sup>981</sup> ke. Însan nîne?”

Wexta ku hildidin dibne hizûra padşê:

“Bavêkal, kerem ke derbas be.”

Ê nizane hizûra padşê da rûnê. Merivekî meclis nedîtibe nikare tê da rûnê. [Bostançî] dibê:

“Padişahê mi, welle ez ê herim bostanê te maye bêxweyî. Mi hatye, eva hedyê te ra anye. Zemanê sewzê te ye, yêtişmîş<sup>982</sup> bûye, mi te ra hedyê anye.”

[Padişah] dibê:

“De êylese<sup>983</sup> sêva dayne wira. Were vira, ez kîse zêr hedyê bime te here.”

[Padişah] li siniya wî, li gîyîma<sup>984</sup> wî dinhêre! [Bostançî] dibê:

“Paşayê mi, e tiştêkî te naxazim. Tê hema sirf navê xwe mi ra bêjî besî min e.”

[Padişah] dibê:

---

978 ) Wiha.

979 ) Parêzvan, mihafîz.

980 ) Serdan, serlêdan, zîyaret.

981 ) Vegotin, qalkirin, baskirin.

982 ) Gihaştin, mezinbûn.

983 ) Ku wisa ye, heke ku wisa be.

984 ) Kinc.

“Bavêkal, xwedê j’ te razî be, tu hê navê mi nizanî?”

[Bostançî dibê]:

“Padşayê mi, e nehatime meclisa te. E negeryame, mi siwal nekiryê. E navê te nizanîm.”

[Padişah] dibê:

“Navê mi Seyîdvan.”

Wexta ku dibê navê mi Seyîdvan, eva nizanê Seyîdvan çî ye. Eva hema isa dibê:

“Se, se, se, se...”

Xwe ra dibêje heta tê nêzikî bostan, dibê:

“Kuro keçelok keçelok, dewar kete nava bostîn.”

Ewê jî bîr dike. Dibê valî-walî devdorê xwe digere. Keçelok pêşva direve tê, dibê:

“Bavêkal, mi tu şandî çî? Tu çî digerî?”

[Bostançî] dibê:

“Kurê mi, welle navê xwe mi ra go. Mi heta vira jî got. Niha ez digerim nagerim navê wî nayê bîra mi. Mi gotye qey çika mi ku xistiye?”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, nav nayê xistin. Ser çî helfê bû, ser çî nîyetê bû?”

[Bostançî] dibê:

“Welle, digotnê se, se, se...”

[Gul dibê]:

“Dibe Seyîdvan be?”

[Bostançî dibê]:

“Hîî keçelok, xwedê mi qurbana te ke. Ê wexta tu dizanî Seyîdvan e tu çima ji mi siwal dikî? Navê wî Seyîdvan e.”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, ti gazî pîredayka mi ke. Îşê mi pê heyê.”

[Bostançî] dibê:

“Keçelok, tê ça b’kî?”

[Gul] dibê:

“Bavêkal, ez ê hine hedyê [û] sêv qîza qiral ra bişînim. Hûn dibê, eva du meh e devê vê behrê ye, nahêle kes ser da here. Ez ê jê ra hedyekî bişînim. Qîza qiralekî ye. Ewê jî hedyekî bide pîredayka mi, yê lêxe were. Ti yê here çî b’ke?”

[Bostançî] dibê:

“Keçelok, Xoce ‘Elî yê şikyat bike. Paşa yê serê me lêxe. Idî wexta ku em bêjin, ewqas varyeta te gihîştîye mi, ez ê herim.”

[Gul] gazî pîrê dike pîrê tê, dibê:

“Dayê.”

[Jina Bostançî] dibê:

“Ha.”

[Gul] dibê:

“Dayê, tê evan sêvana, nava baxçe da ez ê girêdim bime te, tê biherî. Qîza qiral ku gazî te kir tê bê, ewê hisret-kesera pê dikalî, pê dinalî, nêzik e, ne dûr e. E nehatime bêjime te, Xoce ‘Elî bike. Ti qîza qiralekî yî, devê vê behrê mayî. Ez jî jina bostançîkî me. Mi te ra hine sêv, hedîye, sezbek anye. Te heke hedîyek daye mi daye mi, nedaye mi nedaye mi.”

[Gul] dibê:

“Nebî, ti sêva nerm daynî. Qîzikê bêje te da, wan sêvê xwe, hedyeyê xwe dayne koşê çadirê. Tu wisa kewkîtî ke, bira her libek sêvê te, sewzê te here cîkî.”

[Jina Bostançî] dibê:

“Kurê min, ez ê çima kewkîtî kim?”

[Gul] dibê:

“Wusa bike. Ti wusa nekî qîza qiralê serê te lêxe. Tu bavêje.”

[Gul] gustîla xwe anye, sêv çiq kirye, bi gustîla qîzikê kirye nava sêvê, dibê:

“E te ra çi dibêjim tu usa bike.”

[Jina Bostançî] dibê:

“Hay hay.”

Pîrê diçe. Eva [qîza qiral] gazî dike, dibê:

“Pîrê, e j’ pîra tobedar im. Ser mi da neyê. Qîrarê mi Xoce ‘Elî maye sê roj, ez ê Xoce ‘Elî idî qebûl kim. Paşa heqa ricayê ji mi dike. Yalnız<sup>985</sup>, tê bibî bayîsê qetla mi. Ez ê kêrê li xwe xim, şûşa jehrê ser xwe da kim.”

[Jina Bostançî] dibê:

“Qîza mi, wê hisret-kesera tu pê dikalî, pê dinalî, nêzik e, ne dûr e. Mi te ra hine hedyaya ye, sêv in, anîne. Qîza qiralekî yî, yan ti hedyakî didî mi yan nadî mi. Ez nehatime bêjime te, Xoce ‘Elî bike.”

[Qîza Qiral] dibê:

“Oylese<sup>986</sup>, dakapîr, wan sêvê te, hedyayê te çi be, sewzê te dayne koşê çadirê. Were valî va , ez ê hedyekî bime te. Ti ser çehva ra hatî.”

Wexta daykapîr boxçe bela dike, dibe şingînîya gustîla qîzikê diçe orta dîreka çadira wê disekine. Qîzik xwe dighînê, dêna xwe didê, eva gustîla wê, dibê:

“Heeyyy pîrê!”

Dibê xwe davêje dest-pîyê wê, dibê:

---

985 ) Lê, lê belê.

986 ) Wexta ku wisa ye.

“Pîrê, bav-birê mi qurbana te be. Xweyê vê gustîlê li ku ye? Wehdenîyeta wî xwedayê ku hûn pê îmana xwe tînin, ez ê evê varyeta xwe tamamî tesmîlî te kim. Yeterkî<sup>987</sup> ti evî xortî [nîşanî min bike.]”

Pîrêya qijik çî zane, dibê:

“Qîza mi, wellehî keçelokekî me heye. Em ê herin, heke keçelok bizanibe. Wekî dinê e tişteki nizanîm. Yalnîz<sup>988</sup>, eva sêvana keçelok daye mi.”

Dizvire diçe, dibê:

“Keçelok, welle hal hewalê qîzîkê a iha.”

[Gul] dibê:

“Here bêje qîzîkê bêje bê, wexta ku padşahê were, tê gotina padşê qebûl bikî, [tê bêjî ku] kê Çîroka Gul Seyîdvan ji mi ra bêje ez ê Xoce ‘Elî bikim. Çîroka Gul Seyîdvan kes mi ra nebêje, ez Xoce ‘Elî nakim.”

Dibê kê bêje kê nebêje? Bira bêje:

“Keçelokê bostançî. Keçelokê bostançî heger bêje bêje, nebêje nebêje. Eva dizane. Wekî dinê xêncî wî kes nizane.”

Wexta ku diçe cem qîzîkê, idî qîzîk hîmî pîrê bîye. Pêşva tê, xwe davêje dest-pîyê pîrê, [dibê]:

“Pîrê, ka te ça kir?”

[Jina Bostançî] dibê:

“Qîza qîral, welle keçelok gotye wexta ku padişah hat bira qebûl ke, bi vî şîklî qebûl ke. Kê Çîroka Gul Seyîdvan baştan<sup>989</sup> ji mi ra bêje, ez ê Xoce ‘Elî ser serê xwe bavê xwe qebûl kim. Çîroka Gul Seyîdvan mi ra neyê gotin, ez Xoce ‘Elî nakim.”

[Gul] dibê:

“Idî wî çaxî paşa derdê xwe dizane. Ti here jê ra bêje.”

Dibê wexta ku paşa paytûna rê dikeve diçe here qîzîkê bibîne, dêna xwe didê, qîzîk idî yûmûşax<sup>990</sup> bûye, dengê xwe nake. [Padişah] dibê:

“Welle, yê rica mi qebûl bike, Xoce ‘Elî yê qebûl ke. Em ê qîzîkê Xoce ‘Elî ra bînin.”

Wexta ku diçe, tabî ew jî qîza qîralan e, qarşî<sup>991</sup> qîralîya bavê xwe, em bêjin, qarşilamîşî<sup>992</sup> padşê dibe, jina padşê dibe, dibê:

“Padşayê mi, ti ser çehvê mi bavê mi ra hatî. Qîrarê min [û] Xoce ‘Elî îro tamam bûye. Ez ê bi xatîrê te Xoce ‘Elî qebûl bikim. Yalnîz<sup>993</sup>, ricake mi te heye, bi şertê min. Çîroka Gul Seyîdvan kê

987 ) Bes, tenê.

988 ) Lê, lê belê.

989 ) Ji destpêkê de, di serî de.

990 ) Bêdengbûn, rawestan.

991 ) Bo xatîr, bo qedir.

992 ) Pêşwazîkirin.

993 ) Lê, lê belê.

mi ra bêje, ez ê Xoce ‘Elî qebûl kim. Çîroka Gul Seyîdvan mi ra neyê gotin, mesela wî mi ra neyê gotin, ez Xoce ‘Elî nakim. Ti ez Xoce ‘Elî ra neanîme.’”

Wexta ku wusa dibêje, notanî<sup>994</sup> satile ava sar ku ti ser serê Seyîdvan da kî:

“Wey agrê kulê mala mi keto! Dême<sup>995</sup> ez [û] birê xwe bûne mesele, haja mi pê tine. Ez mesele me, birê mi mesele ye.”

[Seyîdvan] dibê:

“Qîza qiral, ewê Çîroka Gul Seyîdvan mi ra bêje, ew namûsa mi jî bixaze ez ê bimê. Yeterkî<sup>996</sup> kê dibêje kê nabêje?”

Dibê:

“Welle, gotine keçelokê bostançî, ew heke bêje. Wekî dinê kes nizane bêje.”

Hankava<sup>997</sup> dişîne pêy keçelok. Keçelok xwe davêje ‘erdê. Destê xwe hûrkê serê xwe dixê. Dibe qirçeqirça postik, dibê:

“Yawo ez, padşa, qîza qiral? Ez yê wan meclisa me? E çi zanim van mesela bêjim. Ez keçelokekî ber destê bostançî me. Xêra dêbavê xwe şorbe-morba ber destê xwe dide mi da. E nanekî duxum pê yaşamîş<sup>998</sup> dibim. Ez, evan îşana?”

Dibê padşê gotye:

“Keçelok were çi bixaze, namûs jî dahîl<sup>999</sup> be ez ê bimê. Yalniz<sup>1000</sup> ku neyê ez ê serê wî jî lêxim, serê bostançî jî lêxim. Emrê padşê wusa ne. Tu jî were, te çi zanibûye tê bêjî, te nizanbûye tu nizanî.”

Dibê wexta ku keçelok wexta dêrî da diçe hundir, birê xwe naz dike. Ê ew (Seyîdvan) nizane keçelok kê ye, dibê:

“Keçelok, xwedê mi qurbana pîyê te ke. Dil cigerê mi hate xarê.”

Qîza qiral jî tîne, tîne meclisa xwe, dibê:

“Tê mesela Gul Seyîdvan mi ra bêjî.”

[Gul dibê]:

“Padşahê mi, yawo ez [û] mesela Gul Seyîdvan? Kurê padşê çi hatye serê wan, ça bûye, ez çi zanim ûydûrmîş<sup>1001</sup> kim, bêjim. Xwedê j’ te razî.”

[Padişah] dibê:

“Keçelok, ti dehwa textê mi jî bikî, padşatîya mi jî bikî, ez ê bime te. Yeterkî, ti mi ra derdê mi

---

994 ) Mîna, nola.

995 ) Yanî.

996 ) Bes, tenê.

997 ) Zû bi zû.

998 ) Berdewamkirina jîyanê, heyatê.

999 ) Tê de, di nav de.

1000 ) Lê, lê belê.

1001 ) Lihevanîn.

bêje.”

Wexta qîza qiral dêna xwe didê, padişah wira digrî. Jin-zarê padişê dimîne metel:

“Yahhh! Paşa, te aqil avîtye! Tu cunu<sup>1002</sup> bûyî?”

[Padişah] dibê:

“Ew derdê ku mi dîtye, kesî we nedîtye. Ka îja birê mi ça bû, Keçelok?”

[Keçelok] dibê:

“Paşayê mi, ez ê xatrê te bigrim, xatrê te naşkênim. Yalniz<sup>1003</sup> bi vî şertî, şertê min hene. Wê qîza qiral hatye. Tê bişînî dergevan bînî. Tê bişînî wezîrê milê xwe yê rastê bînî. Tê bişînî torçî bînî. Tê bişînî Hekîmê Loqma bînî. Tê bişînî aşvan bînî. Tê bişînî şivîn bînî. Tê bişînî bostançî bînî. Wî çaxî e te ra bêjim.”

Padşa emir dike. Emrê padşê, pênc deqa hemûya berav dike. [Padişah] dibê:

“Keçelokê mi, de bêje.”

[Gul] dibê:

“Padşa, eva îsal deh sal e arê ra derbas bû. Ti qe neketibûyî heyra birê xwe. Ti hatibûyî paşatîya xwe da ketibûyî. Xwedê j’ te razî be, e çi zanim bêjim.”

[Padişah] dibê:

“Keçelok, eva çi heye bin te da ne. Tê mi ra bêjî.”

Idî em hema qisa<sup>1004</sup> bêjin. Erê? Meselê xwe hemû jî jê ra dibêje, çi hatye sêrî. Hemû sêrî da cake<sup>1005</sup> dinê ku e bêjim, gofî cake herim we ra bêjim. Yanî mesela xwe ji birê xwe ra dibêje. Dêrdê xwe dibêje. Çîrok nîne, derdê xwe dibêje.

Dibê wexta ku hûrik serê xwe dişiqîfîne, dibê wexta tembolîya wî dadikeve nava milê wî, dibe qîrînîya qîza qiral. Qîza qiral dibêje [padşê], dibê:

“Çehvê mi te tev birije. Ti qiral e dabûme Xoce Elî? E dabûme vî xortî. Te jî rica dikir te digo, îlam were Xoce ‘Elî bike. De îja ti rabe, pêşyê dergevan, tu serê wî lêxe, şivîn bide ser mala wî. Ti rabe wezîrê milê xwe yî rastê, serê wî lêxe, Hekîmê Loqma bide ser mala wî. Tu serê torçî lêxe, tu aşvîn bişîne ser mala wî. Bira aşvan here xwe ra bîna wî da rûnê.”

[Padişah] serê wana lêdixe, ewnê din jî dişîne ser varîyeta wan.

Dibê sê sêv hatin cinnetê. Dudu para cima’etê, yek jî para mi. Qusûreke mi jî hebe nenhêrin. Bîst çar sal, bîst pênc sal e mi bîr kirye, min negotye. Idî hema wellahî, mi eva jî bona xatrê we go. Hûn ser çehvê mi ra werin, ser serê mi ra werin. ÇÎROKBÊJ: NÛREDDÎNÊ XELKÊ XAÇA, HERÊM: GUNDÊ XAÇA [EBEXE/WAN], TEMEN: 61, PERWERDE: NEXWENDE, DÎROK: 01/10/2016, BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1002 ) Cin lê xistin.

1003 ) Lê, lê belê.

1004 ) Kurt.

1005 ) Dîsa, careke din.



## 8. ÇÎROKA HARÛNÊ REŞÎT, SILTAN ZIBÊDE<sup>1006</sup>

Dibê Siltan Zibêde jina Harûnê Reşît bûye. Dibê Harûnê Reşît ça hukim kirye, dibê Siltan Zibêde jî weke wî hukumdar bûye. Îja tabî, dibê em bêjin, bi hevra tartişmîş<sup>1007</sup> bûne, filan. Dibê em bêjin, Siltan Zibêde dewamî geryaye ku Harûnê Reşît ji text bêxe. Em bêjin ji text nexa jî, ya wê li ser ya wî bikeve. Dizanî?

Dibê [Siltan Zibêde] bi çi awayî dike, dizîkava tacekî çêdike. Em bêjin taceke deyerlî<sup>1008</sup>, biqumrûd, bizumrûd, bizêr filan çêdike. Navmalyê xwe dibîne. Dide navmalî, dibê:

“Tê biherî. Wexta ku meclisa Harûnê Reşît berav<sup>1009</sup> bû, tê biherî bidî ser çoka wî. Tê jê ra bêjî; welle jina mi, mi ra çêkirye. Mi layîqî xwe nedîtye, mi layîqî te dîtye. Em bêjin wexta ku gote te; hedîya wê bêje. Tê bêjî; heyran, hedîya wê tune. Hema jixwe tacek e, filan. Yê te zorlamîş<sup>1010</sup> ke. Tu bêje; hedîya wê nede. Wexta ku tu didî, tê cewheratekî bidî.”

Dibê wexta ku isa go, Harûnê Reşît jî hemen gote mervê xwe, ‘imbardarîyê xwe, filan:

“Kuro filankes-bêvankes, çika herin binhêrin.”

Dibê araştirmîş<sup>1011</sup> kir. De îja, Siltan Zibêde jî zanibûye ku tune. Em bêjin, bona ku uzulmîş<sup>1012</sup> be. Bona ku pê bişkê.

Birê xwe ra bêjim, wexta ku diçin defîna aramîş<sup>1013</sup> dikin, dêna xwe dinê, cewherat tê da tune. Zehf uzulmîş dibe. Em bêjin wezîr-wekalê wî, rîspîyê wî, yê wî wextî dibêjin, dibê:

“Padişah, uzulmîş nebe. Yawo, tu padişah î. Eva hukma destê te da tune. Yalaniz, Tucar Ahmed heye li Besrayê. Eva cewharata ancax cem wî hebe.”

[Harûnê Reşît] dibê:

“Baş e.”

Em bêjin, merivekî, sîyarekî sîyar dike, dişîne mala Tucar Ahmed. Em bêjin wexta ku diçe, mervê paşê ye, dîrek<sup>1014</sup> diçe mala walîyê wira. Em bêjin, walî jî eger ku yêra<sup>1015</sup> wî toplantî bolgesî<sup>1016</sup> buye, weyaxud cima’et bûye, camî bûye, ku bûye, xeber didin, filan. [Merivê padişah] dibêjê, dibê:

“Welle a iha. Padişê ez şandime cem te, tê mi bişînî mala Tucar Ahmed. Padşê gotye, bira Tucar Ahmed were cem mi.”

---

1006 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj nivîsandin.

1007 ) Devjenîkirin, minaqeşekirin.

1008 ) Biqîmet, giranbuha.

1009 ) Berhev

1010 ) Zorlêkirin.

1011 ) Lêgerîn.

1012 ) Liberxweketin, kesirîn, keribîn.

1013 ) Lêgerîn, lêkolîn.

1014 ) Rasterast.

1015 ) Cih, cî, der.

1016 ) Cihê civînê, dîwan.

Baş e. Dibê wexta ku mêrik [welî] jî gazî Tucar Ahmed dike, dibêje dibê:

“Tucar, welle em bêjin, eva merva mêvanê te ye, hatye. Yanî mervê padşê ye, êlçiyê<sup>1017</sup> padşê ye. Padişê şandyê cem mi. Ez jî dişîname cem te. Padişê, tu xastî.”

[Tucar Ahmed] dibêje:

“Temam, rabe em herin.”

Dibê wexta ku çû, dibê wexta ku ber bi mala wî mervî diçin, diçne nêzîkî mala wî, dêna xwe didê, dibêje:

“Yawo, ya rebbî, mala wî hema hemû zêr e! Dora mala wî, sûra wî hemû zêr e! Yawo, tiştêkî ‘ecayîb e!”

Neyse, dibê çûn ketne hundir. Em bêjin gazî xulam-xizmetkara kir:

“Kuro, mêvîn biherne odê. Kuro, himamê jê ra hazir kin. Jê ra kinca bînin, filan.”

Em bêjin himamlemîş<sup>1018</sup> bû. Yanî ewa êlçiya isa bû, hema şaş ma, go:

“Kuro, em bêjin hewqa hukmî wî heye eva çima nebûye padişah? Filan.”

Neysene<sup>1019</sup>, idî bi usûla wî wextî dibêjin, heta heft roja em bêjin mêvan mêvantîya xwe dikir. Paşê jê siwal dikirin, falan. Tabî surê<sup>1020</sup> wî tamam dibe, [dibêjin]:

“Bavo, de kerem ke.”

[Qasidê padişê] dibêje, dibê:

“Welle padişê tu xastî, gotye bira were cem mi.”

[Tucar Ahmed] dibêje, dibê:

“Baş e.”

Dibê wexta ku rabûn, em bêjin, du hev hesp anîn. Em bêjin, her hespa jî zînê ku li wira, yanî zînê zêr lê kirin. Dêna xwe didê, du hev jî sandiq anîn, da terkîya xwe, go:

“Kuro, eva jî hedîya ye. Ez ê padişê ra biherim.”

Baş e. Evana ketne rê, hatin. Neyse, wexta ku hatne huzûra padişê, [dibê]:

“Selam ‘elêkim.”

[Padişah dibêje]:

“ ‘Elêkim selam.”

Padişah sebirsiz<sup>1021</sup> e, [dibê]:

“Boy xwedê be, were, filan-bêvan.”

Neysene<sup>1022</sup>, dibê Tucar Ahmed dibêje, dibê:

---

1017 ) Qasid, peyamnêr.

1018 ) Serşûştin.

1019 ) Welhasil.

1020 ) Wext, dem, zeman.

1021 ) Bêsebr, bêhedan.

1022 ) Werhasil.

“Ya padişah, tu musade bikî mi te ra du hev hedîya anîne. Ez ê wan hedîyayê te bime te. Idî paşê xastina te çi be, xwedê mezin e.”

Teyî<sup>1023</sup>, gulê laylûn hene. Dibê benzerê<sup>1024</sup> wan gulê laylûn, yanî isa piçûk di qutiyê da derdixe, datîne. [Padişah] dêna xwe didê, dar e, canlî<sup>1025</sup> ye, meyvê wê jî tê xarin. Padişah ma heyret, go:

“Yawo heyran, ev çi îş e? Mi tiştêkî a iha nedîtye, filan.”

[Tucar Ahmed] dibê:

“Neysene<sup>1026</sup>, eva bira li vira bisene. Padişahê mi, tu îja misade bikî, mi te ra tiştêkî dinê jî anîye.”

Dêna xwe didê, çadirek anî. Çadir vegirt. Wexta ku çadir vegirt, dêna xwe dayê, yanî li rûyê dunyayê çîqa heywan hene, em bêjin hirç, gur, mehr, teva<sup>1027</sup> û tu çi bêjî, şiklê wî li ser çadirê heye. Wexta ku çadir vegirt, herdik xwe ra di çadirê da sekinîn. Gote padişê, go:

“Padişah, ku tu misade bikî, ez ê niha emir kim bira evana hemû canlî<sup>1028</sup> bin. Em bêjin, canlî çane, isakîne<sup>1029</sup>.”

Wexta ku gotê, em bêjin, hemen bi qîrarê xwe canlî bûn. Wexta ku canlî bûn, padişah hema lêye bib’ece, dibê:

“Boy xwedê be, bisekine! Bira hema were ser qîrarê xwe yê berê.”

Padişê idî derdê xwe hîşt, go:

“Yawo Tucar Ahmed, kuro niha ev çi quwet e ji te ra heye? Xwedê daye te? Ev çî ye? Tu vana ji ku tîni? Filan-bêvan.”

Tucar Ahmed dibêjê:

“Heyran, ji van tiştê vegere. Yanî niha gotna te çî ye? Tu wê mi ra bêje ez bibînim. Filan.”

[Padişah] dibêje:

“Yawo heyran, idî mi ya xwe bîr kir. Ez ketme ser [van tiştan]. Idî derdê mi tu yî. Kuro, ez hewqa padişah me, xelîfe me û dunya di destê mi daye, mi eva hukma nedîtye.”

Herdik xwe ra çadirê da sekinîne. Tucar Ahmed dibêje:

“Padişahê mi, xwe zexm bigre. De îja, ez ê ji te ra bêjim. Navê mi Tiral Ahme bû. Ez wisa tiral bûm, yanî a iha mi nikaribû xwe welgeranda nan bixara. Bi vî qîrarê ez isakîne<sup>1030</sup> tiral bûm. Yalaniz<sup>1031</sup>, em bêjin, di şîherê me Besrayê da, gemî diçûne şehrê Çîn-Maçînê.”

Yanî Çîn berê da jî ‘eynî isa ticaret merkezî bûye. Îja gotinê Çîn-Maçîn. Neyse, rojekî dîya mi

1023 ) Wisa nîne? De wisa ye ku tu jî dizanî.

1024 ) Mîna hev, hevşêwe, mînanî.

1025 ) Sax, candar.

1026 ) Werhasil.

1027 ) Teba, dirrende.

1028 ) Sax, zindî.

1029 ) Wisa.

1030 ) Wisa.

1031 ) Lê, lê belê.

destê mi girt, go:

“Kurê mi, rabe em herin. Ji bavê te da zêrek maye. Dibê tucar yê herne Çîn-Maçînê. Di vî şehri da Şêx ‘Elî heye. Merivekî durust e. Ez ê vî zêrî bimê bira bihere ji te ra tişteki bîne. Tu jî hema xwe ra pê mijul be. Kuro lawo, ez ê jî sibê bimrim. Tê ça b’kî? Filan-bêvan.”

[Tucar Ahmed] go:

“Neysene<sup>1032</sup>, dîya mi destê mi girt. Em çûn. Zêrê me hilda. Me bir da Şêx ‘Elî.”

Şêx ‘Elîyê feqîr jî go:

“Xwedê ji te razî be. Wexta ku em bêjin, te anîye qe tişte jî nake. Hema çî be em ê biherin. Te ra pê tiştê bikirin.”

Tucar Ahmed go:

“Welle tucar bira têkevne rê herin. Birê xwe ra bêjim, dîya min e belengaz destê mi girt. Mi ancax xwe gîhande malê. Mi dîsa xwe dirêj kir, bû zarezara mi.”

[Min gote dîya xwe]:

“Heyran, te mala mi xira kir. Filan-bêvan.”

[Tucar Ahmed] go:

“Neyses, bira ewana herin. Neysene, ez jî li malê me. Dîya min e belengaz ancax mi valî-walî li ser kêlekê weldigerîne, filan. Evana [tucar] yê çî bikin? De îja dibêjin, evana yê bi çî awayî herin? Yanî xwedê bizanibe, idî çûyîn-hatina wana şeş meha dikşîne. De îja em bêjin, duduya [meh] diçin. Yanî em bêjin, mêrik mehekî li vira-wira mal dibin, difroşin. Mehekî jî li wira mal dikire, tê. Wexta ku Şêx ‘Elîyê te û ewana tîn.”

Evana diçin wextê ku îşê xwe dibînin, yê rê kevin, panzde roja tîn. Şêx ‘Elî dîna xwe didê, zêrê wê [jinikê] maye. De îja, kewranbaşî<sup>1033</sup> jî ew bûye. Yanî yoneticî<sup>1034</sup> ew bûye, destê wî da bûye. Şêx ‘Elî dibêje mervê xwe:

“Yawo qardaş<sup>1035</sup>, ewê jinkê wexta ewa hêsîra anî, eva zêra da mi, wellahî îmkan tune, em ê cake<sup>1036</sup> gêrî<sup>1037</sup> vegerin. Ez ê herim bi perê wê jê ra mal bikirim.”

Panzde roja hatibûne. Wexta ku dibêje, tucar hemû berav<sup>1038</sup> dibin, dibê:

“Yawo heyran, xwedê ji te razî be. Yawo, binêre panze ye em hatine. Em ê panzda herin. Cake<sup>1039</sup> panzda werin. Dike çil-pênc roj.”

[Şêx ‘Elî] dibê:

---

1032 ) Werhasil, welhasil.

1033 ) Serekkarwan, pêşeng.

1034 ) Rêveber.

1035 ) Birano, birê min.

1036 ) Dîsa.

1037 ) Şûnda.

1038 ) Berhev.

1039 ) Dîsa.

“Ê hûn çi dibêjin?”

[Tucarên din] dibên:

“Bavo, bira eva zêrê wê jê ra be. Hema her kes me, em ê tanga xwe da tişteki binê. Qe tişteki jî nabe. Bavo, em naçin.”

Baş e. Her yekî tişteki danê. Zêrê wê ma. Evana yê werin, axir du ade, sê ada ra derbas bin. Yê werin, birincî<sup>1040</sup> adê da dîsa ticaretê bikin. Teyî, yanî wî çaxî jî mîtanî<sup>1041</sup> van qorsana qorsan hebûne. Dême<sup>1042</sup> meriv girtine, birine, şerjê kirine. Çi kirine? Filan.

Evana têne wê ada ticaretê, yê ticaretê bikin. Gemî disekine. Evana diçe nava adê. Tabî zêr di cêva wî da ne, dibêje:

“Ez ê pê tişteki bikirim.”

Ha digerin, ha diçin. Diçe nava mal meydanîyê. Em bêjin dêna xwe dinê, her kesî tişt anîne. Yawo, dêna xwe dinê, merivekî jî meymûn anîne. Dêna xwe didê, ya rebbî, meymûnekî wisa rind di nav da heye. Yawo, emrê xwedê, dibê ku piştî xweyî meymûna dikevê, ew meymûnana hemû li wî dixin. Wexta berê wî dikevê, disekinin, filan. Ji terefê xwedê da, hema isa kêfa wî pê ra tê, dibê:

“Fiyeta wî çiqasî ye?”

[Firoşyar] dibê:

“Zêrek e.”

[Şex ‘Elî] dibê:

“Welle, hema ez ê vî meymûnî bikirrim. Hemin ça hebe, me têra perê wê jê ra tişt berav kirye. Hema ez ê evê jî biherim.”

Yawo, niha ku xwedê da, dide. Em bêjin, meymûnê dikirre. Têne îkincî<sup>1043</sup> adê. Dêna xwe didê, yawo, li wira xozneber<sup>1044</sup> xwe berdine binê behrê tiştî derdixin. Yanî em bêjin, cewherat filan derdixin.

Dêna xwe didê, ew [meymûn] jî hema sekinî. Ha nihêrî, ha nihêrî, jor da gurrr xwe avîte binê behrê. Yawo, dêna xwe didê, hat. Em bêjin, heke mêrika tiştê normal anîne, evî [meymûn] devê xwe, destê xwe tev tijî kirye. Yanî cewheratê tîne, qumrût-zumrût, tiştê isakîne<sup>1045</sup> tîne. Neyse<sup>1046</sup>, Şex ‘Elî jî musulman bûye. Merivekî durust bûye. Ewan kelmelê wî hildide.

Em bêjin, tên îkincî adê jî xilaz dibin. Êsib<sup>1047</sup>, yalaniz<sup>1048</sup>, meymûn digere. Gava sibê zû sibe

---

1040 ) Ewîl, yekem.

1041 ) Mîna.

1042 ) Anku, yanî.

1043 ) Duyem, duyemîn.

1044 ) Noqav, noqkar, xewas, qewas.

1045 ) Wisa.

1046 ) Werhasil.

1047 ) Bavê berhevkar.

1048 ) Lê, lê belê.

rehn dibe, eva meymûna ‘eynî nûta<sup>1049</sup> meriva, kîse zêr tîne dide Şêx ‘Elî. Suphanella! Îja ji bona çi tê? Yê ça be? Çakî dike? Kes nizane. Yalaniz, meymûn cin e. Cinê padişahê cinan e.

Dibê son<sup>1050</sup> netîce, ewana hatin adaya ya ku tê ra derbas bin û qorsan yê werne pêşyê. Em bêjin, ewana isa xwe ra eyer dikin ku bi şev lembê gemiya xwe be, yê çi be ditemirînin, dibê:

“Em ê derbas bin.”

Wexta ku têne wira, qorsan diçne pêşyê, digrin. Wexta ku digrin çakî dikin? Yanî em bêjin, dibê meriva dibin şerjê dikin. Goştên wan duxin. Idî çakî dikin?

Wexta ku diçin, yanî em bêjin, heke ji pêşyê ji paşyê be, çi be, qismek tucar girtin. Dibê:

“Yawo, îşev vana biherin, şerjê bikin.”

Yanî em bêjin, Şêx ‘Elî bi wan mervana va, qismekî pirr birin. Destpîyê wan girêdan. Kirne binê bînakî. Qedereke xurt sekinin. Şêx ‘Elî dêna xwe dayê, wa meymûn jî hate wira. [Şêx ‘Elî] go:

“Hinekî sekinîn. Em dizanin idî dinya tam kerr bû. Mi dêna dayê, çaxê [meymûn] rabû, tevzîk da xwe. Li ber mi sekinye, li çehvê mi dinhêre. Ça [ku] bêje ez destê te vekim, tê çi bidî mi?”

[Şêx ‘Elî] go:

“Mi go; wellahî tu destê mi vekî, wexta ku em bi silametî bigîjne nava kulfetê xwe, tu ji xwedayê xwe emîn bî, yanî ez ê kîse zêr bime te.”

[Şêx ‘Elî] go:

“Neysel, qudreta xwedê, wexta ku mi ‘eynî iha pê ra xeber da, mi dêna xwe dayê, mîtanî<sup>1051</sup> meriva parrava<sup>1052</sup> destê mi vekir. Wexta destê mi vekir, mi niçande mervê xwe, mi gote hevalê xwe.”

Mi go:

“Wehda xwedê wehd be, bax<sup>1053</sup> meymûnê destê mi vekirye. Mi kîse zêr dayê. Her yekî we ku hûn kîse zêr bidin, xwedê em ê [destên we] vekin. Ku hûn nedin, zaten meymûnê destê mi vekirye. Ez diçim.”

Tucara go:

“Mala te li ser me da xirabîyo! Kuro, ka wê em diçin, serveta me diçe, tu behsa kîse zêr dikî. Yawo, yeterkî<sup>1054</sup> em herin. Bavo, hema te çi gotye, em ê xebera te bikin.”

[Şêx ‘Elî] go:

“Bi emrê rebbê alemê, min û meymûnê me tev yalê<sup>1055</sup> hev kir. Destê wan vekir. Welle, hevalê me yê dinê çûn.”

Yanî eva, Tucar Ahmed ji Harûnê Reşît ra, a iha di çadirê da, li ser pîya sekinye jê ra dibêje. Yanî

---

1049 ) Mîna

1050 ) Axirî, dawî.

1051 ) Mîna

1052 ) Di paşiyê ve.

1053 ) Binêre.

1054 ) Bes.

1055 ) Alîkarî.

li wira Tucar Ahmed hê rûnenîştiye, ji wî ra dibêje. Îja hê ka li ku ye? Yê ça be?

Dibê wexta ku meymûn dide pêşya wana tene gemiyê, bi silametî tene derbas dibin. Xilaz dibin. Tabî, ‘eynî dîsa meymûn rê nîşanî wan dike.

Tucar Ahmed go:

“Şahî kete nava şîher. Gotin go, welle gemî hatin, tucar hatin. Dîya min e feqîr jî rabû. Dîsa ez hildam. Bi kulhalekî<sup>1056</sup> ez dikevim, rûdinê, radibim. Ez birme wira. Em qederekî sekinîn. Me dîna xwe dayê, hatin. Neyse, hema ça pêya bûn, mi dîna xwe dayê, meymûn di dîst da ne.”

[Şex ‘Elî] hat. Xwe avîte pêşya mi, go:

“Şêx Ahmed, selam ‘elêkim, ya xortê bixêr.”

[Tucar Ahmed] go:

“Ez nizanîm. Meymûn da destê mi.”

[Şex ‘Elî] go:

“Meymûnê xwe hilde here malê. Em hemû tene malê.”

[Tucar Ahmed] go:

“Welle dîya min e feqîr him meymûnê destkêş dike, him jî ketye bin milê mi. Em bi kulhalekî gihîştne malê.”

Mal jî piçike kolik e. Kolika tiral, mala tiral yê bibe çî? [Tucar Ahmed] go:

“Qederekî sekinî. Mi dîna xwe dayê, tucar hemû hatin. Xwe avîtnê ser destpîyê mi.”

[Tucaran] gotin:

“Heyran, xwedê em xilaz kirin. Perê te çî bixêr bû. Tu çî merivekî bixêr bûyî. Filan-bêvan.”

Neyse, mi we ra ça gotye, ‘eyne wisa dibêjin. Her yek ‘eynî kîse zêr didê. Ewan tişt-mişt, cewheratên ku ewî ji behrê derxistine, ewana jî dinê. Yalnîz<sup>1057</sup>, Şêx ‘Elî kerr dibêje:

“Kuro, bax<sup>1058</sup>, miqatî meymûnê xwe bibe. Meymûnê te, kulî rojê xwedê, sibe sibe kîse zêr te ra dianî. Yanî yê te ra bîne. Idî çî be ez nizanîm. Dayîna xwedê ye. Tê bi vî qîrarî xwe ra dewam kî.”

[Tucar Ahme] go:

“Bira tucar herin. Ez mame li wira. Ez çehv bi meymûnê, çehv bi zêra ketime. Mi dîna xwe dayê, valî-walî ez hey sivik bûm.”

Dîya mi gote mi:

“Kurê mi, rabe em herin. Lawo, a ihakîne<sup>1059</sup> nabe. Perê te zehf e û zêrê te zehf in. Îja em bêjin, em nava şîher da te ra dikanekî bikirrin. Îşekî bike. Filan.”

[Tucar Ahmed] go:

---

1056 ) Bi awayekî, bi şeklekî.

1057 ) Lê, lê belê.

1058 ) Binêre.

1059 ) Wiha.

“Em bêjin, [qey] tune pere! Em xwe ra çûne nava şîher. Cûmhûrîyet Cehdesîyê<sup>1060</sup> da, mi dikaneke mezin kirrî. Ez çehv bi pera ketime, idî ez sivik bûme. Rast nebûme, yalniz, sivik bûme. De îja em bêjin, ça benzerî<sup>1061</sup> van nalborcîya, yanî em îşekî mezin dikan. Meymûnê mi, kulî rojê xwedê, mi ra kîse zêr tîne. Birê xwe ra bêjim, îşê mi isa dibe. Xêncî wan zêra jî ez wisa zengîn bûme, tiştêkî ‘ecayîb. Birê xwe ra bêjim, yalniz em diçne dikanê. Meymûnê mi sibê inda<sup>1062</sup> dibe, êvarê tê. Em têne malê. Yanî ticareta mi isa dibe, tiştêkî ‘ecayîb. Rojekî em çûne dikanê, mi dêna xwe dayê, meymûnê mi xwe li dikanê dirêj kir, neçû. Yanî neçû. Îşê mi jî nebû ku nebû. Yanî em bêjin, çakî bûye? Em bêjin, tê bêjî qey çehvê xelkê girêdayî ye. Yanî em bêjin, tên ber dikana mi ra derbas dibin jî alvêra mi nabe. Neyse, heta nêzîkî ‘esrê isa ma, mi dêna xwe dayê, meymûnê mi rabû. Tevzîk da xwe. Hate nêzîkî mi.”

Mi go:

“Yawo, tu çî yî? Tu îns î? Tu cin î? Tu meriv î? Tu çî yî? Tê mi ra xeber dî, xeber de.”

[Tucar Ahmed] go:

“Neyse, valî-walî tevzî da xwe. Bi mi ra xeber da. Em bêjin, idî ez meymûnê xwe anlamiş<sup>1063</sup> bûm ku cin e. Me qedereke pir jî isakîne<sup>1064</sup>, bi xeberdanê derbas kir.”

Rojekî gote mi:

“Tucar Ahmed, tu çima nazewicî?”

Mi go:

“Yawo, de ka ez ê ça bizewicim? Em bêjin, îja gereke ez ji xwe ra yeke çevra<sup>1065</sup> xwe da, yeke weke xwe bibînim. Filan-bêvan.”

[Meymûnê] go:

“Tu dizanî, niha di vî şehri da qîza niftî heye. Qîza niftî zehf antîqe ye. Yanî kes nikare dehwe bike. Tê herî li ser kursîyê xazgînîya rûnê. Niftî perekî zehf dixaze. Yê bêje te, ewa yêra<sup>1066</sup> te nîne. Tê bêjî, bixaze qelenê xwe. Ewî go, hezar zêr. Tu bêje, sê hezar zêr. Tune zêr.”

“Eynî bi wî qirareyî diçe, isa rûdinê. Niftî hema ça der da hat, bihêrs gotê:

“Ew yêra te nîne. Filan-bêvan.”

[Tucar Ahmed] go:

“Yawo, eva kursîyê xazgînîya nîne? Wexta ez li ser rûniştîme, bixaze qelenê xwe.”

[Niftî] dibê:

“Yawo tu nikarî bidî. Hezar zêr e.”

1060 ) Di bajaran de kolana bajêr a herî mezin.

1061 ) Mîna, şîbhî.

1062 ) Winda.

1063 ) Têgihîştin, fehmkirin.

1064 ) Wisa.

1065 ) Devdor.

1066 ) Cî, cih, der.



[Tucar Ahmed] dibê:

“Sê hezar zêr.”

Qey tune ye zêr. [Niftî] dibê:

“Baş e.”

Neyse, idî dimîne mecbûr, fathê dixûnin. Axir de îja usûla wî wextî, pir dimînin hindik dimînin. Dibê yê here. Yê dehwata xwe bike. Usûla wî memleketî jî isa ne, zava diçe heft roja li mala xezûrê xwe dimîne. Îja paşê yê dehwata wî bikin. Ew bi bûkê va yê werne mala xwe.

Dibê eva wextê ku diçe, li wira heft roja dimîne, filan. Dibê de îja eva [meymûn] idî hewqas zêr dayê, pere dayê, qencî pê kirye, dibê eva [Tucar Ahmed] idî pê ra emîn e, xeber dide. Meymûn dibêjê:

“Îja ez te ra qencîke dinê bikim. Tê herî. Ew odaya ku tu derbasî cem jina xwe dibî diçî gerdekê, li milê rastê derîkî piçûk heye, tê derî vekî. Di wir da sandiqek heye. Li ser sandiqê kêrek heye. Di hundirê sandiqê da dîkek heye. Tê kêrê hildî. Derê sandiqê vekî. Tê dîk şerjê kî, zîkê dîk biqelêşînî. Te wexta qelaşt, tê da heft têjkê mehra hene. Tê serê wan heft têjkê mehra jê kî. Tê sandiqê deverû kî, herî hundir. Idî mirina te tune ye. Yanî kula te tune ye.”

De îja em bêjin, Tucar Ahmed isa bi wî va emîn e. Idî ew çî dibêje, ew xebera wî dike. Qet duşmîş<sup>1067</sup> nabe, nabêje:

“Ka tu kê yî? Tu ça dizanî? Ev çî ye?”

Dibê hemen diçe. ‘Eynî bi gotina wî dike. Wexta ku kêrê hildide, sandiqê vedike, dîk şerjê dike, serê wan heft têjkê mehra jê dike, gava sandiqê weldigerîne, dibê hemen bû qîrçîniya qîzîkê. Dibê meymûnê qîzîk hilda, herrek tu naçî!

Yanî eva [meymûn] padşahê cinan e, bûye aşqê wê qîzkê. Evî [meymûn] bi sêhrê, bi nihêrandînê, yanî bi wî qirarî kirye. Yanî eva kafîra wexta ku diçe ‘alema wan, ew têjkê mehra nahêlin here. Çimkîle<sup>1068</sup> diçe ku qîzîkê bîne, em bêjin jê ra nihêrîne, bi vî qirarî kirine, nikare ûlaşmîş<sup>1069</sup> be. Yanî eva [meymûn] jî aşqê qîzîkê ye. Wexta ku sandiq weldigere, ew sêr betal bû. Ewî [meymûn] jî zaten di ‘alema xwe da qîzîk hilda, bi çolê ket, bi hewaye ket, çû.

Bira ewa here. Ahmedê te ku di jor da berjêr bû. Dibê dîya qîzîkê, bavê qîzîkê rikêf kîrnê. Jê ra pîrs-gilî gotin, go:

“Xwedê belayê bide te. Tu bûyî bayîsê xwe jî, bûyî bayîsê qîza me jî. Kuro, em bêjin îsal çîqa sal e, ewa kafîra bibû bela serê me. Bibû aşqê qîza me. Bi tilisma, bi sêhrê me nihêrêbû. Me bi vî qirarî bağlamîş<sup>1070</sup> kiribû, nihêrî bû. Dême<sup>1071</sup> ewî tu xapandî, tu isa kirî.”

---

1067 ) Fikirîn.

1068 ) Çimkî.

1069 ) Gihîştin.

1070 ) Girêdan.

1071 ) Yanî, anku.

Evê te [meymûn] bira here. Ahmedê te yê çi bike? Erê. Ahmedê te jî dizvire. Yawo, qijkê qijk, idî hema li ku da diçe, dibê:

“Jina mi.”

Yanî derî dikanê dadayî ye. Idî tu ticaretêkî, tiştêkî jî nake. Erê. Ahmedê te perîşan dibê. Idî hema valî dibêje jina mi, walî dibêje jina mi. Digere, mervê aqılbaşî<sup>1072</sup> dibîne, [dibên]:

“Heyran, wellehî em bêjin cina jina mi birye.”

Dibê mervê mîtanî<sup>1073</sup> Ûsib<sup>1074</sup> ê mezin, aqilî dibêjnê:

“Kuro, bihîstandina me bihîstîye di binya vî şehîrî da bîra kewrana heye. Yanî em bêjin, di wir da rêya wana dewamî heye, rêya wan e.”

Eva [Tucar Ahmed] jî idî radibe, dibê:

“Zaten em bêjin, piştî wê jinê idî ez ê çi b’kim? Hema ez jî idî dimrim, dimînîm, ça dibe bira bibe.”

Evê te [Tucar Ahmed] radibe. Idî em bêjin, tabî xwe ra xerçlixê hildide. Nan-ava ku pê çend roja îdare bike hildide. Xwe ra xurcekî tijî dike. Diçe dikeve bîrê. Em bêjin, bi nerdewanê be, çi be, berjêr dibe, diçe.

Diçe dêna xwe didê, çi! Yanî di binê ‘erdê da bû ‘alemeke din. Em bêjin, rê diçe, bû dunyake din. Pir diçe, hindik diçe. Dêna xwe didê, li nêzîkî wî toz-dûmanek rabû. Neysene<sup>1075</sup>, dêna xwe didê, yawo, mehrekî çîl direve. Yawo, yekî reş î pîs daye pey, hema hema digre. Eva, nêzîkî lê dike. Wexta ku tê ber ra derbas dibe, dibê:

“Kuro, tu mîtanî meymûnê mi, tu bûyî bela serê wî mehrî. Tu ji vî mehrî çi dixazî?”

Eva, ça şûrekî davêjê mehrê reş, mehrê reş dike du qeta. Wexta ku ewî mehrî dikuje, dêna xwe didê, bi hezara deng hat, gotin:

“Yawo Tucar Ahmed, wey xwedê rehma xwe li dêbavê te bike. Xwedê te xilaz ke. Te ça xûşka me xilaz kir.”

Neysene, eva [Tucar Ahmed] gazî dike, dibê:

“Kuro, werne cem mi. Ez natirsim. Ka werne cem mi, xeber din, ka hûn kê ne? Filan-bêvan.”

Neyselê, tene cem, dibê:

“Heyran, welle em yên musulman in. Em nizam çend bira ne. Eva jî xûşka me ye. Eva kafra jî bibû aşqê xûşka me, me nedidayê. Filan... Ewna kafir in, em musulman in. Bi xwedê, tu nebyayî [ewî xûşka me] digirt.”

[Tucar Ahmed] dibêje:

---

1072 ) Aqilmend.

1073 ) Mîna.

1074 ) Bavê berhevkar.

1075 ) Werhasil.

“Îja mala we xira nebe. Em bêjin xwedê yardim<sup>1076</sup> kir, mi jî xûşka we xilaz kir. Pekî ewî kafirî jina mi hilda bir, we qe nedîtye?”

[Ewana] dibê:

“Heyran wellahî, jina te anye li vir ra birye. Yanî ewa padşahê cinan e. Padşahê wan kafiranan e. Yanê gûca<sup>1077</sup> me nagîjê. Em bi wan nikarin.”

[Tucar Ahmed] dibê:

“Lê, îja em ça bikin? Ez ça herme li wir?”

[Ewana] dibê:

“Hêsîrê wana yê nava me da hene. Welle idî çûyîna wira sadece<sup>1078</sup> bi wan hêsîrana dibe. Em ê gazî yekî kin, bînin. Te li wî sîyar kin, ewê te bihere. Yalaniz<sup>1079</sup>, tu kelîmê tewhîd nebêjî. Gava te kelîmeya tewhîd got, ewê di bin te da bihele, tê werî ‘erdê.”

Baş e. Tucar Ahmed, hê di çadira ku ji Harûnê Reşît ra birye, di wê çadirê da sekinye, xwe ra dibêje:

“Neysene<sup>1080</sup>, gazî kirin. Yekî hirç î pirç anîn. Ez lê sîyar kirim. De îja, bi mi ra gotine, kelîmê tewhîd neyne. Wexta ewî ez bi hewa xistim, ez pir çûm hindik çûm. Ewî ez isa bilind kirim, yanê isa li nêzîkî ‘esmana bûm, stêrk mîta<sup>1081</sup> loda dihatne xuyan. Li wê jorê, mi dêna xwe dayê, kalekî sipîçîl hema hat li ber mi sekinî, gote mi:

“Ahmed, kelîmê tewhîd bêje.”

[Tucar Ahmed] go:

“Carekî got, duduya got. Em bêjin, ez newêrim bêjim ku wanê musulman ji mi ra ha gotine.”

[Kalê sipîçîl] go:

“Binêre, aha tu nebêjî mi çehvê te derxist.”

[Tucar Ahmed] go:

“Ez mecbûr mam, mi go, la îlahe îlallah mihemed resûlellah. Wexta ku mi got, ewa mervê mi, bin mi da helya, ret<sup>1082</sup> bû. Ez jî mîtanî<sup>1083</sup> pereşotê jor da tême xarê. Yalniz<sup>1084</sup>, xwedê mi ra yardim<sup>1085</sup> dike. Ez pir hatim hindik hatim, ez nizanîm? Mi dêna xwe dayê, ez li ‘erdeki sipîçîl ketim. Mi dêna xwe dayê, çemek heye. Ez li berê çêm ketim. Pir çûm hindik çûm. Mi dêna xwe dayê, sîyarek li hespekî çîl î çehvreş sîyar e, orxe dike. Sîyar, çakî tê!” [Sîyar go]:

- 
- 1076 ) Alîkarî.  
1077 ) Quwet, hêz.  
1078 ) Tenê.  
1079 ) Lê, lê belê.  
1080 ) Werhasil.  
1081 ) Mîna  
1082 ) Xilasbûn.  
1083 ) Mîna  
1084 ) Lê, lê belê.  
1085 ) Alîkarî.

“Tucar Ahmed, selam ‘elêkim.”

[Min go]:

“ ‘Elêkim selam.”

[Sîyar] go:

“Yawo, xwedê ji te razî be. Te wê rojê xûşka me ça ji wî kafîrî xilas kir?”

Mi go:

“Neysel, xwedê ji te razî be. Wexta mi xûşka te ji wî kafîrî xilaz kir, îja tu bi xwe dizanî ewî kafîrê hanê jî jina mi birye. Mi ra rêkî vekin. Kuro, ez musulman im hatime nava we. Ka em ça bikin?”

[Sîyar] go:

“Heyran, wellahî, billahî, tillahî, em pê nikarin. Yanî em bêjin, em valî musulman in. Ew jî kafîr in. Eva sûra hanê mifriq-pola binhêre, çîqa bilind e. Yanî wan kafîra çêkirye. Eva hidûdê me ye. Yanî em nikarin derbas bin.”

Min go:

“Îja qet çî bilgîya<sup>1086</sup> te pê heye? Tê ça bikî?”

[Sîyar] go:

“Bilgîya mi iha ye. De îja eva çîqa sale jî, em bêjin li pey jinikê çûye. Nava mervê xwe, ‘eşîra xwe, ulka<sup>1087</sup> xwe negeryaye. Yanî kafîrî wisa hij wê jinkê dike. Yawo, cîyê jinikê li ser dareke iha, di nava vî çêmê dikşe da wisa çêkirye [ti kes nikare bigîjê]. Cîyê jinikê li wir çêkirye. Welle ku tu xwe bavêjî nava vê avê ku tu herî, tê bi wî qîrarî jinikê bibînî. Hema idî tu û şansê xwe. Tu jinikê bibînî, eva kafîra li wir be, li wir nebe, te bikuje, ça bike, ez nizamim? Sadece<sup>1088</sup> çareya te iha ye.”

Ew jî hema ku da diçe, dibê:

“Ka jina mi?”

[Tucar Ahmed] xweyî soza xwe bûye, dibêje:

“Bira ez werme kuştin. Mi mirina xwe daye ber çehvê xwe. Hema tenê jina xwe xilas bikim. Kuro, mi çî li serê xwe kir?”

Dibê eva xwe davêje avê. Idî pir diçe hindik diçe, rast lê tê. Yanî em bêjin, dêna xwe didê, heqîqeten di nava avê da yêra<sup>1089</sup> wê çêkirye. Em bêjin, xwe ra li ser darê, li wê derê sekiniye. Eva diçe. Jinik hew dinhêre, Tucar Ahmed derket! Neysene, [jinik] dibê:

“Hey helal be ji te ra. Tucar Ahmed, tu xweyê xwe sozê xwe yî. Kuro, tu ça hatî vira?”

[Tucar Ahmed] dibê:

“Em sarilmîş<sup>1090</sup> hev bûn.”

---

1086 ) Agahî, zanîn.

1087 ) Welat.

1088 ) Tenê.

1089 ) Cî, cih, der.

1090 ) Hembêzkerin.

Mi gotê:

“Qîzê, niha îdî îşê girîn û kenê tune ye. Niha mi ra çarekî bibîne. Mi tu dîtî. Em ê çakî bikin? Em ê ça li vir xilaz bin?”

[Jinik] dibêje:

“Tucar Ahmed, kafirî pirrî ku hij mi dike, yanî çîqa tiştê kara wî zirara wî heye hemû mi ra gotye. A binhêre, evê dara hanê va dûpişkek heye. A li vira, eva xençera li darê dayî, tê pozka xencerê bidî dûpişkê, dûpişkê daynî ‘erdê, êgir li ser dadî. Wexta ku dûpişk qizmîş<sup>1091</sup> bû, ‘efrît yê li ber te bisekinin bêjin, padişahê mi em dinyayê xirav kin, ava kin? [Wî çaxî] hukmî wî dikeve destê te.”

Evê te, ‘ecele xencerê ji dêr dikşîne. Pozka wê dide dûpişkê, berjêr dike, êgir li ser dadide. Ku wexta dûpişk qizmîş dibe, hemen du hev ‘efrît li ber disekin, dibê:

“Padişahê mi, bixaze mirazê xwe. Em dinyayê xirav kin, ava kin?”

[Tucar Ahmed] dibê:

“Na. Hema ez dixazim hûn ê kafirê padişahê vî memleketî bigrin, destpîyê wî girêdin, bîne vira.”

Îdî hukim dikeve destê ‘efrîta. Em bêjin, eva kafira wextekî hew dinhêre, ‘efrît hemen wî digrin. Bi jîka-kebîn<sup>1092</sup> dest-pîyê wî girêdidin. Dibê wexta ku li ber wî [Tucar Ahmed] datînin, dibê:

“Padişahê mi, em ça bikin?”

[Tucar Ahmed] dibê:

“Hûn herin. Mi ra kûpekî, hinek mifriq-pola bînin.”

Dibê kûpekî, hinek mifriq-pola tînin. [Tucar Ahmed] ser tepê ewî dixê kûp. Dibê ‘eynî mifriq-pola jî tîne dihelîne, berdide li ser kûp, dibê:

“Biherin. Yanî behra çîqa kûr kîjan be bavêjne wê behrê, bira here.”

Evê te [meymûn], bira bi vî qirarî here ku here. Evana [‘efrît] çî dikin? Dîsa tîne cem, dibê:

“Padişahê mi, tu çî dixazî?”

[Tucar Ahmed] dibê:

“Ez wê dixazim. Niha em bêjin, textipayê vî, yanî mala wî, baxê wî, baxçê wî, sûra wî idî çî hebe, hûn ê bi vî qirarî rakin, li şehrê Besrayê li perrê şîher daynin.”

De îja ‘alema cina bûye. Evna [‘efrît] ‘eynî bi wî qirarî, yanî ew mala wî, sûra wî, ew bax-baxçê wî, zêr-zîvê wî radikin, li wira datînin. Wexta ku datînin, dibê şahî dikeve nava şîher. Yanê idî em bêjin, herkes hij Tucar Ahmed dikin, dibê:

“Kuro, mêrik xweyê xwe sozê xwe bû. Bi vî qirareyî çû.”

[Tucar Ahmed] dibêje:

“Padişahê mi, tu padişah î. Yanî îşê te bi kesî tune ye. Em bêjin, îro niha ez tucar im. Vatantaşê<sup>1093</sup>

1091 ) Qelandin, biraştin.

1092 ) ?

1093 ) Welatî.

te me. Mi bi vî qirarî, bi vê zorîyê, xwedê daye mi, mi qazanc kirye. Tu niha çi dixazî ez bime te?”

Dibê em bêjin, wî çaxî Harûnê Reşît dibê:

“Mesele ev e.”

[Tucar Ahmed] ‘eynî ewê cewheratê didê.

A ji birê xwe ra bêjim, ew diçe bi mirazê xwe şa dibe. Hûn jî bi mirazê xwe şa bin. Xwedê şixula we li hev bîne. A eva ret<sup>1094</sup> bû.

ÇÎROKBÊJ: HECÎ HENÎFÎ

HERÊM: GUNDÊ ŞEREFXANÊ JÊRÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 63

PERWERDE: NEXWENDE

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 28/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1094 ) Xilas, kuta.

## 9. ÇÎROKA HEBKAHINARÊ<sup>1095</sup>

Hebe nebe rehme li dêbavê hazira be.

Hebû, qîzikek bû, cîya wê bû, bavê bû. Qîzik radibe diçe nava gund. Dibêje qîzê hevalê xwe, dibê:

“Em herne pincarê.”

Radibin diçne pincarê. Xwe ra diçne pincarê. Serê xwe dixne ber xwe, xwe ra pincara xwe diçinin. Isa jî pincar çinîne, hebe bîst torbe tijî pincar kirine. Serê xwe bilind dikan, dêna xwe dinê, hema êvar e. Êvar li wan ketye. Ewa qîzka dibêje hevalê xwe, dibêje:

“Ka em ê ça bikin? Ça nekin? Ka îja derenge. Em ê ça bikin?”

Radibin. Hema pincara xwe, xwe ra dixne kolik, hêmû tê da radizên. Qîzik, sibê zû radibe. Qîzik radibe, dêna xwe didê, hevalê wê libek tine ne. Libek hevalê wê tine ne. Hema ewa liba tenê dimîne. Ewa tenê dimîne. Qîzik, sibê zû radibe, şeveqa tarî ye. Radibe, dêna xwe didê, heft dêw ser ra sekinîne. Heft dêwê çehvhêşin ser ra sekinîne, dibê:

“Welle, em ê buxwin.”

Dêwê birê wanê mezin dibêje wanê dinê, dibê:

“Na, em naxun. Kuro, em diçne nêçîrê. Hema kes tine nanê me hazir ke. Kes tine ç a me hazir ke. Em ê hema xwe ra biherin têxne xûşka xwe. Hema bira nan-ava me hazir ke.”

Radibin, dibê:

“Erê welle, xebera te ye.”

Hema radibin, hildidin dibin. Qîzik digrî, nizam çi. [Dêw] dibê:

“Na, em tiştêkî te nakin.”

Mala wan jî, em bêjin zehf dûrî gund e. Zehf dûr e. Hildidin dibin, dibê:

“Eva mala me ye. Tê me ra nanekî hazir kî, çaykî hazir kî. Em li nêçîrê tîn, hema em a iha bê nan bê çay dimînin.”

Qîzik jî sibê zû radibe, tendûrê dadide. Hema wan ra nanê wana, ç a wana, wan ra hazir dike. Isa hij wan jî dike, dibê:

“Kanê birê mi wana nehatin?”

Tam mêla xwe daye wana da. Çehvnihiyê dêw in, dibê:

“Kanê nehatin?”

Dêna dayê, dibê:

“Hatin.”

Ew [dêw] jî zehf hij wê dikan. Rojekî isa, duduya isa, sisiya isa. Em bêjin, sê-çar mal in. Mala dêwa, hinek valî avê ne, hinek jî walî avê ne. Malê dêwa hinek valî avê ne hinek jî li walî avê ne.

---

1095 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

Dibê pîrek tê walî, dibê:

“Cê<sup>1096</sup> eva qotek isa destê mi da ewk bûye, cê ha bigre buxwe. Tu jî nan-manê bir-mirê xwe da dikevî tu niha birçî yî.”

Qîzik dibêje:

“Na na, ez birçî nabim. Ez xwe birçî nakim.”

Pîrê, jehrê dixê nav. Ewî qotî dide qîzikê, qîzik duxwe. Nan-manê wan jî hazir dike. Qîzik dibe def. Qîzik dimre.

Dêw tên. Dêna xwe dinê, wê qîzik mirye. Ser qîzikê da digrin, dibê:

“Ka em ça bikin? Ça nekin?”

[Dêw] dibê:

“Em ê ça bikin? Hema em ê rabin, herin. Qutîk e pola bînin. Em ê têxne qûtyê.”

Ewekî [pînekî] jî davêjne ser. Datînine ser rêya xwe, dibê:

“Em çûyîne hatin em ê ser da bigrîn. Em ê hatîne hatin em ê ser da bigrîn. Me zehf hijê dikir.”

Radibin isakîna<sup>1097</sup> dîkin. Rojek isa, dudya isa, deha isa, bîstî isa derbas dibe diçe. Paşayê wî gundî dibêje ewê xwe, dibêje meriv-merivê xwe, dibêje wezîr-wekîlê xwe, dibê:

“Hûn ê herin. Ewê qutya hanê mi ra hildin, werin.”

[Wezîr-wekîlê paşa] dibê:

“Paşa, welle tu xaş bî. Ka serê rêya dêw in. Em nikarin herin bînin.”

[Paşa] dibê:

“Na. Bûye hûn ê herin bînin, nebûye hûn ê bînin.”

Radibin diçin. Ewê qutiyê nava hev ra dîkin, hildidin tînin. Dîkin nakin derê qutyê venabe. Qutya pola ye. Dişkênin, ça dîkin, venabe. Ewê qutiyê hema isakîne<sup>1098</sup> xwe ra datînine wê derê, disekine.

Berdestyeke mala paşê hebûye. Pîrek e. Pîrek e berdestiya mala paşê ye. Ewa qutya jî wê derê ye.

Ewa qîzka dibe serteşîkî, hundirê qutyê da derdikeve. Dibe serteşiyê berê [ku] me ça hirî pê dirêsa. Ji sêrê ye, da. Hindirê wê qutyê da derdikeve. Xwe xwe derdikeve, dibe serteşîkî. Hema xwe ra nava mala paşê da ne. Pîrê jî hema hildide, dibê:

“Hîî, serteşîke çîqa rind e. Ez ê biherme mala xwe. Ez ê xwe ra serî kim, pê hiriyê bişkinim.”

Hildide tîne. Datîne pencera xwe. Pîrê nizane. Datîne pencera xwe. Pîrê idî diçe nava mala paşê da dixevite, da. Pîrê jî hema mala xwe datîne, halê xwe dihêle. Diçe îşê mala paşê dike. Vala nabe. Mala xwe, halê xwe, karê xwe dihêle, diçe. Tewneke pîrê jî dar va ne.

Ew serteşî xwe ra dibe qîz, xwe ra qîzekî. Xwe ra dikeve nav malê da. Wextê ku pîrê tê, dibe serteşî dîsa diçe pencerê. [Qîzik] dibê:

---

1096 ) Ca, de, dê, haydê.

1097 ) Wisa.

1098 ) Wisa.



“Ez zehf çênakim. Bira pîrê nekeve şikê.”

Pîrê jî pîr e. Em bêjin, pîreke halê xwe da ne. Lêdide diçe. Tê, dêna xwe didê, wê mala pîrê tertemîz e. Tewna pîrê çêkirye. Zehf jî çênake, hindikî çêdike. Tewn, da. Berê tewn çêdikirin, xalîçe çêdikirin, berr çêkiririn, çîwal çêdikirin. Ya pîrê jî çîwal in, çîwal bûne. Berê çîwal çêdikirin, da. [Pîrê] dibê:

“Welle, wê [îşê] mala mi hemû kirye. Tewna mi jî çêkirye. E ça bikim? Ça nekîm? Ez ê xwe lê veşêrim.”

Pîrê tê. Hema dikeve pişt derî, xwe vedişêre. Dêna xwe didê, ew serteşîya li pencerê peya bû. Bû qîzeke çardasalî. Tu li qîzê dinhêrî, şerm dikî li qîzîkê binhêrî! Radibe tê, wan derê pîrê temîz dike. Tewna pîrê çêdike, ret<sup>1099</sup> dike. Wextê ku teqîniya derî tê, dibe serteşî diçe pencerê.

Wextê ku pîrê ber dêrî derdikeve, qîzîkê digre, dibê:

“Ez cîya te me tu jî qîza min î.”

[Qîzîk] dibê:

“Tu behsa mi kesîkî ra jî nakî. Hal-mesele ihakîna<sup>1100</sup> ne. Tu nabêjî ti kesîkî jî.”

Pîrê dibê:

“Ez nabêjme kesîkî jî. Tu xwe ra malê da be. Ez ê jî herme mala paşê. Ez berdestiya wan im.”

Erê. Idî pîrê diçe berdestiya wan dike. Nabêje jî. Qîzîk jî xwe ra karê malê dike. (Pîrê) tê, qîzîk dibêje:

“Qe çi mala paşê hebû? Çi tine bû?”

[Pîrê] dibê:

“Welle, çi mala paşê hebû? Welle, pêncî hespê paşê hene. Paşa yê hespa belav dike. Hespê paşê jî zehf jar in. Gundî yê xweyî kin.”

[Qîzîk] dibê:

“Here me ra jî yekî bîne. Yeke jar. Nava hespa da yê çîqa jar e, ew jî çîqa jar be, ewî me ra hilde bîne.”

[Pîrê] dibê:

“Ka tê çakîna<sup>1101</sup> xweyî kî? Tê ça bikî?”

[Qîzîk] dibê:

“Tu here bîne. Îşê te pê tine.”

Pîrê jî dibê:

“Yekî jî bine mi da. Kîjan nav da jar e, ewî bine mi, ez ê xwe ra biherim.”

Hemû bi pîrê dikenin, dibê:

---

1099 ) Xilas, kuta.

1100 ) Wiha.

1101 ) Çakîna

“Îja tu wê berdestiya malê paşê yî! Tê ça hespa paşê xweyî kî?”

[Pîrê] dibê:

“Tu bide mi, ez ê xweyî kim.”

Navê wê qîzkê jî Hebkahinarkê ye. Navê wê qîzkê Hebkahinarê ye.

Diçe hespa paşê hildide tîne. Hespê tîne. Qîzik, hespê xweyî dike. Qîzik, rojê danekî diçe destê xwe li ku dişo, hemû dibe gul-sosin. Hemû dibe çiçek. Qîzik mûta<sup>1102</sup> sêrê ye, ha. De îja ewî hespê isa kok dike, hesp idî derî ra dernayê. Dibê rojek isa, dudya isa, meh çûye, sal çûye. Dibê:

“Yê hespa berav<sup>1103</sup> kin.”

Hespê paşê berav dikin. Dibê:

“Hêspê kê maye, yê kê nemaye?”

Dibê:

“Welle, yê pîrê ma.”

Pîrê jî hesp kirye gomê da, qîzikê hesp xweyî kirye. Diçin, [pîrê] dibê:

“Welle, hesp dêrî ra dernakeve.”

Hemû tiranê xwe dikin, dibên:

“Çakîne<sup>1104</sup> hesp li dêrî ra dernakeve?”

Diçin, dîwarekî diqelêşînin. Hespê derdixin. Hesp isa ne, tu şerm dikî li hespê binhêrî! Dibê:

“Pîrê, te çakîne xweyî kirye?”

[Pîrê] dibê:

“De, mi xweyî kirye.”

Dibê:

“Te ça xweyî kirye?”

[Pîrê] dibê:

“De, welle mi xweyî kirye.”

Rojek isa, dudya isa. Mala paşê dibhê, dibê:

“Welle qîzeke pîrê heye. Navê qîzikê Hebkahinarkê ye. Welle bi salixa ewê qîzikê hesp xweyî kirye.”

Rojekî isa, duduya isa, kurê paşê dibê:

“Hûn ê destê qîza pîrê mi ra bigrin.”

Diçin destê qîza pîrê jê ra digrin. Destê qîza pîrê ji ewê ra, ji kurê paşê ra digrin. Dixine def-zirne. Qîza pîrê sîyar dikin, hildidin dibin. De îja em bêjin, yanî qîzik jî heqa poz bi kurê paşê nake, heqa poz pê nake. Du zarê wê hene. Du zar jî jê çêdibin, ji kurê paşê çêdibin. Kurê paşê ça dike, dibê

---

1102 ) Mûta.

1103 ) Berhev.

1104 ) Çawa.

xeber nade, dibêje:

“Yawo, evê çar rojekî pak mi ra xeber neda. Mi ra xeber nade. Eva, qe nizam zimanê wê tine? Eva lala e? Eva çî ye?”

Radibe diçe. Du zarê wî hene. Herdik<sup>1105</sup> jî zarê kurîn in. Diçe sevekî tîne, dibê:

“Bisene<sup>1106</sup>. Ez ê evê sêvê daynime wira. Zatî herdu zarê mi yê bona sêvekî hev xin. Zatî zar in. Yê bona wê sêvê hev xin. Mecbûr e, cîya wan jî xeber de. Kanê cîya wana lal e? Xeber dide? Xeber nade?”

Dibê wextê herdu zar bona wê sêvê hev dixin, [dîya wana] dibê:

“A de dêna xwe bidê, belkî bavê we bimre. Wextê bavê we heb’ya, bavê we bav bûya, yê we ra du sêv bianîya, sêvek nedianî. We bona vê sêvê hev nedixist.”

Qîzik jî hema tîne, wê sêvê ortê da ker dike, kerîkî dide wê zarê, kerîkî jî dide wê zarê. Mêrik jî xwe ditelîne. Mêrik tê, dibê:

“Pekî tu çîma bi mi ra xeber nadî? Tu dibêjî ez lall im. Ez kerr im, lall im. Tu çîma mi ra xeber nadî? Ne wê tu xeber didî.”

A idî ewk dike, bi hev ra xeber didin. Mêrik radibe, ewk dike, dizewice. Kurê paşê dîsa ser dizewice, jinekî tîne. Zengîn e, xwe ra dizewice. De îja ew jinka dinê jî daha<sup>1107</sup> poz pê nake. [Kurê paşê] dibêje jinikê da, dibê:

“Were nan-avê bide min, çay bide min.”

Ewa pêşyê, Hebkahinarê dibêje, ew jî zehf bedew e, isa bedew e, dibê:

“Here. Te bi mi nedikir. Ez ê werme cem te çî? Te wextê poz bi mi nedikir, wextê te mi ewk nedikir, îja wextê mi te ra xeber nedida, îja te çîma mi ra xeber nedida? Îja tu çûyî, axirîyê da zewicî. Te çû ew anî. Ez bi te nakim.”

Dibê her<sup>1108</sup> zarê wê jî idî mezin dibin. Her zarê qîzikê, herdik jî mezin dibin, dibine xort da. [Hebkahinarê] radibe idî li mêrik diqete. Idî li mêrê xwe diqete. Xwe dide ber her zarê xwe. Diçe cem herdu zarê xwe. Her zarê idî mezin dibin, dibine xort, dizewicin.

Idî jinik [Hebkahinarê] dimîne. Qîzik [Hebkahinarê] kor dibe. Dîsa tê cem mêrê xwe da. Dîsa tê cem merê xwe. Dîsa tê cem kurê paşê. Wî çaxî, wextê ku kor dibe, ew [û] kurê paşê idî wî çaxî hev ra şa dibin. Bi mirazê xwe şa dibin.

A idî wir da xilaz dibe.

ÇÎROKBÊJ: AMOJNA SUHBET, HERÊM: GUNDÊ ŞEREFXANÊ JORÊ [EBEXE-WAN]

TEMEN: 45, PERWERDE: NEXWENDE

DÎROK: 20/09/2016, BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1105 ) Herdu.

1106 ) Bisekine.

1107 ) Zêde.

1108 ) Herdu.

## 10. ÇÎROKA HEMZE PELEVAN<sup>1109</sup>

Dibê carek ji caran rehma xwedê dêbavê hazira.

Eva çîroka ya Hemze Pelevan e. Dibê paşak hebûye. Kurekî wî, navê wî Hemze Pelevan bûye. Rojekî di koşka xwe da xwe ra pêgermokê digerîne. Dêna xwe didê, pîreke sêhr, curnekî avê mîtanî<sup>1110</sup> beroşekî ser pişta wê ye. Tîjî av e. Dide pala çîyê, diçe mala xwe. Dibê Hemze Pelevan tîr-kevana rastî pîrê dike, dibêje:

“Ez ê daynime pîrê. Mi li kûp da, eva mi lêda. Jixwe pîrê jî girt, ketime heyrê. Pîrê, bira geber be here.”

Dibê çaxê rast dike, ça datîne, orta<sup>1111</sup> kûp dixê. Dibê av ser boçka pîrê da tê xarê. Pîrê serê xwe bilind dike, walî dora xwe dinhêre. Dibê birê xwe ra bêjim, wexta tîr-kevana rastî pîrê dike, tîr kevana boçka pîrê dixê, av ser pîrê tê. Pîrê dibê:

“Belkî tu bibî aşqê Xeremcoya qîza Qaqayê Qaweranê, Çîn Maçînê.”

[Hemze Pelevan dibê]:

“Pîrê, Xeremco kê yê?”

[Pîra Sêhr] dibê:

“Hewqas mi te ra go.”

Hemze Pelevan roj bi rojê diçe xirav dibe, roj bi rojê diçe nexaş dibe, [dibê]:

“Kuro eva Xeremco kê ye? Kuro, eva çi bû pîrê mi ra go?”

Dibê dixtor têne ser, hekîm têne ser, dibê çi tê ser, dibê dermanê wî nabînin. Hekîmek têne ser, dibê:

“Hebe nebe, eşqê Hemze Pelevan revandîye. Bira here nêçîrê.”

Dibê ew bi wezîr-wekaletê bavê xwe, qazî-niftîyê bavê xwe, xulam-xizmetkarê bavê xwe, diçne serê çîyakî. Xwe ra seyragê, xwe ra kêfê dîkin. Dibê dibêje rûspîkî bavê xwe:

“Tu nizanî rêya Çîn-Maçînê kalî<sup>1112</sup> dikeve?”

[Rûsipî] dibê:

“Welle, ez nizanim. Kalkê mi jî mîta<sup>1113</sup> mi wezîrê kalkê te bûye. Gotyê, rêya Çîn-Maçînê rohilatê ye.”

Dibê eva li hespê xwe sîyar dibe. Xatrê xwe wana dixaze, dibê:

“Bêjne bavê mi da, ez hatim ez kurê wî me. Ez nehatim, bira destê xwe ji mi bişo.”

Eva parrava dine pey. Qe pê ra dighînin? Hemze Pelevan, heger pir tê heger hindik tê. Dêna didê, perrê şiherekî da hine zar li hev dixin. Eva çurtumê suhê<sup>1114</sup> hene, yek, çurtume tîjî xulî dike,

1109 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1110 ) Mîna, nola, fenanî.

1111 ) Nav, navend.

1112 ) Kî alî, kîjan alî.

1113 ) Mîna, nola, fenanî.

1114 ) Cureyekî giha ye.

hema berdide çehvê kîjan zarê kor dike. Hemze Pelevan xwe ra lê sêr dike. Dêna xwe didê, dibê:

“Kuro, ewî zar hemû kor kirin.”

Ew [û] Hemze Pelevan dine hev, li hev dixin. Dibê Hemze Pelevan pê nikare. Hemze Pelevan dêna xwe didê, mîtanî<sup>1115</sup> çîlpîyekî<sup>1116</sup> nava avê, hema nava dest-pîyê wî da iha diçe tê. [Hemze Pelevan] dibê:

“Qurban, navê te çî ye?”

[Ew zarok] dibê:

“Navê mi Kindir e.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Kuro, were ez rastî hespa bime te, ez rastî şûr bime te, ez rastî gurz bime te, rastî şer ke.”

[Kindir] dibê:

“Hahhh?”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Welle.”

[Kindir] dibê:

“Ê de baş e.”

Herdu diçne dest-rûye hevdu, dibne birê hevdu. Evna heger pir tèn heger hindik tèn, perrê şiherekî ra, devê behrekî ra derbas dibin. Dêna xwe dinê, qîzek xwe ra camê da rûniştîye quranê dixûne. Evna dajone derê mala qîzikê. Dikevne hundir, dêna xwe dinê, ya rebbî! Dêwek di hundir da nîne, zangek<sup>1117</sup> di hundir da ne!

Yeke wî yeke dêw. Dibê ew [û] dêw li hev dixin. Dibê Kindir şûrek davêje serê dêw. Dibê du serê dêw dibe, du serê wî jêdike. Dimîne sê serê wî. Dibê dêw mîtanî çîlpîya, nava destê wan da iha diçe tê. Kindir û dêw bona qîzikê, seva qîzikê li hev xistin. Dêw dike nake sitara dêw dêst [Hemze Pelevan] da tine. Dêw dibê:

“Yawo, tu nayê ez vê qîza xwe ya han bime te? Ez qîza xwe bide te. Tu bibî zavê mi.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Erê.”

Dibê dêw qîza xwe lê mehr dike. Hemze Pelevan bi awayê şer’a Miheme, qîza dêw helalî xwe ra dixaze. Dibê Hemze bi qîzikê va xwe ra odekî ne. Kindir bi dêw jî xwe ra odekî ne. Dibê Kindirê te dibê:

“Kuro, ez Hemze Pelevan ça bibînim? Kuro, ez bêxewbûna mirim.”

Dibê birê xwe ra bêjim, Hemze Pelevan derdikeve desmêja mêja subê, Kindir dibîne. Kindir dibe:

---

1115 ) Mîna.

1116 ) Darên piçûk ên hişk û hola

1117 ) Kevirên qerase û zêde mezin ra gotin.

“Kuro Hemze, tu hatîyî herî Xeremcoyê bînî. Kuro, îja tu ketî paşka<sup>1118</sup> qîza dêw. Kuro, ez bêxewbûna mirim.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Temam. Îja ez ê bêjme qîzikê. Bira sibê karê xwe bike. Sibê em ê herin.”

Eva dibêje qîza dêw, dibê:

“Welle, em ê subê herin. Karê me bike. Em ê sibê herin.”

[Qîza dêw] dibê:

“Hemze, tê herî ku? Ka ez ê ça bim?”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Ez hatim, eva mi tu birî. Welle, ez nehatim, tu dizanî.”

[Qîza dêw] dibê:

“Baş e. Yalaniz<sup>1119</sup>, tu çûyî, tê nîşanê xwe bidî cem mi. Tu çûyî, tê tişteki xwe bidî cem mi, hedyake xwe ye qîmetlî<sup>1120</sup>.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Baş e. Ez ê wê xencera xwe bime te. Tu gava subê ra, du rikat mêja sibê kir, devê xencera mi iha ji qalib kaş ke. Hege a iha teyisî, ez a iha firaqetîyê me. Lê devê wê paxs<sup>1121</sup> girtibe, ez tengasîyê da nim. Idî gor bavê te. Tu mi xilaz dikî jî tu dizanî, tu mi xilaz nakî jî tu dizanî.”

Qîzik isa diqîre mîta<sup>1122</sup> teyr, dibê:

“Bavo, welle zavê te dibê ez ê herim.”

[Dêw] dibê:

“Lawo, bide xatrê xwedê, bira herin. Du pirîskê êgir in, pekîyane mala mi. Ez bêxewbûna mirim. Ez xurifîm. Bira herin.”

[Qîza dêw] dibê:

“Baş e.”

Dibê birê xwe ra bêjim, evna radibin. Dêw wana tîne devê behrê. Dibê têxe hundirê gemîyê. Bira ewna ser behrê kevin. Dibê evna êpêce<sup>1123</sup> ser behrê diçin. Şev dikeve ser wana. Dibê terefê xaliqê ‘alemê da firtonêk çêdibe. Dibê gemîya wana li ser behrê pirtîpirtî dibe. Dibê heryek li ser textekî diçe.

Em werne Kindir. Kindir, xorte, hê nezewicî ye. Kindir dêna xwe didê, textê wî diçe tişteki dikeve, dibê:

---

1118 ) Paşil, paxil.

1119 ) Lê, lê belê, bes.

1120 ) Biqîmet, binirx.

1121 ) Zeng, jeng.

1122 ) Mîna, nola.

1123 ) Gelek, zehf, zêde.

“Reqqq...”

Cake<sup>1124</sup> gêrî<sup>1125</sup> dizvire. Eva li ser text e, dibê:

“Vê carê textê mi yaqlaşmîş<sup>1126</sup> bû, ez ê xwe bavêjim.”

Wexta textê wî diçe, li wî tiştî dikeve, Kindir xwe davêje. Dêna xwe didê, dunya reşayî ye. Kindir, devê behrê da, xwe ra kumê xwe dikşîne serê xwe, radizê.

Wê tempoyê<sup>1127</sup>, ‘eynekî Hemze jî textê wî diçe tişketî dikeve, dibê:

“Reqqq...”

Gêrî<sup>1128</sup> dizvire. Ew jî xwe davêje. Dêna xwe didê çi? Reşayî ye. Herdik<sup>1129</sup> xwe ra reşayî da radizên.

Em werne Kindir. Kindir çehvê xwe vedike. Dêna xwe didê, ro hatye taştê. Perrê şiherekî da ye. Dikeve nava şihê, digere. Valî diçe, walî tê. Diçe, dibe kurê Ahmedê Soldirî. Dibe kurê wî. Bira Kindir isa dewam ke.

Em werne Hemze. Hemze çehvê xwe vedike. Dêna xwe dayê, adeke orta<sup>1130</sup> heft behra, li ser dîrekekî [ku] çûye hewa, bînak-apartmanek çêbûye. Hemze Pelevan, bi lingê xwe apartmanê va hildikişe, diçe. Dêna xwe didê, ya rebbî! Qîzek di yataxekî da ranezaye, hîva çarda ye di yataxê da razaye! Destê xwe ha dide qîzikê, qîzikê wêda dike. Ew jî dikeve nava cîyê qîzikê, xwe dirêj dike, radizê.

Qîzik ser hemdê xwe da tê. Dêna xwe didê, ya rebbî! Xortek paşka<sup>1131</sup> wê da ne. Deyn<sup>1132</sup> lê dike:

“Filankes, çika rabe tu kê yî hatî vira?”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Welle , çi te veşêrim çi xwedê.”

[Qîzik] dibê:

“Ez Hemze Pelevan im.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Tu kê yî?”

[Qîzik] dibê:

“Welle, ez Xeremco me.”

[Hemze Pelevan] dibê:

---

1124 ) Dîsa, careke din.

1125 ) Paş, paş ve.

1126 ) Nêzîkbûn.

1127 ) Lez, bizav.

1128 ) Şûnda, şûnde.

1129 ) Herdu.

1130 ) Nav, navber.

1131 ) Paşil, paxil.

1132 ) Deng.

“Pekî<sup>1133</sup> tu Xeremco bî, îşê te li vira çî ye?”

[Xeremco] dibê:

“Welle dilê qîralê şiherekî ketibû min. Idî kafir bû. Bavê mi pê nikaribû. Bavê mi, tîrsa wî sêr da ser min. Ez avîtme vê ada orta heft behra. Xîncî mi, xwedê, bavê mi, kes nizane. Bavê mi, hefte-hefte nanê mi dişîne. Dibê, hetanî hefteke dinê cake<sup>1134</sup> ez dişînim.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Baş e.”

Dibê idî çî terî mehra xwe dibirre dibirre, ez nizanîm. Ew dibe kulfeta wî, ew jî dibe mêrê wê.

Dibê rojekî Xeremco, dibê:

“Hemze.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Ha.”

[Xeremco] dibê:

“Rabe, çika em bigerin. Heger nanê me têra me tine be, em ê bêjne bavê mi, bira me ra zêde bişîne.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Baş e.”

Diçin, êpêce<sup>1135</sup> digerin. Dêna xwe dinê, derfîkî piçûk wir da ne. [Hemze Pelevan] dibê:

“Xeremco, ev çî ye?”

[Xeremco] dibê:

“Welle, eva derê zîrç-mîrça qaz-maza ne. Layîqî te nîne.”

[Hemze Pelevan] xwe ra hayal<sup>1136</sup> dike. Zanî? Dibê:

“Heyran, merivek orta<sup>1137</sup> heft behra da, vir da yaşamîş<sup>1138</sup> nabe. Hebe-nebe yarê wê di wir da ne.

Rojekî, Xeremco serê xwe dide ser çoka Hemze Peleban, xwe ra razabûye. Hemze Peleban, xwe ra a iha bi gulîyê wê dileyîze. Dêna xwe didê, kilîteke piçûk e a hinde bi kezîke wê va girêdaye.”

Dibê:

“Peyyy! Bi xwedê pêxembera, hebe tinebe ev ya wî derî ye.”

Serê wê nerm daytîne, diçe. Wexta kilîtê wî derî dixê vedike, dêna xwe didê, mîta<sup>1139</sup> pelek agir

---

1133 ) Baş e.

1134 ) Dîsa, careke din.

1135 ) Gelek, zêde.

1136 ) Xeyal.

1137 ) Nav, navber.

1138 ) Jiyîn.

1139 ) Mîna, nola.



ser behrê ket. Heta çehvê wî dît çirûsî, çû. Cake<sup>1140</sup> derî kilît kir, hat. Xwe ra kete yêra<sup>1141</sup> xwe. Serê wê da ser çoka xwe, go:

“Xeremco.”

[Xeremco] go:

“Ha.”

[Hemze Pelevan] go:

“Welle hal-hewal iha.”

[Xeremco] go:

“Haylê, mala te xirabûyî! Welle, ewa kirasek bû. Bavê mi, mi ra bi sêrê çêkiribû. Ne bi meqesê hatibû birrîn ne bi derzîyê hatibû dirûtinê. Bi sêrê çêbibû. Te teze sirra mi li dunyayê xist. Idî gor bavê te. Tu ça dikî bike.”

[Hemze Pelevan] go:

“Weyyy! Mi go, ka tê çi bêjî. Mala bavê wê şewityê. Kê bi mi dikare xêncî xwedê.”

[Xeremco] dibê:

“Ê de baş e.”

Kiras isa diçe. Ahoyê<sup>1142</sup> me ber pêz e. Cigara wî heye, agrê wî tine. Ahoyê me go:

“Xwedê kim, eva kirasa layîqî Hacerê<sup>1143</sup> nîne. Ez ê biherim bime mixtarê gund. Bira mixtarê gund çend sala şivantîya mi zêde ke.”

Dibê wexta dibe dide mixtar, mixtar dibê:

“Xwedê, eva layîqî jina mi nîne. Ez ê biherim bime axê. Bira axa çend sala mixtarîya mi zêde ke.”

Wexta dibe dide, [axa dibê]:

“Peyyy! Kuro, kirasê Xeremco ye.”

Ew axaya, berê dehwa Xeremco kiribûye, hemen gazî pîrê sêr dike, pîra top dike, dibê:

“Kê here Xeremcoyê mi ra bîne were sax-silamet, ez ê wana tême terezîyê, beramberî wana zêr bikşînim [û bidime wana].”

Bavo, dibê pîrek derdikeve. Dibê ji haşayî cima'etê, dibe zîrezîra qûna wê, dibê:

“Ew xweyê vê nefîsê ye. Wellehî, ez ê bînim.”

Dibê pîrê soz dide qiral. Tê devê behrê. Dibê pufî behrê dike. Mehrekî ji behrê kaş dike. Mehr dibe qamçî. Li kûpekî sîyar dibe. Dibê [qamçî] davêje nava kûp, dibe vizeviza pîrê. Dibê pîrê tê ada orta<sup>1144</sup> hevt behra. Mehrê xwe berdide hundirê kûpê xwe. Dibê tizbîke sedlibê hildide, dibê:

“Ez hecî me hecîya mame,

---

1140 ) Dîsa, careke din.

1141 ) Cî, cih.

1142 ) Bîrayê çîrokbêj.

1143 ) Jina Aho û jinbira çîrokbêj.

1144 ) Navber, navbeyn, nav.

Sofi me sofîya mame,  
Ser barê deva razame,  
Ketime, cî da mame.”

Hemze jî li nêçîrê bûye. Hine werdek-merdek destî wî da bûne, dibê:

“Pîrê te xêr e?”

[Pîra sêhr] dibê:

“Welle, hêca<sup>1145</sup> gemîya me hatye vir ra çûye. Heta mi dezmeş girtye ez mêj kim, ez rabûme gemîcî tine. Gemîya me çûye. Îşev mi xweyî ke. Ez ê sibê herim.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Pîî, çî dibe.”

Hildide, tîne tê. Xeremco dûr va gazî dikê, dibê:

“Hemze, bide xatrê xwedê, ewa pîra sêr e. Neyne mala me.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Heyran, eva xurifi çî ye, bibe pîra sêr çî ye?”

[Xeremco] dibê:

“Yawo, bide xatrê quranê, ez zanim, da. Pîra sêr e.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Na heyran. Xeremco, welle ez ê bînim.”

Pîrê tîne tê. Wexta sibê zû radizên, pîrê radibe dikeve wan devdora, mala wana tertemiz<sup>1146</sup> dike. Çaya wan, nanê wan, xizmeta wan dike.

[Hemze Pelevan] dibê:

“Xeremco, aha binê<sup>1147</sup>, mi digote te. Pîra sêra çî ye? Eva xurifi çî ye? A binê, ça xizmeta me kirye.”

[Xeremco] dibê:

“Ê Hemze, de welle kêfa te ye.”

Hemze diçe nêçîrê. Pîrê dibêje Xeremcoyê:

“Xeremco, eva têjkê qureşîya yê namidar ruhê xwe dizanin. Pelevan in. Dizanin tusulmata rehê wan ku da nin.”

[Xeremco] dibê:

“Ê pîrê ez ça b’kim?”

[Pîra sêhr] dibê:

“Tu xwe bavêje nexaşîye. Ew carna diçe nêçîr-mêçîrê Ez ê te ra tusulmata<sup>1148</sup> rehê wî bigrim. Tu

---

1145 ) Teze, niha.

1146 ) Pir û pak.

1147 ) Binêrê, binhêre.

1148 ) Tilsim, tilism.

jî xwe ra pê tusulmata ruhê wî dileyîzî hetanî tê.”

[Xeremco] dibê:

“Pîî, erê welle.”

[Pîrê] pênc-şes nanê hişk dixê binçenga Xeremcoyê. Duduya jî dide ser serê Xeremcoyê. Gazî dike, dibê:

“Hemze, Xeremco nexaş e.”

Hemze direve tê. Dêna xwe didê, çi? Xeremco isa nexaş e, dimre. De îja hev dixapînin. Dibê Xeremco iha xwe dide ser alîkî, dibê:

“Hemze, ez dimrim. Parxanê mi şikestin. Zû bêje ka tusulmata rehê te ku da ne.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Heyran, tusulmata rehê minê ku be? Pitê<sup>1149</sup>, tu çi bî ez jî ew im.”

[Xeremco] dibê:

“Na, tê bêjî.”

[Hemze Pelavan] dibê:

“Tusulmata ruhê mi gêzîyê da ne.”

Pîrê êvar da dikeve ser gêzîyê, gêzîyê dixemilîne. Qebza<sup>1150</sup> gêzîyê şil dike. Diçe ser ra disekine. Pîrê dibê:

“Na. Xeremco, Hemze virra dike.”

[Pîrê] cake<sup>1151</sup> isa dike. Hemze dibê:

“Xeremco, tê sirra mi beyan kî. Welle, wexta qebza şûrê mi şil be, ez ne mirî me ne mayî me.”

Dibê pîrê şebeqa subê radibe. Dibê qebza şûrê wî şil dike. Diçe serê xwe dide ser qelbê wî, dibê:

“Erê. Hemze ne mirî ye ne mayî ye.”

Tû şûr dike. Şûr kewkêti<sup>1152</sup> orta behrê dike. Tê, digre poleçîka<sup>1153</sup> Xeremcoyê. Nava cîyê wê kaş dike. Şîrp<sup>1154</sup>, sîlekî davêje peleguha<sup>1155</sup> wê, dibê:

“Qiralê şîher bona te dimre. Tu jî hatî ketî paşka<sup>1156</sup> vî têjkê qureyşîya.”

[Xeremco dibê]:

“Hemze, Hemze, Hemze!”

[Pîra sêr] dibê:

“Haaa! Mi Hemze mest kirye, tu mayî.”

---

1149 ) Bo bangkirina keç û jinan tê gotin.

1150 ) Destik.

1151 ) Dîsa, careke din.

1152 ) Dûravêtin.

1153 ) Por, pirç.

1154 ) Dengê lêxistinê.

1155 ) Binê guh.

1156 ) Paşil, paxil.

Pufî Xeremcoyê dike, dike sêvekî, dixê binê cêva xwe. Tê, kûpê xwe ji behrê kaş dike. Mehrê xwe ji nava kûpê derdixê. Puf dikê, mehrê wî dibe qamçî. Davêje nava kûpê. Tê, derbasî şîher dibe.

Wexta tîne nava şîher daytîne, dibê Xeremco xencerekî dide vî destê xwe, şûşeke jehrê dide wî destê xwe. Xeremco dibêje:

“Kê çil şevî çil rojî ser mi keve, ez ê vê şûşa jehrê ser xwe da kim, evê xencerê zika xwe ra kim.”

Em werne qîza dêw. Qîza dêw sibê zû hişyar dibe. Wexta radibe mêj dike, qalibê xencerê kaş dike, dêna xwe didê, isa paxs<sup>1157</sup> girtîye, paxseke hêşîn. Isa diqîre! Xencer ya Hemze bûye, dabûye qîza dêw. Jina wî bûye, daye wê. Ji Mezher<sup>1158</sup> ra bêjim, birê xwe ra bêjim, qîzik isa diqîre mîta<sup>1159</sup> teyr. Dêw dibê:

“Qîza mi, ça bû?”

[Qîza dêw] dibê:

“Bavo, bide xatrê xwedê, Hemze tengasîyê da ne.”

[Dêw] dibê:

“Lawo bide xatirê xwedê, du hev pirîskê kulê bûn hatibûn ketibûne mala mi. Lawo, bise.”

Dike nake ewlad e. Dilê wî pê dişewite. Dibê dêw xwe xorozi<sup>1160</sup> behrê dike. Şûrê wî derdixê. Dibê dide ber sobê temîz diqelîne. Wexta berdide qêlif, dibê Hemze dibê:

“Weee Xeremco, ez çi xeweke xaş da bûm. Te ez hişyar kirim.”

Dêw dibêjê:

“Weylê mala te xirabûyî! Rabe ser xwe. Pîrê rîtye devê te, Xeremco birye. Xeremcoya çi? Halê çi?”

[Hemze Pelevan] dêna xwe didê, dêw e. Dêw evî tîne derbasî valî<sup>1161</sup> behrê, perrê şîher dike. Şîher jî nîşan dixê, dibê:

“Xatrê te.”

Bira dêw bizvire. Dibê Hemze dikeve nava şîher, yê silamet we bûye li mala xwe nebûye. Hetanî şîher hev dihise Hemze nîvê şîher dibirre. Dibê dêna xwe dinê, idî pê nikarin. Qiralê şîher tîne tê, dixne maledor, dibê:

“Rojê dora malekî ye.”

Çiqa jin-zarê wê malê hene dine pêşya Hemze. Hemze, çiqa bi wan ra şer dike şer dike. Serê hemûka jêdike. Isakîne<sup>1162</sup> dewam dike. Çadirek xwe ra perrê şîher vegirtîye. Hemze, êvarê çadira xwe ye. Sibê jî li meydanê şêr dike.

---

1157 ) Zeng, jeng.

1158 ) Berhevkar.

1159 ) Mîna, nola.

1160 ) Xweavêtîna avê.

1161 ) Vî alî.

1162 ) Wisâ, bi wî awayî.

Dibê wexta diçne derê mala Ahmedê Soldirî, dibê:

“Ahme.”

[Ahmedê Soldirî] dibê:

“Ha.”

[Xelkê şîher] dibê:

“Welle paşê gotye sibê sira<sup>1163</sup> mala wî ye.”

Kindir, kurê Ahmedê Soldirî ye. Wexta li guhê Kindir dikeve, Kindir dibê:

“Kuro, sira çi?”

[Xelkê şîher] dibê:

“Welle, pelevanek derketye nava şîherê me. Mîna pirîskê kulê ye. Şîher ret<sup>1164</sup> kirye. Kirine maledor, rojê dora malekî ye, derdikevin pê ra şer dikin.”

[Kindir] dibê:

“Kuro, bêjne paşê ez ê nava lat-pûtê wî nim. Kuro, bira sibê mi ra hespekî, şûrekî bişîne. Ev xweyê vê nefîsê ye.”

[Xelkê şîher] dibê:

“Baş e.”

Diçin. Jê ra hespekî, şûrekî tînin tîn. Dêna xwe didê, heqet meydanê pelevanekî isa sekinîye, nayê kara. Dibê ew [û] Kindir li hev dixin. ‘Erd mîta<sup>1165</sup> xetê kotana ber pîyê hespê herdika<sup>1166</sup> çiq dibe. Kindir dibê:

“Xorto.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Ha.”

[Kindir] dibê:

“Peyayî ‘erdê be. Yek me serê yekî jê ke. Bira guhê van heywana jî dengê şîher jî ji guhê me derkeve.”

Ew [û] birê xwe li hev dixin. Lê, hev naz nakin. Dibê wexta banzdidne<sup>1167</sup> ‘erdê, destê xwe davêjne kemberê xwe, dibê Kindir çawa ya illa ya xwedê dike, Hemze digre girmmm li ser piştê ‘erdê xe, Hemze ax dike, dibê:

“Kuro, lingê xwe li ser zikê mi bavêje. Tê mi bikujî. Tê ça Kindirê birê mi xilaz bî?”

[Xelkê] şîher jî gazî dikê, dibê:

“Ha bikuje, ha bikuje.”

---

1163 ) Dor.

1164 ) Qirkirin, xilaskirin, jinavbirin.

1165 ) Mîna, nola.

1166 ) Herdu.

1167 ) Xwe ji jor de avêtîn.

Eva, lingê xwe li ser zikê Hemze Pelevan radike. Hemze Pelevan li ser piştê davêje.

[Xelkê şîher] dibê:

“Yawo, te çima nekuşt?”

[Kindir] dibê:

“Yawo, ti golkê bavê min e? Mi lingê xwe li ser zikê wî rakir. Îro nebe ez ê sibê bikujim.”

Kindir bi xwe ye. Ew [û] Hemze hev naz nakin. Hev inda<sup>1168</sup> kirine, da. Kindir wî nakuje. Hemze idî pîsepîs tê çadira xwe. Ne ji xwe ra çay çêdike ne nan çêdike. Hemze dibêje:

“Kuro, eva kê bû? Eva yê sibê mi bikuje!”

Hemze Pelevan dêna didê, bû çûrînîya derê çadirê. Derê çadirê vebû. Ew xorta kete hundir, go:

“Zû bêje. Zû bêje ka ew Kindir kê bû? Yoxsa<sup>1169</sup> mi tu dikuştî. Kindir kê bû?”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Welle hal-hewal a iha.”

[Kindir] dibê:

“Kuro, de Kindir ez im. Hey mala te xirabîyo!”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Kuro, tu yî?”

[Kindir] dibê:

“Erê.”

Diçne dest-rûyê hevdu. Nan, ça xwe duxin. [Kindir] dibê:

“Em ê sibê oyînekî<sup>1170</sup> serê paşê kin. Çiqa milletê paşa heye em ê hemûkî têne hundirê sûrê. Hemze, tu xwe bide ber dêrî. Ez ê bikevme navê. Idî gorê da.”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Ê baş e.”

Dibê Kindir cabê dide qiral, dibê:

“Çiqa milletî wî heye bira têxe sûra xwe, hewşa xwe. Bira jinê bî têne qûteqût. Bira êtîm têne zarezar. Wî çaxî hêrsa min ê were ez ê lêxim bikujim. Wekî din hêrsa min neyê ez nakuji.”

Paşa ‘eynekî wê tempoyê<sup>1171</sup> dike. Hemûka têdixe sûra xwe, derîya lê qapat<sup>1172</sup> dike. Dibê Hemze [û] Kindir li meydanê li hev dixin. Dibê du serîya dine hevdu, dibe qîrçînîya wana. Dibê Kindir li dêrî dixê dikeve hundir. Hemze xwe dide ber derê sûrê. Dibê çiqqa millet tê da be, tamamî wî bi qiral va şerjê dikan. Davêjne dera hanê.

[Kindir] dibê:

---

1168 ) Winda. Li Ebexê ev peyv bi vî awayî tê bikaranîn.

1169 ) Hekena, eger wisa nebûya.

1170 ) Dek û dolap.

1171 ) Lez, lezgînî.

1172 ) Girtin.

“Kuro Hemze, kê ma, kê nema?”

[Hemze Pelevan] dibê:

“Pîra sêr ma.”

Kindir dibê:

“Tu were, miherin<sup>1173</sup>.”

Dibê tèn. Dêna xwe dinê, pîrê wî qulçikî<sup>1174</sup> da rûniştîye. Zêra dijmêre, davêje qulçikê hanê. Hemze xwe dide ber dêrî. Kindir dikeve hundur. Wexta Hemze dibê:

“Pîrê, mi devê te gê, tê ku da herî?”

Dibê, pîrê dibe ‘orrînîya wê, dibe dêlikekî. Dibê, dibe çîreçîra wê, ber Kindir ra baz dide. Dibê Kindir ça orta<sup>1175</sup> pišta wê dixê, serê wê diçe derê hewşê qûnê wê dimîne di hundir da. Zêrê pîrê top dikin, tèn. Dibê barê hevt deva, qîmetê giran barê sivik, bar dikin. Dibê Xeremcoyê jî dixne sandoqekî, dine ser barê devê. Tèn, qîza dêw jî hildidin. Têne nêzkîya şîherê bavê xwe. Îşçikî<sup>1176</sup> xwe pêşda dişîne dibê:

“Çika here. Piştî mi xûşkeke mi hebû. Heye, tine ye?”

Dişîne tê, dibê:

“Welle, xûşka te heye.”

Ewê xûşka xwe jî li Kindir mehr dike, dide Kindir.

Hevt roj hevt şeva dixne def û dehwat.

Ewna diçe mirazê xwe. Hûn jî bigîjne mirazê xwe.

ÇÎROKBÊJ: ‘ELÎYÊ APÊ MIHO

HERÊM: JI GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 47

PERWERDE: DIBISTANA SERETAYÎ

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 19/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1173 ) Yanî, em herin. Ev şêwegotin jî li Ebexê zêde tê bikaranîn.

1174 ) Qunçik, goşe.

1175 ) Nav, navend.

1176 ) Xizmetkar, xebatkar.

## 11. ÇÎROKA HESEN HISEYN<sup>1177</sup>

Go, carekî yek hebû, navê wî ‘Elî bû. Diçe ber dêwêr. Em bêjin, diçe rasteke<sup>1178</sup> nota<sup>1179</sup> wê rasta Bayîzdaxa<sup>1180</sup>. Dêna xwe dayê, teyrek ber darekî firda. Çû. Dêna xwe dayê, hêkek e. Hêka xwe hilda. Efendimê xwe ra bêjim, de ber dêwêr e jî. Tê derê Koşka Cihû ra derbas dibe. Wextê derbas dibe, Cihû gazî dikê, dibê:

“Were were.”

Dizane hêka Teyrê Ne’ma ye. [Cihû] dibê:

“Were vira.”

[‘Elî] dibê:

“Çi ye?”

[Cihû] dibê:

“Ewê hêkê tê ça b’kî?”

[‘Elî] dibê:

“Welle, hêk e. Teyrekî firdaye. Mi jî hêk hildaye.”

[Cihû] dibê:

“Ka bide min.”

[‘Elî] dibê:

“Heyran, tiranê xwe neke. Ez ê ku ra bime te.”

[Cihû] dibê:

“Ez ê zêrekî bime te.”

[‘Elî] dibê:

“Tiranê xwe neke.”

Dudu, sisê, çar, dibe pênc. [Elî] dibê:

“De ez ê bime te.”

Digre didê. Efendimê xwe ra bêjim, zêrê xwe berav<sup>1181</sup> dike. Tê malê. Dibêje jinka xwe, dibê:

“Qîzê, bide xatrê xwedê, mi hêkek ‘erdê dîtye. Mi anye daye Cihû. Cihû belke serxoş bûye? Çika ça bûye? Tirsim sibê dehwa zêrê xwe bike. Van zêra rind hilde.”

[Jinik] dibê:

“Baş e.”

---

1177 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1178 ) Deşt, deyst.

1179 ) Mîna.

1180 ) Navê navenda Ebexê ye.

1181 ) Berhev.



Diçe. Cake<sup>1182</sup> rojekî diçe. Mesela dewarê xwe berdide wira. Dêna xwe didê, dîsa teyr firda. Hêkek li wir e. Hêka hilda. Dîsa cihû serê rê, dîsa ew hêka hilda. Pênc zêr danê.

De, de, de... Hema isa vir da wê da, rojekî dibê:

“Welle, baş e. Iha nabe. Ez ê teyr bigrim. Çika ça dibe?”

Diçe xwe ditelîne, ça dike, teyr digre. Teyr hildide, efendim, tîne mala xwe. Rojê pênc zêrê xwe Cihû distîne. Zengîn dibe. Mala xwe dibe koşekî. Mehek, heke deh roj be, panzde roj be, derbas dibe. Dibê sibetirê gazî dike. Efendimê xwe ra bêjim, dibêje kulfetê xwe:

“Welle, ez ê ber dêwêr derkevîm. Idî halê me jî xaş e. Rojê pênc zêr tê mala min.”

[Kulfeta wî] dibê:

“Baş e.”

Derdikeve. Koşkekî, nota<sup>1183</sup> ewka Bayîzdaxa, kêleka gundê we, wê derê xwe ra cîkî dikirre. Deste avayê temîz<sup>1184</sup> çêdike. Diçe dibêje gundîya, dibê:

“Welle, ez ê idî ber dêwêr derkevîm.”

Gundî dibê:

“Heyran, here ber dêwêr.”

[‘Elî] dibê:

“Na welle, e nikarim. Kal im.”

De idî zengîn e, da. Ber dêwêr derdikeve. Efendimê xwe ra bêjim, deste avayê temîz çêdike. Zeman tê, dibe:

“Welle, hecî diçine hec. Yê herne hec.”

Ew jî karê xwe dike, dibê:

“Ez ê herme hec.”

Diçe hec. Lê, tevdîra dîkê xwe dide jinikê, dibê:

“Binêre, bide xatrê xwedê, dîk dîqat be. Rizqê me dîk dide. Rojê tê hêkekî biherî bidî Cihû. Rojê yê pênc zêra bide. Heta ez hec hatim.”

[Jinik] dibê:

“Ê baş e.”

Zeman tê. Efendimê xwe ra bêjim, hecî hec tîn. Behs tê, navê wî Hecî ‘Elî ye, dibê:

“Welle, Hecî ‘Elî çûye emrê xwedê.”

[Jinik] dibê:

“Ê baş e.”

Vir da wê da hecî tîn, dibê:

---

1182 ) Careke din, dîsa.

1183 ) Mîna.

1184 ) Baş, qenc.

“Welle, filankes çûye emrê xwedê.”

[Jinik] dibê:

“Rehma xwedê lê be.”

Zeman derbas dibe. Rojê hêkekî tîne dide Cihû. Wextê tê derê ewka (mala) wî vedike, Cihû dibêje:

“Filankes.”

[Jinik Hecî ‘Elî] dibê:

“Ha.”

[Cihû] dibê:

“Hecî çûne hec. Mêrê te çûye emrê xwedê.”

[Jinik] dibê:

“Erê welle mirye.”

Cihû dibêje, dibê:

“Hema tu mi nakî? Rojê hêkekî didî mi. Zaten rizqê te jî ez didim.”

[Jinik] dibê:

“Ê baş e. Ê welle ez ê te bikim.”

[Cihû] dibê:

“Ê şertê me jî heye.”

[Jinik] dibê:

“Çi ye?”

[Cihû] dibê:

“Tê herî dîk şerjê kî. Yalniz, pîslika<sup>1185</sup> hindirê dîk tê bavêjî. Serê dîk, dil-hinavê dîk, tê bixî qaşikekî<sup>1186</sup> bikelînî. Kelya, ez ê werim. Ez ê te qebûl kim.”

[Jinik] dibê:

“Ê baş e. Ez ê dîk qurbana te kim.”

Efendimê xwe bêjim, radibe. Carîke wê jî heye. Dibêje caryê, dibê:

“Carî, dîk bîne. Em ê şerjê kin.”

“Carî dibêje:”

“Tu çi terî dîk şerjê dikî? Rizqê te dîk dide.”

[Jinik] dibê:

“Welle, ez ê şerje kim.”

Şerjê dike, dibê:

---

1185 ) Gemar.

1186 ) Amaneke piçûk e ku tê da xurek tê çêkirin.

“Yalniz, ez ê şerjê kim. Tê pîslika<sup>1187</sup> wî derxî bavêjî. Wekî din serê dîk, dil-hinavê dîk, çi hebe, tê têxî qaşikê bikelîne. Cihû yê were.”

Efendimê xwe bêjim, dikelîne. Efendimê xwe bêjim, êvar tê. Hesên-Hiseyn kurê wê bûne. Kurê jinikê bûne, jina Hecî ‘Elî. Ji wê ye. Efendimê xwe ra bêjim, lê carî dizane. Wextê tê, (carî) dibêje jinikê:

“Wextê tu hatî, tê bêjî ka serê dîk, ka dil-hinavê dîk?”

[Jinik] gazî caryê dike, dibê:

“Carî, ka?”

[Carî] dibê:

“Welle, Hesên-Hiseyn mektevê hatine. Welle, serê dîk, dil-hinavê dîk, yekî serê dîk hildaye xarye, yekî dil-hinavê dîk.”

[Jinik] dibê:

“De tu here.”

Cihû dibêje jinikê, dibê:

“Tê serê Hesên jî jêkî yê Hiseyn jî. Tê herdika jî jêkî.”

Cîya wan dibê:

“Baş e. Êvarê meytevê hatin ez ê serê herdika jî jêkim.”

[Cihû] dibê:

“Temam.”

Wextê herdu tên werne malê, carî tê pêşyê. Carî gazî dike. Carî dibêje:

“Filankes.”

[Herdu bira] dibê:

“Ha.”

[Carî] dibê:

“Neyne malê.”

[Herdu bira] dibê:

“Ça?”

[Carî] dibê:

“Cihû, cîya we hildaye. Behs kirye, hûn werin wê serê we herdika jî jêke.”

[Herdu bira dibêjin]:

“Wusa?”

[Carî dibê]:

“Wusa.”

Herdik serê xwe hildidin, herrek tu naçî. Terkedinya dibin diçin. Efendimê xwe ra bêjim, rojêkî

mala te dimînin. Rojê cîkî dimînin. Hesên-Hiseyn diçin cîkî, çolekî radizên. Ewî dinê, Hesên dibêje, dibê:

“Em du hev in. Em diçne mala jî me xweyî nakin. Ez ê hema Hiseyn bihêlim. Ez ê serê xwe hildim herim.”

Ew radizê, xewê da ne. Hesên radibe diçe. Diçe. Dêna xwe dayê, cîkî notanî<sup>1188</sup> Bayîzdaxa<sup>1189</sup>. Tê, dêna xwe dayê, kes şîher da tine. Gencekî pîrs dike, dibê:

“Eva şîhera kes tê tine?”

[Ew genc] dibê:

“Mala te! Paşayê me mirye. Teyrê dewletê berdidin. Teyrê dewletê ser serê kê da rûnê ewa yê bibe paşa. Paşayê me mirye. Ewê bibe paşa.”

[Hesên] dibê:

“Baş e.

Efendim, ew jî xwe ra diçe perrekî disekine. Efendim, wextê teyr berdidin, teyr digere, digere, digere, tê ser serê Hesên da rûdinê. Yek, milê wî digre, dibê:

“Ev êtîmî bigû hatye çi? Ne êla me ye, ne ‘eşîra me ye. Me teyrê xwe berdaye. Teyr hat ser serê wî danye.”

De îja, serê dîk, serê teyr xarye. Lê, serê teyr xariye, da. Cake<sup>1190</sup> dinê tînin dixne odekî. Efendim, derî ser da dadidin. Cake teyrê xwe berdidin. Teyr digere, digere, digere, teyr tê camê dişkêne. Dîsa ser serê wî datîne. Çend hevê iha mervê baş dibê:

“Heyran, welle paşayê me ‘adil bû. Miheqeq ev merva jî ‘adil e. Hema genc e, gencekî temîz<sup>1191</sup> e. Em ê hema bixne paşa.”

Efendimê xwe ra bêjim, dixne paşa. Emrekî isa datîne. Derva tişteki datîne. Hesinekî camê da datîne, dibê:

“Kê hat eva hesina hejand, derdê wî çi be ez ê sormîş<sup>1192</sup> kim.”

Dibên:

“Ê baş e.”

Datîne. Ew, idî bira bibe paşa. Em werin Hiseyn xeber din. Hiseynê te radibe. Dêna xwe dayê, Hesên tine. Ew jî dikeve rêyekî, herrek tu naçî. Ew jî diçe. Diçe cîkî. Dêna xwe didê, efendimê xwe ra bêjim, rastî qesabekî tê. Dêna xwe dayê, qesabek li vira, rastî qesabekî te. Dêna xwe didê, dibê:

“Ez ê hema herme cem wî qesabî. Efendimê xwe ra bêjim, ez ê jî hema heger rizqekî, tişteki bide min, ez ê ber destî wî bixevitim.”

---

1188 ) Mîna.

1189 ) Navê navenda Ebexê ye

1190 ) Careke din, dîsa.

1191 ) Baş, qenc.

1192 ) Pîrsîn, lêkolîn.

Diçe. Êvar tê. Du jinê qesab jî hebûne. Jinik lê têne hev, dibên:

“Ka te em xweyî kirine, te yekî din jî anye?”

[Qesab] dibê:

“Ê ‘evda xwedê, hema daye peyê mi hatye. Zarek e. Hatye. Em ê sitar kin heta sibê.”

Du-sê roja dimîne. Kolkê qaza da radizîne. [Hiseyn] rojekî dibê:

“Bihêle, barî ez dest bavêjme wan cilkê xwe rakim. Belkî hema ez daîm werim vira, xwe ra razêm.”

Dest davêjê. Dêna xwe dayê, tûrek zêr, kasek zêr şûna wî derket. [Hiseyn] dibê:

“Peyyy, mala min xirav be! Rojê kîsike zêrê mi dikeve.”

Radibe. Serîyo tu qurbana linga bî. Herrek tu naçî. Wira radibe. Diçe, rastî melekî tê. Rastî mele tê. Efendimê xwe ra bêjim, diçe mala mele, dibê:

“Filankes, ez îşev nêvanê te me.”

Ew jî dide pey diçe. Du hev jinê mele, hêrsa xwe lê tînin, dibên:

“Ka te em xweyî kirine?”

[Hiseyn] dibêje jinê mele:

“Qe nertisin. Hûn çî bixazin ez ê we ra bînim. Ha we ra du zêrê hanê. Herin çî xwe ra [tînin bînin]. Dinê da çî dixazin ewê xwe ra bînin. Kalorya bînin, nivîna bînin, yîyecek-îçecek<sup>1193</sup>.”

Tînin. Efendim, oda xwe tijî dikin. Radizên. Neh deh roja wira radizê, radibe, rûdinê. Rojekî dêna xwe didê, hine axeler, ewê qirewêtlî<sup>1194</sup>, efendim, paşaler iha<sup>1195</sup> berjêr diçin. Efendimê xwe ra bêjim, ew Hiseyn dibêje, dibê:

“Filankes, ev mervana iha wêda diçin, ber bi wê koşka han e bilind diçin, diçine çî?”

[Mele] dibê:

“Were. Îşê te çî pê ketye?”

[Hiseyn] dibê:

“Na welle, tê pirs kî.”

[Mele] dibê:

“Welle, ewa Dunya Gozel e. Ew mervê zêra hildidin, zîva hildidin, wextê (Dunya Gozel) yek tiliya xwe derdixe, ewana hemû bayilmîş<sup>1196</sup> dibin. Wan zêra, wan pêra, wan yîyeceka<sup>1197</sup> top dike, dibe.”

[Hiseyn] dibê:

“Hihey, baş e.”

---

1193 ) Xwarin-vexwarin.

1194 ) Bistûbend, biboyinbax.

1195 ) Wiha.

1196 ) Jixweveçûyîn.

1197 ) Xwarin.

Dunya Gozelî însan bûye. Wextê tiliya xwe bilind dike, ewna hemû bayilmîş<sup>1198</sup> dibin. Yanî, yek dibê:

“Çika yê me kê begem ke?”

Kesekî begem nake. Hema wextê tiliya xwe derdixe, ewk dike, hemû bayilmîş dibin. Ew zêr, zîv hemû li ‘erdê dimîne. Huseyn dibê:

“Tu bihêle. Îja sibê dora min e.”

Efendim, diçe deste kincê temîz xwe dike. Efendim, sinîke zêr tijî zêr dike. Efendim, dide ser serê esnafekî, merivekî. Rê dikeve diçe. Diçe. Wextê diçe, ew mervê dinê hemû bayilmîş<sup>1199</sup> dibin, cake<sup>1200</sup> tên. Dunya Gozel ça çehv dikeve, dibê:

“Eheyyy Hiseyn! Ez ‘esmîn te digirim tu ‘erdê dest mi kefî. Mala te, tu heta niha li ku bûyî?”

Dizane, da. Dunya Gozel, çima dibêjin Dunya Gozel? Dibê:

“Were hindir.”

Ewê din hemû bayilmîş dibin. Hiseynê te diçe. Efendimê xwe ra bêjim, Hiseyn kêleka Dunya Gozelê rûdinê. Dibê:

“Mala te xira be. Tu heta niha li ku bûyî?”

[Hiseyn] dibê:

“Welle...”

Efendimê xwe ra bêjim, qazekî şerjê dike. Davêje ser goşt-birinc, dixê kêş. Efendim, ew (û) Huseyn duxin. Êvar tê. Dibêje carîyê, dibê:

“Carî, qawekî çêke. Şîr-şekir çêke, bîne. Ez-Huseyn buxin<sup>1201</sup>. Em razên.”

[Carî] dibê:

“Baş e.”

Wextê carî qawê çêdike, ew radibe dermanê nehişê berdide fîncana Hiseyn. Efendim, wextê berdidê, dibê:

“Hiseyn, de buxwe. Mala te neşewite.”

Hiseyn wextê duxwe, bayilmîş dibe. Bayilmîş<sup>1202</sup> dibe. [Gozel Dinya] dibêje carya, dibê:

“Herin, isa evî bikên, isa bikên, tiştêk devê wî dertê. Wextê derket, hûn ê li avê xin, binîn. Ez ê qurt kim.”

Dil-hinav bûye, da. Dizane, da. Wextê isa dibêje, isa dikên, isa dikên, hilqînî dikevê, vedireşe. Hiseyn dibin, davêjne cîkî kîjan pîslîk<sup>1203</sup> e, davêjne wê derê. Ew dil-hinavê teyr bûye. Efendim, li

---

1198 ) Jixweveçûn, jiserhemdêxweveçûn.

1199 ) Jixweveçûn.

1200 ) Dîsa, careke din.

1201 ) Li Ebexê û li derdora Ebexê bo vexwarina tiştên şilemenî peyva ‘xwarin’ê tê bikaranîn.

1202 ) Jixwevaçûyîn.

1203 ) Gemar, qirêj, qilêr.

avê dixê, qurt dike.

Hiseyn wextekî çehvê xwe vedike. Dêna xwe dayê, çi? Êvar hat. Nava pîslikekî da ne. Belengaz e. Dide serê rê. Diçe malê [dibê]:

“Dêrî vekin!”

Dêrî vedikin. Dêna xwe dayê, çi? Hiseyn halekî perîşan e. Halekî perîşan e. Rojekî, dudya dimîne. Birçî ye, da. Çi heye? Rojekî radibe derdikeve, dibê:

“Ez ê idî herim. Ka çi heye ez buxum?”

Zêr diçin, da. Zêr idî qeyb dibin. Diçe dêna xwe dayê, sê meriv ser tepekî<sup>1204</sup> qirka hev digrin. Diçe nava wan da, dibê:

“Kuro, çi bûye?”

Dibên:

“Welle, eva mîrata bavê me ye.”

[Hiseyn] dibê:

“Çî ye, îja?”

Dibên:

“Eva bilûr e, kumek e, sifrik e.”

[Hiseyn] dibê:

“Ê de îja mehna wan çî ye?”

Dibên:

“Eva sifrika gava tu lê xî bê; tehm, tehmê cinnetê çi hebe lê dertê, em duxin. Eva kuma jî ti herî ku, tu bidî serê xwe, kes te nabîne.”

[Hiseyn] dibê:

“Ahaaa, xwedê da me. Bilûr?”

Dibên:

“Mehna wê nayê dîtinê.”

[Hiseyn] dibê:

“Temam. Bira bisene. Hûn gune ne. Hûn ê li hev xin. Lê, îja ez ê ser vî tepeyî bisenim. Ez ê kevirekî bavêjim. Kê we xwe gihandê ez ê sifrikê bime wî.”

Dibên:

“Heyyy, rehma xwedê dêbavê te be.”

[Hiseyn] dibê:

“Ez ê kevirekî din jî bavêjim. Kê xwe gihandê, ez ê kum bime wî. Zaten jî yê axiriyê da [be].”

Dibên:

“Heyyy, de baş e.”

Kevirekî davêje. Hersêk direvin. Wextê direvin, ew tîne sifrikê qet dike, dixe piçenga xwe. Kum dide serê xwe. Bilûrê dide destê xwe, herrek tu naçî.

Tên, dibê:

“Xalo, xalo, xalo!”

Dibên:

“Heyyy, em gora bavo nin. Mîrata bavo belav bû, çû.”

Vedigere tê. Li derê mele dixê. Mele derî vedike. Dêna xwe didê, halekî perîşan e. Efendim, hate malê. Sifrikê derdixê, lê dixê, efendim, yêmek<sup>1205</sup> tîjî dibe. Dibê:

“Bihêle.”

Hema ça lê dixê, tîrekî lê dixê, efendim, yêmek isa dibe! Yemekê cinnetê isa dibe, dibe qîyamet! Ew duxwe, jinik duxun. Efendimê xwe ra bêjim, serê xwe datîne radizê. Dibê:

“Sibê dor dora mi Dunya Gozel e. Tu bihêle.”

Sifrikê dixê bin milê xwe. Kum dide serê xwe. Efendimê xwe ra bêjim, wextê ewana diçin bayilmîş<sup>1206</sup> dibin, ew xwe ra dêrî ra diçe kêleka Dunya Gozelê rûdinê. Diçe wira rûdinê. Efendimê xwe ra bêjim, wextê yêmek<sup>1207</sup> tê, Dunya Gozel jî jê ra yêmek tê. De Dunya Gozel ewî nabîne. Ew jî kêleka Dunya Gozelê duxwe, nan duxwe. Dêna xwe didê, a kêleka din jî nanê wê çû. Efendim, metel dimîne. De dibêje carya, dibê:

“Nîn hildin herin.”

Nîn hildidin dibin. Êvar tê. Efendimê xwe ra bêjim, radizên. Efendim, Dunya Gozel radizê. Efendim, de kum sêrî ye. Kes naz nake. Wextê Dunya Gozel radizê, ew mirç diçe rûya. Wextê diçe rûya, Dunya Gozel hişyar dibe, dibê:

“Peyyy! Ev kê bû?”

Kes tine. Efendimê xwe ra bêjim, dibêje carya, dibê:

“We derî çi terî dada ne?”

Carî derdikevin. Deriya vedikin, dibê:

“Tu însan tine.”

[Dunya Gozel] dibê:

“Ê de baş e. Ev çi heye, îşê Hiseyn e.”

Qasekî dimîne. Qesta xwe xilmaş davêje. Hiseyn wextê dîsa [paç dike], destê xwe hema ça lê dixê, kum serî dikeve. Hiseyn wê derê dikeve. Dibê:

“Heyyy mala te xirabîyo! Tu cina ketî? Tu çolêketî? De ez bona te bi’ecîm.”

Tê, rûdinê. Efendimê xwe ra bêjim, nan çêdike, çay çêdike. Yêmek<sup>1208</sup> duxun. Dibê:

---

1205 ) Xurek, zad.

1206 ) Jixweveçûn.

1207 ) Xurek, zad.

1208 ) Xurek, zad.



“Tu bi çi hatî?”

Dibê derdixe, sifrikê derdixe. Nan isa dike, dike qîyamet. [Dunya Gozel] dibê:

“Tu bi çi hatî?”

[Hiseyn] dibê:

“Ez bi vî kumî hatim.”

[Dunya Gozel] dibê:

“Ê baş e.”

Dîsa nan duxin. Çayê, qawekî çêdike. Dermanê nehişê davêjê. Wextê davêjê, dîsa bayilmîş<sup>1209</sup> dibe. Gozel Dinya her tiştê wî berav dike. Kumê wî, sifrika wî hildade. Wana qet dike, hildide. Bilûr tenê dimîne. Bilûr ayrî<sup>1210</sup> ye. Bilûr cem Dunya Gozelê nîne, cem Hiseyn e.

Hiseyn dîsa davêjne cîkî, pîslikekî<sup>1211</sup>. Şeveq davêje. Dêna xwe dayê, çi! Nava pîslikê ye. Efendimê xwe ra bêjim, isa radibe diçe. Hiseyn radibe. Efendimê xwe ra bêjim, rojekî, dudya, sisya... Hiseyn birçî ma, da. Rojekî, hinek bilûrekê dixin. Dêna xwe didê, [dibê]:

“Ne yeke mi jî heye.”

Diçe. Bilûra xwe ber serê arîka dikşîne. Derdixe tîne. Wextê ça pifî hindirê wê dike, dêna xwe dayê, du hev ‘efrît ber sekinîn, dibên:

“Axa, em dinê xirav kin yan ava kin?”

[Hiseyn] dibê:

“Ne xirav kin ne ava kin.”

[Hiseyn] dibê:

“Dunya Gozel, te çi kirye, te mi kirye. Tu bihêle.”

Efendimê xwe ra bêjim, êvar tê. Wextê pif dike, dibê:

“Koşka wê, ‘imbaretê wê, ada heft behra daynîn.”

Wextekî, Dunya Gozel radibe. Dêna xwe didê, çi! Dora wê hemû behr e. Deyn<sup>1212</sup> carya dike, dibê:

“Carî, ca rabin. Mala bavê we neşewite! Behr e! Dora behrê ne! Avayê mi, bînayê mi devê behrê ne!”

Radike. Dêna xwe dayê, Hiseyn jor da tê, difitîne. [Dunya Gozel] dibê:

“Heyyy, binê, însanê cinu cinu ye. Te îja ez anîme derxistime devê behrê?”

[Hiseyn] dibê:

“Erê wellle.”

[Dunya Gozel] dibê:

---

1209 ) Jixweveçûyîn.

1210 ) Cuda.

1211 ) Gemar, qirêj, qilêr.

1212 ) Deng.

“Tu bi çi hatî ? Te çi terî ez anîme?”

[Hiseyn] dibê:

“A mi tu bi vê bilûrê anî.”

[Dunya Gozel] dibê:

“Ê de baş e.”

De rûdinên. Dîsa nan, av, çay-may... Efendimê xwe ra bêjim, êvar dikeve ser. Wextê dîsa jehrê didê, bayilmîş<sup>1213</sup> dibe. Davêje ada heft behra. Hiseyn davêje wira. Ew jî bilûrê dixwe, dibê:

“We ça ez anîme, koşka mi, ‘imbareta mi, kevir kevir şaş nebe, hûn ê daynin.”

Cake<sup>1214</sup> radibin. ‘Eynî bi wî hesabî datînin. Hiseyn wextekî şevê radibe. Dêna xwe dayê, çi! Mêşeke, sade notanî<sup>1215</sup> vî Kîrrê Tendûlekê<sup>1216</sup> dar in. Ha diçe, devî ne. Ha diçe, devî ne. Birçî dibe. Sêv li wira ne. Sêvek, sêva sor duxwe. Dêna xwe dayê, bû hirç! Hisên bû hirç jî. Dibê:

“Heyyy, mala mi xira be! Teze ez bûme hirç!”

Ha digere, ha digere. Diçe dêna xwe dayê, hine sêvê gewrik hene. Dibê:

“Ev sêvê sor mi xarine. Ca sêvê gewr jî buxum.”

Ça duxwe, dibe meriv. Dibê:

“Aaaa, baş e. Dunya Gozel, te çi kir te bi mi kir.”

Efendimê xwe ra bêjim, radibe. Ça dike, Xalqê ‘alemê derbas dike. Tê, hine sêvê sor dikirre. Hinek jî sêvê gewr dikirre. Tê, ber koşka wê datîne. Efendimê xwe ra bêjim, sêvê isa nin, tu qêmîş nakî dêna xwe bidî sêva. Carî tên, dibê:

“Dunya Gozel, sêvê isa hatine ber koşka te. Qe şîherê bavê te da tine.”

[Dunya Gozel] dibê:

“Ê de here me ra kîlokî bikirre bîne.”

Diçe tîne. De her yekî, yekî didê. De bidî<sup>1217</sup> Dunya Gozelê naxun. Dunya Gozel radibe. Kêra xwe hildide, sipî dike. Ça duxwe, nîşkêva bû hirç! Dibe hirçeke sax.

Efendimê xwe ra bêjim, Hiseynê te diçe. De Dunya Gozel ça bike? Cab paşê ra diçe, dibê:

“Welle, qîza bû hirç! Bû hirç!”

De paşa ye. Gazî mela dike, gazî niftîya<sup>1218</sup> dike. Efendimê xwe ra bêjim, dibê:

“Dunya Gozelê kê qenç ke ez ê bêqelen bimê.”

Ê kê qenç bike? Hewqa tên. Ew hine mele hene, hinde kitabê wan hene, tînin. Rojekî ça dibe, Hiseyn diçe dîwana paşê, dibê:

---

1213 ) Jixweveçûyîn.

1214 ) Dîsa, careke din.

1215 ) Mîna.

1216 ) Çiyayê Tendûrekê.

1217 ) Li cem wê/wî.

1218 ) Miftî.

“Paşa xaş be, ez ê qîza te qeç kim.”

[Paşa] dibê:

“Mala bave te! Wellahî ez ê serê te lê xim. Hewqa mele hatin. Hewqa şêx-mele hatin. Yekî qenc nekir. Ka tê ça qenc kî?”

[Hiseyn] dibê:

“Ê yawo, mi qenc kir, tê Dunya Gozelê bidî mi. Mi qenc nekir, tê serê mi lê xî.”

Heyetekî çêdikin. Ew [paşa] dibê:

“Temam. Baş e.”

Efendimê xwe ra bêjim, wextê tê, tê ber koşka Dunya Gozelê disekine, dibê:

“Dunya Gozel, ça ne?”

Serê xwe xar dike. Dizane, da. [Hiseyn] dibê:

“Dil-hinavê teyr te xarye, kanê? Ti bidî. Ewî derxe bide mi.”

Dil-hinavê wî ça dike, derdixe. [Hiseyn] dibê:

“Sifrika mi li ku ye? Tê bidî mi. Kumê mi li ku ye? Tê bidî mi.”

Iha dike, dibê:

“Ê baş e. Ez ê hemûka bime te.”

Efendimê xwe ra bêjim, sevekî derdixe, seva gewr derdixe, dibê:

“De buxwe.”

Wextê duxwe, dêna xwe didê, bû Dunya Gozel. Cab paşê ra diçe, dibê:

“Efendim, paşa, welle qîza te dîsa ‘eynî mîna halê berê ye.”

[Paşa] dibê:

“Ê baş e. De idî here. Dunya Gozel te kir, eva kir. Nekir, zaten mi te ra sozek daye.”

[Hiseyn] tê. Dunya Gozel dibê:

“Hiseyn, kelîmeke mi heye.”

[Hiseyn] dibê:

“Çî ye?”

[Dunya Gozel] dibê:

“Tê herî. Sibê zû, merivek hespekî sîyar e. Mi’îneke<sup>1219</sup> ewk sîyar e, boz sîyar e. Wextê dajo, wusa dike xwihê da reş dibe. Wextê tê, ewkekî, cuhureke qûmê dixê serê wê, devê wê. Ew duxwe heta sibê. Here. Wê meselê mi ra hel ke. Were, ez ê te bikim.”

[Hiseyn] dibê:

“Dunya Gozel, ê de baş e.”

Diçe. Heqeten dêna xwe didê, ewa sîyara derket. Hespeke boz e. Wextê dajo, isa dajo, isa dajo, reş dibe. Xwihê da reş dibe. Wextê tê peya dibe, efendimê xwe ra bêjim, cuhurê qûmê dikşîne serê wê.

---

1219 ) Mehîn, mahîn.

Tê mala xwe.

Ew jî tê malê. Efendimê xwe ra bêjim, tê nêvanê wî. [Ew meriv] dibê:

“Filankes, de kerem ke were nan buxwe. Êvar e.”

[Hiseyn] dibê:

“Welle, ez nanê te naxum.”

[Ew meriv] dibê:

“Çima naxwî?”

[Hiseyn] dibê:

“E naxum. Ewa hespa, wextê ti sîyar dibî diçî dajoyî heta êvarê, êvarê tê, reş dibe. Wextê tu tê, cuhrê wî dixî sêrî, sed darî jî lê dixî. Mesela wê çî ye? Mi ra bêje.”

[Ew meriv] dibê:

“Yawo, îşê te tine? Nankê xwe buxwe. Tu dehwa çî mi ra dibînî?”

[Hiseyn] dibê:

“Na. Tê wê meselê mi ra bêjî.”

De zemanê berê, kê nanê kê nexwe jî ‘eyb bûye, da. [Ew meriv] dibê:

“De were nanê xwe buxwe. Ez ê te ra bêjim.”

[Hiseyn] dibê:

“Ê baş e.”

Wextê nan tîne, nanê xwe duxwe. [Ew meriv] dibê:

“Eva, jina min bûye, eva mi’ina. Wextê ez hatime geryame, millet gotye mi gotye, eva rêjberê te, em bêjin bûye kerê reş, ker jî kerê reş bûye, jina te ra ne. Mi bihar<sup>1220</sup> nekiryê. Mi gotye, virra dîkin. Hevraz-berjêr, ez rojekî hatim. Mi dî, heqeten isa ne. Jina mi sêrcî bû. Wextê qamçîk li mi da ez bûme boncî. Ez bûme boncî. Efendimê xwe ra bêjim, saqoqa ketim. Sa mi xeniqand. Vir da wê da. Baltûzeke mi hebû. Zarê wê derketin go, eva çehvê vî boncîyî nota<sup>1221</sup> çehvê zavê me ye.”

[Baltûza wî] gazî dikê, tê. Qamçîkî lê dixê, dibe meriv. Dibê:

“Yalnız<sup>1222</sup>, tu vê carê jî herî, wextê li te xe, idî e te nikarim. Tê bibi heywan, ‘eynî heywan. Qamçîyê ewê hene.”

Radibe. Sîyar dibe, diçe. Wextê tê, ew razayîbûye. Jinik razayîbûye. Wextê lê dixê, dibê:

“Ti bibî hesp.”

Li ewî ‘ereb dixê, dibê:

“Tu jî bibî kerekî reş.”

[Ew meriv] dibê:

---

1220 ) Bawer.

1221 ) Mîna.

1222 ) Lê, lê belê.

“Niha eva kerê reş e. Eva jî kulfeta min e.”

[Hiseyn] dibê:

“De bihêle, îja ez te ra sozekî bidim. Yalniz, tê bidî xatrê mi. Em ê lêxin kerê reş bikujin. Em ê jina te jî dîsa [bînin] ‘eynî hêla berê.’”

[Ew meriv] dibê:

“Ê baş e.”

Wextê qamçîkî lê dixin, jinik dibe ew. Jinik tobe dike, idî. Lê dixê kerê reş jî dikuje. Efendim, dibê idî bira ew here xwe ra. A bi wî hesabî.

Îja dibê hel dike tê. Wextê tê, [Hiseyn] dibê:

“Filankes.”

[Dunya Gozel] dibê:

“Erê, tamam. Gotina te ye. Yekî dinê jî heye.”

[Hiseyn] dibê:

“Çî ye?”

[Dunya Gozel] dibê:

“Tê herî. Melek sibê zû radibe banga sibê. Radibe, dikene, dikene, dikene, diçe serê minarê. Wextê bang dide, digrî, digrî, digrî, tê mala xwe. Here wê meselê jî mi ra hel ke. Were ez ê te bikim.”

[Hiseyn] dibê:

“Ê baş e.”

Efendimê xwe ra bêjim, diçe. Sibê zû şevqê diçe. Heqeten, dêna xwe dayê, mele rabû çû mêja sibê. Keniya, keniya, keniya, çû. Wextê tê, digrî, digrî, digrî, tê. Diçe nêvanê wî. Wê rojê dimîne. Sibê dibêje:

“Mela, şevqê tu diçî mêja sibê. Ti dikenî, dikenî, diçî. Wextê tê, digrî tê.”

[Mele] dibê:

“Filankes, îja ez te ra meselê bêjim. Ez çûm. Cîk hebû. Kevotk [lê] hebûn. Horî bûn. Kanîk bû, diketne avê. Sê hev bûn. Xûşkê hev bûn. Diketne avê. Rojekî, dudyâ, sisya... Ez çûm. Min go, ez ê yekî bigrim. Ez çûm. Nizam ça bû. Mi xwe teland, ewk kir. Ewna ketne avê, yek ma. Mi destê xwe danî ser kevlê<sup>1223</sup> wê. Mi ewa wê girt, kincê wê girt. Idî nefirî. Nefirî. Mi anî, xwe ra hilda. Hevraz-berjêr, du zarê mi lê çêbûn. Kevotk in da, horî ne. Du zarê mi lê çêbûn. Lê, mi kevlê wê anî kire cîkî, veşart. Hey cara ez tîm dêna xwe dimê, kevlê wê çika heye tine ye? Rojekî ez tîm. Mi dêna xwe dayê, du hev zarê mi jî hene.”

Dibêjne cîya xwe, dibê:

“Bavê mi, a filan derê dinhêre, nota<sup>1224</sup> tişteke tê da ne. Heftê carekî diçe dêna xwe didê. Çika çî

1223 ) Kinc, ber, cilûberg.

1224 ) Mîna.

ye?”

[Dîya wan] dibê:

“Kê derê ye?”

[Zarok] dibê:

“A vê derê.”

Ça diçe, peyyy! Dêna xwe didê, kevlê wê ye, kincê wê ne. Wan kinca xwe dike. Kinca zarê xwe jî dike. Difirin diçin.

[Mele] go:

“Wextê diçin, sibê zû şeveqê tên. Wextê ser serê vê darê datînin, dixûnin. Ez diçim. Ez dibêm, ez ê bigrim. Ez dikenim, dikenim, [diçim]. Wextê ez diçim ew difirin. Ez jî digrîm, digrîm, digrîm, tême mala xwe.”

[Hiseyn] dibê:

“Ê de baş e. Îzna xwedê ez ê te jî xilas kim.”

[Mele] dibê:

“Çî ye?”

[Hiseyn] dibê:

“Ser serê darê qîr ke. Qîr ke. Wextê qîr kî, ewana yê werin daynin. Wextê daynin, ew qîr pê va ye. Ew nikarin bifirin. Ez ê wan hersêka<sup>1225</sup> jî bigrim.”

Hiseyn jî aqil bûye. [Mele] dibê:

“Ê baş e.”

Wextê ew dibê, êfendim, serê darê qîr dike. Wextê ewana tên serê darê datînin, ewana diçin. Wextê diçin, de bifirin nikarin bifirin. Hersêka jî digrin. A bi vî hesabî diçe. Dunya Gozel dibê:

“Heqeten gotina te ye. Meseleyeke dinê jî heye.”

Hiseyn ça dike? Hiseyn hema qamçikî lê dixê, dibê dibe qantir. Dunya Gozel dibe qantir. Sewrax<sup>1226</sup> dibî? Ew eşyayê xwe, yîyêcek<sup>1227</sup>, çî birye, hemû lê dike. Sîyar dibe, herrek tu naçî.

Tê şehre, ew birê wî (lê) bûye paşa, tê wî şehri. Tê wî şehri. Efendimê xwe ra bêjim, qantirê wira dihê. Dêna xwe didê, em isa bêjin, yekî nota<sup>1228</sup> gundîyê me Mahir, kevira bi milê xwe dikşîne. Dibêje merivekî, dibê:

“Evê qantirê ez ê bime te. Tê bar kî bi kevira. Tê bikşînî. Tişteki jî nadê. Yêwê wê qûm e. Xêncî qûmê tişteki nadê.”

De Dunya Gozel ew dibe, pişt-miştê hemû kul dibin. Dunya Gozel dizane ew zengila ew e [di şîherê Hesên da ye].

---

1225 ) Her sê.

1226 ) Serwext.

1227 ) Xurek, zad.

1228 ) Mîna.

Efendimê xwe ra bêjim, ew [Hiseyn] diçe, dibê:

“Ez ê herme memleketê bavê xwe.”

Diçe memleketê bavê xwe. Diçe. Dêna xwe dayê, cîya wî [û] cihû. Du hev zarê wî jî lê hene. Şûrekî hildide diçe. Efendimê xwe ra bêjim, diçe wira. Dibêje cîya xwe, dibê:

“Dayê, te çima iha kir? Ez serê dîk lê xim yan?”

Yek qîz bûye yek jî ew bûye. [Hiseyn] dibê:

“Ez serê dîk lê xim yan serê ewê lê xim, serê qîzîkê lê xim?”

Serê herdika lê dixê, dikuje. Cihû jî dikuje. Cîya xwe jî dikuje. Wira vedigere tê. Tê.

De Gozel Dinya dizane, wira her kes diçe, zengil dihejîne, dehwa heqê xwe dike. Diçe. Dibê ewa xwe [zengil] ba dike. Gazî dike. Dehwa heqê xwe dike. Merivek derdikeve, dibê:

“Eva heywanek e!”

Paşa derdikeve. Dêna xwe dayê, qantirek sêrî bûye xûn heta binî. Gazî dike, dibê:

“Eva heywana kê heta niha daye xevatê?”

Ew meriv tê, dibê:

“Welle, merivekî anye daye min. Mi pê kevrê xwe kişandîye. Gotye, tu vî halî tiştêkî nedê.”

[Paşa] dibê:

“Ê baş e. Ew meriv li ku ye?”

Nas dikin. Gazî dikinê. Wextê Hiseyn tê, ewê nas dike, birê xwe nas dike. Dêna xwe dayê, Hesen e, bûye paşa.

[Paşa] dibêje wî mervî, dibê:

“Filankes, ev qantir te çima kirye vî halî? Te daye vî mervî?”

Nabêjê. [Hiseyn] dibê:

“Bira<sup>1229</sup> cima’eta te belav be, ez ê te ra bêjim.”

De birê xwe nas dike. Hesen nas dike. Wextê cima’et ewk dibe, dibê:

“Ewa yê were ser xalî-xalîçê te.”

[Paşa] dibê:

“Çi terî were?”

[Hiseyn] dibe:

“Lê.”

[Paşa] dibê:

“Heywan e.”

[Hiseyn] dibê:

“Na. Ewê were. Ez ê bêjmê. Ew ê hilkişe, nerdewanê te hilkişe, were ser xalî-xalîçê te. Ez ê îja mesela wê te ra bêjim.”

---

1229 ) Bila.

Wextê tîne wira, dibê:

“Ne tu kurê gêvîn î?”

Dibêje birê xwe. Wextê dibêje tu kurê gêvîn î, metel dimîne, dibê:

“Kuro, evî ça bidî<sup>1230</sup> wezîr-wekîla negote mi, tu kurê gêvîn î?”

[Hesen] dibê:

“Tu ça dizanî ez kurê gêvîn im?”

[Hiseyn] dibê:

“Tu kurê gêvîn î. Çima ez te naz nakim tu kê yî?”

[Hiseyn] wextê iha dike, dibê:

“Eva Dunya Gozel e.”

[Hesen] dibê:

“Çi terî Dunya Gozel e?”

[Hiseyn] dibê:

“Ê tu kurê gêvîn î. Ka tu çi fehm dikî? Ez Hiseyn im, tu jî Hesen î. Em birê hev nîn in? Tu jî kurê gêvîn nîn î?”

[Hesen] dibê:

“Erê welle.”

[Hiseyn] dibê:

“Bihêle.”

De mesele, mi te ra ça gotye, wusa wî ra dibêje. Qamçikî ça lê dixe, dibe Dunya Gozel. Wusan e, şemdana wê davêje koşka wî digre.

[Hiseyn] dibê:

“Eva Dunya Gozel e. A îja ez ê bime te idî.”

A wî çaxî dide birê xwe. Ew diçe mirazê xwe şa dibe. Ew jî diçe mirazê xwe şa dibe. A kuta bû, çû.

ÇÎROKBÊJ: KEMALÊ XELKÊ SARÎCÊ

HERÊM: GUNDÊ SARÎCÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 71

PERWERDE: NEXWENDE

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 05/10/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1230 ) Li cem.



## 12. ÇÎROKA HEZAR YEK ŞEVÎ<sup>1231</sup>

Dibê padişahê hebûye. Yanî du hev hespê wî ye bayê birûskê hebûne. Jina padişah yeke bêedeb bûye. Dibê jina wî yeke edesiz<sup>1232</sup> bûye. Yawo, teyî, berê digotin, digot:

“Moriya xewê davêjne guha.”

Dibê êvarê, gava padişah radiza, moriya xewê diavîte guhê padşê. Dibê xwe ra radibû. Hespêkî sîyar dibû. Em bêjin, yek jî xulam lê sîyar dikir. Yanî kulî rojê xwedê [wisa bûye].

De îja jina paşê bûye. Em bêjin, tune ne xulam û xizmetkar. Em bê, xurçek be, têrek be, tijî kadebêşî dike. Davêje terkîya xwe. Meydan dikin diçin. Em bê, diçne ku? Diçne serê Tendûlekê<sup>1233</sup>.

Li wira herebaşî<sup>1234</sup> hebûne. De herebaşî, ewanê yolkesan<sup>1235</sup> hebûne. Dibê li wira, em bê, wexta ku eva çûye wê derê, dewamî çûbûye nava wana. Ewa dera, yanî ewa çil merva, haşa, tamamî em bêjin pê ra cima' kirine. Ew cake<sup>1236</sup> bi sibê ra hatye. Dême<sup>1237</sup> moriyê ji guh derdixe, paşê padişah pê dihise.

Dibêje pir dewam dikin, hindik dewam dikin. Yawo, de îja di êvar da diçe sîyar dibe. Em bê, meydan dike. De îja, di êvar da here serê Tendûlekê were. Yê ça be? Ça dibê? Hesp kok nabin, da. Yawo, hesp kok nabin. Yawo dibê hesp kok nabin. Ê em bê, ew seyîsê hespa newêre bêje [ku] jina te dibe. Ê ew mervê ku miqatî hespa dibin newêrin surra jinikê bêjin. Halbûkî, kurê kerê, bêje. Hemî zaten serê te ye were jêkirin. Yanî bi hezara serê meriva tê jêkirinê.

Pir diçe, hindik diçe. Rojekî yekî mîtanî<sup>1238</sup> Hadoyê me ye Hecî Ūso ye jêhatî miqatî hespa dibe. Erê, dibêje, dibê:

“Kuro, mi gora bavê paşê go. Ez ê herim hespa paşê xweyî kim. Filan...”

Dibê wexta ku dibin, padişah dibêje:

“Tê van hespê mi kok kî. Tu kok kî, jixwe tu xilaz bûyî. Tu kok nekî, ez ê serê te jêkim.”

Em bê, dibê:

“Padişah, bavo, mi çi xast tu bide min. Em bê, cêh bîne, ûlafê bîne, nizam çi bîne. Em bê, hesp çima kok nebe?”

Neysene<sup>1239</sup>, tê. Padişah dibêjê, dibê:

“Kuro, ji kela serîya serîk maye. Ya cendeka cendekê maye. Binêre ez ê serê te jê kim!”

1231 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1232 ) Bêedeb.

1233 ) Çîyayê Tendûrekê.

1234 ) Rêgirr, rêbirr.

1235 ) Rêgirr, rêbirr

1236 ) Dîsa, careke din.

1237 ) Anku, yanî

1238 ) Mîna.

1239 ) Werhasil.

[Seyîs] dibê:

“Bavo, mi çi gote te tu bîne. Ez ê miqatî hespê te bim. Ku mi kok nekir serê mi jê ke.”

Neyse, eva pir dimîne, hindik dimîne. Padişah rojekî gazî dikê, dibê:

“Kuro, tu kurê merivan î. Ka tu jî hatî, hesp kok nebûn?”

Hema kerr gazî dikê, dibê:

“Paşa, were vira. Surra hespê te destê jina te da ne. Jina te nahêle hesp kok bin.”

[Padişah dibêje]:

“Kuro çakî nahêle?”

[Seyîs] dibêje, dibê:

“A iha. Gava ku dibe êvar, moriya xewê davêje guhê te. Bi xwedê, hespekî sîyar dibe. Mi jî yekî sîyar dike. Em diçine serê Tendûlekê. Heta sibê, em bê, xwe ra çi dike dike. A tê, ewk dike.”

[Padişah] dibê:

“Kuro, hey nabe?”

[Seyîs] dibê:

“Erê.”

Idî ullah’alem, padişah, idî ewî dikuje? Idî xelat dike? Heke idî dest-pîyê wî girêdide ku surra wî dernekeve? Ça dike? Em bêjin, soz-bext xelat dike. Em bêjin, berdide. Yanî [seyîs] nikare [surrê eşkere bike]. Zaten yê here çi bêje? [Padişah] dibê:

“Tu kincê xwe bide mi.”

Padişah, kincê wî li xwe dike. Wê şevê dikeve dewsa wî. Dêna xwe didê, ‘eynî mêrik ça gotye, gotna wî isa ne. Padişah, bi çehvê serê xwe dibîne.

Padişah, pê ra sîyar dibe diçe. Dibê wê şevê [jinik] hinekî dereng tê. Kenehû<sup>1240</sup> lîdera wana sond duxwe, dibê:

“Ku were ez ê çil darî lê xim.”

Dibê yek radibe, dibê:

“Paşa, çil darî lê nexê. Em bêjin, kenehû sonda te cî ye. A evê gêzîyê da çil na, heyştê dar heye. Carekî gêzîyê le xe. Kenehû sonda te tê cî.”

Yanî padişah wana bi çehvê xwe dibîne. Dêna xwe didê, li wira darek heye. Hesp pê va girêdane. Haşa ji we, dibê hespa wisa hingî dar kotîye, dar li ser rehekî maye. Haşa, tersê hespa avîtye ser serê darê. Bi çehvê xwe dibîne. Qe xwe belu nake. Wextê ku dizvire tê, ça tê mala xwe, serê wê jê dike. Serê jînikê jê dike.

Mudekî, em bê, bêjin dimîne. Mudekî bêjin dimîne. Dêna xwe didê, em bê, îdare nake. Bêjinî îdare nabe. Niha dibê bi vî qirareyî tê, mudekî jî dimîne. Dibê îdare nabe. Dibê di şehrê xwe da dike yasax [ku] kes qîza nade mêr. Dibê eva xwe ra rojê qîzekî dixaze. Em bê, dehata wê dike. Êvarê

---

1240 ) Qaşo.

diçe cem. Subê jî serê wê jê dike. De padişah e, xwe ra isa dewam dike. Dibê son netîce<sup>1241</sup>, rojekî, qîzeke wezîr dibêje [bavê xwe], dibê:

“Bavo, bêje padşê, ez ê padşê bikim. Mi bidê.”

Niha dunyayê da, xwedê gava aqil da, her tişt tê. Çimki aqil e. Wezîr dibêje, dibê:

“Qîzê, tu qîza merivan î. Zaten tu hema çî yaşamiş<sup>1242</sup> bî kar e. Zaten padşê kirye yasax. Em bêjin, şîher da qîz mêr nakin. Hema em bêjin bona xatrê mi, bekî<sup>1243</sup> tu du-sê sala bimînî. Filan...”

[Qîza wezîr] dibê:

“Wexta ku yê mi bikuje, hema pêşda bira mi bikuje. Yan ez ê heyata qîzê şîher xilas kim. Yan jî serê mi bira here.”

Neyses, wexta ku [qîzik] dibêjê, [bavê wê] dibê:

“Temam.”

[Qîza wezîr] dibê:

“Yalniz<sup>1244</sup>, bêjê. Wexta ku ez herim, eva xûşka mi, yeke piçûk bûye, eva jî yê bi mi ra were.”

Neysene<sup>1245</sup>, eva wexta ku ‘eynî isa dike. Tabî êvarê dehvatê dikin, diçe malê. Padişah wexta ku ji dîwana xwe yê here yêra<sup>1246</sup> xwe, dêna xwe didê, eva rabû, pêş va hat. Kete ber milê wî, bir. Filan.

[Padişah] dibêje, dibê:

“Pekî tu nizanî, mi tu xastî? Ez heta sibê serê jina jê dikim. Filan...”

[Qîza wezîr] dibê:

“Padişahê mi, ez jina te me. Em bê, ez goreva<sup>1247</sup> xwe bikim. Serê mi jê dikî jî tu dizanî.”

Dibê hinekî disekinin, filan. Yê idî razên. Dêna xwe didê, qîzik [xûşka piçûk] digrî:

“Ihi, ihi, ihi...”

Padişah dibêjê, dibê:

“Ew çima digrî?”

[Qîza wezîr] dibê:

“Welle, padişahê mi, min hêm kirye. Ez jê ra çîroka dibêjim.”

[Padişah] dibê:

“Ê de baş e, baş e. Jê ra yekî bêje, bira kerr be.”

Dibê wexta ku eva dibêje:

“Ya illa ya xwedê.”

---

1241 ) Axiriyê da, dawiyê da.

1242 ) Jîn, jiyîn.

1243 ) Belkî.

1244 ) Lê, lê belê.

1245 ) Werhasil.

1246 ) Cih, cî, der.

1247 ) Wezîfe, peywîr.

Bextê te û xwedê me, Mezhero<sup>1248</sup>, dest pê dike ku yekî dibêje. Tam tîne cîyê heyecanlî<sup>1249</sup>, padişah eynî nûta<sup>1250</sup> Hecî Hiseynê rehmetî dibêje, dibê:

“Ii, iii, iii...”

Ew dibêje:

“Padişahê mi, bira bisekine şevke dinê.”

Idî birayo, eva hema isa [dibê]:

“Şevke dinê.”

Padişah, sade meraq dike ka yê ça be? ‘Eynî benzemîşî<sup>1251</sup> van dîziya [dibe], da. Teyî, hinek hema alişmîş<sup>1252</sup> dibnê. Dibê isa padişê ra çîroka dibêje. Yanî padişah wextekî dêna didê, navê wê [çîrokê] dibe Elif û Leyla. Yanî, hezar yek şevî.

Padişah wextekî xwe dihise, [qîza wezîr] dibêje:

“Welle padişah, eva du zarê te hene. Yê sisiya jî a va zikê mi da ne.”

Idî padişahê ka ça bike? Hezar-yek şev, sê sal e. Erê. Zarê wî jî jê çêdibin. Dêna xwe didê, haşa, ya xirab jî nîne. Em bêjin, idî yaxa<sup>1253</sup> jinê şîher jî jê xilaz dibin. Ew jî xilaz dibe. Elif û Leyla ev e.

Îja birayê xwe bêjim, de îja qîzikê çî jê ra bêje? Ew qîzka jina padşê, yê îdî başlamîşî<sup>1254</sup> çîroka ke, paşê ra çîroka bêje. Ka eva me teze serî vekir. Teyî<sup>1255</sup>, wextê ku bêrê çîrok digotin, digotin:

“Hebû tunebû rehma li dêbavê hazira bû.”

Erê, rehme li dêbavê hazira be. [Qîza wezîr] dibêje:

“Yek hebûye. Êtîm bûye. Navê wî Hesen bûye. Hesen, li ber destê merivekî, em bê, xevitî bûye. Yanî ewa baxir qismî heye? Teyî, em bêjin carna Mîdyatê jî niha bi çagûça çêdikin, filan. Dibê [Hesen] bi wî qîrarî çêdike. Dibê mecûsîk, kafirî, em bêjin ehlê sêrê bûye, çî bûye? Filan-bêvan. Ha digere, ha digere, çehvê wî, wî [Hesen] dibîne. Dêna xwe didê, em bêjin tabî [Hesen] bêbav e, bêbira ye, bêkes e. Yanaşî<sup>1256</sup> wî dibe.”

[Mecûsî] dibêje, dibê:

“Kuro, tu vî îşî da çî dîstînî? Filan-bêvan.”

Iha dide xeberdandinê. Merivek, ew Mecûsî diçe dibêje wî zarî, dibê:

“Kuro, were miherin<sup>1257</sup>. Ez ê te wisa zengîn kim. Tê bibî zengîne dunyayê.”

---

1248 ) Berhevkar.

1249 ) Biheyecan, peroşdar, bixiroş.

1250 ) Mîna

1251 ) Wekî, şîbhî.

1252 ) Hînbûn.

1253 ) Pêşîr.

1254 ) Destpêkirin.

1255 ) Li Ebexê û li devdora Ebexê di xeberdandinan da bo piştrastkirin û qewînkirina gotinan ev peyv tê bikaranîn.

1256 ) Nêzîkbûn.

1257 ) Yanî, em herin. Ev şewegotin li Ebexê berbelav e û zêdetir tê bikaranîn.

[Hesen] dibêje, dibê:

“Baş e.”

Neysene<sup>1258</sup>, axir gede idî dibêje dîya xwe? Idî bê dîya xwe diçe? Eva [Mecûsî], gede hildide. Wexta ku em bêjin, tam destê gede mîtanî<sup>1259</sup> van orgutana<sup>1260</sup> ça dikeve dêt, wexta ku dikeve dêt, idî em bêjin digo, destê gede ji ‘erd-‘esmana diqete. Gede, yê ku da here? Eva [Mecûsî] çi dike? Dibeje, dibê:

“Gede, bax<sup>1261</sup>-binhêre. Em gava ku çûne ku, tê bêjî bê, eva bavê min e.”

Gede, êtim bûye. Tu kesê gede tune ye. Dîya gede heye, sade. Gede, em bê, mîtanî van îşçiyê hanê dixevite. De mi go, baxir. Yanî wir da dixevite.

Birayê xwe ra bêjim, niha eva dibê qedereke pir çûn, axir hindik çûn. Dibê yê herin gemîkî sîyar bin. Dibê wexta gemîyê sîyar bûn, Ûsibo<sup>1262</sup>, evî [Mecûsî] dibê gemîyê da wisa da gede. De ehlê gemîyê hemû hatin, gotin:

“Yawo, tu çima lê dixî? Filan-bêvan...”

[Mecûsî] go:

“Yawo, kurê min e. Bavo, we ra çi?”

Gede jî tirsî dibêje, dibê:

“Bavê min e.”

Neysene<sup>1263</sup>, eva çûn. Cîkî peya bûn. Dibê nizam kafîrî xand, ça kir? Qantirek li ber hazir bû. Qantir li ber hazir bû. Dibê ew [û] gede li qantirê sîyar bûn. Dibê çûn. Çûne cîkî muwate<sup>1264</sup>. Dêna xwe dayê, çiyakî wisa bilind e! Tişteki ‘ecayîb! Em bêjin, dêna xwe dayê, dibê de îja bi sêrê, sêr e. Gede kire nav postekî, postekî dêva. Em bêjin pêça, ça kir, filan? Dibêje dibê, gote gede, go:

“Kuro, binêrê! Li vira, niha teyrê werin, te hildin biherne serê vî çiyayî bilind. Li serê vî çiyayî kevir hene. Kevir, yanî hemû cewharat e, yanî zêr e, zîv e, filan. Tê kewkî kî, kewkî kî, tilol kî. Yê werin, werin. Wexta ku mi gote te da, idî bes e. Ez ê rê nîşanî te kim, tê werî.”

Ê gedê qijik idî dikare bê na. Eva [Mecûsî], bi wî qirareyî dike.

Teyr, [gede] hildidin, dibine ser serê wî çiyayî. Dêna xwe didê. Wexta ku em bêjin, tabî bi sêrê, bi ewê, dêna xwe dayê, vekirin. Gede rabû. Dêna xwe dayê, bi hezara hestîyê meriva, serê meriva, çiyê meriva hene. Idî gedê qijikî, em bêjin [nikare tişteki jî bike]. Kuro bê, hema tişteki, kevira tilol neke. Ê ji tirsî kevira tilol dike. Ew cewharata filan tilol dike, tê jêrê. Xwe ra, ewa [Mecûsî], wexta ku têra wî tê, gazî gede dike, dibeje dibê:

---

1258 ) Werhasil.

1259 ) Mîna.

1260 ) Rêxistin.

1261 ) Binhêre, binêre.

1262 ) Bavê berhevkar.

1263 ) Werhasil.

1264 ) ?

“Idî bes e. Tilol neke.”

Gede dibêje, dibê:

“Yawo, îja ka ez ê ça werim? Ka rêya mi?”

[Mecûsî] dibê:

“Kuro, rêya te heye? Tê xwe ra li wir bî. Wê derê, yêra<sup>1265</sup> te xaş e.”

Gede ha dinhêre, ûçirim<sup>1266</sup> e, mîta<sup>1267</sup> Kela Amokê<sup>1268</sup>. Valî ûçirim, walî va ûçirim. Belkî hema Kela Amokê be jî, kê çi zane? Dibê, gede mudekî pirr dimîne. Pirr dimîne.

Gede dêna xwe didê, em bê bi emrê xwedê, yanî li ser behrê gemî diçin. Eva, çakî dike? Dibê:

“Hema ez ê xwe bavêjme yalê behrê.”

Eva xwe davêje nava behrê. Niha, xwedê jî ku yardim<sup>1269</sup> ke, dike. Xwe davêje nava behrê. Ça dike? Axir, meriv, gemî [wî] hildidin. Hildidin. Pir diçin, hindik diçin. Idî mêrika dibêjin, dibên:

“Bavo, idî vira tê peya bî.”

Peya dikin. Cîkî peya dikin. Evê tê [gede] jî, xwe ra hema serê xwe hildide. Dikeve nava ormanekî. Diçe w diçe w diçe w diçe... Diçe cîkî. Dêna xwe didê, em bêjin rastî koşk-serakî-bînakî hat. Dibê rastî koşk-seray-bîna hat. Xwe ra, em bê, axirî sitirî, sekinî, filan. Dêna xwe dayê, qîzek derket.

Yanî idî ji mewqîya însana derketye. Ew bolge<sup>1270</sup> ya cinan e. E, çûye wira. Yanî qîzik jî ji perîyan e. Zanî? Ji wan e. Neyse, [gede dibê]:

“Selam ‘elêkim.”

[Qîzik dibê]:

“ ‘Elêkim selam. Kuro, te xêr e? Tu ça hatî?”

Derdê xwe jê ra sêrî da dibêje. Qîzking, em bê, gunê wê pê tê. Em bêjin de hewqa dizanin, filan. [Dibê]:

“Kuro, tu ça hatî? Kuro, ewa kafra, ewî çima ha kir?”

[Gede] dibê:

“Welle, idî. Welle, hema mi xwedê gotye tu gotye. Hema tu xûşka mi, ez birê te. Filan.”

Neysene<sup>1271</sup>. [Qîzik] dibê:

“Kuro, niha îja ya mi kêfa wê ye. Em heft xûşk in. Ez ya piçûk im. Niha ez ber malê mame. Yê dinê çûne raw-nêçîrê. Ka îja ewê werin, ez ê ça wan sewraxt<sup>1272</sup> kim. Filan...”

---

1265 ) Cî, cih, der.

1266 ) Kendal.

1267 ) Mîna.

1268 ) Gundekî ber behra Wanê ye

1269 ) Alîkarî.

1270 ) Der, dever, herêm.

1271 ) Werhasil.

1272 ) Serwext.

Çi serê we biêşînim. Idî ewna jî tîn. Neysene<sup>1273</sup>, ew qîzking ber wan digere. Ber wan digere, dibê:

“Welle, meseleke ha<sup>1274</sup> heye.”

Ewna jî îqna dibin. Em bêjin, dibên:

“Welle, boy xwedê ye. Wexta ku hatye hema birê me ye. Birê me ye.”

Birê wana xwe ra, idî em bêjin, de îja diçe w tê. Filan-bêvan. Ka yê ça here? Ça bike? Xwe ra cem wan e. Idî lê xaş jî hatye. Her tiştî wî, dibê ekmek elden sû golden<sup>1275</sup>. Çima kêf neke? Birê wana xwe ra diçe, digere. Ew xûşkê wî dîsa diçine ewê, diçine raw-nêçîrê. Ewa dimîne, digere.

Carekî dêna xwe didê, ya rebbî! Kuro, heft hev kevotk hatin. Dibê hewz heye. Dibê hatin, danîn. Kevlê xwe, yanî kirasê derxistin. Ya rebbî, bûne qîzê isa! Tiştêkî ‘ecayîb! Dibê ketne hewzê.

Yaniz<sup>1276</sup>, nav da yek heye. Ya rebbî, yanî wisa bedew e! Tiştêkî ‘ecayîb! Hesênê te, dilê wî dikevê. Neyse, evê te [kevok] ça dibin? Evana radibin. Ewa [Hesen] dîsa dêna xwe didê, hema a gava sieta wana tamam bû, her kes derket. Kirasê xwe, xwe kir. Herrek tu naçî. Yanî em bê, firdidin, yallah.

Dibê [xûşka wî] hat. Neysene, dimre. Dîsa gote xûşka xwe, go:

“Xûşkê, wellehî ez dimrim. Hal mesele bi vî karî ye.”

[Xûşka wî] dibê:

“Kuro, lawo, tu hatî vira. Kuro, tu bûyî bela serê me. Kuro, evana, ewa ku tu dibêjî, navê wê Mînarusîna ye. Yalaniz<sup>1277</sup>, qîza padşahê padşahan e. Yawo, eva hewza, em bêjin yê wan e. Ji ku tîn xwe ra dikevne avê? Kuro, çi kula te heye ku tu çûyî te dît? Filan.”

Hema dîsa dibê:

“Ih, ih, ih...”

Birayê xwe ra bêjim, neysene, dibê îja axir, ber qîzîkê digere, qîzîk dibêjê:

“Heft roja carekî tîn, filan... Wextê ku hatin, kirasê xwe xistin, te kirasê wê hilda veşart ku hevalê wê çûn, welle tu xilazbûyî. Gava te kirasê wê [hilneda, tu nikarî ti tiştêkî jî bikî]. Yanî isa dîqat ke, kirasê wê hilde, ha. Te kirasê kîjanê hilda, ew ma ji te ra.”

Eva [Hesen], tabî dîqat dike, filan. Dikevne avê. De îja, xwe ra dizîkava lê dinhêre. Erê. Kirasê wê hildide. Dibê wexta ku zemanê wana tamam dibe, hema her kes rabû. Kirasê xwe, xwe kirin. Herrek tu naçî. Dibê eva ma cî da. Dibê ma cî da. Birê xwe ra bêjim, dibê qîzking, yanî em bêjin lawayî kir:

“Boy xwedê, tu kê yî? Kuro, te çi kir? Filan-bêvan.”

---

1273 ) Werhasil.

1274 ) Wiha.

1275 ) Biwêjeke tirkî ye ku tê maneye domandina heyateke bi belaşî.

1276 ) Lê, lê belê.

1277 ) Lê, lê belê.

[Hesen] dibê:

“Welle, îmkan tune.”

Dibê kiras nedayê. Dibê bi porê wê girt. Dibê hilda, anî cem xûşka xwe. Anî cem xûşka xwe. Dibê xûşka wî go:

“Kuro, wellahî-billahî-tillahî, yanî tu bûyî bela serê me. Rûyê te da hemin em ê werne sirgûnkirin. Çika yê ça be?”

Neysene<sup>1278</sup>, dîsa ma. Qederekî ma. Xûşkê wê hatin. Îja ewa pîçûk çû ber xûşkê xwe gerya. Îja surra xwe go, go:

“Heyran, hal-mesele bi vî karî ye.”

Ê xûşk jî, yanî xweyê sozê xwe ne. Em bêjin, gotinê tu birê me yî. Erê. Yanî dilê wan ber dernayê. Çi serê te biêşînim, evê te [Hesen] rabû. Yanî idî xûşka, ew [Marînusîna] dane wî. Li cem ma. Dibê şeş meha ma. Şeş meha ma. Tabî, idî jinik hemle ye.

Dibê [xûşkên wî] rabûn. Yanî de îja, em bêjin dunya dest wan da ne. De îja dibê, tiştê ku qîmetê wî em bê giran bi xwe sivik, barê şeş deva, dibê jê ra cêhiz kirin, kar kirin. Dibê go:

“Hesen, te ra oxir be.”

Hesen bi jina xwe va [lêxistin çûn]. Hesen jî, yanî kirasê jinikê veşartî ye. Yanî hema çi wextî bidê, jinikê here. Dibêje dibê, eva rabûn. Xwe ra lêxistin hatin. Hesenê te jî were. Idî şîherê Besrayê, Bexdayê, kê derê, yê were şehrê xwe. De çend meha, xwedê bizanibe. Sê meha tên? Çend meha tên? Tên, tene şîher.

Tên. Neyse, tên diçne cem pîrka dîya wî da. Feqîrê, em bêjin wexta dibînin, li wira em bêjin pîrik şa dibe, filan. Dîya wî dêna xwe didê, wê jinike delal, bûkeke delal e.

‘Eynî eva jî wexta Harûnê Reşît bûye, ha. E. Wextê Harûnê Reşît da bûye.

Dibêje dibê, li wira, de îja çend sala dimîne. Çend sala dimîne. Dibê du kur jê çêdibin, ji jinikê çêdibin. Dibêje, navê yekî datîne Nasir. Navê yekî datîne Besir. Wan nava lê dike.

De îja em bê, îşê sê sal, çar sala dimîne. Eva [Hesen] jî dibêje dîya xwe, dibê:

“Dayê, welle em bêjin mi bîra xûşkê xwe kirine. Xûşkê mi hewqa emeg li mi dane. Ez ê herim serîkî bime wana.”

[Dîya wî dibêje]:

“Baş e.”

Ev [Hesen] jî radibe karê xwe dike. Yê here serîkî bide xûşkê xwe [xûşkên wî yên cin]. De îja em bêjin ku wexta mudêkî pîr diçe, idî dikeve bolga<sup>1279</sup> periya. De îja îşê du meh, sê meha be, çi be, axir bi hedîya-xelat-belat diçe. Evê te, bira here cem xûşkê xwe.

---

1278 ) Werhasil.

1279 ) Cih, cî, der, dever, herêm.



Jinikê bimîne. Dibêje dibê, yanî sira<sup>1280</sup> himamê ya jina bûye. Jinik dibêje xasiya xwe, dibê:

“Em ê jî herin, filan.”

Neyse, hîngî xasî dibêjê:

“Heyran, mêrik çûye. Gotye, bira jina mi dernekeve. Qîza mi, boy xwedê be. Filan-bêvan...”

Neysene<sup>1281</sup>, axirî [bûk xasîya xwe] zorlamîş<sup>1282</sup> dike. Eva [bûk] diçe. Carekî diçe, em bêjin dimînin. De îja eva [Marînusîna] isa kilama dibêje. De Sultan Zibêde jî hatye. Kêfa wê zehf pê ra tê.

Dibêje, cara dinê jî ‘eynî dîsa sira tê, [Marînusîna] dibê:

“Em ê herin.”

Diçe. Bûk dibêje Sultan Zibêdê, dibêje, dibê:

“Kirasekî mi cem xasiya min e. Tu bêjî xasiya mi, [bila] wî kirasî bîne. Îja tu wî çaxî bibîne, em bê yanî, ez te ra kilama bêjim, bileyîzim, bireqisim, filan...”

Dibêje dibê, Sultan Zibêde dibêjê, dibê:

“Pîrê, de here kirês bîne, heyran.”

Pîrê jî mala xwe xira dike, surra xwe nabêjê. De axir, Sultan Zibêde tabî jina padşê ye. Dibêje dibê, Siltan Zibêde gerdenîke wê hebûye. Dibê deyera<sup>1283</sup> gerdenîya wê weke serweda Bîzansê bûye. Yanî isa deyerlî<sup>1284</sup> bûye. Dibê ewê gerdenîyê dide pîrê, pîrê mecbûr dike. Yanî idî mecbûr dike. Pîrê diçe kirês tîne. Dibê wexta ku kirês didê, evê te [Marînusîna] ça dike? [Marînusîna] dibêje dibê:

“Tu îja dêna xwe bidê Sultan Zibêde, îja ez ça bikim?”

Hemen kirês xwe dike. Her<sup>1285</sup> zarê xwe, qewlî mêrikava, dixê paşla xwe. Kirês hildikşîne, diçe ser tawan. Em bêjin, vira jî qederekî kilama jê ra dibêje. Sultan Zibêde dibêje:

“Were. Filan-bêvan”

[Marînusîna] dibêje, dibê:

“Heyran, yawo, ez îsal çîqa sal e mi eva roja beglemîş<sup>1286</sup> kir. Ez qe têm.”

[Sultan Zibêde] dibê:

“Lê, tê ça bikî?”

Xasiya wê zarîn-fîxan digrî, dibê:

“Heyran, ka kurê mi were ez ê çî cewabê bime kurê xwe? Ça bikim? Filan... Boy xwedê be, îja ku kurê mi were, ez çî bêjmê? Tu çî dibêjî?”

---

1280 ) Dor.

1281 ) Werhasil.

1282 ) Zorlêkirin.

1283 ) Buha, qîmet.

1284 ) Giranbuha, biqîmet.

1285 ) Herdu.

1286 ) Li bendê mayîn, li hêviyê mayin.

[Marînusîna] dibêje:

“Kurê te ku hat, wexta ku pey mi were, bêjê bê, bira were Cezîra Weqilwaqê.”

De îja ‘erebî cezîre barikim<sup>1287</sup> navê ada ye. Eva te [Marînusîna], bira xwe ra zara hilde bihere. Hesenê te jî şeş meha dimîne? Çi dimîne? Yê were. Wexta ku tê, pîrêya qijik çi dike? Pîrê jî radibe. Nêzikî mala xwe sê merzela çêdike. Yekî mezîn duduyê piçûk [çêdike], dibêje:

“Wexta kurê mi were...”

Dibêje kurê xwe da:

“Welle tu çûyî. Hema halek li zarê te peyda bû. Filan-bêvan...”

[Hesen] dibêje:

“Dayê, baş e. Wexta mir, tu rabe kirê bîne nîşanî mi ke.”

[Dîya wî] wexta dibê:

“Kiras tune.”

[Hesen] dibê:

“Rast bêje.”

[Dîya wî] dibê:

“Welle hal-mesele bi vî karî ye.”

[Hesen] dibê:

“Temam. Mi zanibû tê boyaxekî bikî.”

Dibê evê te [Hesen] cake<sup>1288</sup> dinê radibe. Berê xwe dide xûşkê xwe [xûşkên xwe yên cin]. Yê here. Birê xwe ra bêjim, eva rê ket, çu cem xûşkê xwe. De îja berê digotin; wî çaxî sal-zemana bû, niha zar-zimana, zû tê ser hev. Dizanî? Ewa diçe digîje xûşkê xwe, dibê:

“Hal-meselê mi bi vî kareyî.”

Dîsa xûşkê qijik ser hev da digrîn. Ser wî da digrîn, dibên:

“Kuro, tu bela bûyî rastî me hatî? Îja ka pekî îcar em ê ça bikin?”

[Xûşkên wî] dibêjin, dibên:

“Welle, apekî me heye. Salê carekî tê vira. Em bêjin, em hev dibînin. Yanî em bêjin, me zîyaret dike. Bona me tê. Xwedê, em ê heviya wî apê xwe bimînin. Heke ku ewî tiştekir kir, nekir nekir. Kuro, Mînarûsîna qîza padşahê padşahan e. Xûşkeke wê jî heye, Nûrûlhuda ye. Nûrûlhuda jî hê ji bavê xwe hukumdartir e. Yanî Cezîra Weqilwaqê jî, ku wexta iha gotye, qe îmkana me [tuneye]. Yanî, em nikarin.”

Neysene, dibê wexta apê wana tê, diçin zîyaret dikin. Surra xwe jê ra dibêjin. Filan... Apê wan jî, dibê isa uzulmîş<sup>1289</sup> dibe. Dibêje qîzê birê xwe jî, yanî wan biraziyê xwe jî dixeyîde, dibê:

---

1287 ) Wisa bawer dikim.

1288 ) Dîsa.

1289 ) Liberxweketin, kesirîn.

“Yawo, çi îşê we bi wî heye?”

[Qîz] dibên:

“Apo, ti me gotye? Yawo, hatye. Idî hema me jî bona xwedê, em bê, em lê bûne xweyî. A iha bûye. A iha bûye. Filan...”

Dûrimê<sup>1290</sup> jê ra dibêjin. Dibê apê wana kaxizekî dinvîse. Idî eger merivekî didê? Ça dike? [Hesen] dişîne cîkî, dibê:

“Tê herî wira. Merivekê derê. Yekî kincê wî reş e, serdanpê reş e. Tê vê kaxzê bidî wî. Ewê here. Idî tê pir herî hindik herî? Îja tê herî, binê ‘erdê ra [derbas bibî]. Wira, merivekî serdanpê kincê wî çîl e. Navê wî Şêx Ebûrîş e. Welle, tê vê kaxza mi bidî Şêx Ebûrîş. Eger Şêx Ebûrîş te ra tişte kir kir, nekir nekir.”

Hema eva [Hesen], dîsa mîta<sup>1291</sup> mervê me dibê:

“Ih ih... Jina mi.”

Yaniz<sup>1292</sup>, mezintaya xwedê zehf e. Yanî, binhêrê xwedê çi çêkirye? Îja evana hemû temsîl in. Eva, qîzik [qîza wezîr] dibêje.

Yanî, îja mala mi xirav kir, Mele Seîd<sup>1293</sup> digot. Îja dihat, a iha cîyê heyecanî<sup>1294</sup> da, digo:

“Padşahê mi, bira bisekine şevke dinê.”

Yawo, malxirabî ‘erebî isa dixand, a niha ez ça xeber didim, ez hindik xeber didim. Yanî isakîne<sup>1295</sup> dixand, ha.

Mezher<sup>1296</sup> ra bêjim, eva [Hesen], bi vî qirareyî diçe. ‘Eynî dêna xwe didê, ew cîyê ku ewî gotye li wira disekine. Dêna xwe dayê, em bêjin, merivekî serdanpê kincê wî reş, rûdana wî reş [li wir e]. Dibê [ewî ew kaxiz] hilda. [Hesen jî] da pey.

Dibê ketne binê [‘erdê], rêkî da diçin. Ça meriv sibê hetanî nîvro binê ‘erdê ra here. Dibê dêna xwe dayê çûn. Em bê, binê ‘erdê jî îsa bû dunya. Em bê, heyetek rûniştîye. Filan-bêvan. Heqîqeten, dêna xwe didê, merivekî rûdana wî çîl [li wir e]. Filan. Dibê wexta kaxiz dirêj kirê, dayê, [ew merivê rûdana çîl] dibê:

“Heyran, yawo, eva îşekî çakî ye, hatye?”

[Ew merivê rûdana wî çîl], idî bona xatirê wî [şêxî] dibê:

“Niha, ez ê jî kaxizekî binvîsim bime te. Niha, sereskerya eskerê Nûrûlhudayê heye. Welle eva, yanî evê kaxzê tê bidî wê. Eger ku ewê te ra tişte kir kir, nekir nekir.”

---

1290 ) Rewş, hal-mesele.

1291 ) Mîna.

1292 ) Lê, lê belê.

1293 ) Birayê çîrokbêj.

1294 ) Bi heyecan, bi kelecane.

1295 ) Wisa. Ev şewegotin li Ebexê zêdetir tê bikaranîn.

1296 ) Berhevkar.

Yanî tabî, idî mîtanî<sup>1297</sup> berê, yanî zehfî tişta, belkî hine cîya da mi bîr jî kiribe. Tabî idî, a bi vî qirareyî.

Evê te [Hesen] radibe. Em bê, ew jî isa bi gemiya, bi gemiya qederekî diçe. Dibê ew jî [Hesen] kaxizê dide [gemîcî], diçe. ‘Eynî isa bi gemîyê diçin, diçe. Son<sup>1298</sup>, yê here, em bê bigîje wê sereskerya Nûrullhudayê. Em bê, sereskerya wê ye, him jî dadîya wan bûye. Yanî, ewana xweyî kirine.

Dibê evê te [Hesen] wextê kaxizê didê, dibê wexta ku behsa Cezîra Weqilwaqê dike, yawo ew jî uzulmîş<sup>1299</sup> dibe. [Seresker dibê]:

“Ka em ê ça herin?”

Neysene<sup>1300</sup>, birê xwe ra bêjim, ewa jinka idî ewî hildide. Ewî hildide diçe. ‘Eynî dîsa adekî, dibê derbas dibe. Jinik jê ra tehrîf dike, dibê:

- Kuro, em ê cîkî ra herin. Sade teyr, sade qûjeqûja teyra [ye]. Tu serê xwe bilind nakî, derdora xwe nanhêrî! Em bê, yanî bi ‘ilmê wan, yanî bi sêhrê wan, yanî gava te da şikbe bin, yê te bikujin. Erê, ew jî teyr in. Hema ji sêrê ne.

Evê te [Hesen], ji wî jî xilaz dibe. Pir diçin hindik diçin. [Seresker] dibêje, dibê:

“Îro li vira, yanî ticaret dibe. Yanî ça dibên pazar [heye]. Em bê, duh-pêrê sira<sup>1301</sup> mêra bûye. Îro jî sira jinan e. Were. Ez ê te ra ewk bikim. Em bê, deste kincê jina li te kim. Tê li vira, xwe ra li vê derê bisekine. Em bê de îja, temamî jin tên, diçin, digerin. Çika tu jina xwe nabînî?”

[Hesen] digere heta êvarê, dibêje:

“Dîsa tişte tune.”

Neysene, evna pir diçin hindik diçin. Eva [jinika seresker] yê [Hesen] hilde here. Çû şehre Nûrullhudayê.

Yalniz<sup>1302</sup>, mêrik, Hesen, jê ra gotye. Jinikê ra gotye. Em bê, surra xwe jê ra gotye:

“Yanî, mi Mînarusîna birye. Yanî idî em bêjin, çar sal e jina mi bûye. Du zarê mi jê hene.”

Temam jê ra gotye. Neysene, evê te [Hesen], son<sup>1303</sup> çi dibêje? Çi serê te biêşînim. Eva sereskera wê, diçe adê. Yanî ada Nûrullhudayê. Nûrullhuda bi xwe hê qîz e. Çiqas eskerê wê heye, hemû qîz in. De îja eskerê di wê ‘alema wan da.

Dibêje, dême<sup>1304</sup> eva isa dirêj dibe? Ça dibe? Çiqa digere? Yanî jinik [Hesenî] gîzlî<sup>1305</sup> digerîne.

---

1297 ) Mîna.

1298 ) Axir, dawî.

1299 ) Liberxweketin, kesirîn, keribîn, kedirîn.

1300 ) Werhasil.

1301 ) Dor

1302 ) Lê, lê belê.

1303 ) Dawî, axir.

1304 ) Anku, yanî.

1305 ) Veşartî.

Nabîne. Son, diçe dibêje Nûrûlhudayê, dibê:

“Meseleke wiha heye.”

Birê xwe ra bêjim, Nûrûlhuda zehf hêrs dibe, dibê:

“Baş e.”

Yanî, Nûrûlhuda dibêje:

“Ev kîjan jin e ku bi vî qirarî, bê min, em bê, çûye? Ihakîne<sup>1306</sup> kirye? Falan.”

Zehf hêrs dibe, falan. Dibêje dibê:

“Baş e. Wexta ku isane<sup>1307</sup>, şehre mi da çîqa qîz hene, tamamî [berhev bikin].”

Eva [Nûrûlhuda], tamamî wî iha dixe cîkî. Ew qîzana hemû tîn diçin. Ber ra derbas dibin. Hema ew [Hesen] dibêje:

“Ihhh, ihhh... Ev nînin.”

Son netîce<sup>1308</sup>, ew dibêje. Yanî jînik [seresker] dibêje, dibê:

“Nûrûlhuda, welle qîzê şîher hemû hatin çûn. Evî nego, jina min e. Xwedê, ez mame tu mayî. Yanî, yan ez im yan tu yî.”

Yanî, idî newêre bêje tu yî. Neyse, Nûrûlhuda wexta ku derbas dibe li ber ra, tabî de xûşkê hev in, rengê hev da nin, dibê eva xwe va diçe. Hesen xwe va diçe. Dibêje dibê, idî Nûrûlhuda dizane ku em bê, xûşka wê ye. Mîranusîna ye.

Dibêje dibê, eva [Nûrûlhuda] radibe, sibê dibêje jînikê [sereskerê]. Yanî ewa jînkê, de ew jî qumandara Nûrûldayê bûye. Erê. Tabî, tam mîta tûgay qumutanîya<sup>1309</sup>, filan-bêvan. [Sereskerê] bin emrê wê da bûye, him jî dadiya wan bûye. Qedrê wê cem hebûye. [Nûrûlhuda] dibêje [sereskerê], dibê:

“Hemî te eva boyaxa anî li mi aland.”

Ewa jînkê qîjik jî dibêje, dibê:

“Heyran, tu mi te alandye? Axirî hatye li me alyaye.”

Birê xwe ra bêjim, dibê eva [Nûrûlhuda] radibe. Sereskerê xwe [bi rê] dike. Dîrek dişîne şehre bavê xwe. Dibêje, dibê:

“Here. Bêje bavê mi, selamê mi jê ra bêje. Bê, Nûrûlhudayê gotye, welle îsal çend sal e, mi Mîranusîna nedîtye. Bira îzna wê bide, were cem mi. Were şehre mi.

[Seresker] dibê:

“Baş e.”

Eva radibe. Esker mesken dike. Wexta diçe şehre bavê wana, bavê wana sibê zû radibe, dîna xwe didê, dora şehre wî tijî çadir-xîvet in. Em bê, mervê xwe dişîne, [dibêje]:

---

1306 ) Wiha.

1307 ) Wisa.

1308 ) Dawiya dawî, di axiriyê da.

1309 ) Femandara Tûgayê.

“Kê ye?”

[Merivê padişêh] dibên:

“Welle, eskerê Nûrulhodayê ne.”

[Bavê wan dibêje]:

“Xêr e?”

Tabî, êlçî diçin. Mervê wî, sereskeryê wî diçin, dibên:

“Welle, Nûrulhodayê gotye, bêje bavê mi, selamê mi jê ra bêje. Bira îzna Mîranusînayê bide, were mêvanê mi.”

Wexta jinika [seresker] diçe cem Mîranusînayê, ê de îja Mîranusîna jî teze poşman dibe:

“Kuro, mi mala xwe xira kir. Em bê, qedera xwedê bû. Ez çûbûm. Kê go tu werî?”

Em bê, yanî [Mîranusînayê] zarê xwe gîzlemîş<sup>1310</sup> kiribûne. Neysene, surra xwe ji jînikê ra dibêje.

Yanî sereskeryayê ra dibêje, dibê:

“Qîzê, ka îja em ê ça bikin? Em ê ça herin? Filan-bêvan...”

[Jinika seresker] dibê:

“Were.”

Yanî ji tirsê, hev newêrin. Yanî ku wexta bizanibin herd<sup>1311</sup> zarê wê hene ku em bê, însan in. Yanî yê bikujin. Tabî eva bi çarekî, tabî seresker idî bi sêra xwe, bi ‘ilmê xwe, heger bi çî awayî gîzlemîş<sup>1312</sup> dîkin, derdixine şehrê Nûrulhodayê. Neysene<sup>1313</sup>, Nûrulhuda dêna xwe didê, gazî Mîranusînayê dike, dibêjê dibê:

“Qîzê, te ça kirye? Filan-bêvan...”

[Mîranusîna] idî surra xwe jê ra dibêje. Dibêje, dibê:

“Heyran, welle hal mesele bi vî karî ye. Ez ça bikim? Filan...”

[Nûrulhuda dibê]:

“Yawo, te îja çima mi ra negotye? Te çima gîzlemîş kirye? Çî ye?”

Idî çî dibêjne hev? Dibêje dibê, eva [Mîranusîna] wexta ku [dibêje], yanî Nûrulhuda bihar<sup>1314</sup> nake. Ku em bêjin, Hesên tîne qarşî<sup>1315</sup> jîna wî, Mîranusînayê. Wexta ku hev dibînin, herd<sup>1316</sup> zar direvin, dibên:

“Bavo.”

Idî eva [Nûrulhuda] bihar<sup>1317</sup> dike. Eva, bihar dike. Eva radibe. Dibêje dibê, yanî ewê çî digo,

---

1310 ) Veşartî.

1311 ) Herdu.

1312 ) Veşartin.

1313 ) Werhasil.

1314 ) Bawer.

1315 ) Pêşber, hember.

1316 ) Herdu. Li Ebexê li şûna peyva ‘herdu’ piranî peyva ‘herd’ tê bikaranîn.

1317 ) Bawer.

Mîranusînayê davêje çarmixê. De îja çarmix ew buye. Dizanî? Davêje çarmixê. Yalniz<sup>1318</sup>, yê bikuje. Ewê jî bikuje, zara jî bikuje, Hesen jî bikuje. Nûrulduda yê wana bikuje. Erê, davêje çarmixê.

Yawo, niha tu ya xwedê binhêre. Niha xwedê xweda ye. Em bê, ew hemû mexlûqên xwedê ne. Ew hukma xwedê daye wan.

Dibê ewa [Mîranusîna] çarmixê da, bira isa bimîne. Hesenê te radibe. Serê xwe hildide. Yanî bi çolê dikeve. Idî yê çolê keve ku da here? Berjêr dibe. Dibê diçe, dêna xwe didê, çemek dikşe. Hukmetê xwedê, ber çêm dikeve. Pir diçe hindik diçe. Dêna xwe didê, darekî dibîne. Yawo, ser belgê darê nivîsare. Navê wî nivîsare:

“Ya Hesenê kurê filankesê, nesîbê te yê were vira. Qedera te da ev heye. Yalniz, xwedê yê te xilas ke. Xwedê, yê xilas ke.”

Dibê qedereke pirr diçe. Dêna xwe didê, du zar li wê derê, em bê, iha tartîşmîş<sup>1319</sup> dibin. Dibêje dibê, diçe cem wana. Dibêje, dibê:

“Kuro, hûn çima iha dikin?”

[Herdu zarok] ‘erebî dibêjin, dibên:

“Welle, ‘emo, yanî apo. Eva kum e, eva jî qamçî ye. Yanî herdik<sup>1320</sup> jî bavê me da mane. Meriv kum dide serê xwe nayê xuyan. Qamçî jî hukmî wî zehf e. Gava te li ‘erdê da, sêzde hev padşahê cîna, yanî em bê, padişah çîqa esker bin emrê wan da ne, dikevne bin emrê mêriv.”

Ewî mezin dibêje, dibê:

“Mi gotiye ez mezin im. Qamçî mi ra, kum te ra. Ew jî dibê, na. Kum te ra, qamçî mi ra. Em tartîşmîş<sup>1321</sup> dibin.”

Îja [Hesen] dibêje:

“Ez ê şerî’eta we bikim.”

[Herdu bira] dibên:

“Ê de tê ça bikî?”

[Hesen] dibêje, dibê:

“Ez ê niha kevirekî bavêjim. Hûn ê birevin. Kê we kevir hilda, qamçî yê wî ye.”

Niha hukmetê xwedê, eva kevir davêje. Wexta kevir davêje, ewna li pey kêvir dikevin. Eva kum dide serê xwe. Qamçî dide destê xwe. Emrê xwedê, wexta direvin, hukmetê xwedê, dibê yê piçûk ‘eynî berê kêvir hildide. Wexta dizvirin, [dibên]:

“ ‘Emo<sup>1322</sup>, ha emo!”

---

1318 ) Lê, lê belê.

1319 ) Devjenî, minaqeşe.

1320 ) Herdu.

1321 ) Mineqeşe, devjenî.

1322 ) Apo.

‘Emo tune. ‘Emo, ku ye? ‘Emo jî a li ber wana, nayê xuyan. Evê te [Hesen], kum dide serê xwe. Qamçî dide destê xwe, dibê:

“Xwedê em xilas kirin.”

Yanî, Nûrulhudayê esker li pey Hesen xistye. Ê hemî [Hesen] yê ku da here? Zaten behr e. Dora wî hemû behr e. Bin emrê wê da nin. Filan... Dême xilas, xilasê xwedê ye.

Evê te [seresker] jî, wexta ku ewa sereskerya dibîne ku Mîranusîna li çarmixê da ye, idî ew dizane, dibê:

“Xêra mi jî tune. Xwedê, pey wê yê mi jî bikuje.”

Evê te [Hesen] jî diçe. Dême sêrbaz, dibê sêrbaz hebûne li çîya. Diçe cem sêrbaza. Çi dike? Dibêje, yanî ji sêrê hespekî xwe ra tîne. Evê te, Hesenê te jî, wexta ku kum jî li sêrî ye, kes nabîne, da. Kes nabîne.

Evê te [Hesen], yê ça bike? Yê were. Dîrek<sup>1323</sup> tê qawûşa ku Mîranusîna avîtine çarmixê da. Diçe jorê, dêna xwe didê, jina wî, herd<sup>1324</sup> zarê wî tenê wir in. Dibê wexta ku kum li serê xwe hildide, dibê zarê wî hemen giryan, go:

“Peyyî, bavê me!”

Jinikê [Marînusîna] jî go:

“Heyran, ka bavê we vî qasî yê li ku were? Filan-bêvan...”

Erê, neysene<sup>1325</sup>, (Hesen) diçe cem wana. Kum datîne, dibêje dibê:

“Ez hovanê<sup>1326</sup> li vira me. Qîzê, xwedê me xilas ke.”

Neysê, ewê [Marînusîna] vedike. Idî bi emrê xwedê, her yek zareke xwe hildide. Berjêr dibin. Wexta berjêr dibin, dêna xwe dinê, derê sûrê girtîye.

[Hesen dibê]:

“Yawo, dêrî veke. Ew kê ye? Filan.”

Jinik gazî wan dike. Ewa seresker dibê:

“Ku tu soz bidî, mi xwe ra biherî, ez ê dêrî vekim. Tu mi nebî, [ez dêrî venakim].”

[Hesen] dibê:

“Heyran, em ê çima te nebin? Dêrî veke.”

Neysê, dêrî vedike. Evna derbasî walî surê dibin. Ewa seresker dibêje, dibê:

“Niha hukmê mi heye. Ez dikarim bixûnim evan mexlûqê vê adê hemû bibne mehsî. Yanî ade bibe behr, ew jî bibne mehsî. Ez vê sêrê dikarim bikim.”

Eva [Hesen] jî dibêje, dibê:

---

1323 ) Rasterast.

1324 ) Herdu.

1325 ) Werhasil.

1326 ) Hova, peyveke ku li Ebexê zêdetir tê bikaranîn û tê wateya ‘vir, li vir, li vir e’ ye.



“Na, heyran. Wexta xwedê em xilas kirine, qe tiştêkî isakîne<sup>1327</sup> neke.”

[Hesen] qamçî li ‘erdê dixê, sêzde padişahê cina li ber hazir dibin. Dibêjin, dibên:

“Em dunyayê xirav kin, ava kin?”

[Hesen] dibê:

“Xirav nekin, ava nekin. Me ra sê hev hespê bayê-birûskê bînin.”

Sê hev hespa jê ra tînin, li ber hazir dîkin. Ewana sîyar dibin. Sîyar dibin. Her yek kurekî xwe dide ber xwe. De bajon. Evana dajon. De îja hemi kum-qamçî pê ra nin, ha. Erê. Evana dajon. Pir tîn hindik tîn.

Nûrûlhuda pê dihise, eskerê xwe li pey dixê. Evana mudekî pirr tîn. Li bolgekî<sup>1328</sup> idî Nûrûlhuda xwe bi wan ra dighîne. Nûrûlhuda xwe bi wan va dighîne.

Dibê eva [Hesen] wetxa qamçîyê xwe li ‘erdê dixê, de îja ew sêzde padişah, eskerê wana hazir dibe. Dibêje dibê evana wisa li hev dixin. Yanî emrê xwedê, dibê yanî eskerê Hesen yanî yê Nûrûlhudayê em bê ewk dike, esîr digre. Nûrûlhudayê jî em bê, esîr digre. Filan...

Idî bi çî awayî dibe, idî anlaşmîş<sup>1329</sup> dibin. Ewa [Hesen] bi vî qirarî tê dertê cem xûşkê xwe [xûşkên wî yên cin]. Tabî xûşkê wî sevmîş<sup>1330</sup> dibin, def-dehwat, filan-bêvan.

Dibê Şêx Êbûrîş bi wî şêxê apê wana va, ewna jî li wira hazir dibin. Yek dibêje:

“Kum mi ra.”

Yek dibêje:

“Qamçî mi ra.”

Axir çî dike? [Hesen] kum dide yekî, qamçî dide yekî. Evana jî xwedê xilaz dîkin. Bi vî qirareyî tîn. Em bê, xilaz dibin.

Her kes çû mirazê xwe şa bû. Hûn jî mirazê xwe şa bin.

ÇÎROKBÊJ: HECÎ HENÎFÎ

HERÊM: JI GUNDÊ ŞEREFXANÊ JÊRÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 63

PERWERDE: NEXWENDE

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 10/10/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1327 ) Wisa.

1328 ) Cih, dever, herêm.

1329 ) Lihevhatin, lihevkrin.

1330 ) Şabûn.

### 13. ÇÎROKA KERR KULIK<sup>1331</sup>

Dibê ‘Emer Axayê Dêskî hebûye. Ew feqîrê-dewrêşê nava mala digerin, pera berav<sup>1332</sup> dikin, ji wan ra dibêjin dewrêş. Dibê rojekî dewrêş tê wê malê, tê mala ‘Emer Axayê Dêskî, dibê:

“Malê, tu xaş mal î, Bilîcana ‘Elî‘ihsanê Gêrsîn ji te kême.”

Dibê ‘Emer Axayê Dêskî dibê:

“Yawo, eva çî ye? Eva ‘erebe ye? Eva çî ye?”

Jê nizanbûye, em bê, hespê ‘Elî‘ihsanê Gêrsîn e. Eva dibê, ‘Emer Axayê Dêskî dibê:

“Kê here Bilîcanê jî bîne ez ê qîza xwe bimê. Bedelê wê ez ê qîza xwe bimê.”

Subê defa hewarê dixê, tumî şîher berav dibe. Dibê tumî şîher berav dibe. Dibê fîncana qawê jî digere. [‘Emer Axayê Dêskî] dibê:

“Kê fîncana qawê buxwe yê here bîne. Yeterkî<sup>1333</sup> fîncana qawê buxwe yê here bîne.”

Hevt roj hevt şevê wana tamam dibe. Dibê kesek ser fîncana qawê da nayê. Dibê kala rîyê xwe bi darkê cigarê tevdaye, xorta bersingê xwe vedaye. Kesekî ser fîncanê da were tine. Kala rîyê xwe bi darkê cigarê tevdaye, ew darkê pê cigare hildidan dikşandin. Dibê kal hîngî mane idî pê darkê cigarê rîyê xwe tevdane. Xorta jî bersingê xwe vedaye, naçin. Yanî nikarin.

Mesela cem me, em odekî da rûnên yek gazî me ke, îşekî hebe yek gazî me dike, dibê:

“Were îşê te heye.”

Dibê ‘edetê cem wan jî, dibê gava solê wana daynana, berê sola iha daynana, idî qe gazîkirin nedixast. Dizanibû yê rabe. Perîşan, solê bavê xwe datîne. Bavê wê dertê, dibê:

“Yahhh! Qîza mi, te xêr e?”

[Perîşan] dibê:

“Bavo, te ez derxistime satîşê<sup>1334</sup>. Te ez derxistime vî îşê hanê, vê satîşê hanê, tu ewk dikî. Kesekî were tine. Yalniz, vî îşî heke Kerr-Kulkê Silêmin, filan nîmarê, filan soqaqê hene. Heke Kerro-Kulik tiştêkî bikin.”

[‘Emer Axayê Dêskî] dibê:

“Baş e, qîza mi.”

Radibe, namekî, kaxizekî dinvîse. Dide destê xulamêkî xwe, dibê:

“Bihere, bide Kulik.”

Eva diçe. Kulik razayî bûye. Kerro ser doşkê bûye. Namê dide destê Kerro. Kerro çaxê namê mêze dike, dêna xwe dayê, ‘Emer Axayê Dêskî şandîye pey wana. [Kerro] dibê:

“Kuro lawo, mi poz-qepyê bavê we, ‘Emer Axayê Dêskî go. Hevt roj e we goşt xarye em ê jî

1331 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1332 ) Berhev. Li Ebexê ev peyv zêdetir bi vî awayî tê bikaranîn.

1333 ) Bes.

1334 ) Firotanê, firotandinê.

werin avşorê buxin?”

Sîlekî lê dixê, xulam tê. Axa dibê:

“Yahhh! Te gotê?”

[Xulam] dibê:

“Ne tu bî, ne navê te be. Yek ser barqonê bû, digotnê Kero. Ewî sîlek li mi xistîye. Hê niha jî vizeviza guhê min e. Qe nizam perda guhê qetyaye?”

Dibê cake<sup>1335</sup> ewka wî nabe. Cake radibe namekî dinvîse, dide yekî dinê, dibê:

“Xulam, xulama nas dikin. Tê evî bidî destê Kulik.”

Diçe, dêna xwe didê, Kulik xew rabûye. Namê dide destê Kulik, Kulik dixûne. Kulik dibê:

“De tu here, em ê werin.”

Werdek, cîya wan e. Werdek dibê:

“Kulik.”

[Kulik] dibê:

“Çî ye?”

Ewê wetrê dehwat-mehwatek e, dibê:

“Kurê mi, heke xelkê sed milyon avît tu sed-pêncî bavêje. Heke dusud avît tu sêsidî bavêje, seva navê bavê xwe.”

[Kulik] dibe:

“Baş e, dayê.”

Ewa [xulam] tê. Kerr û Kulik gava têne ewê da, têne kona ‘Emer Axayê Dêskî, dêna xwe dayê, hesabekî ew e [mezin e]. Kulik, xwe li ser Kero ra davêje, gazî qawecî dike, fîncanê [qawê] duxwe. Gava fîncanê duxwe, şirpînî dikeve hevt hezar mala ‘ereba, burûka, heydera, berjêrya, dibê:

“Kuro, eva serxoş in. Em xwe ra herne mala xwe.”

Em werin bi Kulik xeber din. Kulik dibê:

“Kerro, mi Perîşan qe nedîtye. Em seva vê diçin vî îşê hanê dikin. Gelo Perîşanê tu kerr î, tu lal î, tu keçel î? Me nedîtye.”

Deng bi guhê Perîşanê va diçe. Perîşan radibe awakî xwe dixemilîne, tê. Çaxê tê ber Kulik ra derbas dibe, Kulik dibê:

“Kerro, eva kê ye?”

[Kerro] dibê:

“Perîşan e.”

Xirrinî bi Kulik diçe, xwe va diçe. Kerro birê pîçûk e, dibê:

“Kulik, tu rabe. Teze te dîtye. Tu rabe here Deştê Herranê, destê xala Bilîcanê bîne-neyne, paşê xwe xwe va bihere.”

---

1335 ) Dîsa, careke din.

[Kulik] dibê:

“Tew tew tew, Kerro lo bira,

Perîşan e, xaş Perîşan e,

Ne bi lokê deva ne, ne mi’înek e serê tewla ne,

Fenanî.....

Du hev hûtên notanî<sup>1336</sup> Kerr û Kulikê Silêmîn herin deşta Herranê,  
Bînin-neynîn xûna van herduyan e.”

Evna bira herin. Deng bi Werdekê ra diçe, dibê:

“Welle, zarê te çûne şerê hatin-nehatê.”

[Werdek] dibê:

“Hey nabe?”

Dibê:

“Welle, ‘Emer Axayê Dêskî şandine şerê ‘Elî‘ ihsanê Gêrsînê birê te [ku] herin Bilîcanê bînin.  
Perîşanê jî pêş wê va bide Kulik.”

Werdek radibe, dev-dînê wê tevhev dibe. Berê xwe dide konê ‘Emer Axayê Dêskî, tê. Dibê ji ber  
heybet-hêrsa Werdekê, dibe virrevirra çît-perdê kon, ser ‘Emer da tîn. ‘Emer dibê:

“Yahhh! Werdek, tu qe neçûyî konê axelera?”

[Werdek] dibê:

“Tu bi qurbana axelera bî. Mi ra negotana kevnajînê, min ê niha lingekî te bigirta, tu sitûnekî  
xista, tu pê va bimayî. Du êtîmê mi hebûn, mi anîne bin perr-baskê we, mi go bira biêwirin. We  
şande vî îşê hanê, îşê hanê derxiste serê wan.”

[‘Emer Axayê Dêskî] dibê:

“Werdek, kelîma xwe degiş<sup>1337</sup> ke. Rabe, Perîşan bûka te ye. Bûka xwe nîşan ke.”

Radibe bûka xwe nîşan dike, diçe malê. Cîger e tabî, taymîş<sup>1338</sup> nabe. Wira jî Sofî Miheme hebûye.  
Dibê rîyê Sofî Miheme tam tapanek bûye. [Werdek] dibê:

“Sofî Miheme, belkî tu tinebî.”

[Sofî Miheme] dibê:

“Çima Werdek?”

[Werdek] dibê:

“Qe dilê te mi da tine?”

[Sofî Miheme] dibê:

“Welle, hê serê Silêmîn da dilê mi te da hebû. Mi tirsra wî newêribû. Îja ew çû emrê xwedê, tirsra

---

1336 ) Mîna.

1337 ) Guherîn.

1338 ) Xweragirtin, berxwedan.

van her<sup>1339</sup> êtîmê te ez newêrim.”

[Werdek] dibê:

“Tu rabe bi gotina mi bike. Tu vê meytûba hanê bihere bide ‘Elî‘ihsanê Gêrsîn. Bizvire were ez ê te bikim. Soz.”

Radibe hespekî dide Sofî Miheme. Sofî Mihemedê te, bira xwe ra hespa sîyar be here. Diçe bajarekî, şiherekî [hespa xwe] difroşe, dibê:

“Ez hespa xwe dime kerekî.”

Yek tê, haşa dibê:

“Kuro kurê kerê, hesp rind e yan ker?”

[Sofî Miheme] dibê:

“Yawo, tu bavê min î? Ez xwe ra difroşim. Nasil olsa<sup>1340</sup> Werdekê soz daye mi, mi distîne. Xwedê bike hev bikujin.”

Werdek tê. Dizvire here cem Kerro-Kulik ser wan da, şert-şurûtê xalê wan ji wan ra bêje, bizvire were malê. Kulik birayê mezin bûye. Kerro birayê piçûk bûye. [Werdek] tê, dibê:

“Kulik, xwedê oxirê bide we. Ez cîya we bûm. Mi kevçî şîrê sipî helbet dabû we. Hûn mi bişêwiriyana. Beke<sup>1341</sup> mi bi qedr-însanetiya dunyayê jî [Bilîcan] birê xwe bistanda.”

[Kulik] dibê:

“Dayê, mi kirye tu neke.”

[Werdek] dibê:

“Xwedê oxirê bide we. Yalnız<sup>1342</sup>, çend şert-şurût hene ez we ra bêjim. Idî hûn diçin jî hûn dizanin. Nebî nebî! Çîyayê Şengalê karê karhezala ber tûmê hewşanê radibin, hûn bine pey! Berê ber da mala bavê we nayê. Li Deşta Herranê avê golegeniya hene. Sosikê nehêline beredayî. Sosik buxwe yê teng-berê xwe biqetîne, xal ê serê we jê kin, ser porkura Werdekê da rê kin.”

Kulik dibê:

“Dayê, ez bi wî dikim, riha dide riha distîne, ez rabim, tu cîya mi nebûyayî min ê niha rimek li te xista, rimê orta<sup>1343</sup> her cicikê te da bişkok bida. Bavê mi, berê nota<sup>1344</sup> garana gunda guhê birê te [digirt], dibir dianî. Îja tu niha dibê, iha nin iha nin. Qelûnê wan iha nin.”

Dibê, Kerro dibê:

“Dayê, xwedê mi bi qurbana te ke. Qe tiştêkî xaş tinebû tu bêjî?”

[Werdek] dibê:

---

1339 ) Herdu. Ev peyv bi vî awayî û bi vê mebestê li Ebexê zêde tê bikaranîn.

1340 ) Jixwe.

1341 ) Belkî. Ev peyv jî bi vî şeklî li Ebexê zêde tê bikaranîn.

1342 ) Lê, lê belê.

1343 ) Nav, navber.

1344 ) Mîna.

“Xwedê bela xwe bide te. Navê te Kerro ye, ti guhê te jî kerr e? Mi çi wî ra got deng hate te jî. Xwedê oxirê bide we.”

Dizvire tê malê. Kerr-Kulik bira herin. Kulik li ser barê deva pêşyê bûye. Kerro jî parava bûye. Li Çiyayê Şengalê, dibê nezkî êvarê, vira xezalek ber wana banz dide. Kulik ser barê ewê [devê] hişyar dibe. Çaxê vediciniqe, Kerro dibê:

“Kulik, çi ye?”

[Kulik] dibê:

“Xezal e.”

[Kerro] dibê:

“Ez bextê te û xwedê me, weysête cîya me ye, nebî tu bidî pey!”

[Kulik] dibê:

“Welle, ez ê bime pey. Ez ê şeş roja bidme pey. Roja hefta li Deşta Herranê ser kaniyê dil-cîgerê wê te ra sor kim.”

Kulik berdide karê da. Şeş roja dide pey. Roja hefta li Deşta Herranê karê digre, sor dike. Kerro tê. Kulik radibe, dide şûrê xwe, diçe pêşya wana. Wetrê kewranekî başqe<sup>1345</sup> ye. Kerro dibê:

“Yahhh! Te xêr e?”

[Kulik] dibê:

“Xwedê rehê te bistîne. Ti te rehê me [û] van heywana dabû, te rehê me stand? Em hevt roj e pey te ketine.”

Xwe ra ew şev wira diêwirin. Destê sibê Kulik radibe, dibê:

“Ez ê herim Bilîcanê bînim.”

Kerro dibê:

“Birê mezin tu yî.”

Eva diçe pez-mezê wan, yê xala tîne. Pez-mezê xala ber êlê top dike. Qasî dusud-sêsid pezî dide pêşya xwe bin êlê tîne. Cabê dine xalê wî. [Xalê wî] dibê:

“Kurê min, xarziyê me ne. Qey ketine tinebûna malê dunyayê. Bira xwe ra biherin.”

Kerro dêna xwe dayê, Kulik qasî sed-dusud pezî daye pêşya xwe tê. Kerro dibê:

“Kulik.”

[Kulik] dibê:

“Çi ye?”

[Kerro] dibê:

“Mêraniya te iha ne?”

[Kulik] dibê:

“Birê mi, xwedê bike tu sibê herî bînî. Bilîcanê bînî. Welle, mi ev qedandîye.”

---

1345 ) Dî, din.

Kerro sîyarê Nijdî bûye. Nijdî jî cehniyê Sosikê bûye. Şeveqa sibê, mêja sibê ra radibe diçe. Diçe êlê, dêna xwe dayê, êlê dengê meşkeke dêw tê. Diçe dêna xwe didê, pîrek dêw dikê, dibê:

“Selam ‘elêkim, daka pîr.”

[Pîrê] dibê:

“ ‘Elêkime selam, kurê mi. Te xêr e?”

[Kerro] dibê:

“Welle, daka pîr, tu dikarî tasek çeçilmast, ava sar bidî mi?”

[Pîrê] dibê:

“Kerem ke.”

Dibê tasê tijî dike hetanî dibe dide destê Kerro piçîkek tê da namîne. Pîrê dibê:

“Ez te ra tiştêkî bêjim?”

[Kerro] dibê:

“Bêje.”

[Pîrê] dibê:

“Deşta Herranê, Kerr-Kulik hatine wira. Dibe tu ew bî?”

[Kerro] dibê:

“Welle, ez ew nînim. Ez xulamê wan im.”

[Pîrê] dibê:

“Ê, xwedê rehê te bistîne. Tu iha sawa te heye. Gelo sawa wan çiçiqas e?”

Dibê xebardana wî [û] pîrê ra, Bilîcan destê kurê xalê wî da bûye, dişîne avê. [Kerro] dibê:

“Daka pîr, ewa hanê çi heywan e?”

[Pîrê] dibê:

“Kurê mi, çima tu kor î?”

[Kerro] dibê:

“Na welle, ez kor nînim. Ez şereş im. Heta tav bejneq bilind nebe ez însîn-heywîn hev firq nakim. Yaniz<sup>1346</sup>, ew çî ye?”

[Pîrê] dibê:

“Ewa Bilîcan e. Duhê dehwata qîza ‘Elî’ ihsanê Gêrsîn bûye, ajotine. Mêja sibê ra tîne avê, kes nezerî neke.”

Hine zêr davêje pêşa pîrê, pîrê dibê:

“Tê cake<sup>1347</sup> bizvirî li ser pîrka xwe da werî?”

[Kerro] dibê:

“Ez vê carê bizvirim ez ê xurçîkek zêr bidme te.”

---

1346 ) Lê, lê belê.

1347 ) Dîsa, careke din. Li Ebexê ev peyv bi vî awayî û zêde tê bikaranîn.

Eva [Kerro] diçe, dibê:

“Kuro, eva çi hesp e?”

[Kurxalê wî] dibê:

“Bira<sup>1348</sup> kuro tu bî.”

[Kerro] dibê:

“Bavo, bira kuro ez bim. Yaniz<sup>1349</sup>, xeberdana memleketê me, em hevra isa xeber didin. Bi vê kelîmê dibêjne hev kuro. Kuro, yaniz eva çi hesp e?”

[Kurxalê wî] dibê:

“Eva Bilîcan e. Duhê dehwata xûşka mi bûye, me ajotye. Îro me aniyê avê, seva nezerî nekin.”

[Kerro] dibê:

“Kuro, gema wê bide mi.”

Xwe davêje ‘erdê, dibê:

“Xalo, kerem ke.”

[Kerro] dibê:

“Ez bi wî kim, riha dide riha distîne, heta serê mi bi te va were xuyên, tu ser zik neçî, tu gazî kî, ez ê serê te pehn kim.”

[Kurxalê wî] dibê:

“Xalo, bi xwedê, heta serê te bi mi va were xuyên, ez ê ser zik herim, ez gazî jî nakim.”

Bira eva isa here. Kerro Bilîcanê hildide tîne. Buxdo xulamê wan e. Buxdo raza ye, Kulik jî raza ye. Sosik filitye, avê golegeniya isa xariye, a teng-berê xwe qetandiye. Wira çaxê şûr dikşîne Buxdo, Buxdo xwe li nava guhê Kulik dixê Kulik hişyar dibe. Kulik dibê:

“Yahhh! Kerro, te xêr e?”

[Kerro] dibê:

“Mala te xira be. Mi Bilîcan aniyê. Tu rabe, xal li pey min in. Ka tê çaxa ra tixî şer?”

Kulik radibe deneme<sup>1350</sup> dike. Dêna xwe dayê, çi! Sosik qe nalicime. [Kerro] dibê:

“Kulik, tu birê min î mezin î. Ez birê te yê piçûk im. Heta niha te çi digot mi xebera te dikir. Ve carê jî tu xebera mi bike.”

[Kulik] dibê:

“Kanê bêje.”

[Kerro] dibê:

“Tu Bilîcanê sîyar be. Ez ê jî Nijdî sîyar bim. Em ê xala ra tîxne şer. Sosik nikare.”

[Kulik] dibê:

---

1348 ) Bila.

1349 ) Lê, lê belê.

1350 ) Ceribîn, tecrube.



“Welle, ez kurê Silêmin im. Yê bêjin, me pozê bavê wan gana. Hespa me sîyar bûne, berê xwe dane me. Ez bimrim jî ez ê ser piştta hespa xwe bimrim.”

Kerro dêna xwe dayê, çî! Hevt hezar ‘ereb, hevt jî xalê Kerro hemû tèn. Kerro dibê:

“Ez bextê we [û] xwedê be, hûn çîqa hatine ez hevt hezar hinde jî cake<sup>1351</sup> ji we dixazim, kesek ser Kulikê birê mi da neçe.”

Dibê çaxê Kerro şer dike, pêşyê li ser paşyê da dizvirîne. Dibê meydana Kerro kesek namîne. Xal xwe ji Kerro û ‘ereba didizin ber bi Kulik diçin. Çaxê diçin, dibê xal berê hespê dine helqê. Çaxê qamçî dikin nûtanî<sup>1352</sup> kivrîşkê peyîzê, helqê xilaz dikin.

Dibê Kulik dizvire ser Sosikê. Dibê qamçî ser qamçî lêdixe. Sosik çaxê firqaz dike her<sup>1353</sup> lingê paşyê tê da cî dike. Xal dizvirne ser Kulik. Yek rim, du rim, çarde rima lêdixin.

Kerro xwe dighîne ser birê xwe, dibê:

“Kulik, tu çanî?”

[Kulik] dibê:

“Welle, tu ça bêjî ez isa nim.”

[Kerro] dibê:

“Xwedê mala te xirav ke. Ez ça bêjim tu isa nînî. Mi dît xala yek, du rim, çarde rim li te xistin.”

[Kulik] dibê:

“Birayê mi, heke lêdabin, bedena îsanê vî zemanî, nûtanî<sup>1354</sup> çarde kêca mi bigezin.”

[Kerro] dibê:

“Niha tu çî dibêjî?”

[Kulik] dibê:

“Tu dikarî aveke sar bidî mi?”

[Kerro] dibê:

“Welle, heta heyfekî ber çehvê te hilnedim ez avê nadim.”

Nijdî sîyar dibe. Dêna xwe dayê, xala xwe gîhandine nava êlê. Dajo nava êlê. Jinê xala desmala xwe jî davêjne pêşya wî, dînemîş<sup>1355</sup> nake. Şeş xalê xwe dikuje. Yekî jî digre tîne. Dora Kulik dibe tîne. Kulik çehvê xwe vedike, dibê:

“Yahhh! Kerro, te ça kir?”

[Kerro] dibê:

“Welle, mi şeş xal kuştin. Mi eva jî girtiye. Şeş tûrê wî tamam bûye. Tûra hefta ez ê ber lingê te şerjê kim.”

---

1351 ) Dîsa, careke din.

1352 ) Mîna.

1353 ) Herdu.

1354 ) Mîna.

1355 ) Guhnedayîn.

[Kulik] dibê:

“Tu duduya dizanî, hefta nizanî. Em ji duduya mane yek, ew jî ji hefta mane yek. Bira sibê xelk nebêjin malbavana Werdekê bêxweyî ye, mala bavê wê nexwin.”

Eva radibe. Weysê xwe Kerro ra dike, dibê:

“Kerro, min helalîya xwedê, Perîşana xwe ya binîşan li te helal kir. Tê mi bidî ser barê deva pêşyê. Çaxê te kewranê xwe rê xist, bira cîya mi bibîne. Cîya mi qîza dîtyan e. Bibîne yê te ra tiştekî bêje. Lê tu cinyazê mi dûr va nîşan nexî; nêzik va, hankava<sup>1356</sup>, paşê nîşan xî yê te bikuje.”

Eva çaxê radibe. Kulik kefen dike, dide ser barê deva pêşyê. Cab dine Werdekê, dibê:

“Welle, Kulik hat bi Kerro va. Bilîcan jî anîn”

Werdek dertê ber camê. Dêna xwe dayê, milê Kulik darbestê da ba dibe, go:

“Belê kurê mi, rast e. Dunya ha<sup>1357</sup> hatye yê ha jî here. Dunya, warê bavê kesî nîne.”

Radibe. Hevt roja şîna Kulik dîkin. Piştî hevt roja jî dehwata Kerro w Perîşanê dîkin. Aha, eva jî iha.

Ew çûn mirazê xwe şabûn. Hûn jî xêr-silamet mirazê xwe şabin.

ÇÎROKBÊJ: AHMEDÊ ZAVA

HERÊM: GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 43

PERWERDE: DIBISTANA SERETAYÎ

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 20/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1356 ) Nişkava. Ev peyv jî li Ebexê zêde tê bikaranîn.

1357 ) Wiha.

## 14. ÇÎROKA MEMO ZÎNÊ<sup>1358</sup>

Birê min, hebû nebû rehme li dêbavê hazira bû.

Dibê, sê hev bira hebûn. Sê hev bira hebûn, xelkê Roşkan e. Dibê, her sê bira jî ewladê wana tunebûne, bêewlad bûn. Zanî? Bêewlad bûn. Dibê, yaşê<sup>1359</sup> bavê ewê, bavê Memo hate çil salî. Xwedê ewladek dayê. Navê wî dayîne Memo.

[Memo] di hucra da di xandinê da yêtişmîş<sup>1360</sup> bû. Cam-pencera da gihîşt. ‘Emrê wî hate panzde sala. Dibê Memo raza. Di xewê da, dêna xwe dayê, du hev kevotk hatin, hatne ser singê wî. Dibê gustîlê xwe hev guhurîn. Kevotkê [û] Memo gustîlê xwe di xewnê da hev guhurîn. [Kevotkê] go:

“Ez Zîne me.”

Ji Memo ra go, go:

“Ez Zîne me. Qîza Mîr im. Xûşka Mîrê Bota me, Cizîra Bota. Xûşka Mîrê Cizîra Bota me.”

Zanî? Dibê, gustîlê xwe li hev guhurîn, çû. Ewê w Memo gustîla xwe hev guhurîn di xewnê da. Bax<sup>1361</sup>, sewraxt be. Ewê w Memo gustîlê xwe hev guhurîn. Dibê Memo sibê rabû. Duşmîş bû<sup>1362</sup>, zehf uzintî<sup>1363</sup> kir. Zanî? Bavê Memo zehf gerya, go:

“Ez ê Memo bizewicînim.”

Memo li gustîlê nihêrî, got:

“Qet îmkanê wê tune. Îlam ez ê herim xweyê vê gustîlê bibînim.”

Dibê, zehf pê da bend bûn. Tu çare nekir. Zanî? Tu çare nekir. Memo, êvarê rabû çû yêra<sup>1364</sup> hespê bavê xwe. Destê xwe da ser pişta hespa. Hespêkî di bin da pişta xwe bilind kir. Memo gote ewî xizmetçî, go:

“Tê evê heftêkî bêslî<sup>1365</sup> kî.”

Dibê hesp bêslî kir. Memo qirarê xwe da ku derkeve here. Bavê wî lavayî kir. Apê wî lavayî kirin. Cîya wî lavayî lê kir:

“Memo, tu me dihêlî diçî şehre ewê. Em dimîne bêkes, bêxweyî.”

Kir nekirin bi serê Memo neket. Memo sibê zû rabû, li hespê xwe sîyar bû. Dibê hesp qeyd kirin. Memo bi qeydê li hespê sîyar bû. Şiher derket, çû.

Memo çû. Berê xwe da Cizîra Bota. Rîya wî wextî, idî rîya çend roja be, çend si’eta [be], çû. Dibê Memo ser pişta hespê çû. De lawê padişah bû, tişte nedîtibû. Serkanîkî rast hat, pêya bû. Hespê xwe

1358 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1359 ) ‘Emir, temen, sal.

1360 ) Mezin bû, gihîşt.

1361 ) Binêre, binhêre.

1362 ) Fikirî.

1363 ) Xemgînî, kesirîn, liberxweketin.

1364 ) Cî, cih, der.

1365 ) Zêdapar.

berde.

Dêna xwe dayê, qeydê, lingê hespê wî goşt ret kirye aniye hestî. Dibê Memo lingê hespê vekir. Qeyd şikênand, vekir. Hespa xwe berda. Li ser kaniyê çi raza, çi rabû. De îja yê wî çaxî bi sal-meha hatine gotinê, niha em bi zar-zimana dibêjin. Bi si'et ser hev da tê. Zanî? Zeman derbas bû. Memo sîyar bû, çû. Dibê Memo sîyar bû çû.

Dibê Memo çû nêzikî Cizîra Bota. Beko hebû, remildarê Mîr bû. Beko, remildarê Mîr bû. Dibê Beko remil danî, dêna xwe dayê, Memo tê. Remlê nihêrî. Wî wextî wexta remla bûye. Zaten eva kitêbî ye jî, ha. Eva kitêbî ye jî. Dibê navê xûşka Beko jî Zîn bû, navê wê jî Zînê bû. Xûşka Beko, xûşka Beko jî navê wê Zînê bû. Dibê Beko sibê zû dêna xwe dayê, belê, ewê (Memo) were. Memo, hate devê Şet. Yê derbas be were nava Cizîra Bota. Dibê Beko xûşka xwe xemiland, şande devê Şet, Şetê Bota. Şande devê Şetê Bota, go:

“Memo yê derbas be were. Tu ji Memo ra bêje bê, heft sale ez te beklemîş<sup>1366</sup> dikim. Tu li ku yî? Belkî tu Memo qandirmîş<sup>1367</sup> dikî. Belkî tu qandirmîş dikî.”

Dibê, Memo hate devê Şet, sekinî. Gelo buhurê Şet kîjan e? Zanî? Buhurê Şet kîjan e? Dibê, merivekî gotê, go:

“Buhurê Şet ev e.”

Navê hespê wî Bor e. Memo wexta Bor avîte buhurê, dibê Memo Şet derbas bû. Dêna xwe dayê, qîzeke xemilandî li devê Şet sekinîye, girêdayî. Dibê rikêfî Memo kir, go:

“Memo, heft sale ez te beglemîş<sup>1368</sup> dikim. Tu li ku bûyî? Tu teze hafî?”

Dibê Memo li gustîlê nihêrî, li wê nihêrî. Memo ma metel, go:

“Zîna ez dibêjim ev nîne.”

Dibê Memo pê nekir, go:

“Ya ez dibêjim tu ninî.”

Eva yeke reş, ne ew[e]. Dibê qîzikê ‘elbê xwe hilda, çû. Memo serê Bor berda, go:

“Hesp berê da miraz in, pêşya gotye. Hespê mi here kê derê, ez ê herme wir.”

Dibê hesp çû derê mala Qeretajdîn. Qeretajdîn, wezîrê Mîr ê milê rastê ye, him de<sup>1369</sup> zavê wî ye. Zavê Mîr e. Navê jina wî Sitî ye. Dibê wexta ku çû li derê malê sekinî, Memo pêya bû. Jinikê camê ra dêna xwe dayê, mêvanek hat. Serê meriva disekine! Însanê ha<sup>1370</sup> nedîtine. Zanî? Dibê peya bû. Qeretajdîn li Sera Mîr bû. Dibê hema [jinikê] xwe gîhandê. Xulama hespê wî kişand. Dibê ew jî hilda hundurê oda mêvana. Şande peyê ewê [Qeretajdîn], go:

“Mêvanê me hene. Bira nesekine were.”

---

1366 ) Liheviyêmayîn, libendêmayîn.

1367 ) Xapandîn.

1368 ) Liheviyêmayîn, libendêmayîn.

1369 ) Jî.

1370 ) Wiha.

Dibê Beko gotê, go:

“Tê herî ku derê?”

Gote Qeretajdîn, zivirand. Go:

“Xeberdan heye, toplantî<sup>1371</sup> heye. Bira qasekî şûnda were.”

Dibê, cara duduya cake<sup>1372</sup> şand. Cara sisiya ew bi xwe çû, Sitî bi xwe çû. Dibê derê dîwanê vekir, go:

“Qeretajdîn, mêvanê me heye. Tu li vê derê çi dikî?”

Dibê Qeretajdîn rabû hat. Qeretajdîn hat, wexta Memo dît, herduk çûne dest-rûyê hev. Ku çi terî! Xwedê ça Memo çekirye! Çi ‘ihsan jê ra kirye! Dibê qurala wî çaxî sê roja ji mêvana nedipirsîn, tu ji ku hatî tê herî kê derê? Dibê du rojê wî tamam bû. Roja sisiya Mîr dêna xwe dayê, du roj e Qeretajdîn nayê dîwanê. Dibê Mîr şande pey. Qeretajdîn çû, go:

“Mîr, mêvanekî mi hatiye. Xwedê te’ala însanekî wisa şandiyê! Qe çehvê me tiştêkî isa neketiyê!”

Zanî? Dibê Mîr gote Qeretajdîn, go:

“Here bîne.”

Gotê, go:

“Here bîne.”

Dibê Qeretajdîn hate malê. Çi ‘izzet-îkrama wî hebû tekrar kir. Memo hilda, berê xwe dane Sera Mîr.

Dibê wexta ku derî vekirin, Mîr bi xwe pêşya Memo rabû, yêr<sup>1373</sup> nîşanî Memo da. Memo rûnişt. Memo du şeva bû mêvanê Mîr. Mîr nehîşt Memo here. Li cem Mîr ma. Dibê roja sisiya Sitiyê gotê, go:

“Here mêvanê me bîne. Mêvanê bîne.”

Dibê mêvan anîn. [Qeretajdîn] jê siwal kir, dibê jê siwal kir. Dibê Memo gotê da, go:

“Ez ji bona Zînê hatime.”

Zînê jî bûka wî ye. Bûka Qeretajdîn e. Qeretajdîn ji birê xwe ra, Mîr Şakir ra dest girtiyê. Sewraxt be, ha. Jê ra dest girtiyê. Dibê duşmîş bû, taşmîş<sup>1374</sup> bû, go:

“Baş e.”

Dibê Beko remil danî, dêna xwe dayê, belê, ara<sup>1375</sup> wî w ewê çêdibe. Ara Memo Zînê çêdibe.

De sibê zû Memo dîsa rabû. Ew [û] Qeretajdîn hatne ewê da, hatne Sera Mîr. Dibê ewê hilda gotê, Beko go:

“Mîrê mi, em ê derkevne nêçîrê. Em ê derkevne nêçîra xezala.”

---

1371 ) Civîn.

1372 ) Careke din.

1373 ) Cî, cih, der.

1374 ) Dûr û dirêj an jî kûr û hûr fikirîn.

1375 ) Têkilî.

Dibê, hespê xwe kişandin. Sîyar bûn, derketne nêçîrê. Çi xezalê rabûn, Memo qe nehîşt kes hilde. Memo pêşya hemûşka<sup>1376</sup> hilda. Heftêk wisa dewam kirin. Dibê heftêkî isa sêrkirin. Memo tu çare nedît. Dibê Memo go:

“Ez nexaş im, îro.”

Zanî? Memo go:

“Ez nexaş im.”

Dibê, Memo ew ro li malê ma. Evna çûne nêçîrê.

Beko remil danî, dêna xwe dayê, Memo Zînê yê hev bibînin. Zînê xûşka Mîr e. Navê jina Mîr jî Zînê ye. Bax<sup>1377</sup>, kitêbî ye. Gere evî îşî bavê te zehf rind bizanibe. Zanî? Dibê navê xûşka wî jî Zînê ye. Navê jina wî jî Zînê ye. Zanî? Dibê Beko dêna xwe dayê, lê hevdu bibînin. Zînê wisa [xwe] çêkir ku hate odê ew [û] Memo hevdu bibînin. Zanî? Dibê Beko gote Mîr, go:

“Em ê vezerin.”

Dibê wexta zivirîn, bû şingêşinga sîyara, hatin. Zînê fersend nedît. Memo parra<sup>1378</sup> kurkê xwe avîte ser. Zînê ma di pişt Memo da. Ma pişt Memo da. Dibê dêna xwe danê, îmkan tune. Hatne hundur, diçin tîn. Dibê wî çaxî Beko hilda gote Mîr, go:

“Mîr, sol dudu ne.”

Mîr, xwe dîsa serva nebir [ku] sol dudu ne.

Dibê, Sityê dêna xwe dayê, îmkan tune. Mîrê pê bihise. Şande pey Qeretajdîn, go:

“Were mêvanê me hatine.”

Beko nehîşt here. Du cara şand. Cara sisîya tekrar şand, nehat. Dibê, Sityê agir berda koşk-seray Qeretajdîn. Agir berdayê, berda ya Qeretajdîn. Sewraxt be. Berda ya xwe ku bona werin, Zînê ji pişt Memo derkeve, nebînin. Dibê agir berdayê. Cab dane wana, go:

“ Agir bi koşk û seraya ewê [Qeretajdîn] ket.”

Temam tev derketin, hereket kin, werin, derkevin, derdikevin. Dibê Beko gote Mîr:

“Mîrê mi, bibîne bibîne.”

Zînê revî kete piştê dêrî. Mîr dît. Ema ‘ecêba jina wî ye? Xûşka wî ye? Mîr dît. Jina wî ye? Xûşka wî ye?

Caw<sup>1379</sup> dane da, çûn. [Qeretajdîn] dêna xwe dayê, agir bi koşk seraya wî ketye. Zêr-zîvî wî qîyamet<sup>1380</sup> helyaye. Dibê temirandin. Derbas kirin, temirandin. Ji birê xwe bêjim, tekrar zivirîn hatin.

1376 ) Hemû. Ev peyv li Ebexê bi vî awayî zêde tê bikaranîn.

1377 ) Binêre, binhêre.

1378 ) Li piştê ve, ji aliyê piştê ve. Ev peyv jî peyveke taybet e û li bikaranînê wê li Ebexê zêde ye.

1379 ) Cab, cewab, bersiv.

1380 ) Ev peyv di vir de bi wateyua xwe ya mecazî hatiye bikaranîn û tê wateya ku ‘zêde zêde’ helyaye.

Dibê Mîr şande pey Qeretajdîn, go:

“Tê herî memleketê Roşka.”

Wî çaxî xeraç berav<sup>1381</sup> kirine, xerç berav kirine. Sewraxt dibî? Xerc berav kirine. [Mîr] go:

“Xercê sê sala me berav nekiryê. Here, berav ke bîne. Pê koşk-seray xwe çêke.”

Dibê wexta çû cem Sityê, Sityê gotê:

“Ka tu ji mêvan ra çi dibêjî? Mêvanê ça be? Mêvanê ça be?”

Zanî? Mêvanê ça be? Dibê Qeretajdîn go:

“Bira dewam ke, heta ez têm.”

Bira Qeretajdîn [here]. Dibê Qeretajdîn iha wira da mêvan hîşt, cake<sup>1382</sup> zivirî cem Mîr, go:

“Mîrê mi, ez ê herim. Bax<sup>1383</sup>! Ez te ra xwedê sond buxum, kêlî ji Memo şaş be ez ê Cizîra Bota biherme felaketê. Serê te dibirrim. Qet îmkana wê tune ye. Zanî?”

Baş e. Soz danê, ewana çûn. Bira ew derkeve here memleketê Rojka xeracê berav<sup>1384</sup> ke.

Dibê, Memo ma li cem Mîr. Çûn hatin, tu care nekirin. Zînê xwe xemiland. Memo dêna xwe dayê, Mîr gote Memo, go:

“Were, em ê kişik bileyzin.”

Kişik zehf xêr e, ha. Go:

“Em ê kişik bileyzin.”

Dibê wexta kişik leyîstin, Memo sê desta ji Mîr bir, ser şertê şandilxaz. Şandilxaz şert e. Yanî te çi go, yê wî bide. Sewraxt be, ha. Şandilxaz. Zanî? Dibê leyîstin.

Min eva zehf ji meriva siwal kirye, ewk kirye. Tabî, cîna da em çi dihêlin, ji kilama qîsayê wî dimîne. ‘Esas nivê wî kilamkî tê gotinê, ha. Eva benda nivî xebirdan e, nivî kilamkî ye, ha. De kilamkî ez ê şaş kim. Ez ê şaş kim. Lê, ez şaş kim, qe xaş nabe. Gere her tiştî wî yêrê<sup>1385</sup> da be.

Dibê şertê çara dêna xwe dayê, Beko dêna xwe dayê, yê ji Mîr bihere [û] Zînê bixaze. Yawo, remlê datîne. Dibê Beko xwe gîhande Zînê, go:

“Zînê, Memo sê şerta ji Mîr birye, yê te bixaze. Tu awaz awaz (xwe) bixemilîne, xwe bide ber camê. Belkî ‘eşqa Memo tê, Memo te dibe.”

Dibê evî wisa çêkir. Wexta ku Zînê derkete ber camê, bi wî qirarî xwe xemiland, Memo çehvekî wî li kişikan e, yekî li Zînê ye. Mîr sê desta ji Memo bir. Dibê wexta Mîr jê bir, Mîr go:

“Beko, em ça bikin? Em çi serê Memo bikin? Çi serê Memo bikin?”

Dibê Beko go:

“Mîr, em ê Memo bavêjne zindyanê. Em ê Memo bavêjne zindyanê. Em ê bavêjne filan zindyanê.

---

1381 ) Berhev.

1382 ) Careke din. Ev peyv jî bi vî awayî zêde tê bikaranîn li Ebexê.

1383 ) Binêre.

1384 ) Berhev.

1385 ) Cih, cî, der.

Baş e. Memo avîtnê zindyanê. De şertê şandilxaz dileyîzin. Memo avîtnê zindyanê. Caw<sup>1386</sup> dane Sitiyê, go:

“Welle Mîr, Memo avîte zindyanê.”

Dibê Sitî w Zînê di binî va lexemdar<sup>1387</sup> anîn, lêdan. Tabî, zindayana ew [kevir] nebû. Isa çêkirin. Memo isa tê da xweyî dikin. Yanî ji berê zehf zehf kêftir, zehf kêftir [bû]. Memo zindyanê da ne.

Dibê Beko dîsa remla xwe danî, dêna xwe dayê, îmkan tune. Zehf felaket<sup>1388</sup> Memo xweyî dikin. Dibê Beko gote Mîr, go:

“Mîrê mi, eva iha nabe.”

[Mîr] go:

“Lê?”

[Beko] reml danî, go:

“Em ê Memo bavêjne zindiyana kevir. Vira da xwe dighînê, xweyî dikin.”

Mîr go:

“Baş e.”

Dibê wexta Memo avîtnê wê zindyanê, destê vana jê qetya.

Sitî derkete ser rê, dêna xwe dayê, kewranbaşî tên diçin. Dibê meytûbek nivîsî, da destê kewranbaşîya, go:

“Qeretajdîn li filan derê, Roşka xerc berav<sup>1389</sup> dike. Hûn ê vê meytubê bine destê wî.”

Dibê Sitiyê di meytubê da nivîsî, go:

“Beko bi vî îşî, Beko bi Mîr va kir, Memo avîtnê zindyanê. Yan tu digîjê yan tu nagîjê.”

Ê de îja, kewranbaşîyê wî çaxî çî çûn, derketne wê derê. Kaxiz dane Qeretajdîn. Kaxiz kete destê Qeretajdîn. Qeretajdîn, ew hîşt, xerc hîşt hêviya xulama va. Çi hebû, çî berav kiribû, Qeretajdîn hat. Dibê Qeretajdîn nêzîkî şîher kir. Çil rojê Memo ye, Memo zîndyanê da ye. Tişte nexarye.

Dibê Beko li remlê nihêrî, Qeretajdîn hat. Dibê gote Mîr, go:

“Zînê bişîne bira Memo derxe. Qeretajdîn hat.”

Zanî? Dibê wexta ku gazî Zînê kirin, Mîr gazî kirê, go:

“Zînê, here ser devê bîrê, Memo ji xwe ra derxe.”

Dibê Zînê çû ser devê bîrê, gazî Memo kir, Memo derxe. Memo çil roj e tê da [bûye]. Dibê Memo wexta hereket kir, çîqa liblibkên piştê Memo hebûn, hemû hev derketin.

Qeretajdîn pêya bû, dûrimeke<sup>1390</sup> ha<sup>1391</sup>. Memo derxistin, hildan.

---

1386 ) Cab, cewab, bersiv.

1387 ) Karêz, karrîz.

1388 ) Bi wateya xwe ya mecazî hatiye bikaranîn û tê wateya ‘zêde zêde’ baş hatiye xwedîkirinê.

1389 ) Berhev. Li Êbexê ev peyva bi vî şeklî zêde tê bikaranîn.

1390 ) Rewş, hal û hewal.

1391 ) Wiha.



Niha li ewê, li Cizîra Bota, ewa herdika<sup>1392</sup> kêleka hev e, merzelê herdika kêleka hev e.

Dibê Zînê jî xwe kuşt. Herduk jî hildan. Qeretajdîn, Beko kuşt. Zanî?

Birayê min, em ê di wira da son<sup>1393</sup> bidin. Xwedê rehma li dêbavê te ke. Heçî yê ku dînemîş<sup>1394</sup> ke jî, zehf salamê mi jê ra hene. Zehf hurmeta mi heye. Şeva we bimîne xaş. Xwedê zehf xêra wê w dêbavê we qebûl ke. Yanîşike<sup>1395</sup> me jî hebe, me bibexşînin.

ÇÎROKBÊJ: SILÊMANÊ HECÎ HEYDER

HERÊM: JI GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 67

PERWERDE: NEXWENDE

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 05/10/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1392 ) Herdu. Li Ebexê ev pey bi vî awayî zêde tê bikaranîn.

1393 ) Dawî.

1394 ) Guhdarî.

1395 ) Xeletiyek, çewtiyek.

## 15. ÇÎROKA MERVÊ MERAQDAR<sup>1396</sup>

Dibê merivek digere. Yanî merivek digere, dibê:

“Ez dunyayê da çika merivekî bêderd bibînim. Tişteki bêderd bibînim.”

Yanî meraqlî<sup>1397</sup> bûye. Zanî? A îja diçe rastî kê tê, dêna xwe didê, hê ji wî derdlîtir<sup>1398</sup> e.

Dibêje dibê, diçe dêna xwe didê, merivek li ber camîkî xwe ra rûniştîye, dibêje dibê:

“Boy xwedê da be, pênc quriş pere bine min.”

Wexta ku dinê, dibê:

“Bavo, kê pênc qurişa bide mi, bira kulmekî dayne qafê mi.”

Yawo, eva [Merivê Meraqdar] dimîne metel:

“Yawo, pekî çima ez ê pênc qurişa bimê, çima kulmekî daynime qafê wî?”

Wexta pera didê, qafê wî naxe. [Parsek] dibê:

“Bavo, perê xwe hilde. Mi lazim nîne.”

[Merivê Meraqdar] dibê:

“Heyran, kuro, wexta ez xêrê dikim, çima li te xim?”

[Parsek] dibê:

“Mi heq kirye.”

[Merivê Meraqdar] dibê:

“Wellahî, tu jî heta mesela xwe mi ra nebêjî ka te bona çî heq kirye, ez li te naxim.”

[Parsek] dibê:

“De baş e.”

De neyse, destê hev digrin, diçine cîkî xwe ra rûdinên.

[Parsek] dibê:

“Bira, ez kewranvanî bûm. Devê mi hebûn. Mi barê mêrik hilda. Em bêjin, ça niha dibêje dibê Îpekyolî<sup>1399</sup>, em bêjin ji Çînê ez ê biherme nizam ku. Filan-bêvan... Em hatne cîkî mîta Gelyê Bidlîsê. Em ê iha herin, hinekî dûr e.”

Mi gote mêrikî, mi go:

“Welle, em ê qisa<sup>1400</sup> herin.”

Mêrikî go:

“Yawo qardaş<sup>1401</sup>, em neçin.”

---

1396 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1397 ) Meraqdar.

1398 ) Biderdtir.

1399 ) Rêya bazirganiyê ya tarîxî.

1400 ) Kurterê.

1401 ) Bira.

Mi go:

“Na na. Em ê herin. Filan-bêvan...”

[Parsek] go:

“Niha em ketne wî cîhê muwate<sup>1402</sup>. Yanî şeytîn xeletî<sup>1403</sup> li mi kir. Em çûn. Mi gote mêrikî da.”

Mi go:

“Xwedê, ez ê te bikujim. Em bêjin, zaten kewran yê min, nizam çî yê min, em bê, meriv yê min in. Ez ê malê te jî xwe ra biherim.”

Mêrikî gote mi da, go:

“Yawo, mi nekuje. Ez ê qencîke isa te bikim tu ji mi zengîntir bî.”

[Parsek] go:

“Tê çî qencîyê mi bikî?”

[Mêrikî] go:

“Niha dermanek cem mi heye. Em bê, ez ê çehvê te yê çepê xim. Çiqa xezîne-defîne binê ‘erdê da hene bira hemû derkevin, tu bibîne.”

[Parsek] go:

“Wexta isa kir, heqîqeten ku li çehvê mi da, çî binê ‘erdê da heye tamamî wî ez dibînim. Temam tê ber çehvê mi.”

Mi gotê:

“Na welle, tê çehvê dinê xî jî.”

Mêrik gote mi:

“Xwedê, gava mi li çehvê te yê rastê xist herd<sup>1404</sup> çehvê te yê kor bin.”

[Parsek] go:

“Mêrikî mi ra rast jî dibêje. Neysene<sup>1405</sup>, em bêjin şeytan xeletîyê<sup>1406</sup> li mi dike.”

[Şeytan] dibê:

“Na. Te dixapîne.”

[Parsek] go:

“Mi kir mêrikî kir, welle, mêrikî derman çehvê min î rastê xist. Herd çehvê mi bûne keşk. Mêrik çepê mi girt, ez avîtime berê devîkî. Xwe ra malê mi, serveta mi hilda, herrek tu naçî.”

Ew çû. Îja [Merivê Meraqdar] ji wira çû, çû cîkî. Dêna xwe dayê, merivekî mîtanî<sup>1407</sup> Hesên

---

1402 ) ?

1403 ) Xapandin.

1404 ) Li Ebexê li şûna peyva ‘herdu’ kurtepeyvên ‘herd, her’ têne bikaranîn.

1405 ) Werhasil, axir.

1406 ) Xapandin.

1407 ) Mîna.

Hosta<sup>1408</sup>, Êsib<sup>1409</sup> zane, dibê yawo, tê li ber dêrî disekine li sona<sup>1410</sup> dikana xwe dinhêre. Dikene, direve diçe wira. Wexta ku em bê, diçe wira, dêna didê, tişt tune. Herd pîyê xwe ‘erdê dixê, ‘erdê pencerû dike, digrî, cake<sup>1411</sup> tê wira.

Neysene, de meraqlî<sup>1412</sup> ye, diçe, dibê:

“Yawo, tê mi ra bêjî. Filan-bêvan...”

Mêrik dibêjê:

“Heyran, ji mi vegere. Filan-bêvan...”

Son<sup>1413</sup>, [Merivê Meraqdar] dibê:

-Welle, tê bêjî.

[Mêrikî] dibê:

“Bira, ez merivekî halezik bûm. Rojekî ez cûme, em bê, mal meydaniyê. Mi du hev hindî kirrî. Mi şerjê kirin. Min dane elemanê<sup>1414</sup> xwe, mi şande malê. Mi go, bira jinik yekî zara ra çêke. Yekî jî sor ke, bavêje ser birinc, mi ra bişîne dikanê.”

[Mêrikî] dibê:

“Wexta ‘eynî isakîne<sup>1415</sup> çêkir, mi ra şande dikanê. Nanê mi hat. Mi derê dikana xwe dada hundur va. Mi perde avîtnê ber. Ez xwe ra rûniştim. Mi wexta başlamîşî<sup>1416</sup> nanê xwe kir, mi dêna dayê, serê dikanê walî pişikê derket.”

[Pişikê] go:

“Yawo, ca ji bona xwedê, ez wisa birçî me. Hine nan bide mi.”

[Mêrikî] go:

“Mi nedayê.”

[Pişikê] go:

“Yawo, hine goşt bide mi.”

[Mêrikî] go:

“Zehf lavayî li mi kir. Son netîce<sup>1417</sup>, çi gote mi, mi go na. Ez niha duxim. Hestîyê xwe datînme wira.”

[Pişikê] go:

---

1408 ) Esnafekî qelaçî bû li Ebexê.

1409 ) Bavê Berhevkêr.

1410 ) Dawî, axirî.

1411 ) Dîsa, careke din.

1412 ) Meraqdar.

1413 ) Axir.

1414 ) Berdestî.

1415 ) Li Ebexê li şûna peyva ‘wisa’ carnan jî peyva ‘isakîne’ û li şûna peyva ‘wiha’ jî carnan peyva ‘ihakîne’ tên bikaranîn.

1416 ) Destpêkirin.

1417 ) Dawiya dawîn, axiriya axirîn.

“Heyran, hema ji boy xwedê da be, hema hestî, parçe hestî bide mi.”

[Mêrikî] go:

“Mi nedayê. Zêrek derxist.”

[Pişikê] go:

“Tu parçe hestî bide mi. Ez ê evî zêrî bime te.”

[Mêrikî] go:

“Dudu derxist, sisê derxist... Aaa kome zêrê iha da pêşya xwe.”

[Pişikê] go:

“Yawo, hema parçe hestî bide mi.”

[Mêrikî] go:

“Mi parçe hestî jî neavîte ber. Mi go, hemî zaten ez ê rabim, ez ê zêrê xwe berav<sup>1418</sup> kim. Yawo, wexta ku em bê, mi nedayê, ez rabûm mi rikêf kirê. Ez çûm. Ne pişik e, ne zêr in! Ez wexta tîm ku li yêra<sup>1419</sup> xwe disekinim, pişikê jî dibînim zêra jî dibînim. A halê min ev e. Çimkîle<sup>1420</sup> mi wexta eva heqareta xwe ra kirye, a ihakîne<sup>1421</sup> ye.”

Îja ewa çû. Sê hev in. Îja [Merivê Meraqdar] diçe cîkî jî, dêna xwe dinê, wa'izê camiyê, de berê diçûn ser minara bang didan, yekî mîtani<sup>1422</sup> Ûsibê<sup>1423</sup> bavê te, nefsa wî tenîk bûye. [Merivê Meraqdar] dibêje dibê:

“Yawo, mele diçe jora minarê, digrî, tê. Wexta ku li jêrê disekine, li wira dinhêre, dikene, dikene, direve. Hema îşê wî ew e. Diçe jorê, tê jêrê.”

Neyse, de eva meraqlî<sup>1424</sup> ye, yê bêje. Hingî mêrik dibê:

“Yawo, kula mi bes e. Ji mi vegere. Tu dehwa çi [li min dikî]?”

[Merivê Meraqdar] dibê:

“Welle, tu mi bikujî jî tê bêjî.”

[Mele] dibê:

“Bavo, banga ‘esrê bû. Ez derketme serê minarê. Ez ê bang dim. Yawo, mi dêna xwe dayê, bi emrê xwedê, teyrekî delal î wisa li ber mi danî. Mi destê xwe avîte lingê teyr. Mi destê xwe avîte lingê teyr, girt. Wexta ku mi destê xwe avîte lingê teyr, bi her<sup>1425</sup> desta mi teyr girt. Teyr bi hewa ket. Bi emrê xwedê, ez jî pê ra diçim. Ez diçim. Idî ez ne diwêrim berdim! Ne erê, ne na! Çûn, çûn... Ez

---

1418 ) Berhev.

1419 ) Cih, cî, der, dever.

1420 ) Li Ebexê carna li şûna peyva ‘çimkî’ pevva ‘çimkîle’ jî tê bikaranîn.

1421 ) Li Ebexê li şûna peyva ‘wisa’ carnan jî peyva ‘isakîne’ û li şûna peyva ‘wiha’ jî carnan peyva ‘ihakîne’ tên bikaranîn.

1422 ) Mîna.

1423 ) Bavê berhevkar e û guhdêr e.

1424 ) Meraqdar.

1425 ) Herdu.

nizanim, son netîce<sup>1426</sup>, teyr ez li adeke orta<sup>1427</sup> heft behra danîm. Ada orta heft behra danîm. Qudreta xwedê, wexta ku ez danîm, teyr bû qîz. Qîzeke delal e, keleş e, musulman.”

Dibê birê xwe ra bêjim, jinikê go:

“Ez musulman im. Geryame. Yanî em bê, qudreta xwedê, wexta ku kevlê xwe li xwe davêjim dibme teyr. Geryame. Yanî mi tu begem kirî. Em bê, tu him wa’izê camiyê yî, tu bang didî, musulman î. Yanî mi tu xwe ra anîyî. Ez ê te bixazim.”

Erê. Dibê rojek ma, dudu ma. Dibê jinikê go:

“Em bê, birê mi hene. Çûne raw-nêçîrê, filan. Yê werin. Em musulman in. Em ê mehra xwe bibirrin. Ez ê bibme jina te.”

[Mele] dibê:

“Yawo, niha mêrika hê nehatine. Dîsa şeytan xeletî<sup>1428</sup> li mi kir. Ez saldirmîşê<sup>1429</sup> qîzikê dikim.”

Qîzikê go:

“Binê, kurro tu kurê merivan î. Em musulman in. Kuro, heta mehra xwe em nebirrin, ez te ra heram im.”

Erê. [Mele] go:

“De şeytan xeletîyê li mi dike. Mi kir qîzikê kir, ez saldirmîşê qîzikê dikim.”

Qîzikê go:

“Xwedê, tu kêrê mi nayê. Ez ê dîrek te biherim.”

[Mele] go:

“Neysene<sup>1430</sup>, qîzik bû teyr. ‘Eynî dîsa mi destê xwe avîte lingê qîzikê. Welle, qîzikê ez anîm danîme vira. Li serê minarê, niha ez wexta li jêrê disenim li wira dinhêrim, teyrê mi li wir e. Wexta diçime wira tişte tune.”

A ew jî ‘eynî bi vî qirareyî dewam dike. Ew jî isa derbas dibe. Ew [mele] zaten aqil davêje. Ret<sup>1431</sup> dibe diçe.

ÇÎROKBÊJ: HECÎ HENÎFÎ

HERÊM: JI GUNDÊ ŞEREFXANÊ JÊRÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 63

PERWERDE: NEXWENDE

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 28/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1426 ) Dawiya dawî, axiriya axirî.

1427 ) Nav, navber.

1428 ) Xapandin.

1429 ) Êrişkirin.

1430 ) Werhasil, axir.

1431 ) Xilasbûn, kutabûn.

## 16. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME [1]<sup>1432</sup>

Dibê rehma xwedê li dêbavê hazira.

Eva çîroka paşa ye, sî w neh hev jî kurê wî ne. Dibê paşa, kurê wî hemû mîta<sup>1433</sup> Yusufê<sup>1434</sup> mi dibin, mezin dibin mîta Yusufê mi. Dibê dibêje jina xwe da, dibê:

“Çika nanekî mal da îro çêkin. Îşê mi heye.”

[Jina wî] dibê:

“Baş e.”

Dibê jînê wî, de sî w neh hev jî jînê wî hebûne. Xwedê hev neyne îşê wî. Dibê jinik radibin, nan be, xizmet be, çi be, dikin. Dibê eva tîne tê nan oda xwe rast dike. Gazî zarê xwe dike. Dêna xwe didê, çi! Zarê wî hema ‘eynî mîtanî<sup>1435</sup> pêz [duxwin]. Ça tu afrê pêz rast kî pêz berdî ser, hema duxwin. Dibê:

“Xwedê, ez bêzuryet im. Ez ê dîsa bizewicim.”

Eva, dunyayê dikeve yê bizewice, ha vir ha dera han. Dibê diçe şiherekî, qîza xelîfekî dixaze. Qîza xelîfekî dixaze. Ji Mezherê<sup>1436</sup> birê xwe ra bêjim, qîzîkê tîne awaye şer’a Miheme mehr dike. Sal zeman dikevne arê<sup>1437</sup>, dibê ji qîzîkê kurek çêdibe. Ew jî mîtanî ‘Evqadir<sup>1438</sup>, Yusuf wana mezin dibe. Dibê, cake<sup>1439</sup> dibêje jinê xwe da, dibê:

“Çika nanekî çêkin. Îro îşê mi heye.”

Eva îja cake dinê gazî zarê xwe dike. Dêna xwe didê, navê gede lê dike Mîrze Miheme, dêna xwe didê Mîrze Miheme hema xwe gîhande wanê dinê, kevçiyê hemûka destê wana girt, her yek kevçik danî qafê wana. Berdayê, çûne wî qulçê<sup>1440</sup> hanê. Dibê çarmêrkî ser sifra xwe rûnişt. Kerek siniya xwe, goşt xwe birincê xwe va xar. Kevçiyê xwe danî wira. Dest serçehvê xwe paxij kir. Dêrî va derket çû. Îja ewna ketne ser nan.

[Paşa] go:

“Aha! Xwedê, teze zuryeta mi heye. Yê paşatîyê bike, teze yê paşatîyê dewsa mi bike, teze heye.”

Ji Mezher ra bêjim, dibê ewa jinê wî ye dinê, zarê wî ye dinê, isa li Mîrze Miheme cîya Mîrze Miheme qicix in<sup>1441</sup>, her xwedê bêje bes e. Ji birê xwe ra bêjim, bavê xwe ra bêjim, dibê rojekî paşa

---

1432 ) Ev çîrok li devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1433 ) Mîna, nola, fenanî.

1434 ) Biraziyê çîrokbêj e û guhdariya çîrokê dike.

1435 ) Mîna, nola, fenanî.

1436 ) Berhevkar.

1437 ) Navber, navbeyn.

1438 ) Biraziyê çîrokbêj e û guhdariya çîrokê dike.

1439 ) Dîsa, careke din.

1440 ) Goşe, quncik.

1441 ) Hesûdî, çevnebarî, zikreşî.

dibêje jina xwe, gazî jinê dike, dibê:

“Ez ê herme xeraca xwe ye hevt sala ser şiherekî ye. Ez ê herim bînim werim. Yaniz<sup>1442</sup>, kurê mi jina min tesmîlî<sup>1443</sup> xwedê, tesmîlî we.”

[Jinên wî] dibê:

“Baş e.”

Tesmîlî wan jinê xwe ye malê dike. Ew jinê wî ye mal da hene, tesmîlî wan dike. E. Mîrze Miheme tesmîlî wan dike, ewî bi jina xwe, bi cîya<sup>1444</sup> wî va.

Eva diçe. Jinik jî dêna xwe dinê, roja [ku] paşa yê were, ewana tînin tîn derbek dermanê nehişê dine jinikê, yekî dine xulamekî. Têxne nava yataxa<sup>1445</sup> paşê herdika<sup>1446</sup>. Dêrî walî va dadidin. Camê ra derdikevne derê malê. Paşa nêzkiya tê ber dêrî, dibê:

“Qîzê, ka kurê mi? Ka jina mi?”

[Jinên wî] dibê:

“Aaa! mala te xirabûyî ser te da! Te jî digo, mi jin xastiye. Te nedigo, mi edesizek<sup>1447</sup> xastiye. Kuro, hîngî tu çûyî ew bi xulamekî va hindirê malê da nin. Qe nizam çi îşî dikan?”

Eva, paşa dikeve hindir, dêna xwe didê, çi! Ya rebbî, jina wî bi xulamekî va tehzî nava cîya da! Idî paşa qoniyê<sup>1448</sup> dizane çî ye, açix<sup>1449</sup> nake. Dibêje jinê xwe da, dibê:

“Xwe kerr kin. Ez evê bi kurê wê va isa bişînim heta xaş bin dengê wan guhê mi da neyê.”

[Jinên wî] dibê:

“Baş e.”

Dide destê du hev xulama, dibê:

“Hûn ê biherin serê filan çîyayî herdika bikujin. Kirasê herdika<sup>1450</sup> mi ra xûnê da kin hildin bînin werin.”

Xulam dibê:

“Baş e.”

Herd xulam hildidin dibin. Hildin biherin. Dibê rê da diçin, jinik dibêje herdika, dibê:

“Yawo, werne vira. Ez ê kirasê xwe, kirasê gedê xwe bime we. Biherin, teyrekî-tûkî bikujin, tê da kin, hildin biherin bine paşê. Paşa ku ra ketye heyra xûna me. Hûn ê bikne belaya serê xwe.

---

1442 ) Lê, lê belê.

1443 ) Teslîm, emanet.

1444 ) Li Ebexê û li derdorê Ebexê ji bo bilêvkrina û gazîkirina peyva ‘*dayîkê an jî dîya min*’, peyva ‘*cîya min*’ tê bikaranîn

1445 ) Cî, cî û nivîn.

1446 ) Herdu.

1447 ) Bêpêşk, bêtore, bêdedeb,

1448 ) Rewş, hal û hewal.

1449 ) Eşkere.

1450 ) Herdu.



[Herdu xulam] dibê:

“Baş e.”

Hinekî jî zêr dide herdika. Qîzik kirasê xwe, yê zarka xwe dide herdika. Hespê xwe sîyar dibe, bira here mala bavê xwe. Evana tînin teyrekî-tûkî dikujin. Dibê kirasê qîzikê [û] gede, kirasê herdika tê da dikin, tînin dine paşê. Paşa kirasê herdika qet dike, dike behlgîyê ber serê xwe, serê xwe jor da dide ser. Bira paşa isa wira dewam ke. Em werne Mîrze Miheme.

Mîrze Miheme diçe mala kalkê xwe, ew [û] cîya xwe. Mîrze Miheme rojekî, cehnikî kalkê wî tor<sup>1451</sup> heb'ye, dibê bêgem bêzîn lê sîyar dibe tê hewşê. Dibê kalkê wî ber Mîrze Miheme disekine sîleke isa lêdixe, [mîna] topekî lêdixe, dibê:

“Êtîmo, tê herî hespê da bikevî werî kuştinê. Xelkê bê, qey gem-zîn mala wî da tine bû lê kira, kurê xwe lê kira, kurê xwe lê sîyar kira.”

Eva, darekî hildide diçe cem cîya xwe. Xort bûye jî. Dibêje dîya xwe, dibê:

“Zû bêje ka eva yan bavê te ye, qîzê, bavê mi nîne. Yan bavê min e, bavê te nîne. Tu jî dibêjî bavo, ez jî dibêjim bavo. Ka ça dibe bavê te, ça dibe bavê mi?”

Qîzik dike nake li serê wî naxe. Diçe cem bavê xwe, dibê:

“Bavo, te vî êtîmî xêr e? Tu her car dibî dikutî dişînî ser serê mi. Ez hûr kirim.”

[Bavê wê] dibê:

“Baş e, qîza mi. Guhê xwe bidê çika sonic<sup>1452</sup> tê ser çî?”

[Paşa] dişîne şîher, jê ra deste kincê pelevana, şûr-mertalê pelevana, zîn-berzînê hespê dikirre tîne tê, dibê:

“Mîrze Miheme, li hespê xwe ke.”

Li hespê xwe dike. [Paşa] dibê:

“Çika van kinca xwe ke.”

Xwe dike. [Paşa] dibê:

“Şûrê xwe, gurzê xwe, kemberê xwe jî girêde.”

Girê dide. [Paşa] dibê:

“De çika hespê xwe sîyar be.”

Hespê xwe sîyar dibe. [Paşa] dibê:

“Çika du serya dora oda kalkê xwe ra bajo here were tu sîyarekî çanî?”

Mîrze Miheme du serya diçe tê, dibêje cîya xwe, dibê:

“Dayê, bavê mi kê ye? Ez çûm. Bêje.”

[Dîya wî] dibê:

“Kure mi, xwedê îşê te li hev bîne. Here sî w neh kurê kê hebin kurê çilî jî tu yî. Bavê te jî paşa

1451 ) Kedînekirî, kovî.

1452 ) Encam, netîce, dawî.

bû.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

Eva, bira berê xwe bide çîya, idî xwe ra hilkişe here. Mîrze Miheme heger zehf tê heger hindik tê, perrê cîkî xalî ra derdikeve. Dêna xwe didê, qefle sîyar jorda tèn.

Ew jî dêna xwe dinê, ya rebbî, sîyarek li hespekî sîyar e! Tu li sîyêr, hespê, şûr-mertala dinhêrî, şerm dikî! Paşa dilê xwe da dibêje, dibê:

“Xazila b’bûya nêvanê mi. Ev merva b’bûya nêvanê mi.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Esselamu ‘elêkim.”

[Paşa] dibê:

“ ‘Elêkume selam. Yahhh, te xêr e?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Welle, ez merivekî eşqçî me xwe ra digirim. Merivekî eşqçî me. Eşqa mi tê xwe ra digirim.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Lê te xêr e?”

[Paşa] dibê:

“Welle, eva sî w neh kurê min in. Eva wezîrê min e, eva niftiyê min e, eva qazyê min e, eva jî ez paşa me. Welle em jî va hatine zozana, xwe ra pîknîkê<sup>1453</sup> [bikin].”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Hiii! Mi bavê xwe dît!”

[Mîrze Miheme] açix<sup>1454</sup> nade, açix nade. Eva [paşa] tîne, dibê:

“Tu îşev nabî nêvanê mi?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Welle, hema bime nêvanê te. Çi dibe.”

Tê nêvanê bavê xwe. Haja Mîrze Miheme pê tine bûye. Ew dizane ew bavê wî ye. Lê ew nizane ew kurê wî ye. Dibê rojek dudu mala wî dimîne. [Paşa] dibê:

“Kurê mi, navê te?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Navê mi Mîrze Miheme.”

[Paşa] dibê:

“Kurê mi, tê qatî mala mi kurê mi bî. Bira neçne nêçîra çîyayê sor, çîyayê reş. Wekî din ku da diçin bira herin. Heta ez çûm hatim.”

---

1453 ) Ger, geşt, seyran.

1454 ) Eşkere, diyar.

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e, ser çehvê mi. Ez ê hell kim.”

[Paşa] dibê:

“Temam.”

Dibê eva radibe diçe. Ji birê xwe ra bêjim, eva radibe, bira here xeraca xwe ye hevt sala cake<sup>1455</sup> top ke bîne were, paşa.

Mîrze Miheme yêra<sup>1456</sup> wî [da] xwe ra rûniştîye. Dêna xwe didê, zarê wî li dorê hatin, go:

“Welle, tu bimrî em ê hene nêçîra çîyayê sor.”

[Mîrze Miheme] go:

“Kuro, werin neçin. Lawo, werin gotna mi bikin. Hûn ê herin, nayên!”

[Kurên paşê] go:

“Welle, em ê herin.”

[Mîrze Miheme] go:

“Hûn diçin, gor bavê we. Herin.”

Eva sî w neh kurê wî radibin, sîyar dibin, diçne nêçîra çîyayê sor.

Birê xwe ra bêjim, [Mîrze Miheme] dêna xwe didê, pêkî pêxas, hema ewna deyştê ewk kirine, hespa da peya kirine. Hema ew sî w neh birê wî dane pêşya xwe, hildaye birîye wî tepa<sup>1457</sup> çîyê. Pey diçe, dêna xwe didê, ya rebbî! Serê wan hemû kirine orta xwe, dêla xwe va alandîye, serê xwe daye ser dêla xwe, xwe ra razaye zîhakî<sup>1458</sup> bêteşe. Deyn<sup>1459</sup> zîhê dike. Dibê zîha wexta hişyar dibe, dibê:

“Wey tejkê qureyşîyayî namidaro, ez ‘esman te digeryam tu ‘erdê dest mi ketî. Binê vî diranê minê kursî kurma xaribû, jê ra peşke goştê însanê xav lazim bû.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ey kafirê dînbetal, buxwe şerbeta rêxê paşê bişêkirîne.”

[Zîha] dibê:

“Dora mala me ye, dora mala we ye?”

Mîrze Miheme dibê:

“Berê, me dor daye kafira.”

Dibê eva zangekî<sup>1460</sup> datîne Mîrze Miheme, [Mîrze Miheme] ber xwe dide yalîkî, şûrê xwe dide ber nehtika xwe, zîhe qetqetî dike davêje ser hevdu. Ewî sî w neh birê xwe binê derdixe, tîne devê çêm, dibê:

---

1455 ) Dîsa, careke din.

1456 ) Cih, şûn.

1457 ) Ser.

1458 ) Tebayekî kudi çîrokan da zêde derbas dibe ra tê gotin.

1459 ) Deng.

1460 ) Kevirên qerase û zehf mezin.

“Dest serçehvê xwe bişon.”

Dest serçehvê wana dişo. Li hespê wan dike, hildide tîne malê.

Cake<sup>1461</sup> zemanek dikeve arê<sup>1462</sup>, birê wî dibê:

“Welle, tu bimrî em ê herne nêçîra mêşê reş, çîyayê reş.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Kuro, werin qaydê çîyayê sor nekin. Lawo, hûn ê herin nayên. Serê mi da îşa dernexin.”

[Kurên paşê] dibê:

“Na welle, em ê herin.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Hûn diçin, gor bavê we. Herin.”

Eva cake<sup>1463</sup> sîyar dibin. Dibê berê xwe dine nêçîra çîyayê reş diçin. Dibê Mîrze Miheme, du rojê wana tamam dibe, naçe. Roja sisiya Mîrze Miheme diçe. Mîrze Miheme diçe. Dêna xwe didê, ya rebbî, pêkî pêxas hema dane pêşya xwe, hildane birine tepa<sup>1464</sup> çîye! Diçe, dêna xwe didê, li ser milê wî yî çepê mîtani<sup>1465</sup> qulûbekî çêbûye. Qîzek tê da, camê da xwe ra rûniştîye. Qibeqiba wê ye qur'anê dixûne. [Qîzik] destê xwe jê ra ba dike, dibê:

“Mîrze Miheme.”

Mîrze Miheme dibê:

“Ha.”

[Qîzik] dibê:

“Ewî dêwî ez jî anîme hatime girêdame. Were, neçe birê xwe dernexe. Tu birê xwe derxî, tê destê birê xwe zirarê bibînî.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Na welle, ez ê birê xwe derxim.”

[Qîzik] dibê:

“Wexta tê birê xwe derxî, birê te, a wî zangi<sup>1466</sup> bilind ke, a wê qulê da nin.”

Zangê bilind dike. Dêna xwe didê, ya rebbî, dêwekî orta<sup>1467</sup> wan da xwe dirêj kirye! Însan isa anîye hatye; yê ji zikê wî qelaştîye, yê sersêrkî dardakirye, yê ser linga dardakirye!

Mîrze Miheme, zîha<sup>1468</sup> li hev dixin. Mîrze Miheme zîhê qetqetî dike davêje ser hevdu. Çiqa

---

1461 ) Dîsa, careke din.

1462 ) Navber, navbeyn.

1463 ) Dîsa, careke din.

1464 ) Ser.

1465 ) Mîna, nola.

1466 ) Kevirên zehf mezin.

1467 ) Nav, navber, navbeyn.

1468 ) Tevayê ku di çîrokê derbas dibe hin caran wek ‘dêw’ tê bilêvkirin û hin cara jî wek ‘zîha’ tê bilêvkirin.

însanê wir da bên ber heyî, nefesa wî radibe rûdinê, temama derdixe dunyaya rehmayî, dibê:

“Herin, mirazê xwe şabin.”

Wî sî w neh birê xwe jî dide pêşya xwe, tîne dibe ser kaniyê, dibê:

“Kuro, du sê roj e we dest serçehvê xwe neşûştine. Hûn serçehvê xwe bişon. Nan-manê xwe buxin. Kêfa xwe binhêrin. Ez jî bêxew im, ez ê bîstekî razêm.”

[Birayên wî] dibê:

“Baş e.”

Mîrze Miheme kulkê xwe dikşîne serê xwe, xwe ra xwe dirêj dike radizê. [Lê] bin kumê xwe da hişyar e, birê xwe denemîş<sup>1469</sup> dike. Êpê<sup>1470</sup> zeman dikeve arê, dêna xwe didê, eva sî w neh birê wî dor lê girtin. Ewî şûr da wî, ewî da wî, ewî da wî, mesela piçûkê me Qadê<sup>1471</sup> ye, me şûr da Qadê, go:

“Tê lêxî bikujî. Bira<sup>1472</sup> nêçîra çîyayê sor, çîyayê reş bibe navê me.”

Birê wî dêna xwe dayê, yê li Mîrze Miheme xe, dibê yalvarmîşî<sup>1473</sup> xwedê dibe, dibê:

“Mîrze Miheme, heger tu hişyarî bira deng were te, heger tu razayî bira were xewna te. Birê mi, mi zorlamîş<sup>1474</sup> kirine ez ê te bikujim. Boy xwedê be, hişyar be.”

Mîrze Miheme vediciniqê radibe ser xwe. Dibê şûr destê wî da dikeve. Dibê çoka Mîrze Miheme vir da dibirre, ret<sup>1475</sup> dike. Lingê wî ret dike. Dibê ewna direvin. Gazî wî birê xwe dike tîne tê, dibê:

“Were.”

Dibê haşayî we, dibê:

“Ez devê te, paşê nim. Kuro, welle ez birê we bûm. Nebîyê filankesê me, navê dîya mi ev.”

Kaxizekî dînvîse didê, dibê:

“Bêje paşê, ez devê paşê nim. Heta hûn xaş bin, dunya xaş be ez nayêm.”

Lingê wî, birîna wî girê dide. [Mîrze Miheme] dibê:

“Lingê mi jî têxe qûmê.”

Lingê wî dixê nava qûmê. Dibê:

“Hespê mi bîne were.”

Hespê wî tîne tê. Li hespê xwe sîyar dibe. Xatrê xwe wî dixaze. Dibê berê xwe dide wê qîzka tepa<sup>1476</sup> çîyê, diçe.

Navê qîzikê jî Gulemdan bûye, dêna xwe didê Mîrze Miheme hat, lingekî wî tune. Isa diqîre

---

1469 ) Ceribandin.

1470 ) Zehf, zêde, pir.

1471 ) Biraziyê çîrokbêj e û guhdarvanê çîrokê ye.

1472 ) Bila.

1473 ) Lavayîkirin.

1474 ) Bi zorê pê kirin, zordarîkirin.

1475 ) Ji binî va jê kirin, tiştekan jê neman, yekcar birîn.

1476 ) Ser.

tiştékî mîtanî<sup>1477</sup> ‘ecêb, dibê:

“Mîrze Miheme, ça j’ te bû?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Welle, hal-hewalê mi, birê mi iha.”

[Gulemdan] dibê:

“Ê de mi negote te were neçe.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ê de idî mi kirye. Ez ça b’kim? Bûye, da.”

Dibê ew radibe Gulemdanê va barê hevt deva, qîmetê giran barê sivik, bar dikin. Dibê birê xwe ra bêjim, rê dikevin, yê were herne Stenbolê<sup>1478</sup>. Dibê rê da tîn. Bira ew rê da were. Em werne paşê. Paşa hat, dibê:

“Kuro, ka ew merva? Ka ew sîyara?”

[Kurên paşê] dibê:

“Welle, kê ç’ zane? Te ew qewatê ku anî hatibû? Lêxist çû. Me nêçîra çîyayê reş qazanç kirye, çîyayê sor qazanç kirye.”

[Paşa] dibê:

“Kuro, werin. Lawo, ez we naz dikim. Mi ra rast bêjin.”

Dibê birê piçûk hinekî iha teletel diçe. [Paşa] dibê:

“Kuro, were ti bêje.”

[Birayê piçûk] dibê:

“Welle bavo, a eva kaxiza nivîsiye daye mi. Navê wî Mîrze Miheme, birê me, nebîyê filan paşayî, navê dîya wî ev. Xwedê, bona te hatibû. Me a iha [kir]. Her<sup>1479</sup> neçîr jî ewî qazanç kirin. Me jê ra bêxwedêtî kir. Welle, lingê wî jî şûr lê ket birrî. Welle, piştî xwe da me lêxist çû. A te ra eva kaxiza jî nivisîbû, te ra şandîye.”

Bira paşa gopalekî hesin bide destê xwe, soleke hesin têxe pê xwe, xwe ra bigere di dunyayê. Hetanî sola wî biqete, gopalê wî kurt be, paşê yê kurê xwe bibîne. Em werne Mîrze Miheme.

Mîrze Mihemedê te, bavê xwe ra bêjim, ew Gulemdan rê da diçin. Eva helebaşîyê<sup>1480</sup> han e dizîyê hene, diz diz, diz dajone ser wana. Dibê herdika<sup>1481</sup> hespa peya dikin, tana<sup>1482</sup> kiras-derpê dihêlin. Kincê wan, zêr zîvî wan, şûrê wan tamamî jê distînin. Bira hildin biherin.

Gulemdan dikeve ber milê wî, dikeve ber lingê wî, dide milê xwe, hêdî hêdî [diçin]. Dibê

---

1477 ) Mîna.

1478 ) Stenbol, di çîrokê da wek cihekî sembolîk tê bikaranîn.

1479 ) Herdu.

1480 ) Diz.

1481 ) Herdu

1482 ) Bi tenê.

îşiqek<sup>1483</sup> dūr diçûrise, dibê ber bi îşiqê digrin. Herdik tên cîkî kesb<sup>1484</sup> dikevin. Dibê serê xwe datînin xwe ra radizên. Şeveqa sibê li herdika dixê. Dêna xwe dinê, wê perrê kanîkî da[nin]. Gulemdan dibê:

“Mîrze Miheme!”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ha.”

[Gulemdan] dibê:

“Tu lingê xwe têxe nava vê kaniyê. Bira lingê te pirtîkî rihet be, birîna te rihet be. Ez ê herme nava şîher ka derzîkî, dermanekî, nanekî xwe ra hildim werim.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

Eva bira here şîher. Mîrze Miheme lingê xwe têdixê nava avê. Nebî<sup>1485</sup>, av jî ava bostanê qîzê paşê bûne. Bavê xwe ra bêjim, dibê yekî mîtanî<sup>1486</sup> mi ber bostan bûye. Dêna xwe didê, ava bostan xûn tê.

Merrekî dide ser hustuyê xwe, jêr va tê. Tê, dêna xwe didê, ya rebbî, xortek nîne hîveke çarda ne, lingê xwe kirye avê! Dibê isa bi merra didê, isa didê mest dike. Dibê milê wî digre. Dibê vira kaş kirye, bihere bavêje pişta Tendûlekê.

Gulemdan tê, dêna xwe didê, ne Mîrze Mihemed e! Ne erê ne na! Cî da, wê derê dikeve xwe va diçe. Kalê Xizir, xwedê bîne xewna ometa Miheme, hewariya wana bîne, hewariya mi we tevayî, tê xewna wê, dibê:

“Gulemdan, serê xwe bilind ke, ber serê te da kûpek zêr heye. Wî kûpê zêr hilde bihere. Mîrze Miheme tu zor bibînî.”

Gulemdan ser hemdê xwe da tê. Ewî kûpê zêr derdixê, hildide diçe. Serê hevt rîya ûtêlekî, xanekî, loqantekî, qawekî çêdike. Kê were here, derdê piçûktayî hetanî wê si’etê çi hatibe sêrî, jê ra dibêje. Nanê wî, ava wî, her tiştî wî bedava<sup>1487</sup>. Sibê radibe, lêdixê diçe mala xwe. Bira ew îşî wê isa dewam ke. Em werne Mîrze Miheme.

Mîrze Miheme ser hemdê xwe da tê. Dêna xwe didê, ya rebbî, wê tav hatye nîvro! Birînî wî, dewsa bêrê isa diêşin, tiştêkî qîyamet<sup>1488</sup>. Mîrze Miheme bi lingê xwe, idî bi çalepîya, idî bi deverûya, idî bi ligêlingê lêdixê [diçe]. Dêna xwe didê, çadirek dūr sipî dike. Ber çadirê digre diçe. Dêna xwe didê, kalekî mîtanî<sup>1489</sup> mi xwe ra hundirê çadirê da rûnîştîye. [Mîrze Miheme] dibê:

1483 ) Ronî, ronayî.

1484 ) Belengaz, şepirze.

1485 )

1486 ) Mîna, wekî, nola.

1487 ) Beleş, bêpere, bêheq.

1488 ) Bo zêde êşandinê hatiye bikaranîn.

1489 ) Mîna, wekî, nola.

“Esselamû ‘elêkim, bavêkal.”

[Kalê] dibê:

“Yahhh, xorto! ‘Elêkime selam. Te xêr e?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Qe ne tu bêje ne ez bêjim. Mi hema xwe dîtye nedîtye ez vî halî [da] me. Hema tu bavê mi ez jî kure te.”

[Kalê] dibê:

“Peyyy, erê welle.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Rast e. Ez jî kurê te.”

Dibê Mîrze Miheme radibe. [Kalê] birînî wî derman dike, birînî wî qenc dibin. Xwe ra du hev darê binmilê xwe çêdike. Bavê xwe ra bêjim, hûrekî pêz şerjê dike. Dide ber tavê, diqelîne, didrû. Porê xwe temîz binî da qet dike, têxe serê xwe. Navê xwe jî lê dixê keçelok.

Bavê wî jî baxçivanê qîzê paşê bûye. Mîrze Miheme, xwe ra yêra<sup>1490</sup> xwe nav baxçê qîzê paşê da, ser darê çêdike. Dêna xwe didê, birê xwe ra bêjim, dêna xwe didê, ha sube bûye. Bona mêja sibê av lê lazim bûye. Ser dêr peya dibe, here bikeve avê, qîza paşê ye piçûk ewî dibîne. Dibîne. Dibê birê xwe ra bêjim, dêna xwe didê, wê keçelok ser darê peya bû. Hûrê xwe serê xwe derxist. Porê wî hat dakete van dera. Ya rebbî! Tu li xort nanhêrî, hîva çarda ça ne, isa ne! Dibê kete avê, dezmêja xwe girt, milê xwe şûşt, lingê xwe şûşt. Dibê ser lingekî sekinî, mêja sibê ji xwedê ra kir. Dibê cake<sup>1491</sup> di’ a ji xwedê xast. Dibê anî hat porê xwe bin da qet kir, temîz çêkir. Hûrê xwe kişande serê xwe, temîz çêkir. Dibê topal topal, haşa, hat çû yêra xwe, ser darê yêra xwe.

Qîzikê go:

“Iiii! Bira deynê hustuyê mi be.”

Dibê qîzê paşê cab kirin, go:

“Bira qazvanokçîyê me hine tirî, xiyar, mesela zebeş, qawûn me ra bişîne. Em pê eylence<sup>1492</sup> kin.”

Dibê qîza paşê ye mezin, wexta (baxçevan meywe) da Mîrze Miheme, Mîrze Miheme bir çû, qîzikê dibê xwe ra hinek jê hilda. Mîrze Miheme bire dîwana qîza paşê ye ortê, ewê xwe ra hevek<sup>1493</sup> jê hilda. Dibê bire ya piçûk, ya piçûk derî (vekirî) hîştîye, çûye serê odê, jora han rûniştîye. Rûniştîye. Gazî kirê, go:

“Keçelok, pêşda were.”

[Mîrze Miheme] go:

“Heyran, were. Xwe ra tê çi hildî hilde. Serê mi, qalîk-malikê serê mi bikeve ser van xalîçe-

---

1490 ) Cih.

1491 ) Dîsa, careke din.

1492 ) Kêf û şahî.

1493 ) Piçek, piçikek, hindik.



malîçê te. Heyfa xalîçê te ye.”

[Qîza piçûk] go:

“Yawo, ez dibêjme te pêşda were, da.”

Kir nekir, qe Mîrze Miheme tê. Qîzik hat. Dibê wexta sinî bi milê wî va girt kewkêtî<sup>1494</sup> kir, dibê Mîrze Miheme çû, gurr ser piştê, serê odê jorê ‘erdê ket. Hûrê wî serê wî derket. [Qîzikê] dêna xwe dayê, ya rebbî, porê wî dakete ‘erdê, ha li van dera ye, go:

“Zû, surra xwe mi ra bêje. Tu kê yî ketîyî vî halî? Ka bêje tu kê yî?”

De îja Mîrze Miheme surra xwe jê ra nego, go:

“Yawo, te j’ mi xêr e? Tu çî mi dixazî? Dêrdê te çî ye tu mi ra wê bêje?”

[Qîza piçûk] go:

“Qe, lê vegere.”

Kir nekir Mîrze Miheme tişte nego. Dibê qîzikê dilêkî na sed dilî, dilê wê kete Mîrze Miheme. De îja dibê çîrok e, wî çaxî bi sal zemana bûye, niha bi zar zimana tê gotin. Mezherê<sup>1495</sup> bira, dibê qîzik, rojekî qîzê paşê cab dikin, dibê:

“Bira me ra sê hev zebeş bişîne dîwana paşê.”

Qîza paşê ye mezin kêra xwe li zebeşê xwe dixê, ya orte kêra xwe li zebeşê xwe dixê, ya piçûk kêra xwe li zebeşê xwe dixê, dişîne dîwana paşê. Wexta datîne pencerê, paşa dibêje wezîr, dibê:

“Wezîr, ew zebeşê hanê çî ne li wira? Bîne were em buxin.”

[Wezîr] dibê:

“Welle, zebeşê xarinê nînin.”

[Paşa] dibê:

“Lê?”

[Wezîr] dibê:

“Welle yê qîzê te ne, şandine.”

Dibê [Paşa] gotye:

“Peyyy! Çika ya qîza min e mezin bînin.”

Tînin. Ya qîza mezin tînin tîn. Wexta ker dikin, [wezîr] dibê:

“Evê gotye, bavo ez mêra buhurim idî, mi bide mêr.”

Baş e. Ya ortê tînin, ew jî dibê:

“Bavo, welle ez jî ya mêra me. Yanî idî ez jî hiz dikim mêr kim.”

Ya piçûk anîn hatin. Ew jî teze xal ketinê, [dibê]:

“Bavo, ez jî ya mêra me.”

[Paşa] dibê:

---

1494 ) Dûravêtin, virrvirrandin.

1495 ) Berhevkar.

“Ê baş e.”

Defa hewarê dixin, dibê:

“Sibê qîzê paşê yê mêr kin.”

De îja kê xwe naxemilîne? Yawo, yê xwe nexemilîne niheq e. Birê xwe bêjim, dibê ya mezin [seva xwe] davêje serê kurê wezîr dixê. Ya dinê davêje serê kurê wekîl dixê. Ya piçûk dimîne. Sêva wê destê wê da ye. Ewa milleta hîngî dora koşka paşê ra çû hat, hemû gêj bû. Go:

“Kuro, kê maye kê nemaye?”

Go:

“Keçelokê kurê baxçevançî maye.”

Go:

“Bişînin ewî jî bînin werin.”

Keçelok dîrva hê nayê, eva, sêva xwe li ser destê xwe direqîsîne. Çaxê davêje tepa<sup>1496</sup> Mîrze Miheme dixê. Mîrze Miheme wisa diqîre, dibê:

“Wîî! Mi nava rist-gulyê bavê ga. Te sîrtikê<sup>1497</sup> serê mi hemû herîşandin.”

Cake<sup>1498</sup> dibê:

“Yanişî<sup>1499</sup> avîtye.”

Cake dinê ew davêje, cake qafê Mîrze Miheme dixê. Werhasil, sê cara davêje tepa qafê Mîrze Miheme dixê.

Paşa jê hêrs dibe, dibê:

“Eva, ser odê çî terî ye gîyîma<sup>1500</sup> wê, hûn ê isa bigrin bine wî keçelokî, bira xwe ra hilde bihere.”

Mîrze Miheme bi bavê xwe va, de bavê wî baxçevançiyê qîzê paşê ye, dikevne ber milê qîzikê, [dibin]. Kalê isa hij qîzikê dike, lêye bide ser serê xwe. [Lê) Mîrze Miheme poz pê nake. Dibê anîn hatin, piçike koxtikê wana hebû, kirne koxtik. Dibê dîya qîzikê ji qîzikê ra yataxa wê, kincê wê, eşyayê wê, kelmelê wê çî be, şand. Dibê Mîrze Miheme, qîzik êvarê dibêjê, dibê:

“Were razê. De were têkeve nav cîya, razê.”

[Mîrze Miheme] dibêje qîzikê:

“Na welle, ez nayêm ranazêm. Mi nava lat-pûtê bavê te gê. Tu nava cîyê xwe da razê. Ez ê ‘erdê razêm.”

Mehekî isa dewam dikan. Rojekî Mîrze Miheme diçe çarsiyê. Dêna xwe didê, ya rebbî, kincê wî, kincê Gulemdanê, hespî wî, şûrê wî, gurzê wî hatye çarsiyê difroşin. Wisa diqîre, mîta<sup>1501</sup> teyr. Qîza

---

1496 ) Ser.

1497 ) Keçelbûn.

1498 ) Dîsa, careke din.

1499 ) Xeletî, çewtî.

1500 ) Kinc, libas.

1501 ) Mîna, wekî, nola.

paşê pêşda diçe, dibê:

“Mîrze Miheme, boy xwedê be, ça j’ te bû?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Tê derdê mi derman kî?”

[Qîza paşê] dibê:

“Yawo, tu bêje bekî<sup>1502</sup> mi derman kir.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Welle, hal-hewalê hespekî, hine kinc a iha.”

[Qîzik] kaxizekî dînvîse didê, dibê:

“Bihere bide ewkê bavê mi, depoçiyê<sup>1503</sup> bavê mi. Ez ê bistînim.”

Dibê eva, kaxizê dibe dide depoçî. Dibê depoçî diçe hespî wî, kincê wî, şûrê wî, gurzê wî jê ra distîne, dide Mîrze Miheme. Mîrze Miheme tîne tê, hespê xwe wira girêdide. Şûrê xwe wira darda dike. Kincê Gulemdanê wira, kincê xwe wira darda dike.

Ê însanekî dilê [wî] saf, berê xwe bide xwedê, gazî xwedê ke, xwedê nîyaza dilê wan qebûl ke, ya mi we jî tevayî. Înşalla, mi umûd e ya birê mi jî tevayî. Xwedê bide xatirê resûlê ekrem. Destê mi jî desmêj e. Dibê, bavê xwe ra bêjim, xwedê hewara meriva tê. Dibê Kalê Xizir hewara Mîrze Miheme tê.

Dibê [Mîrze Miheme] idî ber xewa, girîyê, dikeve, nehiş dikeve. [Xwedê] emrê Kalê Xizir dike, Kalê berjêr dibe. Dibê diçe lingê wî qûmê derdixê tîne tê, pê va dike. Tûka xwe lêdixê, lingê Mîrze Miheme qenc dibe. Deyn<sup>1504</sup> lê dike, dibê:

“Mîrze Miheme, rabe lingê te qenc bû.”

Mîrze Miheme wexta destê xwe dide lingê xwe, dêna xwe didê, lingê wî qenc bûye. Ewî hanê, ewî hanê jî qenc bûye, dibê:

“Qîza paşê, qîza paşê!”

[Qîza paşê] dibê:

“Ha.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Min nava tilîyê lingê bavê te gê, iha lingê mi qenc bûye.”

[Qîza paşê] dibê:

“Qasekî were têkeve paşka mi da razê.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Na welle, quran mi sond xarye, ez ranazê.”

---

1502 ) Belkî.

1503 ) Embervan.

1504 ) Deng.

Ew cake<sup>1505</sup> ‘erdê radizê, ew xwe ra wira radizê.

Bavo, qîza şiherekî başqe<sup>1506</sup> [namek] şandîye ser wî paşayî [bo] herbê, dibê:

“Yan yê xeraca hinde salî bide, yan yê qîzeke xwe bide, yan jî herba me jê ra herb e.”

Namek şandine. Eva jî, sofyê wî, wezîrê wî, qazî wî, niftiyê wî beravbûne<sup>1507</sup>, ser wê kaxzê duşmîş<sup>1508</sup> dibin ka çi pîlanî çêkin.

[Paşa] dibê:

“Ka em ça b’kin?”

[Dîwana paşê] dibê:

“Yawo, qîza xwe ye piçûk hema keçelok bistîne bidê bira here.”

[Paşa] dibê:

“Ê kuro, ha mi ya piçûk da ha ya mezin da. De namûs namûs e. Qîza mi nîne?”

[Dîwana paşê] dibê:

“Erê.”

[Paşa] dibê:

“Nabe.”

[Dîwana paşê] dibê:

“Ê xeraca hersal jî em nikarin binê. Hema em ê bêjnê herba me ji te ra herb e.”

[Paşa] go:

“Baş e.”

Qîrarê xwe herbê ra dan. Birayo, dibê wexta li hev dixin, dibê hersê qîzê paşê dikevne ewê da, dikevne cama da lê sêr dikin. Ewa piçûk jî diçe lê sêr dike. Dibê ew herdikê dinê hîngî dine qafê wê, hîngî dine milê wê, lêdixin dikuji hetanî qîzîk êvarê tê. [Qîzîka piçûk] dibê:

“Mîrze Miheme.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ha.”

[Qîzîka piçûk] dibê:

“Bide xatrê xwedê, kuro, xûşkê mi ez kuştim, lawo. Kuro, dibêjne mi te yekî pak bikira, te çûye yekî topal kiriye, te yê yek pak bikira, ew jî niha pişta bavê me şer kira.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ha bêjê, subê ez ê filan newalê ra werim, hespekî iha jî sîyar bim.”

[Qîzîka piçûk] dibê:

“Baş e.”

---

1505 ) Dîsa, careke din.

1506 ) Din, dî.

1507 ) Berhevbûn.

1508 ) Fikirîn, ponijîn.

Qîzik wexta diçe, sibê yê şêr sêr kin, evnê din cake<sup>1509</sup> lêdixin, dimûçikîne<sup>1510</sup> qîzikê, qîzik dibê:

“Mi porê we kurkirno, welle a niha mêrê mi jî hespekî iha sîyar e, yê a vira ra jî were.”

Dêna xwe dinê, ya rebbî, sîyarek lê derneket qîtê kulê lê derket, kete nava şêr. Yê silamet ew e mala xwe nehatîye. Isa lêdixe mîta<sup>1511</sup> xîzê binê behrê. Dibê zenda wî şûr lêdikeve, qaydê tilîya Harûnê<sup>1512</sup> birê mi. Dibê paşa jî desmala xwe derdixe lê girêdide. Dibê cake şer kêsvês dibe. Dibê eva hespê xwe sîyar dibe. Diçe wî perrî da peya dibe, Lêdixe tê mala xwe. Tê mala xwe.

Cab tê, dibê:

“Welle paşê werem derxistîye.”

[Mîrze Miheme dibê:]

“Hahhh! Kuro, werema paşê çî ye?”

Dibê:

“Welle, werem ji bona te derxistîye. Gotye, welle mi qîza xwe daye keçelok, dibê ji bona te werem derxistîye. Gotye, derdê wî jî ew e. Heqa dixtor hatine ser, hekîm hatine ser, gotye, dermanê paşê şîrê şêr di ‘îyarê<sup>1513</sup> şêr da ne.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Heylê mala te xirabûyî!”

Kurê wezîr, kurê wekîl radibin sîyar dibin. Bira herin dermanê şîrê şêr ‘îyarê şêr da. Eva [qîzika piçûk] isa digrî, tê ber Mîrze Miheme digere, dibê:

“Mîrze Miheme, bide xatrê xwedê xatrê qur’anê tu jî here.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“De here bêje cîya xwe bira mi ra hespekî bişîne. Ez jî sîyar bim herim.”

Eva diçe kîjan hespê [ku] pê av kişandine, ‘eware<sup>1514</sup>, jarik, jê ra tînin tîn. Mîrze Miheme gemê davêje dêla hespê, paşopê hespê sîyar dibe, mexsûs. Nava gund ra derdikeve. Zarê gund dine ber hîta<sup>1515</sup>, ber pela<sup>1516</sup>, ber kevira. Mîrze Miheme diçe cîkî xalî, hespê xwe wira berdide. Bira hespê wî zozana xwe ra biçêre.

Eva [Mîrze Miheme], dêlbijîyê<sup>1517</sup> hespê xwe, dêlbijîyê hespê bayê birûskê herdika li hev dixê, dibê hespê wî ber wî hazir dibe, şûr-mortalê wî pê va. Hespê wî bayê birûskê bûye. Mîrze Miheme

---

1509 ) Dîsa, careke din.

1510 ) Bêdengbûn, xilasbûn, sekinîn.

1511 ) Mîna, nola,

1512 ) Birayê çîrokbêj e û guhdarvan e.

1513 ) Post, çerm.

1514 ) Jar.

1515 ) Kevirên mezin.

1516 ) Kevirên mezin.

1517 ) Pirç an pûrta dirêj a dêla hespan

li hespê xwe síyar dibe. Ya illah ya xwedê dibêje, dibê dikeve rêke mîta<sup>1518</sup> rêya me ya Tucîyê<sup>1519</sup> hildikşe. Hildikşe. Diçe dêna xwe didê, serê du rêya, rêk ha diçe, rêk ha diçe. Kalekî rûdana qerqaş, çehv-birîyê belek, sîmanê sipî-girover ber sekinîye, dibê:

“Esselamu ‘elêkim, ya xortê delal.”

[Mîrze Mîheme] dibê:

“ ‘Elêkme selam. Tu ça dizanî ez Mîrze Miheme me?”

[Kalê] dibê:

“Ez dizanim tu Mîrze Mihemed î. Iha tu şêr dibînî? Ser milê xwe yê çepê vegere. Iha zangê da, şêr zangê<sup>1520</sup> da ne. Îsal hevt sal e binê lingê wî kelemek tê ra çûye, lûvelûva wî diçe ‘asîmanê heyşta. Isa herî, girmegirma hespê, terpeterpa lingê te neçê. Lê, mi umîd xwedê heye jî naçê. Bin lana wî da yêra<sup>1521</sup> xwe çêke. Ew lingê xwe yî birîn daîma dûrî xwe dirêj dike. Seva lingê wî hev nekeve neêşe, birîna wî neêşe. Isa şûrê xwe teletel daynê, li dewsa wê kelemê xe, bira ew kêmedeb lingê wî bikşe derkeve. Ewê ser lanê biqîje bireve. Yê isa here were hetanî bedena wî rihet bû. Yê cake<sup>1522</sup> were ser lana xwe bikeve. Wî çaxî yê te bixaze yê bê, bêje bixaze mirazê xwe. Tu mirazê xwe çi dixazî bixaze.”

Xatrê xwe ji Kalê Xizir dixaze. Hespê xwe wira girê dide. Xwe ra tîr-kevanê xwe hildide tê. Têêê, dikeve binê yêra wî. Dêna xwe didê, şêr hat, her<sup>1523</sup> çehvê wî girtîne. Ber aciya<sup>1524</sup> lingê xwe kudkê xwe davêje, kudkê wê haaa diçe rasta hanê. Şêr tê li dewsa xwe dikeve. Lingê xwe yî birîn dûrî xwe dirêj dike. Eva, isa tîr-kevanê xwe eyer dike, çawa datîne binê lingê wî dixê. Şêr isa ser lanê diqîre weqasî teyr radibe hewa, çolê dikeve. Iisa diçe têêê, heta lingê wî rihet dibe. Dibê tê ser yêra xwe dikeve, dibê:

“Ewa kê ye? Bira bixaze mirazê xwe.”

Mîrze Miheme radibe ser xwe, dibê:

“Mirazê ew e şîrê şêr di ‘îyarê şêr da.”

[Şêr] dibê:

“Hee! Xazil îman, qu’ran, mîrê miraza ra, hevt salê dinê jî lingê mi biêşîya te isa negota mi. De te ra eva kudka min e hanê. Bihere bikuje, post ke, bîne were.”

Mîrze Miheme dibe, cîkî da post dike. Dikuje, post dike. Hildide tîne tê. [Şêr] dibê:

“Tê evî gihanê mi bidoşî.”

Mîrze Miheme hema isa didoşe, ewî ‘îyarî wî tijî dike. [Şêr] dibê:

---

1518 ) Mîna, nola.

1519 ) Gundekî Gîhadîna Agiriyê ye.

1520 ) Kevirekî zêde zêde mezin.

1521 ) Cî, cih.

1522 ) Dîsa.

1523 ) Herdu.

1524 ) Êş, jan.

“Kefa ser ra, kîjan nexaştî dibe bira bibe, hemûkî ra derman e. Lê, ewa ava binî jî dermanê weremê ye.”

Xatrê xwe şêr dixaze. Bira were hespê xwe sîyar be were. Dêna xwe didê, cîkî ra derbas dibe dêna xwe didê, çadir vegirtine, kurê wezîr kurê wekîl dane pey mişka, [dibên]:

“Ha şîrê şêr ‘îyarê şêr da.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Kuro, şîrê şêr ew nîne. Lawo, şîrê şêr ha pişt min e.”

[Kurê wezîr û kurê wekîl] dibê:

“Ha!”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Erê welle.”

[Kurê wezîr û kurê wekîl] dibê:

“Bine xatrê xwedê, bide me.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ez bime we. Erê welle, bime we. Çima neme we? Yaniz<sup>1525</sup>, hûn bihêlin ez vê gustîla xwe sor kim qûna we va daynim, ez ê bime we. Çima neme we? Pîî, qurbana we dikim.”

[Kurê wezîr û kurê wekîl] dibê:

“Baş e.”

Eva, dibê gustîla xwe dibe dixê nava êgir, sor dike. Kulîmekê wan va daytîne. Herdika dexme dike. Dibê hine şîrê şêr ‘îyarê şêr, hine jî dimîze nav, têdixê postekî mişka dide herdika. Hespê xwe sîyar dibe, dikeve rê tê. Tê, tê wê yêra<sup>1526</sup> wî hespê xwe yî dinê. Dibê tê, birê xwe ra bêjim, wî hespê xwe berdide hespê xwe yî din sîyar dibe, tê malê. Dibê jina wî pêşva diçe, dibê:

“Mîrze Miheme, ez ê qurbana te bim, bavê dimre, da! Kurê wezîr kurê wekîl hine şîr dane bavê mi, bavê mi lapta<sup>1527</sup> çûye, birîna wî daha<sup>1528</sup> kûr bûye. Bavê mi xarye, daha birîna wî kûr bûye.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Hîî, mi nava lat-pûtê bavê te gê. Bisene, ez pirtîkî bêna xwe bistînim. E firaqê çayê buxim. Ez ketim, mirim. E rêya hevt roja çûme.”

Efendimê xwe ra bêjim, dibê qîzik ber digere. Isa ber digere, isa ber digere... Dibê bardaxekî tijî şîr dike dide qîzikê. Qîzik dixê ber pêşa xwe diçe. Cîya xwe dibîne, dibê:

“Dayê, dê were. Eva, Mîrze Miheme anye hatye.”

Dibê dide paşê, paşa dibê:

“Berdine wê bira here. Zaten ez miryê wê me.”

---

1525 ) Lê, lê belê, bes.

1526 ) Cî, cih.

1527 ) Pir, zêde, gelek.

1528 ) Pirtir, zêdetir, gelectir.

Jinik dibê:

“Bo tu bimirî jî tê buxwî.”

Wexta gulmekî lê dixê, çehvî wî vedibin. Gulma duduya lê dixê, radibe ser xwe. Gulma çara çarmêrkî rûdinê, dibê:

“Gulê, qe tine?”

[Qîzik] dibê:

“Bavo, welle ez çî te veşêrim çî xwedê, hema qe nizam çî ye, gake şerjê kirye, tijî kirye anye?”

[Paşa] dibê:

“Here, ewî postî bide piştê xwe were.”

Baş e. Eva tê, dibê:

“Mîrze Miheme, ca ez qurbana te bim. Mîrze Miheme, bavê mi baş bû, da.”

[Mîrze Miheme dibê]:

“Hahhh! Baş bû?”

[Qîzik] dibê:

“Erê.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Bidî xatrê xwedê, çî gotye?”

[Qîzik] dibê:

“Gotye, here ‘îyar bide piştê xwe bîne were.’”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Hayla, mi nav lat-pûtê bavê te gê. Ez dime bavê te?”

Eva, Mîrze Miheme radibe, bavê xwe dide pêşya xwe bi jina xwe va. ‘Îyarê xwe dide milê xwe. Xulamê wî heb’ye, dide milê xulam. Evna diçne hizûra paşê. Wexta dêrî vedikin, dêna xwe didê, kurê wezîr kurê wekîl rûniştine, lê cina dikevin, [dibêjin]:

“Peyyy! Kuro, ewê qûna me dexme kirye kete hundur.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Paşa xaş be, ne kes derva were hundur, ne kes hundur here derva.”

Dibê du hev celladê mîta<sup>1529</sup> Ahme<sup>1530</sup> dide ber dêrî. [Mîrze Miheme] dibê:

“Paşa xwe be, te qîza xwe dabû keçelok, dabû mi da. Te seva mi werem derxist.”

[Paşa] dibê:

“Erê welle.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Yê şîrê şêr ‘îyarê şêr da te, tu qeç buyî, ez im.”

---

1529 ) Mîna.

1530 ) Birayê çîrokbêj e.



[Paşa] dibê:

“Erê wellle.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Eva jî ‘îyarê mi hedyâ mi. Yê herba te jî qazanc kir ez im. Eva jî desmala te.”

[Paşa] dibê:

“Erê wellle, rast e.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Yê [ku] te ser werem dernexistibû jî ew herdikê han bûn, erê? Tu kulîmekê wan e rastê binhêre, herdik jî mi dexme kirine.”

Heqet, şapkê wana berjêr dikan, dêna xwe dinê, dexmekirîne. Aha! Serê herdika jêdike. Berdide bavê wan jî. [Paşa] dibê:

“Tu wezîrê milê min î çepê, bavê te jî yê rastê.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Na welle, mi çeletî<sup>1531</sup> kirye. Bavê mi jî qaydê te paşa ye. Lê, bavê mi (baxçevan) mesela dikare bibe wezîrê te.”

Bavê xwe [baxçevan] têdixê wezîrê milê wî yî [rastê]. Jina xwe hildide, têdixe mihafekî, dide ser barê devê. Mihafê, mîta ça kursîkî, de ew hine çîrok derdikevin, tey hineka saniqekî dine ser milê xwe, meriv dine ser milê xwe dibin. Dibê barê hevt deva, qîmetê giran barê sivik, bar dike.

Wexta nezkiya mala Gulemdamê, de mi go mesela Gulemdamê serê hevt rêya xwe ra apartman çêkirye, [Gulemdan] dêna xwe didê, ew Mîrze Mihemedê hatî çuyî birê xwe [ji kûlê] derxistîye ew Mîrze Mihemed e. Yaniz<sup>1532</sup> lingê wî jê jêkirîbû, niha lingê wî silamet e!

Mîrze Miheme tê were derbas be, ew nahêle, dibê:

“Na welle, qurban. Eva, mi serê hevt rêya eva îşa kirye. Heta tu nanê mi, ava mi nexwî, xizmeta te nekim, e nahêlim tu herî.”

Naz dike, Mîrze Mihemed e. Ew Mîrze Miheme naz dike, Mîrze Miheme wê naz nake. Yaniz, de çaxê Mîrze Miheme ew bir çû, lingê wî jêkirîbûye. Îja niha lingê Mîrze Miheme seqet nîne. Yanî baş bûye. A îja ji wê nizane, xwe açix<sup>1533</sup> nake. [Gulemdan] dibê:

“Çika derdê xwe mi ra bêje sonî<sup>1534</sup> tê ser çî?”

Dibê çî hatibû serê Mîrze Miheme hetanî wê si’eta diçe birê xwe bibîne [dibêje]. Gulemdan, dibe qîrînîya wê xwe davêje ser serê Mîrze Miheme, [dibê]:

“Kuro Mîrze Miheme, de ez im. Tu mi naz nakî?”

[Mîrze Miheme dibê]:

---

1531 ) Çewtî, bêrêtî.

1532 ) Lê, lê bêle.

1533 ) Eşkere, diyar.

1534 ) Encam.

“Peyyy! Gulemdan tu yî?”

[Gulemdan] dibê:

“Erê.”

Dibê ewê jî, barê hevt deva ji wê eşyayê wê jî bar dike. Her<sup>1535</sup> jinê xwe hildide, berê xwe dide mala bavê xwe, tê.

Bavê wî dêna xwe didê, gopalê wî tewya, sola wî binî va qul bû. Dibê wexta tê mala bavê xwe, bavê wî çaxê paşayê berê [bûye], birê wî çaxê şûr lingê wî dixin ya, wexta cabê jê ra dibin, ewa gopalekî hesin dide destê xwe, soleke hesin jî xwe ra çêdike dixê pîyê xwe, dibê:

“Kîngê sola mi qetya, gopalê mi jî tewya, wî çaxî Mîrze Mihemedê were ez ê bibînim.”

Îja sola hesin kîngê biqete, da. Dêna xwe didê, sola wî qul bû, gopalê wî jî tewya, go:

“Bi xwedê, Mîrze Mihemedê idî were.”

Mîrze Miheme derdikeve şîherê mala bavê xwe. Dişîne cîya xwe jî tîne tê. Nîkaha cîya xwe, bavê xwe teze dike. Wira hevt ro hevt şeva jî dixê def-dehwata xwe. Bavê wî berdide wan kurê xwe ye dinê, hemûka xwe diqetîne. Cida dike bira-mirayê wî ye dinê.

Ewna çûn îman, qur’anê, mirazê xwe. Hûn jî herin îman, qur’anê, mirazê xwe, dêbavkê we şa bin. Mi ûmûd xwedê ye. A ben de<sup>1536</sup> hinde.

ÇÎROKBÊJ: ‘ELÎYÊ APÊ MIHO

HERÊM: JI GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 47

PERWERDE: DIBISTANA SERETAYÎ

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 21/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1535 ) Herdu.

1536 ) Ji min.

## 17. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME [2]<sup>1537</sup>

Kekê, hûn bixêr, bi serçehva hatine. A, ez ê we ra Çîroka Mîrze Mihemed bêjim. Eva jî yeke din e. ‘Eyne li ser navê Mîrze Miheme hatye kar kirin.

Dibê hebû carek ji cara, rehme l’ dêbavê hazir û guhdara. Tabî ev tiştana di pêşya da mane, hatine. Ê tê da, hine cîya da mesela şaşî jî çêdibe, kêmasî jî çêdibe. Tabî tiştê zûva nin.

Dibê îja padîşak hebû. Navê padîşa Hesên bûye. Dibê padîşa, pênc hev lawî wî hebûne. Lawê piçûk, navê wî Mîrze Mihemed bûye. Dibê lawê piçûk navê wî Mîrze Miheme [bûye].

Dibê Mîrze Miheme lawekî zehf cîvan bûye, zehf delal bûye. Dibê îja wanê din, ji ser wê durustbûna wî, cîvanbûna wî, dibê birayê wî ye dinêna<sup>1538</sup>, [jê] qisqanmîş<sup>1539</sup> dikirin. Dîyê wan dudu bûne. Yanî dê yek nebûne, dîyê wana dudu bûne. Dîya Mîrze Miheme ayrî<sup>1540</sup> bûye.

Dibê îja zeman di arê ra derbas dibe, cîya Mîrze Miheme dunya xwe degîş<sup>1541</sup> dike, wefat dike, diçe dunya dinê. Dibê Mîrze Miheme daha<sup>1542</sup> di ewê da tenê dimîne. Dibê îja ser wê, daha birayê wî, mesela çevra<sup>1543</sup> nerind, dibê zêde jê hesûdî kirin, zêde ser da çûn. Dibê dêna xwe dayê, mimkuna wê nîne. Dibê îja Mîrze Miheme rabû, hespê xwe sîyar bû, siher terk kir. Şiherê bavê xwe terk kir. Dibê serê xwe hilda, go:

“Ez ê ji vê bolga<sup>1544</sup> derkevim ku herim bolgeke isa ku kesî mi naz neke. Yanî nizanbin ez lawê paşa nim, lawê dewletîmenda nim. Ku kes ne sirra mi bizanbe ne min bizanbe.”

Dibê Mîrze Miheme baya<sup>1545</sup> çû. Rojek, dudu, sisê... Werhasil dibê ku heftekî isa ku çûyîna wî dewam kir, karê wî. Dibê arekî<sup>1546</sup> dêna xwe dayê, kanîke temîz dikşe. Dibê l’ ser kanyê, de îja berê, dibê padşahê berê, axayê berê, civanê berê, ‘eba[yê wan] hebûne. Dibê ser piştê hespê xwe peya bû. Heywan berda, qaş kir. Ew xwe ra biçêre. Dibê ewî jî ‘ebayê xwe li xwe aland, serçehvê xwe şûşt, go:

“Ez ê hinekî ser vê kaniyê razêm.”

Dibê çi raza, rabû. Des-serçehvê xwe şûşt. Hinekî lingê xwe kire avê, aveke zehf temîz. Dibê meger av jî diçe nav baxçê keçê paşê.

Dibê baxçivan hat, dêna xwe dayê, gencekî cîvan lingê xwe kirye avê. Dibê ha lê nihêrî, hespê wî nihêrî, qedir-qîyafetê wî nihêrî! Ku ev însanê hinde baş, hinde delal, evî cîyê xalî çi îşê vî hebe?

1537 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1538 ) Yên/ên din, yên/ên dî-dîtir.

1539 ) Hesûdî, dexesî, çavnebarî, zikreşî.

1540 ) Cuda.

1541 ) Guherîn.

1542 ) Zêde.

1543 ) Dêrdor, devdor.

1544 ) Dever, cihûwar, navçe, herêm.

1545 ) Gelek, pir.

1546 ) Navberekî, wextekî.

Dibê cake<sup>1547</sup> pišta xwe dayê lêda çû. Dibê ewî wextê pišta xwe dayê lêda çû, dibê Mîrze Miheme jî rabû hespê xwe sîyar bû, qederekî çû. Dibê duşmîş<sup>1548</sup> bû, go:

“Yawo, ez bi vî şeklî, bi vê gîyîmê<sup>1549</sup>, bi vê qûşamê<sup>1550</sup>, ez herme ku kes mi xweyî nake. Ez nikarim îdara xwe bikim.”

Dibê jor da berjêr bû. Dengê rêjbera hat, însanê ku ber pêz. Dibê çû cem yekî, selam dayê, kêfxaşi dayê. Dibê bi hevra axifîn, gotê go:

“Bira, tu dikarî pezekî bidî mi? Goştê wê te ra, îç<sup>1551</sup>îşkempa wê ji mi ra, postê wê, hûrê wê. Mi ra şerjê ke, temîz ke, hûrê wê bide min. Goştê wê wekî din qompîle te ra. Ez ê heqê te jî bime te.”

Duşmîş<sup>1552</sup> bû, go:

“Erê, dikarim. Çima nikarim? Pezê min e, kê were bêje mi.”

Dibê pezek şerjê kir, îçê wê dexist. Hûrê wê, bêmehnî tabî ku em dibên zimanê me em dibên hûr, dibê hûrê wê temîz kir, şûşt, bi xwêy kir, qederekî da ber tavê. Baya<sup>1553</sup> ew bû, qelya. Dibê Mîrze Mihemedê te hilda dêna xwe dayê, tam bûye kum, bûye papax. Dibê kire serê xwe.

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê hespê Mîrze Miheme jî ku ji, teyê bigota ji bayê birûskê ne. Bîrden<sup>1554</sup> derdiket bîrden qeyib dibû. Dibê îja Mîrze Miheme dêlbijîkê hespê kişand, kire ber cizdangê xwe. Dibê şûrê xwe, her gîyîme li ser çî bû, dibê li ser pišta hespê girêda. Hesp qeyib bû, çû.

Dêlbijîk çî ye? Dêlê hespa hene ya, de îja ew pûrta dêlê wan hene, de dêlê wan dirêj in, ji wê ra dêlbijî dibêjin. Wextekî dêlê hespa, bêmehnî, dihûnan, girê didan donema<sup>1555</sup> mezina da. Idî niha hesp jî rabûne. Berê, bûkê berê, hatin-çûyîna hemû bi hespa bû.

Dibê Mîrze Miheme cake<sup>1556</sup> zivirî hat, hate ser kaniyê. Dibê ji şivan siwal kir, go:

“Eva kîjan bolge<sup>1557</sup> ye? Eva, filan derê kanîk heye, ew çî kanî ye? Ew av diçe ku?”

Dibê go:

“Eva şehrê Ehmed Paşa ye. Ew kanî, ew ava xaş, diçe ser baxçê wî, baxçê qîzê wî. Baxçîvan heye, li ber e. Gula av dide, baxçe av dide, zebze dinhêre. Îşê wî jî ev e.”

Dibê go:

“Isa?”

Dibê go:

---

1547 ) Careke din, dîsa.

1548 ) Fikirîn.

1549 ) Kinc, cilûberg.

1550 ) Kinc, cilûberg.

1551 ) Hundir, nav.

1552 ) Fikirîn.

1553 ) Gelek, pir, zêde.

1554 ) Nişkava.

1555 ) Serdem, çax, heyam.

1556 ) Careke din, dîsa.

1557 ) Dever, herêm.

“Erê.”

Dibê Mîrze Miheme kete rê, jor da hate serê kanîye. Av teqîb kir, hate nava baxçe. Dêna xwe dayê, merivekî yaşlî<sup>1558</sup>, wê halê xwe da, li ber ewê [baxçe] ye. Bêreke kurtik hildaye dorê gula diçe tê, dorê dara diçe tê, dorê darê meyva diçe tê. Dibê go:

“Selam ‘elêkim.”

[Baxçevan go]:

“ ‘Elêkim selam.”

Dibê baya<sup>1559</sup> sekinî. Kalê hat dêna xwe dayê, sîma ‘eyne sîma ye. Ema, gîyîm-qûşam<sup>1560</sup>, serî ne wusa ne. Dibê hetanî êvarê cem sekinî. Dibê wextê çû, ewî [Mîrze Miheme] da pey. [Baxçevan] dibê:

“Qurban, tu çi kesî yî? Tu çi ‘isn î? Tu xelkê ku yî? J’ ku hatîyî? Tê ku da herî?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“E jî nizamim. Ez xerîb im. Hema mi serê xwe hildaye, terkedunya bûme. Ez hatime ketime serê kanyê, mi av xarye<sup>1561</sup>. Tî bûme. Mi av teqîb kirye. Mi gotye, [av] here ku ez jî herme wir.”

[Baxçevan dibê]:

“Kesî te tune, berxê?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Na. Qe tu kesî mi tune.”

[Baxçevan dibê]:

“Yêra<sup>1562</sup> tu herî jî tune?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Na. Yêra ez herimê jî tune.”

[Baxçevan] dibê:

“Ê mi teqîb ke.”

Dibê teqîb kir, da pey kalê. Dibê çûne xanîkî. Ketne nava şîherkî, çûna xanîkî. Dêna xwe dayê, kalê jî tenê ye. Dibê rûniştin. Xwedê çi kiribû qismet-nesîb, dibê xarin. Kalê yataxek wî ra jî danî. Hine nivîn avîte ‘erdê, go:

“Kurê mi, tu vira razê. Ez jî vira razêm.”

Dibê razan. Sube zelal bû, cake<sup>1563</sup> rabûn. Rojek, dudu, sisê... Dibê Mîrze Miheme gotê, go:

“Bavêkal, îja qe kesî te tune?”

---

1558 ) Kal.

1559 ) Zêde, gelek, pir.

1560 ) Kinc, cilûberg.

1561 ) Li Ebexê û derdora Ebexê ji bo vexwarina tiştên şilemenî li şûna lêkera ‘vexwarin’ê lêkera ‘xwarin’ê tê bikaranîn.

1562 ) Cih, der.

1563 ) Dîsa, careke din.

Dibê go:

“Jina mi çûye emrê xwedê. Zarokê mi jî tûne ne.”

[Mîrze Miheme] go:

“Hema ez kurê te, tu jî bavê mi. Ez jî bêkes im. Em ê hev xweyî kin.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê sal, zeman di arê<sup>1564</sup> ra derbas bûn. Dibê rojekî Mîrze Miheme ber koka darê da rûniştîye, xew bikeve çehva. Kalê dena xwe bidê, av qetyaye. Kalê were şelemaçekî<sup>1565</sup> lêxe. Zora wî zehf here. Zehf bixeyîde îşê xwe da.

Dibê wê esnayê<sup>1566</sup> da hesp dikeve bîrê. Dibê wexta hesp dikeve bîrê, dibê xasbaxçe jî tam pêşya koşk-serayê qîzê paşê bûne yanî guzergeha wan da bûne, dibê Mîrze Miheme dêlbijîyê hespê wextê dide êgir hesp li ber hazir dibe. Dibê ewî hûrê serê xwe derdixe, ewî postê keçelokê serê xwe. Dibê gîyîma<sup>1567</sup> ser piştê hespê li xwe dike. Li hespê sîyar dibe. Şûrê xwe dide destê xwe dikeve nava dara, davêje dara, dara qetqetî dike. Sîyarî dajo ser kalê, kalê direve. Kalê direve. Mîrze Miheme qederekî diçe tê. Nebî qîza paşê jî di pacê da dêna xwe didê. Mîrze Miheme cake<sup>1568</sup> hespê xwe peya dibe. Kincê xwe ye her ro xwe dike. Ewê [hûrê] xwe dixê serê xwe, direve.

[Baxçevan dibê]:

“Wey bavo, wey bavo, wey bavo!”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ça bû?”

[Baxçevan] dibê:

“Mala te neketo! Sîyar nebû ejderha bû, kurê mi! Qe nizam çi bû kete nav dara me, dayê birrî, qetqetî kir?”

Dibê rabûn top kirin top kirin, qederekî dane hev, ewk kirin. Dibê kalê çû uzuntiya<sup>1569</sup> xwe paşê go, go:

“Hal-mesele, dar ha şikestine, ha bûne.”

Dibê kalê jî her ro dibe nîvro, ara<sup>1570</sup> nîvro ‘esrê ji qîzê paşê ra demet demet<sup>1571</sup> gula dibe, meyve dide ser dibe. Dibê qîza piçûk, ew ro kalê çû, gotê go:

---

1564 ) Navber.

1565 ) Sîle.

1566 ) Wext, dem, kêlî.

1567 ) Kinc, cilûberg.

1568 ) Dîsa, careke din.

1569 ) Kerb, keser, kovan.

1570 ) Nav, navber.

1571 ) Baq baq.

“Bavêkal, tu yaşlî<sup>1572</sup> yî tu neyê. Bira keçelok me ra bîne. Bira keçelok bîne.”

[Baxçevan] dibê:

“Baş e, qîza mi.”

Kalê tê. Hefte tê. Kalê, cake sinî tê, siniya her kesî ayrî ayrî<sup>1573</sup> gula demet demet<sup>1574</sup> çêdike dide ser, meyveyê wan dide ser. Dide keçelok, dibê:

“Hilde bihere.”

Qederekî pê ra dibe, dibê:

“Hilde bihere bira ew (hêrs) nebin. Tê berê daynî filan derî, paşê daynî filan derî, en son<sup>1575</sup> daynî filan nuqtê.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

Sirêle<sup>1576</sup> datîne tê. Ya piçûk mecdîkî, yanî perê wî çaxî, em bêjin zêrekî bexşîş didê. Tê nîşanî kalê dixê. Tabî mexsûs xwe nezanîyê davêje ya ku çozulmîş<sup>1577</sup> nebe, dibê:

“Bavo, eva çî ye? Qîza paşê da mi.”

[Baxçevan] dibê:

“Belqitî, eva zêr e, mecdîf ye. Hinde sal e ez baxçîvan im bexşîşek nedane mi.”

[Mîrze Miheme] hildide, bi wî şertî dewam dike. Dîsa rojekî Mîrze Miheme li hespê sîyar dibe dikeve nava dara, cake<sup>1578</sup> dara dibirre. Direve. Nêzkîya wextê kalê were, dikeve, hespê berdide, xwe vedişêre. Kalê tê, dibê:

“Ça b’ye?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Hal mesele [ev e]. Bavo, sîyarekî a iha deket.”

[Baxçevan] dibê:

“Te negotê, bavê minê niha were?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Mi gotê jî çend pere dike. Go, eger bavê te tê bira rojkî mi ra kivş ke, ez ê werim bavê te bibînim. Çika bavê ça ne?”

Te go erê? Bira evna dewam bikin. Qîza paşê rojekî caw<sup>1579</sup> dike ji kalê ra, dibêje Mîrze Miheme dibê:

---

1572 ) Kal, kalemêr, pîrêmêr.

1573 ) Cuda cuda.

1574 ) Baq baq.

1575 ) Di dawiyê da, di axiriyê da.

1576 ) Di rêzê da.

1577 ) Eşkerebûn, dîyarbûn.

1578 ) Dîsa.

1579 ) Cab.

“Bêje kalê, bira kalê bi xwe were.”

Kalê diçe. Qîza paşê hersêk dibêjne ya mezin. [Ya mezin] dibêje kalê, dibê:

“Zebeşekî, tê zebeşekî isa mi ra bişînî, bidî ser siniya mi bişînî, yanî qismê wî yî zehf buhurî be.”

Ya mezin wisa dibêje. Nehlet bê şeytan, ya mezin isa dibêje, dibê:

“Bira buhurî be hemû.”

Ya ortê jî dibê:

“Bira nîvî wî çurumîş<sup>1580</sup> bûbe nîvî wî mabe.”

Ya piçûk jî dibêje, dibê:

“Bira zebeşê mi tam ewa xarinê be, gihîştî be, hesabê wî yî xarinê be idî. Kal nebe.”

[Baxçevan] dibê:

“Baş e.”

Kalê tê dikeve nava bostan. Eva na eva, eva na eva, bîr suru<sup>1581</sup> li hev dixê, sê hev zebeşa sêçmîş<sup>1582</sup> dike, dide ser siniya, ew [û] keçelok dibin. Ew, keçelok dibin. Datînin, dizvirin tèn.

Êvarê, qîza mezin, berê zebeş dişîne dîwana bavê xwe. Paşê ya ortê dişîne. Pey wê ya piçûk dişîne. Zebeşê qîza mezin ku şandîye ewî tînin ker dikin. Dêna xwe dinê, zebeş pûç bûye, ret<sup>1583</sup> bûye îçê<sup>1584</sup> wê.

Paşa dibê:

“Yawo, gelo hijêkirina vê evlada mi weke vî zebeşî bû ji mi hiz kir, evê ku çurûk<sup>1585</sup> mi ra şand?”

De însanê niha ça danişmanê<sup>1586</sup> wan hene, aqilbendê wan hene, yê berê jî ‘eyne isa aqilbendê wan hebûne, însanê daha<sup>1587</sup> baş hebûne.

[Padişah] dibê:

“Îja ka zebeşê keça ortê bînin.”

Ya wîna jî tînin. Dêna xwe dinê, ew jî nîvî wê buhurî ye, çurumîş<sup>1588</sup> bûye, nîvî wê maye.

[Padişah] dibê:

“Yê keçka piçûk bînin.”

Tînin. Dêna xwe dinê, zebeş tam gihîştî ye. Wusa ne, gevez, nikarî j’ şirînbûna tada<sup>1589</sup> wê jê loqmekî, parçekî hildî.

[Padişah] dibê:

---

1580 ) Rizî.

1581 ) Gelek, zêde, pir.

1582 ) Bijartin.

1583 ) Xilasbûn, kutabûn.

1584 ) Nav, hundir.

1585 ) Pûç, rizî, xerabûyî.

1586 ) Şêwirmend, aqilmend.

1587 ) Zêde.

1588 ) Pûç, rizî, xerabûyî.

1589 ) Tehm, çêj.



“A evê keça mi hij mi kirye.”

Rûsipîkî wî dibêjê, dibê:

“Paşa xaş be, ne wiha ne. Ev tiştana ji van ra anlam<sup>1590</sup> hene. Yanî eva ku zebeşa ew [bêsebeb] neşandine.”

[Padişah] dibê:

“Anlamê<sup>1591</sup> wê çî ye?”

[Rûsipî] dibê:

“Qîza te ye mezin gotye, wextê min î mêra derbas b’ye. Idî ez ji ewa însanê ketime vicûd olarak<sup>1592</sup>. Ya ortê jî gotye, idî nivê bedena mi çurumîş bûye, ez nivî mame, yarî<sup>1593</sup> însan im. Ya piçûk jî gotye, heqê min î mêra ne. Anlama vana ev e.”

Dibê paşê gotê rûsipîyê xwe, go:

“Îja em çî şertî bikin, yanî?”

Dibê [rûsipî] go:

“Tê, [bi tellala di nav şîherê xwe da mêkirina qîza xwe eşkere bikî.]”

De îja berê tellal hebûne, tellalê paşa. Ne ku mûta<sup>1594</sup> dewra niha têlevziyon, medya, şû bû<sup>1595</sup>, em bê hebin, apalo, her tişt. Mesela cûmûrbaşqanê<sup>1596</sup> dekeve, serokwezîrê xeber de, ewê dinê were xeber de, ev tiştana tine bûne, tellal hebûne.

Dibê sibe zelal bû. Dibê bi emrê paşê dane navmalya, xulama, go:

“Gazî tellala kin.”

Dibê tellala heftêkî di şîher da def û zirnê xistin. Dibê go:

“Qîzê paşê, donema<sup>1597</sup> wan mêra ne, yê bizewicin. Yê sêva xwe bavêjin, serê kê dan, yê bi wan ra jî [mêr bikin]. Paşa gotye, ez ê qîza xwe bimê.”

Dibê millet, genca, de îja yê mirîşkeke wî jî hebû çû mirîşk firot, ewî jî cilek xwe kir, go:

“Beke<sup>1598</sup> avît serê mi da? Qe belî nake.”

Dibê ku hefte tamam bû, dibê îja serf serf<sup>1599</sup> hatin. Serfa pêşyê mesela lawê wezîra-wekîla, pey wan lawê dewletîmenda, pey wan lawê aqilbenda, isa serf serf genc hatin. Tabî feqîr çûne sira<sup>1600</sup> paşyê.

---

1590 ) Wate, mane, mene.

1591 ) Mane, wate.

1592 ) Wek, wekî.

1593 ) Nîv, nivî.

1594 ) Mîna.

1595 ) Filan û bêvan.

1596 ) Serokkomar.

1597 ) Heyam, wext, dem.

1598 ) Belkî, dibe ku.

1599 ) Rêz bi rêz, dor bi dor.

1600 ) Rêz, dor.

Dibê qîza paşê ye mezin avît serê kurê wezîr da sêva xwe. Cama xwe da sekinye, Ew jî pêşya wan ra derbas dibin. Paşa bi heyeta xwe jî rûniştîye, sêr dike. Dibê qîza ortê avît li serê kurê wekîl da. Dibê ya piçûk neavît. Şiher hat derbas bû, seredor bû. Dibê tûrek na, dudu na, sisê na. Dibê en son<sup>1601</sup> paşê emrê xulama kir, go:

“Kuro, ka siwal bikin şiher da kê maye?”

Dibê siwal kirin, ciwab kirin. Ha l’ vî yalî ha l’ wî yalî, kê maye kê nemayê? Dibê go:

“Kuro baxçîvan maye. Keçelok maye.”

Dibê wextê keçelok hat, kalê [û] keçelok jî pey millet son<sup>1602</sup> tûrê hatin. Dibê qizikê sêv avît li serê keçelok da, serê Mîrze Miheme da. Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Mi gora bavê, tê paşê niyê.”

Çox af bûyrûn<sup>1603</sup>. De eva hatye gotinê. Dibê:

“Te ew sîrkê serê mi hemû dawêşandin. Te ez kuştim.”

Dibê sêva xwe hilda. Sêv iha l’ şalê xwe da, gezek sêva da. Dibê paşa kire qareqar, kire fixan, go:

“Ez evê j’ evladîya xwe ret<sup>1604</sup> dikim, ji qîztîya xwe ret dikim. Ça bavêje serê keçelekî xe, serê xîzmetçîkî xe?”

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê paşê eva evlada xwe ji evladîyê da retkirinê. Dibê da retkirinê, go:

“Idî qîzeke min e wusa tune.”

Dibê nikaha wê jî neda birrînê, isa lê hate xezebê. Dibê ji ewa [qesra] xwe jî avît, ji qesra wê derxist da avîtinê. Dibê de îja tesmîlî<sup>1605</sup> kalê û keçelok kirin. Dibê evna çûn.

Ê tabî qîza dîtyan e, qîza dewletîmendana e, ji sîhê neçûye tavê, di ber perdê da sekinye ku l’ însana sêr kirye, hewa temîz hildaye. Ji efendimê xwe ra bêjim, dibê rojek, dudu, sisê, çar, deh, zeman tê motanî<sup>1606</sup> avê derbas dibe.

Dibê kalê nexaş ket, kalê jî wefat kir. Dibê kalê jî wefat kir. Dibê ma Mîrze Miheme, qîza paşê. Dibê êynî Mîrze Miheme baxçivantîya xwe dewam dike. Diçê w tê, heqê xwe jî distîne, bexşîşê xwe jî distîne. Dibê qîza paşê dêna xwe dayê, a wiha kar nabe, yanî jîyan a iha nabe. Dibê qîza paşê gote keçelok, go:

“Kuro keçelok, a evî pereyî bihere, li çarsîyê bide ta [û] perçe bîne.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê çi xasti bû, kaxizek nivîsî, go:

---

1601 ) Di dawiyê da, di axiriyê da.

1602 ) Axir, dawî.

1603 ) ‘Efû bikin, bibexşînin, biborin.

1604 ) Xilas, kuta.

1605 ) Teslîm, radest.

1606 ) Mîna.

“Here bigere li dikana, li bazara. Ev tiştê mi nivîsîne bîne.”

Dibê çû anî, da qîza paşê. De îja niha ça dantêla, oya, îşlema çêdikin, dibê qîza paşê jî bi wî şeklî kar kir. Dibê îja hefte hefte dida keçelok, keçelok dibir difrot, lêdida dihat. Dianî, çi dianî jî, dianî tesmîlî wê dikir.

Dibê rojekî gotin, go:

“Welle, paşa nexaş e.”

Dibê dixtor, hekîmê wî yê ku welata gerandin. Çi ew nekirin? Go:

“Îlacê paşê, şîrê şêr di ‘îyarê şêr da bînin binê. Nexaşîya wî qansêr e.”

De berê digotin penceşêr. Qansêr, idî bi awayê niha însanê me em pê xeber didin ew e. Berê digotin penceşêr, qanqiran. Kesî nizanbû bigota qansêr. Dibê go:

“Îlac ew e.”

Dibê kurê wezîr kurê wekîl, her zavê wî sîyar bûn çûn, go:

“Em ê herin şêr bikujin. Şîrî wî di ‘îyarê wî da hildin bînin bine padşa, bira paşa qenc be.”

Dibê keçka piçûk gotê, go:

“Kuro keçelok, kuro bide xatrê xwedê. Kuro, tu ne ev î. Kuro, ew sîyarê mi dîtî! Kuro, l’ ser piştâ hespê te dar ha dibirrîn. Kuro, te ha dikir. Kuro, te ez qarşî<sup>1607</sup> xelkê mehçûb kirim. Kuro, bavê mi ji bona te ez ji evladîyê ret<sup>1608</sup> kirim. Kuro, ca tu jî karekî bike.”

Dibê êvar da ber gerya, daxazî kir. [Mîrze Miheme] go:

“Ji bona wê daxaziya te, ji bona ewê heqareta bavê te [li te] kirî, ez ê jî herim. Yalniz<sup>1609</sup> ez nayême vira, ha! Ez ê ji vira derkevim, paşê ewê gîyîma<sup>1610</sup> xwe li xwe kim. Ez ê ew tiştê ku bavê te xastîye jî ez ê bînim. Ez ê bînim. Yalniz, tu min înan<sup>1611</sup> nakî. Ez çi bim ez ê gîzîlî<sup>1612</sup> bim. Xwedê mezin e, mutleqa rojekî dergakî rehmê yê vebe. Eva kara a wiha nabe.”

[Qîza paşê] dibê:

“Soz, ez heta bi îsteka<sup>1613</sup> te nebe, yanî tu nebêjî idî ez ê xwe açix<sup>1614</sup> kim, ez nabêjim. Yanî kirinê te bi tu kesî ra nabêjim. ‘Eyne tu keçelok, e jî xanima te me.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

Dibê keçelok sibê rabû. Dibê gotê, go:

---

1607 ) Pêşber, hember.

1608 ) Xilas, kuta.

1609 ) Lê, lê belê.

1610 ) Kinc, cilûberg.

1611 ) Bawer.

1612 ) Veşartî, xef, nepenî.

1613 ) Daxwaz, xwestek.

1614 ) Diyar, eşkere.

“Here dîya xwe ra bêje, navmalya ra bêje, bira hîç olmasa<sup>1615</sup> hespekî bine te bîne. E lê sîyar bim herim ku înanmîş<sup>1616</sup> be. Yanî bizanbin ez jî çûm.”

Dibê çû ber dîya xwe gerya. [Dîya wê] go:

“Serkur, eva j’ derdê te bû bavê te kete vî halî. Kurê wezîr, kurê wekîl çûne. Niha dermanê bavê te anîn jî. Keçelok! Here! Şêr bikuje! Şîrê wî bîne! Hiheyyy, dunyayê xira be!”

Dibê zehf ber gerya. Dibê de evlada wê bû dilê wê qanîh nebû. Yanî ku bê, here. Dibê gote seyîsa, go:

“Kuro, hema hespekî ça dibe, bînin binê bira bihere.”

Dibê anîn. Dibê keçelok di nava şîher de ters<sup>1617</sup> li hespê sîyar bû. Dewsa gemê dêla hespê girt. Dibê zara da pey. Yê qûtandê, yê kevir avîtê, yê dar avîtê, haşa, yê kelb berî wî dan.

Dibê ji şîher derket, hesp berda. Dêlbijîyê hespê kumêt da êgir, dibê hesp l’ ber hazir bû. Dibê gîyîma<sup>1618</sup> xwe l’ xwe kir, şûr-gurzê xwe girêda, ‘eba xwe avîte navmilê xwe, dibê serê kumêt berda. Dibê serê kumêt berda.

Ji birayê xwe bêjim, dibê zehf çû. Dibê şev kete ser, li binê darekî raza. Hespê xwe qaş kir, serê xwe avîte xewê. Wextekî hişyar bû, dêna xwe dayê, kalek sekinye s’tûyê wî da. Dibê [kalê] go:

“Mîrze Mihemedê mi, te ra oxir be.”

Dibê dengê xwe nekir, go:

“Gelo ev xewn e, gerçek<sup>1619</sup> e?”

Dibê cake<sup>1620</sup> go:

“Mîrze Mihemedê mi, te ra oxir be. Tê ku da herî?”

Dibê go:

“Oxra xêrê, bavêkal. Kerem ke.”

Dibê go:

“Kure mi, tê herî ku?”

Dibê go:

“Ez ê herim, paşa nexaş e, ez ê şîrê şêr di ‘îyarê şêr da [bînim]. Dermanê paşê ew e.”

[Kalê] dibê:

“Eva rêya çûyîn-nehatinê ye. Kê vê rêyê çûye gêrî<sup>1621</sup> nehatye, venegeryaye.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ew serî ew oxir e, axayê mi. Min sozekî isa hildaye. Ew serî ew oxir e.”

---

1615 ) Qet nebe.

1616 ) Bawerkirin.

1617 ) Çep.

1618 ) Kinc, cilûberg.

1619 ) Rast, rastî, rasteqîn, heqîqet.

1620 ) Dîsa.

1621 ) Şûnda vegeîn.

[Kalê] dibê:

“Îja guhê xwe rind bide mi. Ez ê te ra tiştêkî bêjim. Yalnız<sup>1622</sup> gotnê mi gotî bira guhê te ra bibe guhar, rind bizanbî. Yanî ku tu ji bîra nekî. Tê niha herî, hevtêkî reşayî herî. Hevtêkî [jî] çemekî têkeve pêşya te. Motanî<sup>1623</sup> avê bihara ça tîn, mesela qırş-qal çem radibin wextê tîn, aveke usa yê têkeve pêşya te motanî kêm û xûnê. Te çîqa jê xar<sup>1624</sup> şukurdar be, şukur ke. Yanî nebê; xwedê tu xirav kî veya xwedê tu ava kî, çî tiştêkî pîs e, çî tiştêkî nerind, ewê wusa nebêje.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

[Kalê] dibê:

“Tê hevt roja l’ piştta hespê li wî çemî herî. Tu ji wî çemî gava xilazbûyî, tê herî bikevî ormanekî<sup>1625</sup>. Tê hevt roja jî orman herî. Ku hevtê te tamam bû, rind guhê xwe bide mi, wextê hevtê tamam bû, tê ji orman derkevî. Nava orman da kanîk heye. Kanîke zehf xaş e, zehf delal e. Şêr, nîvro-‘esrê têne ser wê kanyê avê duxin, dikevne bin sîhê dara, xwe dirêj dikan, dînlenmîş<sup>1626</sup> dibin. Şêrek, hevt sal e lingê wî da birîn heye. Ev ling edeb<sup>1627</sup> hildaye. Ji ber [wê] zehf aciz e, zarezara wî diçe ‘erşa. Ewa heyana zarezara wî, yanî însan ber tayamîş<sup>1628</sup> nabe ji wê acîya<sup>1629</sup> wî. Yêra<sup>1630</sup> xwe isa çêke; eger oq<sup>1631</sup> be, eger rima te be, eger şûrê te be ku wextê şêr hatin yê avê buxin xwe dirêj kin, isa binê lingê wî xe bira te nebîne, yanî te ferq neke. Ku der be ew aqintî<sup>1632</sup>, ew edeb, ew îltihab, ew pîslik<sup>1633</sup> temîz be, lingê wî yê hêsayî be. Wexta lingê heyani hesayî bû yê bê, ew kê ye bira dekeve bixaze mirazê xwe? Wî çaxî gotna te çî be tê jê ra bêjî. Yanî wê esna<sup>1634</sup> ku tu lingê wî xî, birînê xî, acî<sup>1635</sup> zehf e. Ku te bibîne yê te pirtîpirtî ke.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

Xatrê xwe jê dixaze diçe. Ku rojê xwe dijmêre dikeve çem, çîqa avê j’ çem duxwe, dibê:

“Ya rebbî çox<sup>1636</sup> şukur. Xwedê tu ava kî. Xwedê tu zêde kî. Nîmetê te ye ya rebbî.”

1622 ) Lê, lê belê.

1623 ) Mîna.

1624 ) Li Ebexê û li devdora Ebexê bo vexwarina tiştên şilêmenî, li şûna lêkera ‘vexwarin’ê lêkera ‘xwarin’ê tê bikaranîn.

1625 ) Daristan.

1626 ) Bêhnvedan, vehesîn, îstirehet.

1627 ) Kêm, nêm, lêm, edab.

1628 ) Liberxwedan, xweragirtin.

1629 ) Êş û elem.

1630 ) Cî, cih, şûn.

1631 ) Tîr.

1632 ) Gemar, kêm û edeb.

1633 ) Gemar, kêm û edeb.

1634 ) Gav, kêlî.

1635 ) Êş, elem.

1636 ) Gelek, zêde.

Ji çê m derdikeve. Hevt roja reşayî diçe, hevta jî dikeve orman<sup>1637</sup>. Dikeve orman diçe. Dêna xwe dayê, di nava orman da kanîke delal e wusa heye. Aveke cemed e wusa heye ku meriv hij-heyran edêna xwe bidê. Dibê hespê av dide, des-serçehvê xwe dişo. Hespê xwe jîdibe vedişêre. Bi xwe jî xwe di binê darekî, li ser darekî xwe vedişêre ku şêr [wî] nebîne. Dibê şûrê xwe derdixe darekî dibirre. Serê wê isa tûj dike motanî<sup>1638</sup> şûjin.

Dibê dêna xwe danê, şêr jor da hatne avê, avê xwe xarin. Paşya hemûka da yek tê, wusa zarezara wî ye, wusa lûvelûva wî ye ku yanî agir dilê însana dikeve ji aciya wî. Dibê hat hinekî av xar. Hema a xwe da kêleka sîha darê, [xwe] dirêj kir, zarezara wî ye. Dibê dirêjkirina wî da weke deh-panzde deqa kete arê<sup>1639</sup>, motanî xewek ku heyânî bigre.

Dibê ewî li ser darê Mîrze Miheme anî. Dibê ew dara ku birrîbû çêkiribû, mûtanî şûjin serê darê isa ku înce<sup>1640</sup> kiribû, dibê ça l' binê nigê şêr da, dibê bû wehrinîya şêr. Dibê şêr rabû kete nava dara, kete orman, berdide şêra, dara dişkêne, tu kar pê nebû. Dibê qedera si'etekî filan, dibê cî da nigê wî hêsayî bû. Dibê xwe dirêj kir l' ser kanyê, go:

“Ew kê ye bira derkeve bixaze mirazê xwe?”

Dibê Mîrze Mihemedê te l' ser darê berjêr bû, go:

“Ez im.”

Go:

“Tu kê yî?”

Go:

“Ez Mîrze Mihemed im.”

Dibê go:

“Mirazê te çi ye? Tu çi dixazî? Varîyeta dunyayê çi bêjî ez ber te sekinî me. Min ehd kirye mi gotye, kê ku vê birîna nigê min, mi ji vê êşê, vî halî xilaz bike, çi bixaze ez ê bidim.”

Dibê go:

“Padişah nexaş e, ez hatime derman. Derman jî dixtora gotye, şîrê şêr di ‘îyarê şêr da were, bine paşê.”

Dibê go:

“Bira nigê hevt salê din jî a wuha bûya te eva tişta ji mi nexasta. Îja ez ê niha, min wehd kirye, kudikeke mi bihere, têjikekî bihere bikuje. Bira deng di guhê mi da neyê. Post ke, têxe ‘îyar. Post ke bîne. Çiçkê bedena min bidoşe şîrê wê têxê bihere. Xaş helal be. Xwedê têxe şifa xêrê.”

Dibê Mîrze Miheme têjikeke wê hilda bir ku cîkî تنها kuşt. Post be, ‘îyarê wê be, çi be, dibê hilda anî. Dibê heyânê xwe yek kêlekekî xwe lê fedî kir, bedena xwe draxist. Dibê Mîrze Miheme

---

1637 ) Daristan.

1638 ) Mîna.

1639 ) Navber.

1640 ) Zirav, tûj.

çiçkê bedena wê dot, dote wî postî. Dibê hilda. Xatrê xwe jê xast, kete rê. Dibê kete rê, lêda hat. Dibê Mîrze Miheme ew tiştana kar kirin. Li hespê xwe sîyar bû gêrî<sup>1641</sup> zivirî.

Dibê gêrî zivirî. Dîsa rojê xwe jimirî ku hevtê xwe j' nav mêşe derbas kir ji mêşe deket. Dibê hevta reşayî hat, hevta jî çem derbas bû. Dibê kete reşayî hat. Yanî daxilî mintika xwe bû, mintika şihêre paşê. Dêna xwe dayê, wê du hev sîyar jî wê digerin. Du hev sîyar jî digerin. Dibê li pêşya her<sup>1642</sup> sîyara rovîk rabû. Rovî rabû. Dibê herdika berê rovî dan. Dibê Mîrze Miheme ser piştta hespê oçek<sup>1643</sup> avîte rovî, rovî l' pêşya wan hilda. Dibê hatin, hatin:

“Selam ‘elêkim.”

[Mîrze Miheme go]:

“ ‘Elêkim selam, xoşbêş.”

[Mîrze Miheme] go:

“Hûn kî ne?”

Dibê ewî go:

“Ez kurê wezîr im.”

Ewî jî go:

“Ez kurê wekîl im. Em zavê padşê ne.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Kuro, hûn zavê paşê ne. Hûn vira çi îşî dikin? Çi îşî we heye? Hûn nêçîrvan in? Hûn nêçîrvanê xezala ne? Hûn yê çi ne?”

Dibê:

“Evê direvî ji wî ra dibêjin kudka şêrê. Em ê ewî bikujin biherin. Dermanê paşê ye.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Wusa ne?”

[Herdu] dibê:

“Erê.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

Evna dajon têne ser avekî. L' ser avê peya dibin. Evna jî rovîyê xwe tînin, rovîyê xwe post dikin.

[Mîrze Miheme] dibê:

“Îja hûn ê niha ça b'kin?”

[Herdu] dibê:

“Em ê evî biherin bine paşê. Dermanê paşê ye.”

---

1641 ) Şûn de, paş ve.

1642 ) Herdu.

1643 ) Tîr.

[Mîrze Miheme] dibê.

“Baş e. Îja ez we ra tiştêkî bêjim. Ku ez bêjim, mi dermanê paşê anye hûn ê çi bine mi?”

Yek dibê:

“Em ê hinde [zêr bine te ku] em hene şîher. Ez kurê wezîr im. Xezîne paşê, bavê îkîncî adamê<sup>1644</sup> wî ye, her tişt destê wî ye. Ez ê hinde zêr bime te.”

Ewî din dibê:

“Ez ê hinde pere bime te. Ez kurê wekîl im.”

Dibê:

“Çi bixazî em ê bine te.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ez malê dunyayê, varlixa<sup>1645</sup> dunyayê ji we naxazim. Postê we we ra. Yalniz<sup>1646</sup>, ez ê hinekî îlac bime we biherin binê. Moreke min heye. Ev gustîla tilya min mor lê ye. Ez ê evê morê li kulîmekê we xim.”

Dibê:

“Yawo, tiştê isa dibe?”

Dibê:

“Wextê tiştê isa nebe ez îlac name we.”

Kurê wezîr dibêje kurê wekîl:

“Tu çi dibêjî?”

[Kurê wekîl] dibê:

“Yawo, mêrkê xerîb e. Em hatine îlac. Kê bizanbe mor li kulîmeka me heye, va l’ me daye? Li bedena me daye mor?”

[Kurê wezîr dibê]:

“Kes nizane.”

[Kurê wekîl] dibê:

“Ê tamam.”

[Kurê wezîr] dibê:

“Temam.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

Eva, postê wan ji wan distîne, dibê:

“Hûn rûnên.”

---

1644 ) Merivê duyem(în).

1645 ) Mal û milk.

1646 ) Lê, lê belê.



Li ser pišta hespê xwe xurcka xwe vedike. Tîne parçek ji lingê têjka şêrê jê jêdike, di şîr da dike, dike nav postê wan, dibê:

“A eva dermanê we ye. Dermanê we ev e. Evê biherin bine paşê.”

Dibê gotne hev, go:

“Kuro, zate mêrkê xerîb e. Li vê derê kê bizanbe?”

Dibê bira ew bikevne rîya xwe werin. Mîrze Miheme jî, keçelok jî, hespê xwe dewam ke were. Dibê hate yaxinê<sup>1647</sup> şîher. Dibê cake<sup>1648</sup> hespê xwe berda. Şûr, gurz, kemendê xwe li ser girêda, hespê xwe berda. Bira hespê wî here.

Dibê hat xwe gîhande perrê şîher. Hespekî dîsa ters<sup>1649</sup> lê sîyar bû. Ajot hate derê kolka xwe. Dibê zarê şîher [û] genca yê difitînê, yê ‘û dikê, ye kevira davêjê, haşa yê kelba berî dide. Pê dikenin da, bûye tiraneçî.

Dibê qîzik ji hundur deket, berî wana da. Kelîme-pirs ji wan ra gotin. Dibê hesp berdan. Dibê çûn. Dibê çû hundur. Dibê j’ qîzikê siwal kir. Rûnişt, kêfxaşî dane hev, bêna xwe standin. Dibê qîzikê go:

“Tu silametîkî hatî.”

Dibê go:

“E. Qe dûrima<sup>1650</sup> bavê te ça ne?”

Dibê [qîzikê] go:

“Mala bavê te xirabîyo! Kurê wezîr-wekîl hatine. Şîrê şêr di ‘îyarê şêr da anîne. Hema dîwana bavê mi da sirf [li ser] navê kurê wezîr-wekîl xebardan heye. Wakî din kes bi tiştêkî din naaxife. E çûme dîya xwe bibînim, xûşkê mi hatine, wxûşkê mi berdane mi. Mi siwala bavê xwe jî nekiryê ji dayka xwe. E cake<sup>1651</sup> zivirîme hatime. Îja qe te çi kir?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Dûrima<sup>1652</sup> bavê te a niha ça ne?”

[Qîzik] dibê:

“Dûrima bavê mi zehf kotî<sup>1653</sup> ye. Dixtor jî hema sureklî<sup>1654</sup> dibên; şîrê şêr, ‘îyarê şêr.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Here cem cîya xwe. Bira îskaneke temîz yan jî fîncaneke zêr, derê wê girtî be derî lê neyê vekirinê, wî sozî cîya xwe bistîne bîne. Mi îlac anye. Em ê hine îlac wake damlekî<sup>1655</sup>, du damla

---

1647 ) Nêz, nêzîk.

1648 ) Dîsa, careke din.

1649 ) Çep.

1650 ) Hal-hewal, rewş.

1651 ) Dîsa, careke din.

1652 ) Hal-hewal, rewş.

1653 ) Nebaş, xirab.

1654 ) Biberdewamî, domdar.

1655 ) Dilop.

weyaxut weke kevcîkî, em ê îlac têne. Bira cîya te dizîkava bidê. Ka bavê te ser ça dibe? Goreyê wê em ê herin.”

[Qîzik] dibê:

“Ê baş e.”

Qîzik diçe, ber cîya xwe digere, dibê:

“Dayê, keçelok jî çûbû.”

[Dîya wê] dibê:

“Serkur, serkur, serkur! Eva hemû derdê te ye bavê te ketye vî halî. Pitê<sup>1656</sup>, tu wê rojê hatî hespê, îja [keçelok] ters<sup>1657</sup> lê sîyar bûbu, dêla wî girtibû. Ewa! Here! Şêr bikuje! Şîrê şêr di ‘îyarê şêr da bîne! Kurê wezîr-wekîl çûn anîn jî.”

[Qîzik] dibê:

“Dayê, ez wî tiştê te dixazim tu wî bide mi.”

Zehf ber digere. De naşkêne, evlad e artix<sup>1658</sup>. Ça hebe, yanî soniçta<sup>1659</sup> evlad e. Digre didê. [Qîzik] dibê:

“Tê fîncaneke bavê min e zêr bidî mi, nehatibe xevatê. Yanî xevat derken<sup>1660</sup> ku tê da çay-qehwe nehatibe xarinê, dest pê neketibe.”

Didê tîne. Weke du kevcîyê çayê, bîlemedin<sup>1661</sup> sê kevcîyê çayê ewî îlacî, şîrê şêr berdinê. Kerr, dixê nava ewa [pîna] dipêçe, tîne dide cîya xwe, dibê:

“Tê êvarê bê millet, cima’et bela bû tê bidî bavê mi. Şevê kevcîkî bidê.”

Dewam dikin. Rojek, dudu, sisê... Dixtor dibê:

“Dûrima<sup>1662</sup> paşê ber bi başbûnê diçe. Xazila heb’ya. Ev îlac heb’ya. Kê anye?”

Tabî deng-seda tune. Kê evî îlacî dide paşê, kes nizane. Paşa dibêje jina xwe, dibê:

“Eva îlaca kê anye?”

Jinik dibê:

“E nizanîm.”

Nabêje, yanî sirr e. Jinik, vê carê îja jinik tê bi libsê feqîra. Kinceke feqîra xwe dike, kinceke qelişî, qirêj, nepaxîşkirî yanê. Tê, siwal, siwal, siwal... Tê derê qîza xwe. Tê diçe hundur, xwe beyan dike, dibê:

“Keça mi, bavê te bi ser wî îlacî baş dibe. Hebe, zêde bide.”

[Qîzik] dibê:

1656 ) Li Ebexê û li devdora Ebexê bo gazîkirina jinan tê bikaranîn.

1657 ) Çep.

1658 ) Êdî.

1659 ) Encam, axirî, dawî.

1660 ) Mebest, armanc.

1661 ) Ku em bêjin.

1662 ) Hal û hewal, rewş.

“Dayê, here. Bira kes te nizanbe tu tê vira. Bira keçelok j’ ber baxçe were ez bêjme keçelok. Hebe?”

[Jina padişah] dibê:

“Qîza mi, eva keçelok anye?”

[Qîzik] dibê:

“Erê, dayê. Eva, keçelok anye.”

[Jina padişah] dibê:

“Ê baş e.”

Qîzik êvarê, de berê sê damle<sup>1663</sup> veya<sup>1664</sup> sê kevçî berdabûne bardaxê, qîzik êvarê şeş kevçîya davêjê. Dibe dizîkava dide cîya xwe, dizvire tê. Dibê ser wî padişah baş bû, ser wî îlacî. Retbûna<sup>1665</sup> îlac hat, padişah jî baş bû. Dibê yaniz<sup>1666</sup>, keçelok ewa [mor] isa hilda, go:

“Tê bibî hatira<sup>1667</sup>. Roj hebe tê kêr werî.”

Dibê zeman dîsa di arê<sup>1668</sup> ra derbas bû, meh hatin sal diçin. Ji birê xwe ra bêjim, de îja paşê berê li hevdu zor kirine mûtanî<sup>1669</sup> dewletê niha, ulkê<sup>1670</sup> niha. Dibê îja yê zor-zurbe, dibê xerac ji wanê garîban distandin, ji paşayê feqîr distandin. Yanî feqîrê çâ? Zengîn e, ema ku yalê<sup>1671</sup> eskerîyê va, yalê guç<sup>1672</sup> va feqîr e.

Dibê paşakî serî xwe li Hesên Paşa rakir, li xezûrê keçelok. Dibê li xezûrê keçelok rakir. Dibê berê xerc jê xast, go:

“Yê xercê hevt sala, hinde mal, mesela mecdî, zêr, pere w pez û heywan vs<sup>1673</sup> vs. yê vana bide. Eger nede em ê herb kin.”

Dibê ewî jî go:

“Ez nadim. Herb be herb, em ê herb kin.”

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê go:

“Em ê herb bikin.”

Dibê de îja karê padşahê dinê, dibê pêş da rabû, li defa hewarê da, go:

“Em ê herne ser filan paşayî ku xerca me nedaye, dehwa herbê kirye. Em ê hene herbê.”

---

1663 ) Dilop.

1664 ) An jî, ya jî.

1665 ) Xilasbûn, kutabûn.

1666 ) Lê, lê belê.

1667 ) Yadîgar, yadaşt, bîrewerî.

1668 ) Navber.

1669 ) Mîna.

1670 ) Welat.

1671 ) Alî, hêl.

1672 ) Hêz, quwet.

1673 ) Hwd.

Dibê rasteke<sup>1674</sup> mûtanî<sup>1675</sup> vê rasta me ye Ebexê, dibê şîher mûtanî van çîyayê me van bolgê<sup>1676</sup> me asê, a iha di çîyakî asê da bû. Dibê pêşya şîher jî ova<sup>1677</sup> bû, deyšt bû. Qûrûlûşa<sup>1678</sup> şîher dibê di dibê çîyê da bû, pêşya wê ova bû. Însanê berê ça qela yêrê<sup>1679</sup> asê da, yêrleşim yêrê asê da çêkirine, ‘eyne bi wî şeklî bûye dibê.

Dibê rojek, dudu, sisê... Werhasil mehek hazirlixa<sup>1680</sup> şêr çêbû. Dibê şer enînde soninda<sup>1681</sup> dest pê kir. Dibê dest pê kir, rojek, dudu, sisê, heftêk... Dibê eskerê Hesen Paşa baş e. Yanî îdarelî bîr şekilde<sup>1682</sup> ber xwe dide, yanî safa da.

Dibê hersê qîzê paşê jî, bi caryê wan, hevalê wan, xanimê wan, qîzê dewletîmenda, bûkê dewletîmenda, dibê l’ ser qesrê xwe sekinîne, [şêr] sêr dikin. Dibê xûşka wan e piçûk jî çûye cem wana, ya jina keçelok.

Dibê ew dibê:

“Ew sîyarê hanê ha lêdixe mêrê min e.”

Ew dibê:

“Kurê wezîr e.”

Ew dibê:

“Kurê wekîl e.”

Ya din dibê:

“Nizam kurê kê ye.”

Dibê destê xwe jî iha serê xûşka xwe dixin:

“Serkur, de tu jî navê keçelok bêje.”

Dibê qîzik girya, kete rêya xwe lêda hat. Dibê cîya wê hinekî ber gerya, lêda hat. Dibê keçelok êvarê hat, dibê qîzikê gotê:

“Tek şertekî mi heye. Tu qebûl nekî ez te ra jinantiyê nakim, tu rîya xwe ez rîya xwe. Hemin bavê mi ez j’ qîztîyê red kirime, ez bêkes im. Ez ê hema yaxa<sup>1683</sup> xwe te jî xilaz kim.”

Dibê go:

“Bêje.”

Dibê go:

---

1674 ) Deşt, deyšt.

1675 ) Mîna.

1676 ) Herêm.

1677 ) Deşt, deyšt, rast.

1678 ) Avabûn.

1679 ) Cîwar, jiyangêh.

1680 ) Hazirî, amadehî.

1681 ) Di dawiyê de, di axiriyê de.

1682 ) Bi awayekî asayî.

1683 ) Pêşîr.

“Tê sibê dekevî şêr, dekevî cengê. Eskerê bavê min qirilma noqtasiyê<sup>1684</sup> da ne, ret<sup>1685</sup> dibe idî. Wextê yênilmîş<sup>1686</sup> be xelkê were me jî bihere. Tu wî çaxî hebî çî yî tine bî çî yî!”

Dibê go:

“Ez ê herim. Bona vê kelfîma te neb’ya jî ez ê biçûma. E jî lê sêr dikim, ez ê jî herim. Yalnız<sup>1687</sup>, wextê ez ketme şêr tu nabêjî ewî han filankes e, tu nabêjî keçelok e. Tu bêjî ez ê birîndar bim, tu nabêjî.”

[Qîzik] dibê:

“Soz, ez nabêjim.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“A îja tu lê sêr ke çika şer ça ne.”

Dibê subetirê ‘eyne Mîrze Miheme rabû. Dîsa kurkê wî serê wî çû nava baxçe. Dibê ji efendimê xwe ra bêjim, dêlbijîyê hespê kumêt da êgir, hespê kumêt l’ ber hazir bû. Dibê Mîrze Miheme zirxê xwe li xwe kir, gîyîma<sup>1688</sup> herbê girêda, şûrê xwe kişand. Çû di piştê ra zivirî jor da hat. Dibê herd paşa jî sekinîne, dibê:

“Gelo ev sîyarê hanê motanî<sup>1689</sup> pirîskê êgir tê kê ye?”

Dibê ewî [Hesen Paşa] go:

“Were nav eskerê mi ez ê qazanc kim.”

[Paşayê din go]:

“Were bibe sereskerê eskerê mi ez ê qazanc kim.”

Dibê Mîrze Miheme ajote kêlaka eskerê paşê, eskerê xezûrê xwe. Dibê si’eta herbê tamam bû. Dibê borîya lêda ceng başlamîş<sup>1690</sup> bû, ketne herbê birayo. Dibê Mîrze Miheme li’ ser kumêt çep lêdixe rast dizvire, esker di ser hev da vedigerîne.

Dibê bûka wezîr dîsa dibê:

“Serkur, iha eva mêrê min e.”

Bûka wekîl dibê:

“Eva mêrê min e.”

Ewa dibê:

“Nizam ça bû?”

Dibê ya piçûk qe deng nake. Dibê en son<sup>1691</sup> tepek serê wê dan, go:

---

1684 ) Halê qirê, qirbûnê.

1685 ) Xilas, kuta.

1686 ) Bibinketin, têkçûn.

1687 ) Lê, lê belê.

1688 ) Kinc, cilûberg

1689 ) Mîna.

1690 ) Destpêkirin.

1691 ) Di dawiyê da, di axiriyê da.

“Serkur, ka keçelok?”

Dibê tifalê girya, hat. Dibê roja herbê ye sisyan e, roja sisyan e. Dibê ‘eyne xwe ra sêr dikin. Dibê idî tifalê tayamîş<sup>1692</sup> nebû, go:

“Ewî îro sê roje herbê dike keçelok e.”

Dibê wextê go keçelok e, dibê oqek<sup>1693</sup> li zenda keçelok ket hema li pêşya paşê wêdatir. Dibê paşê go:

“Ewî sîyarî bigrin.”

Dibê ‘eyne oq di milê wî da ne, ew pê hê şer dike. Dibê xwe gîhandnê. Dibê wextê sîyar girtin, dibê paşê pêjgîra xwe ye hevirmûş li stûyê xwe vekir da ser zenda wî. Desmala xwe dexist da ser bi pêjgîrê jî girêda, nehîşt bikeve herbê.

[Mîrze Miheme] go:

“Na. E ji herbê çekilmîş<sup>1694</sup> nabim.”

Dibê heta êvarê li ser piştê hespê ‘eyne şûr hejand. Êvarê si’eta herbê, belî si’eteke wan hebû, dibê çekilmîş bûn. Dibê ew jî hespê xwe sîyar dibû ji nav şêr derdiket diçû. Dibê paşê ew ro zehf israr kir, go:

“Tê l’ cem me bî.”

Dibê ew şev ozellîke<sup>1695</sup> li çadira paşê, kêleka paşê [ma]. Dibê êvarê, dixtorê paşê birîna wî, ewa wî, îlacê wî wextî çî be, dibê derman-merhem yê hekîmê wî wextî, yanî îlacê wan çî be, dibê girêdan. Dibê sibê rabûn.

Dibê heftêkî şer tamam bû ku heftê dudya rojek hildan, dibê eskerê paşê din gêrî çekilmîş<sup>1696</sup> bû. Dibê wextê gêrî çekilmîş bûn, yalniz di wir da, dibê ku roja dudya êvarê ku paşê gotê go:

“Tê werî çadirê dîsa mêvanê min î.”

Dibê gote paşê:

“Na, ez soz nadim. Ez li cîkî din mêvan im.”

Dibê êvarê şev kete ser, ajote derê koxkê xwe. Dibê l’ derî da qîzik deket, dibê:

“Mi te ra negot, nebê keçelok e. Tu bûyî bayîsê zenda mi. Ez ji boyê wê kelîma te birîndar bûm.”

Qîzik zehf ber digere, zehf israr dike, dibê:

“Subê ku bi vê gîyîma<sup>1697</sup> [zirx] xwe were.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ez bi vê gîyîmê nayêm. Jê ra zeman dixaze.”

---

1692 ) Xwenegirtin, xweranegirtin.

1693 ) Tîr.

1694 ) Vekişîn, xwe vekişandin.

1695 ) Xusûsî, bi taybetî.

1696 ) Paşda vekişîn, paşva vekişîn.

1697 ) Kinc, cilûberg.

Şeveqê sibê cake<sup>1698</sup> radibe diçe. Piştî şîher ra dizvire tê semtê sîyara disekine, yêra<sup>1699</sup> cengê. Dibê borîya herbê lêda dîsa hevdu dan. Roja dudya dibê eskerê paşayê din qeyb kir. Wana jî zafer qazanç kir.

Dibê paşê gotê go:

“Tu mêvanê min î.”

Dibê gote paşê, go:

“Na. Mi soz nedaye te, nabme mêvanê te. Ez bibme mêvanê te jî ez ê bi şertekî bibme mêvanê te, bi şertekî. Eger tu ew şertana tu pêk bînî ez ê bibme mêvanê te.”

Dibê go:

“Ez ê bibme mêvanê te.”

Ji birê xwe ra bêjim, dibê paşê go:

“Baş e.”

Dibê eskerê paşayê dinê çekilmîş<sup>1700</sup> bû. Ze’iyeta dayî; araç-gereçê<sup>1701</sup> pê hatine, yîyeceka<sup>1702</sup> ku anî hemû ma. Hespê wan, birîndarê wan, ewê wan, de îja dibê ku her kesî birîndarê xwe ‘eyne ji yêra<sup>1703</sup> herbê kişandin birin. Dibê ew yîyecek, ewê wan e mayî hemû man. De hêsîr ketin, hemû man j’ padşayê din ra.

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê keçelokê me çû dîsa di piştê ra zivirî hat. Hespê xwe berda, goreva<sup>1704</sup> xwe dewam kir. Êvarê hine çiçek hilda anî hat. Dibê evna jî hatin. Dibê go:

“Kurê wezîr, kurê wekîl savaş<sup>1705</sup> qazanc kirine, zafer anîne.”

Dibê êvarê dîwana paşê tijî ye. Her kes dibêje:

“Mi ha lê da.”

[Her kes] pesnê xwe dide. Dibê gotne paşa, dibê paşa go:

“Mi sîyarek dît, sîyarê hespê kumêt, hespê kumêt. Xweyî wî, şêr me da qazanckirinê. Kesî qazanc nekiryê.”

[Paşê] go, go:

“Nîşana mi jî l’ cem e.”

Dibê her kesî çêhvê hev nihêrî. Dibê îja rûsipîyê paşê ji paşê siwal kirin, go:

“Nîşana te çi ye?”

[Paşa] go:

---

1698 ) Dîsa, careke din.

1699 ) Cî, cih, der.

1700 ) Vekişîn, xwe vekişandin.

1701 ) Amûret.

1702 ) Xurek, zad.

1703 ) Cî, cih, der.

1704 ) Peywîr, wezîfe.

1705 ) Şer, herb.

<sup>2</sup>Ew sîyarê ez dibêjim, ewa di herbê da birîndar bûye. Oqek<sup>1706</sup> li zenda wî ketye. Mi desmala xwe ye hevirmûş bi pêjgîra xwe va mi l' zenda wî alandîye, girêdaye. Bi wê zenda va jî ewî şer kirye. Şevêkî jî ji çadirê, kêleka mi bûye. Yê şer qazanc kîrye me ra ew meriv e.”

Dibê her kes çû. Yê kê avîte zenda xwe, yê şîşik sor kir pê va danî, desmalek-pînek lê alandin avîtne stûyê xwe. Dibê paşê go:

“Asla<sup>1707</sup> ev nînin, asla. Yek we nîne.”

Dibê go:

“Bira şîher bikeve sirayê<sup>1708</sup> were. Ez ê her kesî qontrol kim. Ez ê her kesî qontrol kim.”

Dibê her kes hat çû. Her kes derbas bû. Dibê gotne paşê:

“Kes nema.”

Dibê:

“Kuro, qe kes nema?”

Dibê gazî defterdarî wî kirin, go:

“Çiqa mexlûqet di vî şehri da heye we hemû nivîsîye?”

Go:

“Erê.”

Dibê en son<sup>1709</sup> yekî yaşlı<sup>1710</sup> rabû, go:

“Merivek ne tê da [ye].”

[Paşê] go:

“Kê ye?”

[Kalê] go:

“Keçelok, kurê kalê. Ewî qîza te seva xwe avîtî serê wî dayî.”

[Paşê] go:

“Mi ra ewî jî bînin.”

Dibê wezîrê wî, ewî wî gotnê:

“Yawo, keçelok! Baxçivan! Were! Mêra bikuje!”

Dibê aqilmendekî wî gotê, go:

“Bira were. Paşa wextê dibê bira were, bira were.”

Dibê go:

“Bînin.”

Dibê wextê çûn milê wî girtin, dibê da xebera paşê ra, ewê çûne bînin [ra]:

---

1706 ) Tîr.

1707 ) Qet.

1708 ) Rêz, dor.

1709 ) Di dawiyê de, di axiriyê de.

1710 ) Kal, kalemêr, pîremêr.



“Yawo, ez merivekî [feqîr im]. Ez keçelok! Şer! Em dûrî hev in.”

Dibê hildan anî. Dibê paşê go:

“Ser çi hebe bêxin. Milê wî hûn ê zenda wî mi ra dixin.”

Dibê wextê milê wî vekirin zenda wî dexistin, pêjgîra paşê wê desmala paşê l’ ser zenda wî. Dibê paşê go:

“Gazî hekîma kin.”

De en dibên dixtor, berê hekîm bûne Dibê go:

“Gazî hekîma kin mi ra bînin.”

Dibê hekîm hatin, [paşê] go:

“Hekîm, eva birîna we derman kirye?”

Dibê hekîma go:

“Erê. Paşa, eva merva birîndar bûye. Îlk<sup>1711</sup> roja birîndar bûye te êvarê anye çadirê. Evna te l’ zenda wî dane girêdanê. Eva melhema, eva îlaca jî me lêdayê.”

Dibê paşa înanmîş<sup>1712</sup> nebû. Dibê teva gotê, go:

“Paşa, ev meriv e.”

Dibê îja paşa gotê, go:

“Wextê ev meriv e, ew sîyarê mi dîtî yê bi şeklî were ez ê nas kim. A iha ew nîne. Ne ev e, ew sîyarê ez dibêjim ne ev e. Hema evna aydê mi bin jî sîyar ne ew sîyar e.”

Dibê jinika [ra] go:

“Qîza mi jî bînin.”

Dibê qîza wî jî anîn. Dibê jina wî jî hat. Dibê wextê ji hev qetyan, dibê qîzik zehf girya, zehf ber gerya, go go:

“Xwe açixlamîş<sup>1713</sup> ke, idî xêra vî tiştî tine.”

Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Paşa, ez ê werim yaniz<sup>1714</sup>, bi şertekî. Tu wan şerta qebûl bikî, ew sîyarê tu dibêjî ez ê wî sîyarî bînim.”

[Paşa] dibê:

“E, baş e.”

Eva [Mîrze Miheme] dibêje qîzikê:

“Tê yêra<sup>1715</sup> hespê zehf temîz çekî.”

Yanî de berê peyn heb’ye, niha jî heye. Davêjne bin cîyê pêz, gova, cîyê dewara. Dibê:

---

1711 ) Ewil, pêşî.

1712 ) Bawerkirin.

1713 ) Eşkerekirin.

1714 ) Lê, lê belê.

1715 ) Cî, cih, der.

“Tê çil sebet peyn bidî kişandin bavêjî dewsa hespê. Bira pîs nebe, li ser kevira aciz nebe, neêşe. Ez ê bi wî şertî werim.”

[Qîzik] dibê:

“Baş e.”

Dibê ro qama nîvro-‘esrê bû, dibê ji nava xasbaxçe da, dibê dêlbijiyê hespê kumêt da êgir. Dibê l’ hespê sîyar bû, l’ nava baxçe deket. Iha serfîk di nava şîher da çû cake<sup>1716</sup> jêr va zivirî. Ajote derê mala xwe sekinî. Dibê wextê nava şîher da çû hat, dibê paşa jî di ewa xwe da sekinye lê dinhêre, dibê go:

“Sîyar tamam e. Nehêlin bira derê mala xwe peya nebe. Wira peya be jî sîyar mi ra bîne vira. Sîyarê bibe mêvanê mi, yê were vira.”

Dibê bi wî şeklî, dibê l’derê mala xwe peya bû. Hesp li wê derê kişande hundir. Dibê ew bi wê gîyîma<sup>1717</sup> xwe, bi wê qûşama<sup>1718</sup> xwe hate dîwana paşê. Dibê paşa rabû, bir3in vekir, go:

“A sîyarê e dibêjim ev e, ne ew bû. Sîyarê e dibêjim, ev e.”

Dibê heftêkî bû mêvanê paşê. Dibê nan hat, çay hat, av hat, qehwe hat. Dibê go:

“Paşa, ez tiştêkî naxum. Ez j’ bona xarinê jî nehatime. Ku tu şertê mi qebûl bikî ez ê nanê te, ava te, ça te buxum.”

Dibê paşa gotê, go:

“Îja yanişîya<sup>1719</sup> me çî ye wê bêje. Ewê yanişîyê me ra bêje em jî bizanbin. Mesela ku me te ra heqaretek kiribe, tiştêkî şaşî hebe, dibe ya însan e.”

Dibê gote paşê:

“Şaşîya mezin ew e ku qîza te wextê sêva xwe avît li serê mi da, te qîza xwe qîztaniyê ret<sup>1720</sup> nedikir. Eva yek. En<sup>1721</sup> şaşîya te ye mezin ew e. E jî însan im. Xwedê, kurê wezîr jî çêkirye, e jî çêkirime. Kurê wekîl çêkirye, e jî çêkirime. Ew kurê wezîr e, e jî kurê padşa me. Ez kurê filan paşayî me. Ez heramzade nînim, xwe înkâr jî nakim. Idî te anyê wê noqtê ez ê jî xwe açixlamîş<sup>1722</sup> kim. Te wextê îja ku qîza xwe da min te j’ qîztîyê ret kir. Te îja ji bona çî qîztîyê ret kir? Ka ewê mi ra bêje. Te îja ji qîztîyê ret kir, tu wextê ku padşayî, ‘edaleta te hebe, duzena te hebe. Te îja ewa mehrê jî neda, hukmê mehrê jî te neda. Ka çî tiştî, e ser çî tiştî nanê te, ava te buxum, te ra bêm paşa? Ku va evê kêleka te a iha rûniştine, qe yekî, qe aqilmendekî te, rûsipî te, tiştêk te ra nego?”

Dibê paşa go:

---

1716 ) Dîsa, careke din.

1717 ) Kinc, cilûberg, zirx.

1718 ) Kinc, cilûberg, zirx

1719 ) Xeletî, şaşî.

1720 ) Xilas, kuta.

1721 ) Herî.

1722 ) Eşkere.

“Tu heqlî<sup>1723</sup> yî.”

Dibê îja paşê gotê, dibê go:

“Ez ha nexaş ketim. Tu jî wextê ku va ev hunerê te hebûn te çima înkâr kir? Te ku serê xwe mi dernexist? Te çû ewa posta kire serê xwe, keçelok dîye<sup>1724</sup> te xwe da naskirinê? Tu jî buç’ yayî. Kurê wezîr, kurê wekîl çûn. Tu niha tinazê xwe wan dikî. Çûn îlacê mi anîn, dermanê mi anîn.”

Dibê be lêva va kenya, dibê go:

“Paşa, yê ku îlacê te anye belî ye. Tu dibêjî, kurê wezîr-wekîl anîne. E jî înkâr dikim. Ez dibêm, wana neanye. Li wan jî nîşana min heye. Eger ku wan anîme nîşana mi l’ wan e. Eger ew bin nîşana min l’ wan heye.”

Dibê kurê wezîr kurê wekîl, de berê nigê xwe dirêj kiribûn, dibê nigê xwe hinekî hilkişandne ber xwe. Dibê herdika l’ çehvê hev nihêrî, dibê gotne hev go:

“Beke<sup>1725</sup> ew be?”

Dibê [herduyan] go:

“Na, heyran! Kê derê ew e. Kuro, li wê çolê li wê ewê, kê derê ev e?”

Dibê paşa go:

“Nîşana te çî ye?”

Go:

“Nîşana mi l’ her zavê te jî heye. Li kurê wezîr jî heye, li kurê wekîl jî heye. Yaniz<sup>1726</sup>, cima’et giran e, bira cima’et bela be ez ê nîşana xwe te ra bêjim. Qontrol ke, nîşana mi tune be, mi çi gotnê gotye ne wusa be, tu dikarî serê mi lêxî. Ez ber serê xwe hazir im.”

Dibê wextê cima’et ku berêkê va bela bû, kurê wezîr-wekîl go:

“Em ê herin.”

Dibê paşa go:

“Na. Hûn ranabin. Hûn mêvan in. Rûnên. Hûn zavê min in. Me herbek qazanc kirye, me zaferek qazanc kirye. Hûn ê hene kê derê? Yawo, mala mi [da] qey tune qesir. Runên îsreheta xwe binhêrin.”

Dibê zara çehvê hev nihêrîn. Dibê wextê cima’et bela bû, dibê paşa gotê go:

“Îja nîşana te çî ye?”

Dibê go:

“L’ bedena wana, eva gustîla tilya mi mor e, [ev mor heye].”

Dibê qaşa wê a iha bilind kir, welgerand, mor, mora paşatîyê. Dibê go:

“Mi eva mora bi wan va danye. Li bedena wana eva ‘îşareta heye. Tune be dîsa serê mi lêxe.

---

1723 ) Mafdar.

1724 ) Wek, wekî.

1725 ) Belkî, dibe ku.

1726 ) Lê, lê belê.

Dibê zara çehvê hev nihêrîn. Dibê paşê gotê wana, go:

“Kuro, heye?”

Dibê înkâr kirin. Dibê paşa go:

“Cellad!”

Wextê go cellad, dibê zar sekinîn. Dibê go, go:

“Belê, heye.”

Dibê go:

“Heye.”

Dibê paşê gote wana:

“Hûn dikarin idî herin. Hûn dikarin herin.”

Dibê [paşê] go:

“Ew îlac te bi kê şand? Kê anî?”

Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Paşa, ew îlac, tu wextê isa nexaşbûyî ku hekîma gotin go dermanê te ev e, [min ew îlaca ji te ra anî].”

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê Mîrze Miheme ew şev ma l’ dîwana paşê. Dibê sibê cima’eta paşa dîsa hat, meznê wî, rûspîyê wî, wezîrê wî, heyeta wî. Dibê paşê gote mezina, go:

“Fermanekî dixin, hevtêkî di şîher da têne def, dehwat, şaylixayî<sup>1727</sup>.”

Dibê dehwater Mîrze Miheme bi keça xwe da kirinê. Dibê qesrêk jê ra da hazirkirinê. Dibê gazî rûsipîyê xwe, mezina, serpêsekinya [kir], dibê go:

“Idî yaşê<sup>1728</sup> min derbas dibe. Ji we ra padşakî a wiha dixaze. Dîrokîyê da ku bi qarşî<sup>1729</sup> paşê başqe<sup>1730</sup>, bi qarşî dehwa w doza ez evî civanî qebûl dikim. Hûn jî eger qebûl bikin padşa îro şûn da ew e. ‘Eynî dîsa her tiştê bi gotna toplimê<sup>1731</sup>, bi gotna şîher, bi gotna me [be]. Yaniz<sup>1732</sup>, padşa ew e. Her tiştê şîher destê wî da ne.”

Dibê, teva qebûl kir. Dibê wexta ku teva qebûl kir, dibê wezîr rabû, go:

“Ez qebûl nakim. Paşatî be, paşatî heqê min e.”

Dibê paşê gotê, go:

“Tu bi çi şertî qebûl nakî?”

Dibê go:

“Ku tu iha nexaş ketî, lawê me ha çûne emeg dane, iha îlacê te anîne, ha ewa te anîne, ha zafera

---

1727 ) Şahî.

1728 ) Temen, emr.

1729 ) Hember.

1730 ) Ê/ên-yên din,

1731 ) Civak, cimaet.

1732 ) Lê, lê belê.

kirine. Yanî ewa [qencîya] te yê bib'ya ev ji me ra?

Dibê ewî [paşa] jî gotê, go:

“Lawê xwe siwal bike, eger gerçek<sup>1733</sup> îlac lawê te anîbe, paşatî te ra.”

Dibê gotne Mîrze Miheme, Mîrze Miheme go:

“Gotin tune, dîyeceka<sup>1734</sup> mi tune. Paşê çi gotibe ez jî qebûl dikim.”

Dibê wextê zivirîne ser kurê wezîr, dibê wezîr go:

“Gaziknê bira were.”

Dibê wextê hat, dibê wezîr gotê:

“Te neanye?”

Dibê xeberdan pê nebû. Dibê paşê gotê go:

“Çika îja ew mora l' bedena wî, çika bê ew mor kê l' te da? Wextê mi ra çûbû îlac çima hate morkirinê? Tê bi wê mora wî va paşatîya vî şehîrî bikî? Hûnê sibê şîher temelden<sup>1735</sup> bihêlin, birevin.”

Dibê ku wezîr kurê xwe dexiste pişt perdê ku wextê jê siwal kir, dibê go:

“Erê, isa ne.”

Tabî nego, filankesê mor li me daye. Dibê [wezîr û wekîl] go:

“Em jî qebûl dikin.”

Dibê îja l' ser qebûlkirinê, dibê Mîrze Miheme ew rûsipî, ew heyeta paşê ye berê, dibê hemû kire rûsipî meznê dîvanê. Dibê qesrek ayrî<sup>1736</sup> bi wan ra da çêkirinê, qesra mezina, dîwana mezina. Dibê ya serpêsekinîya ayrî, ya aqilmenda ayrî. Dibê heyeteke di yaşê<sup>1737</sup> xwe da, gencê civane di yaşê xwe da; wezîr, wekîl, ji birê xwe bêjim, aqilmend qurmîş<sup>1738</sup> kir. Dibê çi ew heb'ya jî, dibê çîqa tolantî heb'ya, berê bi padşê [û] mezina danişmîş<sup>1739</sup> dibû paşê dizvirî wanê dinêna. Dibê li ser wê, dibê idî ku paşê berê xeraç dida, dibê xeraç jî neda.

Dibê îja Mîrze Miheme namek dexist, go:

“Îro şûn da em xeracê naxazin. Yanî bira eva j' tereffî ra be. Îro em zurbe ne, zor in, va her kesî ra dikarin em herbê bikin. Bira ew tiştê rabe. Bira xoşlixayî<sup>1740</sup> be, bira însanetî be, însan neyne kuştinê, qatlî'am nebin, evna nebin.”

Dibê her kesî qebûl kir. Yanî ew nama wî, ew pêşekariya wî ye pêşda dayî, dibê her kesî ew fikra

---

1733 ) Rast.

1734 ) Tiştê/a ku bêjim.

1735 ) Yekcar.

1736 ) Cuda.

1737 ) Temen, emr.

1738 ) Çêkiririn, sazkirin.

1739 ) Şêwirîn.

1740 ) Aramî, rihetî.

qebûl kir. Dibê ser wê jî dewam kirin heta belî bir sure<sup>1741</sup>.

Bi gotna me, me hinde bihîstîye, em hinde zanin. Yê dînlemîş<sup>1742</sup> kirye jî xwedê jê razî be. Yê anye ziman jî xwedê jê razî be, a birayê delal.

ÇÎROKBÊJ: SALHÊ HECÎ HEYDER

HERÊM: JI GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE/WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 52

PERWERDE: DIBISTANA SERETAYÎ

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 10/10/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]



---

1741 ) Wextekî diayrkirî.

1742 ) Guhdarîkirin.

## 18. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME [3]<sup>1743</sup>

Go, carekî paşak hebû. Efendimê xwe ra bêjim, bostanekî wî zehf rind hebû. Go, bostanê wî hebû. Efendimê xwe ra bêjim, bostanê wî hêşîn dibû, zemanê bostan dihat. Zîhak<sup>1744</sup> hebû, lê meselet<sup>1745</sup> dibû, lê dida hildişand. Erê. Lê dida, xira dikir. Rojekî, kurê wî yî mezin dibê:

“Bavo, ez ê herme ber bostan. Ez ê lê miqat bim.”

[Paşa] dibê:

“De baş e. Lawo, here.”

Diçe ber bostan. Bostanê wî tam [hêşîn bûye]. Bostan e, her tişt tê da heye. Hêşîn dibe. Hêşîn dibe, zemanê wî tê. Dêna xwe dayê, pilote ‘ewr derket. Zîhak lê derket. Efendim, xuroş bû, lê da bostanê wî carekî xilxirabe kir. Direve diçe, dibêje bavê xwe, dibê:

“Welle, a iha.”

[Paşa] dibê:

“Ê lawo, mi negote te tu nikarî.”

Kurê wî yî dinê ortê<sup>1746</sup>, ew dibê:

“Bavo, ez ê herim.”

[Paşa] dibê:

“Kurê mi, de here.”

Ew jî diçe. Efendim, bostan hêşîn dibe. Zemanê bostan tê. Ew zîha dîsa derdikeve, lê dixê hildişîne, xirxirave dike. Hemû xirav dike.

Dimîne. Navê yekî Mîrze Mihemed bûye. Birê wî yî piçûk bûye. Dibê:

“Bavo, ez ê îja herim.”

[Paşa] dibê:

“Kurê mi, herd<sup>1747</sup> birê te çûn ka çi kirin, îja ti herî?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Bavo, de ez ê herim. Idî çi dibe? Mi jî, hema xira bû bira xira be. Zaten zîha her sal lêdixê hildişîne. Bira îsal jî hilşîne.”

[Paşa] dibê:

“Ê baş e.”

Efendim, diçe zemanekî ber bostan dimîne. Qelpûzê<sup>1748</sup> wî heye. Qawûnê wî heye. Her tiştî wî

1743 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1744 ) Zîya, rawer, cinawir.

1745 ) Miselet.

1746 ) Navîn.

1747 ) Herdu.

1748 ) Zebeş.

[heye]. Tiriyê wî, her tişt wî tê da heye. Efendim, hêşîn dibe. Zemanê wî tê. Efendimê xwe ra bêjim, ew jî dizane zemanê wî were zîha yê were lêxe. Efendim, destê xwe diqelişîne, tijî xwêy dike, xewa wî nayê. Efendim, qurana xwe datîne, dixûne. Dibê:

“De ya illa, ya xwedê.”

Dêna xwe dayê, pilote<sup>1749</sup> ‘ewr çiyê derket. Efendim, ji ‘ewra derket. Efendimê xwe ra bêjim, xuroş bû. Efendimê xwe ra bêjim, wextê xuroş bû, were nêzkî bostîn be, ew jî ya illa ya xwedê dike. Tîra wî hebûye. Ça davêjê li kêleka zîhê dixê. Zîha gêrî<sup>1750</sup> vedigere. De, nikare lêxe.

Efendim, zîha diçe. Ew pey diçe. Zîha diçe. Kincê xwe davêje, sola xwe davêje. Efendim, diçe dêna xwe didê, diçe rasteke nota<sup>1751</sup> wê rasta<sup>1752</sup> ewê [Bayîzdaxa]. Dêna xwe didê, beraşekî aşa li wir e. Xûna wî hetanî wira çûye. Efendim, zîha li wir da dikeve xarê. Efendim, jor da dikeve xarê. Ew jî diçe. Dêna xwe didê, heqeten kûlek<sup>1753</sup> e. Zîha çû kete hundir. Vedigere tê.

Sibê zû şeveqê cab diçe paşê, dibê:

“Welle, paşa xaş be. Bostanê te tişte pê nehat!”

Sinîkî tijî her bêşeyî dike. Qawûn be, qelpûz be, tirî be, tijî dike. Tîne dîwana bavê xwe, dibê:

“Efendim, welle zîha hatibû. Mi lêda zîha kuşt. Zîha gêrî zivirî çû. Efendimê xwe ra bêjim, bostan mi nehîştîye [xirav bike].”

Şahî dikeve nava milletî wî, dibê:

“Elhemdilîla, lêda zîha kuşt.”

[Mîrze Miheme] dibêje bavê xwe da, dibê:

“Bavo, yalniz<sup>1754</sup> ez ê pey zîhê herim.”

[Paşa] dibê:

“Kurkê mi, were neçe.”

Mîrze Miheme dibêje bavê xwe, dibê:

“Herd birê mi jî bide min.”

[Paşa] dibê:

“Kurkê mi, însanê niha bêbext e. Neçe. Zîha, te lê daye.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Bavo, îja zîha zeman were, pak be, yê were me bikuje.”

Herd birê xwe [hildide]. Ew jî dine pey. Diçin, diçin. Wê rastê, dêna xwe dayê, beraşekî aşa li wir e. [Mîrze Miheme] dibêje birê xwe:

---

1749 ) Hinek, piçek, komek.

1750 ) Paşde, şûnde.

1751 ) Mîna.

1752 ) Deyşt, deşt.

1753 ) Şikeft.

1754 ) Lê, lê belê.



“Bira, de dest bavêjne wî beraşî hildin. Em ê wir da bikevnê.”

Dikin nakin nikarin, da. Beraş mezin e. Ew jî dest davêjê. Beraş wê da dike, dibê:

“Yalniz, bira, de îja hema kûle ye. Em ê werîs be, heke qet be, çî be, em ê bavêjne nava hev, bavêjne nava we yekî, carê yek we here hindir. Em belkî diçin zîhê dikujin.”

Wextê hinekî dadixe [birayê wî] dibê:

“Wî wî wî, boy xwedê be! Ez şewitîm! Mi hilkşînin!”

Ewî jî hildikşînin. Yê dinê jî ‘eynî isa dikin. Ew jî ‘eynî ye. Mîrze Miheme dibêje, dibê:

“Yalniz, mi daxin. Mi çîqa go, e şewitîm, hûn mi [berdin] ez ê bikevme kûlê.”

Çîqa dibê, dadixin. Diçe. Efendim, de dunya ew e. Diçe dêna xwe dayê, efendim, diçê dêna xwe didê, kûlek e. Wira, sê hev jin li wir in. Sê hev qîz in, dibê:

“Heyyy! Mala te nekeve! Tu ça hatî? Zîha birîndar bûye. Zîha, niha rabe yê te jî bikuje, me jî bikuje!”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ê welle, idî ez hatim. Welle, mi lêdaye zîha birîndar kirye. Yalniz<sup>1755</sup>, ez pey zîhê hatime.”

[Her sê qîz] dibê:

“Welle, zîha hatye. Kûla xwe da ketye. Nalenala wî ye. Yalniz, bide xatrê xwedê, xwe mihafîze bike. Yê te bikuje!”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ê baş e. Ya illa, ya xwedê.”

Her sê qîzka ra dibêje, dibê:

“Hûn çîyê hev in?”

[Her sê qîzik] dibê:

“Em hersêk jî xûşkê hev in. Zîhê, em anîne vira. Zîhê, em anîne kirine vê derê.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ê baş e.”

Efendimê xwe ra bêjim, radibe. Wira ra diçê, dibê:

“Bi îzna xwedê, ez ê lêxim zîhê bikujim.”

Wextê diçe, dêna xwe didê, zîha ketye. Lingê xwe li lingê zîhê dixê, dibê:

“Kopek<sup>1756</sup>, rabe.”

Wextê çehvê xwe vedike, dibê:

“Heyyy Mîrze Miheme!”

Zîha nas dike, dibê:

“Mîrze Miheme, ez ê te lêxim bikujim. Ti ketî kûlê. Te ez birîndar kirime.”

---

1755 ) Lê, lê belê.

1756 ) Kûçik, se.

Hevt beraşê aşa bûye, çi bûye, wextê davêjê, Mîrze Miheme xwe dide alîkî. Lê naxe. Ya illa ya xwedê dike, şûrekî orta<sup>1757</sup> milê wî dixê. Lê dixê.

[Zîha] dibê:

“Yeke din jî lêxe.”

Lê ewna dibêjin, ew jinana dibêjin, dibê:

“Tu du cara lêxî yê sax be. Yê sax be, idî tu pê nikarî. Wê te bikuje. Yek derbî lêxe.”

Wextê derbekî lê dixê, zîha dibê:

“Yeke din jî li min xe.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Na. Qirarê mala me derb e.”

Zîha, wira ‘işk<sup>1758</sup> dibe. Efendimê xwe ra bêjim, jinik tên. De wusa bedew in. Zêr zîv zehf in.

[Mîrze Miheme] dibêje birê xwe, dibê:

“Sebeta daxin. Ez ê vana [van hersê qîzana derxime jorê].”

Zêr zîva dikşîne. [Mîrze Miheme] dibêje birê xwe, dibê:

“Yalniz, de cake<sup>1759</sup> dinê daxê. Em sê hev in, her yekî me yek. Ya piçûk mi ra. De, ayrî ayrî<sup>1760</sup>.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Eva birê min ê mezin ra. Eva birê min ê ortê<sup>1761</sup> ra. Eva ya piçûk min ra.”

Ew, birê piçûk e. Wextê dadixin, wextê sebeta xwe dadixin, derdikevin dêna xwe dinê, şemala wan bîrê girt. Ewê derdixin. Ya dinê jî derdixin. Herdika derdixin. Jina wî ye piçûk dibêjê, dibê:

“Filankes, aha ez her<sup>1762</sup> xûşkê xwe rindtir im. Tu here. Paşê sebetê daxê ez bikevmê. ‘Ewil tu here. Paşê, sebetê tu daxê ez ê bikevme sebetê werim.’”

[Mîrze Miheme] dibêje:

“Na. Îmkan tine. Ez ça tê bihêlim? Ez ça berê ‘ewil derdevim?’”

[Qîzik] dibê:

“Binhêre. Îja ez weysetê xwe te ra bêjim. Ez hemûşka bedewtir im. Yalniz, birê te yê te [ra] qelpiyê bikin. Wê te bîrê da bihêlin. Yalniz, herd guhê ewê jê ke, guhê zîha jê ke. Îja hemî ez dizanim yê te bîrê da bihêlin. Îja ez te ra bêjim. Kanîk heye, li vira ye. Roja cim’ê, beranekî reş heye, yekî qerqaş heye, li hev dixin. Wusa hev dixin, isa hev dixin. Tê avê duxwin. Dîsa hev dixin. Wusa hev dixin. Yê reş, qerqaş dibe. Yê qerqaş, reş dibe. Tu ketî, xwe bavêje ser yê qerqaş. Îzna xwedê, tê derkevî dunya [rehnayî]. Hemî wê te bîrê da bihêlin.”

---

1757 ) Nav.

1758 ) Sekitîn.

1759 ) Careke din, dîsa.

1760 ) Cuda cuda.

1761 ) Navîn.

1762 ) Herdu.

[Mîrze Miheme] dibê:

“De baş e.”

Wextê dadixe, idî dike nake pê nikare. Îja wextê jinik derdikeve, dêna xwe dine şemala wê, herd xûşkê xwe rindtir e. [Birayên wî] dibê:

“Welle, birê me, me ra qelptiyê dike. Ya rind xwe ra hîştîye. Herdikê dinê dane me.”

Efendim, [Mîrze Miheme] dibê:

“De daxe.”

Wextê dadixe, birê wî dibê, dibê:

“Bihêle. Em ê ewî birê da [bihêlin].”

Wextê nêzkaya derkeve, kêrê davêjnê, Mîrze Miheme bîrê da dimîne. Yalniz, [qîzik] dibêjê, dibê:

“Hine peyn wê derê, qulçekî ye. Ewî qulçî veroje. Tê berjêr bî. Derîkî piçûk heye wira. Kilîtek jî heye. Kilîtek nav rîyê ewê da ne, zîhê da ne. Yalniz, ewê kilîte ewî derî xî, beranê wî çaxî derên. Yekî reş e, yekî qerqaş e. Wê li hev xin. Xwe bavêje ser yê qerqaş. Tê derkevî dunya rehnayî.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“De baş e.”

Efendimê xwe ra bêjim, wextê nêzkaya derdikeve, kêrê davêjê, bîrê da dimîne. Evana diçin. Idî bira ew bîrê da bimîne. Hewarî diçe bavê wî ra, dibê:

“Welle, Mîrze Miheme çehv zîhê ketye, bi’ecîye, bîrê da maye.”

Jina wî ça dike? Jina wî tê. Niha wextê jinik tê, kêreke çatme, fincaneke jehrê dide destê xwe. Dikeve odekî, dibê:

“Heta çil şevî kê ser mi da were, ez ê kêra çatmê li zikê xwe dim, fincana jehrê li ser xwe da kim. Bira kes ser mi da neyê.”

Ewna diçin. Jinê xwe dibin. Efendimê xwe ra bêjim, Mîrze Mihemedê te bîrê da dimîne. Mîrze Miheme diçê. Wê ewkê [qulçî] iha vedide, ewk dike. Dêna xwe didê, derîkî piçûk wir derket. Kilîte li dêrî dixê. Dêna xwe dayê, kanîk e. De roja cum’ê isa dike. Dêna xwe didê, du hev beran derketin. Beranekî reş e, yekî qerqaş e. Avê duxwin. Li ser wê [avê], wê derê li hev dixin. Isa li hev dixin, isa li hev dixin, isa li hev dixin... Yê reş, qerqaş dibe, yê qerqaş jî reş dibe.

[Mîrze Miheme] xwe şaş dike. Xwe davêje ser yê reş. Hevt tebeqa diçe binê ‘erdê. Erê. Diçe, dêna xwe didê. Diçe. Wextê diçe, diçe binê ‘erdê, efendimê xwe ra bêjim, çehvê xwe vedike. Dunya tarî ye. Diçe. Êvar tê. Rastî malekî tê. Dêna xwe didê, pîrek li ber derî ye. Diçe nêvanê pîrê. [Dibê]:

“Selam ‘elêkim.”

Wira, gazî pîrê dike, dibê:

“Pîrê, tu nêvana xweyî dikî, xweyî nakî?”

[Pîrê] dibê:

“Welle, nêvan, cîyê mi tine.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Mi xweyî ke, ez ê pera bime te. Zêr hene, ez ê zêrekî bime te. Here, nivîna xwe ra jî bîne mi ra jî bîne. Yêmek<sup>1763</sup> xwe ra jî bîne, mi ra jî.”

Pîrê lotika dide xwe. Efendim, pîre diçe. Efendim, kalorya tîne, nivîna tîne, nan tîne. Efendim, datîne wira. Efendimê xwe ra bêjim, herdik duxwin, nanê xwe duxwin. Êvar tê. (Mîrze Miheme) dibêje, dibê:

“Dayka pîr.”

[Pîrê] dibê:

“Ha.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ez wusa tî me. Ez tî me, dayka pîr.”

De, av tine bûye. Zîha dikeve ber ewê [ava] wana. Dayka pîr jî metel dimîne. Av tine bidê. Heşa, diçe dimîze. Avê tîne didê. Duxwe, dibê:

“Dayîka pîr, ev av çîqa şor bûye.”

[Pîrê] dibê:

“Kurkê min, îja çî te veşêrim çî xwedê veşêrim. Te av xast. Av tine bû. Av tine. Heşa, mi mîstîye, mi anye daye te. Yalniz, zîhak heye. Zîha dikeve ber ava me. Heft roja carekî; qîzekî, heft ‘erebê ga yîyecek<sup>1764</sup>, du ga, nizanîm çî çî, qîzekî dine ser. Zîha duxwe, hûf dike. Paşê xwe dide alîkî, av tê. Em ava xwe hildidin heftêkî carekî.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Wusa?”

[Pîrê] dibê:

“Erê welle.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e. Xwedê mezin e.”

Şûrekî wî jî hebûye. Xalqê ‘alemê isa hiz dike, şûrê wî jî pê ra ne. Dibê:

“Xwedê hiz ke, sibê dor dora mi zîha ye.”

Tê. Efendim, dêna xwe didê, ‘erebe wêda hat. Efendim, heft ewk birinc çêkirine, heft sîtil birinc e. Efendimê xwe ra bêjim, heft-heyşt pêz e, şerjê kirine. Efendimê xwe ra bêjim, ewa qîzka jî dane ser. Zîha yê wê buxwe. Dane ser pêşya ewê [‘erebê], diçe.

Ew çî dike? Ew, hema wextê ‘erebe rê dikevin, ‘erebê wî çaxî ‘erebê ga bûne, hema li ‘erebê sîyar dibe. Efendim, nan duxwe, goşt duxwe, birinc duxwe.

---

1763 ) Xurek, zad.

1764 ) Xwarin.

Qîzik dibê:

“Tu duxwî. Zîha yê te jî buxwe, mi jî buxwe. Barî<sup>1765</sup> bira mi buxwe. Tu genc î. Bira te nexwe.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Na. Bi îzna xwedê, ez ê zîhê bikujim.”

Wextê diçe, efendim, zîha dêna xwe dayê, du meriv hatin. Şa dibe, da. Zîha li ber avê derdikeve. Wextê derdikeve, ew şûrê xwe dide ber nehtika xwe. Wextê ew [zîha] ûf dike, hema isaa şûr dikeve hindirê wî, lêdixe dixê du qeta. Qetekî ha<sup>1766</sup> davêje, yekî ha davêje.

Pêşya avê vedibe. Wextê vedibe, de tarî ye, ew pîslika<sup>1767</sup> wî [zîhê] millet avê hildide. Wextê cab tê paşê ra, dibê:

“Paşa xaş be, nîvê memleketê te av hilda, ziherleme<sup>1768</sup> ye, hemû hate kuştinê.”

Qîzik ça dike? Qîzik, wextê ew lêdixe zîha dikuje, qîzik jî hema peya dibe. Destê xwe iha tijî ew dike, li xûna zîha dixê, nava milê wî dixê. Çakêfî wî hildide, nava milê wî dixê. Efendimê xwe ra bêjim, diçe. Cab paşê ra diçe. Qîzik direve diçe, dibê:

“Welle, merivekî hat li zîha (xist), kuşt. Welle, ez jî xilas bûm.”

Paşa hêrsa xwe lê tîne, dibê:

“Dêlê, Tu çûyî. Tu revî hatî. Zîha jî yê şehre mi ret<sup>1769</sup> ke.”

Cab paşê ra diçe, dibê:

“Paşa xaş be, avê nîvê şehre te xirav kir. Av isa tê!”

Paşa tê. Heqeten, dêna xwe didê, (wisa ye). Du roj, sê roj dimîne. Dibê sibê zû, defa hewarê dixê, dibê:

“Ew kîjan e lê daye zîha kuştîye, ez ê qîza xwe bimê.”

Kurê wekîl dibê:

“Mi kuştîye.”

Kurê wezîr dibê:

“Mi kuştîye.”

Ew [qîzik] dizane. Defa hewarê dixê, dibê:

“Millet bira were. Berav<sup>1770</sup> be.”

Qîzik dibê:

“Ez dizanim kê ye.”

Qîzik nas dike, dibê:

---

1765 ) Qet nebe.

1766 ) Wiha.

1767 ) Gemar.

1768 ) Jehrevîbûn.

1769 ) Xilaskirin, kutakirin.

1770 ) Berhev.

“Merivekî dinê ye. Ev nînin. Nîşana mi lê heye. Ew meriv çawa were ez ê nas kim.”

Dibê:

“Kê maye?”

Dibê:

“Kurê pîrê maye, ewî hatye nêvanê pîrê.”

Gazî dîkinê. Çawa tê, [qîzik] çakê wî radike, dibê:

“A bavo, a nîşana mi hova<sup>1771</sup> ye. Mi çawa destê xwe xûna zîhê daye, piştê da daye, kifş e. A ew meriva ye.”

[Paşa] gazî dike, dibê:

“Bixaze mirazê xwe. Tu çi bixazî, dinê da ti çi bixazî ez ê bime te. Qîza xwe ez ê bime te.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Paşa xaş be, welle, dinê da ez qîzikê jî hilnadim. Yalnız, tê mi derxî dunya rehnayî.”

[Paşa] dibê:

“Heyyy, mala xira be! Ka ez ê te çawa derxime dunya rehnayî? Xazila heft sala jî iha bûya, te eva negota. Yalnız, ez ehdkar im. Mi gotye, kê lêxe zîhê bîkujê, ew çi bixaze ez ê bimê.”

[Paşa] radibe, dibê:

“Tu dizanî tê çawa bikî?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Çawa b'kim?”

[Paşa] dibê:

“Teyrê Sîmirr heye. Zîha jî, zîha hevt sal e, (wextê ku) cûckê wê givrik dibin, zîha tê cûckê wê duxwe. Heger ew te xilas ke. Welle, ez te nikarim xilas kim. Dunya tarî, ka ez ê ku ra te derxime dunya rehnayî?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Ê baş e.”

Efendimê xwe ra bêjim, diçe. Zemanê wî tê. Efendim xwe ra bêjim, wextê diçe, diçe dena xwe dayê, cûcîk çehv pê dikevin, hey dizanin, cûcîk hey dizanin ew zîha ye. [Mîrze Miheme] qasekî dimîne. Dêna xwe didê, zîha jor da hat. Wextê tê, lê dixê, zîhê dîkujê. Teyrê Sîmirr jî çûye. Wextê dixê du qeta, lê dixê dîkujê, efendimê xwe ra bêjim, ew parçe goşt-moştê wî davêje ber cûcîka cûcîk duxwin. De ew radizê. Cûcîk jî perkê xwe vedikin. Ew meriva bin sîha wan da radizê. Wextê Teyrê Sîmirr tê, lê bixê bîkujê, cûckê wê dibê:

“Bide boy xatirê xwedê, yê em xilaskirye, zîha hatye, evî em xilas kirine.”

Wextê ew radibe, dêna xwe didê, heqeten, lêdane zîha kuştine. Ew jî perê xwe vedike, efendimê xwe ra bêjim, sîh didê. Ew radizê. Tam radizê. Hişyar dibe. [Teyrê Sîmirr] dibê:

---

1771 ) Li vir, li vir e.

“Filankes, bixaze mirazê xwe.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Mirazê mi ew e, tu mi derxî dunya rehnayî.”

[Teyrê Sîmirr] dibê:

“Hey mala te neşewite! Ka ez ê te ça derxime dunya rehnayî? Xazila heft sala jî zîhê cûckê mi bixara te ev yeka nekira. Lê ez ehdkar im. Here, heft meşk av, heft dûva bîne. Idî ez kal im, pîr im. Îzna xwedê, ez ê te derxime dunya rehnayî.”

Tê, dibêje paşayî. Paşa dibê:

“Ez ê bime te. Heft dûv çi ne?”

Efendim, heft meşk av, heft dûva dibe. [Teyrê Sîmirr] dibê:

“Yalniz, tê pišta mi sîyar bî. Wextê mi firqaz da xwe, tê dûvekî bavêjî devê min, meşke av ser da kî, heta mi tu derxistî dunya rehnayî.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

Efendimê xwe ra bêjim, tê li ser pišta wî sîyar dibe. Wextê firqaz dide xwe, ew dûvekî davêje devê wî, meşkek av ser da dike. Wextê nêzkaya idî derkeve dunya rehnayî, Mîrze Miheme ça dike, wextê didê dûvek dikeve ‘erdê. Dikeve ‘erdê.

Ew, ça dike? Ew jî hema kêrê hildide, li hêta xwe [dixe] jê dike. Davêje devê wî, meşkê ser da dike. Derdikeve dunya rehnayî, [Teyrê Sîmirr] dibêje:

“Mîrze Miheme, de îja hereket ke here.”

Dibêje teyr, dibêje Teyrê Sîmirr, dibê:

“Tê herî, paşê ez ê herim.”

[Teyrê Sîmirr] dibê:

“Na. Kurkê mi, îsanê xam, îsanê niha ew e. Te [hêta xwe] biavîta devê mi jî min ê tu derxistayî, te neavîta devê mi jî. Erê, mi dît destê te da ketye. Te îja çima hêta xwe jêkirye? A hova<sup>1772</sup> bin zimanê mi da. Mi goştê te nexariye.”

Ewk dike, pê va datîne. [Teyrê Sîmirr] dibê:

“Yalniz<sup>1773</sup> du perkê mi jî bihere. Bavê te, cîya te isa giryane herd jî kor bûne. Yalniz, van perkê mi tu biherî, bavê te cîya te çehvê xwe xin, herdikê jî yê bibne xortê çardasalî. Yalniz, jina te hê mêt nekiryê. Idî hema çil şevê wê jî hindik maye tamam be, xwe bikuje idî. Yalniz, evê gustîlê bihere. Meriv hat te dîtin, gustîlê nîşan de, bira cabê bine jina te, kulfeta te.”

Wextê diçe, dêna xwe didê, merivek cot dike. Diçe. Nas dike, da. Cotkar, wî ça nas dike. [Cotkar dike ku] bireve, gazî cotkarî dike, dibê:

1772 ) Peyveke taybet e ku li Ebexê tê bikaranîn bi menaya ku ‘li vir e, li vê derê ye’.

1773 ) Lê, lê belê.

“Evê gustîla min bihere. Xanima mi heye. Tê nîşanî wê xî, belkî tiştêkî neyne serê xwe.”

Wextê diçê, heqeten isa ne. Diçê, dêna xwe dayê, xanim idî hema koşka xwe ewk lêdaye, lêxe xwe bikuje. [Cotkar] dibêje xanimê:

“Dûr nîne, nêzîk e. Eva gustîl gustîla wî ye.”

Wextê nîşan dixê, dêna xwe didê, heqeten isa ne. Idî xwe nakuje. Cab bavê wî ra diçe. Tê. Tê, hela diçe dîwana bavê xwe. Dêna xwe didê, çi? Bavê wî kor bûye. Cîya wî kor bûye. Heqa giryanê. Emrê xwedê, tîne perika avê da dike, çehvê wan dixê. Çehvê herdka jî silamet dibin. Dîsa têne ser heyama xwe ye berê.

Ew çû mirazê xwe şa bûn. Hûn jî herin mirazê xwe şa bin.

ÇÎROKBÊJ: KEMALÊ XELKÊ SARÎCÊ

HERÊM: JI GUNDÊ SARÎCÊ [EBEXE-WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 71

PERWERDE: NEXWENDE

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 05/10/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]



## 19. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME, GOZEL DUNYAYÊ<sup>1774</sup>

Ez ê we te ra Çîroka Gozel Dunyayê bêjim. Dibê hebû carek cara, rehme li dêbavê guhdara, hazira w cima'etê, me tevayî be.

Dibê hebû du hev bira, herd<sup>1775</sup> bira jî dibê padişah bûn. Dibê navê yekî Hesen bû, navê yekî Huseyn bû. Dibê Hesen Husên, dibê yek padşayê ku wê dewrê, em bê, yek padşayê Misrê bûye, yek paşayê Helebê bûye.

Dibê zeman di arê ra derbas dibe. Dibê navê yekî Hesen bûye, navê yekî Huseyn bûye, navê herd paşa, herd bira. Dibê Hesen birayê mezin bûye.

Hesen radibe xanima xwe hildide diçe mêvandarîya Husên. Ji Misrê diçe Suryeyê, diçe Helebê mêvandarîya birayê xwe. Dibê wextê diçin xwe ra mêvandarîya birayê xwe, de îja berê rêwîtiya wî wextî bi kewranvanî bûye, bi bazirganî bûye, bi sîyarê hespa bûne, deva bûne. Rêwîti bi wî şertî çêb'ye. Dibê îja wextê derdikeve şehre birayê xwe, caw<sup>1776</sup> ji birayê wî ra diçe, pêş da namedarê xwe dişîne.

Dibê birayê wî derdikeve. Heyetekî hildide bi esker bi giregir bi rûsipî bi toren qarşilamîş<sup>1777</sup> dike, tê. Dibê hildine mala xwe. Dibê heftêk, deh ro [derbas dibe]. Dibê birayê piçûk, Husên, dibêje Hesen, dibêje abê xwe dibê:

“Bira, yawo, em herd jî padişah in. Yalniz<sup>1778</sup>, em herd jî bêzuryet in. Xwedê te'ala hê zar nedaye me.”

Hesen dibê:

“Wellehî, jina mi, bira, bihemle ye. Ema, zarik xwedê çi bide, e nizanim xwedê zane.”

Husên dibê:

“Eger jina te welidî xwedê te'ala kur dayê, ku zeman da zar ji jina mi çêbûn qîz be, ez ê jî qîza xwe bime kurê te. Jina te qîz anî ku jina mi kur anî, bira, tê qîza xwe bidî kurê mi. Hîç olmasa<sup>1779</sup>, en azinda<sup>1780</sup> ev saltanatê me dewam bike. Yanî varîyeta me nekeve destê xelqê.”

Hesen dibê:

“Baş e.”

Dibê tabî dayîna xwedê te'ala ra rehma xwedê zehf e, ser 'erd û 'esman tev tijî dike. Dibê sal hatin, meh buhurîn, zeman derbas bû. Dibê jina Hesen, zeman hat doxim<sup>1781</sup> kir. Xwedê te'ala

---

1774 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1775 ) Herdu.

1776 ) Cab, xeber.

1777 ) Pêşwazî kirin.

1778 ) Lê, lê belê, bes.

1779 ) Qet nebe, qe nebe.

1780 ) Qet nebe, qe nebe.

1781 ) Welidîn, zayîn, razan.

ewladekî kurîn dayê. Dibê Hesên navê evladê xwe lêkir Mîrze Miheme. Dibê Hesên navê wî lêkir Mîrze Miheme. Dibê zeman di arê ra derbas bû, jina Huseyn jî bihemle ma. Xwedê te'ala evladeke qîzîn dayê, ewî navê qîza xwe lêkir Fatma.

Dibê Mîrze Miheme deh danzde salî bû, bavê wî dunya xwe degîş kir. Xwedê te'ala êşek lê peyda kir, dunya xwe degîş kir. Xwedê te'ala rehma xwe li ometê bike, li dê bavê me, wî 'evdî jî. Dibê Mîrze Miheme panzde, şanzde, bîst sal 'emrê wî ye. De di şehrê wî da dibê gencê di yaşê<sup>1782</sup> wî da kes ji boy wî nazewice. Paşatîya xwe dewam dike 'eynî heyeta bavê xwe bi dem dezga. Dibê rojekî meznê wî, giregirê wî, dibê l' hev top bûn, go:

“Em ji Mîrze Miheme ra evê xebera hanê bêjin ka gotna wî çî ye?”

Dibê rûsipîkî wî go:

“En îyîsî<sup>1783</sup> em ê bêjne dîya wî. Gotna dê ji ya me elzemtir e. Bira dîya wî jê ra bêje ka gotna wî dibe çî, îja em ê bêjnê.”

Dibê dîya wî ra gotin. Dibê dîya wî go:

“Hûn tişteki zehf rind dibêjin. Tabî gotin jî ya we ye. Ez jî 'eyne ser fikra we me. Yaniz<sup>1784</sup>, di dîrokê da ara<sup>1785</sup> bavê wî d' apê wî da sozek heye. Ez jî şahidê wî sozî me. Meseleke a wiha çêbûye. Ez ê jî jê bêjim, hûn jî jê ra bîne ziman. Heqê we jî heye, heqê mi jî heye.”

Dîya wî jê ra dibêje, dibê:

“Kurê mi, di filan tarîhê<sup>1786</sup> da tu di hemla mi da bûyî, rehmetîyê bavê te heb'ye, me serî l' apê te da ye, em bûne mêvanê apê te, apê te w bavê te sozekî a wiha dane hev. Niha qîzapa te jî te beglemîş<sup>1787</sup> dike. Ê şehrê te da jî gencê yaşê<sup>1788</sup> te seda însan hene. Kes ji boy te, te ra saygî<sup>1789</sup>-hurmetekî digrin, hurmeta bavê te hê heye, nazewice. Gerekî tu pêşya wan însana jî bidî vekirinê, bi xwe ra jî karekî bikî.”

Ji dîwanê ra jî cîya wî evî tîne ziman. Her kes ser fikra dîya wî dibne heq sahibî, dibê:

“Gotin ya te ye.”

Mîrze Miheme dibê:

“Dayê, de ji boy rêwîtiyê me ra xarin vexarinê tevdîr bike.”

Seyîsekî wî heb'ye, navê seyîsê wî jî 'Elo bûye. Seyîs reş bûye, xwedê te'ala jî wisa çêkirye qelema wî. Dibê wextê ew j' cîya xwe ra dibêje, sibetirê jî dibêje 'Elo, dibê:

“ 'Elo, ji xanima xwe ra bêje bira karê xarin vexarinê j' te ra bike. Em ê rêwîtiyê herin.”

---

1782 ) Temen, emir.

1783 ) A/ya baş, a/ya qenc, a/ya rast, a/ya dirust.

1784 ) Lê, lê belê.

1785 ) Nav, navber.

1786 ) Wext, dem, zeman.

1787 ) Li hêviyê li bendê sekinîn.

1788 ) Temen, emir.

1789 ) Qedir, rêz, hurmet.

[‘Elo] dibê:

“Baş e.”

Dibê de îja Mîrze Miheme padşahê şîher e, dîfîye, zengîn e, dewletîmend e, çi bêjî di malê heye. Dîya wî her tiştî ji boy wî kar dike. Dibê navmalî [‘Elo] jî ji jina xwe ra dibêje, dibê:

“Te çi ku çêkir, çi danî, tê di xwêy da çêkî. Bira isa şor be, yanî kar<sup>1790</sup> be.”

Dibê wextê subê zû ku rê kevin, de Mîrze Miheme mêrkî padşaye, dibê hespê wî kişandin. Li hespê xwe sîyar bû. Şûr gurzê xwe girê da. Ayni zaman da<sup>1791</sup> jî pehlîvan bûye. Dibê ku deve, xarin vexarina wan jî ‘Elo bar kir, xulamê wî seyîsî wî. Dibê evna rê ketin, çûn. Du sê sîyar hilda ser xwe. Dibê sîyara şîher derxist, dibê Mîrze Miheme go:

“Heyran, hûn vegezin. Ez van însana çima yormîş<sup>1792</sup> kim? Heqê mi jî tune. Hûn vegezne şîher, miqate bin, sahib derkevin heta ez tîm.”

Dibê evna qederekî baya<sup>1793</sup> çûn. Dibê Mîrze Miheme gote seyîs, gote ‘Elo, go:

“Filankesî, cîkî ku av [lê hebe em lê bisekinin]. Em jî bêna xwe bistînin. Bira ev heywana jî hinekî dînlenmîş<sup>1794</sup> bin. Em parî xarin jî bikin. Em ê îja rabin hereket kin.”

[‘Elo] go:

“Baş e, axayê min.”

Dibê wextê derê malê ku anîn xarin-vexarina wana danîn, dibê ‘Elo xarin-vexarina ku j’ mala wî hatibû, dibê kire heyba Mîrze Miheme, kire xurca wî. Ya ku dîya Mîrze Miheme arîkarî kiribû ji boy Mîrze Miheme, xarin-vexarina boy wî [û] ‘Elo, ‘Eloyê tabî rê da tevî wî buxwe, dibê ‘Elo ew jî hilda da ser piştê hespê xwe.

Dibê evna wextê qederekî çûn, dibê ‘Elo cîkî av sekinîn. Dibê ‘Elo pêşda diçe, sekinî. Mîrze Miheme hat ji boy wî sekinî. Dibê ‘Elo go:

“Paşayê mi, em si’etekî l’ ser vê avê bisekinin.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê hespê xwe tewilandin, rûniştin. Dibê Mîrze Miheme des-serçehvê xwe şûşt, ‘Elo jî şûşt. Go:

“ ‘Elo, de xarina me bîne.”

Dibê ‘Elo nanê xwe anî danî pêşya Mîrze Miheme, xurcika Mîrze Miheme [ya ku] xarna wî ye tê da, dibê ew jî hilda çû pênc şeş mêtira wî wêdatir rûnişt. Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Kuro ‘Elo, ez tu em tenê ne. Kuro, were vira cem mi rûnê. Em tev nan buxin. Em hevalê hev in.”

Dibê go:

---

1790 ) ?

1791 ) Di heman wextê de.

1792 ) Westandin, betilandin, mandî kirin.

1793 ) Zehf, zêde, pir, gelek.

1794 ) Bêhn dan, vehesîn.

“Paşayê mi, beke<sup>1795</sup> bîzê te neçe mi, dibe ya. Tu nanê xwe buxwe, ez ê jî nanê xwe buxum. Beke jinka mi feqîr e goreyê wê karê mi kirye, bîzê te neçe destê wê tu nanê wê buxwî.”

Dibê Mîrze Miheme duşmîş<sup>1796</sup> bû, go:

“Ê baş e. Tu hema ça dibêjî bira gotna te be.”

Dibê Mîrze Miheme wextê nan vekir, nan danî ‘erdê, yawo, qotek nan xar, nan ji şorayî nan nayê xarinê! Xwêyê ye xwêy! Ê şerm dike bêje ‘Elo jî bê, ‘Elo nanê mi şor e, were em tev xarinê bikin. Dibê ‘Elo jî wê derê, sifra Mîrze Miheme ra hatye danînê, dibê nanê xwe da pêşya xwe têr xar. Dibê Mîrze Miheme çend qot nanê şor xar, birçî. Dibê nan nayê xarin.

Dibê rabûn sîyar bûn. Dibê ‘Elo ‘eyne l’ terketiya wana nanê wî l’ terketiya wî girêda, xurca wî. Ya xwe jî terketiya xwe girêda. Dibê evna sîyar bûn çûn.

Birayê min, de îja niha bi zar zimana ye, wî çaxî bi sal zemana bûye. Roja niha ku roya niha derbas dibe roj ‘eyne roj e. Yalnız<sup>1797</sup>, zeman ne zeman e. Ku zemanê wî wextî ku arîkarîya wî wextî ya niha ne yek e. Karê wî wextî yê niha jî ne yek in.

Dibê evna ku qederekî baya<sup>1798</sup> çûn. Şev kete ser vana, ev sekinîn. Dibê sube zelal bû. Evna cake<sup>1799</sup> sîyar bûn. Dibê de îja bolga<sup>1800</sup> ew lê, bîr hebûne. Yanî ku dîrokê da ewê ev anîne ziman ‘eyne bi vî şeklî gotine. Bîr hebûne. Av ji bîra hildane. Pê ihtîyacê xwe dîtine li wan bolga. Dibê Mîrze Miheme zehf tî dibe. Ro, qama ara<sup>1801</sup> nîvro ‘esrê bûye, dibê:

“ ‘Elo, li cîkî bîr hebin bisekine. Hem ez zehf tî me, hem jî bira eva heyvana avê buxin<sup>1802</sup>. Em jî hinekî bêna xwe bidin. Em ê cake<sup>1803</sup> rabin sîyar bin herin.”

[‘Elo] dibê:

“Baş e, Mîrze Miheme.”

Evna qederekî diçin dengî du bîra tîn. Bîrekî da av tune bûye. Bîrekî da jî av heb’ye, zehf kûr bûye. Mîrze Miheme dibê:

“ ‘Elo, peyayî bîrê be avê me ra dexe. Tê bikevî bîrê avê ji me ra dexî.”

[‘Elo] dibê:

“Mîrze Miheme, ku ez bikevme bîrê îja ez ê şertekî bikevmê. Ez tî nînim, tu tî yî. Ez beke<sup>1804</sup> qe avê jî nexum. Şertê min ev e; tê kincê xwe, şûr gurzê xwe bidî min ez ê bikevmê. Tu nedî ez

---

1795 ) Dibe ku,

1796 ) Fikirîn.

1797 ) Lê, lê belê.

1798 ) Zehf, zêde, gelek, pir.

1799 ) Dîsa, careke din.

1800 ) Der, dever, cih, herêm.

1801 ) Nav, navber.

1802 ) Li Ebexê û li derdorê Ebexê bo vexwarina tiştên şilemenî li dewsa lêkera ‘vexwarin’ê lêkera ‘xwarin’ê tê bikaranîn.

1803 ) Dîsa, careke din.

1804 ) Dibe ku,

nakevmê.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Kuro ‘Elo, kuro ez padşahê te, kuro tu seyîsê hespê min! Kuro, ev kirin in tu tînî ji mi ra vana dibêjî? Kuro, iha ser terketiya hespê pênc-şes qat kinc heye. Kîjanê dilê te dixaze ewê xwe ke.”

[‘Elo] dibê:

“Ê baş e. Ew jî ez qebûl dikim.”

Ser piştta hespê xwe, Mîrze Miheme taxime kinc vedike dide ser piştta hespê wî. Şûr gurzê nadê, dibê:

“De bikeve bîrê.”

‘Elo dikeve bîrê, avê derdixe. Avê derdiexe. Avê berê dine heywanê xwe. Paşê jî bi xwe avê duxin<sup>1805</sup>. ‘Elo hildikşe ji bîrê derdikeye. Rûdinên, qederekî bêna xwe distînin. Nan tînin. ‘Elo cake nanê xwe tîne datîne pêşya wî. Mîrze Miheme çend qot nanê şor duxwe. ‘Elo dîsa nanê Mîrze Miheme, nanê dayka wî jê ra danye, dewam dike.

Evna radibin sîyar dibin, dîsa diçin. Subetirê dikeve roja van e çara. Dîsa Mîrze Miheme dîsa dibê:

“ ‘Elo, êwra me hindik maye. Yaniz<sup>1806</sup>, ez tî bûme heywanê me jî tî bûne. Ser bîrekî bisekine.”

Evna l’ ser bîrekî disekinin. ‘Elo vê carê dibê:

“Tu şûr gurzê xwe nedî min ez nakevme bîrê.”

[Mîrze Miheme dibê]:

“Ji bona çi?”

[‘Elo] dibê:

“Ew jî xûna min. Ku tu wî sozî bidî ku ez bîrê dernekevîm jî, tê wan şûr-gurza, evê kincê ser piştta hespê, hespê biherî teslîmî mala min kî. Seva bifroşin pê îdara xwe bikin.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e, ‘Elo. Şert, ez ê şûr-gurzekî bime te.”

Elo dikeve bîrê, avê derdixe. Mîrze Miheme avê duxwe, avê dine hespa. ‘Elo, şûr-gurz hildide. ‘Elo wextê şûr gurz hildide, evna sîyar dibin. ‘Elo dibêje Mîrze Miheme, dibê:

“Mîrze Miheme ez im, tu jî ‘Elo yî. Axa ez im, seyîs tu yî. Axa ez, seyîs tu.”

Yanî bêbextî di berê da heb’ye. Di dîroka da heb’ye heta ku hatye niha, niha jî heye. Mîrze Miheme dibê:

“Baş e.”

Dibê evna wextê yaxinî<sup>1807</sup> şîher dibin, xeber diçe ji rêwîya, ji rêdara, ji şivanê çolê, ji her kesî ra,

1805 ) Li Ebexê û li derdorê Ebexê bo vexwarina tiştên şîlemenî li dewsa lêkera ‘vexwarin’ê lêkera ‘xwarin’ê tê bikaranîn.

1806 ) Lê, lê belê, bes.

1807 ) Nêz, nêzik.

dibê:

“Cabê bine Huseyn Paşa bê; Mîrze Mihemedê biraziyê te, padşa Mîrze Miheme hat.”

Huseyn Paşa radibe heyetekî hildide, pêşva va tê. Gotna ku Huseyn Paşa ra gotine, ku ewê çûne, yek wî hev nagre. Huseyn Paşa dêna xwe didê, yawo, yê ku biraziyê wî [ye], ‘erebekî reş î o bîçim e<sup>1808</sup>. Ku seyîs tu dinhêrî, padşakî bi dilê te ye.

Huseyn Paşa, dibê tiştêkî bêfehmi pê ra hebûye, yanî nezanî. Bêfehmtîya wî j’ nezantîya wî bûye.

Dibê evna wextê diçin, qîzik jî derdikeve camê ku bibîne. Him kurapê wê ye, hem sozdariyê wê ye. Dibê Fatma di camê da dinhêre. Wextê seyîs dinhêre, li paşê dinhêre, dibê:

“Di vî îşî da îşek heye? Ema çî yê? Yê îlerde<sup>1809</sup> derkeve.”

Dibê rojek, dudu, sisê, çar, deh... dibê evna xwe ra derdikevin digerin. Dibê seyîs ‘Elo, dibê îki de bîr<sup>1810</sup> mesela emir dide Mîrze Miheme, dibê:

“Kuro, here teselîya hespê ke. Kuro, nizam here vî tiştî bike.”

Aqilmendekî paşê heb’ye, yê Huseyn Paşa, yê apê wî, dibêjê dibê:

“Di vî îşî da îşek heye. Çika bira seyîs were dîwanê, em ewî jî bine xeberdanê. Em ewî jî dînemiş<sup>1811</sup> kin. Yawo, ku însanekî dîtî bi vî şertî xeber nade. Însanekî ku j’ tiştê fehm bike, dewletîmend be, zengîn be, ê însan dîtî be, toplim<sup>1812</sup> dîtî be, di civata da mezin bûbe a iha hereket nake. Piştî wîqasî, evna mêvanê te ne. Qey xulamê te tune ne, qey seyîs tune ne ku herin teselîya hespê bikin.”

Duşmîş<sup>1813</sup> dibe, dibê:

“Heqeten, gotin ya van e. Gotin ya van e.”

Dibê rojekî Mîrze Miheme derdikeve, li derê malê digere. Gazî xulamekî dike, dibê:

“Em hinekî derkevin bigerin. Yêra<sup>1814</sup> gerê, seyhatê<sup>1815</sup> heye vira?”

[Xulam] dibê:

“Baxçê paşê heye.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Em bêîzna paşê dikarin herne baxçe?”

[Xulam] dibê:

“E. Em ê herin, iha l’ kêlekeke wî ra bigerin. Di baxçe da her çêşît<sup>1816</sup> meywe heye. Hinar heye,

1808 ) Wî şeklî, wî tehrî.

1809 ) Pêş de, li pêşde.

1810 ) Carê carekî.

1811 ) Guhdarî kirin, guh lê kirin.

1812 ) Civak, cemaet.

1813 ) Fikirîn.

1814 ) Cî, cih, der.

1815 ) Ger û geşt.

1816 ) Cûre, cûn celeb, çeşn.

sêv heye, elma<sup>1817</sup>, armût<sup>1818</sup>, mûz, her tişt. Yanî çi bêjî heye tê da.”

Dibê ew wextê diçin, dibê Fatma vana teqîb dike, qîzapa wî. Dibê dibêje caryê:

“Çika ku pey vana here. Evna bi hev ra çi dibêjin? Çi gotin, gotnê wana bîne mi ra bêje.”

Dibê xulam gote wî, gote Mîrze Miheme. Yanî Mîrze Miheme idî ketye dewsa ‘Elo, ‘Elo jî ketye dewsa wî ya, bûye seyîs ya. Dibê gotê, go:

“Eva baxçe ye. Padşa, tu faydê vî baxçeyî hilnade.”

Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Çima?”

Dibê [xulêm] go:

“Wextê meywe tê yêtişmîş<sup>1819</sup> dibe, wextê zemanê wî idî ku lê faydalanmîş<sup>1820</sup> bin, em nizanin dêw e? Em nizanin hirç e? Em nizanin ejderha ye? Dara dişkêne, mêşe xirav dike, her tişt lê çêdibe.”

Dibê go:

“Her tişte lê çêdibe.”

Dibê Mîrze Miheme gotê, go:

“Zeman zehf maye ku ew tişt dîsa ev baxçê a iha xirav bike, ew bike?”

Dibê [xulêm] go:

“Na. Yan heftêk, yan du ro, yan deh ro, a iha surê<sup>1821</sup> wê maye. Eger goreyî sala ku here.”

Dibê sibetirê apê wî gazî kirê bi gotna heyetê. Dibê anîne dîwanê, de bûye seyîs ya. Dibê wextê anîne dîwanê, dibê yêr<sup>1822</sup> nîşan xistin, dibê xeber dan. Qahvecîya çay anîn, qahve anîn. Dibê sirayê<sup>1823</sup> belav kirin, ji wî ra jî danîn. Dibê Mîrze Miheme li wan nihêrî. Dibê qahwa xwe tişteki wisa kibar [vexwar]. De niha însanekî dîtî însanekî nedîtî ara<sup>1824</sup> wî da zehf ferq heye. Dibê ku qahwexarina wî, hereketê wî tam yê maqûla [bû].

Dibê dîsa ‘Elo pê ketye dibêje. Dibê reîsek ji diwanê rabû. Gote Mîrze Miheme, go:

“Ez, tu em dikarin hinekî xeberdanê bikin?”

Dibê hilda qederekî geryan, dane xeberdanê. Dibê zivirî hat. Gotê apê wî, go:

“Paşa ev e, ne ew e. Ewa nîne. Aqlê mi wî nabirre.”

Dibê ew jî merivekî aqilbaşlî<sup>1825</sup>, serpêsekinî bû. Dibê go:

---

1817 ) Sêv.

1818 ) Hirmî.

1819 ) Gihîn, gihîştin, gihaştin.

1820 ) Sûd lê wergirtin.

1821 ) Wext, dem.

1822 ) Cî, cih, der.

1823 ) Bi dorê, bi rêzê.

1824 ) Nav, navber.

1825 ) Zana, şareza, dîtî.

“Tişte di wî tine. Ewa boş<sup>1826</sup> e. Boş e.”

Dibê apê wî rabû. Heyetek hilda, bi ‘Elo va bi xulamê Mîrze Miheme va, de idî [‘Elo] bûye Mîrze Miheme. Dibê geryan. Dibê hatne nava baxçe. Dibê apê wî gotê, go:

“Axxx baxçeyo! E ça te faydalanmîş<sup>1827</sup> nebûm.”

Dibê [Mîrze Mihemedê derewîn] go:

“Çima?”

Padişah go:

“Hal mesele a iha.”

[Mîrze Mihemedê derewîn] go:

“Ewa, bi xwedê [û] ‘Elo.”

Seyîs ji Mîrze Mihem[(dê rastî] ra, Mîrze Miheme kirye dewsa xwe ya, dibê:

“Ewa, îşî wî ye. Berde ordîya, lê sêr ke.”

Isa jî dibêje. Dibê heftêk derbas bû, ‘Elo gazî Mîrze Miheme[dê rastî] kir, go:

“Mîrze Miheme, tu bi çend hev sîyarê apê mi va hûnê îşev bibne nobeçîyê<sup>1828</sup> baxçe.”

Dibê [Mîrze Mihemedê rastî] go:

“Baş e. Yaniz<sup>1829</sup>, bi şertekî.”

[‘Elo] go:

“Şertê te çî ye?”

[Mîrze Mihemedê rastî] go:

“Ez ê hespê te, şûr-gurzê ser piştê hespê, hildim herme nobedarîyê. Eger tu qebûl bikî ez ê herim, tu qebûl nekî e naçim.”

Dibê [‘Elo] go:

“Yawo, tişte isa dibe? Ez ça didim?”

[Mîrze Mihemedê rastî go]:

“Na. Hatye hesabê te tê bidî.”

Dibê [‘Elo] gotê:

“Kurê mi, bîr suru<sup>1830</sup> hesp hene, kihêl hene. Sibê berjêrî nava şûrçêkera be, xançîya be, kîjan şûr-gurza begem dikî bira te ra çêkin. Ser heddadçîya şûrê isa hene, ew çî ye. Bavêjî nava zanga<sup>1831</sup>, kevira qet ke.”

Dibê Mîrze Miheme şûr-gurzê xwe ji wî stand, hespê xwe ji wî stand. Kincê xwe li xwe kir. Sîyar

---

1826 ) Betal, vala, xalî.

1827 ) Sûd jê wergirtin, sûd lê wergirtin.

1828 ) Nobedar, zêrevan, pasvan.

1829 ) Lê, lê belê.

1830 ) Gelek, zehf, zêde.

1831 ) Kevîrên zêde zêde mezin, kevîrên qerase.



jî sîyar bûn, da pêşya sîyara. Dibê qîzapa wî cam vekir, go:

“Mîrze Miheme, Mîrze Miheme, a tu diçî evê mendîla hanê, desmala hanê jî bihere, me ra hine meyve têxne nav bînin.”

Yanî qîzîk idî şuphelenmîş<sup>1832</sup> bû [ku] ew e. Dibê evna rojek, dudu, sisê, çar roja man, roja ku heftê tamam be, wextekî dêna xwe danê, motanî<sup>1833</sup> hûfnîkî<sup>1834</sup> di nava dara da tê. Dibê Mîrze Miheme gote wana, go:

“Mi teqîb bikin.”

Dibê Mîrze Miheme şûrê xwe ji qîlif kişand. Dêna xwe dayê, mehrekî tîpî zîya<sup>1835</sup> hema keteye baxçe, xirav dike, duxwe, tê. Dibê Mîrze Miheme şûr kişand kete pêşyêêê, dayê qetqetî kir avîte ser hev. Dibê xwe dirêj kirin, rûniştin. Sube zelal bû. Dibê xulama caw<sup>1836</sup> da paşê, go:

“Welle, mesele bû ev.”

Dibê heyet, paşa tev hatin. Tiştêkî dehşet<sup>1837</sup>! Her kesî jî ‘ilbet<sup>1838</sup> dît! Dibê evna zivirîn hatin. Dibê Mîrze Miheme jî baxçe da gerya. Her darekî meyvek jê qopmîş<sup>1839</sup> kir, kire desmalê. Anî da destê carya, şand.

Dibê dîsa Mîrze Miheme ‘Elo ye, ‘Elo Mîrze Miheme ye. Dibê evna rabûn geryan. Dibê ‘Elo gote apê xwe, ‘Eloyê navmalî ‘Eloyê xulam gote Huseyn Paşayê apê Mîrze Miheme, go:

“Apo, qe çî te hey çî te tune ye?”

Dibê li nava her tiştê wî, xeznê wî, defînê wî, koşk-serayê wî geryan. Dibê derîk kete pêşya wan. Dibê ‘Elo gotê, go:

“Apo, ev çi derî ye?”

Dibê go:

“Ji ewî gerrî be. Yawo, were. Kurê mi, îşê te wî derî tev hev tune.”

[‘Elo] go:

“Na, tê bêjî.”

Dibê wextê derî vekirin ketne hundurê odeke a iha, fotrafeke wisa lê ye! Însana tiştêkî isa nedîtye!

Dibê [‘Elo] go:

“Eva kê ye?”

Dibê [Huseyn Paşa] go:

“Eva Gozel Dunya ye.”

---

1832 ) Guman kirin, şik birin.

1833 ) Mîna, nola, fenanî.

1834 ) Dengê seyr ên rawiran.

1835 ) Rawirên mezin ên mîna maran.

1836 ) Cab, xeber.

1837 ) Erjeng, bisaw, bixof, tirsnak.

1838 ) Erjeng, bisaw, bixof, tirsnak

1839 ) Qetandin.

Dibê [‘Elo] go:

“Îja te eva ça anî? Ev fotraf ji ku hat? Te j’ ku anî?”

Dibê [Huseyn Paşa] go:

“Min du carî vê serveta xwe da, paşê ev fotraf hate destê min. Ez bûme aşiqê wê, vê fotrafê.”

Dibê ‘Elo go:

“Ev fotraf çî ye. Ewa li xwedê, li ‘Elo, li seyîsê min. Yê here ewê bi xwe bîne. Ew çî ye.”

Ji axayê xwe ra bêjim, dibê sube zelal bû, heyet rûniştiye. Dibê ‘Elo gazî Mîrze Miheme kir. ‘Eloyê xulam, de bûye Mîrze Miheme, Mîrze Miheme jî bûye ‘Elo. Dibê hate dîwanê, dibê go:

“Karê xwe bike. Tê herî şehrê Bexdatê. Tê herî şehrê Bexdatê, qîza Ahmed Paşa bînî. Gozel Dunya qîza Ahmed Paşa, tê j’ apê mi ra bînî. Çi gerekmiş<sup>1840</sup> dike, esker be, kewran be, şer be, arac-gerecê<sup>1841</sup> wî zemanî çî bin, bira goreyê wê tevdîra te bikin.”

Dibê Mîrze Mihemeyê te duşmiş<sup>1842</sup> bû, go:

“Tu tişt gerek nake. Ez, hespê xwe, şûr-gurzê xwe. Yaniz<sup>1843</sup> ku ez hatim, bi şertekî ez ê herim. Ez wextê ku gêrî<sup>1844</sup> hatme vê derê, em ê wî şertî wî çaxî açixlamiş<sup>1845</sup> kin. Ez nehatim jî zaten her tişt dimîne te ra.”

Dibê wextê ku Mîrze Miheme yê rê keta, dibê Fatmayê carîk şand, namek da dêt, go:

“Here, evê namê bide sîyar were. Gotineke wî hebe jî bira te ra bêje, were.”

Dibê Mîrze Miheme wextê ewê caryê name anîn, Mîrze Mihemed name vekir name xand, Fatmayê gotye:

“Mîrze Miheme, ew ‘ereb ne kurapê min e. Kurê apê mi nîne. Ew fotrafê hatine jî ne ew in. Kurapê mi, sozdaryê mi tu yî. Di vî îşî da çî hebe nama xwe da binvîse. Tu werî jî ez ê te beglemiş<sup>1846</sup> kim, tu neyê jî ez ê te beglemiş kim. Tu neyê jî ez ê ewî bime kuştinê, ha. Tu werî jî ez ê ewî bime kuştinê, tu neyê jî ez ê ewî bime kuştinê.”

Mîrze Miheme jî namekî dinvîse, namê da dibê:

“ ‘Eynî Mîrze Miheme ez im. Ara<sup>1847</sup> mi wî da şertek heye. Ez hatim, em ê ewî şertê xwe açixlamiş<sup>1848</sup> kin. Ez nehatim, tu çî bi serê wî dikî tu dizanî.”

Dibê Mîrze Miheme sîyar bû, bira berê xwe bide şehrê Bexdatê. Ji axayê xwe ra bêjim, dibê roj bi

---

1840 ) Hewce, lazim.

1841 ) Amûrat.

1842 ) Fikirîn.

1843 ) Lê, lê belê, bes.

1844 ) Paş.

1845 ) Rave kirin, vegotin, derberrîn.

1846 ) Li bendê man, li hêvîyê man

1847 ) Nav, navber.

1848 ) Rave kirin, vegotin, derberrîn.

Mîrze Miheme bûne meh, meh lê bûne sal. Yanî acî<sup>1849</sup>, keder li ser hev yuklenmîş<sup>1850</sup> bû. Dibê axayê xwe ra bêjim, Mîrze Miheme dibê berê xwe da şehre Bexdatê, ku heftê ku deh ro dibê çû.

Devê avekî, hespê xwe qaş kir, berda. Bi xwe jî xwe dirêj kir. Dibê wextê rabû, dêna xwe dayê, kewranekî morîstanga aveke zirav derbas dibe. Ku tê derbas be, av hema isa lê dixê dibe. Dibê Mîrze Miheme şûrê xwe bi kalanê wî va tev kire pire, a iha danî. Ew heywanana tamam ser ra derbas bûn. Dibê hat, sona<sup>1851</sup> wan da moristangekî topal, dibê go:

“Mîrze Miheme, ev qencîya han e te l’ me kirî, a evî perrê min, baskê min yanî, têxe ber cizdangê xwe. Serê te kê derê êşya, tu ketî tengayê, bidê êgir ez ê l’ ber te hazir bim. E jî vê qencîya te ye hanê bîr nakim.”

Dibê Mîrze Miheme hilda, kire ber cizdangê xwe. Duşmîş<sup>1852</sup> bû, go:

“Morîstangê were çi qencîyê mi ra bike?! Moristang were, bikevme tengayê, mi xilas ke, qencîyê mi bike?!”

Dibê rabû, l’ hespê xwe sîyar bû çû. Dibê baya<sup>1853</sup> çû, ne rojek ne dudu ne sisê... Dibê dîsa li cîkî av, cîkî çîmen, dibê sekinî. Heyanê<sup>1854</sup> xwe girê da, av da. Des-serçehvê xwe şûşt. Xarna wî çi be, dibê xarin-vexarina xwe kir. Dibê dêna xwe dayê, mişkekî serê xwe j’ qulikê ra derxistîye. Dibê mişk gotê, go:

“Mîrze Miheme, tê ku da herî?”

Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Ez ê herme şehre Bexdatê.”

[Mişk] go:

“Tê herî çi?”

[Mîrze Miheme] go:

“Ez ê herim Gozel Dunyayê bînim.”

[Mişk] go, go:

“Ez neyê tu nikarî bînî. Eger tu mn biherî tê Gozel Dunyayê bînî. Tu mi nebî tu nikarî bînî.”

Dibê duşmîş<sup>1855</sup> bû, go:

“Yawo, ka ku ez wextê nikaribim bînim tê ça bînî?”

[Mişk] dibê:

“Tu dikarî niha mi hildî? Bax<sup>1856</sup>, bi şertekî. Em ê herin. Me Gozel unya neanî serê mi lêxe. Ku me

---

1849 ) Êş, jan, kul, derd.

1850 ) Ser hev de hatin, bargiranî bûn.

1851 ) Axir, dawî.

1852 ) Fikirîn.

1853 ) Pir, gelek.

1854 ) Heywan.

1855 ) Fikirîn.

1856 ) 9 Binhêre.

anî, em hatne a vî ‘erdî l’ vê derê, Gozel Dunya jî dahîl<sup>1857</sup> me çi anîbe em ê hev par kin.”

Mîrze Miheme dibê:

“Baş e. Îja ez ê te ça xweyî kim?”

[Mişk] dibê:

“Tê min têxî qutya cixarê, têxî cêva xwe.”

Çox af bûyrûn<sup>1858</sup>, eva zaten di berê da bûye, mîşk û pişik dujminê hev in. Yanî îmkaniya vana tune.

[Mişk] dibê:

“Yêra<sup>1859</sup> pişik lê be mi bernede. Yêra pişik tê da tune bû, îşê min e. Tu wan tiştta mi ra bihêle. Anîna Gozel Dunyayê jî tu mi ra bihêle. Tu yeter kî<sup>1860</sup> yêra pişik lê be mi bernede. Wakî din sixmîş<sup>1861</sup> nebe, em ê bînin. Bi çi şertî be, bi çi bibe mal, em ê Gozel Dunyayê bînin.”

Dibê Mîrze Miheme mişk kire qutyê, qutî kire cêva xwe. Li hespê xwe sîyar bû, ajotin. Dibê daxilî şîherê Bexdatê bûn. Xwe ra ketine devê behrê tèn. Dêna xwe danê, tûrcî<sup>1862</sup> tûra davêjne behrê. Dibê tûrcî tûra davêjen behrê. Dibê Mîrze Miheme xwe ra sekinîye. Ro hate ‘esrê. Dibê mişk gotê, go:

“Yawo, tu çi sekinî? Yawo, êvar hat! Bajo şîher, dereng e. Em hene mala bavê Gozel Dunyayê. Karekî bike.”

Dibê Mîrze Miheme ji wira qetya, jor da hema a deh mêtira berjêr b, dêna xwe dayê, gencek tûrê davêje behrê. Dibê Mîrze Miheme çû cem genc, go:

“Tu, tûrê mi ra bavêje behrê ka şansê mi çi dertê.”

Dibê genc gotê, go:

“Tu perekî bide mi. Mesela mecdîkî veya<sup>1863</sup> zêrekî bide min, ez ê tûrê bavêjme behrê.”

Dibê Mîrze Miheme dexist zêrek dayê, go:

“Tûrê şansê mi ra bavêje behrê ka çi dertê?”

Dibê genc wextê tor avîtê behrê, çend deqa tûr di behrê da sekinî. Dibê wextê kişand, dêna xwe dayê, mehsîkî sipîçîl ji behrê deket. Mehsîkî zehf bedew ji behrê deket.

Dibê Mîrze Miheme gote genc, go:

“Tekrar mehsî bavêje behrê.”

Dibê genc go:

“Tu perekî bîdî ez ê berdme behrê, tu nedî ez navêjme behrê.”

---

1857 ) Tê de, di nav de, tevî (wê).

1858 ) Bibore.

1859 ) Cî, cih, der.

1860 ) Hema, bes.

1861 ) Bêhteng bûn, tengizîn, aciz bûn.

1862 ) Torvan, torevan.

1863 ) An, an jî.

Dibê Mîrze Miheme zêrekî dinê jî dayê. Dibê mehsî berda behrê. Dibê Mîrze Miheme ji wî qetya neh-deh mêtira wê da çû. Dibê mehsî hat pêşya wî ra serê xwe dexist, go:

“Mîrze Miheme, ez evê qencîya te bîr nakim. A evî baskê mi hilde cem xwe. Zeman hebe tu ketî tengayê, bidê êgir ez ê l’ ber te hazir bim.”

Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Baş e.”

Dibê ew jî hilda. Dibê duşmîş<sup>1864</sup> bû, go:

“Yawo, ez ê ça jê kim?”

Dibe min jî [mişk] go:

“Kuro bêaqil, hilde. Roj were yê kêrî me were.”

Dibê ew jî hilda, kire ber cizdangê xwe. Ajotne şîher, çûne derê koşka bavê Gozel Dunyayê. Çûne derê koşka bavê Gozel Dunyayê. Dibê ji axayê xwe bêjim, pêya bûn. Dibê ev hildane hundur. Rojek, dudu, sisê, çar, pênc, heftêk tamam bû. Dibê wextê heftêyê van tamam bû, dibê ji Mîrze Miheme siwal kirin, dibê paşê gotê go:

“J’ kela serya maye serîk, ya cendeka maye cendek. Nebe bayîsê qetla xwe. Tu ji boy çi hatî?”

[Mîrze Miheme] go:

“Ez ji boy Gozel Dunyayê hatime.”

[Bavê Gozel Dinyayê] go, go:

“Sê hev şertê mi hene. Tu şerta pêk bînî tê Gozel Dunyayê biherî. Te pêk neanî tu Gozel Dunyayê nabî, serê teyê were lêxistinê. Tu qebûl dikî? Îro te ra molet. Duşmîş<sup>1865</sup> be, sibê qararê xwe bide.”

Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Baş e.”

Dibê Mîrze Miheme, êvarê cîyê wî danîn, raza. Duşmîş bû:

“Yawo, ev şert çi ne? Yê bi çi terî be? Em ê ça biherin? Ez pê dernexim serê minê here? Ê ez padişahê şîher, şehre mi alîkî ma? Dergîstiya mi alîkî ma, e li vir?”

Dibê mişk dêna xwe dayê, tebatî nayê Mîrze Miheme. Dibê mişk tiqtiq serê xwe li qutyê da. Dibê Mîrze Miheme derî vekir, [mişk] go:

“Mala te xirabîyo! Kuro, razê.”

Eva çî ye, eva çocux oyincaxî<sup>1866</sup> ye. Tu van tiştê mi ra bihêle. Xwe ra xeyala neke, razê, hêsayî be.

Dibê Mîrze Miheme serê xwe danî xewê, raza. Dibê sube zelal bû. Dibê evna hatne dîwanê. Dîwan tijî bûye, kimekima dîwanê ye. Dibê xwe ra subhet kirin, xebirdan kirin. Dibê padşa gotê,

---

1864 ) Fikirîn.

1865 ) Fikirîn.

1866 ) Pêlîstoka zarokan.

go:

“Mîrze Miheme, îlk başlangic<sup>1867</sup> e îşev. Tu şerta qebûl dikî?”

[Mîrze Miheme] go:

“Erê.”

[Bavê Gozel Dunyayê] go, go:

“Îro sadece<sup>1868</sup> denetim amaçlî ye<sup>1869</sup>. Şertê te ye dinêna yê bimîne sibê. Eva îlkî<sup>1870</sup> wî ye. Tu evê başarmîş<sup>1871</sup> kî, vê sinavê<sup>1872</sup> derbas bî, ewê dinê werin. Tu vê derbas nebî serê te yê here. Îlk<sup>1873</sup> sinava<sup>1874</sup> te ev e.”

Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Baş e.”

Dibê êvarê cima'et bela bû. Dibê paşê gazî wezîra, xulama kir, go:

“Kuro, Mîrze Miheme biherne oda wî.”

Dibê Mîrze Miheme wextê birin derî vekirin, odeke a iha tijî garis-gilgil. Garis-genim, em bêjin, tevî hev e. Dibê çend hev çîwal anîn danîne wê derê. Şûjin, derzî anîn danîne wê derê. Dibê gotne Mîrze Miheme:

“Tê evî heta sibê vî garisî vî genimî ji hev veqetînî, têxî çîwala, derê wî bidrûyî, daynî wira, yê hazir be ayrî ayrî<sup>1875</sup>. Îlk şertê me ev e.”

Dibê [Mîrze Miheme] go:

“Baş e.”

Dibê evna derketin çûn, derî dadan. Mîrze Miheme ma hundur da, duşmîş<sup>1876</sup> bû:

“Wey malê xirabê! Kuro, mi serê xwe kire çî belakî! Çî derd e!”

Dibê mişk jê ra serê xwe l' qutyê da, go:

“Kuro, mala te xirabîyo! Ca mi vira derxe ez hinekî nefes hildim, bêna mi cikya.”

Dibê mişk dexist, duşmîş<sup>1877</sup> dibe. Mişk go:

“Weylê mala te xirabûyî! Mi wetrê tu zehf aqil î. Hema yê bêaqil tu yî. Kuro, lê ew qencîya me li morîstang ra kir ka? Kuro, çika baskê morîstangê derxe.”

Dibê Mîrze Miheme baskê morîstangê dexist ku da êgir, bû vizînîya morîstanga ji bin dêrî ra

---

1867 ) Destpêk, destpêka ewîl,

1868 ) Bi tenê, sirf.

1869 ) Bo tecrubekirinê,

1870 ) Yekem, ya pêşî.

1871 ) Bi ser ketin, mîyeser bûn, serfiraz bûn.

1872 ) Ezmûn, îmtîhan.

1873 ) Yekem, ya pêşî.

1874 ) Ezmûn, îmtîhan.

1875 ) Cuda, cihê.

1876 ) Fikirîn.

1877 ) Fikirîn.

kişyan, go:

“Mîrze Miheme, em ji boy te çi b’kin?”

Dibê mişke gote wana:

“Hema hûnê vî genimî ayrî<sup>1878</sup> kin têne torba, garis jî ayrî têne torba devê wan bidrûn.”

Dibê heta paşî hat pêşyê dayê temîz kir, devê torba dirûtin. Xatrê xwe jê xastin, yalla herrek nesene. Dibê evna ketne rê, lêdan çûn. Mîrze Miheme ser çiwala xwe dirêj kir, mişk berda wê kêşê. Dibê sube zelal bû. Paşê evna şandin, go:

“Kuro, herin kanê çî ye?”

Dibê hatin dane dêrî, reqereqa wan e. Dibê Mîrze Miheme rabû, go:

“Yawo, çî ye? Hûn nahêlin em razên.”

Dibê wextê danê xwe danê, devê çiwala vekirin, [gotin]:

“Kuro, ‘eynî ye.”

Ew ayrî ew ayrî. Dibê hev şaş bûn. Yanî ku mûtanî<sup>1879</sup> însanê bikeve şoqê. Dibê bîlgî<sup>1880</sup> dane paşê, go:

“Temam e.”

Dibê Mîrze Miheme çû banyo, banyo kir, qahvaltî<sup>1881</sup> kir. Dibê hate dîwanê. Dibê mişk gotê, go:

“Bira, dîwana paşê giran e. Hê pişk li wan orta<sup>1882</sup> tune be, tu mi berde ez ê herim xwe yêr<sup>1883</sup> kim. Gozel Dunya jî yê were dîwanê. Tê Gozel Dunyayê bidî xebirdanê. Ev tiştana zor in, giran in. Şert ev in; wextê wana gote te kerem ke, mesela ez ê îşev herim bikevme goşê doşekê, tu bê, misada paşê-heyetê hebe bira doşek jî pêş mi va xeber bide. Tu lê sêr ke. Bira ew soriya<sup>1884</sup> bêjin, tu tev nebe.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

Dibê êvarê cima’eta paşê tijî ye. Giregirê wî rûniştine. Aqilbendê wî, wezîrê wî rûniştine. Dibê paşê gotê:

“Mîrze Miheme, bi xêr be. Te îlk<sup>1885</sup> şertê xwe qazanc kirye. Tê îja me ra nesîhetekî bikî.”

Dibê go:

“Baş e.”

[Paşê] dibê:

---

1878 ) Cuda.

1879 ) Mîna.

1880 ) Agahî, xeber.

1881 ) Taştê.

1882 ) Nav, navber.

1883 ) Ci, cîh.

1884 ) Pirs.

1885 ) Yekem, ya/yê pêşî.

“Nesîhet ku tu Gozel Dunyayê bidî xebordanê. Nesîheteke isa tê bikî.”

Dibê Mîrze Miheme duşmîş<sup>1886</sup> bû, dibê go:

“Paşa, saygîya<sup>1887</sup> mi j’ te [û] heyetê ra heye. Bira pêş mi va şemdana Gozel Dunyayê xeber de.”

Dibê cima’etê li çehvê hev nihêrî, her kesî şemdanê nihêrî. Mişk ketye şemdanê. Dibê mişk go:

“Cima’eta paşê, hebû carek cara rehme li dêbavê hazir û guhdara. Rind guhê xwe bine min. Ez ê we ra meseleke dîrokî bêjim, tarîhî<sup>1888</sup>. Sê hev meriv hebûn. Bûne hevalê hev çûne qurbetîyê. Her kes meslekê wî ayrî<sup>1889</sup> bû. Evna, yek terzî bû, yek merengoz bû, yek mele bû. Evna rabûn. Terzî makîna xwe hilda, aletê ku wî çaxî here qurbetîyê pê bixevite. Makîna wî be, meqesa wî be, mêtira wî be, dibê ewî ew hilda. Dibê merengoz jî tevşoyê xwe, birreka xwe, çagûçê xwe, mêtira xwe, ew hilda. Mele jî kitêbê xwe hildan. De her kesî goreyê meslekê xwe dewam bike qurbetîyê. Dibê evna çûn. Şev kete ser vana. Dibê şev kete ser vana. Dibê vana go:

“Şevê, li vî memleketî, rêya xerîb, em ê her yekî me, yek s’iet du si’et em ê nobetê bigrin heta sube me hat.”

Dibê merengoz go:

“Bavo, nobeta şevê, îlk<sup>1890</sup> nobeta êvarê li min.”

Dibê terzî go:

“Ya duduya li mi.”

Dibê mele go:

“Ya sisîya li min. Him dikeve destê subê, him jî mêja min e subê li mi naçe. Ez ê mêja xwe jî bikim.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê wexta evna rûniştin qederekî cem hev, dibê vana agir dada. Orman<sup>1891</sup> yaxinê<sup>1892</sup> van bû. Dibê vana ji orman jî qederekî dar anîn, dane ser agrê xwe. Dibê merengoz gotê vana, go:

“Arqadaş<sup>1893</sup> nobet ya min e. Hûn rabin razên seva hûn jî xewa xwe hildin. Em rê da hatine, westîyane.”

Dibê merengoz birreka xwe hilda kete orman, qedere dar birrî anîn. Tevşoyê xwe hilda xwe da pê da ûxraşmîş<sup>1894</sup> bû. Îskeletekî meriva çêkir. Îskeletî meriva dibê bi texta çêkir. Si’etê nihêrî, dêna

---

1886 ) Fikirîn.

1887 ) Rêz, rêzdarî, hurmet.

1888 ) Tarîxî.

1889 ) Cuda, cihê.

1890 ) Yekem, ya pêşî.

1891 ) Orman.

1892 ) Nêz, nêzîk.

1893 ) Heval, hevalno.

1894 ) Pê de ketin, pê mijûl bûn.



xwe dayê, nobeta wî jî tamam bûye. Dibê îskelet bir [ji] êgir wêdatir danî. Dibê deyn<sup>1895</sup> terzî kir, go:

“Terzî terzî, rabe nobeta te ye.”

Dibê wextê terzî rabû, qederekî ber êgir rûnişt, çehvê xwe mizda. Xew jî hinekî ji çehvê wî revî. Dêna xwe dayê, reşekî însanekî wêdatir sekinye. Dibê ser da çû:

“Lolyo filankesî, tu kê yî? Dengê xwe bike, navê xwe bêje. Iha mi l’ te da, iha ez ê te bikujim.”

Dêna xwe didê, tişte ne xwe dilipitîne, ne xeber dide, tu tişte jî tune. Dibê çû. Tirsetirs çû. Hate nêzîk. Dêna xwe dayê, merengoz bi texta îskeletêkî însana çêkirye. Dibê duşmîş<sup>1896</sup> bû:

“Merengoz eva çima çêkirye? Gotye, ez ku herme yêra<sup>1897</sup> îş, memleketê xerîb, ez ê bi vî şertî bixevitim pera qazanç kim.”

Dibê evî jî anî makîna xwe dexist. Eger ji kincê xwe be, ji yê hevala be, ku perçe bi xwe ra anî be bihere qurbetîye pê îş bike, dibê ewî jî mêtira xwe dexist. Ew kereste olçmîş<sup>1898</sup> kir, ew îskeleta wî însanî. Dibê jê ra kinc birrî, çêkir. Kincê jina dibê lê kir. Si’eta xwe nihêrî. Dêna xwe dayê, nobeta wî tamam bûye. Bir, dûrî agirê danî. Dibê zivirî deyn<sup>1899</sup> mele kir, go:

“Mela, rabe nobeta te ye.”

Dibê mele rabû, terzî raza. Tabî jê ra negotye, eva tiştê hanê mi kirye. Dibê mele qederekî ber êgir rûnişt, çehvê xwe mizda. Valî-walî dora xwe nihêrî. Dêna xwe dayê, însanek wî wêdatir sekinye. Dibê qederekî ser da çû, gazî kirê:

“Filankesî, lolo, tu kê yî? Mi l’ te da. Navê xwe bêje, dengê xwe bike.”

Dibê tişte tine. Dibê tirsetirs çû, çû, çû ber. Dibê dêna xwe dayê, jinek. Dibê wexta a iha ba kir, dêna xwe dayê, îskeletê însana. Merengoz çêkirye, texte olarak<sup>1900</sup> kirye însan. Terzî jî kinc dirûtye, lê kirye. Dibê mele duşmîş bû, dibê:

“Gotye, merengoz gotye, sene’etê mi ev e. Ez ê ha bikim. Terzî jî gotye, eva sene’etê min e. Meslekê<sup>1901</sup> min ev e, ez ê jî ha bikim.”

Dibê mele rabû dezmêj girt. Ew îskelet jî anî cem xwe, da ber êgir. Dibê du rukuat sinnet kir. Qur’ana xwe vekir, baya<sup>1902</sup> xand. Mêja sibê kir. Ser mêja xwe tekrar xand. Di’a xwedê kir, go:

“Ya rebbî, tu jî mi qarşî<sup>1903</sup> vana mehçûb nekî. Meslekê mi jî ev e. Tu ruhekî bidî vî qalibî.”

Tune kî qey rehma xwedê. Dibê xwedê te’ala jî emir kir, ruh berda qalib, bû hurmetekî<sup>1904</sup>. Dibê

1895 ) Deng, bang.

1896 ) Fikirîn.

1897 ) Cih, cî.

1898 ) Pîvan, pîvandin.

1899 ) Deng, bang.

1900 ) Wek.

1901 ) Pîşe, kar.

1902 ) Zêde, gelek, pir.

1903 ) Pêşber, ber, hember.

1904 ) Bi maneya ‘jin’ê hatiye bikaranîn.

[şemdanê<sup>1905</sup>] go:

“Cima’eta paşê, niha ev hersê însan ji boy vê hurmetê hev dikujin. Ev hurmet ya kê ye? J’ kê ra dikeve?”

Dibê go:

“Ya kê ye? J’ kê ra dikeve?”

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê [şemdanê] go:

“Cima’etê paşê, bax<sup>1906</sup> e we ra tekrar dibêjim, deh deqe sure<sup>1907</sup>. Ev însanana hev dikujin. Hûnê caba mi bidin. Merengoz ra dikeve? Mele ra dikeve? Terzî ra dikeve?”

Dibê her kesî tişte go. Hineka xeber da, hineka qe xeber neda. Dibê en son<sup>1908</sup> Gozel Dunya rabû, go:

“Xira be serê bavê mi, ser dîwanê, ser mezina. Kuro, jinik ji mele ra dikeve. Merengoz qûpqûrû<sup>1909</sup> textek çêkirye danye wira. Terzî jî perçek<sup>1910</sup> dirûtye avîtyê ser sêrî. Mele jî xandîye. Ha, hûn dibê, jin tehzî nabe. Pekî<sup>1911</sup>, mele di’ a nekira xwedê te’alayê ruh bidayê? Nedidayê. Ji kê ra dikeve? Mele ra dikeve.”

Dibê cima’et hev belav bû. Dibê bira Mîrze Miheme rabe. Ku wextê cima’et hev belav bû, dibê mişk şemdanê berjêr bû hat kete yêra<sup>1912</sup> xwe. Dibê cima’et belav bû. Gozel Dunyayê xwe gîhande şemdanê, dibê şemdan li ‘erdê da pirtîpirtî kir, go:

“Bîst sal ‘emrê min e. Te rojekî tişteki îha mi ra negotye.”

Mîrze Miheme bira here oda xwe. Ji birayê xwe bêjim, dibê Mîrze Miheme çû raza heta si’et dehê nîvro. Ji xew rabû serçehvê xwe şuşt. Qahvaltiya<sup>1913</sup> xwe kirin. Dibê hat xwe ra rûniştin. Dibê mişk dîsa gotê, go:

“Bira, bax<sup>1914</sup> îşev dîsa yê siwala ji me bikin. Ez ê îşev bikevme behlgîyê ber piştta Gozel Dunyayê. Ez ê di wir da cima’eta paşê ra nesîhet bikim, xeber bidim. Wextê gotne te, tu bê, bira pêş mi va ew xeber de, behlgî xeber de. Tu tev nebe.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Baş e.”

- 
- 1905 ) Şamdank, fînddank, mûmdank.  
1906 ) Binêrin.  
1907 ) Mude, mudet.  
1908 ) Axiriyê da, di dawiyê da.  
1909 ) Req û rût.  
1910 ) Bi maneya ‘kinc’ hatiye bikaranîn.  
1911 ) Gelo.  
1912 ) Cî, cih, şûn.  
1913 ) Taştê.  
1914 ) Binêre.

Dibê ara<sup>1915</sup> mexrevê ‘esrê ye. Dîwan berêkava<sup>1916</sup> top dibe. Dibê Mîrze Miheme, dexist efendî<sup>1917</sup> berda. Dibê efendî çû kete yêra<sup>1918</sup> xwe. Dibê dîwan tijî bûye, kimekim<sup>1919</sup> e. Dibê dîsa paşê go:

“Mîrze Miheme, kerem ke cima’etê ra nesîhetekî bêje, xeberdanekî bike.”

Dibê go:

“Paşa, ji te, cima’etê, heyetê, mezina, rûsipîya ra hurmeta min heye. Bira pêş min behlgî kerem ke cima’etê ra nesîhetekî bike.”

Dibê behlgî<sup>1920</sup> go:

“Cima’eta paşê, hebû carek ji cara rehme li dêbavê hazir û guhdara. Rind guhê xwe binê. Sê hev bira hebûn. Yekî ji stêrka însana zehf rind naz dikir. Her stêrkek ji boy însanekî ‘işaret dikir. Yekî wî dixtor bû. Yekî wan jî barevîng bû ku wextê biçûya bayê pê ra nedigîhand. Ev hersê bira l’ qurbetîyê bûn. Qîzapeke van hebû. Vana jî ji qîzapa xwe zehf hiz dikir, zehfff. Dibê rojekî ewî ku stêrka anamîş<sup>1921</sup> dibe, ji fehm dike, dibê dêna xwe dayê, stêrka qîzapa wan isa bûye ximam.”

Dibê zivirî cem wan herd birê xwe, go:

“Qîzapa me nexaş e, halekî xirab dane. Mi li stêrka wê nihêrye dûrima<sup>1922</sup> qîzapa me qe rînd nîne.”

Dibê dixtor kitêbê xwe anîn danî lê nihêrî, go:

“A eva îlacê me yê a niha ku cem qîzapa me bûya, qîzapa bixara, xwedê şifa bidayê yê baş bûya.”

Dibê Barevîng hat, ji Barevîng ra jî gotin. Dibê Barevîng go:

“Reçetê bidin, ez ê îlac biherim. Ew îşê min e.”

Dibê Barevîng reçeteya ku wana nivîsî [pê] îlac kirrî. Îlac anî da qîzapa xwe. [Behlgî, yanî mişk go]:

“Qîzapa wan niha baş bûye, qenc bûye. Xwedê şifa dayê, qenc bûye. Ev hersê bira sevê hev dikujin. Qîzîk ji kê ra dikeve, cima’eta paşê? Surê<sup>1923</sup> we deh deqe ye. De kerem kin cima’eta paşê, qîzîk kê ra dikeve?”

Dibê dîsa her kesî fikrek got, her kesî tişte got. Doxrî<sup>1924</sup> kelîme li ser sabit nekir cima’etê. Dibê dîsa Gozel Dunya hêrs bû xeber da. Dibê wextê xeber da, dibê go:

“Cima’eta bavê min e bêaqil, ewî stêrk nas kirye, normal e. Dixtor jî gotye, demanê mi wira bûya yê qenc bûya. Ê tamam. Ewî stêrk nas kirye. Ewî jî gotye, derman. Derman ma vira, nexaş jî wir e.

1915 ) Navber, navbeyn.

1916 ) Hêdî hêdî.

1917 ) Bi maneya ‘mişk’ hatiye bikaranîn.

1918 ) Cî, cih, şûn.

1919 ) Axiftina bi dengêkî nizm.

1920 ) Balif, balgî.

1921 ) Fehmkirin, têgihîştin.

1922 ) Rewş, hal.

1923 ) Mude, mudet, mawe.

1924 ) Rast, dirust, neşaş.

Ewê derman anye, qîzik, qîzapa wan ji wî ra dikeve. Barevîn, qîzik ji wî ra dikeve.”

Dibê cima’et rabû hev belav bû. Her kes çû îşê xwe. Mişk jî hate yêra<sup>1925</sup> xwe. Dibê paşê sîbetirê go:

“Mîrze Miheme, îşev gotin tişte tune. Tek şertekî min maye. Tu ewê bînî yêrê<sup>1926</sup> em ê hazirlîxa<sup>1927</sup> dehwatê bikin.”

[Mîrze Miheme] go:

“Baş e.”

Dibê êvarê rûniştin cima’etê da. Dibê Mîrze Miheme go:

“Paşa, kerem ke şertê te çî ye?”

[Paşa] go:

“Cîya min dergîstî bûye. Bi bavê mi nîşanlî<sup>1928</sup> biye. Li devê behrê geryane. Şimka wê ye zêr şiqitiye ketye behrê. Eger tu şimka cîya min bînî Gozel Dunya ya te ye. Ez ê jî karê dehwatê bikim. Eger tu neynî serê teyê here.”

Dibê êvarê cima’et belav bû. Dîsa Mîrze Miheme hate oda xwe. Duşmîş<sup>1929</sup> bû, xiyal lê giran bûn:

“Kuro, qosqoca<sup>1930</sup> behr! Şimik! Di behrê da ez ê çî bînim?”

Dibê dîsa mişk jêrva serê xwe li qutyê da, go:

“Kuro mala te xirabîyo! Ca mi dexe. Hey mala te xirabîyo çî jî xira bûye! Tu çîma xema-xîyala dikî? Kuro, ca bira sibe zelal be. Kuro, lê me mehsî bona çî j’ destê tûrcîya dexist berda behrê? Kuro, qencîke me ser wî heyê. Hele bira sibe zelal be.”

Dibê Mîrze Miheme raza, sibe zelal bû. Dibê qavaltîyê<sup>1931</sup> xwe kirin si’et deh yanzda (da). Dibê paşê heyetek tesmîlî<sup>1932</sup> Mîrze Miheme kir, go:

“Biherin yêra şimka dîya min lê inda<sup>1933</sup> bûye nîşanî Mîrze Miheme xin.”

Dibê Mîrze Miheme hildan birne devê behrê. Mîrze Miheme l’ devê behrê digere. Li wî serî ha tê, li wî serî ha diçe. Dibê mişk cake<sup>1934</sup> serê xwe l’ qutyê da, go:

“Mîrze Miheme, ez bi’ecîm mi ji vira dexe.”

Dibê dexist, go:

“Kuro mala te xirabîyo! Kuro, ca baskê mehsî derxe. Kuro, dexe çîka.”

Dibê dexist dane agir. Dibê qederekî çûn. Dibê mehsî serê xwe hinde j’ behrê, bîst santîmî dexist,

---

1925 ) Cî,cih, şûn.

1926 ) Cî,cih.

1927 ) Amadekarî.

1928 ) Dergîstî.

1929 ) Fikirîn.

1930 ) Gelek mezin, gewre.

1931 ) Taştê.

1932 ) Radest, teslîm.

1933 ) Winda.

1934 ) Dîsa.

go:

“Mîrze Miheme, emir ke. Ez bin emrê te da amade me. Tu çi bêjî serê mi oxra te da ne.”

Dibê go:

“Hal-meselê min, paşê a wiha.”

Dibê [mehsî] go:

“Mîrze Miheme, şimik cem pîrka min e. Ez ê xwe berdme behrê. Ez ê berê biînsanî bixazim. Eger pîrka mi da mi, mi anî, xwe mi anî. Ku nede ez mecbûr e bikujim. Ez wextê bikujim jî îdara mi di behrê da nabe. Gerekî idî tu mi xweyî kî.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê mehsî xwe berda behrê çû. Dibê weke si’etekî, du si’eta mehsî derneket. Dibê carekî dêna xwe dayê, mehsî hat şimik di dêv da ne. Dibê go:

“Mîrze Miheme, e çûme. Mi maxdûrîyeta j’ pîrka xwe ra anye ziman. Xilaskirina te ez xilaskirime jî mi anye ziman. Pîrka min bi ser navê însanetîyê şimik daye min, mi j’ te ra anye.”

Dibê şimik da Mîrze Miheme. Xatrê xwe xast, xwe berda behrê çû. Dibê xwe berda behrê çû. Ji axayê xwe ra bêjim, dibê Mîrze Miheme wextê şimik hilda, dibê ku kir rê keve, dibê mişk gotê:

“Kuro bêaqil! Kuro, ca hineki bira kincê te bibne qûm. Kuro, ca hinekî bira şil be. Kuro, xelk bizanibe te îşek kirye, lawo. A iha nabe.”

Dibê ketne rê hatin. Dibê hatne dîwana paşê. Dibê êvarê dîwan tijî bûye, cima’et giran e. Dibê paşê go:

“Mîrze Miheme, te gotna me pêk anye, kar kirye?”

Dibê go:

“Belê.”

Dibê dexist ji nava mendîla xwe danî pêşya cima’etê w paşê. Dibê her kes zehf sevmîş<sup>1935</sup> bû. Dibê Gozel Dunya jî tabî sevmîş bû. Dibê heta dereng rûniştin. Cima’et bela bû. Mîrze Miheme çû oda xwe. Her kes daxilmîş<sup>1936</sup> bû.

Dibê sibê paşê rabû gazî tellalçîya kir, go:

“Kuro, l’ defê xin. Hevt ro hevt şeva bira di şîher da bibe şaylixayî<sup>1937</sup>. Gozel Dunya mi daye mêt. Bira her kes were dehwata wê.”

Dibê paşê jî rabû eşyayê qîmetê wî giran bi xwe sivik bi barê deva [bar kir]. Dibê mesela hevt deve anî lall û durr bar kir. Hevt deve anî jê ra qumaş bar kir. Ê hevt deve anî ku tiştê başqe<sup>1938</sup> bar kir. Bi vî şeklî dibê mesarifa Gozel Dunyayê dîtin. Dibê ewa [qîrarê] mehra wê jî da. Nikaha wan da

---

1935 ) Dilşa bûn, pê dilşad bûn, dilxweş bûn, pê dilxweş bûn.

1936 ) Belav bûn.

1937 ) Şahî, dewat.

1938 ) Ya/yê/yên din, dî.

birrînê. Mehra wê da jî da, qararê mehrê jî ser xwe da rakirinê.

Dibê Mîrze Miheme xatrê xwe xast ji paşê. Gozel Dunya hilda bi rê ket. Dibê wextê hatin, dibê hatne wê bolga<sup>1939</sup> ku mişk hildaye [û] mişk gotyê, em çi bînin em ê li vira hev par kin. Dibê mişk dêna xwe dayê, qe Mîrze Miheme nasekine. Dibê mişk xwe ji cêva wî avît, go:

“Hop hemşehrim<sup>1940</sup>, tê l’ vira bisekinî.”

Peya bû l’ pêşya bazirgan sekinî, go:

“Tê li vira bisekinî. Me çi anye, me çi soz hev ra daye Gozel Dunya jî dahîl<sup>1941</sup>, em ê vira li hev par bikin.”

Dibê Mîrze Miheme duşmîş<sup>1942</sup> bû, go:

“Kuro bira, Gozel Dunya însan e. Em ê vê însanê ça hev par kin? Me çi anye hisa mi jî dahîl<sup>1943</sup> ji te ra [lê], Gozel Dunya nayê parkirinê.”

Dibê go:

“Mîrze Miheme, yan tê serê xwe derbas bî yan Gozel Dunyayê derbas bî. Şertê me ev e.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê mişk go:

“Kuro, Gozel Dunyayê destpîyê wê girêdin dayne ‘erdê. Isa daynin bira bedena wê neêşe.”

Dibê [mişk] gazî pehlîvanekî kir, go:

“Kuro, were vê derê. Kuro, bax<sup>1944</sup>, mi wextê go şûrê xwe bikşîne tê şûr bikşînî. Mi wextê go cendek orte ke lêxe, şûr bîne yalniz<sup>1945</sup> nebirre lênexe. Şûr bîne, lê nexê.”

Dibê wextê danîn, gazî pehlîvan kirin, go:

“Şûr bikşîne.”

Dibê pehlîvan wextê şûr kişand, dibê [mişk] go:

“De cenaze orte ke lê xe.”

Dibê wextê jor da anî ku lêxe, dibê tîremehrekî ji boxaza<sup>1946</sup> Gozel Dunyayê xwe avît.

Dibê mişk go:

“Kuro, ewî bikujin.”

Dibê ewa da kuştinê, go:

---

1939 ) Cih, dever, herêm.

1940 ) Hemşehriyê min, hemwelatîyê min.

1941 ) Tê de, di nav de.

1942 ) Fikirîn.

1943 ) Tê de, di nav de.

1944 ) Binêre, binhêre.

1945 ) Lê, lê belê, bes.

1946 ) Gewrî, qirik.

“Mîrze Miheme îşe ret<sup>1947</sup>. Em birayê hevdu ne. Tu ser çehvê mi ser serê mi ra hatî. Bi xatrê te, xwedê mirazê te bike.”

Dibê mişk gotê, go:

“Eva sêr bû li ser Gozel Dunyayê bû. Ku eva ranebîya tê jî bimrayî. Mesele ev bû. Lema mi gote te, em çî bîne vê derê em ê hev nivî kin. Te eva nizan bû.”

Dibê Mîrze Miheme wextê ku rê ket çû, dibê xebercîya pêş da xeber şandin, go:

“Mîrze Miheme hat.”

Dibê ayrica<sup>1948</sup> jî Mîrze Miheme namedarek-namek nivîsî ji şehre xwe şand. Dibê ji dîya xwe, ji ew meznê dabû dewsa xwe, dibê ji wana qederek esker xast, go:

“Ez dixazim qederek esker were.”

Dibê Mîrze Miheme, ew esker wextê hat bi wî şeklî, dibê daxilî şîherê apê xwe bû. Dibê apê wî şa dibe, dibê:

“Gozel Dunya ji mi ra tê.”

Apê wî jî wisa şa dibe. Dibê wextê apê wî qarşilamîş<sup>1949</sup> bû bi seyîsê wî va bi ‘Elo va, tabî ewa hê Mîrze Miheme ye Mîrze Miheme jî ‘Elo ye, dibê wextê qarşilamîş bû, go:

“Kuro ‘Elo, tu hatî?”

Dibê Mîrze Miheme emrê eskera kir, go:

“Evî bigrin. Evî bigrin, serê vî lê xin.”

Gerçek<sup>1950</sup> Mîrze Miheme emir da, go:

“ ‘Elo, lê xin.”

Dibê Mîrze Miheme hîkaye hemû ji apê xwe ra go, go:

“Hal-meselê min, ‘Elo ev e. Bi vî şertî bûye, bi ha jî bûye.”

Dibê gotê apê xwe, go:

“Mi Gozel Dunya, çûyîna e çûme j’ te ra çûme, mi anîna anye xwe ra anye. Gozel Dunya te tercîh bike ya te ye. Mi tercîh bike ya min e.”

Dibê apê wî jî qebûl kir, go:

“Kurê min, ez ê dehwatê Gozel Dunyayê jî dehwata te jî bikim. Herd jî xêlî-bimbarekî te bin. Gozel Dunya jî weke qîza min e îro şûnda. Ew jî evlada min e. Yeterkî<sup>1951</sup> hûn serfraz bin.”

Dibê apê wî anî, dehwata Gozel Dunyayê jî wîra da kirinê, dehwata Fatmayê jî da kirinê yek hefte areyle<sup>1952</sup>. Dibê Mîrze Miheme rabû herd xanimê xwe hilda bi mesrefeke giran va. Gêrî<sup>1953</sup> zivirî

1947 ) Xilas bûn, kuta bûn,

1948 ) Ji bilî vê, ji xeynî vê, xêncî vê.

1949 ) Pêşwazî kirin.

1950 ) Rast, rasteqîn.

1951 ) Bes.

1952 ) Bi navber, bi dor, bi rêzê.

1953 ) Paş, li paş.

bajêrê xwe, bajêrê Mîsrê li ser şehre xwe.

Sê sêv hatin cînetê, yek para min dudu para cima'etê. Sed rehme l' dêbavê wan be me ra gotye. Sed rehme l' dêbavê me w ometê, her kesî be, ku yê dînemîş<sup>1954</sup> bike, yê ku anye ziman, ku yê dayê dînemîşkirinê<sup>1955</sup>.

ÇÎROKBÊJ: SALHÊ HECÎ HEYDER

HERÊM: JI GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE-WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 52

PERWERDE: DIBISTANA SERETAYÎ

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 29/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

1954 ) Guhdar kirin.

1955 ) Guhdarîkirin.



## 20. ÇÎROKA MÎRZE MIHEME, KURÊ ŞAH AHMED<sup>1956</sup>

Dibê hebû carek cara rehme l' dêbavê hazir û guhdara.

Cima'eta hazir, de îja ku eva devra niha em tê da, ev tiştê em tîne ziman, di mezina di pêşyê me da di kal-bava da maye, di çanda kurdî da maye. Em jî îro vana ji ewê hevalê xwe yî han ra tîne ziman, diaxifin.

Dibê Şah Ahmed hebû. Şah Ahmed sê hev jinê wî hebû. Dibê jinê Şah Ahmed yek sal du sal arê<sup>1957</sup> re sîyarkirbûn. Bavê wî donema<sup>1958</sup> wî da bi wî şertî zewicandibû. Dibê çend sal arê ra derbas bû, zar ji jina çênebûn.

Dibê salek, du, sisê... dibê dayîna xwedê, dibê hersê jin tev hemle man. Dibê herd jinê mezin du hev law anîn, jina ku piçûk anîbû ewê lawek anî. Dibê navê lawa lêkirin. Nave lawê jina piçûk lêkirin Mîrze Miheme. Dibê lawê xwe ye dinê na her yekî wana navek da ser. Navê en<sup>1959</sup> lawê jina piçûk navê wî lêkir Mîrze Mihemed.

Dibê Mîrze Mihemed şeş hevt sal 'emrê wî bû, dibê ku notanî padşayê niha başqanê<sup>1960</sup> niha ça em bê, danişmanê<sup>1961</sup> wan hene, dibê yê berê jî aqilbendê wan hebû. Yanî padşahê berê, wezîrê berê, reîsê berê, dibê di goreyê ewa xwe da, di topluma da, di însana da, di civata da, mervê aqil [ku] dîrokê bizanibin, dibê ew mervana bi wan [dişewirîn]. Dibê îja Mîrze Miheme ra jî, dibê bavê wî Şah Ahmed însan derxistin gerandin, go:

“Hûn ê merivekî aqilmend, dîrokî hûn ê bînin. Ewê Mîrze Miheme yetişmîş<sup>1962</sup> ke.”

Dibê merivek anîn, navê wî 'Edo bû. Dibê 'Edo pîrr aqil bû, pîrr dîrokî bû. Dibê Mîrze Miheme idî bi her tiştê xwe, mesela bav olarak<sup>1963</sup> 'Edo didît, dê olarak 'Edo didît, arqadaş<sup>1964</sup> olarak 'Edo didît. Dibê şev rojê wî [û] 'Edo yek bû.

Dibê zeman hat, dibê paşa gazî lawê xwe kirin, go:

“Werin, yaşê<sup>1965</sup> ye idî. Zewaca we hatye. Eva jî heqê min e, ez ji we ra dibêjim. Hûn jî goreyê wê bigerin. Êş, dost, çevra<sup>1966</sup> xwe, goreyê xwe qîzekî bibînin.”

Dibê tabî ev însanana rabûn, yê dehwa qîza wezîr kir, yê dehwa qîza wekîl kir, yê dehwa qîza... Her kesî goreyê xwe, dibê xwe ra însanek seçmîş<sup>1967</sup> kir. Dibê Mîrze Miheme, 'Edo hat gote Mîrze

1956 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

1957 ) Navber, navbeyn.

1958 ) Heyam, dewr.

1959 ) Herî.

1960 ) Serok.

1961 ) Şewirmend.

1962 ) Mezinkirin, perwerdekirin.

1963 ) Wek, wekî.

1964 ) Heval.

1965 ) Temen, emir.

1966 ) Dêrdor, dorber.

1967 ) Hilbijartin, bijartin.

Miheme, go:

“Bavê te a iha gotye. Birayê te jî a iha tercihê xwe dane. Fikra te çî ye?”

Dibê Mîrze Miheme duşmîş<sup>1968</sup> bû, go:

“ ‘Edo, niha bawtî olarak<sup>1969</sup> idî tu dîtî, mi tu dîtî. Bigere, yeke henkûfê min tu begem kî, mi jî begem kirye. Ku tu bibîne em ê herin begem kin.”

Dibê [‘Edo] go:

“Isa?”

[Mirzê Miheme] go:

“E.”

Dibê evna derketin. Ku dewra berê, mesela niha em rêya berê ku bi meha çûne em niha bi roja diçin, bi si’eta diçin. Bi vî şeklî yanî ev aracê<sup>1970</sup> niha, ev ewê niha wî wextî tinebûne. Sîyarî bûye, bazirganî bûye, deve bûye, bi vî şertî ûlaşim<sup>1971</sup> çêbûye. Kewranî bûne, bi vî şertî çêbûne.

Dibê ‘Edo digere, du heftêya ser hev digere. Derdikeve zozanekî, dêna xwe dayê, êleke giran li zozanekî danye. Dajo êlê, diçe siwal dike:

“ Êl ya kê ye?”

Dibê:

“Êl ya Mîr Mehmûd e. Konê sertacê kona jî yê Mîr Mehmûd e.”

Eva dajo derê kon. Dibê qîza Mîr Mehmûd jî keçeke wî hebûye, ew jî di mal da bûye. Keça wî jî zehf keçeke civan bûye, zehf baş bûye. Em bê, [gazî] xanima, carîya dike, dibê:

“Bira hesp di destê mêvan, destê sîyar da nesene.”

Hespê hemen hildidin, dikşîne kêlekeke çayîrê, mêrgê, zozanê. Mêvan derbasî kon dikan. Dibê îja usûla wan a iha bûye. Ku tu mesela îro mêvanî ku hatî ça hatî vira, ku dewra wî wextî dibê heftêkî kesî j’ mêvana siwal nedikir, tu xelkê ku yî, tu ji ku yî, tu ji boy çî hatî, tu ji boy çî herî.

Dibê ‘Edo evna hemû tek tek ji carya, ji xulama, ji navmalya hêm bû. Siwal kir ji wana, fehm kir ev tiştana, go:

“Hetanî heftêkî tişteki siwal nekin.”

Dibê go:

“Hetanî heftêkî tişteki siwal neke.”

Dibê heftêyê wî wextê tamam bû, dibê Mîr Mehmûd gotê:

“Tu kê yî? Tu ji boy çî hatî? Tu ku da hatî? Tê ku da herî?”

Dibê go:

“Ez aqilmendê kurê Şah Ahmed im, aqilmedê Şah Mîrze Miheme. Ez digirim Mîrze Miheme

---

1968 ) Fikirîn.

1969 ) Wek, wekî.

1970 ) Wesayît, erebe, tirêmbêl, maşîn.

1971 ) Çûnûhatîn, veguhastin, veguhêzî.

bizewicînim. Hinde zeman e ez geryame. Siwal, siwal, siwal ez hatime vira. Salxê te mi ra dane. Qîzeke te ye baş heye. Gotna te mi ra çî ye?”

Mîr Mehmûd dibêjê, dibê:

“Şah Mîrze Mihemed were, ew [û] keça mi ku hevdu bibînin, ez ê jê ra tiştêkî bêjim.

Dibê:

“Baş e.”

Subetirê ‘Edo radibe, sîyar dibe tê. ‘Eynî du hefte rêya wî dikşîne, tê. Bîlgî<sup>1972</sup> dikeve şîher, dibê:

“Welle, ‘Edo hat. Mîrze Mihemed zewicand.”

Bîlgî diçe destê paşê jî. Paşa êvarê gazî ‘Edo dike. Şah Ahmed dibê:

“Çî ye?”

Dibê:

“Hal mesele ez hinde geryame. Filan zozanê, filan bolgê<sup>1973</sup>, filan yêrê<sup>1974</sup> da Mîr Mehmûd heye. Keçeke wî ye cîvan heye. Mi dîtye, mi salix kirye, mi soz jê standiye. Mîrze Miheme here ku hev begem bikin, mesele ret<sup>1975</sup> dibe.”

[Şah Ahmed] dibê:

“Baş e.”

Evna subê radibin. qederek sîyar, Mîrze Miheme bi paytûna xwe, evna rê dikevin diçin. Eva di vê dîrokê ku ev çarde rojê vana, du heftê van tamam dibe, evna derdikevne zozana Mîr Mehmûd.

Ev, heftêk li zozana Mîr Mehmûd dimînin. Herdu hevdu begem dikin. Mîr Mehmûd radibe mesarifeke bi xwe deyerê<sup>1976</sup> wê giran bi xwe sivik, bi goreyê aracê<sup>1977</sup> wî wextî ji van ra datîne, evna tîn.

Evna tîn. Evna tînê warekî. Şev dikeve ser wan. Warekî xirabe bûye. Ew şev li war disekinin, li war disekinin. Di kêleka war da darek heb’ye, dareke sipîndarê jê ra gotine. ‘Edo li ber darê rûdinê. Mîrze Miheme w dergîstîya xwe, ew jî li paytûnê rûdinên. Sîyar jî di etrafê wan bolga<sup>1978</sup> wan da her kes xwe ra hespê xwe qaş kirye, rûniştîye yêra<sup>1979</sup> xwe da. Şev ketye ser vana.

Wextekî şevê ‘Edo dêna xwe didê, sê hev kevotk hatne serê darê, wê dara sipîndarê li ser serê ‘Edo. Du hev dibêjne yekî, dibê:

“Dayê, ev kê ye?”

Dibê:

---

1972 ) Xeber, salix, agahî.

1973 ) Herêm, dever, navçe.

1974 ) Cî, cih, der.

1975 ) Kutabûn, xilasbûn.

1976 ) Qîmet, buha, nirx.

1977 ) Wesayît, erebe, maşîn, tirêmbêl.

1978 ) Di vir de ji bolgeyê mebest cî, cih, der e.

1979 ) Cî, cih, der

“Eva ‘Edo ye.”

Dibê:

“Lê evnê dinêna kê ne? Ev sîyar, ev bûk?”

Dibê:

“Eva Mîrze Mihemed e, kurê Şah Ahmed e. Eva jî qîza Mîr Mehmûd e, qîzaxatya we ye.”

Kevotk ji hev ra dibêjin, dibê:

“Îja eva qîzaxatya wê[ye]. Şah Ahmed kurê padşahê perîyan e. Gevernîgara qîza Qaqayê Xaweranê, Şah Ahmed kurê padşahê perîya, aşiqê wê bûye. Ewê jî sêr daye ser Şah Ahmed. Şah Ahmed niha [wisa] maye.”

Şah Ahmedê kurê padşahê perîyan e. Yanî evê rind ji hev derxe. Şah Ahmed dudu ne, yek kurê padşahê perîyan e, yek bavê Mîrze Mihemed e. Ew ji hev ayrî<sup>1980</sup> ne.

Kevotk dibêjine hev, ha. Ew her kevotk dibêjne ya dinê, dibê:

“Îja pekî îlgîke<sup>1981</sup> Şah Ahmed bi van çi tevhev heye?”

Dibê:

“Qedera Gevernîgara qîza Qaqayê Xaweranê li serê Mîrze Mihemed e, di serê Mîrze Mihemed e.”

Dibê:

“Îja yê niha ça be?”

Dibê:

“Îja eger ‘Edo hişyar be bira guhê xwe rind bidê. Ku evna sibê herin, yê herin serê rê, Şah Ahmedê were pêşya wan.”

Kurê padşahê perîya, Şah Ahmedê kurê padşahê perîya, eva jî eskerekî giran hildide tê ser Mîrze Mihemed. Eva tê ser Mîrze Mihemed. Bi vî qewlî tê ser Mîrze Mihemed. Ku wextê ev tê pêşya Mîrze Miheme, evna wextê dîkin bikevne cengê, dibê:

“Mîrze Miheme, ez bona cengê nehatime.”

Şah Ahmedê kurê padîşahê perîya, dibê:

“Mîrze Miheme, ez bona cengê nehatime pêşya te. Ez hatime pêşya te, sirreke min heye. Xêncirî te jî tu însan çozmîş<sup>1982</sup> nake, îlacê wê ba te ye.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“Bêje, çî ye?”

Dibê:

“Ez bêjim tê înanmîş<sup>1983</sup> bibî? Tê gerçek<sup>1984</sup> înanmîş bibî? Baweriya te yê bi mi were?”

---

1980 ) Cuda, cihê.

1981 ) Pêwendî, eleqe, têkilî.

1982 ) Helkirin, çareserkirin, safîkirin.

1983 ) Bawerkirin.

1984 ) Rast, rastî.

Ji Mîrze Miheme ra dibêje, dibê:

“Tê mi va emîn bibî?”

[Mîrze Miheme] dibê:

“E.”

[Şah Ahmedê kurê padişahê perîya] dibê:

“Ez kurê padşahê perîya me. Gevernîgara qîza Qaqayê Xaweranê, sêrek e daye ser min. Ez ê jina te vê derê tême mêvan bi sîyarê te, eskerê te, leşkerê te, berbîyê te ku heta te çû Gevernîgara qîza Qaqayê Xaweranê anî vira. Sêr ê betal be, tê bi mirazê şa bî ez ê jî herim mirazê şa bim. Tu heta neynî vira ew sêr betal nabe.”

[Mîrze Miheme] dibê:

“ ‘Edo, ti çi dibêjî?”

Mîrze Miheme îja dibêje ‘Edo. ‘Edo dibê:

“Ez qebûl dikim teklîfê. Teklîfa Şah Ahmedê Kurê Padşahê Perîya ez qebûl dikim. Em ê herin Gevernîgara qîza Qaqayê Xaweranê bînin.”

A îja gelgelelim<sup>1985</sup> yê ça bînin, yê ça were, bi çi şertî be.

Dibê evna rê ketin hatin. Şev kete ser vana, evna hatin li ber wê mala xirabe, li ber wê mala xirabe, dibê sekinîn. Mîrze Miheme w ‘Edo, dibê rûniştin li bin darê. Ji birayê xwe ra bêjim, dibê Mîrze Miheme de lawê zengînan e, lawê paşan e, negeryaye. Derd, kul, xem tunebûye. Kurkê xwe, ‘ebayê xwe kişande ser serê xwe, kete xewê. Dibê ‘Edo duşmîş bû taşmîş<sup>1986</sup> bû, si’et lê bûne roj, şev lê bû sal, şev nayê. Dibê Edo dêna xwe dayê, wextekî şevê hersê kevotk cake<sup>1987</sup> hatne ser serê darê. Dibê go:

“Ev kê ne?”

Dibê go:

“Eva Mîrze Miheme ye, ‘Edo ye.”

Dibê go:

“Evê hene ku?”

Dibê:

“Keça mi, evnê herin Gevernîgara Qîza Qaqayê Xaweranê bînin.”

Dibê:

“Îja yê ça bînin?”

Dibê:

“Eger ‘Edo hişyar be bira guhê xwe rind bidê. Ez ê terîf kim bira ew jî ûygûlamayê<sup>1988</sup> bike. Evna

---

1985 ) Balaxwedan, dênaxwedan.

1986 ) Hûr û kûr difîrîn.

1987 ) Dîsa, careke din.

1988 ) Sepan, tetbîq.

ku subê rabûn bira ‘Edo roja bijmêre. Yê hevt roja reşayê herin. Hevt ro reşayî çûn yê hefta jî qûmê herin, li qûmê. Yê herne devê behrê. Yê herne devê behrê, qayikçî heye. Ez ê niha meytûbekî binvîsim, jorda berdme bin darê. Eger ‘Edo hişyar be ku subê rabû bira meytûbê hilde. Meytûbê bide, ewê namê bide destê qayikçî. Qayikçî yê vana derbasî walî behrê ke. Wexta derbasî walî behrê bûn idî gor bavê wan. Idî ji walî bi çî şertî bikin, bi çî şeklî bînin ewa sorina<sup>1989</sup> wan e. Wextê hatin, ku anîn îja hatin, wextê ku anîn hatin bira hevt rojê xwe dîsa qûmê bijmirin hevt rojê xwe jî reşayê bijmirin yê dîsa werne vira. Ew ê jî vira bibne mêvan em ê jî vira bibne mêvan ew şev.”

‘Edo subê radibe. Evna radibin. ‘Edo kaxza xwe hildide diçin. ‘Edo roja dijmire. Tabî Mîrze Mîheme nizane. Mîrze Miheme arekî<sup>1990</sup> dibê:

“ ‘Edo, ew çî ye tu tê da mijxûl dibî, hesaba dikî?”

[‘Edo] dibê:

“Mîrze Miheme, ewa îşê min e îşê te nîne.”

Evna hefta bi reşayî diçin hefta bi qûmê diçin, diçne devê behrê. Diçne devê behrê, dêna xwe dinê, qayîkek li devê behrê sekiniye. ‘Edo derdixe ewê namê dide destê qayikçî. Qayikçî vana derbasî walî behrê dike. Şevêkî jî dike mêvanê xwe.

Evna sirra xwe ji qayikçî ra dibêjin, dibê:

“Em ji boy vî tiştî hatine.”

Qayikçî dibê:

“Baş e.”

Qayikçî dibê, baş e. Mîrze Miheme dimîne li mala qayikçî. ‘Edo w qayikçî dikevne şîher digerin. Dikevne şîher digerin. Rojek, dudu, sisê... ‘Edo dêna xwe dayê, yanî bi vî şertî bi qayikçî ra bigerin tu karî nakin, tu karî nakin. ‘Edo dibêje qayikçî, dibê:

“Mîsade te hebe em ê xanîkî kira kin. Xanîkî goreyê xwe em ê ji xwe ra kirê kin.”

Baş e. Evna sibê wexta derdikevin, ‘Edo dibêje qayikçî, dibê:

“Tu here îşê xwe. Em ê jî îşê xwe dewam bikin. Me îşê xwe qedand em ê te bibînin. Em yêra<sup>1991</sup> te zanin.”

Evna wextê dikevne şîher digerin, de Mîrze Miheme kurê padşan e, kurê dîtyan e, li apartmana digêrîne çehvê xwe, ‘Edo jî li xanîkî piçûk digêrîne ku yêreke<sup>1992</sup> lê bisenin, bisitirin, bibne mêvan. Dibê di saqoqekî ra, mehlekî ra derbas dibin, dêna xwe danê, pîreke yaşlî<sup>1993</sup> l’ ber dêrî sekiniye, dibê:

“Dakapîr tu mêvana xweyî dikî?”

---

1989 ) Pirsgirêk.

1990 ) Kêlî, qas, lehze.

1991 ) Cî, cih, der.

1992 ) Cî, cih, der.

1993 ) Pîr.

[Pîrê] dibê:

“Ser çehva. Yalnız<sup>1994</sup>, xarin, gîyecek<sup>1995</sup>, yîyecek<sup>1996</sup> tune.”

[‘Edo] dibê:

“Ewa li me, yeterkî<sup>1997</sup> tu me xweyî ke.”

‘Edo radibe mecdîkî dide pîrê, dibê:

“Bide yîyecek jî bide gîyecek jî, çi gerekmiş<sup>1998</sup> dike binê.”

Mecdîkî, perê berê, perekî dide pîrê, dibê:

“Here xerc bike. Çi mesref, çi çi gerekmiş ke hemûkî bîne.”

Pîrê diçe, çi gerekmiş dike hemûkî distîne tîne. Ew ro dimînin. Subetirê ‘Edo radibe li nava şîher digere, dikeve sira<sup>1999</sup> qesaba. Dikeve sira qesaba, li qesaba, sira qesaba digere. Dêna xwe didê, nêrkî wisa anîn mûta<sup>2000</sup> xezalekî. Dibê ‘Edo gote wan qesaba, go:

“Ev nêrî fiyeta wî çi ye?”

Dibê go:

“Sê mecdî.”

Dibê ‘Edo go:

“We ra çar mecdî. Goştê wî jî we ra, ha. Postê wî hûn ê bine min, deriyê<sup>2001</sup> wî. Hûn ê isa yuzmîş<sup>2002</sup> kin têle purta wî şaş nebe.”

Dibê yuzmîş kirin, tamam ser serê nêrî ra anîn. Qesaba goşt hilda post dane ‘Edo.

Dibê ‘Edo post ji wi ra hilda bire ce demaxçîya, ewê çêdikin. Dibê wana jî post zehf rind çêkir.

Dibê ‘Edo post cem wan jî hilda bire ser serafçîya. Dibê go:

“Hûn ê evê isa bixemlînin...”

De îja ku ewê wî wextî, yê wê donemê<sup>2003</sup> da, zêrê wî be, cevherê wî be, zumrûtê wî wextî be, bi çi şeklî [be], yanî ewê wî çaxî di dîrokê da pere kiribin, mûtanî<sup>2004</sup> mesela niha dibê micevher ya, pirlanta, zêr, di ‘eyne wî çaxî dibê:

“Hûn ê bi wî şeklî bixemlînin.”

Dibê evna wisa dixemilînin, ‘Edo dibê heqê wana hildide dide wan, dibê:

“Postê min ê li vir be, ez ê werim hildim.”

---

1994 ) Lê, lê belê, bes.

1995 ) Tiştên lixwekirinê.

1996 ) Tiştên xwarinê.

1997 ) Bes, hema.

1998 ) Hewce, lazim.

1999 ) Rêz.

2000 ) Mîna, nola, fenanî.

2001 ) Post.

2002 ) Gurandin.

2003 ) Çax, serdem. Heyam.

2004 ) Mîna.

Dibê ‘Edo dikeve şîher digere, paytûnekî xwe ra distîne. Dibê paytûnekî distîne. Dibê digere, xêncî paytûnê zengilekî distîne. Dibê zewngilekî distîne. Dibê êvarê paytûna xwe, zenglê xwe, postê xwe hildide tê malê. Dibê tê malê, Mîrze Miheme dibê:

“Eva çî ye?”

Dibêje ‘Edo. ‘Edo dibê:

“Mîrze Miheme, ku sube zelal be eva yê kêrî çî were, boy çî ye mi anye, tê bizanbî. Ez ê wî çaxî te ra bêjim.”

Dibê evna razan. Sube zelal bû. Dibê ‘Edo deyn<sup>2005</sup> Mîrze Miheme kir, go:

“Rabe.”

Dibê go:

“Rabe.”

Dibê ‘Edo anî ew post kişande ser Mîrze Miheme. Kişande ser Mîrze Miheme, zengil jî kire stûyê wî. Mîrze Miheme danî ser paytûnê. Paytûna xwe sîyar bû, mehle mehle digere. Dibê millet isa tê sêrê<sup>2006</sup> weke heşrê. Nêrî, bi vî hesabî, xemilandî! Dibê soqaq soqaq gerya. Netîce olarak<sup>2007</sup>, dibê rojekî kete soqaqa paşê bi xwe.

Paşa jî, qiral, şîher yê qiral bûye, Qiralê Qaqayê Xaweran. Navê padşa Qaqa bûye, navê qiral. Li Xaweranê bûye. Ji efendimê xwe ra bêjim, dibê paşa w jina xwe tev camê da sekinîne, lê sêr dîkin. Dibê ‘Edo jî si’et başî<sup>2008</sup> disekinî. Dibê si’eta wî wextê ku tamam bû rêkeve, dibê xanimê gote paşê:

“Em in Gevernîgar e. Ku evê mucîza hanê Gevernîgar nebîne, ku pê bihise yê me ra çî bêje?”

Dibê go:

“Tu heqlî<sup>2009</sup> yî.”

Dibê emrê xulama kir, go:

“Paytûncî<sup>2010</sup> bine sekinandinê.”

Dibê paytoncî sekinî. [Xulam] go:

“Qiral te dixaze.”

Dibê qiral jor da hat gotê, go:

“Tu a iha si’etekî disekinî, însan çîqa pere dide te mesela? Sêrcî<sup>2011</sup> tu çî qazanc dikî?”

Dibê dîyelîm<sup>2012</sup> go:

---

2005 ) Deng.

2006 ) Temaşe.

2007 ) Wek.

2008 ) Serê sietê, sietek carekî.

2009 ) Heqdar, mafdar.

2010 ) Paytonvan.

2011 ) Temaşevan.

2012 ) Em bêjin.



“Ez bîst mecdîyê hanê qazanc dikim.”

Dibê [qiral] go:

“Te ra sed mecdî. Tê herî, ev merva yê te biherin. Tê herî derê dîwana qîza mi, derê dîwana Gevernîgarê. Ewê jî temaşe bike.”

Dibê [‘Edo] go:

“Baş e. Sorin<sup>2013</sup> tune be?”

Dibê [qiral] go:

“Na. Qiralê vî şehri ez im.”

Dibê hemen gazî yazicî<sup>2014</sup> kir, go:

“Kuro, kaxizekî binvîsin mora mi lêxin bine vî mervî. Tu çiqa di şehre mi da bimînî sorin<sup>2015</sup> tune, bi emrê padşê.”

Eva daha<sup>2016</sup> bû tişteki rind ji wan ra. Dibê xulamê vana da pêşyê, evna çûne derê Sera Gevernîgarê. Gevernîgar qîza kê ye? Qîza Qaqayê Xaweran e. Ji axayê xwe ra bêjim, dibê l’ derê dîwanê sekinîn. Dibê xulam zîl çalmîş<sup>2017</sup> kir. Gevernîgarê serê xwe di camê ra derxist. Dêna xwe dayê, tişteki muhteşem, go:

“Bira devra nesekinin wene hundur.”

Dibê hildane hundur. Dibê ‘Edo derbasi koşekî, yalîkî odê bû. Dibê Gevernîgarê jî nêrî hilda oda xwe, bira bi nêrî şa be. Dibê bi nêrî şa be. Dibê de îja çi ji nêrî ra anîn! Her tişt, çêre be, gîha be, once be! Korîgan wî ‘esrê evna tunebûne. Yanî ‘eyne gîha-çêre hebûye, ne ev tiştê niha hebûne, dibê tînin. Ew jî xwe ra kirtkirt destê xwe da diqetîne davêje ‘erdê pêşîya xwe.

Dibê wextê xarinê hat, dêna xwe danê, Gevernîgarê ra qazake sorkirî hat her tişt ser. Dibê parçek jê hilda xar. Yê dinê jî danî wê derê, kêleka mûtfaxê. Nanê ‘Edo jî ayrî<sup>2018</sup> çû.

Dibê si’eta xewa wê hat. Dibê hîngî pê leyîstîye, dibê nizane si’et çî ye. Dibê Gevernîgarê serê xwe avîte xewê. Dibê Mîrze Mihemedê te ji post deket. Dibê dest-serçehvê xwe şûşt, bi pêjgîrê ziha kir. Dibê qaza xwe anî, nîvî goştê xwe xar. Têr xar, çû kete postê xwe. Dibê rojek, dudu, sisê... Dibê Gevernîgar di vî tiştî da şupelemîş<sup>2019</sup> bû. Dibê go:

“Yawo, ez êvarê derî da didim. Ew merva li wî yalî, ez [û] nêrî li vî yalî? Çi hebe nêrî da heye?”

Gevernîgarê jî dibê çiqa remildarê wî wextî hebûne, tarîhçiyê<sup>2020</sup> wî wextî hebûne, em bê, ewê jî li remla nihêrîye li ser vê qederê, qeder li serê Mîrze Miheme bûye. Nizanbûye Mîrze Miheme xelkê

---

2013 ) Pirsgirêk.

2014 ) Katib, nivîsevan.

2015 ) Pirsgirêk.

2016 ) Zehf, gelek, zêde.

2017 ) Li zengilê dêrî xistin.

2018 ) Cuda, cihê.

2019 ) Şik kirin, şik birin, guman kirin.

2020 ) Dîroknas, mêjûnas.

ku ye, li kîjan welatî ye, kurê kê ye. Yalniz<sup>2021</sup>, nav olarak<sup>2022</sup> Mîrze Miheme ye.

Dibê êvarê pê şabû heta wextekî şevê. Dibê derbasî mûtfaxê bû. Normalde<sup>2023</sup> dibê neşter tiliya xwe da, dibê hinekî jêkir. Dibê xwêy berdayê, go:

“Bira birîn bişewite, xew nekeve çehvê mi ka eva çi mesele ye.”

Dibê bi wî şertî, dibê xwe ser yataxa xwe, xwe dirêj kir avîte xewê, kenehû.

Dibê dêna xwe dayê, post vebû. Însanek ji post deket. Xwedê te’ala isa çêkirye, [bi] qelema xwedê bedew w bedew. Dibê duşmîş<sup>2024</sup> bû. Eva Gevernîgar duşmîş dibe, ha. Hayala<sup>2025</sup> xwe da, dibê:

“Eger kurê padşa be ku ‘esilzade be, dîtek be, însan be, yê berê here des-serçehvê xwe bişo. Eger birçî be yê nan buxwe. Eger ku ji mi hiz bike hema ça ji post derkeve [yê were rûyê min paç bike]. Eger îja nedîtek be, dunyanedîti be, ji însanetiye fehm neke, yê yan saldirmîşî<sup>2026</sup> mi ke yan saldirmîşî nan ke. Ji van her tiştê yê yekî bike.”

Dibê dêna xwe dayê, Mîrze Miheme wextê ku deket, dibê derê lawaboyê vekir. Çû des-serçehvê xwe bi sabûnê şûşt, temîz kir. Pêjgîr hilda, des-serçehvê xwe zuha kir. Nan anî, nanê xwe xar. Cake<sup>2027</sup> ‘eyne bi wî şeklî rakir. Çû des-serçehvê xwe tekrar bi sabûnê şûşt, ziha kir. Hat ku here rûyê wê, dibê ku hat here rûyê wê, dibê ewê bi zenda Mîrze Miheme girt. Dibê bi zenda Mîrze Miheme girt, dibê go:

“Tu kê yî?”

Dibê go:

“Ez Mîrze Miheme me. Ez kurê Şah Ahmed im. Ez ji welatê Qafa hatime vira. Ji welatê Qafa hatime vira.”

Dibê [Gevernîgarê] go:

“Îja tu bi çi şertî hatî?”

Dibê go:

“Ez hatim. Ji behrê me heq da qayîkçîkî em derbas kirin. Em derbasî şîher bûne. Hinde zeman e jî em di şîher da nin. Ez jî ji bona te hatime. Navê min Mîrze Mihemed e.”

Dibê go:

“Mîrze Miheme, mi jî çîqa remildara siwal kirye, însanê xandî<sup>2028</sup> siwal kirye, qedera min serê Mîrze Miheme bûye. Ema Mîrze Miheme kurê kê ye, ji ku ye, ez ewê nizanim. Yalniz<sup>2029</sup>, tiştêkî

---

2021 ) Lê, lê belê, bes.

2022 ) Wek, wekî.

2023 ) Bi maneya ‘hinekî, piçekî’ hatiye bikaranîn di vê hevokê de.

2024 ) Fikirîn.

2025 ) Xeyal.

2026 ) Rikêfkirin, êrişkirin.

2027 ) Dîsa, careke din.

2028 ) Xwende.

2029 ) Lê, lê belê, feqet, bes.

dinê jî heye. Yekî dinê jî aşiqê min e. Ez ewê jî te ra bêjim.”

[Mîrze Miheme] go:

“Ew kê ye?”

[Gevernîgarê] go:

“Ew jî Şah Ahmedê Kurê Paşayê Perîya ye.”

Dibê Mîrze Miheme gotê, go:

“Ez ji bona xwe hatime. Te ji xwe ra biherim ne ku Şah Ahmed ra biherim.”

[Gevernîgarê] go:

“Baş e.”

[Mîrze Miheme] go:

“Îja tu çî dibêji ku hatina xwe ra. Tê bêjî erê, tê neyê. Eger tu werî em ser karê çûyînê bin. Eger tu neyê jî hadê rojek, hadê dudu, hadê heftêk, ez ê vira mecbûr terk kim.”

Dibê [Gevernîgar] duşmîş<sup>2030</sup> bû, go:

“Mîrze Miheme, ez ê werim bi şertekî . Yalnız, tu mi nedî Şah Ahmedê Kurê Paşayê Perîya, mi nedî wî da.”

Dibê Mîrze Miheme jî gotê:

“Şert, sond, ez te j’ xwe ra dibim ne bi wî ra. Ez vî sozî vî şertî dime te.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê evna ketne xewê. Dibê subê rabûn. Mîrze Miheme ji post derket. Dibê bi ‘Edo ra gurişmîş<sup>2031</sup> bûn. Dibê Mîrze Miheme gote ‘Edo, go:

“Idî karê tivdareka jiem şîher derkevin, wî karî bike.”

Dibê ‘Edo rabû, gerya. Dibê ‘Edo gerya. Dibê ‘Edo di nava şîher da gerya, çû meydanê. Çû meydanê. Dibê ‘Edo du hev hesp kîrîn. Dibê du hev hesp kîrîn, du hev hespê temîz. Dibê ‘Edo bire xanekî tesmîlî<sup>2032</sup> xançî kir, go:

“Tê heftêkî van hespa zehf xweyî bikî, zehf temîz xweyî kî.”

Dibê ‘Edo gerya. Çû mala qayikçî, qayikçî dît, go:

“Filankesî, filan rojê filan si’eta şevê da tê me derbas kî. Weke wê hazirlixa<sup>2033</sup> xwe bibîne. Mesela îro şemî ye, şemîya were si’et dehê şevê da, duduyê şevê da, tê me l’ devê behrê hildî, me derbasî walî kî.”

Dibê qayikçî qebûl kir. Dibê [‘Edo] zivirî ser xançî, gotê xançî, go:

“Ez ê filan rojê hespê xwe biherim.”

---

2030 ) Fikirîn.

2031 ) Hevdîtin.

2032 ) Teslîm, radest.

2033 ) Tevdîr, tivdarek.

Tabî si'et, sanîye jê ra kifş nekir. Dibê 'Edo zivirî cem pîrê, gote pîrê, go:

“Du hev hespê min hene. Em ê bikaribin vana li vir xweyî bikin.”

Dibê pîrê go:

“Belêêê.”

Dibê 'Edo derxist sê mecidîyê dinê jî da pîrê. Dibê 'Edo çû hesp ji xanê hilda anî. Rojek maye here, dibê hesp ji xanê hilda anî da cem pîrê. Dibê yê roja ku ew şev rê kevin, dibê 'Edo çû nav nehlbenda gerya. Li xana nehlbendek dît, anî. Dibê gote nehlbendcî, go:

“Tê van hespa ters<sup>2034</sup> nehl bikî. Yanî ça ters nehl bikî, tê nehla ters li binê pîyê wan xî, rê ji devê behrê were [nav] şîher. Tu çi dixazî?”

Dibê nehlbendcî duşmîş<sup>2035</sup> bû. Perekî deyerê<sup>2036</sup> serê xwe, yanî xûna xwe ji wan xast. Dibê 'Edo ji wî zêdetir dayê. Dibê nehlbencî hesp nehl kirin, gote wana, go:

“Ne we ez dîtîme ne min hûn dîtîne.”

Dibê ['Edo] go:

“Baş e.”

Dibê 'Edo waxtekî şevê paytûna xwe hilda, li derê koşka Gevernîgarê [sekinî]. Gevernîgar bi Mîrze Miheme va hilda hate mala pîrê. Hesp derxistin li hespa sîyar bûn, çûn. Herrek tu nasekinî. Dibê ajotne devê behrê. Axayê min, dibê qayiqçî hazir bû. Evna hildan danî walî behrê, go:

“Idî hûn bi çi şertî diçin herin.”

Dibê wextê danî walî behrê, go:

“Hûn bi çi şertî diçin idî herin. Eva idî îşê we ye.”

Dibê 'Edo cake<sup>2037</sup> jimirî rojê xwe. Heftêk li qûmê çûn, heftêk jî reşayê çûn. Dibê roja heftêyê wan tamam bûn, [li] kolka xirabe, li ber darê bûne mêvan, êvarê. Dibê waxtekî şevê ye. 'Edo dîsa xwe ra rûniştîye, xew lê nayê:

“Ka sibê yê ça be? Ê, Şah Ahmed Kurê Padşayê Perîya bi eskerekî giran li ser rê ye? Jina Mîrze Miheme li wir e, mêvan e? Ê, Gevernîgarê jî, Mîrze Miheme soz dayê ku qe çehvê Şah Ahmed nebîne?”

'Edo di xayalê da ne:

“Yê ça be? Yê çi terî be? Yê bi çi terî be?”

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê evna xwe ra rûniştin. Nan be, yîyecek<sup>2038</sup> be, dibê xarin. Dibê Mîrze Miheme bi Gevernîgar, dibê xwe ra rûniştine. Dibê 'Edo l' ber kolikê sekiniye. Evna jî li kêleka 'Edo ne. Dibê waxtekî şevê 'Edo ji cem van rabû, hate bin darê. Evna ketne xewê. 'Edo jî rabû hate

---

2034 ) Çep, berevajî.

2035 ) Fikirîn.

2036 ) Biha, qîmet.

2037 ) Dîsa.

2038 ) Xwarin.

bin darê.

Dibê ‘Edo dêna xwe dayê, dîsa hersê kevotk hatin, hatne serê darê. Dibê duduya gote yekî, go:

“Dayê evna kê ne?”

Go:

“Welle, eva Mîrze Mihemed e. Eva jî Gevernîgar e, anîne. Yê sibê biherin. Mîrze Miheme yê wê derê jina xwe hilde, yê herin.”

[Du kevotkan] go:

“Îja yê ça biherin? Jina wî mêvanê Şah Ahmed e, Şah Ahmedê Kurê Padşahê Perîya? Mêvanê wî ye.”

[Kevotk] dibê:

“Îja yê a iha be. Niha wextê Mîrze Miheme qîza Mîr Mehmûd, qîzaxatya we, tasmîlî<sup>2039</sup> Şah Ahmed kir.”

Şah Ahmed gotê, go:

“Eva xûşka min e, tu jî birê min î hem vê dunyayê hem wê dunyayê yî. Birê min î axretê yî. Jina te jî xûşka min e.”

Şah Ahmedê Kurê Padişahê Perîya eva gotna gotîye. Dibê ji Mîrze Miheme ra ev gotin anîye ziman.

[Kevotk] dibê:

“Îja evna wexta subê herin, bira ‘Edo rind guhê xwe bidê, eger hişyar be. Eger raza be, bira here xewna wî. Hişyar be, bira xeberdanê min hene guhê wî, guhê bidê. Eger di xew da be, bira here xewna wî. Evna wexta subê herin, ku çûn yê derkevne qarşî<sup>2040</sup> wan.”

Ahmedê bêje, Şah Ahmedê Kurê Padişahê Perîya yê bêje Mîrze Miheme, yê bê:

“Te Gevernîgar anî, em ê li vira hev par kin.”

[Kevotk] dibê:

“Mîrze Miheme yê bêjê bê, yawo, te bextek dabû min sozek dabû min. Eva parkirin di arê<sup>2041</sup> tune bû. Em ê çi terî, însanek e, em ê çi terî par kin?”

[Kevotk] dibê:

“Tabî ewna nizanin. Di boxaza<sup>2042</sup> wê da tîremehrekî zehîrlî<sup>2043</sup> heye, di boxaza Gevernîgara Qîza Qaqayê Xaweran da. Mesel ev e. Parkirinê were ser vê nuqtê. Wextê ku ev parkirin bi vî şeklî dewam bike,”

Bira ‘Edo bêje herdika jî bê:

---

2039 ) Teslîm, radest.

2040 ) Ber, pêşber, hember.

2041 ) Navber, nav.

2042 ) Gewrî, qirik.

2043 ) Bijehr, jehrdar.

“Hûn bisekinin eva îşê min e. Ez hem bavê Mîrze Miheme me hem bavê Governîgarê me. Governîgarê gotna mi bike, gotna kesî nake.”

[Kevotk] dibê:

“Yê destê Governîgarê girêdin li ser piştê hespê dayne ‘erdê. Wextê danîne ‘erdê, Edoyê şûrê xwe bikîşîne.”

Dibê Şah Ahmedê bêjê, Şah Ahmedê Kurê Padşahê Perîya, yê bê:

“Qefesa wê orte ke, lê xe. Bira qefes yekî me ra here, cendek yekî me ra here.”

[Kevotk] dibê:

“Wextê ‘Edo şûr bikişîne ku bîne, bira lê nexê. Ew tîremehrê ji boxazê<sup>2044</sup> bireve, xwe bavêje. Wextê tîremehr xwe bavêje sêhr betal dibe. Yê tîremehrê bikujin. Mesele ret<sup>2045</sup> dibe. Mesele ev e. Eger ku wî şertî nebe, dîrekmen<sup>2046</sup> biherin, ew tîremehrê lêxe Mîrze Miheme bikuje. Sorin<sup>2047</sup> ev e.”

‘Edo, tamam guhê xwe didê. [Kevotk] dibê:

“A hege ku dîsa hişyar be bira guhê bidê, raza be here xewna wî. Bi xatrê te, em diçin.”

‘Edo bira idî dilekî şa serê bavêje xewê. Em jî vegerne îskane çayê. Dibê îja sibe li ometê zelal bû van însana jî tevayî. Dibê evna rabûn, dîsa l’ hespê xwe paytûnê xwe sîyar bûn. Dibê ro qama nîvro ‘esrê, derketne bal Şah Ahmedê Kurê Padşahê Perîya. Dibê wextê derketne bal Şah Ahmedê Kurê Padşahê Perîya, dibê Şah Ahmed gotê, go:

“Mîrze Miheme, birê mi, tu bixêr hatî. Tu bi silametîkî hatî.”

Dibê kêfxaşi dane hev. Dibê Şah Ahmed gotê, go:

“Mîrze Miheme, îşev bibne mêvanê min. Subê ez ê destûra we bidim. Ez ê ji xûşka xwe ra jî karekî bikim.”

Jina wî ye qîza Mîr Mehmûd, [Şah Ahmed] dibê:

“Ez ê ji xûşka xwe ra jî karekî bikim. Hûn ser çehvê mi ra hatine. Yalniz<sup>2048</sup>, ku tiştêkî dinê jî heye, ez ewê jî te ra bêjim. Em ê Governîgarê vira li hev paylaşmîş<sup>2049</sup> kin. Em ê Governîgarê têne du cîya, nivî j’ te ra nivî jî mi ra.”

Dibê wextê ev anî ziman, dibê Mîrze Miheme eva tiştê qebûl nekir. Dibê Mîrze Miheme eva tiştê qebûl nekir. Dibê ‘Edo gote Mîrze Miheme, go:

“Mîrze Miheme, tê bi gotna mi niha bikî, gotna mi hereket bikî. Wextê te ez bavtî xwe ra qebûl kirime, Governîgarê jî ez bavtî olarak qebûl kirime. Şah Ahmed jî mi qebûl dike. Hûn mecbûr in bi gotna mi bikin. Eger hûn bi gotna bikin, eva tiştê yê çêbe. Eger hûn bi gotna mi nekin, yê xira be.”

---

2044 ) Gewrî, qirik

2045 ) Kutabûn, xilasbûn.

2046 ) Rast, rasterast, yekser.

2047 ) Kêşe, pîrsgirêk.

2048 ) Lê, lê belê.

2049 ) Parkirin.

Şah Ahmed jî dibê:

“Ez bi gotna te dikim.”

Mîrze Miheme jî dibê:

“Ez gotna te dikim.”

Gevernîgar jî dibê.

“Ez jî qebûl dikim gotna te bavtî olarak<sup>2050</sup>. Tu çi bêjî ez bin emrê te da im, amade me.”

[‘Edo] dibê:

“Baş e.”

Emir dike, dibê:

“De destê Gevernîgarê girêdin, pîyê wê girêdin.”

‘Edo vana dibêje, ha. ‘Edo vana dibêje, dibê.

“De dayne ‘erdê bira bedena wê neêşe.”

Datîne ‘erdê. ‘Edo gazî Mîrze Miheme dike, dibê:

“Mîrze Miheme, şûrê xwe ji qilif bikşîne.”

Wextê Mîrze Miheme şûr dikşîne, [‘Edo] dibê:

“Tê cendek orte kî. Qefes yekî we ra, govdeyê<sup>2051</sup> hevraztir yekî ra, berjêrtir yekî ra. Hûn herdik jî qebûl dikin?”

Dibê:

“Em qebûl in.”

[‘Edo] dibê:

“Mîrze Miheme, qefesê orte ke şûr lê xe.”

Wextê Mîrze Miheme şûr jor da tîne, ‘Edo dest davêjê, tîremehr ji qirka Gevernîgarê davêje.

Wextê qirka Gevernîgarê davêje, [‘Edo] dibê:

“Tîremehrê bikuje.”

Eva îşa ‘Edoyê bikira, ‘Edo bi Mîrze Miheme dide kirinê. ‘Edo bi Mîrze Miheme evî tiştî dide kirinê. ‘Edo ku wextê dînemîş<sup>2052</sup> dike vana, ew kevotk dibêjin, dibê:

“Edoyê evê bike.”

‘Edo evê bi Mîrze Miheme dide kirinê. Guhdar ‘Edo ye, bi wî dide kirinê.

Dibê ku wextê tîremehr kuştin, dest-pîyê Gevernîgarê vekirin. Dibê [Mîrze Miheme û Gevernîgar] sarilmîşî<sup>2053</sup> hev bûn.

Dibê Şah Ahmed nehîşt ev herin. Dibê ew şev bûne mêvanê wî. Dibê sibê rabû Gevernîgar jî xelat kir. Qîzhatya xwe, qîza Mîr Mehmûd, dibê mesrefek jî wê ra kir. Ewa, qîzhatya Şah Ahmedê Kurê

---

2050 ) Wek, wekî.

2051 ) Gewde.

2052 ) Guhdarîkrin.

2053 ) Hemêzkrin, hembêzkrin.

Padşahê Pêriya ye, qîza Mîr Mehmûd e. Mîr Mehmûd jî ji wan ewka [perîyana] bûyê.

Ji axayê xwe ra bêjim, dibê xelatek jî li Mîrze Mihemed kir, dibê go:

“Ez, tu îro şûnda birê hev e hem vê dunyayê hem wê dunyayê ne. Mi j’ bona vî tîremehrî gote te, Gevernîgarê tê bînî vira, yê sêrê ser ma ra ke, sêr ev bû. Te nizanbû, mi zanibû. Bi tevî sorin<sup>2054</sup> ev bû.”

Dibê ku evna rabûn bi rê ketin, dibê îja caw<sup>2055</sup> bi Şah Ahmed ra çû, Şah Ahmedê bavê Mîrze Mihemed. Sewraxt<sup>2056</sup> be, ha. Dibê go:

“Welle, Mîrze Miheme ‘Edo hatin. Mîrze Miheme xwe ra du jin jî anîn.”

Yalniz<sup>2057</sup>, di vir da me tiştêk bîr kirye. Tiştê me bîr kirî çî ye? Ez ewê jî tekrar bînme ziman. Dibê evna wextê hatin hatne bin darê, kevotka hemû hev ra gotin, dibê go:

“Îja wexta evna subê herin, xeber ji bavê Mîrze Mihemed ra here, Şah Ahmed ra here, Şah Ahmedê gulekî ji jehrê çêke. Yanî Mîrze Miheme wê gulê hilde qoqlamîş<sup>2058</sup> ke yê pê bimre, zehîrlenmîş<sup>2059</sup> be. Eger ‘Edo ew gul qetand, mesele namîne, tu zirara vana çênabe.”

Bavê Mîrze Miheme, jê nefret kirye. Tek sorin<sup>2060</sup> nefretkirina wî bûye. Nefretkirina wî çî bûye? Ji jêhetîbûna Mîrze Mihemed bûye, ji aqilbendîya ‘Edo bûye. Çima ji aqilbendîya ‘Edo bûye? Mîrze Miheme wextê hevt salî bûye, ‘Edo hatye, Mîrze Miheme idî ‘Edo hem bav dîtye hem dê dîtye. Zemanê xwe bi wî ra derbas kirye.

Dibê evna wextê hatin ber bi şîher va, rêya vana nêzik bû, ji birayê xwe ra bêjim, dibê padşê rabû qefle sîyar hilda bi def bi zurne. Dibê di şîher da bû girminîya defê w zurnê. Reqascî deketin, genc deketin, qîz xort deketin. Wan kurê paşê ye dinê xanimê xwe hildan, her kesî xwe xemiland, go:

“Welle, birayê me tê em ê jî pêşva herin.”

Dibê paşê jî gulek ji jehrê da çêkirinê. Da destê gencekî, gencekî cîvan, dibê go:

“Wextê min Mîrze Miheme hemêz kir, tê evê gulê keremî Mîrze Miheme kî.”

Tabî ew genc jî nizane gul zehîr<sup>2061</sup> e, ama<sup>2062</sup> ‘Edo zane. Dibê Êdo zane. Dibê evna jor da ketne şîher. Dêna xwe danê, qefle sîyarê giran jêr va hilksîya. Mîrze Miheme dêna xwe dayê, bavê wî, birê wî, jinbirê wî, heyeta bavê wî tamam pê ra sîyar in. Zehf sevmîş<sup>2063</sup> bû. Dibê ew jî, ‘Edo jî, xanimê wan jî zehf şa bûn.

Dibê wextê bavê wî, Şah Ahmed, dibê wextê Mîrze Miheme hemês kir, ‘Edo hemês kir, bûkê

---

2054 ) Pirsgirêk, kêşe.

2055 ) Cab, cewab, xeber.

2056 ) Serwext.

2057 ) Lê, lê belê, bes.

2058 ) Bênkirin, bêhnkirin.

2059 ) Bijehrêketin, jehrîbûn.

2060 ) Pirsgirêk, kêşe.

2061 ) Jehr.

2062 ) Lê, lê belê, bes.

2063 ) Şabûn.



xwe tebrîq kir, dibê ewî gencî ew gul dirêjî Mîrze Mihemed kir. Dibê ‘Edo jî şûr avîtê gulê, pirtîpirtî kir, gul kete ‘erdê hemû. Dibê paşa jî uzuntî<sup>2064</sup> hîs kir. Yanî qarşî<sup>2065</sup> toplimê<sup>2066</sup> kenehu zehf uzulmîş<sup>2067</sup> bû. Dibê yalniz, Mîrze Miheme zehf qehirî. Mesela [go]:

“Bavê mi ev gula hanê anî? ‘Edo eva gula ha kir?”

Dibê Mîrze Miheme zehf qehirî. Ji birayê xwe ra bêjim, dibê êvarê bû girminîya defê w dehwatê. Dibê paşê yek hefte şîher da kir def-dehwat. Goruntu olarak<sup>2068</sup> em isa bêjin. Dibê êvarê ku heftêya wan tamam bû ‘alima nikahên wan birrîn, ji axayê xwe ra bêjim, yê herdu jina. Dibê Mîrze Miheme wextê ku êvarê çû, dibê ma xuşûşê da, dibê go:

“Eva sorin<sup>2069</sup> çima ha bû? Eva çî ye? Sonicê<sup>2070</sup> were ku? ‘Edo ew gul çima firand?”

Hê di xayalê da ne. Dibê go:

“Ez ê herim bêjme ‘Edo, ev sorin çî ye? ‘Edoyê mi ra bêje.”

Dibê Mîrze Miheme çû. Dibê gote herd jînê xwe, go:

“Hûn ê niv si’etî mi molet bikin goruşmeke<sup>2071</sup> mi, ‘Edo heye. Sorinek heye. ‘Edo bira mi ra çozmîş<sup>2072</sup> ke. Yanî tu xayalê da hûn nemînin. Xwe ra dîwanê xwe da rûnên heta ez têm.”

Dibê Gevernîgarê gotê, go:

“Eger mumkun be ‘Edo bîne vira em jî pê bihisin. Bira di tarîyê de nemîne.”

Dibê Mîrze Miheme go:

“Na. Ez bêjim, ‘Edo were jî ‘Edo nayê vira. ‘Edo ne ew însan e ku were vira.”

Dibê Mîrze Miheme rabû. Dibê çû, dêna xwe dayê, ‘Edo rûniştîye, duşmîş<sup>2073</sup> dibe. Dibê wextê ‘Edo Mîrze Miheme dît ku rabe, dibê Mîrze Miheme go:

“Ranebe. Min hetanî niha tu bawtî ça qebûl kiriyî hema îro şûnda ‘eynî wî qaydeyî. Erê, ez kurê Şah Ahmed im. Hema bavê min tu yî. Were rast bêje. Mesele çî ye? Sêrî da çî bûye? Ça bûye? Tu ev tiştana ji ku hîm bûyî? Kê te ra gotin? Heta were gula bavê min, tê hemûkî mi ra bêjî.”

Dibê ‘Edo duşmîş<sup>2074</sup> bû, go:

“Ez bêjim paşayê mi bikuje, ez nebêjim tê mi bikujî. Ez emîn im. Yalniz<sup>2075</sup>, ez nabêjim. Sirrek e, bira bimîne.”

---

2064 ) Xem, kerb, keser, kovan.

2065 ) Pêş, pêşber, hember.

2066 ) Civat, cimaet.

2067 ) Keribîn, kesirîn, xemgînbûn, liberketin.

2068 ) Wek, wekî.

2069 ) Pirsgirêk, kêşe.

2070 ) Encam.

2071 ) Hevdîtin.

2072 ) Helkirin, çaresekirin.

2073 ) Fikirîn.

2074 ) Fikirîn.

2075 ) Lê, lê belê, bes.

Dibê Mîrze Miheme go:

“ ‘Edo tu nebêjî, bax<sup>2076</sup>, hevt salîya xwe mi tu dîtî. Erê, ez kurê filankesê me. Yalniz, mi aqlê xwe, fikrê xwe, zeka xwe, rabûna xwe, rûniştandina xwe, her tiştê xwe ez ji te hîm bûme. Were, mesele çî ye hemûkî bêje.”

Dibê ‘Edo yek bi yek hêmû jê ra go. Ça çûne, kevotk ça hatine, kevotka ça Gevernîgar anîne, kevotka bi çî şertî gotye, ‘Edo bi çî şertî kirine, heta hatye bavê wî. [‘Edo] dibê:

“Wextê caw<sup>2077</sup> çû, bavê sîyar hildan. Berya wê bavê te çû ew gula jehrê da çêkirinê anî, bi jehrê. Bi jehrê da çêkirinê anî ku pê te bikuje. Wan kevotka jî mi ra pêş da gotibû. Mi jî, te ew gul hilda bèn kira, tê zehirlenmîş<sup>2078</sup> bûyayî bimrayî. Mi jî lema gul qetand. Mesele ev e.”

Dibê go:

“Mesele ev e.”

Dibê Mîrze Miheme xwe avîte ser dest-pîyê ‘Edo, go:

“ ‘Edo, tu gerçek<sup>2079</sup> bavê min î, e jî gerçek kurê te me. Yalniz, ez ê te ra tiştêkî bêjim. Ez ê paşê bime kuştinê, bikujim eger tu bêjî erê. Fikra te çî ye? Ez ê bavê xwe bikujim, derbasî text bim. Te derbasî tex kim, ez jî bime wezîrê te.”

Dibê ‘Edo gotê, go:

“Miherne<sup>2080</sup> mala te.”

Dibê wextê hatne mala wî, dibê ‘Edo bidî herd jinê wî jê ra go, go:

“Hûn çî dibêjin?”

‘Edo go:

“Ez qarşî<sup>2081</sup> vî tiştî me. E qarşî vî tiştî me. Tu evê bikî, ne navê te ra ne navê mi ra tu ew [feyde] çênabe. Em ê bi îhanetê<sup>2082</sup>, tarîhê<sup>2083</sup> me b’ îhanetê sûçlamîş<sup>2084</sup> ke. Yê bê, bavê wî paşa bû, dexesî bavê kir, bavê xwe kuşt. Bêbextî kir. Eva merva jî seyîsî wî bû, aqilbendê wî bû, qafê wî tijî kir da kuştinê, kire paşa.”

Gevernîgar jî dibê:

“E ser fikra ‘Edo me.”

Qîza Mîr Mehmûd jî dibê:

---

2076 ) Binêre.

2077 ) Cab, cewab, xeber.

2078 ) Bi jêhrê ketin, jehrî bûn.

2079 ) Rast, rastî, rasteqîn.

2080 ) Yanî, em herin. Eva (miherin, miherne) qalibgotinek e ku di Ebexê û li derdorê Ebexê da zêde tê bikaranîn.

2081 ) Dij.

2082 ) Bêbextî, xayîntî.

2083 ) Tarîx.

2084 ) Sûcdar kirin, tawanbar kirin.

“Ez qarşî<sup>2085</sup> vî tiştî me.”

Navê [wê] qîzê heye. Mi navê qîzê bîra kirye. Navê wê jî heye. Navê wê heye. Navê wê, ez subê da hema isa lê digirim bi turlu<sup>2086</sup> nehatîye qafê mi. [Ji guhdarvanan Apê Silêman go]:

“Navê wê Gulperî ye, Gulperî. Navê wê Gulperî ye.”

Ji axayê xwe ra bêjim, dibê bi vî şertî qarar dan. Ser gotna ‘Edo, ser gotna Gevernîgarê, ser gotna Gulperîyê, dibê qarar dan. Mîrze Miheme ji ewê tiştê qafê wî da, ji wê jî vazgêçmîş<sup>2087</sup> bû, ji qetlî’ama bavê xwe.

Axayê mi, dibê eva dîrokîyê da a wiha hatye. Sed rehme l’ dêbavê wan be, me ra gotibe me j’ wan hildabe. Sed rehme jî l’ dêbavê me, ometê, li yê me be, em j’ te ra dibêjin. Rehme jî l’ dêbavê wan be, evê têxe tarîh, têxe dîrokê, însanê pey me werin ku vana dînemîş<sup>2088</sup> kin.

ÇÎROKBÊJ: SALHÊ HECÎ HEYDER

HERÊM: JI GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE-WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 52

PERWERDEHÎ: DIBISTANA SERETAYÎ

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 30/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

2085 ) Dij.

2086 ) Bi şeklekî.

2087 ) Hêlan, dev jê berdan, jê gerîn, dest jê berdan, dest jê kişandin.

2088 ) Guhdar kirin.

## 21. ÇÎROKA NAVÇEKERÊ KURÊ ÎZA<sup>2089</sup>

Dibê hebû carek cara, rehme l' dêbavê hazir û guhdara.

Ev çîroka e ji te ra bêjim, dîrokê da ya Navçeker Oxlo<sup>2090</sup> Îza ye. Dibê Îza wezîrê padşê bû, wezîrê Qasim Paşa bû.

Dibê Qasim Paşa paşakî hem nandar bû hem zulumkar bû, hem nandar hem zulumkar. Dibê îja hevt sala carekî dişandin xerac top dikirin ji padşa, ji 'eşîra dîyelim<sup>2091</sup>. Dibê îja hevt sala wan tamam dibe. Îza wezîrê paşê bû, wezîrê Qasim Paşa bû. Dibê Qasim Paşa ku hevt sal tamam bû, dibê eskerek dida ser Îza, defterdarê xwe, yaziciyê<sup>2092</sup> xwe, ewê xwe dibê bi rex dixistin, xeraca her kesî dihate beravkirin<sup>2093</sup>.

Dibê ku heft sal tamam bû, dibê paşê li defa hewarê da, êvarê heyet rûnişt, dibê gote Îza go:

“Tê subê heyetekî hildî herî ser Husên Paşa. Xeraca hevt sala yê top kin, bijmirin, binvîsin, yê tesmîlî<sup>2094</sup> te kin, tê hildî bînî.”

Dibê go:

“Baş e.

Dibê wextê Îza ku êvarê zivirî hate mala xwe, dibê ji xanima xwe, hevala xwe ra anî ziman û axifî, go:

“Eva tişt a wiha bûye. Ez ê herim. Bekî<sup>2095</sup> mehek, du meh, bekî rêya sala be. Em bê, zeman bikşîne hatina me, zivirandina me, anîna me. Gotina te?”

Dibê îja ku wextê yê biçûya, dibê hevala wî bihemle bû. Dibê gote hevala xwe, go:

“Eger ku xwedê da hemla te kur be, ez ku nehatim navê wî lê ke Navçeker Oxlo Îza. Eger ku qîz be, xwedê da, tu çi lê dikî lê ke.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê subê rabûn. Bira eva li hespê xwe sîyar be. Heyetek top kir. Berê xwe bide rîya xwe.

Dibê zeman hat, xwedê te'ala l' hurmetê hate rehmê, hemla xwe danî, ewladekî kurîn dayê. Dibê ewladekî kurîn dayê. Dibê navê wî lê kir Navçeker.

Dibê go ha îro yê werin, ha subê werin. Sal hatin mûtanî<sup>2096</sup> meha derbas bûn. Dibê heft sal tamam bû, nehatin.

---

2089 ) Ev çîrok li gorî devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

2090 ) Kur, kurê.

2091 ) Em wisa bêjin.

2092 ) Katib.

2093 ) Berhevkin.

2094 ) Teslîm, radest.

2095 ) Belkî, dibe ku.

2096 ) Mîna.

Dibê îja ku wextê Îza çû daxlî şîher bûn, dibê ew ro mêvanê paşê bûn. Dibê sibetirê, êvarê, wezîr gotê:

“Îja mêvanê min î. Ez, tu em arqadaşê<sup>2097</sup> hev in. Tu jî wezîr î, e jî wezîr im. Bibe mêvanê min.”

Dibê bû mêvanê wezîr. Dibê rojek, dudu, sisê, çar... Dibê bi anda<sup>2098</sup> jî di nava şîher da xerc berav dîkin. Ku yê pere dide, yê mecdî dide, yê zêr dide, yê deve dide, yê pez dide, yê dewar dide. Yanî xerc ew bûye, heywan bûye yanî. Dibê îja kê çî tine goreyê wê dinvîsin. Mesela navê wan, di bin da ewa wan, paşa mora wî lê dikeve, ewa wî lê dikeve.

Dibê eva roja sonê<sup>2099</sup> ye. ‘Eyne êvarê mêvanê wezîr e dîsa. Dibê êvarê xwe ra rûniştine. Dibê ewî , wezîr laqirdî hev kirin. Dibê wezîr go:

“Mala mi xaş e.”

Dibê ewî jî go:

“Na. Mala mi xaş e.”

Dibê wezîr go:

“De rabe em nav mala mi bigerin. Ku vê carê hatina min cem we çêbe, ez ê jî li qesra te bigerim. Çika qesra te çî ne, îja?”

Dibê evna l’ kîjan odê, kîjan derî geryan, dibê Îza not dîkir. Yanî mesela raxistina îçê<sup>2100</sup> wê, camê wê w ewa wê, dibê Îza isa not kir. Dibê ber odekî-derîkî ra derbas bûn, dibê Îza a iha nigê xwe l’ derî da, go:

“Eva çî ye?”

Go:

“Jê vegere.”

[Îza] go:

“Yawo, wextê em arqadaşê hev in, eva çî ye mi ra jî bêje, e jî bizanbim.”

Dibê wezîr cake<sup>2101</sup> gotê, go:

“Jê vegere.”

Dibê Îza go:

“Na. Te eva mi ra kire meraqekî. Yawo bêje, eva ka çî ye e jî bizanbim.”

Dibê derî vekirin. Dibê jê ra mengene digotin. Dibê a iha bi hesina çêkiribûn. Wextekî ew hebû, cercere hebû. Kame jî hebû, cercere jî hebû. Evna pê nan dikutan. Kame; heywan girêdidane gêlê, nîr jî didane ser stuyê du ga, ewa jî girêdidan diavîtne ser, l’ ser digerîyan nan[ê dirûtî] hûr dîkirin.

---

2097 ) Heval.

2098 ) Di heman wextê de.

2099 ) Dawî, axir.

2100 ) Hundir, nav.

2101 ) Dîsa, careke din.

Cercere jî bi hespa, a iha hemû te yê bigota kêr in, a iha dizvirî nan[ê dirûtî] qutqutî<sup>2102</sup> dikir. Sapê nan qutqutî dikir heta nan ku hûr dibû derdiket.

Dibê îja [wezîr] go:

“Îja eva jî ew e.”

Dibê [Îza] go:

“Eva kêrî çi tê?”

[Wezîr] go:

“Kêrî tişteki nayê. Car heye zehf kêr tê, car heye jî kêr nayê.”

Dibê [îza] go:

“Îja eva ça vedibe? Ça ew dibe?”

Dibê wezîr gotê, go:

“A evî qolî<sup>2103</sup> dibînî? Tu evî qolî a iha vedikî.”

Dibê wextê wezîr qol a iha bilind kir, dibê hemû a iha vebû, ew kêrana ji hev deketin, iha gêrî<sup>2104</sup> çûn. Dibê wezîr ortê da rûnişt, xwe tê da dirêj kir. Dibê [wezîr] go:

“De normal ha bide hev. Cake ewî qolî berjêr ke.”

Dibê normal de<sup>2105</sup> cake<sup>2106</sup> Îza qol<sup>2107</sup> qol berjêr kir. Dibê wezîr go:

“Temam.”

Dibê [wezîr] go:

“De weke.”

Dibê Îza cake qol bilind kir, ew kêrana, mengene ha gêrî<sup>2108</sup> ji hev çû. Dibê îja wezîr gotê Îza, go:

“Îja çika tu were denemîş<sup>2109</sup> ke. Bikeve nav, e te denemîş kim.”

Dibê de arqadaşê<sup>2110</sup> hev in, samimî ne, bi îyî<sup>2111</sup> nîyet. Hanî<sup>2112</sup> dibêjin ya, ku cara te dî însanê me ew dibe, dibê îyî nîyet sûtîstîmal dibe. Dibê ew jî bi dilê xwe yî xaş, dilê xwe yî geş, germ, saf, dibê wextê wezîrê paşê qol bilind kir, dibê Îza xwe di nav da dirêj kir. Dibê [wezîr] qol berjêr kir, dibê bîrden<sup>2113</sup> basmîş<sup>2114</sup> kir. Dibê Îza gotê go:

“Bedena mi diêşe, kêr di bedena mi da rûdinê.”

---

2102 ) Parçeparçeyî.

2103 ) Destî destik.

2104 ) Paş.

2105 ) Bi awayekî asayî.

2106 ) Dîsa, careke din.

2107 ) Destî, destik.

2108 ) Paşve, paşda.

2109 ) Ceribîn.

2110 ) Heval.

2111 ) Pak, baş.

2112 ) Wiha.

2113 ) Di derbekî de, yekcar, ji nişka ve.

2114 ) Pêlêkirin.

Dibê ewî hîngî dest da ser qol, qol hesabîyle<sup>2115</sup> basmîş kir. Dibê carekî zivirî, ew kêrana hemû di bedena Îza da rûniştin. Dibê Îza ma di wî halî, di wir da. Dibê deket, derî dada. Dibê derî dada.

Dibê sibe zelal bû, evî hat dêna xwe dayê, erê, Îza ruh dide, tesmîl<sup>2116</sup> dibe. Dibê go:

“Îza qeyb e, Îza hatîye kuştinê.”

Dibê ew xercê beravkirî<sup>2117</sup>, dibê tekrar hemû ma. Dibê ew mervê paşê, heçî hatne şerjêkirinê, heçî hatne kuştinê, heçî canê xwe xilas kirin. Dibê her kes ji hev revî. Werhasil dibê heft sal arê<sup>2118</sup> da derbas bû. Yê çûyî ku hatin, dibê ji paşê ra uzuntîya<sup>2119</sup> xwe anîne ziman, go:

“Hal mesele a iha. Mesele bû ev.”

Dibê wextê go Îza hatîye kuştinê, dibê îja padşê jin-zarê Îza xweyî kir. Ji wan ra nifaqe dexist, yîyecek<sup>2120</sup>, go:

“Ji xezînê pere yardimî<sup>2121</sup> çî ihtîyaç<sup>2122</sup> hebe bikin.”

Dibê îja kurê Îza, em werin li kurê Îza xeber bidin. Dibê Navçeker hevt salî ye weke çarde salîya dixuyê. Dibê ku zarê şîher da, ku zarê mehlê da ku dileyîzin, li hev dixin, dibê hema li kîjanî dixê, dikeve. Yê ku milê wî dişkêne, yê guhê wî xûn dike. Dibê rojekî ewî [û] nebiyê pîrekî li hev dabûn. Dibê nebiyê pîrê kutabû<sup>2123</sup>, dibê pîrê hate derê malê, derê mala wan. Dibê zehf şikyatçî çûne cem paşê, dibê paşê go:

“Yawo, eva merva êtîm maye. Bavê wî hinde xizmet kirye ji boy vî şehîrî. Bavê wî ji boy we hatye kuştinê. Hûn çî evî yekê dikin? Vê alîkarîya hanê, mi ra dibên, vî mervî ra neke? Bira hinekî mezin be, zeman le em ê gorevekî<sup>2124</sup> binê, yê ji van tiştî destê xwe bikşîne. Her kes jî zaroka xwe tembe ke, bira pê ra van tiştî neke, wextê hûn hinde şikyatçî ne.”

Dibê îja ewî [û] nebiyê pîrê li hevdu dan. Dibê nebiyê pîrê zehf kutabû. Dibê nebiyê pîrê diçe. Dibê pîrê destê nebiyê xwe digre hildide tê derê mala wê. Derê malê dide. Cem cîya wî, cîya wî ra gazindê wî dike, şikyatî wî dike. Ew jî tê. En son<sup>2125</sup> pîrê dibêjê, dibê:

“Eger tu mêrekî zehf jêhatî yî tê herî heyfa bavê xwe vekî. Tu wextê hinde jêhatî yî tu çîma naçî heyfa bave xwe venakî?”

Dibê bira pîrê lêxe here. Agiro, kê tu gurr kirî! Dibê Navçeker wextê hate hundur, dibê cîya wî ber gerya, jê ra nan anî. Go:

---

2115 ) Bi hesabi xwe.

2116 ) Teslîm, mirin.

2117 ) Berhevkirî.

2118 ) Nav,navber.

2119 ) Kerb, keser, kovan.

2120 ) Xwarin-vexwarin.

2121 ) Alîkarî, palpiştî.

2122 ) Hewcehî, hewcedarî.

2123 ) Li Ebexê û li devdora Ebexê peyva ‘kutandin’ê bo lêdan û lêxistinê tê bikaranîn.

2124 ) Wezîfe, peywîr.

2125 ) Herî dawî, di axiriyê de.

“Dayê ez nan naxum. Bavê mi kê kuştiye, tê mi ra bêjî. Kê kuştibe tê mi ra bêjî.”

Dibê go:

“Kurê min, evna îtraf<sup>2126</sup> in. Ev tişt a virr e, eva nebûye. Te zara wê kutaye ewê jî ev gotye. Tişte dêst da nemaye, ew gotye. Bavê te wezîr bû, wezîrê padşê bû. Bavê te însanekî naskirî bû, însanekî pehlîvan bû, însanekî cîvan bû, delal bû. Ev tiştana virr in. Kê bikarebe bavê te bikuje? Bavê te mirye.”

[Navçeker] dibê:

“Dayê, tu nebêjî e yê te bikujim. Çara wê tune. Çi hatye serê bavê mi tê mi ra gerçekîya<sup>2127</sup> wê bêjî. Çi bûye tê mi ra bêjî.”

Dibê dîya wî dêna xwe dayê, tabî ku eva îşê rojekî da nîne. Eva îşê heftêya, meha, iha derbas dike ew û cîya xwe ber hev didin. En son<sup>2128</sup>, cîya wî dêna xwe didê çare tine, dibê:

“E yê te ra bêjim. Here dîwana paşê bêje paşê; te bavê mi şandîye ku? Çi hatye serê bavê mi? Ça bûye? Bira j’ te ra bêje lêxe were. Eksîk<sup>2129</sup> hebe e yê tamam kim.”

Dibê wextê diçe dîwana paşê, nahêlin here, nahêlin here [hundir]. Rûsipîkî paşê tê, jor da berjêr dibe, dibê:

“Bavê te çûye filan şehîrî. Çûye filan şehîrî xeracê top ke. Bavê te li wî şehîrî çî hatibe sêrî [em nizanin]. Hevalê wî ye hatî dibê, wezîr kuştiye. Hinek dibên, inda<sup>2130</sup> bûye. Hinek dibê, mirî ye. Yaniz<sup>2131</sup>, net<sup>2132</sup> netîce em nizanin. Yanî bihîstina ku me ra hatîye gotin, wezîr bavê te kuştiye. Mêvanê wezîr bûye. Çi ewa bavê te hebe sorimlî<sup>2133</sup> wezîr e.”

Dibê eva cake<sup>2134</sup> dizvire tê cem cîya xwe, dibêje cîya xwe, dibê:

“Tê mi ra netê<sup>2135</sup> wê bêjî.”

Cîya wî dibê:

“Tu di hemla mi da bûyî, ez bi te nexaş bûme<sup>2136</sup> bavê te çûye. Eva nava jî bavê te mi ra gotye. Weysê kirye gotye, ku eger ez nehatim, te hemla xwe danî ku law be navê wî Navçeker lê ke. Hal-mesele iha. Hevalê bavê te yê hatî ku gotine, wezîr bavê te kuştiye. Heger tê bikaribî herî întiqamê bavê xwe hildî, here. Her tişt mi, şîrê sipî mi l’ gerdena te berî kirye. Eger tu nikaribî van tişt a, li serê xwe nealîne, li xwe nexe bar. Bira li te qar nebe.”

---

2126 ) Îffîra, buxtan

2127 ) Rastî.

2128 ) Di axiriyê da, di dawiya dawiyê da.

2129 ) Kêm, kêmasî.

2130 ) Winda.

2131 ) Lê, lê belê.

2132 ) Tam, yekcar, hemu, eşkereyî.

2133 ) Berpirsiyar, mesûl.

2134 ) Dîsa, careke din.

2135 ) Tam, hemû, eşkereyî.

2136 ) Yanî ducanîbûn.



[Navçeker] dibê:

“Ez ê herim.”

Dibê rabû çû nava baxçe, dest avîte darekî, çinarekî. Hema iha girt, kok va rakir, da ser milê xwe. Berê xwe da dîwana paşê, çû dîwana paşê. Doşkê<sup>2137</sup> va hilkişîya, dibê kê dekete pêşyê, hema ha milê wî girt jor da doşkê da avît. Hilkişîya qesra paşê. Dibê bi çinarê xwe va çû hundur. Dibê paşa rabû gotê, go:

“Kurê mi, were rûnê.”

Dibê paşê yêr<sup>2138</sup> dayê, rûnişt. Dibê go:

“Te xêr e? Tu kê yî?”

Dibê go:

“Ez Navçekerê Kurê Îza me.”

Dibê [padişah] go:

“Te xêr e?”

Dibê go:

“Ez hatime xûna bavê xwe.”

[Padişah] go:

“Xûna bavê xwe tu çi dixazî?”

Paşê dêna xwe dayê, nayê sewraxtkirinê<sup>2139</sup>. Dibê [Navçeker] go:

“Xûna bavê min ew e; tê hespekî, zirxê herbê, şûr-gurzê ser, qederekî jî xerclix bidî mi, zêr, pere. Ez ê herme întîqamê bavê xwe.”

Dibê paşa gotê, go:

“Kurê mi, xûna bavê xwe nexaze. Bavê te însanekî deyerlî<sup>2140</sup> bû. Wezîrê mi bû, başpehlîvanê mi bû. Dîrokê da navê wî heye. Însanekî ha ew bûye. Ha, ez ê hespekî, şur, gurz, zirxê ser, kîjan kihêlê bixazî ez ê bime te. Çi qeder varîyeta dunyayê, zêr, pere dixazî ez bime te. Yalniz<sup>2141</sup>, vê oxirê da neçe. Ez te têxme sercîhanê eskera. Çi gorevê<sup>2142</sup> qebûl bikî ez bime te.”

[Navçeker] go:

“Asla<sup>2143</sup>. Ez ne pere-pûlê te dixazim. Ez heta întîqamê bavê xwe venekim ez nayme vî şehîrî. Eger mi qedandîye întîqamê bavê xwe vekirye, ez hatime, xwe hatime. Ez nehatim, bizanbe dêmekî<sup>2144</sup> ez

---

2137 ) Balqon.

2138 ) Cî, cih, der.

2139 ) Serwextkirin.

2140 ) Hêja, birûmet.

2141 ) Lê, lê belê.

2142 ) Wezîfe, peywîr.

2143 ) Qet.

2144 ) Nexwe.

mol<sup>2145</sup> bûme, rêya moltiyê da jî çûme.”

Dibê paşa lê nihêrî ku xeberdana wî, ku ew çinarê girtîye a iha dihejîne, dibê paşa go:

“Ez emînîm ku zeman were evê bibe sercîhanekî isa, bibe pehlîvanekî isa ku her kes ji wî çekinmîş<sup>2146</sup> be.”

Dibê paşa rabû gazî seyîsa kir, go:

“Kuro, kîjan kihêlê jêhatî, hespê jêhatî ye ku bikeve herba, bikeve şera, bikeve erqa sîyarê xwe xilas ke, kihêlekî isa bikşîne bin vî. Şûr, kîjan şûrê çelîk<sup>2147</sup> e ku netewe, neşkê, dewsa yekî duduya binê. Gurzê wî, qilicê<sup>2148</sup> wî, her tiştî wî ser girêdin, hazir kin. Zirxekî herbê binê.”

Dibê her tiştî wî tam kir. Dibê xurçika wî jî tijî, de îja pere be, yê wî çaxî mecdî be, zêr be, dibê xurçik jî tijî kir, go:

“Dîya te jî xûşka min e. E ça l’ xûşka xwe binhêrim, ça qîza xwe binhêrim, ez ê isa jî dîya te binhêrim. Ku tu hafî, hafî. Tu nehatî jî ev tiştê mi dane te xûna bavê te nîne. Tu bê, xûna bavê mi ez nadim. Mi çi jî daye te xaş helalî te be. Çunkî bavê te mêrê xûnê nîne ku tu bêjî xûna wî [bide].”

Dibê Navçeker sîyar bû hate derê malê. Xatrê xwe dîya xwe xast. Xwe pê da helalkirinê, go:

“Mi ra di’ a bike.”

Serîyo tu qurbana niga bî, bira Navçeker here. Dibê Navçeker çû. Ji birayê xwe ra bêjim, şîher deket. De îja berê rêya sal zemana bûye, ro, meh, sal çûne. Niha bi zar zimana ye. Em hema dibêjin, deqê da ser hev da tê gotinê. Dibê eva ku çû daxilî bolgekî<sup>2149</sup> bû, dêna xwe dayê, gundek e. Nîvî gund heye nîvî gund tune. Yanî yapî<sup>2150</sup> ne yapiyê ewan [însanan] e.

Dibê ew şev li yapî ma. Subê deket dêna xwe dayê, heqet ji wî yapî însan derdikevin. Gund e hema xirabe ye. Dibê dêna xwe dayê, gencek hate cem wî:

“Merheba.”

[Navçeker go]:

“Merheba.”

[Genc] go:

“Tê ku da herî?”

Dibê go:

“Welle ez rêwî me. Ez îro li vir im, sibê li cîkî din im. Ez ê heta belî noqtekî herim, yêrekî<sup>2151</sup>.”

Dibê [genc] go:

“Ez jî te ra werim.”

---

2145 ) Bêkêr,

2146 ) Fikare kirin, pelikandin.

2147 ) Pola.

2148 ) Şûr.

2149 ) Herêm, der, dever.

2150 ) Avayî.

2151 ) Cî, cih, der, dever.

Dibê [Navçeker] go:

“Navê te?”

Dibê go:

“Navê mi Qurbanî.”

Dibê Navçeker gotê:

“Qurbanî, ez rîya diçim rîya çûyîn-nehatinê ye, rîya mirinê ye, rîya kuştinê ye. Tu bi mi ra neyê, kar neke.”

Dibê go:

“Îmkana wê tune. Mi hema ji hiz kirye ez ê jî bi te ra werim.”

[Navçeker] go:

“Ê de sîyar be.”

Dibê evna sîyar bûn. Ku heftêk, dudu, sisê, meh çûn, dibê daxilî şiherekî bûn. Dibê şihêr wisa xaş e. Dena xwe danê, însanê şihêr wusa dikşin. Yanî tê bê, qey heşr e, savaşek<sup>2152</sup> e şihêr da ne ku însan direve, goç<sup>2153</sup> dike. Dibê j’ yekî, dudya siwal kirin, go:

“Çî ye, çî nîne?”

Dibê go:

“Wellehî, em diçne dîtna qîza padşê.”

[Navçeker û Qurbanî gotin]:

“Yawo, dîtna çî terî<sup>2154</sup>? Ev çî terî dîtin e?”

Yê deve destê wî da, yê ga destê wî da, her îsanek tê heywanek destê wî da ne. Yanî yê tepsiyê<sup>2155</sup> gula l’ destê wî, her kes tiştêkî [tîne]. Dibê dênâ xwe danê, gencek hat, ewî jî nêrîk anye. Nêrî wusa rind e! Dibê Navçeker gote Qurbanî, go:

“Em evî nêrî ji vî gencî nestînin?”

Go:

“Em bistînin.”

[Navçeker] go:

“Ka bêjê.”

[Qurbanî] go:

“Bira, fîyeta nêrî çî ye?”

[Genc] go:

“Ez nêrî nadim. Ez ê biherim dîtna qîza padşê.”

[Navçeker] go:

---

2152 ) Şer  
2153 ) Koç.  
2154 ) Tehr  
2155 ) Sinî.

“Kuro, tu nêrî dibî, tê qîza paşê çîqa bibînî?”

[Genc] go:

“Welle ez ê biherim yan ez ê ber paçê ra, iha ber camê perdê ra pêşa<sup>2156</sup> wê bibînî yan etamiyê wê bibînî.”

[Navçeker] go:

“Yanî tu ser çehvê wê, sîma wê nabînî çî terî<sup>2157</sup> ye?”

[Genc] go:

“Gerekî ew be ez dunyayê biherim [ku] bibînî.”

[Navçeker] go:

“Pîî! Kuro, eva bêaqil e.”

Dibê Navçeker gotê, go:

“Kuro, nêrî me ra bîne, were cem me. Kuro, ez êvarê a iha nîşanî te bikim qîza paşê, tu qîza paşê isa bibînî.”

Dibê kir nekir nebû, go:

“Tu vê carê lakinî bikî ez ê serê te jêkim. Mi êvarê ku nîşanî te neda tu heqlî<sup>2158</sup> yî.”

Dibê de îja însan wusa tê w diçe mûtanî<sup>2159</sup> xîzê behra, belgê dara. Dibê heta mexrevê ew [wisa] bû. Dibê însan gêrî çekilmîş<sup>2160</sup> bû. Dibê idî îşiq<sup>2161</sup> vêketin, qesra qîza paşê dişxule<sup>2162</sup>.

Dibê Navçeker gote ewê, gote Qurbanî go:

“Îja rabe hine dar bîne, dar.”

Dibê gotne wî hevalê xwe, go:

“Navê te?”

Go:

“Navê mi jî Keniz.”

[Navçeker] go:

“Keniz, em xerîb in li vî welatî. Em ê dara li ku bibînî?”

[Keniz] go:

“Bide pey mi.”

Go, Keniz Qurbanî hilda çûne ewê, dibê çûne nava şîher qedere dar anîn.

Dibê [Navçeker] go:

“Kêrekî jî bînin.”

---

2156 ) Daw, etek.

2157 ) Tehr, awa, şekl.

2158 ) Xwedîheq, xwedanheq, heqdar, mafdar.

2159 ) Mîna.

2160 ) Jê vekîşîn.

2161 ) Ronayî, renayî, lembe, çira.

2162 ) Çirûsîn, teyisîn, rewneq dan.

Dibê kêrek jî anîn. Dibê agrê xwe dadan. Dibê yalniz<sup>2163</sup>, pêşya qesra qîza paşê ye, ha. Dibê agir dadan. Agrê wan dişxule, alepîk<sup>2164</sup> radibe.

Dibê [Navçeker] go:

“De îja nêrî bînin dayne ‘erdê.’”

Dibê nêriyê xwe jî danîne ‘erdê. Ji birayê xwe ra bêjim, dibê kêr tersine<sup>2165</sup>, pişta kêrê dane qirka nêrî dibin tînin. Dibê barebara nêrî ye. Dibê carya qîza paşê dêna xwe dayê, agirek dişxule. Ku cam vekir dêna xwe dayê, wê du-sê heva heywanek avîtye ‘erdê şerjê dikin. Barebara heywîn e. Gazî xanimê dike, dibê:

“Xanim, hal mesele a iha.”

[Qîza Paşê] dibê:

“Ca here wan ra şerjê bike. Gune ne, bavê mi bibîne yê wana were xezebê. Qey evna hatine dîtna me, idî em nedîtine. Hema ewa destê wan da maye, ew jî avîtnê ‘erdê. Wan ra şerjê bike. Bira nanê xwe buxin, sibê rabin lêxin herin. Qe bavê mi nebîne. Bira bicehmin herin.”

Carya wê tê, destê Qurbanî digre, dibê:

“Tê a iha nêrî şerjê kî.”

Kêrê dine ser stuyê nêrî dibin tînin. Nêriyê xwe şerjê dikin. [Carî] dibê:

“Hûn ê post kin. Eger ku ihtîyaciya we tiştêkî hebe, ez we ra bînim.”

Dibê ewê pişta xwe dayê çû. Nasil olsa<sup>2166</sup> agir dişxule. Dibê vana dayê pîlê<sup>2167</sup> nêrî jêkirin bi post va, rakirin dane ser êgir. Tabî eva bîlerek<sup>2168</sup> tê kirin. Yanî Navçeker dibêje vana dibê:

“Ha bikin.”

Dibê bêna goşt, bêna kiz, bêna pirçê w bêna ewê, dibê kete mehlê, kete şîher. Dibê carî di camê da, pacê da sekinîye dêna xwe didê, go:

“Xanim, mala bavê te xira be! Ca were dêna xwe bidê. Evna pîlê nêrî radikin a iha dine ser êgir dişewitînin tametam. Evê qûşxana hanê, xanim, misada te hebe ez biherim. Wan ra hine goşt-moşt têmê, bira bine ser êgir.”

Dibê [Qîza Paşê] go:

“Bihere, keça mi.”

Dibê hilda bir. Hine goşt-moşt wan ra hûr kir, ji hev dexist, kire qûşxanê da ser êgir, go:

“Pijya, buxin.”

Dibê ewê pişta xwe dayê hat. Ew, Xanim tev camê da sekinîne dêna xwe dinê. Perde dane alîkî,

---

2163 ) Lê, lê belê.

2164 ) Çirûsk, pirîsk.

2165 ) Aliyê çepê va.

2166 ) Çawa be, çito be, çilo be.

2167 ) Bi ‘p’ ya nerm. Hêt, ran.

2168 ) Bizanebûn, biqest, mexsûs.

xwe l' ber perda xwe sekinîne dêna xwe dinê. Dibê vana qûşxana xwe ters<sup>2169</sup>-deveru kir, qûşxana danîne nava êgir, devê wê kirne nava êgir, goştê xwe dexistin dane ser piştê wê. Dibê dîsa don dihele diçe ser êgir. Dibê dîsa caryê go:

“Ha xanim, ca dêna xwe bidê. Mala bavê te şewitîyê! Ev çi terî<sup>2170</sup> îş e?”

Dibê go:

“Here van belengaza hilde bîne hema a vî koşê salonê. Nan-man çêke bide wan, bira lê bisenin. Êvarê jî derî dade bira razên. Şeveqa subê, mêja subê dengê azanê ra vana dexe bira herin.”

Qîza paşê ye. Qîza paşê dibêje carya xwe, dibêje carya xwe. Ji birayê xwe ra bêjim, dibê evna rê ketin. Dibê eva carî di jor da hat. Dibê qedere goşt hildan. Da milê van, dibê go:

“Miherin<sup>2171</sup>.”

Dibê hilda anî salonê. Dibê van ra nan<sup>2172</sup> çêkir, nanê xwe xarin. Dibê go:

“Hûnê a xwe vê derê jî [dirêj kin] razên.”

De îja qesra qîza paşê ye. Temam xalî û xalîçe ye. Dibê emenî be, berr be, betanî be, orxan be, çi be, dibê anî da wana, go:

“Bavêjne ser xwe, xwe ra razên.”

Dibê carî derbasî bolima<sup>2173</sup> oda xanimê bû. Dibê ha derî nivî da hiştîne vekirî, dêna xwe didê. Dibê hersêka<sup>2174</sup> xwe dirêj kirye. Yekî xwe a iha dirêj kirye, yekî xwe a iha xwe dirêj kirye, yek jî ketye ortê. Dibê nigê xwe bilind kirine, orxanê a iha li ser nigê xwe dibin tînin. Ew dibê:

“Ez ê bikevme ortê.”

Ew dibê:

“Ez ê bikevme ortê.”

Ew dibê:

“Ez ê bikevme ortê.”

Orxanê a iha li ser nigê xwe dibin tînin. Dibê caryê gotê, go:

“Xanim, mala bavê te bişewite! Bela tine bû, te îja me ra bela çêkir! De îja tu were lê binhêre!”

Dibê wextê xanimê a iha ber camê ra, ber kêleka dêrî ra dêna xwe da hersêka, go:

“Ji hersêka yekî wî tam e. Duduyê wî na, duduyê wî hêç. Yek, yekî wî tam e, aqil e.”

Dibê xanim deket, go:

“Kuro, bisekinin!”

Dibê wextê çehv xanimê ketin hersêk jî sekinîn. Carî jî kêleka xanimê [ye]. Dibê [xanimê] go:

---

2169 ) Deveru.

2170 ) Tehr, awa, şêwe.

2171 ) Li devoka Ebexê li devdorê Ebexê li şûna hevoka ‘em herin’ê hevoka ‘miherin’ tê bikaranîn.

2172 ) Li Ebexê û li devdora Ebexê carna li şûna peyvên ‘xurek, zad’ peyva ‘nan’ tê bikaranîn.

2173 ) Beş, şax.

2174 ) Peyveke xwemalî ye ya ku li Ebexê û li devdora Ebexê li dewsa ‘her sê’ tê bikaranîn.

“Hûn kê ne? Navê we çi ne?”

Dibê ewî go:

“Navê mi, Navçeker.”

Dibê ewî go:

“Navê mi Qurbanî.”

Dibê ewî go:

“Navê mi jî Keniz.”

Dibê [xanimê] go:

“Navçeker, tu j’ ku hatîyî?”

Dibê go:

“Ez xerîb im. E ne li vir im.”

[Xanimê] go:

“Belî ye.”

[Navçeker] go:

“Hevalê mi jî xerîb e. Keniz ehlê vir e.”

[Xanimê] go:

“We ew nêrî boy çi anîbû?”

[Navçeker] go:

“Me nêrî neanye. Nêrî yê Keniz b’ye. Keniz, nêrî anye te bibîne. Tu nedîtî, idî êvar kete ser. Em jî dengî Keniz hatine me gotyê, nêryê xwe bifroşe me. Yanî berîya êvarbûnê da em dengî wî hatine me gotyê, nêrî rind e bide me. Nedaye. Gotye, ez nêrî dibim. Me gotyê, kuro çima nadî? Gotye, ez ê nêrî biherim qîza paşê pê bibînim. Mi jî gotyê, kuro tê qîza paşê çi qeder bibînî? Yanî qîza paşê çi qeder bedew e? Ev mexlûqet hemû diçe ku? Gotye, diçe dîtina qîza paşê. Gotye, welle ez ê yan ber perdê da ya pêşa<sup>2175</sup> etamîya wê bibînim ya pêşa dêrê wê bibînim. Dîtina jî ev e. Ku ez sîmayê wê bibînim gerekî nîvî şîher biherim. Bi nêrî nabê. Mi jî gotê, kuro nêrî bide me. Kuro, ez ê jî qîza paşê nîşanî te xim.”

Dibê [xanim] duşmîş<sup>2176</sup> bû, go:

“Eva kîrnê we ji boy dîtina mi bû?”

[Navçeker] go:

“E. Ev kîrnê me kirin, ev pîlan yê mi bû. Mi j’ vî, Keniz ra jî soz dabû. Mi go, ku tu qîza paşê nebînî çi dibê bê, serê mi lêxe. A îja niha tu dîtîyî.”

[Navçeker] dibê:

“Keniz, kuro ku me nêrî şerjê nekira te yê qîza paşê a iha kê derê bidîta? Kê îro hatye qîza paşê

---

2175 ) Daw, deling.

2176 ) Fikirin.

dîtye ku tu jê mayî? A binê<sup>2177</sup>, tu cem rûniştîyî, xeber didî, pê ra qise dikî.”

Dibê qîza paşê duşmiş bû, go:

“ ‘Eslê te çî ye? Tu kurê dewletîmendan î? Tu kurê başan î? Tu kurê paşan î? Tu çî yî?”

Dibê go:

“Ez ne kurê dewletîmendan im ne kurê paşan im. Ez hema însanekî tu mi ça dibînî ez însanekî halê xwe da, a wuhan im.”

Dibê qîza paşê gote caryê, go:

“Cîyê van herd<sup>2178</sup> hevalî wî a evê odê dayne.”

[Qîza paşê] go:

“Yaniz<sup>2179</sup> bi şertekî, hûn ê qaydê meriva razên. Hûn ranezên ez ê nigê we bigrim, gazî xulam-xizmetçîya kim, nigê we bigrin doşka<sup>2180</sup> da bavêjin. Hê cezakî jî paşa bide we. Qaydê însanê bin. Mi hûn însan olarak<sup>2181</sup> hildane vira, ne heywan olarak. Em jî însan in, da. A we ez jî dîtime, idî tişte parra<sup>2182</sup> va maye.”

Dibê gote Navçeker, go:

“Tu jî derbasî vê odê be. Eva banyo<sup>2183</sup> ye. Îhtîyaciya te banyoyê hebe banyo bike. Dest, serçevê xwe bişo. Birçî bin bira we ra nan were, sifre were qûrmişkirinê<sup>2184</sup>. Yalnız, îşê mi bi te heye.”

Dibê Navçeker dest-serçevê xwe şûşt, rûnişt. Xanim bi carya xwe tev hatin. Dibê baya<sup>2185</sup> axivîn, xeber dan. Dibê gote Navçeker, go:

“Tê ‘eslê xwe, ‘esaleta xwe, tu ji ku tê, ku da herî, tê hemûkî mi ra bêjî.”

Mi sêrî da ça were gotye, dibê Navçeker hemû jê ra got. Dibê hemû jê ra got, go:

“A iha bavê mi ha hatye kuştin. Ez diçim întiqamê bavê xwe hildim.”

Dibê heta wextekî xeber dan, wextekî şevê. Dibê xanimê carya xwe hilda çû oda xwe, derê xwe dadan. Navçeker jî oda xwe raza. Dibê subê zû rabûn. Dibê qahvaltîya<sup>2186</sup> xwe kirin. Dibê Navçeker xatrê xwe xast. Dibê xanimê gotê:

“Ez ê te beglemîş<sup>2187</sup> kim. Eger tu zivirandinê zivirî mi bihere.”

Dibê go:

“Baş e.”

---

2177 ) Binêre.

2178 ) Herdu.

2179 ) Lê, lê belê.

2180 )

2181 ) Wek, wekî, mîna.

2182 ) Paş, paşî.

2183 ) Serşo, serşok.

2184 ) Amadekirin, hazirkirin, raxistin.

2185 ) Gelek, zêde, pir.

2186 ) Taştê.

2187 ) Li bendê man, li hêviyê man.



Dibê Qurbanî jî gote caryê, go:

“Ez ê te xwe ra biherim.”

Dibê sozê xwe kirne yek. Bira evna sîyar bin. Dibê Keniz jî gihîşte van idî. Dibê hersêk<sup>2188</sup> sîyar bûn çûn. Dibê evna sîyar bûn çûn. Dibê ji birayê xwe ra bêjim, dibê evna dîsa çûn. Dibê evna daxilî şehre paşayê [ku] bavê Navçeker tê da hatye kuştinê, daxilî wî şehri bûn. Dibê daxilî şîher bûn.

Ji xweyî xwe ra bêjim, dibê di şîher da geryan. Dibê meh, sal, zeman [derbas bû]. Dibê loqante kiralamîş<sup>2189</sup> kirin. Dibê belî surekî<sup>2190</sup> loqante kiralamîş kirin. Dibê Navçeker gote vana êvarê, go:

“Kuro, hûn herdik loqantê binê xevatê. Ez boy întiqamê bavê xwe hatime. Ez întiqamê bavê xwe hilnedim ez nikarim herim. Ez mecbûr im întiqamê bavê xwe hildim, ez hildim.”

Dibê Navçeker xwe berda nava şîher, idî pey wezîr ket, wezîr teqîb dike. Dibê wezîr teqîb dike. Rojek, dudu, sisê, meh, sal... Dibê rojekî dêna xwe danê, însan li ser merzela top bûye. Dibê ew jî çû. Dibê çûn siwal kirin. Go:

“Jina wezîr mirye.”

Dibê wextê go jina wezîr mirye, dibê Navçeker ber lêva va kenya. Dibê wextê zivirîn, dibê Qurbanî gotê go:

“Navçeker, tu çima kenyayî?”

Go:

“Îşê mi bû.”

[Qurbanî] go:

“Ça îşê te bû?”

[Navçeker] go:

“Welle, îşê mi bû. Tu were lê binhêre.”

Dibê evna zivirîne loqantê. Dibê Navçeker gote vana, go:

“Kuro, idî loqantê hûn îşlemîş<sup>2191</sup> kin. Ez ê jî pey întiqamê xwe bim, heta roja wê hat.”

Dibê go:

“Baş e.”

Ji birê xwe ra bêjim, dibê Navçeker rabû xwe berda sûka jina. Mesela ça niha diçî Kurdistanê sûka jina ayrî<sup>2192</sup> ye. Her bajarekî da sûka jina ayrî ye. Sûka jina jî mesela yêra<sup>2193</sup> gîyîmê<sup>2194</sup> jina bin, xemlê jina, gîyîmê jina. Mêr naçnê. Nizanim, însanekî mesela bi hevala xwe va tev here lê

---

2188 ) Her sê.

2189 ) Kirê kirin, îcare kirin.

2190 ) Mude, mawe.

2191 ) Şixulandin, xebitandin.

2192 ) Cuda, cihê.

2193 ) Cî, cih, der.

2194 ) Cilûberg, kinc.

alışverişê<sup>2195</sup> bike ew ayrî, sûka jina yan ku mêrik bi hevala xwe, hurmeta xwe ve here lê ewk bike, yanî jin sadece diçnê.

Dibê xwe berda sûka jina. Çend dest kincê jina ji xwe ra da karkirinê. Çend taxim maqyajê jina, xemlê jina, qundire, de îja tiştê li ser jina abade bûbe, dibê tamam hilda. Baholek, dudu, sisê [tijî kir].

Dibê xwe berda nava şîher li deryê feqîra gerya. Dibê rastî pîrekî hat. ‘Eyne bi gîyîma jina diçe ha, ne bi ya mêra. Dibê gote pîrê, go:

“Daka pîr.”

[Pîrê] go:

“Çî ye keça mi?”

[Navçeker] go:

“Daka pîr, tu mi xweyî nakî? Tu hema bibe dîya mi, bavê mi dîya mi mirin e, ez jî bime keça te.”

[Pîrê] go:

“Baş e, keça mi. Yaniz<sup>2196</sup>, xarin, vexarin, karkirin tune.”

[Navçeker] go:

“Ewa li min.”

Dibê dexist perek da pîrê, mecidî be, zêr be. Dibê pîrê dîz li kolozê da, her tişt hazir kir, hah yataxê<sup>2197</sup> hinde avîtne ‘erdê. Dibê rojek, dudu, sisê, deh, bîst... De îja bazara şîher e, dibê pîrê [Navçeker] hilda xwe ra l’ şîher geryan. Dibê ku l’ şîher digerin, de îja [Navçeker] xwe boyax kirye. Ji birayê xwe ra bêjim, qaşqelemî li çehvê xwe daye. Lêvê xwe boyax kirye, bedew e o biçim<sup>2198</sup>. Kê çî zane mêr e? Dibê iha di cadê da hildikşin, dibê pîrê dêna xwe dayê, wezîr çend hev hevalê wî jor da tèn. Dibê pîrê gotê, go:

“Keça mi, em iha vê cada din ra herin. Wezîr bi hevalê xwe va tèn.”

[Navçeker] go:

“Bira werin. Em bona wezîr şîher dernekevin?”

Dibê mexsûs xwe ber bi wezîr girt, pêşya wezîr ra derbas bû. Daha<sup>2199</sup> jî serê xwe bilind kir, gerdena sipî [vekir]. Dibê wezîr dêna xwe dayê, bi çehvekî na hezar çehvî dil berdayê. Dibê wezîr evna teqîb kirin. Zivirandinê meriv da ser van, go:

“Ka eva pîra, eva qîza diçe ku, kîjan malê? Nimara derî, soqaqê, mehlê kifş kin, mi ra bînin.”

Dibê hemû nivîsîn, birin dane destê wezîr. Dibê heftêk, deh ro arê ra derbas bû. Dibê êvarekî wezîr bû mêvanê pîrê. Dibê xwe ra xeber dan dunyayê, vir da wê da. Dibê wezîr gote pîrê, go:

---

2195 ) Kîrrîn firotin.

2196 ) Lê, lê belê.

2197 ) Nivîn, cîh û nivîn.

2198 ) Bi wî awayî, bi wî şeklî.

2199 ) Zêdetir, gelectir, pirtir.

“Daka pîr, ez xazgînî me. Xazgînîyê keça te me.”

Dibê pîrê go:

“Wezîr, ka e jî keça xwe ra bêjim. Yê yekî te çêtir bibîne?”

Dibê gotê. Dibê berê xwe li hev xist. Paşê go:

“Daka pîr, tu zanî.”

[Pîrê] go:

“Keça mi, qosqoca<sup>2200</sup> wezîr e. Dewra niha da qîsmetê wuha tê serê kê? Kê wezîra neke?”

Dibê go:

“Baş e. Yaniz<sup>2201</sup>, şertê mi hene.”

Dibê [pîrê] go:

“Bêje.”

Dibê go:

“Yê apartmanekî te ra çêke, berê.”

Dibê wezîr apartmanek pîrê ra da çêkirinê. Her tiştê wî, îneden îplîye<sup>2202</sup>, hemû hazir kir. Dibê Navçeker go:

“Idî bira nîşana xwe taxmîş<sup>2203</sup> ke.”

Dibê nîşan taxmîş kirin. Dibê îja ew, wezîr geryan. Gote, go:

“Îja miherin<sup>2204</sup>. Em mala te, qesra te [bibînin]. Tu qosqoca<sup>2205</sup> wezîrê paşê yî. Îja subê tu mi biherî, padşayê were, hevalê teyê werin, giregirê werin. Ez bizanim çî te heye, çî tune, eksîkê<sup>2206</sup> te, şûyê<sup>2207</sup> te, bûyê<sup>2208</sup> te.”

Dibê wezîr go:

“Qe tu însanekî mûta<sup>2209</sup> te ev aqil ev gotin mi ra nekiryê. Hema dayînek e, xwedê daye mi.”

Nizane xwedê qesasê serê wî şandye. Dibê go:

“Dayînek e xwedê daye mi.”

Dibê wezîr, [Navçeker] hilda çûn. Dibê nav mala wezîr, qesra wezîr, koşka wezîr hemû li hev dan. Dibê hatne ber wî derî.

De îja eva bi rojekî da neb'ye. Eva bi hefta, bi ewa derbas bûye. Dibê hatne ber wî derî. Dibê

---

2200 ) Mezin, gir, muezem.

2201 ) Lê, lê belê.

2202 ) ‘Îgneden ipiliğe’ biwêjek e ji zimanê tirkî ye û berginda wê di zimanê kurdî de ‘ji serî hetanî binî’ ye

2203 ) Pêvekirin, pêdakirin.

2204 ) Em herin.

2205 ) Mezin, gir, muezem.

2206 ) Kêmasî

2207 ) Ew.

2208 ) Ev.

2209 ) Mîna.

wezîr a iha nigê xwe l' dêrî da. Dibê [Navçeker] go:

“Wezîr, evî derî veke. E vira jî bibînim.”

Dibê go:

“Heyran, were jê gerî be. Îşê me bi wira tune.”

Dibê [Navçeker] go:

“Wezîr, mi ra meraqa çêneke. Derî veke em bibînin.”

Dibê wextê derî vekerin ketne hundir, dêna xwe danê, di nava wan hesna da îskeletê meriva hene.

Dibê wezîr kelîmek e nexaş go. Dibê wextê kelîmek e nexaş go, dibê îdî [Navçeker] anamîş<sup>2210</sup> bû.

Dibê go:

“Wezîr, ev çi ne?”

Dibê go:

“Heyran, jê vegere.”

Dibê [Navçeker] go:

“Wezîr, kuro mi veneşêre. Kuro, ez helala te me. Kuro, ez niha her tiştî bizanbim fayda te ye, yarara<sup>2211</sup> te ye.”

Dibê go:

“Hal-hewalê Îza, iha eva kemîkê<sup>2212</sup> Îza ne. A wuha a hatye xerc, mesrefê. A wuha, a wuha, a wuha. Hinde zor, zorbalix<sup>2213</sup> kirine. Mi jî bi vî şertî daye îşkencê, daye kuştinê.”

Dibê go:

“Wezîr, îja ev çi terî<sup>2214</sup> ye?”

Dibê wezîr gotê, go:

“Evî qolî berjêr ke.”

Dibê ewa qola berjêr kir.

Dibê go:

“Wezîr, na. Tu vira bigre, tu bilind ke. Ez berê xwe dirêj kim.”

Dibê wezîr bilind kir. Ew çû kete wira xwe dirêj kir. Wezîr go:

“Tê a iha bigrî. Eva a iha yê werne hev, bedena însana da diçin, însana dikujin.”

Dibê wezîr normal de da hev, go:

“Temam e.”

Dibê wezîr vekir. Dibê wezîr go:

“Îja ez bikevme wira.”

---

2210 ) Fêmkirin, têgihîştin, serwextbûn.

2211 ) Feyde, menfa'et, kêr.

2212 ) Hestî.

2213 ) Zorbetî, zirbetî.

2214 ) Tehr, awa, şêwe.

[Navçeker] go:

“Na. Sadece ez bizanbim çî ye, kêrê çî tê.”

Dibê wezîr go:

“Heyran, e jî bikevme wira.”

Go:

“Ê were. Tu wextê zehf ewk dikî tu jî were.”

Dibê wezîr jî hat xwe dirêj kir. Ewî jî ‘eyne qol iha berjêr kir, cake<sup>2215</sup> bilind kir, cake wezîr nav dexist.

Dibê zeman hat îja vana dehvat kir. Dibê dehvat kirin. Dibê êvarê cake xwe ra geryan. Dibê hatne ber derê wê odê. Dibê ewê idî kilît lêda derî vekîr. Dibê go:

“Wezîr, çika were evê cake nîşanî mi xe. Mi eva bîr kirye. Eva mi bîr kirye.”

Dibê wezîr go:

“Baş e.”

Dibê go:

“Wezîr, tu berê mandalê bilind ke ez ê xwe dirêj kim.”

Dibê wezîr mandal bilind kir, mengene j’ hev vebûn. Ewê çû xwe dirêj kir. Wezîr cake mandal hevraz kir, hatne hev. Cake bejêr kir, vebû. Ew derket. Dibê îja wezîr go:

“Ez xwe dirêj kim.”

Go:

“Na na, heyran.”

[Wezîr] go:

“Na na, e jî xwe dirêj kim. Yanî tu rind hîn be, fehm bike jê.”

Dibê wextê wezîr xwe dirêj kir, dibê ewî mandal bejêr kir. Dibê wezîr go:

“Tu, mi dikujî!”

Dibê ewî hingî basmîş<sup>2216</sup> kir. Dibê hingî wezîr kire qareqar, dibê hesabîyle<sup>2217</sup> basmîş kir. Wezîr mest kir<sup>2218</sup> tê da.

Dibê kincê xwe, ew kincê ser serê xwe jor da anî, go:

“Wezîr, hinde zeman e mi ev ro beglemîş<sup>2219</sup> dikir. Ez kurê Îza me, Îza bavê min e. Ez kurê Îza me. Navê mi Navçeker e.”

Dibê basmîşî<sup>2220</sup> qol kir, qol hemû bejêr kir. Ew hesin hemû di bedena wezîr da rûniştin. Yanî

---

2215 ) Dîsa, careke din.

2216 ) Pêlêkirin, tepisandin.

2217 ) Li gorî dilê xwe, li gorî hêz û quweta xwe.

2218 ) Li Ebexê û li derdora Ebexê bi maneya kuştinê tê bikaranîn.

2219 ) Li bendê man û sekinîn, li hêviyê man û sekinîn.

2220 ) Pêlêkirin, tepisandin.

birîndar kir, birîneke giran e ku giran.

Dibê ew xêlî-mêliya xwe hemû anî avîte ser yataxê<sup>2221</sup>. Kincê xwe li xwe kir. Rê ket, daxilî şîher bû. Dibê çû cem Qurbanî, Keniz. Dibê subê zû rabû, bînak kîralamîş<sup>2222</sup> kir. Hekîm im dîye<sup>2223</sup>, Hekîmê Loqman dîye, dibê tabelak lê da, jor da berjêr kir.

Dibê sube zelal bû. Paşa beglemîş dike wezîr were. Heyet hat, her kes hat rûnişt, wezîr tune. Dibê hevalê wî laqirdî hev kirin. Paşa laqirdî bi wan kir, go:

“Kuro, ka herin wezîr çima nehat? Ka wezîr pê ket, ça bû? Kuro, ka herin wezîr ku da maye?”

Dibê evna çûn:

“Wezîr, wezîr!”

L’ dêrî dan, ketne hundur, walî geryan walî geryan. Kincê bûkê, xêlî-mêlî wê l’ wê derê, wezîr tune. Dibê walî l’ derîya dan, walî geryan, hemû geryan. Dibê hatne ser wî derî, dest avîtnê vekirin. Dêna xwe danê, nêzenêza wezîr di mengena da tê. Dibê vekirin, mandal bilind kirin. Wezîr ji nav kişandin dexistin. Dibê caw<sup>2224</sup> dane paşê. Tiştêkî kesî nedîtî! Paşa jî ew tiştê di mala wezîr da nedîtibûye. Dibê îja go:

“Hekîm, Loqman?”

Dibê gerandin. Kê tê dibê:

“Ez hekîm im.”

Îja em werin Navçeker xeber bidin. Dibê Navçeker çû nav qesaba. Dêna xwe dayê, heywanek anîne, gak, şerjê dikin. Şerjê kirine, postê wê maye. Dibê gote qesab, go:

“Tê sadece dêla wê bidî mi. Fîyeta postê çî ye?”

[Qesab] go:

“Yawo, ez dêlê ser post difroşim.”

[Navçeker] go:

“Yawo, fîyeta postê te çî ye?”

[Qesab] go:

“Du mecdî.”

[Navçeker] go:

“A te ra çar mecdî. Tê dêla wê bidî mi.”

Dibê dêla wî wir da jêkir, hilda. [Navçeker] go:

“De îja evê temîz bide debaxê. Yanî çêke, têxe qamçî.”

Dibê çû. Ji birê xwe ra bêjim, idî ku niha em dibêjin nalbûr, çû ser nehlçekera. Dibê ev bizmarê hane hûr, em jê ra dibêjin çengene mixinî, hinek jî hûr lap hûrê wan hene, dibê qederekî ji wanê hûr

2221 ) Nivîn, cî û nivîn.

2222 ) Kirêkirin.

2223 ) Bi navê.

2224 ) Cab, agahî, xeber.

kirrî anî. Dibê anî da wî qesabî, debaxçiyî, go:

“Tê vana hemû di serê wî da bikutî. Şimakî bikşînî ser. Kes nizanbe qamçî ye. Tê têxî qamçî, heleqekî jî bavêjî serê wî, destê mi da.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê heqê wî, ewî çî xastîye, dibê ewî dudu zêde dayê. Ji birayê xwe ra bêjim, dibê hilda. Dibê hat gerya. Dibê çantek xwe ra kirrî. Aletê<sup>2225</sup> wî kirrî, aletê dixtora çî gerekmiş<sup>2226</sup> dike ewna jî kirrî. Dibê çû yazîxana<sup>2227</sup> xwe.

Dibê de îja paşê seferberlik<sup>2228</sup> îlan kirye:

“Kê wezîr qenc ke?”

Her kes tê, dibê:

“Ez dixtor im.”

Her kes tê, dibê:

“Ez hekîm im.”

Tabî dixtorî tune bûne, hekîmî hebûne. Dibê gencek di çarşiyê da diçe, dêna xwe didê, Loqman Hekîm Navçeker Oxlo<sup>2229</sup> Îza nav heye. Diçe j’ paşê ra dibêje, dibê:

“Di şehrê me da hekîmekî delal heye. Tabela wî, ewa wî, her tiştî wî [heye]. Çika bira ew jî mi’ane bike.”

[Paşa] dibê:

“Baş e, bira mi’ane bike.”

Dibê dişîne pey. Tê dêna xwe didê, dibê:

“Hildin bîne yazîxana<sup>2230</sup> mi. Heftêkî ez ê lê binhêrim. Birînê wî qenc nebû, paşa xaş be, heqê mi [nede].”

[Paşa] dibê:

“Baş e.”

Hildidin tîne yazîxana wî, oda wî. [Navçeker] dibê:

“Hûn dekevin herin.”

Eva gazî Keniz, Qurbanî dike, dibê:

“Kuro, masekî dayne vî ‘erdî.”

Datîne ser. [Navçeker] dibê:

---

2225 ) Amûr, hacet.

2226 ) Pêwîstîbûn, pêdivîbûn, hewcebûn.

2227 ) Nivîsgeh, buro.

2228 ) Seferberî.

2229 ) Kur, kurê.

2230 ) Nivîsgeh, buro.

“Kuro, wezîr bine ser.”

Eva ava sar li wezîr dike, bi qamçî dikute. Birîna dixê, ha. Ser-merî na, birina dixê.. Hingî ava sar lê dike birîn ro b’ ro sor dibin. Tê şuştinê. Heftê tamam dibe. Tabî xarin-marina wî jî didê ayrica<sup>2231</sup>. Heftê wî tamam dibe, heyet tê dêna xwe didê, baya<sup>2232</sup> sorayî ketye birîna. Hema çi terî sorayî ketyê? Dibê:

“Idî qenc dibe.”

Xeberê dine paşa, dibê:

“Qenc dibe.”

Evî hildidin dibin. Hildidin dibne dîwana paşê. Dibê îja qûrtûlûş yêldonumîya<sup>2233</sup> şehre paşê bû. Qûrtûlûş yêldonumîya şehre paşê bû. Dibê paşê îlan kir, go:

“Subê gîrîşa<sup>2234</sup> şîher da, gîrîş-çixişê<sup>2235</sup> şîher, ozellikle<sup>2236</sup> gîrîşa şîher da bira nan çêkin. Pêz şerjê kin, qelyê çêkin. Bira genc, sîyar sîyar bin herne cirîdê. Em ê jî werin temaşe bikin ka hespa kê birincî<sup>2237</sup> derdikeve.”

De tabî Navçeker jî di dîwanê da ne, toplantiyê<sup>2238</sup> da ne. Dibê go, dibê ewekî, rûsipîkî gotê go:

“Paşa xaş be, em ê wezîr jî bînin?”

Go:

“Tabî, wezîrê jî were wira. Hûn ê wezîr bînin. Di sona<sup>2239</sup> ewa [heyeta] da daynin ku îlk<sup>2240</sup> sîyarê were wezîr bibîne. Ez [û] qedere ku rûsipî hene, em ê sîyar olarak<sup>2241</sup> herin. Yaniz<sup>2242</sup>, em ne ajotina ew, ji boy qûrtûlûşa<sup>2243</sup> şîher, zafera<sup>2244</sup> şîher em ê jî tûrekî bavêjin.”

Dibê cima’et bela bû. Navçeker rabû. Dibê Navçeker rabû kete şîher, tûrek da. Namek nivîsî anî da destê paşê, da hundur, go:

“Evî karê hanê ez ê ustlenmiş<sup>2245</sup> bikim. Evî pezê hanê, vî goştê hanê ez ê j’ qesaba hildim. E jî esnaf im. Bira zîrar li xezna me, xezna paşê. Ez ê çil hev hogiçî şerjê kim, tême qelî. Wezîrê jî wê derê kêleka me be. Kê birincî<sup>2246</sup> hat jî em ê bexşîşê binê. Paşê çi gotye em ê wê bexşîşê binê.”

2231 ) Her wiha.

2232 ) Zedetir, pirtir, gelektir.

2233 ) Salvegera rizgariyê

2234 ) Têketin, ketin.

2235 ) Ketin û derketin. Têketin û derketin.

2236 ) Bi taybetî, xasma, nexasim.

2237 ) Yekem, yekemîn.

2238 ) Civîn.

2239 ) Dawî, axirî.

2240 ) Yekem, yê pêşî.

2241 ) Wek.

2242 ) Lê, lê belê.

2243 ) Rizgarî.

2244 ) Biserketin, serkeftin, serfirazî.

2245 ) Girtin ser xwe, kirin stuyê xwe.

2246 ) Yekem, yekemîn.



Dibê [paşê] go:

“Baş e.”

Dibê evî şev da kar kir. Dar birin, goşt birin, sinî qurmiş<sup>2247</sup> kirin, agir vêxistin. Dibê subê ra goşt dikele. Dibê wezîr jî anîn. Yataxek<sup>2248</sup> wezîr ra danîne wê derê, wezîr nav da ne. Ber piştta wê tijî ye, xwe ra sêr dike.

Dibê sîyar çûn. Bira sîyar herin. Dibê çil sîtil qurmiş kirine. Her sîtilekî da kevgîrek heye. Kevgîr hûn dizanin çî ye, da? Kepçe<sup>2249</sup>. Dibê Navçeker ew kevgîrana dexistin kire nava ar, nava êgir. Dibê hesabîle<sup>2250</sup> sor bûn. Dibê care yek hilda bi wezîr va danî. En ya sonê<sup>2251</sup>, dibê bi devê wezîr va danî.

Dibê wextê sîyar hatin, genc tèn derbas dibin, dibê:

“Yawo, wezîr jî dikene, ha!”

Dibê en yê sonê, paşa bi heyetê va hat. Paşa jî go:

“Wezîr dikene.”

Dibê wextê hatin dêna xwe danê, hema goşt çûye, hestî ye dûr va sipî dike. Zanî? Hestî ye dûr va sipî dike. Wezîr mirye. Dibê wezîr hildan. Şaylixana<sup>2252</sup> wan dewam dike. Nanê xwe xarin. Wezîr hildan defin kirin.

Dibê êvarê cima’eta paşê tijî ye. Rojek, dudu, sisê... dibê yasê<sup>2253</sup> wezîr ret<sup>2254</sup> bû, şîna wezîr kem bû. Dibê paşa gote rûsipîya, go:

“Tellala ra bêjin bira l’ defê xin. Bira defê xin, bira gazî kin, ev însan kê be di şîherê mi da, bira dereve ez ê xelat kim. Bira dekeve ka kê ye? Ev însanê ku hinde hatye, ev hukma kirye ka kê ye?”

Dibê êvarê dîwana paşê tijî ye, pê xeber didin. Dibê Navçeker rabû ser çokê xwe sekinî, ser çoka rûnişt, go:

“Paşa xaş be, Navçeker e. Yê eva îşa kirye ez im.”

[Paşa] go:

“Navê te?”

Go:

“Navê mi Navçeker e.”

[Paşa] go:

“Navçeker, tu ça hatî vî şehîrî? Tê eva îşa ça kir?”

Go:

- 
- 2247 ) Danîn, rastkirin.  
2248 ) Nivîn, cî û nivîn.  
2249 ) Hesk, çoçik.  
2250 ) Bi awayekî, bi hesabekî.  
2251 ) Herî dawî, axirîn.  
2252 ) Şahî, şahîfî.  
2253 ) Şîn.  
2254 ) Kuta, xilas.

“Ez kurê Îza me. Bavê mi filan tarîxê da hatye vî şehîrî xeracê. Te, bavê mi daye kuştinê.”

[Paşa] go:

“Mi bavê te nedaye kuştinê.”

[Navçeker] go:

- Wezîr, bavê mi bi vî şertî kuştie. Wextê bavê mi hatye ez hemla dîya xwe da bûme. Eva navê li ser mi, Navçeker jî, bavê mi weysêt olarak<sup>2255</sup> daniye. Ez mezin bûme. Ev sorin<sup>2256</sup> çêbûne. Gotine mi, here întiqamê bavê xwe, eger tu zehf mêrekî jêhatî yî here întiqamê bavê xwe hilde. Ez pey doza bavê xwe hatime. Bavê mi hatye vî şehîrî, ji vî şehîrî derneketye. Wezîrê te bavê mi kuştie. Mi di vî şehîrî da loqante kiralamîş<sup>2257</sup> kirye, loqante vekirye. Jina wezîr mirye. Ez hatime ser cinaze, ser merzel. Me jina wezîr hildaye. Îlk<sup>2258</sup> roja jina wezîr mirye, mi gotye tamam, întiqamê mi idî tê hildanê. Wextê jina wezîr mirye, ez êvarê zivirîme, e j' loqantê [zivirîme]. Mi loqante tesmîlî hevalê xwe kirye, e ji loqantê ayrilmîş<sup>2259</sup> bûme. Mi bi vî karî kar kirye. Ez bûme qîza pîrê. Em l' şîher geryane, wezîr çehv berdaye mi. Mi wezîr qebûl nekirye. Ji wezîr xilaz nebûme, mi qebûl kirye. Wezîr jî pîrê ra qesir çêkirye. Here bibîne, şahid e. Îja wextê mi ku wezîr begem kir, mi şert dane pêşya wezîr. Mi go, tê berê dîya mi ra qesrekî çêkî, qonaxekî çêkî. Çêkir. Îja ez nîşanlı<sup>2260</sup> bûm, em hatin l' mala wezîr geryan. Çî wezîr heye, çî tune? Ew mengena [ku] wezîr bavê mi tê da kuştibû, nîşanî mi da bi çî şertî kuştibû. Heta kelîmek, dudyê bê' erzî jî gotin. Wextê min hestiyê bavê xwe dîtî, tabî ewî ew kelîmana gotin, tabî nizanbû ez çî me. Wezîr sadece çehv bedewbûna mi [ketibû]. Nizanbû boyax e mi l' xwe daye. Bîr an evel<sup>2261</sup> ça mi bibe sahîb, wezîr pey wê ketibû. Netîce, ku wextê dehwatê hat, dehwater me kirin. Em êvarê dîsa hatin li malê geryan. Em hatne ser wê

Mi j' wezîr ra go:

“Yawo, kanê evê nîşanî mi xe ez meraq dikim.”

[Navçeker] dibê:

“Berê ez ketme mengênê. E jê deketim.”

Mi go:

“Miherin<sup>2262</sup>.”

Wezîr go:

“Na, ez ê jî îja bikevmê.”

[Navçeker] dibê:

- 
- 2255 ) Wek.  
2256 ) Pirsgirêk..  
2257 ) Kirêgirtin, kirêkirin.  
2258 ) Yekem, yê/ya pêşî  
2259 ) Veqetîn.  
2260 ) Dergîstî.  
2261 ) Gavek berê.  
2262 ) Em herin.

“Mi jî tiştêkî isa dixast. Wextê ketê, hal mesele a iha. Îja ez paşê, ser wê îja ez çûm bûme dixtor. Min yazîxane<sup>2263</sup> vekir. Mi wezîr bi şertî ewk kir. En son<sup>2264</sup> ku qurtulûşa<sup>2265</sup> şehrê we bû, ez hatim ew çil peza ez ustlenmîş<sup>2266</sup> bûm. Ewa kara mi kir. Ew kevgîrana jî mi devê wezîr va danî. Kê we jî dihat we digo, wezîr dikene. Mesele ev e. Mi întiqamê bavê xwe hildaye. E jî hovanê<sup>2267</sup> me, l’ cima’eta we da nim. Hûn mi bikujin, azad kin, destê te da ne, paşa.”

Paşa dibê:

“Ez ne te dikujim ne azad dikim, ez te xelat dikim. Ez te dikme zavê xwe, te dixme wezîrê xwe.”

[Navçeker] dibê:

“Ez qebûl nakim. Wezîrtîya te qebûl nakim. Mi dîya xwe ra, xelkê xwe ra, paşayê xwe ra mi sozek daye. Mi gotye; ez întiqamê bavê xwe vekim, hildim tola bavê xwe, ez ê werim. Dîya mi, mi beglemîş<sup>2268</sup> dike.”

Dibê îja paşa gotê:

“Ez keça xwe bime te.”

Dibê go:

“Mi j’ keça paşakî ra soz daye. Eger keça te hêvîyê qebûl bike ez ê biherim., eger mi jî qebûl bike ve<sup>2269</sup> e jî keça te qebûl bikim.”

Dibê paşa go:

“Wellahî, qe gencê motanî<sup>2270</sup> te ber çehvê mi neketine. Hinde yanî açix sozlu<sup>2271</sup>, durust, cîvan.”

Dibê îja wextê ku padşê ev tiştana jê ra anîne ziman, dibê Navçeker go:

“Paşa, bira sibê zelal be. Ez, qîza te em hev bibîn. Qîza te ev şertê ez dibêjim begem bike, van şertê mi qebûl bike, em jî hevdu begem bikin, beke<sup>2272</sup> qîza te ez begem nekirim, beke mi qîza te begem nekir, hema em bêjin a wuha nabe.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê sube zelal bû. Dîsa dîwana paşê tijî ye, rûniştine. Dibê paşa rabû gazî xanima xwe kir. Dibê go:

“Qesra te musaît e?”

Dibê go:

---

2263 ) Nivîsgeh, buro.

2264 ) Herî dawî, di axiriyê da.

2265 ) Rizgarî.

2266 ) Kirin stuyê xwe, girtin ser xwe.

2267 ) Hova, peyveke taybet a ku li Ebexê zêde zêde tê bikaranîn bi wateya ‘ez li vê derê me’.

2268 ) Li bendê man, li hêviyê man.

2269 ) Û.

2270 ) Mîna.

2271 ) Rastgoi rastbêj.

2272 ) Belkî, dibe ku.

“Erê.”

Dibê paşa bi du hev rûsipîyê xwe bi xanima xwe va, dibê derbasî boluma<sup>2273</sup> xanima xwe bûn.

Dibê gazî keça xwe kir. Dibê keça wî hat. Dibê go:

“Keça mi, tu evî gencî qebûl dikî?”

Dibê keçikê gotê, go:

“Bavo, ku dîtina si’etekî, xeberdana si’etekî nabe tişteki. Zeman dixaze me ra.”

Dibê [paşa] duşmîş<sup>2274</sup> bû, go:

“Gotna te ye.”

Dibê [paşa] ji wan ra go, go:

“Hûn heftêkî mêvanê min in. Hûn ê di qesra mi da bin.”

Dibê di nava wê heftê da keçikê [û] Navçeker ku rind ji hevdu fehm kirin, hevdu dîtin. Dibê keçikê jî bi çehvekî na bi hezar çehvî çehv berda Navçeker, jê hiz kir. Dibê Navçeker jê ra go:

“Ez niha sozî<sup>2275</sup> me. Mi j’ keçeke din ra jî soz daye. Eger tu qebûl bikî, bax<sup>2276</sup>, ez te biherim jî ewê bibe hêvîya te. Tu qebûl bikî ez ê te biherim. Tu qebûl nekî ne te ez dîtine ne mi tu dîtîyî.”

Dibê qîza paşê duşmîş bû, hayal qûrmîş<sup>2277</sup> kir:

“Yawo, gencekî a iha cîvan, ji welatekî hinde ‘erd were, întîqamekî bona tolekî were, tola xwe hilde, întîqamê xwe hilde, ku mêrekî iha ez ê idî ku bibînim?”

Dibê go:

“Ez qebûl im.”

Dibê îja paşa rabû, dehwata wan da kirin. Mehra wan da birrîn. Dibê îja karê mesrefa keça xwe kar kir. Dibê eşyayê bi xwe qîmetê wî giran yanî pere bike, yuk<sup>2278</sup> olarak bar olarak<sup>2279</sup> sivik be, dibê barê bazirganekî [hazir dike]. De berê j’ kewrana ra mezina digotin, bazirgan. Kewran-bazirgan; deve bûne, ga bûne, hesp bûne, af bûyrûn<sup>2280</sup> qantir bûne. Wan ra jî qantira ra jî gotine, hêstirok. Ew hebûne.

Dibê ku destûra wan da, bi rê ketin. Go:

“Heta nuqta hidûdê me, filan padşayî biherin. Ji wê nuqtê hûn veherin. Ew ê herin.”

Dibê îja evna wextê çûn heta wê nuqtê, dibê wê nuqtê xatirê xwe hev xastin. Bira ewna veherine şehre xwe. Dibê evna jî çûn ji perrê şîher da êwir bûn. Dibê çadirê xwe vegirtin. Heftêkî, deh ro perrê şîher êwirîn.

---

2273 ) Beş, qism.

2274 ) Fikirîn.

2275 ) Sozdar.

2276 ) Binê, binêre.

2277 ) Xeyal kirin.

2278 ) Bar.

2279 ) Wek.

2280 ) ’Efû bike, bibexşîne, bibore.

Dibê îja Navçeker kete şîher gerya. Dibê çû. Dibê namek nivîsî, da namedara. Tepsîk<sup>2281</sup> gul da çêkirinê. Nama xwe kire nav wê tepsîya gula, ji qîza paşê [sozdara xwe ya din] ra şand. Dibê wextê ew gul ji qîza paşê çûn, dibê danîn zivirîn. Dibê qîza paşê wextê gul hatne pêşya wê li gula nihêrî, gul hev vekirin demet-demet<sup>2282</sup> ayrî<sup>2283</sup> kir, dibê dêna xwe dayê, namek nav a ne. Dibê name vekir xand. Dibê dêna xwe dayê, yê name şandîye Navçeker e. Gotye:

“Heftêk e ez, bazirganekî va li perrê şehre bavê te êwirî me. Sozekî mi j’ te ra hebûye. Ez zewicî me, min hevala xwe jî anye. Eger tu l’ ser sozê xwe bî, ya hatinê bî, ez hazir im. Eger tu ya nehatinê bî... Ha şertê te hebin, bi çi şertî be, ez te j’ bavê te bixazim. Rêka wê çî ye? Vana mi ra name olarak<sup>2284</sup> bişîne veya<sup>2285</sup> bi xwe were em hev bibînin.”

Her tiştê xwe tê da gotye. Dibê keçikê rabû, deste kincê mêra li xwe kir. Destek jî l’ carya xwe kir, carî da kêleka xwe. Xwe berdane nava şîher, xwe berdane konê Navçeker, çadira Navçeker.

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê l’ çadira Navçeker, wan [û] Navçeker qise kir. Dibê rûniştin, suhbet kirin. Qehwe hat, çay hat. Dibê keçikê dest avîte papax serê xwe dexist, go:

“Navçeker, ez filankes im, qîza paşê me. Eva nama te şandye, ez ser wê hatime.”

Dibê Navçeker gotê:

“Eva hevala min e. Mi j’ wê ra jî gotye. Mi gotye; mi soz daye, ez sozdarî me, tu qebûl bikî ez ê te biherim. Tu jî hovanê<sup>2286</sup> yî. Tiştê mi te ra gotye, mi gotye ez ê vegerim. Te gotye, tu vegerî tê mi biherî? Mi gotye, bi gotna tu hiz bikî, em ji hev hiz bikin, ez ê te biherim. Em hiz nekin ez te nabim. A tu niha bêjî erê, ez ê te j’ bavê te bixazim. Bavê te tu dayî, eva ez ê te bibim. Bavê te tu nedayî, tu yêra<sup>2287</sup> xwe ez yêra xwe. Ne te ez dîtîme ne mi tu dîtî.”

Dibê ew jî duşmîş<sup>2288</sup> bû, go:

“Yawo, ku gencekî hinde aqil, hinde cîvan, hinde jêhatî, hinde pehlîvan ez ê j’ ku bibînim? Ti hêvîyê mi buxwe? Em însan in. Qîzê dîtyan e, qîzê paşan e. Em ê mêrekî motanî<sup>2289</sup> Navçeker ku bibînin? Ez qebûl im.”

Dibê keçik namekî dinvîse ji bavê xwe ra dişîne, dibê:

“E gencekî ra ez tanîşmîş<sup>2290</sup> bûme. Dehwa mi dike. Îzna te hebe, tu îzin bidî yê were dîwanê. Tu qebûl bikî em ê hev ra evlenmîş<sup>2291</sup> bin.”

---

2281 ) Sinîyek.

2282 ) Baq bi baq, deste bi deste.

2283 ) Cuda.

2284 ) Wek.

2285 ) An, an jî, ya jî.

2286 ) Peyva ‘hova, hovanê’ li Ebexê û li derdora Ebexê bi maneya ‘li vir, li vê derê’ tê bikaranîn.

2287 ) Cî, cih, der.

2288 ) Fikirîn.

2289 ) Mîna.

2290 ) Hevnasîn, hevaskirin.

2291 ) Zewicîn.

[Paşa] dibê:

“Baş e.”

Namê hildide, namê dixûne. Namê ji keça xwe ra dişîne, dibê:

“Mehêk şûnda bira eva tiştê bibe.”

Qîzik cake<sup>2292</sup> dizvire cem Navçeker. Navçeker dibêje qîzikê, dibê:

“Ez jî ser fikra bavê te. Îja ez ê eva bazirganê xwe, ez ê derbasî şehre xwe bim. Ez derkevme şehre xwe bi wî şertî bi wî sozî ez ê heyetekî hildim. Hê beke<sup>2293</sup> ez paşayê xwe jî hildim, heyetekî hildim isa werme xazgînîyê te ji bavê te. Yalnız<sup>2294</sup>, sureklî<sup>2295</sup> di ara<sup>2296</sup> me da nameçîyê herin werin. Ku wextê bavê te bîlgî<sup>2297</sup> da te go ez hazir im, nama teyê were cem mi.”

Dibê go:

“Baş e.”

Dibê xatirê xwe hev xastin. Navçeker dibê subê bazirganê xwe bi rê xist. Rojek, dudu, sisê, heftê... Dibê dengê rêwîya hat, dengê rêjbera hat, dengê însanê çolê hat, dibê go:

“Cabê bine şîher bê, Navçekerê Oxlo<sup>2298</sup> Îza hat. Întiqamê bavê xwe hilda. Qîza paşê jî xwe ra xwast anî.”

Dibê mizgînîçîya mizgînî birin. Dibê hewarî kete şîher. Deng çû koşka paşê. Dibê paşê jî îlan kir, go:

“Kê mizgînîyê bîne gerçek<sup>2299</sup> ku ew be, ez ê jî xelat kim yê ku mizgînîya gerçek bîne.”

Dibê paşa înanmîş<sup>2300</sup> nebû. Yanî kes înanmîş nebû wî tiştî. Dibê her kes sîyar bû. Gneç sîyar bûn, yaşlî<sup>2301</sup> sîyar bûn çûn. Heqeten dêna xwe danê, Navçeker wê hat. Bazirganekî giran anye. Jinek pê ra. Dibê mizgînîçîya hesp ajotin, bîlgî<sup>2302</sup> dane paşê, go:

“Gerçek<sup>2303</sup> e, doxrî<sup>2304</sup> ye.”

Dibê îja paşê gazî tellala kir, go:

L' defê xin, hewar kin. Heftêkî di şîher da şaylîxa<sup>2305</sup> ye, dehvat e. Mesrefa wê, xarin-vexarin çî hebe hemû jî yê xeznê here, tamamî ji xeznê here.

---

2292 ) Dîsa, careke din.

2293 ) Belkî, dibe ku.

2294 ) Lê, lê belê.

2295 ) Her daîm, her wext, her gav.

2296 ) Nav, navber, navbeyn.

2297 ) Agahî, xeber, zanyarî.

2298 ) Kur, kurê.

2299 ) Rast, durust.

2300 ) Bawerkirin.

2301 ) Kal, kalemêr, pîremêr.

2302 ) Xeber, agahî, zanyarî.

2303 ) Rast, rasteqîn, heqîqet.

2304 ) Rast, rasteqîn, heqîqet.

2305 ) Şahî.

Dibê paşa rabû, di wê esnayê<sup>2306</sup> da gazî hosta, heddada kir. Dibê go:

“Hûn ê nava heftêkî, ha we ra sê hefte, bîlemedin<sup>2307</sup> mehekî da hûn ê qesreke temîz ji Navçeker ra çêkin. Xerc, mesrefa wê ji xeznê be.”

Ji birayê xwe ra bêjim, dibê heftê dehwatê tamam bû. Dibê Navçeker derbasî mala xwe bû, cem dîya xwe bû. Dibê rojek, dudu, sisê... Dibê îja paşê şande pey, hilkişande qesra xwe. Bi çî şertî çûbû, bi çî şertî întiqamê bavê xwe hildabû, dibê hemû j’ paşê ra go. Bi çî şertî jî qîza paşê anîbû ew jî go.

Dibê îja wê esnayê da nameçiyê wan dihatin diçûn. Dibê rojekî nameçik hat. Nameçî tê mala wî, mala bavê wî. Nimara deriyê xwe daye, yê dayka xwe. Dayka wî li ber dêrî berdide nameçî. Qîza paşê pey nameçî dikeve, nameçî dide vegerandinê, dibê:

“Ka were, te xêr e? Tu j’ ku hatîyî?”

Dibê:

“Eva nameya filankesê, qîza filan paşayî ji Navçeker ra şandîye. Evê namê bine destê wî.”

Dibê:

“Baş e.”

Qîzik hildide. Dîya wî dibê:

“Bira Navçeker evê nebîne. Bavê wî a iha birine, dane kuştinê.”

Qîzik dibê:

“Na. Bira were bibîne. Qararê xwe yê paşê bide.”

Navçeker êvarê j’ dîwanê paşê tê. Qîzik wextê namê dide pêşyê, dibê:

“Ev name îro hatye.”

Dibê:

“We name şandin, neşandin?”

Dibê:

“Me neşandine.”

Hemen ewa jî namekî dinvîse. Qîzikê gotye:

“Bavê min te beglemîş<sup>2308</sup> dike.”

Ewa hemen namekî dinvîse dişîne, dibê:

“Filan rojê...”

Çend roja hatine, çûyîna wana, rîya wana, ewê rîya xwe hesab dike, dibê:

“Filan heftê em mêvanê we ne. Mêvanê qesra bavê te ne.”

Eva subetirê diçe dîwana paşê, j’ paşê ra dibêje dibê:

---

2306 ) Gav, kêlî, dem.

2307 ) Nebe nebe, herî zêde.

2308 ) Li bendê ma, li hêviyê man.

“Hal mesele a wuha. Ez sozlî<sup>2309</sup> me. Tu jî padşayê min î. Yan heyetekî bidî mi, yan bi xwe kerem kî, ez ê herim nîşaniya xwe bibînim, dehwata xwe bikim.”

Dibê:

“Baş e, baş e.”

Paşa dibê:

“Yaniz<sup>2310</sup>, şertekî min heye.”

[Navçeker] dibê:

“Paşa, kerem ke şertê xwe bêje.”

Dibê:

“Bavê te çi gorev<sup>2311</sup> kirye tu wê gorevê qebûl bikî ez ê jî ew tiştê tu dibêjî ez ê hemûka qebûl bikim. Îro şûnda tê hem bibî başpehlîvanê<sup>2312</sup> min hem jî bibî wezîrê mi, qûrmayê<sup>2313</sup> mi. Ku e şîher nebim, girtin-berdana şîher hemû tişt ‘aydî te, bin destê te da.”

[Navçeker] dibê:

“Baş e, padîşayê mi. Qebûl dikim.”

Dibê paşa radibe, heyetekî hildide Navçeker jî dahîl<sup>2314</sup>. Dibê sîyar dibin, daxilî şîherê padşê dibin. Rojek, dudu, heftêk... Dibê gotnê xwe ji hev ra dibêjin. Dibê paşa jî qebûl dike. Dibê dehwata qîza paşê bi Navçeker, dibê paşa sulha mehrê dike. Dibê hildidin tên, tê şehre xwe. Derbasî qesra xwe dibe.

Ji birayê xwe ra bêjim, dehwata xwe dike. Heftêkî dixê def û dehwat. Dibê ser vê dehwatê jî derbasî koşk-sera paşê dibe, koşk-sera paşê ye ku wezîrtîyê, toplantîyê<sup>2315</sup>. Ji toplantîyê rojekî êvarê tê gazî Qurbanî, Keniz dike, dibê:

“Hûn herdi jî birayê min in. Bigerin, di çevrê<sup>2316</sup> da, di şîhera da, di bajara da yê henkûfê xwe, henkûfê me bibînin. Ez ê jî we bizewicînim. Ew tiştê idî ferza ser min e, e jî we bizewicînim.”

Dibê zemanle<sup>2317</sup> ew herd jî du hev keça xwe ra dibînin. Dibê Navçeker dehwata wan birayê xwe jî dide kirinê. Tabî birê wî, yanî oz<sup>2318</sup> birê wî nînin. Hema biratî olarak<sup>2319</sup> xwe ra qebûl kirye. Yoldaş<sup>2320</sup> olarak, heval olarak xwe ra qebûl kirye evna.

---

2309 ) Sozdar.

2310 ) Lê, lê belê.

2311 ) Peywîr, wezîfe.

2312 ) Serekpelewan.

2313 ) Serkanîherb.

2314 ) Tê de, di nav de.

2315 ) Civîn.

2316 ) Devdor, derdor.

2317 ) Bere bere, bi zeman re, bi demê re.

2318 ) Heqîqî, rasteqîn.

2319 ) Wek.

2320 ) Hevrê, rêheval.



Ji birayê xwe ra bêjim, bi vî şeklî eva hîkaya me jî tê sona<sup>2321</sup> wê. Yê dînemîş<sup>2322</sup> kiribin jî xwedê jê razî be. Yê me ra gotibin jî, me ji wan hildabe jî xwedê ji wan razî be. A ev tiştana jî hevalê me yê cîvan însalla yê deyer<sup>2323</sup> bidê.

ÇÎROKBÊJ: SALHÊ HECÎ HEYDER

HERÊM: JI GUNDÊ SEREGOLÊ JORÊ [EBEXE-WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 52

PERWERDE: DIBISTANA SERETAYÎ

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 15/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]



---

2321 ) Dawî, axirî.

2322 ) Guhdarîkirin.

2323 ) Qîmet, buha, rûmet.

## 22. ÇÎROKA PÎRA SÊR<sup>2324</sup>

Hebe nebe, rehme li dêbavê hazira be.

Qîzikek hebûye, cîya wê bûye, bavê wê bûye. Cîya wê lê dixê. Qîzik radibe serê xwe hildide diçe. Qîzik serê xwe hildide diçe. Diçe.

Pir diçe hindik diçe. Dêna xwe dayê, malek dût e. Hema zinavek<sup>2325</sup> dû ser mala pîrê dikşe. Qîzik, hema xwe ber bi wî dûtî digre diçe. Ber bi wî dûtî digre diçe. Dêna xwe dayê, yanî qefle qîz jî wê derê ne. Digêje wan qîza. Êvar ser wan da dikeve. Ewna qîzana hemû, wê dûtî pîrê digrin, diçne mala pîrê. Diçne mala pîrê da. Pîrê jî pîra sêr e. Radibin diçin. [Pîra Sêr] dibê:

“Hûn li ku tên? Hûn ê çawa bikin?”

[Ew qîzana] dibê:

“Welle, hema em hatine. Em li gund dût ketine. Hema me xwe vî dûtî te yê ser xanmana<sup>2326</sup>, me xwe girtîye, em hatine mala te.”

[Pîra Sêr] dibê:

“Werin. Werin, we çawa ji mi kiro! Werin.”

Welle, radibin diçin. Êvar ser wan da tê. Radizên. Pîrê dibê:

“Ez çawa b'kim çawa nekim?”

Dibê qîzikek guhê xwe didê. Pîrê dibêje:

“Ez çawa b'kim çawa nekim, ez ê wana hemûka buxum.”

Pîrê diçe ser jorê. Ewna hevt heşt qîz in. Hemû, ya xwe dixne yek, dibê:

“Em ê isa bikin, em nahêlin pîrê razê heta sibê. Evê me buxwe.”

Qîzik dibêje, dibê:

“Min guhê xwe dayê, gotye golika xwe, gotyê golikê gotye, tu xwe kerr ke. Ez ê wana hemûkî îşev buxum. Ez ê buxum jî bime te jî. Bi xwedê, ha gotye.”

Dibêje. Hevalê wana hemû ranazên heta sibê. Wextê ku pîrê diçe ser xanmana, diranê xwe tûj ke wana buxwe, qîzikek dibêje, dibê:

“Pîrê, cîya mi her ro vî çaxê elengê<sup>2327</sup> da mi ra av dianî.”

Pîrê diçe. Dêna xwe dayê, dike nake av nakeve elengê. Pirtikekî dixê textikê elengê, tîne. Dibê:

“Nakeve elengê.”

[Qîzik] dibê:

“E tî me. Cîya mi her ro mi ra elengê da avê tîne.”

Hela ewê kerr dike. Ewê kerr dike. Ewa radibe. Yeke din deyn<sup>2328</sup> lê dike, dibê:

2324 ) Ev çîrok, li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

2325 ) Zehf zirav û lawaz.

2326 ) Mal, xanî.

2327 ) Serada ar, serada êr.

2328 ) Deng.

“Pîrêê, cîya mi her ro vî çaxî mi ra kade bêşî<sup>2329</sup> lêdixist.”

Ew jî isa dike, [dibê]:

“Bona kerr bin. Ez wana buxum.”

Ew hevaleke wê ye din jî dibê:

“Welle, cîya mi, mi ra her ro vî çaxî kade bêşîya lêdixist.”

Welle pîrê radibe. Kade bêşîya lê dixê. Didê, ewa duxwe. [Qîzikeke din] dibê:

“Pîrêê, welle cîya mi her ro vî çaxî mi ra goştê qelîya sêlê çêdike.”

Radibe, qelîya sêlê çêdike. Dide hevaleke din. Ew jî duxwe. De îja, dibê yeke din jî deyn pê dike, dibê:

“Pîrêê, welle cîya mi her ro vî çaxî mi ra ewk, mi ra çay çêdike, mi ra tîne. E çay nexum<sup>2330</sup> ez nasenim.”

Jê ra çay çêdike. Tîne didê da. Ew hevalê wê hemû dora xwe dikin. Temam dikin. (Qîzik) dêna xwe dayê, sibe lê hat. Radibe, ça dike? Dibê:

“Ez ê ça b’kim, ça nekim?”

Hemû direvin. Hemû direvin, qîzikek dimîne. Radibe, qîzikê dixê hindirê torbe da. Devê torbe girê dide. Diçe diranê tûj ke, dibê:

“Ez ê werim ewê buxum.”

Ewa qîzka cî da dimîne. Qîzikê digre. Dikeve pişt derî, qîzikê digre. Ewanê din direvin. Qîzikê digre. Dixê hindirê torbe. Devê torbe girê dide, dibê:

“Ez ê herim. Devê xwe, diranê xwe tûj kim. Ez ê buxum.”

[Qîzik] dibê:

“Mala mi xira be! Yê mi buxwe!”

[Qîzik] radibe devê torbe jê dike, diqelişîne. Golikê dixê, golka pîrê. Ew e golikek e. Golka pîrê dixê da. Derî girê dide. Qîzik direve diçe.

[Pîrê] diranê xwe tûj dike, da. Tê, derî vedike, duxwe. Devê xwe davêjê golikê duxwe bi torbe va. Dêna xwe didê, wê golika wê ye. Dibê:

“Mala mi xira be! Golka min e. Mi golik xar.”

Direve, li pey wana dikeve. Wana nagre. A golikê jî duxwe. A golik jî diçe.

Ew jî wê derê, çû mirazê şa bû.

ÇÎROKBÊJ: AMOJNA SUHBET, HERÊM: GUNDÊ ŞEREFXANÊ JORÊ [EBEXE-WAN]

TEMEN: 45, PERWERDE: NEXWENDE, DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 20/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

2329 ) Şîrînayîyek e. Bi ar, rûn û bi şekir tê çêkirinê.

2330 ) Vexwarin

### 23. ÇÎROKA ROSTEMÊ ZAL<sup>2331</sup>

Wexta Rostemê Zal da padşahê hebûye. Rostemê Zal pelevanekî wî padşahî bûye. Dibêje, xwe tebdîl qîyafet dikan. Padişah, wezîr va tev digerin. Digerin. Em bêjin, gotye:

“Çirê şîher bira yasax<sup>2332</sup> be.”

Neysel. Pir diçin hindik diçin. Dêna xwe dinê, yawo, ew heye. Dêna xwe dinê, çirak dişxule<sup>2333</sup>. Padişah dibêje:

“Yawo, qey evana emrê mi dînemîş<sup>2334</sup> nakin. Filan...”

Neysene<sup>2335</sup>. Dibê padişah xwe xar dike, dibê:

“Wezîr, çika hilkişe ser piştta mi dêna xwe bidê?”

Dêna xwe didê, çi? Yawo, em bêjin du hev mêt-jinê hev in, genc in. Dibêje, dibê:

“Yanî jinik çoka xwe dafîne ‘erdê mêtik serê xwe dide ser. Qederekî, em bê, disekine. Yan radizê yan ranazê, îja çoka wê diqerime, îja ew serê xwe dide ser.”

Neysel. Padişah xwe dihejîne, dibê:

“Kuro wezîr, piştta mi ş’kest.”

[Wezîr] dibêje, dibê:

“Padişah, mala te xirav nebe. Heger ez nîv si’etî nehatim, tu herî tu si’etekî nayê.”

Neysene. Eva, padişah diçe piştta wî. Dêna xwe didê, ‘eynî ‘ecêba ku ewî dîtye ew jî dibîne. Berjêr dibin. [Padişah] dibêje, dibê:

“Wezîr, yawo gelo hebe eva jinka, yanî ku mêtê xwe terk ke? Yanî ça digotin, aldatmîş<sup>2336</sup> ke.”

Wezîr dibêje:

“Haaa! Isa aldatmîş dike, mîta<sup>2337</sup> fire av.”

De îja padişah, wezîr va tartîşmîş<sup>2338</sup> dibin. Padişah dibêje:

“Ku ez bizanibim, bibînim bi çehvê serê xwe eva mêtê xwe aldatmîş<sup>2339</sup> ke, ez ê serê jinê şehre xwe hemû bime jêkirin.”

Yawo, mêtik-jinik sadiqê hev bûne. Padişah bihar<sup>2340</sup> neke ku em bêjin evana, yanî jinikê vî merkî aldatmîş ke. Wezîr dibêje, dibê:

“Heyran, bextê jinê tune. Yawo, tu çima vî tiştî dikî?”

2331 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

2332 ) Qedexe.

2333 ) Li Ebexê bo teyîsîn û rewnaqdariya ronahiyê lêkera ‘şixulîn’ tê bikaranîn.

2334 ) Guhdarîkirin.

2335 ) Werhasil.

2336 ) Bêbextîlêkirin.

2337 ) Mîna.

2338 ) Mînaqêşe, devjenî.

2339 ) Bêbextîlêkirin.

2340 ) Li Ebexê li şûna peyvên ‘bawer, bawerkirin’ê peyvên ‘bihar, biharkirin’ tê bikaranîn.

[Padîşah] dibêje, dibê:

“Na. Gava tişteki isa hebe...”

[Wezîr] dibê:

“Ê baş e.”

Îja xwedê rehma xwe lê ke, Temirê Reşo xeber dida, digo:

“Xwedê silametiya fesada nede, ne ku bide.”

Lê. Dibê wezîr dibe:

“Baş e.”

Dibê neyse. Wezîr digere di mehlê da. Nêzîkî wî, dizane, pîreke fesad dibîne. Neyse, xoş-bêş, filan. [Wezîr] dibê:

“Jina filankesê, dilê paşê ketyê.”

Pîrê dibêje, dibê:

“Yawo, ça?”

Wezîr dibêje pîrê:

“Boy xwedê be, tu ça orta<sup>2341</sup> wê bi paşê çekî?”

Pîrê dibêje, dibê:

“Yawo, weylê xwedê jê razîbûyî. Ew çî ye?”

Digo, ça Reşoyê Mele digo:

“At oynayacağı yêrîdir<sup>2342</sup>.”

[Pîrê] dibê:

“Ew çî ye? Wexta padîşah dilê wî ketibê, ew ça nayê? Filan.”

Neyse. Zêrekî li devê pîrê, zêrekî li dêv va dizeliqîne. Pîrê diçe cem da. Pîrê, îja diçe cem jinikê, hevraz-berjêr. Dibêje jinikê, dibê:

“Yawo, tu xaş jin î, hema nefayde<sup>2343</sup>. Ka tu jina vî mervî yî.”

Jinik, berê dibêje:

“Heyran, qedera xwedê ye. Şû ye bû ye<sup>2344</sup>.”

[Pîrê] dibê:

“Qîzê, tu layîqî padîşaha yî, wezîra, filan...”

[Jinik] dibê:

“Heyran, ez ku, wezîr li ku? Filan...”

[Pîrê] dibê:

---

2341 ) Têkilî.

2342 ) Biwêjeke tirkî ye bi îhtîmaleke mezin tê maneya ku ez tam pisporê vî şixulî me. Yanî eva tam şixulê min e.

2343 ) Bêfayde.

2344 ) Filan-bêvan.

“Qîzê, tu hiz bikî, xwedê xwedê, padişah dilê wî ketye te.”

[Jinik dibêje]:

“Ça ketye mi? Filan...”

Neyse. Ça dike? Em dirêj nekin. Padişah tê, Padişah dibêje wezîr:

“Kuro, ez ku çûme hundur, mi bi çehvê serê xwe dît, weke deh deqa, tu têkeve hundur bê, padşa ser şehre me da girtin.”

Dibêje dibê, eva wexta ku isakîne<sup>2345</sup> dike, padişah dikeve hundir, dêna xwe didê, heqîqeten jinik, yanî em bê, donmûş<sup>2346</sup> bûye. Yanî paşa ça kete hundir, sankî<sup>2347</sup> paşa mêrê wê ye, filan. Tabî, wezîr hemen dikeve hundir. Padişah, sade bona tercubê çûye hundir. Dertê. Wexta ku dertê, dibê gazî Rostem dike, dibê:

“Bax<sup>2348</sup>, ez derketim. Em bê, heta şeş meha ez nayêm. Wexta ku heta şeş meha ku ez çûm nehatim, ez wexta ku werim, yanî jinekî-qîzekî, yanî jin qismî di şehre xwe da nebînim. Tu serê hemûka jê kî.”

[Rostem dibê]:

“Heyran, padişah, çakî<sup>2349</sup> dibe? Filan...”

Pelevanê wî, Rostemê Zal bûye. Ew bi wezîrê xwe va diçe. Yanî Rostem pelevanê wî ye. Lê. Em bê, bin emrê wî da ne. Yaniz<sup>2350</sup> Zal hê heye, ha. Rostem kurê Zal e. Zal jî pelavan bûye. Neyse. Rostem dibêje, dibê:

“Heyran, ihakîne<sup>2351</sup> nabe. Ez ê berê herim. Di sêrî da, ez ê serê jin zarê xwe jê kim. Wexta ku wisa ye. Bona dilê mi idî bişewite. Heyfa mi bi kesî neyê.”

Eva wexta ku diçe, tabî de îja pelevan e. Em bêjin bênefişka dixê, filan-bêvan. Îja Zal, mala Zal şewîtî, Zal hê ji wî pelevantir bûye. [Zal] dibê:

“Kurê mi, xêr e? Tu bênefişka dixî? Filan...”

[Rostem] dibêje, dibê:

“Bavo, welle padişê iha gotye. Ez jî hema hatime. Mi gotye, ez ê berê serê jin zarê xwe jê kim. Ka tu çi dibêjî? Ça dikî? Filan...”

[Zal] dibê:

“Kurê mi, qe serê kesî jî jê neke. Padişah wextê ku hat, sade tu mi bide piştê xwe, bihere hizûra padişê. Ez pelevanê bavê padşê me. Helbet qedrê mi cem padşê heye. Meselek heye, ez ê jê ra bêjim.”

---

2345 ) Wisa.

2346 ) Şaşmayî, matmayî.

2347 ) Qey, tu dibê qey, heçko.

2348 ) Binhêre, binêre.

2349 ) Li Ebexê li şûna ‘bi çi awayî, çawa’ tê bikaranîn û zêde-zêde tê bikaranîn.

2350 ) Lê, lê belê.

2351 ) Li Ebexê li şûna peyva ‘wiha’ tê bikaranîn û zêdetîr tê bikaranîn.

Erê. Dibê pir diçe hindik diçe. Eva, wexta padişah tê, dêna xwe didê, dîsa ‘eynî hema ser kaniyê [jin] qîç-gevez dikin. Padişah hema hê nagîje şehre xwe, dibê:

“Zû gazî Rostem kin. Dême<sup>2352</sup> Rostem qey emrê mi pêk nayne.”

Dibêje dibê, neyse. Wexta ku padişah gazî Rostem dike, Rostem bavê xwe dide pišta xwe, diçe. Dibêje, dibê:

“Welle, padişah, mi îfî’atsiziya<sup>2353</sup> te nekiryê. Yaniz<sup>2354</sup>, eva bavê min, pelevanê bavê te bûye. Ewî nehîştîye ez serê jina jê kim. Gotye, ez ê tiştêkî jê ra bêjim. Wellahî, em bê, bira te ra xeber de. Yanî sûcê mi çi be jî dîsa ez razî me.”

Baş e. Dibê Zal gotê, go:

“Padişahê mi, ez ê te ra xeberekî bêjim. Yanî ku te heq neda mi da, bavo, pêş Rostem va serê mi jê ke. Yanî me serjêkirina xwe daye ber çehvê xwe. Padişahê mi, wexta bavê te da, arekî<sup>2355</sup> diz li şehre me miselet bûn. Her kesî nobed digirt. Tabî, ez pelevanê bavê te bûm. Zalê Zer bûm. Navê min dunyayê belav bibû. Nobed ya min e. Erê. Mi hespê xwe, gurz kemendê xwe [girêda]. Sîyar im. Ez digirim. Şev pir çû hindik çû. Xewê zor da min. Mi go, ez ê derkevme dişê<sup>2356</sup> sûrê. Meydanekî bidme hespê xwe. Bira xewa mi bireve, ez ê vegerim. Ez wexta derketme dişê sûrê, mi meydanek da hespê xwe. Mi dêna xwe dayê, ya rebbî, sîyarekî isa! Pelevanekî hê ji mi pelevantir! Em bê, rê da diçe. Mi ajote ser.”

[Min gotê]:

“Lolyo, tu kê yî? Iha diz ev e. Filan...”

[Zal] dibê:

“Neyse. Wexta ku min ajote ser, mi gurzek rakirê. Wexta mi gurz weşandê, em bê, qalqanê xwe da ber gurz.”

[Ewî sîyarî] go:

“Kuro, tu kurê merivan î. Eva zemanê laqirdîya nîne. Eva hidûdê Zalê Zer e. Lawo, ez rêwî me. Rêya xwe da derbas dibim. Talanê te li pêşya mi nînê, tajanê te pêşya mi nîne. Çi li mi dixazî?”

[Zal] go:

“Neysene<sup>2357</sup>. Hinekî sekinî. Ew ji mi dûr ket. Cake<sup>2358</sup> dinê ez hêrs bûm. Yawo, kuro, navê mi heye ez bi xwe tune me. Ka ev çi ye? Ça ber mi ra derbas bû? Mi îkîncî<sup>2359</sup> sefer ajote ser. Dîsa mi gurzek danîyê.”

---

2352 ) Anku, yanî.

2353 ) Bêmrêtî.

2354 ) Lê, lê belê.

2355 ) Wextekî, zemanekî.

2356 ) Derva.

2357 ) Werhasil.

2358 ) Li Ebexê li şûna peyva ‘dîsa, careke din’ ev peyv zêdetir tê bikaranîn.

2359 ) Duyem, duyemîn.

[Ewî sîyarî] go:

“Kuro, binêre! Ez te ra dibêjim, tu kurê merivan î. Bi xwedê bi xwedê, ez ê bikim şîrê zikmakî devê te ra were. Yawo, tu çi ji mi dixazî?”

[Zal] go:

“Dîsa jî ez mame cî da. Ûçîncî<sup>2360</sup> sefer mi ajote ser. Kuro, hema qalqan da ber gurzê mi, hema iha ez girtim ji hespê, ji hespê min, mi hilda danî ber xwe. Herd<sup>2361</sup> lingê mi kire bin lingê xwe, orta<sup>2362</sup> xwe w zîn. Wexta ku ez iha guvaştim, mi go, şîrê zikmakî devê mi ra hat. Neysene<sup>2363</sup>. Ez berdâm.”

[Ewî sîyarî] go:

“Kuro, sîktir be<sup>2364</sup> here. Zalê Zerê niha bi me bihise. Yê mi jî bikuje te jî bikuje. Kuro, tu dehwa çi li mi dikî? Filan...”

[Zal] go:

“Neyse. Ez avîtim, çû. Ez rabûm. Dîsa jî mi meydan kir, ez pey ketim. Ez newêrim bêjim, ez Zal im. Min go, wehda xwedê wehd be, sadece ez ê seyîstîya hespê te bikim. Xulamtîya te bikim. Yawo, tu hewqa pelevan î. Filan...”

[Ewî sîyarî] gote min:

“Kuro, tu kurê merivan î. Welle, tu nikarî xulamtîya mi jî bikî. Hema madem tu dibêjî, were.”

[Zal] go:

“Neyse. Em pir çûn hindik çûn. Em çûne cîkî, şiherekî. Gundek be, heke çi be, xanmanekî du qat-sê qat e. Me iha cîkî talde da hespê xwe girêdan. Mi dêna xwe dayê, ji terkîya xwe sikke peya kirin. Sikke peya kirin.”

[Ewî sîyarî] go:

“Kuro, binêre! Evan sikkana iha dîwêr da bikute, têxe nerdewan heta ez têm. Ez ê vira dezmêj bigrim.”

[Zal] go:

“Ewî, bêmehnî, dest avîte doxîna xwe. Ez jî çûm, mi sikke anîn. Mî xurçik avîtye ser milê xwe. Mi zangek hildaye, ‘dinggg’ ez lê didim.”

[Ewî sîyarî] go:

“Kuro kuro kuro! Kuro, tu çi dikî? Kuro kurê kerê, em diçine dizîyê. Ez ê herme wira dizîyê. Ka dingedinga te ye. Eva çî ye? Mi gote te jî tu nikarî xulamtiya mi bikî, kuro.”

Neysene<sup>2365</sup>. [Zal] go:

---

2360 ) Sêyem, seyemîn.

2361 ) Li Ebexê li peyvên ‘herdu’ zêdetir peyvên ‘her, herd’ tên bikaranîn.

2362 ) Navber.

2363 ) Werhasil.

2364 ) Bicehime.

2365 ) Werhasil.



“Berda mi. Ez dûr sekinîm.”

[Ewî sîyarî] gote mi:

“Kuro, binêre. Ez niha diçim. Ez ê herme wê jorê. Ez diçime kuştinê. Eger weke nîv si’etî, eger si’etek be, te ez beglemîş<sup>2366</sup> kirim. Ez hatim, jixwe hatim. Ez nehatim, lawo, hespê mi, gurz kemendê mi, zêr zîvê min î xurçika mi da çi hebe, xaş helalî te be. Hilde here.”

[Zal] go:

“Neysel. Ez mame jêrê. Mi dêna xwe dayê, hema a iha [xurçikê sikkey] avîtye hustuyê xwe. Sikkê dide ber dîwêr. Hema a iha ça lê dide, sikke dîwêr da diçe. Wusa kire nerdewan, çû jorê. Neysene. Pir ma hindik ma. Mi dêna xwe dayê, hat. Zendê wê hildayî ne, qîz e. Zendê wê hildayîne. Xencerê wê dêst da, peya bû. Neysel, hat sîyar bû.”

[Wî sîyarî] go:

“Kuro, sîyar be. Em herin.”

[Zal] go:

“Em hatin. Em çûne şiherekî. Mi dêna xwe dayê, perek-zêrek derxist da mi da.”

[Ewî sîyarî] go:

“Kuro, here. Xwe ra çi distînî bistîne, têra xwe nanav, çi, filan-bêvan... Yaniz<sup>2367</sup>, bêrekî, destîyê wê, tevrekî, destîyê wê va bistîne bîne.”

[Zal] go:

“Ez çûm. Em bê, tabî weke xarna xwe yîyecek<sup>2368</sup> [kirî].”

De perekî bol<sup>2369</sup> e. Em bê, ji mîlyare pere dusud milyonî xerc kî, çi nastînî? [Zal] go:

“Bêr mi anî, tevir mi anî. Xwe ra yîyecek, em bê, nan anî. Çi kir? Filan... Dîsa me da meydanê em çûn. Em çûne sehrake bilind, zozanekî. Xwe ra cîkî ez sekinîm. Ew nan naxwe. Mi nan xar. Em çûn rastî merzelekî hatin. Li kêleka merzel, merzel kola. Ez hê nizamim qîz e.”

[Ewî sîyarî] go:

“Bikole.”

[Zal] go:

“Mi merzel kola.”

[Ewî sîyarî] go:

“Xwe tê da dirêj ke.”

[Zal] go:

“Mi xwe tê da dirêj kir.”

[Ewî sîyarî] go:

---

2366 ) Li bendê man, li hêviyê sekinîn.

2367 ) Lê, lê belê.

2368 ) Xwarin.

2369 ) Zêde.

“Nertise. Ev merzela yê te nîne, yê min e.”

[Zal] go:

“Mi tam kola. Mi go, yê mi tê da çehl ke. Mi dêna xwe dayê, a iha li pêsrê xwe da, qîz e. Memkê wê derketin.”

[Ewê sîyarê] go:

“Bax<sup>2370</sup> binhêre! Îja ez ê mesela xwe te ra bêjim. Ez ê xwe bikujim. Ewî ku hêca ez çûm mi kuşt, ew kurapê mi bû. Eva [merzela yê] kurxalê min e. Yê dergîstiyê min e. Yanî dilê mi ketibû vî. Mi [û] vî me hij hev kir. Evî [kurap] jî bona mi lêda kurxalê mi kuşt. Dergîstiyê mi kuşt bona ku mi bixaze. Mi jî ew nekir. Mi jî wehd kir, mi go, digo gotye, bira goştê berxa nêr li mi heram be heta ez heyfa te venekim. Mi heyfa wî vekir. Yanî mi heyfa dergîstiyê xwe vekir. Mi ew kuşt. Ez hatim. Niha idî ku te wexta hevaltîya mi kirye, tu surra mi hisyayî, [ger] tu camêr î mi bixaze xwe ra. Yanî erê, ez dibêjim, tu mêrekî xirav nînî. Mi bixaze, ez bibme jina te.”

Min go:

“Mala te xirav nebe! Ka ez nikarim xulamtîya te bikim. Ka ez ê ça mêtîya te bikim?”

[Zal] go:

“Zehf ber mi gerya.”

Min go:

“Bi xwedê, îmkan tune. E nikarim te bixazim.”

[Zal] go:

“Mi nexast.”

[Qîzikê] go:

“Temam. Wexta tu mi naxazî ez ê xwe bikujim. Sade tê vê qencyê mi bikî, em bê, mi çehl kî, herî.”

[Zal] go:

“Mi hey nihêrî zarîn lê çû. Xencera xwe li serê dilê xwe da, xwe kuşt. Mi çehl kir. Mi piştta xwe dayê, ez hatim. Padişahê mi, dibê jin jî hene jinkok jî hene. Pekî ew jî jin bû. Ewê ew hukim kir. Tê bona molekî serê jinê vî şehîrî jê kî. Ka eva çî ye?”

Dibê padşê go:

“Helal be ji te ra. Bona xatrê te ez dengê xwe nakim.”

Lê, birayê mi, eva a ihakîne<sup>2371</sup> ye. Eva jî çû.

ÇÎROKBÊJ: HECÎ HENÎFÎ, HERÊM: GUNDÊ ŞEREFXANÊ JÊRÊ [EBEXE-WAN]

TEMENÊ: 63, PERWERDE: NEXWENDE, DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 28/09/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]

---

2370 ) Binêre, binhêre.

2371 ) Wiha.

## 24. ÇÎROKA SENEM XANIMÊ<sup>2372</sup>

Ez ê ya Senem Xanimê te ra bêjim. Senem Xanim qîza Ahmed Axayê Mîra ‘Ereba bû, qîza Ahmed Axa bû. Ahmed Axayê Mîrê ‘Ereba ji ‘ereba bûye, ji Si’ûdî ‘Erebîstanê hatîye. Evana yalî Si’ûdî ‘Erebîstanê ji eqrebayê xwe, ji pizmamê xwe, ji dostê xwe xeyîdî ye. Efendimê xwe ra bêjim, berê xwe da Turkîya me da, hate yalîyê Dîyarbekirê, wê derê danî.

‘Elî Îzet Begê xelkê Dîyarbekirê bû. Ew bû, lawekî wî tenê bû. Go:

‘Kurê mi jî yek e, lawê mi jî yek e. Ez ê bigerim li dinyayê keçikekî ji lawê xwe ra bixazim.’

Dibê ji gundê xwe rabû, ji mewqîyê xwe rabû. Dibê ‘eqîba<sup>2373</sup> zêra avîte terkîya xwe, kete etrafê Elazîxê, Meletyê, Bîngolê, Bidlîsê, gerya ku gerya. Qîzeke ku rastî wî were tune bû, begem nedikir.

Eva mervê hanê wexta ku vegerya, dêna xwe dayê, etekê<sup>2374</sup> Qirijdaxê ra konekî daniye. Efendimê xwe ra bêjim, dêna xwe dayê, nûtanî<sup>2375</sup> pelûtê ‘ewrê nîsanê li ser kon nêzkiya pênsid-şesid pezê wî heye. Efendimê xwe bêjim, keçikeke nûta<sup>2376</sup> başokekî ketye nav da. Dibê pez dot, hoz kir, koz kir. Dibê pez berda hustu malê, berx berdane binya malê. Dibê satilê xwe hildaye dimeşya ser kaniyê. Xwedê go, dilê ‘Elî Îzet Begê evê keçika zehf [xweş] dît. Dibê ajote ser kaniyê, li cem keçikê. Gote keçikê, go:

‘Keça mi, tu qîza kê yî?’

[Keçikê] go:

“Ez qîza Ahmed Axayê Mîrê ‘Ereba me.”

[‘Elî Îzet Begê go]:

“Bavê te li mal e?”

[Keçikê go]:

“Belê.”

Çend siwalê başqe<sup>2377</sup> jî li keçikê kir. Keçik hema ‘ecele çû, zani bû, go:

“Bi xwedê, ev merivê hanê mûtanî muşterîyê qîzan e.”

[Qîzikê] serê xwe kire ber xwe, çû. Evî [‘Elî Îzet Begê] ajote ser, çûn. Efendimê xwe ra bêjim, çû wê derê, wîra xwe ra sekinî. Dibê berê xulam hebûn, xizmetkar hebûn. Dêna xwe danê ,merivekî şexsê wî temîz, hespê wî temîz li derê malê sekinîye. Dibê [Ahmed Axayê Mîrê ‘Ereba] emir da pêşekara, [go]:

“Beyî odaya, atî tavlaya<sup>2378</sup>.”

2372 ) Ev çîrok li gor devoka çîrokbêj hatiye nivîsandin.

2373 ) ? Dibe ku sandoq be.

2374 ) Qûntar.

2375 ) Mîna.

2376 ) Mîna.

2377 ) Din, dî, dîtir.

2378 ) Yanî Bêg biherne hundir, hespê jî biherne zeviyê.

Dibê serê hespê Beg girtin. Dibê Beg hildane ser doşekê. ‘Izzet îkram, suhbet muhbet, heta ku êvar ser wan da hat. Dibê ‘edetê wî merivî wisa bû hetanî heft roja ji mêvanê xwe siwal nedikir, tê ku da herî, tu çi qewî hatî, tu hatîyî çi. Dibê sekinî hetanî êvarê, dibê êvarê suhbet kirin heta wextekî şevê. Dibê wextê şevê ‘Elî Îzet Begê tayamîş<sup>2379</sup> nebû. [Ahmed Axayê Mîrê ‘Ereba] jê ra got:

“Qurban, tu ji ku da hatîyî? Tê ku da herî? Mi teze te dîye.”

[‘Elî Îzet Begê] go:

“Ez ‘Elî Îzet Begê me. Îro, Begê Dîyarbekirê ez im. Tabî girtin berdana Dîyarbekirê tevî destê mi da ne.”

Dibê ewî [Ahmed Axayê Mîrê ‘Ereba] gotê, go:

“Qurban, ‘edetê me ‘ereba wisa ne, hetanî heft roja em li mêvanê xwe siwal nakin. Madem ku te siwal kirîye ez ê jî derdê xwe ji te ra bêjim. Ev keçika min e hanê ya ji te ra xizmetê dibîne dehwaçiyê wê ji ‘Erebîstanê zehf radibûn. Mi go, ez bidme yê pêşiyê yê paşiyê îşkencê bighîne mi. Xwedê te’ala jî mehna qederê [dizane]. Hema en îyîsî<sup>2380</sup> ez xeyîdîme, ez hatime vira. Ez hatime vî memleketî.”

[‘Elî Îzet Begê] go:

“Ê qurban, ez te ra salixê xwe bidim. Ez îro Beg im. ‘Elî Îzet Begê me. Begê Dîyarbekirê ez im. Tabî girtin berdana Dîyarbekirê tev di destê mi da ne. Meha mi qedîya li ser piştê hespê. Ez li dunyayê ketime lawê xwe bizewicînim. Aha, ez îro hatime derê mala te, bûme mêvanê te. Tu bêjî, eva merivê hanê hatye dehwa zorê li mi dike, weyaxut mesela em bêjin, dehwa tiştêkî dinê li mi dike, haşa, estexfîla ewa tine. Ez hatime bi qewlê xwedê, bi hedîsa pêxember, tê keçka xwe bidî lawê mi.”

Dibê evna merivana jî duşmîş bûn taşmîş bûn<sup>2381</sup>. [Ahmed Axayê Mîrê ‘Ereba] go:

“Yawo, ez ê heta kîngê evê keçikê bigerînim. Qelenê keçka mi iha ye.”

De mehlûme, xwedê te’ala jî qeder kirye. [‘Elî Îzet Begê] go:

“Bêje. Heta ji te tê bêje.”

Dibê evî merivê hanê go:

“Qelenê keçka mi sed zêr e.”

Dibê evî [‘Elî Îzet Begê] emir kir. Dibê ‘eqîba zêra li ser piştê hespê vekirin, anîn danîn. Efendimê xwe ra bêjim, dibê ewî sed zêrê xwe jimirî danî ser çoka Ahmed Axayê Mîrê ‘Ereba. Dibê fatha xwe xandin. Dibê ewî ew şev bûka xwe da kêleka xwe, da rûniştandinê heta destê sibê. Go:

“Qurban, idî destê sibê ye ez ê herim. Efendimê xwe ra bêjim, milletê mi heye, etba’ê mi heye,

2379 ) Xweragirtin.

2380 ) Ya baş, ya qenc.

2381 ) Hûr û kûr fikirîn.

cînarê mi heye, hevalê mi heye. Ez ê herim hevalê xwe ra bêjim. Hogirê xwe ra bêjim. Bêjim, mi lawê xwe zewicandîye.”

Sibe rehn bû li ser ummeta pêxember ra jî li ser wî ra jî. Dibê evana xatirê xwe hev xastin. Dibê ‘Elî Îzet Begê, berê da memleketê xwe. Efendimê xwe ra bêjim, kete memleketê xwe, go:

“Mi kurê xwe zewicandîye.”

Dibê deh li wî gundî, bîst li wî gundî, sî li wî gundî, dibê dusud-pîncî sîyarê dehwatê pevxistin. Efendimê xwe ra bêjim, dibê hatin. Efendimê xwe ra bêjim, bûka xwe sîyar kirin bi qewlê xwedê bi hedîsa pêxember. Efendimê xwe ra bêjim, dibê çûne memleketê xwe, dehata xwe kirin.

Dibê sal çûn, meh qediyar, roj derbas bûn. Efendimê xwe ra bêjim, heft sal derbas bû ne ewlad e ne tewlad e. Dibê ‘Elî Îzet Begê duşmîş<sup>2382</sup>, dibe:

“Ya rebbî, dinyayê da ez bûm yek kurê mi bû. Gelo çima zurîyeta wî tine?”

Navê qîzikê Senem Xanim e. Qîza Ahmed Axayê Mîrê ‘Ereba ye. Efendimê xwe ra bêjim, dibê eva mervê hanê dêna xwe dayê, Senem Xanimê zembîlek kinc şûştîye avîtye nava çiqilê dara. Tu li Senem Xanimê dinhêrî, heft sal e li binê perdê da qebilîye, beridîye. Meriv qêmîş nake dêna xwe bidê.

[‘Elî Îzet Begê] go:

“A ya rebbî, te eva hanê jî, gelo te ewladek bidayê qe yê ç a b’ya?”

[‘Elî Îzet Begê] kir nekir, tayamîş<sup>2383</sup> nebû, go:

“Bi xwedê, ez ê jê ra bêjim [ka] ewladê te çima tine?”

Ê de tabî, merivê berê timamî tev aşiq bûn. [‘Elî Îzet Begê] asilmîşî<sup>2384</sup> têla bû ji bûka xwe ra got [ka] zarê te çima tine? Wextê birincî<sup>2385</sup> qita jê ra go:

“Çehvê mi jorê rehma xwedê.”

Li jêrê dergûşa ber milê te ye.”

Dibê Senem Xanimê gotê, go:

“Xezûrê mi mezin e, efendimê xwe ra bêjim, yaşê<sup>2386</sup> wî gêçkîn<sup>2387</sup> e. Ku ez caba wî nedim, here malê derdekî derxe, weyaxud nexaşîyekî yaxalamîş<sup>2388</sup> ke, en îyîsî<sup>2389</sup> ez ê caba wî bidim.”

A ji birê xwe ra bêjim, Senem Xanim vegerya ji xezûrê xwe ra bendekî got, go:

“ ‘Elî Îzet Begê Dîyarbekir êla we ye.

Tu zengînî ji dinyayê.

---

2382 ) Fikirîn.

2383 ) Xweragirtin, liberxwedan.

2384 ) Lêxistin, jenandin.

2385 ) Yekem, yekemîn.

2386 ) Emr, temen.

2387 ) Derbasbûyî.

2388 ) Lê peydabûn, lê mîyeserbûn.

2389 ) Ya baş, ya baştirîn, ya qenc, ya qenctirîn.

Malê dinyayê zehf e malê te gelek heye.

Îro tu dibêjî çehvê mi jore rehma xwedê.

Li jêrê dergûşa li ber milê te ye.”

Dibê ‘Elî Îzzet Begê dîsa qafê wî da rûnenişt. Îkîncî bîr defa<sup>2390</sup> go:

“Eger hizkirina te hebe ez ê yeke dinê jê ra, kurê xwe ra bixazim.”

Dibê eva bûka hanê jî duşmîş bû taşmîş bû<sup>2391</sup>, go:

“En îyîsî, ez ê ji vî merivî ra bêjim, derdê kurê heye.”

Asilmîşî<sup>2392</sup> têla bû, jê ra gotê, go:

“Derdê kurê te heye. Ji mi nîne, ji Huseynê lawê te ye.”

Navê gede jî Huseyn e. Huseyn jî kurê ‘Elî Îzzet Begê ye. Navê jina wî Senem Xanim e. Senem Xanim jî qîza Ahmed Axayê Mîrê ‘Ereban e.

Efendimê xwe ra bêjim, wexta wusa got, Hiseyn tana gêcelikê<sup>2393</sup> şevê derket nava xasbaxçe. Dêna dayê, bavê wî [û] jina wî kilama davêjine ser hev. Son netîce<sup>2394</sup>, hatne ser nexaşîya Hiseyn.

De însanekî derdî wî hebe zehf-pir uzulmîş<sup>2395</sup> dibe. Dibê eva [Hiseyn] girya, li nava çehvê da, go:

“En îyîsî<sup>2396</sup> çî ye? Ez ê lêxim herim.”

Efendimê xwe ra bêjim, eva hat, her tiştê xwe berav<sup>2397</sup> kir. Efendimê xwe ra bêjim, çantê xwe, her tiştê xwe hilda çû. Berê xwe da Xamê Binê Berîyê, herrek tu herî. Ça dibêjin, ça gotinê ku dengbêj dibêjin, dibê wî berê xwe da yalîyê Bexdatê, çû.

Eva çû. Şeş salê wî sekinî. Hiseyn, meytûbek ser navê hostayê xwe şand. Rind anlamîş<sup>2398</sup> be. Li ser navê hostayê xwe ji bavê xwe ra şand. Kenehû hosta nivîsiye, go:

“Huseyn Beg, lawê te şeş sal e li cem mi dixevitî. Efendimê xwe ra bêjim, anîden<sup>2399</sup> emrê xwedê cî anî. Baş saxlixî dîlerim<sup>2400</sup>.”

[Hiseyn] meytûba xwe nivîsî, avîte postê. Heftêkî meytûbê timam bû, derketê Dîyarbekirê. Dibê wexta ku meytûb çû destê wana, dibê bû şîn girîn. Ehlê Dîyarbekirê, ewên ku bêşîn-girîn nemabe tine ne. [Dayika Hiseyn go:]

“Wey li minê, gelo tu mirî? Kê nanek da te? Kê avek da te? Gelo kê kete bin darbesta te? Gelo kê tu çehlkirî? Gelo weysête te çî bû?”

---

2390 ) Dîsa, careke din.

2391 ) Hûr û kûr fikirîn.

2392 ) Lêdan, jenandin.

2393 ) Cilê şevê, kirasê şevê.

2394 ) Dawiya dawî, axirî.

2395 ) Liberxweketî, keribî, kesirî.

2396 ) Ya baş/qenc, baştirîn, qenctirîn.

2397 ) Berhev.

2398 ) Fehmkirî, têgihîştî.

2399 ) Nişkava.

2400 ) Serê te sax be.

Dibê wexta ku isa dewam kir, nava heftekî du hefta da, dibê derdê cîgerê derdekî zor e, dibê dayka wî emrê xwedê bi cî anî. Wextê [emrê xwedê] cî anî, dibê di malê ma çi? Efendimê xwe ra bêjim, ma ‘Elî Îzzet Begê, qîzeke ‘Elî Îzet Begê heye navê wê Fatma ye, ma Senem Xanim. Herdu cahil, mêrikê kalemêr di mal da [dimînin]. Ya rebbî tu yardimê<sup>2401</sup> li wan bikî. Dibê halê wana zehf perîşan bû.

Efendimê xwe ra bêjim, dibê [Hiseyn] ku şeş sal e li qurbetiyê ye, saleke jî meytûb şandîye. Bû çi? Bû heft sal. Eva merva [Hiseyn] duşmîş bû taşmîş bû<sup>2402</sup>, go:

“Ya rebbî, xebat mi ra bes e.”

Ê tabî ku dibên lawê zengîna bû, destê wî ji qelemê aciz bibû. Wexta ku ketye xevatê her tiştî dike. Efendimê xwe ra bêjim, mesela qalib girêdide, qanala dikole, siwaxê dike. Son netîce<sup>2403</sup>, efendimê xwe ra bêjim, dibê eva merva [Hiseyn] dibê:

“Senem Xanima mi dîtye, eva şeş sal e ez mirime. Saleke jî mi meytûb şandîye. Niha ji malê derket çû.”

Dibê eva radibe tivdarekî xwe hildide. Ê tabî merivê berê tev aşiq bûne. Dibê eva merva berê xwe dide memleketê xwe tê. Wexta berê xwe dide memleketê xwe tê, payîz e, dêna xwe dayê, dengê defê lê beser bû.

Em werin wira [Diyarbakir] jî bêjin. Ji wira jî dostekî ‘Elî Îzzet Begê heye, navê wî Qereman Axa ye. Qereman Axa jî eynî mûtani<sup>2404</sup> ‘Elî Îzzet Begê ye. Mesela em bêjin, xweyî xwe her tiştî ye. Efendimê xwe ra bêjim, ‘Elî Îzzet Begê duşmîş<sup>2405</sup> bû, go:

“Xwedê, gelo? Eqrebayê mi tine ne, birayê mi tine û ewkê mi tine. Hema dostekî mi heye. Kurekî dostê mi heye. Ez ê hema bûka xwe bime kurê wî, bime kurê Qereman Axa.”

Dibê cab dike. Dibêje Qereman Axa, dibê:

“Hal mesele a iha ye.”

Qereman Axa jî sevmîş<sup>2406</sup> dibe, dibê:

Ha kurê mi [ha] kurê te. Wez ê\* bûkê biherim daynime mala xwe. Ewê [û] kurê xwe dîsa tekrar bînime mala te. Ez ê kurê xwe jî qurbana te bikim.

Dibê Qereman Axa duşmîş dibe taşmîş dibe<sup>2407</sup>. Diçe nava milletê xwe, etba’ê xwe, dibêje:

“Mi kurê xwe zewicandîye. Mi lawê xwe zewicandîye.”

Dibê lawê zengîna, dostê zengîna zehf in. Deh li wî gundî, bîst li wî gundî, sî li wî gundî, çil li wî gundî, dibê ewî [Qereman Axa] dusud-pîncî sîyar pevxist. Wexta dusud-pîncî sîyarî pevdixe, dibê

2401 ) Alîkarî.

2402 ) Dûr û dirêj fikirîn.

2403 ) Dawiya dawî, axir, axirî.

2404 ) Mîna.

2405 ) Fikirî, hizirî.

2406 ) Şabûn.

2407 ) Dûr û dirêj fikirîn.

Qereman Axa merivekî axirbaşî<sup>2408</sup> bûye, zani bûye, gotiye ku:

“Eva dehata qîza mêrik nîne, dehata bûka mêrik e. Ez ê vî dusud-pîncî sîyarî biherim têxme Dîyarbekirê, dehata bi dehwa ne. Kelîmo, tu qenc werî xirab werî? Çi bêjin, çi nebêjin?”

En îyîsî<sup>2409</sup> gazî sîyara kir, go:

“Gelî sîyara, hûn li vê derê xwe ra devgemekî bine hespê xwe, xwe ra rûnên. Efendimê xwe ra bêjim, em ê bi du berbûya va herin. Bûkê reş-heş derxin bîne vê derê. Em ê kêfa xwe binhêrin heta em derketne Çînarê<sup>2410</sup>.”

Ji birê bavê xwe ra bêjim, dibê hal mesele wusa ye. Dibê wexta ku ewî [Qereman Axa] bûk sîyar kir, berê xwe da Çînarê, em werin ji Hiseyn xeber din. Hiseyn derkete kêrtê<sup>2411</sup>, dêna xwe dayê, dengê defê lê tesel bû. [Hiseyn] go:

“Heeeyyy felek, mala te xira be. Gelo kîjan Senemê here mala kîjan Hiseynî xira ke? Bi xwedê kim bi xwedê kim, zemanekî bavê mi jî mi ra dehateke iha kiribû. Ez ê herim pêşya vê dehate, çika gelo qîza kê ye, dine kurê kê?”

Dibê wexta derkete li Gêdûka Çîyayê Mehzî lê sêr kir, dêna xwe dayê, belê, dehata ji Dîyarbekirê derket ber bi Çînarê va diçe. ‘Eynî dilê wî şewitî, go:

“Bi xwedê, ez ê qitekî ji vê dehate ra bêjim.”

Kanê bi kilamkî çi dibêje?:

“Wî wî wî wî wî wî wî wî wî wî gele du-sud sîyarê dehate.

Ez ê di Gêdûka Çîyayê Mehzî li bajara Dîyarbekira Şewitî bi tevî bi genim e.

Derdê dilê mi giran e kula dilê mi qalim e.

Derdê dilê mi wisane fenanê pelûtê ‘ewrê nîsanê li ser Qirîjdaxê xwe ra dikimkime.

Hûn ê wî xwedê kin hûn ê ji mi ra bêjin kanê eva qîza kê ye hûn ê biherin.

Wextekî ya mi bû navê wê Senem e wî wî wîî.”

De ez kulama heqa nizamim bêjim. Dibê ji wan sîyara hinek anlamîş<sup>2412</sup> bûn, hinek anlamîş nebûn.

Efendimê xwe ra bêjim, ê Senemê jî go:

“Eva çi aşiq e [ku] dibêje eva Senem e?”

Hineka guh dayê, hineka guh nadayê. [Hiseyn] duşmîş bû taşmîş bû<sup>2413</sup>. Îkîncî defa<sup>2414</sup> asilmîşî<sup>2415</sup> têla bû ku dîsa jî bendekî jê ra bêje. Benda duduya jê ra dibêje:

“Eva bûka hanê tu ku derê tînî, tê biherî kurê kê ra?”

---

2408 ) Giran.

2409 ) Ya baş/qenc, baştirîn, qencîrîn.

2410 ) Navçeyeke Dîyarbekirê ye.

2411 ) Kêrt, di çîyayan de ji bo cihên nizm ên ku rê tê ra derbas dibin re tê gotin.

2412 ) Fehmîrî, têgihîştî.

2413 ) Dûr û dirêj fikirîn.

2414 ) Cara duduya, dîsa.

2415 ) Lêxistin, jenîn.



Çend sîyara ajotne cem hev, go:

“Kuro yawo, derdê vî aşiqî çî ji me ketye? Efendimê xwe ra bêjim, eva aşîqa nahêle em derbas bin?”

[Ew çend sîyarana] dibên:

“Çika bêje tu aşîq î. Aşîqê heqîqî, xwedê teala pê dide zahirkirinê. Te gere bizanibûya bûka me kê ye.”

Eva qinya’etek jê ra çêdibe, dibê:

“Kuro, dibe ku eva Senem Xanim be?”

[Hiseyn] dibê:

“Lê li lê lê, lê li lê lê gele du sud sîyarê dehwatê,  
Wez ê bajara Dîyarbekira Şewitî li serê şaxan û baxa,  
Derdê dilê mi giran e kula dilê mi gelek e,  
Nede ber tîran û daxa, wîî.  
Heger siwala bûkê li mi dîkin,  
Neseba Mîrê ‘Ereb Axa qîza Ahmed Axa ye.

Wî wî wîî.”

[Sîyara] go:

“Pîî<sup>2416</sup>, ya rebbî! Evî got neseba Mîrê ‘Ereba, qîza Ahmed Axa ye.”

[Sîyara] go:

“Çikanê<sup>2417</sup> bêje navê bûkê çî ye?”

[Hiseyn] go:

“Ez ê li bajara Dîyarbekira Şewitî tevî tevî pêda pêda bi genim e.  
Derdê dilê mi giran e kula dilê mi qalim e.  
Derdê dilê mi wusa ne fenanî pelûta ‘ewrê nîsanê,  
Li tepa<sup>2418</sup> Qirijdaxê xwe ra dikimkime.  
Heke siwala bûkê li mi dîkin,  
Neseba Mîrê ‘Ereba, qîza Ahmed Axa ye.  
Navê wê Senem e, wî wî wîî.”

Bûkê go:

“Kuro, evî ku behsa mi bike, behsa bavê mi bike, ewa meriva [merivekî gelek nêzikî min e].  
Efendimê xwe ra bêjim, hine sîyara ajotne cem hev. Hineka ajotne ser serê wî da, [dibên]:  
“Em ê lê xin bikujin.”

---

2416 ) Li Ebexê ji bo halên ecêbmayî û şaşmayî ev peyv tê gotin.

2417 ) Ka, kanê.

2418 ) Ser.

Hiseyn di ortê<sup>2419</sup> da ma. Qereman Axa mêrikî axirbaşî<sup>2420</sup> bû, go:

“Kuro, xelkê sibê bêje, lawo, te dehata xwe kir te çima merivê amîtam<sup>2421</sup> kuşt. Çikanê îşin îçinde bî îş var<sup>2422</sup>. Çikanê binhêrin eva çi îş e?”

[Qereman Axa] ajote serê çîyê, go:

“Kuro, nekujin heta ez hatim.”

[Sîyara] ajotne dora Hiseyn, dora Hiseyn girtine. Efendimê xwe ra bêjim, sîyarê jêrê jî bi tevî berbûyê, bûkê va sekinîne, [Qereman Axa ra dibêjin]:

“Ka here sîyarê jorê [ew meriva] kuştin, nekuştin?”

Qereman Axa xwe pê ra gihîşt, go:

“Kuro aşiq, kurê mi, te sazêk daye destê xwe, te xwe daye serê vî çîyayî, tê rêya rêwîya bibirî? Kurê mi, tu nahêlî em derbas bibin? Bexşîşê dixazî bime te, xerçlixê dixazî bime te.”

[Hiseyn] go:

“Axayê mi, mi xetake giran nekiryê, mi sûcekî giran nekiryê. Bavê mi jî mi ra zemanekî dehateke iha kir. Efendimê xwe ra bêjim, dilê mi şevitî, mi jî we ra du qita siwal kir. Mi go, bûka we ji ku ye? Efendimê xwe ra bêjim, qîza kê ye? Ê hûn ê çima mi bikujin?”

[Qereman Axa] go:

“Tu aşiq bî aşiqê heqîqî bî, rebbê ‘alemê pê dide zanînê, gere te bizanibûya bûka me kê ye.”

[Hiseyn di dilê xwe da] go:

“Kuro, dibê eva Senem be!?”

[Hiseyn] go:

“Axayê mi, de ka îja bêje van sîyarîya bira mi nekujin. Ez ê nîşanê bûkê bêjim.”

[Hiseyn] go:

“Wî wî wî wî gele du sud-pêncî sîyarê dehvatê,  
Wez ê Gêdûka Çîyayê Mehzî li bajara Dîyarbekira Şewitî bi serê giran û gazî,  
Îsal heft sal e ez ketime sivîlê belengazê,  
Destê mi qerimîn li ser têla talûlê, sazê,  
Heger siwala bûkê li mi dikin,  
Nîşanekê sûretê rastê, du hev xala ber boxazê<sup>2423</sup>, wî wî wîî.”

Qereman Axa gazî kir, go:

“Kuro, çika bêje berbûya da ewa ku aşiq dibêje rast e?”

Berbû go:

---

2419 ) Nav.

2420 ) Giran.

2421 ) Bêsûc û bêguneh. Li Ebexê zêde tê bikaranîn.

2422 ) Di vir da tişteke heye.

2423 ) Gewrî.

“Hay hay tamam e. Nişanek li sûrêtê rastê, du hev xal ber boxaza wê ne.”

Senem Xanimê go:

“Ew însanê ku bizanbe du hev xal ber boxaza mi bin, xêncî Hiseyn kes nîne.”

[Senem Xanim] xwe hespê da avît. Hevraza da hat, bû zarezara wê, dibêje:

“Hiseyn, Hiseyn!”

[Çîrokbêj Memedê Xelkê Hacî Zîyaretê]:

“Îja arê me yê ret be ha! Binêre nava rojê ye ha! Isa dibêjin.”

[Berhevkar Mezherê Kalê]:

“Îja evê seva çi dibêjin?”

[Çîrokbêj Memedê Xelkê Hacî Zîyaretê]:

“Eva jî ewka berê ye. Dibên, gere çîrok di êvarê da werne gotin. Nava rojê ar ret dibe.”

Dibê berjêr hatin. Efendimê xwe ra bêjim, dibê etekê<sup>2424</sup> Qirijdaxê da hevdu sarilmîş<sup>2425</sup> kirin. Dibê ketin, xwe va çûn. Dibê ew sîyarê jêrê bi tevî berbûya va jêr va hatin. Ew sîyarê jorê jî bi tevî Qereman Axa va jor da hatin. Dibê li ser wan top bûn. Merivekî ku li ser [wan] sekinîye, gote Qeremen Axa, go:

“Axayê mi, xwedê serê te reş-heş ke li serê te da. Aşiqek hatiye bi du benda bûka me, me stand, stand. Îja niha di hembêzê da ketye, xwe va çûye.”

[Qereman Axa] go:

“Arqadaş<sup>2426</sup>, ew kê ye isa dibêje? Di îşa da îş hene.”

Av anîn li ser çehvê wan da kirin. Hiseyn, berya Senemê li ser hemadê xwe da hat. Destê xwe li saza xwe gerand. Merivekî mota<sup>2427</sup> abê saz da destê wî. Asilmîşî<sup>2428</sup> têla bû, go:

“Wî wî wî wî wî wî gele du-sud sîyarê dehvatê.

Wez ê li Gêdûkê Çîyayê Mehzî li bajara Dîyarbekira Şewitî darê bî ne.

Kesî dîtye meriv heft sala li qulbetîyê bimîne,

Sala heşta ku vegere namûsa xwe nava du-sud sîyarê xeriv da bibîne, wî wî wîfî.”

Dibê Qereman Axa hêsirê wî paxîş kir, [go]:

“Kurê mi, tu kê yî?”

[Hiseyn] go:

“Ez lawê ‘Elî Îzzet Begê me. Ez Hiseyn im.”

[Qereman Axa go]:

“Kurê mi, ne tu mirî yî ev şeş sal e? Efendimê xwe ra bêjim, eva saleke jî kaxiza te reş hatye.

---

2424 ) Qûntar.

2425 ) Hemêzkin.

2426 ) Hevalno.

2427 ) Mîna

2428 ) Lêxistin, jenandin.

Efendimê xwe ra bêjim, eva heft sale te ye, derbas bûye.”

[Hiseyn] go:

“Ez nemirim. Xwedê te’ala dîsa ez gêrî<sup>2429</sup> şandim.”

[Qereman Axa] go:

“Kurê mi, ha lawê mi ha lawê ‘Elî Îzzet Begê, firq tine.”

Tabî sozê mêrê berê soz bû. Bigotana belê, tamam bû. Yê niha jî na, sed bar quran sond buxwe, tu emnîyeta xwe pê naynî. [Qereman Axa] go:

“Sozê mêrê berê, tu here hîngî bavê te neb’ecîye. Ez ê isa evê bi def-dehvat hildim, werim derê mala kurê xwe peya bim. Ha kurê mi ha ‘Elî Îzzet Begê. Elhemdulîlah lawo, me eva derdê hanê nedît.”

Efendimê xwe ra bêjim, [Hiseyn] li hespê xwe sîyar bû, pêşya wana çerixand. Dibê însanekî ku derdekî wî hebe zehf zehf deh deqe nakeve bîrê. Derdê wî dikeve bîrê, [go]:

“Ya rebbî, ez ê gelo ça bim? Ez ê herme malê, ew tas, ew himam, ew Huseyn, ew Senem. Gelo halê min ê ça be, ya rebbî?”

Dibê derdê wî kete bîrê, li tepa<sup>2430</sup> çîyê ye. Efendimê xwe ra bêjim, dibê însanekî ku derdê wî hebe tayamîş<sup>2431</sup> nabe. Dibê bi gotinê melan in bi fê’lê kitêban in, însanekî bi qalbê sax bi dilêkî sax derkeve tepa çîyakî bilind, ji xwedê ra di’a bike, xwedê te’ala di’ayê wî qebûl dike. Dibê evî ajote tepa çîyê. Pêşîra xwe vekir. Yalvarmîşî<sup>2432</sup> xwedê bû. Ka em binhêrin yê çi bêje?:

“Wî wî wî wî wî xwedayo,

Ez ji te ra dibêjim tu rehman î.

Tu seratê li ser qelban î.

Mi li dinyayê çi kirye tu zanî.

Mi bihîstîye li mela li kitêban.

Te gelek ‘evdê xwe ji tengasîyê deranî.

Te Eyub Pêxember li kurma xilas kir.

Te Yusûf Pêxember di binê bîrê da jê ra sed yadîgar danî.

Ez ê niha herim bêjim bavo ez hatim.

Qereman Axa wiha parra Senem Xanim anî.

Îja derdê mi wê derdê ye kula mi wê kulê ye.

Destê Senemê bigîjim malê derxim.

Xelkê bêje lawê ‘Elî Îzzet Begê destê namûsa xwe girt bi zorê mal deranî, wî wî wîîî.”

---

2429 ) Şûnda.

2430 ) Ser.

2431 ) Xweragirtin, liberxwedan.

2432 ) Lavayîkirin.

Ê efendimê xwe ra bêjim, derd giran e, dibêje. Dîsa îkîncî defa<sup>2433</sup> asilmîşî<sup>2434</sup> têla bû. Ka hela li binhêre yê vê carê çî bêje? Dibê:

“Wî wî wî wî wî wî wî xwedayo,

Derd giran e , tayamîş<sup>2435</sup> nabim.

Li ser piştî hespê wez pêya bim.

Di mehlê da weqasî qaçaxê tolazê lawê xelkê nabim.

Ya rebbî, ez yalvarmîşê<sup>2436</sup> te dibim.

Derdê mi giran e, bila dinayayê kes nebîne.

Ku derdê dilê mi wisa ne fenanî pelûta ‘ewrê nîsanê.

Li tepa<sup>2437</sup> Qîrîjdaxê meriv agirekî berdê ba lê rabe.”

Dibê wexta ev îkîncî<sup>2438</sup> qîta hanê go, dêna xwe dayê, hespê wî guhekî xwe hilda yek danî. Sazek li nava çehvê hespê da, go:

“Mîrat, li serê vî çîyayî ez derdê xwe dibêjim. Te li min xêr e?”

Bû şîhîniya hespê. Hesp rabû ser lingê parava. Pêê! Dêna xwe didê, kalekî orte boylî<sup>2439</sup>, sîma wî qerqaş, çehvê reş ber hazir bû, go:

“Kurê mi, devê xwe veke.”

[Hiseyn] go:

“Mi devê xwe vekir. Ewî tûyî devê mi kir. Destê xwe li piştî mi da. Mi destê xwe avîte cêva xwe.”

Kalê go:

“Tê ça b’kî?”

Mi go:

“Welle ez ê çend axçe-pere bime te. Tu li serê vî çîyayî belengaz î.”

[Kalê] kenya, go:

“Qarşî<sup>2440</sup> xwe li çîyê xwe mêze ke, ew çî ye li çîyê?”

[Hiseyn] dibê:

“Wexta ku mi li çîyê mêze kir, ez vegeryam mi dêna xwe dayê, kalê çî, halê çî! Heywax, mi derdê xwe jî jê ra nego!”

---

2433 ) Cara duyem, duyem car, duyemîn car.

2434 ) Jenandin, lêxistin.

2435 ) Xweragirtin, liberxwedan.

2436 ) Lavayîkirin.

2437 ) Ser, serî.

2438 ) Duyem, duyemîn.

2439 ) Bejna ne kurt û ne jî dirêj.

2440 ) Pêşber, hember.



Li meytûbê da nivîsiye birayê te mirî ye.

Mirin emrê xwedê ye.

Heyfa mi nayê mirina birayê mi wîî.

Mala bavê mi qonaxa Mîran û Hakima bû.

Li ser serê mi belav bûye.

Îja heyfa mi nayê li qonaxa mala bavê mi da.

Xelkê îro hatîye jina birê mi ji xwe ra birî ye.

Wî wî wîî.”

[Hiseyn] go:

“Wey! Mala mi xirabyo, heyyy! Fatme tu yî?”

[Fatmê] go:

“Tu kê yî?”

[Hiseyn] go:

“Ez Huseyn im.”

[Fatmê] go:

“Gelekê muta<sup>2447</sup> te hatin gotin go, Hiseyn derketîye hatîye.”

[Hiseyn] go:

“Welle, ez Huseyn im.”

[Fatmê] go:

“Kanê wexta tu Hiseyn bî kanê li ser milê xwe yê rastê tehzî ke, li ser girka milê te nîşanek heye.”

Dibê wexta evî li ser milê xwe tehzî kir, efendimê xwe ra bêjim, eva (Fatme) rastî nîşana wî hat, dibê zarînî li wana ket. Dibê cêrê avê li desta ket, ş’kest. Dibê hev hemêz kirin, ketin xwe va çûn. Bi emrê xwedê, arekî<sup>2448</sup> xwe va çûn, li ser xwe va hatin. [Hiseyn] dibê:

“Ê bacî<sup>2449</sup>, kê heye kê tine ye?”

[Fatmê] go:

“Hey mala te şewityo! Tu sala pêşyê çûyî ew sala na, sala meytûba te hat cîya mi emrê xwedê cî anî. Efendimê xwe ra bêjim, mala bavê mi qonaxa mîran û hakima bû, niha bela bûye. Bavê mi sond xarîye naçe hundur da. Postek li ser balqona xwe danye ku naçe hundur. Bavê mi emrê wî timamî çûye, çehvê wî nabîne. Xelkê hat jina birê mi ji xwe ra birîye.”

[Hiseyn] go:

“Mi Qereman Axa rê da dît, ewê vegere were.”

Efendimê xwe ra bêjim, evna hev hemêz kirin çûne. Ew (û) bavê xwe tanişmîş<sup>2450</sup> bûn, hetanî hev

---

2447 ) Mîna.

2448 ) Wextekî, navberekî.

2449 ) Xwûşkê.

2450 ) Hevnasîn

sewraxt kirin girmîniya defê li koşê şîher lêda. Dibê wexta [girmîniya defê] li koşê şîher lêda, efendimê xwe ra bêjim, dibê cab danê, go:

“Kurê te hat, bûka te jî hat.”

Dibê ‘Elî Îzzet Begê mêrekî isabû, gote sîyara, go:

“Hûn deqekî metel nasekinin. Aha çehvê zavê li rêya bûkê ye. Hûn Fatmê sîyar kin, biherin. Bira çehvê zavê [kurê Qereman Axa] lê nemîne.”

Efendimê xwe ra bêjim, heft roj heft şeva kirne def-dehwat. Efendimê xwe ra bêjim, dibê ewî hetanî nebiyê xwe jî zewicand, ‘Elî Îzzet Begê paşê emrê xwedê bi cî anî. Dibê nîha zurîyeta wana li etrafê Dîyarbekir, ‘Entabê da hene.

Hûn çûne mirazê xwe, ew jî çûne mirazê xwe. Rehma xwedê li débavê we, cima’eta we be jî.

ÇÎROKBÊJ: MEMEDÊ XELKÊ HACÎ ZÎYARETÊ

HERÊM: GUNDÊ HACÎ ZÎYARETÊ [EBEXE-WAN]

TEMENÊ ÇÎROKBÊJ: 55

PERWERDE: NEXWENDE

DEMA ÇÎROKWERGIRTINÊ: 09/10/2016

BERHEVKAR: MEZHERÊ KALÊ [MAZHAR ÇİFTÇİ]